BANDANA, *n.* : dersoka mezina neqişkirî.

BANDEAU, *n.* : dersoka eniyê yan pirçê.

BANDEROL(E), *n.* : alaya biçûk.

BANDICOOT, *n.* : mişkek hindî mezin e.

BANDIED, *adj.* : weşandî, havêtî.

BANDIT, *n.* : rêgir, nijde(van), çete, verde(van).

BANDITRY, *n.* : rêgirî, nijdevanî, cerdevanî.

BANDOLEER, *n.* : rext.

BANDOLERO, *n.* : rêbirr, rêgir.

BANDOLINE, *n.* : avekiyek şirêzî bo karê pirçê.

BANDORE OR BANDORA, *n.* : alavek mûzîqî wek gîtarê.

BANDSMAN, *n.* : endamê tîpa mûzîqeyê.

BANDSTAND, *n.* : herzala tîpa mûzîqeyê.

BANDWAGON, *n.* : erebaneya mûzîqeyê.

BANDY, *vt.* : havêtin, weşandin.

BANDY, *n., adj.* : çemayî, yariya bandî (wek kaşo ye).

- **LEGGED** : lingxwehr.

BANDYING, *n.* : weşandin, havêtin.

BANE, *n.* : jehir, jar.

BANEFUL, *adj.* : kuşinde.

BANG, *vt.i.* : teqandin, qayim girtin " da xistin " lêdan.

BANG, *n.* : teqîn, gurm!.

- **TO GO OVER WITH A ~** : aheng bêqam ser keftin.

BANGALORE TORPEDO, *n.* : teqînkê bangelor : lûleya dirêja asinê tij. Teqemenî bo peqandinê.

BANGKOK, *n.* : qirşikê Bangkok, şefqeyê vî qirşikî.

BANGLE, *n.* : bazin yan zendek bo destî û hicol bo pêyî.

BANG'S DISEASE, *n.* : nesaxiya vegira terşî.

BANGTAIL, *n.* : dûvê kurtkirî, hespê pêşbirkê yan pêşbezînê.

BANG-UP, *adj.* : nayab.

BANIAN, *n.* : bazirganê Hindî, kumlekê firehê Hindî.

BANISH, *vt.* : sirgun kirin, dor kirin, beradan kirin, sirgum kirin.

BANISHED, *adj.* : dorkirî, sirgunkirî, sirgumkirî.

BANISHER, *n.* : dorker.

BANISHING, *n.* : sirgunkirin, dorkirin, beradan.

BANISHMENT, *n.* : dorkirin, sirgunkirin, şelpîn.

BANISTER, *n.* : stûnk yan destikê pêstirkê.

BANJO, *n.* : alavek mûzîqî.

BANK, *n.* : berav, rex, kenar, rexav, lêwar.

- **RIVER** : kenarî rûbar, muzorgrox.

BANK, *n.* : benk, banq, diravgeh.

- **BILL** : qoçana diravgehî.

- **BOOK** : defterka hejmara diravgehî.

- **MONEY** : kaxezên darayî.

- **RATE** : bihayê daşikandinê.

BANKABLE, *adj.* : diravgehbar, banqbar.

BANKER, *n.* : banqvan, bankvan, diravgehvan.

BANKING, *n.* : bankdarî.

BANKRUPT, *adj., n.* : bêpare, mendebor, rûto, nabot, qelaş.

BANKRUPTCY, *n.* : nabotbûn, bêpareyî, rûtbûn, malketin, mendeborî, daşûştin, qelaşî.

BANKSIA, *n.* : dar yan teraşek Awistiralî (Otriş) ye.

BANNED, *adj.* : tembîkirî, berbendkirî, herambar, herimandî, qedexekirî.

BANNER, *n.* : bandêr, ala, bêraq, peydax.

BANNERET(TE), *n.* : bandêrk, alaya biçûk.

BANNEROL OR BANNER ROLL, , *n.* = **BANDEROLE.**

BANNING, *n.* : nehêlan, nehiştin, qedexekirin, berbendkirin.

BANNOCK, *n.* : nan.

BANNS, *n.* : têbîniya jinînanê yan şûkirinê.

BANQUET, *n.* : ahenga têr xwarin, şahînet, ezîmet, şayî, vexwandin.

BANQUETTE, *n.* : rûnişteyek dirêj. herzal (dinav çeperîda) bo şerî.

BANTAM, *n., adj.* : mirovê hûrê şerxwaz, mirîşka biçûk.

- **WEIGHT** : kulmbazê ne pitir ji 118 pawinan.

BANTER, *n.* : tirane.

BANTER, *vt.i.* : tirane kirin.

BANTERINGLY, *adv.* : bi tiraneyî, tiranekî.

BANTING, *n.* : parêz.

BANTLING, *n.* : sava nexasme bîjî.

BANTU, *n., adj.* : gel yan zimanên Efriqaya navî û başûr.

BANYAN, *n.* : darê mezinê rojhelata Asiya.

BANZAI, *n.* : gaziya serketina Japonî, holî, xwekujî.

- **ATTACK** : êrîşa xwekujî.

BAOBAB, *n.* : darek yeksanekerî qurm pan, helezek guldara bakura Emerîka.

BAP, *n.* : nan (balolk).

BAPTISM, *n.* : têhilînîtî : ola filehiya texlîtek pirotî.

BAPTIST, *n.* : têhilînker : filehê texlîtek pirotî.

BAPTISTRY, *n.* : têhilîngeh.

BAPTIZE, *vt.i.* : têhilanîn (nav avê de), nav kirin, zarok têhilanîn (avê de).

BAR, *n.* : kestek, bist, şîş.

BAR, *n.* : berbest, meyxane, kosp, dadgeh, parêzervanî.

BARMAID, *n.* : meygêr (keç).

BARMAN, *n.* : meygêr (mêr).

- **TO BE TRIED AT THE ~** : pêşkêşî dadgerîna eşkera dikin.

- **TO BE CALLED TO THE ~** : bûn parêzer.

- **TO GO TO THE ~** : bûn parêzer.

- **TO READ FOR THE ~** : parêzeriyê xwandin.

BAR, *vt.* : dadixit (bi bistê), berbest kirin, berbend kirin, nehêlan, girtin, qedexe kirin.

- **NONE** : bê awarte (kirin).

BARB, *n.* : niklok, texlîtek kotir, texlîtek hesp.

BARB, *vt.* : niklok kirin.

BARBARIAN, *adj., n.* : hov, dirrinde.

BARBARIC, *adj.* : hovî, dirrinde.

BARBARISM, *n.* : hovîtî, dirrindeyîtî.

BARBARITY, *n.* : dirrindeyîtî, hovîtî.

BARBARIZE, *vt.i.* : hov kirin.

BARBAROUS, *adj.* : hov, dirrinde.

BARBERY APE, *n.* : meymûnê Merakiş (Berberî).

BARBECUE, *vt.* : goşt biraştin.

BARBECUE, *n.* : seyran (goşt biraştin).

BARBED, *adj.* : niklokirî, dirr.

BARBED-WIRE, *n.* : asinê dirrek, sîma dirrek, têla dirrek.

BARBEL, *n.* : masiyek rûbarî ye (texlîtek mêk, simbêlên masiyê (bo sehkirinê).

BARBELL, *n.* : bista herdu serik girankirî (bo werzişiya helgirtina giraniyan).

BARBELLATE, *adj.* : rihçikên kurtêşt req.

BARBER, *n.* : emezîq, sertiraş, sertaş, delak.

BARBERRY, *n.* : teraşek dirrî gulzer.

BARBET, *n.* : seyek pirç dirêj û gij.

BARBET, *n.* : herzal.

BARBICAN, *n.* : çeperê berahiyê.

BARBITAL, *n.* : gejmêrek spî belûrî (bo nivandinê).

BARBITURATE, *n.* : barbîturêt : xwêya tirş (bo hedarkirinê).

BARBULE, *n.* : kurterih, demarokên perî.

BARD, *n.* : kurtan, hozan, dengbêj, hozanê dastanî yan qehremanî.

BARBED, *adj.* : kurtankirî.

BARDOLATOR, *n.* : hijmekarê şekispîrî.

BARE, *adj.* : rîs, rût, tazî, zilît, sat, kot, bê kinc, tisî, tirsî, recal.

- **FACED, ADJ.** : bêxêlî, rûqayim, difor, bê pûşî.
- **FOOT** : pêxas.
- **FOOTED** : pêrût.
- **HEADED** : kot, serkol, serkot.
- **LEGGED** : lingrût, bêgore.

BARE, *vt.* : diyar kirin, rût kirin, rîs kirin.

BARED, *adj.* : rûtkirî, rîskirî, zilîtkirî.

BARELY, *adv.* : encex, hew.

BARENESS, *n.* : tazîbûn, rûtîtî, rûtbûn, rîsîtî.

BARFLY, *n.* : mêşa meyxaneyan : meyxanebaz.

BARGAIN, *vt.* : bazar kirin.

- **TO ~ FOR** : hîvî kirin.

BARGAIN, *n.* : bazar (kirin).

- **A BAD ~** : bazarek xirab.
- **A GOOD ~** : bazarek baş.
- **A HARD ~** : bazarê ziyanok.
- **TO STRIKE [CONCLUDE, SETTLE] A ~** : gehiştin pêkhatinê.

BARGAINER, *n.* : bazarker.

BARGAINING, *n.* : bazarkirin.

BARGE, *n.* : keşt (binpan).

- **MAN** : keştîvan.

BARGE, *vt.i.* : guhaztin (bi keştî).

BARGEE, *n.* = **BARGEMEN.**

BARILLA, *n.* : heleza karbonatên soda.

BARITE, *n.* : kevirê kibrîtatên soda.

BARITONE, *n.* : zildeng.

BARING, *n.* : rûtkirin, rûtandin, satî, verûtin, rîskirin, darûtan, peritîn.

BARK, *n.* : qaşil, tivil, kelpik, qaşik, qal, kewl, qaşol.

BARK, *vi.t.* : rewîn, spî kirin.

BARKED, *adj.* : rewî.

BARKEEPER, *n.* : meygêr, meyfiroş.

BARKENTINE, *n.* : masiyek deryayî mezin e.

BARKER, *n.* : gazîker, tîvilker(k).

BARKING, *n.* : rewîn, gevîn, çele.

BARKY, *adj.* : tîvilî.

BARLEY, *n.* : ceh, cû.

- **COOKED ~** : poxîn.
- **PALLOR** : cehzer.

BARM, *n.* : hevîrtirş.

BARMECIDE, *n.* : aşopî.

BARN, *n.* : kadîn, afir, axûr, gom, gov, hevşî.

BARNACLE, *n.* : texlîtek werdek, mirov yan tiştê debîşî, berçavik.

BARN-DOOR, *n.* : deriyê embara tovî.

BARNSTORM, *vi.* : gerîn bo pêşkêşkirina şanoyî û gotarên ramyarî.

BARNYARD, *n.* : meydana li rex embara.

BARO-, *pref.* : pêşgir e ko giran, pestan e.

BAROGRAM, *n.* : tomara nexşkerê pestanê.

BAROMETER, *n.* : pestanpîv.

BARON, *n.* : baron : xanedan.

BARONAGE, *n.* : baronîtî.

BARONESS, *n.* : jinbaron, baronbanû.

BARONIAL, *adj.* : baronî.

BARONY, *n.* : barongeh : paye yan devera baronî (wek mîrgehê).

BAROQUE, *adj., n.* : barokî : texlîtek hunera avakirinê nexasme li seda hevdeyê.

BAROSCOPE, *n.* : pestanbîn (alava dîtina guhorîna pestanê...).

BAROUCHE, *n.* : erebaneya çarçerxî (û du rûniştekên beramber).

BARRACK, *n.* : serbazgeh.

BARRACOON, *n.* : girtîxaneya bendeyan yan tawankaran.

BARRACUDA, *n.* : gemiya sêbabirek.

BARRAGE, *n.* : sikir, bend, best, berbest.

BARRAGE, *vt.* : havêtin.

BARRAGED, *adj.* : havêtiyê.

BARRAGING, *n.* : havêtin.

BARRAMUNDA, *n.* : masiyek rûbarî.

BARRANCA, *n.* : nihala tenga rex nişîv.

BARRATRY, *n.* : kirîna şûnkaran li dêrê.

BARRED, *n.* : berbendkirî, bendekirî, ewşandî, herimandî.

BARREL, *n.* : birmîl, şikev, stûn yan stûnî.

- **HOUSE** : meyxaneya kotî. texlîtek mûzîqeya caz.

BARREL, *vt.* : kirin nav birmîlî de.

BARRELLED, *adj.* : birmîlkirî (kirî nav birmîlî de).

BARRELLING, *n.* : birmîlkirin (kirin nav birmîlî de).

BARREN, *n.* : nezok, nehatî, çol, şorek, stewr, zûrik, çirg, beyşel, bêber.

- **WOMAN** : bê weç, nezok, nezê.

BARRENNESS, *n.* : stewrî, nezokî, bêweçî, noşor.

BARRET(TE), *n.* : kulav, tûrikê pora jinê.

BARRICADE, *n.* : talde, senger, çeper (li kolanê).

BARRICADE, *vt.* : berbest kirin (bi çeperî).

BARRIER, *n.* : çikandin, tan, berbest, lemper, kosp, gêrbend.

BARRIER, *vt.* : berbest kirin, girtin (bi berbestî).

BARRING, *n.* : herimandin, ewşandin, qedexekirin, daxistin (rê yan derî).

BARRISTER, *n.* : parêzer.

BARROM, *n.* : jora meyvexwarinê.

BARROW, *n.* : galîske, erebaneya destî, çiya, gir, berazê gunokirî.

BARTENDER, *n.* : meygêr.

BARTER, *vi.t.* : pêk guhorîn, ser bi ser dan.

BARTER, *n.* : pêk guhartin, berdêlî, ser bi ser dan, alişt.

BARTIZAN, *n.* : birca derhatiya dîwarî.

BARTON, *n.* : zevî, şov.

BARYTA, *n.* : baryom. oksîdê baryom.

BARYTONE, *n.* : deng, stranbêj.

BASAL, *adj.* : binyatî.

- **GRANULE** : dêndika binyat.
- **PLATE** : depê binyat.
- **PROCESS** : peydabûna binyat.

BASALIA, *n.* : peykerê binyat.

BASALT, *n.* : bazilt : kevirê keskê tarî.

BASALTIC, *adj.* : bazîltî.

BASAN OR BAZAN, *n.* : kevlê debaxkirî.

BAS BLUE = BLUESTOCKING.

BASCULE, *n.* = **SEESAW.**

- **BRIDGE**, *n.* : pira livandinî.

BASE, *n., adj.* : tift, qilê.

BASE, *n.* : binke, binik, binax, hîm, binyat, sokîn, bingeh, binaxe, binereti.

- **BOARD** : binke dep.
- **BORN** : kotî, bijî.
- **PAY**, *n.* : mûçeyê binyat.

BASE, *vt.* : damezirandin.

BASE, *adj.* : tirsinok, çepel, nizim, rijde, tise, kotî, kortîlo, sefîl, xwaro.

BASEBALL, *n.* : beysbol : tepka binikî (yariya werzişî : wek tepkana sê şeqî).

BASED, *adj.* : binyatkirî.

BASELESS, *adj.* : bê bin, bê binyat, bê binçîne.

BASE LINE, *n.* : rêza binikî.

BASELY, *adv.* : bi kotî.

BASEMENT, *n.* : serdab, binyat.

- **MEMBRANCE** : perdeya binyat.

BASENESS, *n.* : rijdeyî, qelaşî, şerm, fehêtî, kotîtî, nizmî, nizmatî, nizmayî.

BASENJI, *n.* : seyê Efrîqayê nêçîrê yê ko kêm direwit.

BASH, *vt.i.* : lêdan.

BASH, *n.* : lêdana dijwar.

BASHFUL, *adj.* : şermîn, fehêtok, fedîkar.

BASHFULLY, *adv.* : bi şermî.

BASHFULNESS, *n.* : şermînî, fedî.

BASIC, *adj.* : binyatî, bin çîneyî, tiftî, bincî, bingehî, binereti.

- **SALT** : tifte xwê.

BASICALLY, *adv.* : bi binyatî, binyatkî.

BASICHROMATION, *n.* : rengê binyatî.

BASICITY, *n.* : qilêxwazî.

BASIDIAL, *adj.* : binyatî.

BASIDIOMYCETES, *n. pl.* : kivarkên binyatî.

BASIDIOSPORE, *n.* : zayendê binyatî.

BASIDIUM, *n.* : binyat : endamê zayendiyê kivarkî.

BASIFY, *vt.* : qilê kirin.

BASIL, *n.* : rihan.

BASILAR(Y), *adj.* : binikî, binyatî.

BASILAR PLATE, *n.* : depê lama jêrî.

BASILIC, *adj.* : şanî, qiralî.

- **VEIN** : şîndemarê mezinê baskî.

BASILICA, *n.* : avahiyek Romanî lakêşe, dêr.

BASILISK, *n.* : kimkimeyê pufdar.

BASIN, *n.* : peng, teşt, pêşok, şikev, awerêj.

BASINET, *n.* : xodeyê sivikê polayî.

BASIPODITE, *n.* : binikê pêyî.

BASIS, *n.* : binaxe, binyat, binik, bingeh, binema, hîm, bineçe, binçîne, ragir.

BASK, *vi.* : xwe germ kirin, xwe dan ber tavê, xweşî bûn.

BASKET, *n.* : sebet, selik, sevî, liba, zembîl, mekev.

- **BALL** : tepka sebetê.
- **FOR GRAPES** : sevî.
- **OF GOLD** : sebeta zêrî : helezek gulzer.

BASKETRY, *n.* : sebet, sebetkarî.

BASKET WEAVE, *n.* : vehîna sebetî : rêbaza tevinkirina perûkî wek sebetî.

BASOPHIL(E), *n.* : tiftxwaz.

BASOPHILIC, *adj.* : tiftxwazî.

Basque, *n., adj.* : Bask : ziman yan welatiyê Bask (li Îspanya).

BASS, *n., adj.* : dengê zîl, dengê kûr.

- **DRUM** : dahola mezin.
- **HORN** : texlîtek borîzan e.
- **RELIEF**, *n.* : neqşê kêm derketî.

BASSET, *n.* : seyek leş dirêj û dest û pê kurt, berz : rexê derketiyê çînek erdî.

BASSET, *vi.* : li ser rûyî berz bûn.

BASSINET, *n.* : landika sebetî : textê wek sebetî bo zarokan.

BASSO, *n.* : dengê qebe.

BASSOON, *n.* : borîzan.

BASSWOOD, *n.* : darê zîzefon.

BAST, *n.* : qal, kewl, qaşik, toşil, tovil, tîvil, qaşil, qaşol.

BASTARD, *n., adj.* : bîjî, teres, selof, pîç, pûç, zol.

BASTARD FILE, *n.* : kardikê bîjî : kardikê nîv zivir.

BASTARDIZATION, *n.* : bîjîkirin.

BASTARDIZE, *vt.* : bê rûmet kirin, bîjî kirin.

BASTARDIZED, *adj.* : bîjîkirî.

BASTARDIZING, *n.* : bîjîkirin.

BASTARDLY, *adj.* : bîjî.

BASTARDY, *n.* : bîjîtî, pîçî.

BASTE, *vt.* : celde dan, lê xurîn, tajan kirin, ter kirin, sist kirin.

BASTED, *adj.* : celdekirî.

BASTILLE, *n.* : zîndan, kelhe.

BASTILLE DAY, *n.* : roja Bastîlê : roja ketina zîndana Bastîl (14 tîrmeh 1789) li Fransa.

BASTINADO, *n.* : celde, lêdan (bi darî), dar (baston).

BASTINADO, *vt.* : lê dan, bi darî, nexasme li ser pêyî.

BASTING, *n.* : lêdana dijwar (bi darî), dirîn, terkirin.

BASTION, *n.* : birc, kelhe.

BAT, *n.* : parçemk, çekçekîle, şevşevok, pîrçemek.

BAT, *n.* : şîmik, tutik, şûnik, topiz, gurz, doq, lêdan, mirkut.

BAT, *n.* : gav.

BAT (AT A RARE BAT) : zû, lezîn.

BAT, *vt.i.* : lê dan, neqandin.

- **NOT ~ AN EYELID** : çavên xwe ne neqandin, ne guhişîn.

BATCH, *vi.* : guhaztin (bi tibaban).

BATCH, *n.* : tibab, nan, tibabek berhemî.

BATE, *vt.i.* : çengan (dijwar) hejandin, kêm kirin, nizim kirin (dengî), bêhn çik kirin.

BATE = bait, *n.*

BATEAU, *n.* : keştiyek biçûk.

BATFOWL, *vi.* : şev nêçîr kirin (balindeyan).

BATH, *n.* : serşo(k), germav.

- **BRICK** : kelpuça batê (bo vemiştina metalî).

- **CHAIR** : kursika nesaxan (çerxdar e).

BATH(O)-, *pref.* : pêşgir e ko kûr e.

BATHE, *vt.i.* : şûştin .

BATHE, *n.* : şûştin (ser).

BATHED, *adj.* : şûştî (ser).

BATHETIC, *adj.* : pûç, hestiyarê dijmezin.

BATHETICALLY, *adv.* : bi hestiyarî, bi pûçî, dijmezin.

BATHHOUSE, *n.* : serşoka gişti.

BATHINETTE, *n.* : noqîgeha geroka biçûkan.

BATHING, *n.* : (ser) şûştin.

- **CAP** : kolavê bo ketina avê.

- **ROOM** : serşok.

- **SUIT** : cilên bo ketina avê yan ajnê.

BATHOLITH, *n.* : baristeyek mezin ji kevrê agirîn.

BATHOMETER, *n.* : kûrpîva avê.

BATHOS, *n.* : rêbaza pûç, ketin.

BATHROBE, *n.* : sertil, birnis.

BATH ROOM, *n.* : serşo(k), germav, destav.

BATH TOWEL, *n.* : bermalk.

BATH TUB, *n.* : serşokdank, banyo.

BATHY-, *pref.* : pêşgir e ko kûr e, kûriya derya ye.

BATHYAL, *adj.* : deep sea.

BATHYMETRIC(AL), *adj.* : kûrpîvanî.

BATHYMETRY, *n.* : kûrîpîvî.

BATHYSCAPHE, *n.* : noqarê kûrahiyan.

BATHYSPHERE, *n.* : goga kûrahiyan.

BATIK, *n., adj.* : rengîn, texlîtek rêbaza çapkirin yan rengkirina perûkî.

BATING, *prep.* : têne, netê.

BATMAN, *n.* : serbazê xizmetkarê efserî.

BATON, *n.* : topiz, gopal, dar.

BATRACHIAN, *n., adj.* : beqî, bejavî.

BATSMAN, *n.* : goglêdayek.

BATTALION, *n.* : tabor, hezar serbaz, betalyon.

- **COMMANDER** : serhezar, fermandarê betalyonî.

BATTED, *adj.* : lêdayî, neqandî.

BATTEN, *vi.t., n.* : depê darî bo bermalê, qelew bûn, qelew kirin, raxistin (bi depan).

BATTER, *vt.i.* : şikandin, lê dan.

BATTER, *n.* : lêdan.

BATTERED, *adj.* : rizok.

BATTER RAM, *n.* : kutek : alava şeriya kevna kutana şûrheyan (wek karîteyî).

BATTERY, *n.* : xanko, topxane, kogeh.

BATTING, *n.* : lêdana tepkê, neqandin.

BATTLE, *n.* : lec, bezm, şer, ceng, rezm, cerenîx, neberd, cengawerî.

- **ARRAY** : rêzkirina şerî.

- **FIELD** : qad, meydana şerî.

- **GROUND** : qad, şergeh.

- **AX(E)**, *n.* : bivrê şerî, jîna gelşok.

- **CRUISER** : keştiya şeqînka lezîna şerî.

BATTLED, *adj.* : şerkirî.

BATTLEMENT, *n.* : baro, berbankê kunikî (bo şerî).

BATTLE PLANE, *n.* : balafira şerî.

BATTLE ROYAL, *n.* : şerê hemûkî, kêşeya dijwar.

BATTLESHIP, *n.* : keştiya cengî, keştiya zirehdar, berhevdana germ.

BATTLEWAGON, *n.* : jîna destdirêjkar.

BATTLING, *n.* : vegevzîn.

BATTUE, *n.* : derkirina nêçîrê ji kunê. kuştina gîştî.

BATTY, *adj.* : dînoke, çekçekîleyî.

BATWING, *adj.* : çeng çekçekîleyî.

BAUBLE, *n.* : leyîztoka zarokan, xişil.

BAUDRONS, *n.* : kitik, pisîng.

BAUXITE, *n.* : boksît : kevirê aluminyomî.

BAWD, *n.* : xudan(a) karxaneyê, hîz, şelf, felîte, qehpe, selîte.

BAWDILY, *adv.* : bi hîzî, hîzekî.

BAWDINESS, *n.* : hîzîtî.

BAWDRY, *n.* : hîzî, xirabkarî, felîteyî.

BAWDY, *adj.* : xirabkar.

- **HOUSE** : karxane, qehpexane.

BAWL, *vi.t.* : gazî kirin, qîj kirin.

BAWL, *n.* : gazî, qîj.

BAWLING, *n.* : şirîxe.

BAWN, *n.* : meydana kelheyê.

BAY, *n.* : teraş, giya, belg (li ser serî nîşana serketinê).

BAY, *adj., n.* : com, kendaw, valatiya sirta çiyayan.

- **HORSE** : hespê kihêl.

BAY, *n., vi.t.* : rewîna seyê mezin, şeqandin, rewîn.

BAY, *adj.* : (hesp) sorqehweyî.

BAYADER, *n. : keçka dawetiya Hindokî.*

BAYARD, *n.* : comerd.

BAYBERRY, *n.* : tûmomik : helezek bakura Emerîka.

BAYONET, *n.* : singo, vizik, zerge, nize.

BAYONET, *vt.* : singo lêdan.

BAYONETED, *adj.* : singokirî (lêdan).

BAYONETING, *n.* : singokirin.

BAYOU, *n.* : rûbark.

BAY-SALT, *n.* : xwê (dêndik pistî helmijînê).

BAY-WINDOW, *n.* : pencerka derhatî.

BAZAAR, *n.* : bazar, dikan, firoşgeh, qeyserî.

BAZOOKA, *n.* : bazoka : çekê sivikê ser milî, moşekhavêj (dijî tankan).

B BATTERY, *n.* : koge.

BCG VACCINE, *n.* : kutana dijî êşa zirav.

B.C. : berî zayîna Îsa pêximberî.

BE : bûn, bit, be... heye.

BE-, *pref.* : pêşgir e ko ji hemî rexan e, hemûkî ye, çêkirin.

BE CAST OFF : qimtî.

BE SHED OFF : qimtî.

BEACH, *n.* : berav.

- **COMBER** : bapîvê beravî.

- **HEAD** : serê pira beravî, berpê.

BEACHY, *adj.* : xîzî.

BEACON, *n.* : ronahiya bilind, fener.

BEAD, *n.* : tizbî, tebel, mo(h)rik.

- **HOUSE** : mala sipasdariyê (hejar) û mezinkirina Xudayî.

- **TO DRAW A ~ ON OR UPON** : stêrkê lê girtin.

- **TO SAY, TELL OR COUNT ONE'S ~** : nivêj kirin bi harîkirina tizbiyan.

BEAD, *vt.i.* : tizbî (mohrik) bi kar hînan.

BEADING, *n.* : mohrikî, xemla mohrikî, (bi mohrikan xemilandî).

BEADLE, *n.* : şemasê dêrê.

BEADLEDOM, *n.* : desthelatdariya xirpoyî.

BEADROLL, *n.* : tizbî.

BEADSMAN, *n.* : nivêjker, qanûnger, hejar (li mala hejaran).

BEADY, *adj.* : biçûk û geş.

BEAGLE, *n.* : tajî.

BEAK, *n.* : nikil, dimik, denok.

BEAKED, *n., adj.* : nikilkirî.

BEAKER, *n.* : mesîn, kemole.

BEAM, *n.* : beşt, tîşk, bişkurîn, qurmê şaxê pezkûvî, paniya mezintira gemiyê, nîşana bêtêlî.

- **OF ~** : bahû.

- **OFF THE ~** : çewt, nerast.

- **ON HER ~ END** : li ser rexî, li ber wergeranê.

- **ON THE ~** : rast, li berê diyarkirî.

- **ON THE PORT ~** : li ser rexê rastê (keştî yan gemî).

BEAM, *vt.i.* : tîrêj dan, geş bûn.

BEAMING, *n.* : geşkirin.

BEAMISH, *adj.* : geş.

BEAMY, *adj.* : geş, geşbîn.

BEAN, *n.* : fasolî, lobî, lib, dêndik.

- **FULL OF ~S** : çalak halxweş.

- **I HAVE NOT A ~** : min filsek nîne.

- **TO GIVE SOMEBODY ~S** : siza kirin.

- **WILD ~** : şolik.

BEANBAG, *n.* : kîskê fasoliyan (perûkê teji fasolî bo leyiztina zarokan).

BEANFEAST, *n.* : vexwandina salane ya karvanî bo karkeran.

BEANIE, *n.* : şefqeyê biçûkê bêçim.

BEAN POLE, *n.* : kesek, karîteyê hilpirjîna helezî.

BEAR, *n.* : hirç, wirç.

- **MALE ~** : nêrehirç.

BEAR, *vt.i.* : helgirtin, zayîn.

- **TO ~ A HAND** : harî kirin.
- **TO ~ AWAY THE PRIZE** : xelatî bûn.
- **TO ~ DOWN** : şikandin, revandin, ser keftin.
- **TO ~ IN MIND** : bîr kirin.
- **TO ~ HEAVILY ON** : xwe bêqam li ser girtin.
- **TO ~ HARD ON THE POOR** : barê hejaran giran kirin.
- **TO ~ SOMEBODY OUT** : li gel bêvanî pêk hatin.
- **TO ~ OUT WHAT SOMEBODY SAYS** : pişta tiştê bêvan dibêjit girtin.
- **TO ~ RESEMBLANCE TO** : wek mirovekê ye.
- **TO ~ UP TO** : nêzîkî mirovekê bûn.
- **TO ~ UPON THE TASK** : qenc bizav kirin da ko erkî bi cih bînit.
- **TO ~ WITH SOMEBODY** : bêhna xwe fireh kirin (di danûstandinê de).

BEARABLE, *adj.* : berdan, helgirtinbar.

BEARABLY, *adv.* : bi helgirtinbarî.

BEAR BERRY, *n.* : tiriyê hirçê.

BEARD, *n.* : rih, rîş, ridên.

BEARDED, *adj.* : rihkirî.

BEARDEDNESS, *n.* : rihkirîtî.

BEARDLESS, *adj.* : bêrih, kose.

BEARER, *n.* : helgir.

- **BONDS** : kaxezên darayî (bo helgirî).

BEAR GARDEN, *n.* : baxçeyê hirçan (bo rahînana hirçan).

BEAR GRASS, *n.* : hirçgiya (giyayê hirçê).

BEARING, *n.* : helgirtin, barbirin, barrakirin, birdebarî.

BEARING, *n.* : sinc, rêbaz.

BEARING, *n.* : hatinber.

BEARISH, *adj.* : wek hirçê.

BEAR LEADER, *n.* : seyda yan hogirê xurtek xaneda.

BEAR'S EAR, *n.* : gulbihara goçkî.

BEAR'S FOOT, *n.* = **HELLEBORE.**

BEARSKIN, *n.* : kevlê hirçê.

BEAST, *n.* : dehbe, wilax, canewer, dewar, giyanewer, canewar.

- **OF PREY** : rawir.

BEASTLINESS, *n.* : dehbeyîtî, kirêtî, xwarin yan vexwarina nexweş.

BEASTLY, *adj., adv.* : dehbeyî, bi kirêtî.

BEAT, *vt.i* : lêdan, repandin, kulitîn, zalbûn, serkeftin (ji neyarî dibit).

- **TO ~ ABOUT THE BUSH** : ber û pêç, zîzikandin.
- **TO ~ SOMEBODY DOWN** : bihayê kesekê kêm kirin.
- **TO ~ IT** : wêve çûn.
- **TO ~ THE RECORD** : renûsa pîvan şikandin.
- **TO ~ A RETREAT** : paşve çûn.
- **TO ~ TIME** : dem pîvan.

BEAT, *n.* : nobe, qutan, lêdana daholê, dakutandin, pil, pirt, pirte, nukuç.

BEATEN, *adj.* : lêdayî, zorbirî, şikandî.

BEATER, *n.* : lêdanka hêkan, kişkerê nêçîrê.

BEATIFIC, *adj.* : pîroz, ciwandar.

BEATIFICATION, *n.* : bextiyar kirin.

BEATIFY, *vt.* : nemir kirin, bextiyar kirin.

BEATING, *n.* : repandin, sû, dilhilavêtin, lêxistin, pil, pirt(e), mukuç, lêdan.

BEATING STICK, *n.* : topiz, doqik.

BEATITUDE, *n.* : bextiyarîtî, nemirîtî.

BEATNIK, *n.* : hebûnîxwazê cil û rewiştê.

BEAU, *n.* : mêbaz, evîndar, dildar, ciwanpûşkar.

BEAUTEOUS, *adj.* = **BEAUTIFUL.**

BEAUTICIAN, *n.* : ciwankar.

BEAUTIFICATION, *n.* : ciwankirin.

BEAUTIFIED, *adj.* : ciwankirî.

BEAUTIFIER, *n.* : ciwanker.

BEAUTIFUL, *adj.* : spehî, rind, ciwan, taze, nazenîn, cindî, nîgardar, dîdar, şeng, şên, bedew, çeleng.

- **GIRL** : zerî.

- **LADY** : nîgar, zerî, sûs, sîsik, şên, xiring.

- **NECK** : gerden zer.

BEAUTIFULLY, *adv.* : bi ciwani, ciwankî.

BEAUTIFULNESS, *n.* : ciwanitî.

BEAUTIFY, *vt.i.* : ciwan kirin, spehî kirin.

BEAUTIFYING, *n.* : ciwankirin.

BEAUTY, *n.* : ciwanî, dîdarî, delalî, tazeyî, spehîtî, şengî, qeşeng, çelengî, rindî(tî), bedewatî, şepal, pergal, bedawî, bedewayî.

- **PARLOUR** : ciwangeh, xemilgeh.

- **SPOT** : şamik, şanik, xalik, şehnik, xal.

BEAVER, *n.* : delek, miha avê, meyka avê, sivore (bejavî).

BEBOP, *n.* : texlîtek mûzîqeya cazê.

BECALM, *vt.* : hedar kirin, mit kirin.

BECAME, *p.* OF **BECOME** : bûn, çêbûn.

BECAUSE, *conj.* : çûnko, lew(ma), ji ber, çimkî, çûnke, lewra.

- **OF** : da, dako, ji ber.

BECCAFICO, *n.* : çûçika hêjîrê : balindeyek ewropî strankar.

BECHAMEL, *n.* : afik yan êxiniya spî.

BECHANCE, *vt.i.* = **BEFALL.**

BECHE-DE-MER : aroyê deryayî (texlîtek canewer e).

BECHARM, *vt.* : dilgir kirin.

BECK, *n.* : celal, nîşan (serhejîn).

BECK, *vt.* : nîşan kirin.

BECKET, *n.* : girtek.

BECKON, *vt.i.* : gazî kirin.

BECKON, *n.* : nîşan (bo hatinê).

BECKON, *vt.* : gazî kirin.

BECKONED, *adj.* : gazîkirî.

BECKONING, *n.* : gazîkirin.

BECLOUD, *vt.* : ewr kirin, tarî kirin.

BECOME, *vt.i.* : çêbûn, bûn.

- **HOT** : germixîn.

BECOMING, *adj.* : jêhatî, taze, bûyîn, hêja, kêrhatî.

- **SICK AND TIRED** : kerixîn.

BECOMINGLY, *adj.* : bi tazeyî, tazekî.

BECQUEREL RAYS, *n.* : tîrêja bîkeril.

BED, *n.* : text, nivîn, cih, xewgeh, cergeh.

- **BUG** : textebît.

- **COVER** : raxistok, sernivîn.

- **SHEET**, *n.* : çerçev.

- **SPREAD** : çerçev, raxistek, nixava nivînan.

- **A DOUBLE ~** : textê dumirovan.

- **A SINGLE ~** : textê mirovekê (yekmirovî).

- **AS YOU MAKE YOUR ~ SO YOU MUST LIE ON IT** : pê divêt tu encamên karê xwe qebûl bikî (ko tu nivînên xwe çêdikî, pê divêt jî tu li ser binvî).

- AND BOARD : xwarin û nivistin.

- TO GET OUT OF ~ ON THE WRONG SIDE : hemî rojê bê tayar û enirî man.

- TO TAKE (KEEP) TO ONE'S ~ : nesax bûn ; di nav nivînan de man ji ber nesaxiyê.

BED, *vt.i.* : nivandin, bi text kirin.

BEDABBLE, *vt.* : leke kirin, pîs kirin.

BEDAUB, *vt.* : leke kirin, pîs kirin (bi boyeyê).

BEDAUBED, *adj.* : lekekirî.

BEDAZZLE, *vt.* : rakêşan, kore kirin (bi ronahiyê).

BEDBUG, *n.* : kirniya nivînan.

BEDCHAMBER, *n.* : jora nivistinê.

BEDCLOTHES, *n.* : çerçev, cacim.

BEDDED, *adj.* : textkirî.

BEDDER, *n.* : jor, text çêker.

BEDDING, *n.* : kêrhatî bo çandinê (li ber bayî).

BEDDING, *n., adj.* : nivîn, doşek, bitextkirin.

BEDECK, *vt.* : xemilandin.

BEDEVIL, *vt.* : rakêşan, xurîn, xirab kirin, şaş kirin, dilber kirin, cadû kirin.

BEDEVILMENT, *n.* : şeytangirtin.

BEDEW, *vt.* : xunav kirin, ter kirin, şil kirin.

BEDFAST, *adj.* : nesax, ketî nav nivînan de.

BEDFELLOW, *n.* : heval, hogir.

BEDFORD CORD, *n.* : tevnê Bêdfordê : tevnê benkê dirêj.

BEDIM, *vt.* : tarî kirin.

BEDIZE, *vt.* : kirêt nixaftin yan xemilandin.

BEDLAM, *n.* : dîn, harxane, nexwêşxaneya dînan.

BEDLAMITE, *n.* : har, dîn.

BEDLINEN, *n.* : rûyê balîfkê (balgehê), doşekê, ~ perûkên nivînan.

BED MOLDING, *n.* : xişil yan xemla li bin derhatiyek tîj.

BEDOUIN, *n., adj.* : koçerê Ereb.

BEDOUINISM, *n.* : koçerîti.

BEDPAN, *n.* : sincika nivînan, germkera nivînan.

BEDPLATE, *n.* : depê binyat, depê binikî.

BEDPOST, *n.* : pêpkê textî.

BEDRABBLED, *adj.* : axkirî.

BEDRAGGLE, *vt.* : teqîn kirin, şil kirin, pîs kirin.

BEDRIDDEN, *adj.* : nesax.

BEDROCK, *n.* : kevirê bin axê, çîna jêrî, xalik, binyata qayim, naxê tiştî, binê rastiyê.

BEDROLL, *n.* : nivînên pêç.

BEDROOM, *n.* : jora razanê yan nivistinê.

BEDSIDE, *n.* : rexê textî nexasme textê nesaxî.

BEDSORE, *n.* : kulka nivînan, qunêra piştê ji ber nivistina dirêja nesaxî.

BEDSPRING, *n.* : zenbeleka textî (doşekê).

BEDSTEAD, *n.* : text, çarpa, çarpê, çarling.

BEDSTRAW, *n.* : qirşikê nivînan.

BED TIME, *n.* : demê nivistinê.

BEDWARD(S), *adv.* : bo nivînan (nivistinê).

BED WETTING, *n.* : nivîn şilkirin (bi şev).

BEE, *n.* : mêş hingivîn.

- EATER : şarod.

- HIVE : kewar, şanik, kore, pêtak.

- KEEPER : xudankarê mêşhingivînî.

- QUEEN : sermak, şulhemak.

- SWARM : şulhe, şilx, şilh.

BEEB READ, *n.* : nanê mêşhingivînî (xwarina vê mêşê).

BEECH, *n.* : spîndar.

- **TREE** : narewen.

BEEF, *n.* : goştê gayî yan çêlê.

- **EATER** : gagoştxwer.

- **STEAK** : parçeya goştê çêlê.

- **TEA** : avgoşta çêlê.

- **WITTED** : xirpo.

BEAFY, *adj.* : qelew, xurt.

BEELINE, *n.* : hêla yekser.

BELZEBUB, *n.* : şeytan, serek şeytan.

BEER, *n.* : bîre, ava cehî, cehav.

- **AND SKITTLES** : bîre û keyfxweşî.

- **HOUSE** : bîrexane.

BEERY, *adj.* : bîreyî.

BEESTINGS, *n.* : firo.

BEESWAX, *n.* : mona mêşhingivînî.

BEET, *n.* : şilinder.

- **RED ~** : beqlê sor.

BEETLE, *n.* : kêz, beltîk, mêkut, mîkut.

- **BROWED** : biroboş.

- **HEAD(ED)** : xirpo, gewc.

BEE TREE, *n.* : darê mêşhingivînî.

BEFALL, *vt.i.* : keftin, ser hatin.

BEFALLING, *n.* : serhatin.

BEFIT, *vt.* : kêr hatin.

BEFITTING, *adj.* : kêrhatî.

BEFOG, *vt.* : şaş kirin.

BEFOOL, *vt.* xapandin.

BEFORE, *adv., conj., prep.* : berê, berî, berahî, ber, li ber, rûber, pêş, pêşde, di ber.

- **YESTERDAY " DAY "** : pêr.

BEFOREHAND, *adj., adv.* : berî.

BEFORE TIME, *adv.* : berê.

BEFOUL, *vt.* : pîs kirin.

BEFOULED, *adj.* : pîs, mirdar, pîskirî.

BEFRIEND, *vt.* : ~dostayî kirin, harî kirin, pişt girtin, piştgirî kirin.

BEFUDDLE, *vt.* : şepirze kirin, dîn kirin (bi vexwarinê, meyê).

BEG, *vt.* : hîvî kirin, parsêkî kirin, xwastin, lave kirin, tika kirin.

BEGAN, *p.* **OF BEGIN** : destpêkir.

BEGET, *vt.* : zêrtin.

BEGGAR, *n.* : gede, geda parsêk, xwazok, xazxazok.

BEGGARLY, *adv.* : hejar.

BEGGARY, *adj.* : parsêkî.

BEGGED, *adj.* : parsêkîkirî.

BEGGING, *n.* : paris, parsêkî, geşt, lavelav, xwastin, hîvîkirin, deroze, lavekirin, tikakirin.

BEGIN, *vt.i.* : dest pê kirin.

- **TO ~ THE WORLD** : dest bi karê jiyanê kirin.

- **TO ~ WITH** : yekem....

BEGINNER, *n.* : destpêker.

BEGINNING, *n.* : despêk, destpêk, destpêkirin, kobarî, sereta.

- **TO END** : ser ta ser.

BEGONE, *vi.* : here !.

BEGONIA, *n.* : giyayek devera yeksanekerî.

BEGRIM, *vt.* : tenî kirin, gemar kirin.

BEGRIMED, *adj.* : tenîkerî, gemarkirî.

BEGRIMING, *n.* : tenîkirin, gemarkirin.

BEGRUDGE, *vt.* : dexisîn, pê ne xweş bûn, bêzarî kirin.

BEGRUDGINGLY, *adv.* : bi bêzarî, bêzarkî.

BEGUILE, *vt.* : xirandin, xapandin, şelandin (bi fêlbazî).

BEGUILED, *adj.* : xapandî, xirandî.

BEGUILEMENT, *n.* : labandin, dilxapî.

BEGUILER, *n.* : fêlbaz.

BEGUILING, *n.* : xapandin.

BEGUINE, *n.* : govendek gelêriya başûra Emerîka (wek romba), mûzîqeya vê govendê.

BEGUN, *n.* : xanim : jinbeg.

BEHALF, *n.* : xatir.

- **IN ~ OFF** : bo (berjewendiya...).
- **IN THIS ~** : ji vî rexî ve.
- **ON ~ OF** : bo, bi navê.
- **ON MY ~** : bo min, ji layê min ve, ji alê min ve.

BEHAVE, *vt.i.* : reftar kirin, rewişt kirin.

- **YOURSELF** ! çi kirêtiya neke!.

BEHAVED, ADJ. : rewiştkirî.

BEHAVER, *n.* : rewiştkar.

BEHAVING, *n.* : rewiştkirin.

BEHAVIOUR, *n.* : rêbaz, sinc, rewiştî, rewişt, rêç, reftar.

BEHAVIOURAL, *adj.* : sincî, reftarî.

BEHAVIOURALLY, *adv.* : bi rewiştî, bi sincî.

BEHAVIOURISM, *n.* : sincîtî, rewiştîtî.

BEHAVIOURIST, *n.* : sincîzan.

BEHEAD, *vt.* : serî birrîn, ser jê kirin, pût kirin.

BEHEADING, *n.* : pûtkirin, serjêkirin.

BEHEMOTH, *n.* : hespê deryayî, mirov yan canewerê ejdehayê xurt.

BEHEST, *n.* : ferman.

BEHIND, *adv., prep., n.* : piştî, paş, pey.

- **TIME** : paşketî.
- **THE TIMES** : kevin, kevneperist.
- **THE SCENES** : nihênî, bi dizîkî ve.

BEHINDHAND, *adj., adv.* : deyndar, paşketî, dereng.

BEHOLD, *vt. interj.* : dîtin.

BEHOLDEN, *adj.* : deyndariya qenciyê.

BEHOLDER, *n.* : deyndarê qenciyê.

BEHOOF, *n.* : havil.

BEHOOVE, *vt.i.* : pê divêtin (viyan).

BEHOOVED, *adj.* : pêviyayî.

BEHOOVING, *n.* : pêviyan.

BEIGE, *n., adj.* : gewr.

BEING, *n.* : heyîn, xu, bûn, heyî, bûne-we(r).

- **IN ~** : heye.
- **ON FIRE** : şewitîn.

BEJEWEL, VT. : çek kirin (gewher).

BEL, *n.* : bêl : yekeya rêkarê şiyanê (temet 10 dîsîbel).

BELABOUR, *vt.* : xebitîn, lê dan, êrîş kirin, tirane pê kirin.

BELATED, *adj.* : dereng.

BELATEDLY, *adv.* : bi derengî.

BELATEDNESS, *adv.* : derengîtî.

BELAUD, *vt.* : pesind kirin.

BELAY, *n.* : kevir bo (lê) girêdana werîsî bo bi serketina çiyayî.

BELAY, *vt.i.* : bese! raweste! werîs li singî girê dan (bo serketinê), girê dan, çespan kirin.

BELAYING PIN, *n.* : singê girêdanê.

BELCH, *vi.t.* : qirqêne, tirt, teqîn.

BELDAM(E), *n.* : pîrejina kirêt.

BELEAGUER, *vt.* : dor girtin, tengav kirin, abloqe kirin, rex û rû girtin.

BELEAGUERED, *adj.* : tengav kirî.

BELEAGUERING, *n.* : tengavkirin.

BELFRY, *n.* : birca zengilê.

BELGIAN, *adj.* : Belçîk.

BELIAL, *n.* : şeytan.

BELIE, *vt.* : hizrek çewt kirin, direw hînan der.

BELIEF, *n.* : bawer(î), ol, bawer kirin, bawermendî, dîn, ayîn, birwa, bawir, bawergeh, mitmane.

BELIEVABLE, *adj.* : bawerbar.

BELIEVE, *vt.i.* : bawer kirin.

BELIEVED, *adj.* : bawerkirî.

BELIEVER, *n.* : bawerker, bawerkar, bawerdar, bawermend, oldar.

BELIEVING, *n.* : bawerkar, oldar, bawerkirin.

BELIKE, *adv.* : belko.

BELLITLE, *vt.* : kêm kirin.

BELITTLED, *adj.* : kêmkirî.

BELLITLEMENT, *n.* : kêmkirin.

BELLITLER, *n.* : kêmker.

BELLITLING, *n.* : kêmkirin.

BE-LIVE, *adv.* : di demî de.

BELL, *vt.i.* : zengil lêdan.

- **TO ~ THE CAT** : karek giring kirin.

BELL, *n.* : zengil, cimxar, zeng, zîl.

- **RINGING** : zingîn.

BELLADONNA, *n.* : giyayê xanimê.

BELLBIRD, *n.* : zengile balinde (balindeyê zengilî).

BELLBOY, *n.* : xizmetkar.

BELLE, *n.* : jina taze, motirfe.

BELLES LETTRES, *n.* : tor, wêje, tora bijîn.

BELLETRIST, *n.* : torevanê bijîn.

BELLETRISTIC(AL), *adj.* : pêwendîdarê torevanê bijîn.

BELLFLOWER, *n.* : zengilok (texlîtek gul).

BELLFOUNDER, *n.* : zengilrêj.

BELLFOUNDARY, *n.* : zengilrêjgeh.

BELLICOSE, *adj.* : dijminkar, şerok, dest-direj.

BELLIED, *adj.* : zikmezin, pejbûyî, tijî-bûyî.

BELLIGERENCE, *n.* : dijminî.

BELLIGERENCY, *n.* : dijminkarî.

BELLIGERENT, *adj., n.* : dijmin, sert, dirr, şerker, şerok.

BELLIGERENTLY, *adv.* : bi dijminî, dijminkî.

BELL JAR, *n.* : zengila şûşe.

BELLMAN, *n.* : zengilvan, gazîker.

BELL-MOUTHED, *adj.* : devzengil.

BELLONA, *n.* : Xwedayê şerî li nik Romanan.

BELLOW, *vt.i.* : bor bor kirin, ûrîn.

BELLOW, *n.* : borbor, ûrûr.

BELLOWING, *n.* : ûrîn.

BELLOWS, *n.* : heban, pufker.

BELLOWS FISH, *n.* : masiyek deryayî pozdirêj, leşpane.

BELLPULL, *n.* : destikê zengilê.

BELLPUSH, *n.* : bişkoka zengilê.

BELLWETHER, *n.* : beran.

BELLWORT, *n.* : gula zengilok, giyayek gulzer wek zengilê.

BELLY, *n.* : zik.

- **ACHE** : zik êş.

- **BAND, N.** : teng, kejî.

BELLY-BOUND, *adj.* : zikgîrî.

- **BUTTON** : nafik, navik.

BELLYFUL, *n.* : ziktijî.

BELLY-GOD, *n.* : zikkûr, zikperês, xwer, zikmezin.

BELLYING, *n.* : tijîbûn, pejbûn.

BELLY-LAND, *vi.* : li ser zikî yan neçarî danan (balafir).

BELONG, *vi.* : xudan bûn, peyrew bûn, endam bûn.

BELONGING, *n.* : xudanî, hatinerêz.

BELONGINGS, *n.* : cilik, tişt.

BELOVED, *adj.* : şadîk, xoşevî, berdil, berdilk, nazenîn, oflaz, delal, hezkirî, dilniwaz, viyayî, dildayî.

BELOW, *adv., prep.* : li bin, xwarê, jêr.

BELT, *n.* : şîtik, piştên, kemerbend, kemer, piştan, navkêl.

- **BELOW THE ~** : teşqele, çewt (li jêr kemerê : kulmbazî).

- **LEATHER ~** : qayîş.

- **TO TIGHTEN ONE'S ~** : destê xwe girtin şîtkê, teng kirin (tengavî).

BELT, *vt.i.* : lê dan, celde kirin, xurt stirandin, kemer kirin.

BELTED, *adj.* : dahêlayî (ji kemerê).

BELT HIGHWAY, belt line, *n.* : rêya li dor bajêrî.

BELTING, *n.* : celdekirin, lêdan, qayîş.

BELTLESS, *adj.* : bêqayîş.

BELUGA, *n.* : dolfîn.

BELVEDERE, *n.* : avahî (li ber dîmenî).

BEMA, *n.* : pîrozgeh : parçeya dêrêya qorbangeh têde.

BEMDUL, *vt.* : dijwar lê dan.

BEMAZED, *adj.* : guhişî, şaş, şepirze.

BEMINE, *vt.* : teqîn kirin.

BEMOAN, *vt.i.* : nalîn, zêmar kirin.

BEMOCK, *vt.* : tirane pê kirin.

BEMUSE, *vt.* : şaş kirin, guhişandin.

BEMUSED, *adj.* : şaşkirî, guhişandî.

BEMUSEDLY, *adv.* : bi guhişînî, bi şaşî, bi şepirzeyî.

BEMUSEMENT, *n.* : şaşkirin, guhişandin.

BEN, *n.* : jora hindurî.

BENCH, *n.* : mêz, balişne, textik, seko.

- **MARK** : nîşana rûberî.

- **SHOW** : nîşangeha seyan.

- **WARRANT** : fermana dadgehî.

BEND, *n.* : berwar, çemîn, kevane.

BEND, *vt.i.* : çemîn, çemandin.

BENDER, *n.* : şeş pens (pare), şadiya qerqeşe.

BENDING, *n.* : çemandin, çivandin, daçemandin.

bending moment : zebra çemandinê.

BENEATH, *adv., prep.* : jêr, bin.

BENEDICT, *n.* : nûzava.

BENEDICTINE, *n., adj.* : rebenê Benediktî.

BENEDICTION, *n.* : pîroz kirin, pîrozbûn, pîrozî.

BENEDICTOR, *n.* : xêrker.

BENEDICTORY, *adj.* : pîrozkirî.

BENEFACTION, *n.* : pît, qencî, çakî.

BENEFACTOR, *n.* : qenc, çak, xudanxêr, xêrxwaz, xêrkar.

BENEFACTORESS, *n.* : xêrkar (jin).

BENEFIC, *adj.* = **BENEFICENT.**

BENEFICE, *n.* : jiyana dêrê, derebegî payedariyek dêrê dahatîdar. Dahatiya vê payedariyê.

BENEFICE, *vt.* : payedar yan dahatî kirin.

BENEFICENCE, *n.* = **BENEFACTION.**

BENEFICENT, *adj.* : qenc, xêrxwaz, xêrkar.

BENEFICENTLY, *adv.* : bi xêrxwazî, bi qencî.

BENEFICIAL, *adj.* : qencî, nojdar.

BENEFICIALLY, *adv.* : bi nojdarî.

BENEFICIARY, *n.* : havilker, mafedar.

BENEFICIATE, *vt.* : çak kirin (madeyê xav).

BENEFICIATED, *adj.* : çakirî.

BENEFICIATING, *n.* : çakirin.

BENEFICIATION, *n.* : çakirin.

BENEFIT, *n.* : havil, sûd, sû, qencî, liştˆ.

- **ASSOCIATION** : civata harîkirinê.

- **SOCIETY** : civata herîkirinê.

BENEFIT, *vt.i.* : havil kirin, sû kirin.

BENEFITED, *adj.* : havilkirî.

BENEFITER, *n.* : havilker, mifadar.

BENEFITING, *n.* : havil kirin, mifadarî.

BENEFIT OF CLERGY, *n.* : pêkhatina dêrê, parêziya oldarî.

BENEVOLENCE, *n.* : qencîxwazî, dilovanî.

BENEVOLENT, *adj.* : qenc, dilovan, mihirvan, xêrwaz, xêrdar.

BENEVOLENTLY, *adv.* : bi dilovanî.

BENEVOLENTLESS, *n.* : dilovanîtî.

BENGALI, *n., adj.* : welatî yan zimanê Bengalê.

BENIGHTED, *adj.* : nezan, şevdar, tarîkirî.

BENIGHTEDLY, *adv.* : bi tarîkirî.

BENIGHTEDNESS, *n.* : tarîkirîtî.

BENIGN, *adj.* : dilovan, mihirvan.

BENIGNANT, *adj.* : dilovan, mihirvan.

BENIGNITY, *n.* : dilovanîtî, mihirvanî.

BENIGNLY, *adv.* : bi dilovanî, dilovankî.

BENISON, *n.* = **BENEDICTION.**

BENJAMIN, *n.* : nixrî.

BENNET, *n.* : giyapîroz.

BENT, *n., adj.* : xwar, çemandî, çivandî, daçemandî, çemayî, xîs, xoyî.

- **GRASS** : giyamêrg (texlîtek helez e).

BENTHIC, *adj.* : jêr deryayî.

BENTHOS, *n.* : jêrderya.

BENUMB, *vt.* : tezandin, sir kirin.

BENZENE, *n.* : benzîn.

BENZENOID, *adj.* : benzînî.

BENZINE, *n.* : benzîn.

BENZOIC ACID, *n.* : tirşiya benzoyk, benîştê darê cava.

BENZOIN, *n.* : benzoyn, benîştê cava.

BEQUEATH, *vt.* : hêlan bo, raspartin.

BEQUEST, *n.* : rasipêrî, mîrat.

BERATE, *vi.* : têxurîn, kirêt kirin.

BERBER, *adj., n.* : Emezîq.

BERE, *n.* : ceh.

BEREAVE, *vt.* : (jê) standin, bê bab, dayik yan zarok kirin (mirin).

BEREAVED (OF), *adj.* : soj, dilşewat, dilsotî, jêstandî (bab, dayk, kur, keç : bi mirinê).

BEREAVEMENT, *n.* : dilsotin, jêstandin : (bi mirinê).

BEREAVING, *n.* : dilsotin.

BEREFT, *adj.* : dilsotî, jê standî, rûtkirî.

- **OF REASON** : dîn, bêhiş.

BERET, *n.* : kulav.

BERG, *n.* = **ICEBERG.**

BERGAMOT, *n.* : texlîtek lêmon e.

BERIBERI, *n.* : berîberî : nesaxiya kêmbûna vîtamîn (B) di nav xwarinê de (mirovî qels û lawaz dikit).

BERKELIUM, *n.* : berkelyum : hêman e.

BERLIN, *n.* : paytextê Almanyayê.

BERLIN, *n.* : texlîtek erebane ye, hiriya Berlînê.

BERM(E), *n.* : bor yan banikê teng.

BERETT, *n.* = **BIRETTA.**

BERRIED, *adj.* : tîkirî.

BERRY, *n., vi.* : lib, tî, tîkirin.

- **LIKE** : wek tiyê.

BERSEEM, *n.* : separe, sêper.

BERSERK, *adj., adv.* : har, bi harî.

BERT, *adj.* : xwehr, xahr.

BERTH, *n.* : bender, kar, lengergeh.

- **TO GIVE A WIDE ~ TO** : dor keftin, xwe vedan.

BERTH, *vt.* : (keştî) lenger danan, lenger kirin.

BERTHA, *n.* : yaxeya kirasê stûnizim.

BERTILLON SYSTEM, *n.* : rêzika Bertîlon (bo naskirina tawanbaran ji nîşanan).

BERYL, *n.* : bêril : berê hêja.

BERYLLIUM, *n.* : berilyom : hêman e.

BESEECH, *vt.i.* : xwastin.

BESEECHED, *adj.* : xwastî.

BESEECHING, *n.* : xwastin.

BESEECHINGLY, *adv.* : bi xwastinî.

BESEEM, *vt.i.* : kêr hatin.

BESET, *vt.* : şepirze kirin, xemil kirin, êrîş kirin, ser girtin.

BESET, *adj.* : şepirzekirî.

BESETTING, *adj.* : şepirzekirin.

BESHREW, *vt.* : nifrîn kirin.

BESIDE, *prep.* : nik, kin.

BESIDES, *prep., adv.* : ji bil, li ser re.

BESIEGE, *vt.* : abloqe kirin, dor girtin, gemaro kirin.

BESIEGED, *adj.* : pêwerhayî, abloqekirî, dapêçkirî.

BESIEGING, *n.* : gemarokirin, abloqekirin, lêwerhatin, dorgirtin.

BESLUBBER, *vt.* : pîs kirin.

BESMEAR, *vt.* : pîs kirin, gemar kirin.

BESMEARED, *adj.* : gemarkirî, pîskirî.

BESMIRCH, *vt.* : pîs kirin.

BESMIRCHED, *adj.* : pîskirî, gemarkirî.

BESMUT, *vt.* : tenî kirin.

BESOM, *vt.* : malîn (bi geziki).

BESOM, *n.* : gezik, malîk, şivink, malî.

BESOT, *vt.* : dîn kirin, bêhiş kirin, mest kirin, şeyda kirin.

BESOTTED, *adj.* : şeydakirî.

BESOTTING, *n.* : şeydakirin.

BESPANGLE, *vt.* : xemilandin (bi titikên teyîsok).

BESPATTER, *vt.* : lalîn, teqîn kirin.

BESPEAK, *vt.* : pêşniyaz kirin.

BESPOKE, *adj.* : rasipêrkirî, berdestkirî.

BESPREAD, *vt.* : belave kirin.

BESPRINKLE, *vt.* = **SPRINKLE.**

BESSEMER CONVERTER, *n.* : guhêrê Bêsimer : kûrheya berhemkirina polayî bi rêbaza Bêsimerî.

BEST, *adj., adv., n.* : baştir (în).

- **~ MAN** : şoşban, şoşman, birazava, şoşbîn.
- **~ SELLER** : kitêba têrfiroti.
- **- AT ~** : di barê baştir de.
- **- IN ONE'S SUNDAY ~** : baştir (în) cilik kirîne ber xwe.
- **- TO BE AT ONE'S ~** : di rewşa baştir de bûn.
- **- TO HAVE OR GET THE ~ OF IT** : bi ser keftin.
- **- TO MAKE THE ~ OF ONE'S TIME** : hindî bişêt bikit (hindî bişêt feydeyî ji demê xwe bikit).

BEST, *vt.* : bi ser keftin, şikandin (neyarî, hevrikî).

BESTIAL, *adj.* : hov, dehbeyê dirr.

BESTIALITY, *n.* : dirrinde, hovî, dehbeyatî.

BESTIALIZE, *vt.* : hov kirin, dirrinde kirin.

BESTIALLY, *adv.* : bi dirrindeyî.

BESTIARY, *n.* : kitêba li ser dehbeyan.

BESTIR, *vt.* : han dan, livandin.

BESTOW, *vt.* : bexşandin.

BESTOWAL, *n.* : bexşîn.

BESTRADDLE, *vt.* = **BESTRIDE.**

BESTREW, *vt.* : werandin.

BESTREWED OR BESTREWN, *adj.* : werandî.

BESTREWING, *n.* : werandin.

BESTRIDE, *vt.* : pêngav havêtin, siwar bûn (pêvekirî).

BESTRIDDEN, *adj.* : siwarbûyî.

BESTRIDING, *n.* : siwarbûn.

BET, *vt.i.* : merc kirin.

BETA, *n.* : beta : tîpa Girek " B ", duwemê zincîrê.

BETAKE, v.refl. : derbest kirin.

BETATRON, *n.* : lezkera elektronan.

BETEL, *n.* : texlîtek helezek hilpirjîn e.

- **NUTS** : tovê fofel.
- **PALM** : fofel : texlîtek darqesp e.

BETHEL, *n.* : dira pîroz.

BETHINK, *vt.* : hizir kirin, raman kirin, bîr kirin, biryar dan.

BETIDE, *vt.i.* : qewmîn, çêbûn, lê qewimîn.

BETIMES, *adv.* : zû.

BETOKEN, *vt.* : nîşan kirin.

BETON, *n.* : konkirît, beton.

BETRAY, *vt.* : xinizî kirin, bêbextî kirin.

BETRAYAL, *n.* : xinizî, bêbextî.

BETRAYER, *n.* : xiniz, bêbext.

BETROTH, *vt.* : mehir kirin.

BETROTHAL, *n.* : mehirkirin, nîşanbirin, xwazgînî.

BETTER, *adj.* : çêtir, baştir, çaktir.

- **OFF** : çêtir e, dewlemendtir e.
- **FOR ~ OR WORSE** : li başiyê û xirabiyê (tengaviyê), li xweşiyê û nexweşiyê.
- **FOR THE ~** : bo baştir.
- **HAD ~** : pê divêt, baştir e.
- **ONE'S ~** : half : jîna mirovî.
- **ONE'S ~** : jî mirovî baştir.
- **THE SOONER THE ~** : hindî zûtir baştir e.
- **TO GET THE ~ OF** : serkeftin, şikandin.
- **TO KNOW ~** : ko jîrtir bit (baştir bizanit).
- **TO THINK ~** : hizra xwe guhorandin.

BETTERMENT, *n., adv.* : başkirin.

BETTING, *n.* : girew.

BETTOR OR BETTER, *n.* : girewker.

BETULA, *n.* : betula : texlîtek teraş e.

BETULACEOUS, *adj.* : betulayî.

BETWEEN, *prep.* : navber, nav, li nav, nêwan.

- **FAR ~** : di navbera demên dor de.
- **IN ~** : navber, di nîvekê de.

BETWEEN BRAIN, *n.* = **DIENCEPHALON.**

BETWEEN THE LEGS, *n.* : navling.

BETWEEN TIMES, between whiles, *adv.* : car car.

BETWIXT, *prep., adv.* = **BETWEEN.**

BEVATRON, *n.* : alava lezkirina elektronî.

BEVEL, *n.* : lar.

- **GEAR** : gêra lar.

BEVEL(L)ED, *adj.* : larkirî.

BEVEL SQUARE, *n.* : alava larê : dartaş bi kar dihînit.

BEVERAGE, *n.* : vexwarin, xwardin.

BEVY, *n.* : pel, revde.

BEWAIL, *vt.i.* : girîn, zarzar kirin.

BEWAILING, *n., adj.* : zêmar kirin, zarî, zarîn.

BEWARE, *vi.t.* : hişyar bûn, wurya bûn.

BEWARE ! *interj.* : zînhar!.

BEWILDER, *vt.* : şepirze bûn, gêj bûn, şaş bûn.

BEWILDERED, *adj.* : şaş, mat, gêj, sergera, metelmayî.

BEWILDEREDLY, *adv.* : bi sergerayî.

BEWILDEREDNESS, *n.* : sergerayîtî.

BEWILDERING, *adj.* : şaş, gêj.

BEWILDERMENT, *n.* : şaşî, gêjî, helwela.

BEWITCH, *vt.* : dilgir kirin, rakêşan.

BEWITCHING, *adj.* : dilgir.

BEWITCHMENT, *n.* : dilgirkirin, dilgirbûn.

BEWRAY, *vt.* : diyar kirin.

BEY, *n.* : beg.

BEYOND, *prep., adv., n.* : paş, der.

- **COMPARE** : nayab, qetlaz.
- **ONE'S REACH** : destê mirovî nagehitê.
- **MEASURE** : bêqam.
- **ONESELF** = beside oneself.
- **(BESIDE) ONESELF** : enirî, harbûyî.
- **IT IS ~ ME** : ez neşêm têbigehim.
- **THE BACK OF ~** : dor qoncala dortira cîhanê.
- **TO LIVE ~ ONE'S MEANS (OR INCOME)** : li ser jêhatina xwe re jiyan (destberdayî).

BEZANT, N. : diravek zêr, Bîzentî. Xemlek avahî (wek sewka pan).

BEZEL, *n.* : rexê hilkolkî, kunka sefa gostîrkê, camgeha demjimêrê.

BEZIAQUE, *n.* : texlîtek yariya kaxezan e.

BEZOAR, *n.* : berkê di nav rûvîka caneweran de nemaze ewên kayî.

BEZOAR ANTELOPE, *n.* : pezkûviyê hindî.

BEZOAR GOAT, *n.* : bizina kûviya îranî.

BHANG OR BANG, *n.* : kindirê hindî.

BI-, *pref.* : pêşgir e ko cot e, duwane ye.

BIANGULAR, *adj.* : dugoşe.

BIANNUAL, *adj.* : salê du ca, nîvsalî.

BIANNUALLY, *adv.* : salê ducarî.

BIAS, *n., adj., adv.* : dubendî, lagirî, aligirî, layengirî, pêşbiryarî.

BIASED, *adj.* : lagir, aligir.

BI ATOMIC, *adj.* : dugerdîleyî.

BIAURICULAR, *adj.* : duguhkî.

BIAXIAL, *adj.* : dutewerî.

BIB, *n.* : singebend, berkoş.

BIB, *vt.i.* : vexwarin.

BIBACIOUS, *adj.* : vexwar, bengê meyê.

BIB AND TUCKER, *n.* : cil.

BIBBER, *n.* : vexwar.

BIBCOCK, *n.* : piloska devjêr.

BIBLOT, *n.* : hunerkariya biçûka qetlaz.

BIBLE, *n.* : Încîl.

BIBLICISM, *n.* : nivîsinîtî : raveya tîpiya Încîlê.

BIBLICIST, *n.* : bawermendê tîpiya Încîlê.

BIBLICAL, *adj.* : Încîlî.

BIBLIO-, *pref.* : pêşgir e ko kitêb e, pirtûk e.

BIBLIOGRAPHER, *n.* : dîrokvanê kitêban yan pirtûkan.

BIBLIOGRAPHIC(AL), *adj.* : dîrokvaniya kitêban yan pirtûkan.

BIBLIOGRAPHY, *n.* : dîroka kitêban yan pirtûkan.

BIBLIOLATOR, *n.* : kitêbperês, pirtûkperês (hindî hez ji kitêban kirin).

BIBLIOLATRY, *n.* : kitêbperistin (bêqam hez jêkirin).

BIBLIOMANCY, *n.* : bextzanîn (bi kitêban yan pirtûkan).

BIBLIOMANIA, *n.* : kitêbhezî, pirtûkhezî.

BIBLIOMANIC, *n.* : kitêbhez, pirtûkhez.

BIBLIOPEGY, *n.* : hunera kitêbbergkirinê.

BIBLIOPHILE, *n.* : kitêbxwaz, pirtûkxwaz.

BIBLIOPOLE OR BIBLIOPOLIST, *n.* : firoşyarê kitêbên qetlaz.

BIBLIOTECA, *n.* : pirtûksiyayî, pirtûkxane, kitêbxane.

BIBLIOTICS, *n.* : xwandina destnivîs, belgename û alavên nivîsînê.

BIBULOUS, *adj.* : vexwar.

BICAMERAL, *adj.* : dujorî (yan civatî) nemaze parleman : civata pîran û civatat nimînenderan.

BICAPSULAR, *adj.* : dukîskî.

BICARBONATE, *n.* : bîkarbonat.

BICE, *n.* : boyeya kesk yan şîn.

BICELL, *adj.* : duxane.

BICELLULAR, *adj.* : duxaneyî.

BICENTENARY, *adj., n.* = **BICENTENNIAL.**

BICENTENNIAL, *adj., n.* : dusedsalî.

BICENTRIC, *adj.* : dugogî, dunîvekî, dunîvekdarî.

BICEPHALIC, *adj.* : duserî.

BICEPS, *n.* : duserî, zebleka duserî.

BICHLORIDE, *n.* : bîklorîd : nexasme bîklorîdê cîweyî.

BICHROMATE, *n.* : bîkromat, nemaze bîkromatê sodyum û potasyum.

BICIPITAL, *adj.* : duserî.

BICKER, *vi.t.* : pit pit kirin.

BICOLOUR(ED), *adj.* : durengî.

BICONCAVE, *adj.* : durûçalî.

BICONVEX, *adj.* : dukoqizî.

BICORN, *adj.* : duşaxî.

BICOPORAL, *adj.* : duleşî.

BICUSPID, *adj.* : du serî tîj, didanê hêranê.

BICYCLE, *n.* : duçerx.

BICYLINDRICAL, *adj.* : dustûneyî.

BID, *n.* : ferman, zêde yan kêm kirin.

BID, *vt.* : zêde (zor) yan kêm kirin.

- **THE PLANE ~S FAIR TO SUCCEED** : diyar e melheze dê bi ser kevit.
- **TO ~ AGAINST** : bihayek bêtir dide.
- **TO ~ DEFIANCE TO** : qeb kirin.
- **TO ~ A PERSON GODBYE** : oxer kirin, şevbaşî yan rojbaşî kirin.

BIDDABLE, *adj.* : sernerm.

BIDDER, *n.* : zûker, lezker.

BIDDY, *n.* : bermalî, jin, mirîşk, çîçelok.

BIDE, *vt.i.* : xwe girtin, man.

BIDENTATE, *adj.* : dudidanî.

BIENNAL, *adj., n.* : her du salî.

BIER, *n.* : darbest, term.

BIFACIAL, *adj.* : durû, durûyî.

BIFARIOUS, *adj.* : durêza karîte.

BIFID, *adj.* : dukîzî.

BIFILIAR, *adj.* : du têl yan ta.

BIFLAGELLATE, *adj.* : dutajangî.

BIFLEX, *adj.* : du dir badayî.

BIFLORATE OR BIFLOROUS, *adj.* : du gul helgir.

BIFOCAL, *adj.* : dutîşko.

BIFOLD, *adv.* : ducarî.

BIFORKED, *adj.* : duçiqî.

BIFORM, *adj.* : du şikil, wêne yan şêwe.

BIFURCATE, *adj.* : duçiqî.

BIFURCATE, *vt.i.* : du çiq kirin, du çiq bûn.

BIGHORN, *n.* : çiyaberan.

BIGHT, *n.* : çepa beravê, qilîç, girêka werîsî.

BIGHT, *vt.* : qayim kirin (bi girêka werîsî).

BIG MONEY, *n.* : tibabek mezin ji diravî yan qazancî.

BIGMOUTHED, *adj.* : çenebaz.

BIGNESS, *n.* : mezinî, ejdehayî.

BIGNONIA, *n.* : helezek emerîkanî kepikî gulciwan.

BIGOT, *n.* : serçil.

BIGOTED, *adj.* : serçil.

BIGOTRY, *n.* : serçilî.

BIG SHOT, *n.* : mirovê giring, giregir.

BIG-TICKET, *adj.* : bihagiran.

BIG TOP, *n.* : kon yan xîvetê mezinê sêrkê, sîrk.

BIG TREE, *n.* : darê mezin : kajek ji 300 pêyan bilindtir dibit.

BIGWIG, *n.* : mirovê giring.

BIHOURLY, *adv.* : dudemjimêrî.

BIJOU, *n., adj.* : gewher, çek, xeml, xişil, biçûk û law.

BIJOUTERIE, *n.* : gewher, çek, xişil.

BIJUGATE, *adj.* : belgdarê ducot.

BIKE, *n.* : duçerx.

BIKINI, *n.* : cilên ji bo ketina avê : duparçe bo jinan, gelek leşî rût diyar dikit.

BILABIAL, *adj.* : gotina dulêvî, deng yan tîpa dulêvkî.

BILABIATE, *adj.* : dulêvî.

BILALANDER, *n.* : gemiyek bazirganî biçûk.

BILATERAL, *adj.* : dulayî, duqolî, durexî.

BILBERRY, *n.* : tiriyê dehlî.

BIBLO, *n.* : şûr, pabendek dirêj bo pêyên hebsiyan.

BILE, *n.* : zerdav, zirav.

- **DUCT** : kerxa zerdavê.
- **STONE** : berkê zerdavê.

BILGE, *n.* : parçeya rasta keştî.

- **WATER** : avgenî.

BILGE, *vt.* : ziyan dan (parçeya rasta keştî).

BILGED, *adj.* : ziyanbûyî.

BILGING, *n.* : ziyanbûn.

BILGY, *adj.* : genî.

BILHARZIA, *n.* : bilharizya : xwînmîzk, kirmê panê di nav xwîn û mîzdankê de.

BILHARZIASIS, *n.* : nesaxiya bilharizya.

BILIARY, *adj.* : ziravî.

BILIARY COLIC, talîşkejan, janetalîşk.

BILINGUAL, *adj.* : duzimanî.

BILIOUS, *adj.* : ziravî.

BILITERAL, *adj.* : dutîpî.

BILK, *vt.* : xapandin.

BILK, *n.* : xapîn.

BILL, *n.* : nikil.

BILL, *n.* : qoçan, gelale, reşbeleka qanûnan.

- **BOARD** : depê agehdariyan.
- **OF INDICTMENT** : dozname.
- **OF RIGHTS** : mafname.

BILLED, *adj.* : nikilkirî, ragehandî.

BILLET, *n.* : pisole.

BILLFISH, *n.* : masiyek nikil dirêj e.

BILLFOLD, *n.* : cizdan.

BILLHEAD, *n.* : kaxeza navnîşan.

BILLIARD, *adj., n.* : bilyardî, pêkan (li bilyardê).

BILLIARDS, *n.* : bilyard.

BILLING, *n.* : ragehandin, pêşkêş kirina navên kirdaran.

BILLINGS GATE, *n.* : zimanê kolanan (kirêt).

BILLION, *n.* : milyon milyon, milyar.

BILLIONAIRE, *n.* : mîlyarder.

BILL OF ATTAINDER, *n.* : biryara destbiserdagirtina samanê xinizî û biryardana kuştina wî.

BILL OF CREDIT, *n.* : çek yan qoçana li ser dewletê.

BILL OF DEBT, *n.* : qoçana deyndariyê.

BILL OF DIVORCE, *n.* : kaxeza berdanê.

BILL OF EXCHANGE, *n.* : guhastin, belgenameya belênî.

BILL OF FARE, *n.* : siyayiya xwarinê, bername.

BILL OF HEALTH, *n.* : belgenameya tendiristiyê.

BILL OF LADING, : belgenameya barkirinê.

BILL OF SALE, *n.* : belêniya firotinê.

BILLOW, *n.* : pêla mezin.

BILLOW, *vt.i.* : pêl rabûn.

BILLOWS, *n.* : şilq, çilqan.

BILLOWY, *adj.* : pejbûyî, pêlî.

BILLPOSTER OR BILL STICKER, *n.* : venûsîna agehdariyan.

BILLY, *n.* : doq, topiz.

BILLYCOCK, *n.* : şefqeyek tatî girûvir.

BILLY GOAT, *n.* : nêrî, nêrebizin, hevorî, tege, sabirên.

BILOBATE, *adj.* : dulibî.

BILOCULAR OR BILOCULATE, *adj.* : duxane.

BIMANA, *adj.* : dudest.

BIMANOUS, *adj.* : dudestî.

BIMANUAL, *adj.* : du destî çekirî.

BIMESTER, *adj.* : duheyvî.

BIMESTRIAL, *adj.* : duheyvî.

BIMETALLIC, *adj.* : dumetal.

BIMETALLISM, *n.* : dumetalîtî.

BIMILLENARY, *adj., n.* : duhezarsalî, pêwendîdarê duhezarsalî.

BIMOLECULAR, *adj.* : dugerdî, pêwendîdarê dugerdî.

BIMONTHLY, *adj., adv., n.* : nîvheyvî, heyvê du car.

BIMOTORED, *adj.* : du bizwên yan mekîne.

BIN, *n.* : sindoqa genimî yan rejiyê.

BIN-, *pref.* : pêşgir e ko du ye.

BINARY, *adj., n.* : duwane.

- **STAR** : stêra duwane.

BINATE, *adj.* : du car, werara cotane.

BIND, *vt.i.* : girê dan, rapêçandin, berg kirin.

- **TO ~ ONESELF TO** : belên dan, peyiv dan.

- **TO ~ OVER** : derbest kirin.

BIND, *n.* : tengavî.

BINDER, *n.* : bergvan, bend, belênî, berg, peyiv.

BINDERY, *n.* : berge.

BINDING, *n.* : girêdan, bestin, berg, bergê kitêbê.

BINDING UP : girêdan, panisman.

BINDING POST : pêgireka gehandinê.

BINDWEED, *n.* : jale, rolik.

BINE, *n.* : leblab, lorik.

BINGE, *n.* : bezm yan ahenga vexwarinê.

BINGO, *n.* : leyiztina bîngo.

BINNACLE, *n.* : derzîdank, sindoqa qîblenima.

BINNARIA, *n.* : kirmokê çengdar yan baldar.

BINOCLE, *n.* : dûrbîna duçavik.

BINOCULAR(S), *n.* : dûrbîn.

binocular vision : dîtina duçavikî.

BINOMIAL, *adj., n.* : duzaravî.

- **EQUATION** : hevkêşeya duradeyî.

- **SYSTEM** : pêro yan rêzika dunavekî.

BINOMINAL, *adj.* : dunavî.

BINUCLEAR, *adj.* : dunafikî, dunavokî.

BIO-, *pref.* : pêşgir e ko jiyan yan zindî ye.

BIOASSAY, *n., vt.* : ezmûna jiyanî, ezmûnan (li ser zindî) kirin.

BIOCATALYST, *n.* : handerê jiyanî.

BIOCHEMICAL, *adj.* : kîmyaya jiyanî.

BIOCHEMIST, *n.* : kîmyajiyanzan.

BIOCHEMISTRY, *n.* : kîmyaya jiyanî.

BIOGENESIS, *n.* : jiyan peydabûn.

BIOGENIC, *adj.* : pêwendîdarê peydabûna jiyanê.

BIOGENY, *n.* = **BIOGENESIS.**

BIOGEOGRAPHY, *n.* : erdnasiya zîndekî, erdnîgara jiyanî.

BIOGRAPHER, *n.* : nivîserê jînnameyê.

BIOGRAPHIC(AL), *adj.* : jînnameyî.

- **DATA** : zanîna jînnameyî, navnîşana jînnameyî.

BIOGRAPHY, *n.* : jînname, serhatîk.

BIOLOGIC(AL), *adj.* : zindekî.

- **CONTROL** : dabînîya zindekî.

- **WARFARE** : şerê zindekî.

BIOLOGISM, *n.* : zindewerzanîtî.

BIOLOGIST, *n.* : zindewerzan.

BIOLOGY, *n.* : zindewerzanî, jînzanî, zindîzanî, zindînasî, jîndarî, jîwarî, zindekîzanî, jiyanitî.

BIOLUMINESCENCE, *n.* : geşiya zindî.

BIOMETRY, *n.* : jînpîv.

BIONOMICS, *n.* = **ECOLOGY.**

BIOPHYSICS, *n.* : jînsirûştzanî.

BIOPSY, *n.* : helkêşan û ezmûnkirina tevnê zindiyê leşî.

BIOSCOPE, *n.* : leşbîn.

BIOSCOPY, *n.* : leşbînî.

BIOSPHERE, *n.* : jiyangeh, cîhana jiyanî.

BIOSYNTHESIS, *n.* : peydakirina jiyanî.

BIOTECHNOLOGY, *n.* : teknolojiya zindekî, bioteknolojî.

BIOTIC(AL), *adj.* : zindekî.

BIOTIN, *n.* : biyotîn : vîtamîna di nav haveyn, cerg û zerka hêkê de.

BIOTYPE, *n.* : nimûneyê jiyanî.

BIPAROUS, *adj.* : cêmkî.

BIPARTISAN, *adj.* : dupartiyî.

BIPARTITE, *adj.* : duqolî, duwane, duparçeyî.

BIPED, *n., adj.* : dupê, dupêdar.

BIPEDAL, *adj.* : dupêdar.

BIPETALOUS, *adj.* : duper (gul e).

BIPHASE, *adj.* : dukoçe, duqonax.

BIPHENYL, *n.* : bîfênîl : hîdrokarbonek spî ye.

BIPINNATE, *adj.* : percot (belg e).

BIPLANE, *n.* : durû.

BIPOD, *n.* : dupêpik, dupa.

BIPOLAR, *adj.* : dutewere.

BIQUADRATIC, *n.* : hevkêşeya çarîne.

BIRACIAL, *adj.* : duregezî.

BIRAMOUS LIMBS, *n.* : pelê duliq.

BIRCH, *n.* : heyzeran.

BIRCH, *vt.* : celde dan.

BIRD, *n.* : balinde, firinde, mel, pelewer.

- **BRAIN** : xirpo.

- **DROPPINGS** : çêrt, zilq.

- **HOUSE** : balindegeh.

- **LIME** : hodar.

- **LOUSE** : speha balindeyan.

-'S EYE : çavê balindeyî (helez e).

BIRDCALL, *n.* : dengê balindeyî.

BIRD COLONEL, *n.* : rêber, serheng.

BIRD DOG, *n.* : seyê nêçîra balindeyan.

BIRDER, *n.* : balindegir, zêrevanê balindeyan.

BIRDIE, *n.* : balindek.

BIRDMAN, *n.* : balafirvan, bazirganê balindeyan.

BIRD OF PARADISE, *n.* : balindeyê beheştê.

BIRD OF PASSAGE, *n.* : balindeyê koçer, mirovê gerok.

BIRD OF PREY, *n.* : balindeyê dirrinde.

BIRD PEPPER, *n.* : bêbera dehlî.

BIRD SEED, *n.* : dêndik yan tovê balindeyan.

BIRD'S FOOT, *n.* : balinde pê (helez e).

BIRD'S FOOT TREFOIL, *n.* : nefela pêyê balindeyî.

BIRDWOMEN, *n.* : balafirvan (jin).

BIRETTA, *n.* : kulav.

BIRL, *vt.i.* : (baskê darî) girêl kirin (di nav avê de).

BIRR, *n.* : zebir, hêz, çalakî.

BIRTH, *n.* : zayîn, zan, bûn.

- **CERTIFICATE** : zayînname.
- **DAY** : roja bûnê yan zayînê, sersalî.
- **HOME** : zangeh.
- **MARK** : xal (nîşan).

BIRTH-MATE : hogirê bûnê : li heman dir û demî bûyî.

BIRTH PLACE : bûngeh , zêd, zayîngeh.

BIRTH RATE : têkraya zayînê.

BIRTH RIGHT : mafê sirûştî.

BIRTH ROOT : gulek zebatî ye.

BIRTH SIN : yekem gunehî.

BIRTH STONE : gewherê bûnê : berek hêja ye.

BIRTH WORT : giyayek bo sanahî kirina biçûkbûnê bi kar dihînin.

BIS, *adv.* : du caran, carek dî.

BISCUIT, *n.* : hindok, biskit.

BISECT, *vt.i.* : du nîv kirin.

BISECTING, *n.* : dunîvîkirin.

BISECTION, *n.* : dunîvîkirin, nîvkirin.

BISECTOR, *n.* : (du) nîvker, nîvkerê goşeyê.

BISEXUAL, *adj.* : duregez, nêrmo, duzayendî.

BISHOP, *n.* : metran, fîlê şetrencê.

BISHOPRIC, *n.* : metranxane.

BISHOPWEED, *n.* : xîltan.

BISMUTH, *n.* : bizmot : texlîtek hêman e.

BISON, *n.* : gayê emerîkî.

BISK, *n.* : şorbe yan giraza goştê balindeyan.

BISSEXTILE, *n.* : sala pirî.

BISTER OR BISTRE, *n.* : boyeya reşa tariya teneyî.

BISTROT, *n.* : darê şivanî (helez e).

BISTOURY, *n.* : neşterk.

BISTRO, *n.* : xudanê meyxaneyê, meyxane yan aşxaneya biçûk.

BISULCATE, *adj.* : derizî, kelişî.

BIT, *n.* : parî, piçek, lixav, bizim, diravê biçûk.

- **BY ~** : piç piç, bere ber.
- **I DON'T CARE A ~** : ez êkcar pûtê pê nakim.
- **A ~ AT A TIME** : hêdî hêdî, bere ber, piç piç.
- **A LONG ~** : 15 sent (diravê emerîkî).
- **A SHORT ~** : 10 sent (dirav e).

- **TO DO ONE'S ~** : erkê xwe kirin.

- **TO GIVE A PERSON A ~ OF ONE'S MIND** : lê xurîn, eşkera li gel axiftin.

BITARTARATE, *n.* : duwem tartarêt, bîtartarat.

BITCH, *n.* : dê(h)l.

BITE, *vt.i.* : geztin, leq lê dan.

BITE, *n.* : leq, gezîn, çizandin, qoncîrk, gestin, geztin, pêvedan.

- **WING** : leqnazik : filmê tîrêja êksa didanan.

BITING, *adj., n.* : leq, çizandin, geztin, pêvedan.

- **A BITE** : gepek.

BITER, *n.* : gezvan, gezok.

BITS, *n.* : kortêl.

BITSTOCK, *n.* : destikê kunkerî.

BITTEN, *adj.* : geztî, kirandî.

BITTER, *adj., n.* : tal, tehil.

- **END** : dûmahiya tal.

- **MODE** : mad yan tayar tal.

- **ORANGE** : narenc.

BITTERLY, *adv.* : talekî, dijwarekî, bi talî.

BITTERNESS, *n.* : tehlî, talî(tî).

BITTERSWEET, *n., adj.* : şirîn û tal, mêxweş.

BITUMEN, *n.* : zift.

BITUMENIZE, *vt.* : zift kirin.

BITUMENOUS, *adj.* : ziftî.

BIVALENCE, *n.* : duhevhêzî.

BIVALENT, *adj.* : duhevhêz.

BIVALVE, *adj., n.* : duzimane, duderçe.

BIVOUAC, *n.* : warê demdarî.

BIWEEKLY, *adj., n.* : nîvheftiyî.

BIYEARLY, *adj.* : nîvsalane.

BIZARRE, *adj.* : seyr, gêre, awêze, nasayî, beloq, awarte.

BIZONAL, *adj.* : dudeverî.

BLAB, *vt.i., n.* : çelte, çenebazî, pir axaftin.

BLABBER, *n.* : çelte, pelpelo, çenebaz.

BLABBLE, *n.* : çenebazî, pirbêjî.

BLACK, *adj., n.* : reş, siya.

- **AND BLUE** : şîn reş (şûna kulmê yan ketinê).

- **AND WHITE** : reşbelek, serbelek.

- **ART** : cadu, xirs.

BLACK-A-VISED (OR VICED) : reng tarî.

BLACKBALL, *n.* : tepka reş (dengê nerênî).

BLACKBALL, *vt.* : nerênî deng dan.

BLACK-BASS, *n.* : masiyek rûbarî ye.

BLACK BED, *n.* : sîlank.

BLACK BEAR, *n.* : hirça reş.

BLACK BEETLE, *n.* : kêz, qalonçe.

- **BELLIED SAND GROUSE** : çonik.

- **BILE** : reş(mad).

- **BIRD** : şalûl.

- **BOARD**, *n.* : depreş.

- **BODY** : leşê reş.

- **BOOK** : kitêba reş (bo navên mirovên neviyayî).

- **BUCK** : pezkûviyê reş.

- **CAP** : kulavreş (balinde ye).

- **CAPPED** : serreş.

- **DAMP** : oksîdê duwemê karbonî.

- **DIAMOND**, *n.* : elmasa reş.

- **DOG**, *n.* : serkizî.

- **EYE(D)** : çavreş, cangiranî.

- **EYED BEAN(S)** : baqil.

- **FLAG**, *n.* : texlîtek pêşî ye.

- **GUARD**, *n.* : bîjî.

- **HEARTED** : garîs.

- **MARKET** : bazarê reş.

- **PARTRIDGE** : por.

- **SEA** : deryayê reş.

- **SHEEP** : pezê reş : mirovê pûçê ji malbatek baş.

BLACK, *vt.i.* : reş kirin.

BLACKAMOOR, *n.* : zincî, reşo.

BLACK BELT : devera reşan.

BLACK BERRY, *n.* : tutirk, tudirk, stirî, dirrik, tureşk.

BLACK DEATH, *n.* : reşav.

BLACKEN, *vt.i.* : reş kirin.

BLACKING, *n.* : boyeya reş.

BLACKISH, *adj.* : piçekê reş.

BLACKJACK, *n.* : mesînê bîreyê, topizê çerimkirî, alaya derya giran, texlîtek darberûyê emerîkanî.

BLACKJACK, *vi.* : lê dan (bi topizî).

BLACK-KNOT, *n.* : girêka reş : nesaxiyek gêlasan.

BLACK LEAD = GRAPHITE.

BLACK LEG, N. : reş ling : nesaxiyek vegira terşî ye. Têkderê lêdanê (mangirtinê).

BLACK LETTER, *n.* : tîpa reş.

BLACK LETTER, *adj.* : enîbeş, çapkirî (bi tîpa reş).

BLACKLIST, *n.* : siyayiya reş, tomara mirov yan hevkariyên neviyayî.

BLACKMAGIC, *n.* : cadûgeriya reş (bed).

BLACKMAIL, *n., vt.* : gefkirin, gef kirin (bo diravî).

BLACK MARIA, *n.* : otomobîla girtiyan.

BLACK MEASLES, *n.* : sorikên reş.

BLACKNESS, *n.* : reşatî.

BLACK OUT, *n.* : temirandina hemî ronahiyan, bêhişî yan jibîrkirina demdar.

BLACK SHIRT, *n.* : kumlek reş : endamê rêkxistinek faşistî.

BLACK SNACK, *n.* : marê reş.

BLACK SMITH, *n.* : asinger.

BLACK THORN, *n.* : porjanê tanî.

BLACK TIE, *n.* : cilên nîv mîriyên zelaman (mêran).

BLACKTOP, *n.* : qîra rêkan.

BLACKTOP, *vt.* : qîr kirin (rê).

BLACK VOMIT, *n.* : veriştina reş.

BLACK WALNUT, *n.* : giwêza reş.

BLACK WATER FEVER, *n.* : ta li gel mîza reş.

BLACK WIDOW, *n.* : bîjina reş : mêya pîrhevokî ya ko mêrê xwe dixwit.

BLADDER, *n.* : mizdank, rûdînk.

- **MUSCLES** : masûlkeyên mîzdankê.

- **NECK** : devê mîzdankê.

- **WORM** : kirmikê mizdankê.

BLADDERY, *adj.* : mîzdankî.

BLADE, *n.* : tîj, kêr, belg, tîx, soranî.

BLADED, *adj.* : tîxkirî.

BLAH, *n.* : pûç.

BLAIN, *n.* : kulik, pirzik.

BLAMABLE, *adj.* : gileyîbar, lêgir, lomebar.

BLAME, *n.* : gileyî, gazinde, gazin, lêgirtin.

BLAME, *vt.* : gazinde kirin.

BLAMED, *adj., adv.* : lêgirtî.

BLAMEFUL, *adj.* : lêgirtî, gazindeyî.

BLAMEFULLY, *adv.* : bi gazindeyî, gazindeyekî.

BLAMELESS, *adj.* : bê gunehî, dawpak.

BLAMELESSLY : bi bêgazindeyî.

BLAMELESSNESS, *n.* : bêgazindeyîtî.

BLAMER, *n.* : gilîmendar, lêgir.

BLAMEWORTHY, *adj.* : lêgirdar.

BLAMING, *n.* : gileyîkirin, lomekirin, gazindekirin.

BLANCH, *vt.i.* : pêtî bûn, spî kirin.

BLANCMANGE, *n.* : texlîtek mihelebî, firnî.

BLAND, *adj.* : nerim, bodil, nazik, taze, xweş, newazişt, nehişker.

BLANDISH, *vt.* : rûbazî kirin, dûrûyî kirin.

BLANDISHMENT, *n.* : rûbazî.

BLANDLY, *adv.* : bi nermî, nermkî.

BLANDNESS, *n.* : nermîtî.

BLANK, *adj., n.* : spî, vala.

- **ENDORSEMENT** : rastandina spî : vegu-hêz bo helgirî.

- **STUPIDITY** : xirpotiya eşkera.

- **VERSE** : helbesta bêpîv.

BLANKET, *n., adj.* : cacîm, mêzer, peto, mewc.

- **A WET ~** : têkderê xweşiyê yan çalakiyê.

BLANKLY, *adv.* : ji her layî ve, eşkera, bê derbirrîn, ji her alî ve.

- **ATHEISTIC** : zendîqê temam.

BLANKNESS, *n.* : valatî.

BLARE, *n.* : dengê borîzanê, deng.

BLARE, *vi.t.* : borîzan lê dan.

BLARED, *adj.* : deng bilind kirî.

BLARING, *n.* : deng bilind kirin.

BLARNEY, *n.* : durûyî, rûbazî.

BLARNEY, *vt.i.* : rûbazî kirin, dûrûyî kirin.

BLASE, *adj.* : betran.

BLASPHEME, *vt.i.* : kifrî kirin, çêr kirin Xudayî, xeber gotin.

BLASPHEMOUS, *adj.* : kifrî, çêriya Xudayî.

BLASPHEMOUSLY, *adv.* : bi kifrî.

BLASPHEMOUSNESS, *n.* : kifrîtî.

BLASPHEMY, *n.* : kifir, bêdînî, bê olî yan ayînî.

-BLAST, SUFF. : paşgir e ko dirm, xane yan çîna xaneyî ye.

BLAST, *vi.t.* : peqandin.

BLAST, *n.* : peqîn.

- **FURNACE** : kûrheya buhujîna metalan.

BLASTED, *adj.* : kembax, qurmiçî, kîndar, qurmisî.

BLASTEMA, *n.* : binyata endamî.

BLASTING, *n.* : dakutan.

BLASTODERM, *n.* : çerm yan dîwarê bilastula.

BLASTO KINESIS, *n.* : livîna binyatî.

BLAST-OFF, *n.* : derketin (moşek).

BLASTOGENESIE, *n.* : bişkujbûn.

BLASTOMERE, *n.* : xaneya bilastulî.

BLASTOPORE, *n.* : devê rûvîka seretayî.

BLASTO SPHERE, *n.* : bilastula.

BLASTULA, *n.* : bîlastula : şiklek pizî ye.

BLAT, *vi.t.* : bilind gotin, kal kal kirin, bar bar kirin, meîn (kirin) .

BLATANT, *adj.* : zeq, eşkera.

BLATHER, *vi.t., n.* : axiftina pûç, pûç axaftin.

- **SKITE** : pûçbêj.

BLATHERED, *adj.* : pûçbêjîkirî.

BLATHERING, *n.* : pûçbêjîkirin.

BLATTED, *adj.* : barebarkirî.

BLATTING, *n.* : barebarkirin.

BLAZE, *n.* : hilorî, pêt, nêrig, gurî, gurîk, şewla agirî.

BLAZE, *vi.t.* : teyisîn, sotin.

BLAZED, *adj.* : şewitî, sotî, girîkirî.

BLAZER, *n.* : saqoyê rengîn.

BLAZING, *n.* : sotin, gurîkirin.

BLAZON, *n., vt.* : rave yan neqşê dirûşmê xanedanî ye, dirûşmê xandaniyê, raveya fortekî, (bi fortekî) belav kirin, nexş kirin, (dirûşmê xanedaniyê), xemilandin, weşandin.

BLAZONED, *adj.* : weşandî.

BLAZONING, *n.* : weşandin.

BLAZONRY, *n.* : dirûşmê xanedanî, rave yan neqişkirina dirûşmê xanedaniyê, xemilandin.

BLEACH, *vi.t.* : bêreng kirin, spî kirin, duhitandin.

BLEACH, *n.* : duhtin.

BLEACHED, *adj.* : duhtî, spîkirî.

BLEACHER, *n.* : spîker, bêrengker.

BLEACHERY, *n.* : spîgeh, duhtingeh.

BLEACHING, *n.* : duhtin, spîkirin, rengbirin, renglabirdin.

- **POWDER** : toza spîkirinê, toza bêrengkirinê, kejmêreka rengbirinê.

BLEAK, *adj., n.* : tarî, sar, çol, dirr.

BLEAKISH, *adj.* : piçekê tarî.

BLEAKLY : bi tariyî, tarîkî.

BLEAKNESS, *n.* : tarîtî.

BLEAR, *adj.* : rondikî, tarî.

- **EYED** : çav kiz.

BLEARY, *adj.* : mijî, nediyar, westayî.

BLEAT, *n.* : meîn, barebar (barbar), kalkal, kalîn, balebal.

BLEB, *n.* : pirzik, rîşik, zîpik, tovdan, peqîşk.

BLED, *adj.* : risikandî.

BLEED, *vi.t.* : riskandin.

BLEEDER, *n.* : risikînker.

BLEEDING, *n.* : risikîn, risikandin, xwîn pijan, xwîn verestin yan veresîn.

- **HEART** : dilê xwînî (helez e).

BLEMISH, *n.* : leke, pele, kirêtkirin.

BLEMISH, *vt.* : kirêt kirin.

BLENCH, *vi.t.* : pêtî bûn, spî bûn, paşve çûn.

BLEND, *n.* : têkil.

BLEND, *vt.i.* : têkil kirin.

BLENDE, *n.* : kibrîtîdê cihikiyê tutyayê.

BLENDED, *adj.* : têkilkirî.

- **WHISKY** : wiskiyê têkilkirî.

BLENDING, *n.* : têkilkirin, têkilî.

BLENDER, *n.* : têkilker.

BLENNY, *n.* : texlîtek masiyên kevreberavan.

BLEPHAR(O)-, *pref.* : pêşgir e ko kulbûna ber û pişta çavî ye.

BLEPHARITIS, *n.* : basirme, kulbûna ber û pişta çavan.

BLESBOK, *n.* : pezkûviyê mezinê başûra Efrîqa.

BLESS, *vt.* : pîroz kirin.

BLESSED, *adj.* : pîroz (kirî).

BLESSEDLY, *adv.* : bi pîrozî, pîrozkî.

BLESSEDNESS, *n.* : pîrozî, bextiyarî.

BLESSING, *n.* : pîroz kirin, pîrozbûn, pîrozî, pît, dirod.

BLETHER = BLATHER.

BLEW, *p.* **OF BLOW** : peqî, pufda.

BLEW, *p.* **OF BLOW** : ba hat.

BLIGHT, *n.* : derd, perjeng.

BLIGHT, *vt.i.* : derd girtin, vekuştin, xirab bûn (çandin).

BLIMP, *n.* : sawêlke, sade, pufdanka zêrevaniyê.

BLIND, *adj., n., adv.* : kore, kor, nebîn(a), şevreş.

- **ALLEY** : rêkork.

- **ANT** : rênast.

- **DATE** : vêketina yekem.

- **GUT** : rîvîkore, rûvîkor.

- **SPOT** : xalka kore ya tora çavî ko qenc ronahiyê seh nakit, piniya kore ko mejî qenc tênagehit, piniya ko wergirtina pêlên bêtêl lawaz e.

BLIND, *vt.i.* : kore kirin, kor kirin.

BLINDER, *n.* : tarîkerê hespî ko nahêlit hesp rexî bibînit.

BLINDFISH, *n.* : masiyek kore ye.

BLINDFOLD, *n., adj.*, vt : çavgirtî, kore yan wind kirin, hol, dersoka çavgirtinê, çavgirtin.

BLINDLY, *adv.* : bı holî, gotre, bi koreyî, korkî.

BLINDNESS, *n.* : koreyî, koranî, korayî, şevreşî.

BLINDMAN'S BUFF, *n.* : yariya çavgirtî.

BLIND STORY, *n.* : avahiyê bêpencerk.

BLIND TIGER, *n.* : meyfiroşgeha neqanûnî (bêdestûrî).

BLIND WORM, *n.* : kimkimeyê kore.

BLINK, *n., vi.t.* : neq, tiroke, mijmij, neqandin.

BLINKARD, *n.* : xirpo, bînerê lawaz, dîtina sist.

BLINKER, *n., vt.* : çavgirtînik, ronahiya çirîskdar, tarîker danan.

BLINKING, *n.* : mijmijîn.

BLINTZ(E), *n.* : kiloca bi penîrî yan rîçalî dagirtî.

BLIP, *n.* : wêneyê li ser perdeyê nexasme radarê.

BLIP, *vt.* : deng birrîn.

BLISS, *n.* : xweşî, şadî, bextiyarî.

BLISSFUL, *adj.* : bextiyar, şad.

BLISSFULLY, *adv.* : bi şadî yan bextiyarî.

BLISSFULNESS, *n.* : şadîtî, bextiyarîtî.

BLISTER, *n.* : pirzik, rîşik, zîpik, tovdan.

- **BEETLE** : kêzika pirzikan.

- **GAS** : xaza pirzikan : xazek jehrî ye û leşî pirzik kirin.

- **RUST** : pirzika sinewberê (kajê) : nexweşiya darê sinewberê.

- **STEEL** : polayî pirzikî.

BLISTER, *vt.i.* : kul bûn, pirzikî bûn.

BLISTERED, *adj.* : pirzikbûyî.

BLISTERING, *n.* : pirzikbûn.

BLITHE, *adj.* : bextiyar, şad.

BLITHER, *vi.* : xirpoyî yan gewcî axaftin.

BLITHESOME, *adj.* : bextiyar, şad.

BLITZ, *n.* : şerê birûskî, danser, êrîşa qayim.

BLITZ, *vt.* : dan ser.

BLITTZKRIEG, *n.* : danser.

BLIPPED, *adj.* : dengbirrî.

BLIPPING, *n.* : dengbirrîn.

BLIZZARD, *n.* : bamişt, bager barova befrê, babelîska befrê.

BLOAT, *n.* : pufdan.

BLOAT, *vt.i.* : puf dan.

BLOATED, *adj.* : pufdayî.

BLOATER, *n.* : masiya xwêkirî û dûkêlkirî.

BLOB, *n.* : dilop, leke, gemar.

BLOB, *vt.* : leke kirin, gemar kirin.

BLOC, *n.* : ber, giro.

BLOCK, *n.* : qurm(ik), berbest.

- **BUSTER** : bombaya mezin.

- **HEAD** : xirpo.

- **LETTERS** : tîpên dar, tîpên cuda.

BLOCK, *n.* : çikandin.

- **AND TACKLE** : dartûn û werîs bo rakirina tiştekê.

- **HEAD** : gewc.

BLOCK, *vt.* : gîro kirin, berbest kirin, rê girtin.

BLOCKADE (ING), *n.* : dorgirtin, çarhêlgirtin, gemaro, abloqe.

- **RUNNER** : abloqeşikên.

BLOCKAGE, *n.* : çikîn, werhatin.

BLOCKED (OFF, UP), *adj.* : berbestkirî, çikandî, abloqekirî.

BLOCK PLANE, *n.* : rende.

BLOCK SIGNAL, *n.* : nîşana rêberiyê.

BLOCK SYSTEM, *n.* : rêzika nîşana (rêasin).

BLOCKY, *adj.* : qut, stûr û qelew.

BLOKE, *n.* : zelam, mirov, mêr, kabra, piyaw.

BLOKISH, *adj.* : xirpo, gewc.

BLOND(E), *adj., n.* : zerkok, qijkal, sorbelek, şê, çor, kej.

BLONDENESS, *n.* : şêyî, kejî, zerkokî.

BLONDISH BREAST, *n.* : zermemik.

BLOOD, *n.* : xwîn. : xwîn.

- **BATH** : kuştara bizdihîn.

- **BROTHER**, *n.* : destbira.

- **COUNT** : jimara xwînê : topikên sor û spî di tibabek xwînê de.

- **CURDLING** : bizdihîn.

BLOODED, *adj.* : xwînbijîn, resen.

BLOOD GROUP : giroya xwînê.

BLOOD GUILTY, ADJ. : kuj, xwînrêj.

BLOOD HEAT, *n.* : germiya xwînê.

BLOODHOUND, *n.* : tajiyê xwînê (bihnê).

BLOOD-LETTING : xwînberdan, nişterkirin.

BLOODLINE, *n.* : babik, malbat.

BLOODMOBILE, *n.* : otomobîla xwînê.

BLOOD MONEY, *n.* : bihayê xwînê : bo kuştinê yan tolê.

BLOOD PLASMA, *n.* : pilasmaya xwînê.

BLOOD PRESSURE : xwînpestên.

BLOOD RED, *adj.* : xwîn sor, sorê wek xwînê.

BLOOD RELATION OR RELATIVE, *n.* : mirov yan xizmê xwînê (bab, kur, keç, bira...).

BLOOD ROOT, *n.* : rihxwîn. : (helez e).

BLOOD SERUM : xwînav.

BLOODSHED OR BLOODSHEDDING : xwînrîştin.

BLOODSHOT, *adj.* : lekeya xwînê.

BLOOD STONE : berkê xwînê.

BLOODSUCKER, *n.* : xwînmij.

BLOOD SUGAR : şekirxwîn.

BLOOD THIRSTY, *adj.* : xwînrêj, xwînvexwar.

BLOOD TRANSFUSION, *n.* : xwînguhaztin.

BLOOD TYPE, *n.* : texlîtê xwînê.

BLOOD TYPE, *vt.* : texlîtê xwînê diyar kirin.

BLOOD VESSEL, *n.* : porgên xwînê.

- **RED ~** : gilokên sor.

- **WHITE ~** : gilokên spî.

BLOODY, *adj.* : xwînrêj, xwînawî, xwînî.

BLOODY MODE, *n.* : madxwînî.

BLOOM, *vt.i.* : geş bûn.

BLOOM, *n.* : geş, tolazî, şîn, heret, rengîn, rû rengizî, têr avî, rengûrû.

BLOOMER, *n.* : mirovê gehiştî, derpê kirasek jinan kurt li gel şelwarî.

BLOOMING, *adj.* : ava, geş, rengîn, heşîn, şên.

BLOOMY, *adj.* : têrgul.

BLOOPER, *n.* : çewtî.

BLOSSOM, *vi.* : geş bûn, vebûn, gul dan.

BLOSSOM, *n.* : ava, şên.

BLOSSOMING, *n.* : avabûn, şên.

BLOSSOMY, *adj.* : ava, rengizî, şên.

BLOT, *n.* : xewş.

BLOT, *vt.i.* : xewş kirin, tarî kirin, zuha kirin (merekebî), belav bûn (merekeb).

BLOTCH, *n.* : qunêr, deq.

BLOTTER, *n.* : zuhang, mijek.

BLOTTING PAPER, *n.* : zuhang, kaxezamijek.

BLOUSE, *n.* : çepek.

BLOW, *vt.i.* : pif kirin, pif dan, ba hatin.

- **TO ~ HOT AND COLD** : demdemî bûn, vê gavê tiştekê dikit lê gavek dî dijî wî tiştî dikit.
- **TO ~ IN** (helketinî) gihîştin.
- **TO ~ THE NOSE** : kilmîşî paqij kirin.
- **TO ~ OUT** : mûm yan çira temirîn yan temirandin.
- **TO ~ OVER** : sar bûn, borîn.
- **TO COME TO ~S** : şer kirin.
- **TO HAVE(GO FOR) A ~** : derkeftin nav bayê bijîn de.
- **TO STRIKE A ~ FOR** : piştgirî kirin, xebat yan bizav bo tiştekê kirin.

BLOW, *n.* : sîlak, çilaq, şap, derb, pif, bagirtek, fit.

- **HOLE** : kunedifin.
- **UP** : peqîn.

BLOW-BY-BLOW : bi dirêjî ravekirî.

BLOWER, *n.* : fortek, baweşîn.

BLOWFISH, *n.* : pufmasî.

BLOWFLY, *n.* : pufmêş.

BLOWGUN, *n.* : tifenga pifkirinê : lûleya havêjan bi pifkirinê.

BLOWHARD, *n.* : fortek.

BLOWING, *n.* : pifkirin, pifdan, bahatin.

BLOWN, *pp.* **OF BLOW** : pifkirî.

BLOW OFF, *n.* : fortek, rewteka hilmê yan avê.

BLOW OUT, *n.* : sifra dilvera. Peqîna tayerê, kunka tayerê, nişkî.

BLOW PIPE, *n.* : levenê pifkirina agirî.

BLOW TORCH, *n.* : agirê lehîmê.

BLOWY, *adj.* : bahozî.

BLOWZY, *adj.* : gij.

BLUBBER, *n.* : girîn, qelew, bezê çermî, bezê nehengî.

BLUBBER, *vi.t.* : qelew bûn, puf bûn, girîn.

BLUBBERY, *adj.* : puf, qelew.

BLUTCHER, *n.* : texlîtek pêlav.

BLUDGEON, *n.* : topiz.

BLUDGEON, *vt.* : lê dan (bi topizî).

BLUE, *n.* : maxolya.

BLUE, *adj.* : şîn, asmanî, esmanî, heş, çiwît, heşîn, pest.

- **CHEESE** : şîn, texlîtek penîrê rokforte.
- **EYED** : çavbelek, çavşîn, kusk.
- **SKY** : esmanî şîn yan sahî.

BLUE, *vt.i.* : şîn kirin.

BLUE BABY, *n.* : şîn biçûk : zarokê şîn leş ji ber nexweşiya dilî.

BLUEBEARD, *n.* : mêrê bi gelek jin.

BLUE BELL, *n.* : gezîze.

BLUEBERRY, *n.* : tişîn.

BLUE BIRD, *n.* : çûçika şîn.

BLUE BLACK, *adj.* : reşê şîn.

BLUE BLOOD, *n.* : xanedan, resen (xwînşîn).

BLUE BLOODED, *adj.* : xanedan.

BLUE BONNET, *n.* : şînkulav.

BLUE BOOK, *n.* : kitêba şîn ko hikumet li ser pirsekê belav dikit.

BLUE BOTTLE, *n.* : mêşek mezin zikşîn e.

BLUE CAT, *n.* : masiyek emerîkanî mezin şîn (şînkitik).

BLUE COAT, *n.* : saqoşîn : serbazê emerîkanî demê serê jiyarî.

BLUE CHIP, *n.* : havildar, serketî.

BLUE-COLLAR, *adj.* : karkerî.

BLUE DEVILS, *n. pl.* : xemgînî, xemdarî, mirûsî.

BLUE FLAG, *n.* : şîn ala : sosina gelekreng.

BLUE GUM, *n.* = **EUCALYPTUS.**

BLUE JACKET, *n.* : deryavan.

BLUE MOLD, *n.* : şîngeniti.

BLUE MOON, *n.* : demê bêqamdirêj.

BLUE OF THE EYE, *n.* : çavbelekî.

BLUE PENCIL, *vt.* : rast kirin, bijar kirin.

BLUE PETER, *n.* : alaya derketina gemiyê.

BLUE POINT, *n.* : kitika siyamî, nermeşeytanoka biçûk.

BLUE PRINT, *n.* : çapa şîn, nexşe.

BLUE RIBBON, *n.* : payedar.

BLUE STOCKING, *n.* : jina rewşenbîr.

BLUE STONE, *n.* : berê şîn.

BLUE STREAK, *n.* : lezçûn (tişt).

BLUE VITROIL, *n.* : kibritatên misî.

BLUE WEED, *n.* : giyaşîn.

BLUFF, *n.* : çivo, dilxap, gefa derew, (belfe).

BLUFF, *vt.i.* : gefa derew kirin.

BLUFFER, *n.* : cerbeze.

BLUING, *n.* : heş, boyeya şîn.

BLUISH, *adj.* : heşî.

- **BLACK EYE** : çavreşbelek.

BLUNDER, *n.* : çewtî.

BLUNDER, *vt.i.* : çewtî kirin.

BLUNDERED, *adj.* : çewtîkirî.

BLUNDERER, *n.* : çewtiya eşkera.

BLUNDERING, *n.* : çewtîkirin.

BLUNGE, *vt.* : teqin kirin.

BLUNT, *adj., vt.i.* : kuh, bêhiş, kuh bûn.

- **ARROW** : tîra kuh.

BLUNTLY, *adv.* : bi eşkerayî, rûqayimî, reqî, vekirî, eşkerakî.

BLUNTNESS, *n.* : (axiftina) eşkerayî, kuhî.

BLUR, *n., vt.i.* : şêlî, mijî, pîsatî, mijî kirin, xeware kirin, şêlî kirin.

BLURB, *n.* : nasdana kitêbê.

BLURRED, *adj.* : şêlîkirî, mijkirî.

BLURRILY, *adv.* : bi mijî, mijkî.

BLURRINESS, *n.* : mijîtî.

BLURRING, *n.* : şêlî kirin.

BLURRY, *adj.* : şêlî.

BLURT, *vt.* : (nişkî) axiftin yan kenîn.

BLUSH, *n., vt.i.* : sor bûn, sor bûn (ji şerma).

BLUSHFUL, *adj.* : şermîn.

BLUSHING, *n.* : şermkirin.

BLUSTER, *n., vt.i.* : bahoz, dengê pêlan, enirîn, gef, şol, gef kirin, bûn bahoz, dijwar axaftin.

BLUSTERING, *n.* : hofehof.

BOA, *n.* : texlîtek mar e.

- **CONSTRICTOR** : marê bowayê ejdeha.

BOAR, *n.* : nêre beraz.

BOARD, *n., vt.i.* : texte dar, sehne, civangeh, dep, texte, siwar bûn.

- **ABOVE ~** : eşkera.
- **BLACK ~** : depê reş (bo nivîsînê).
- **ON THE ~** : li ser gemiyê.
- **ON THE ~S** : li ser depê şanoyê, kirdar.
- **TO GO BY THE ~** : ji gemiyê keftin.

BOARDER, *n.* : nîşte.

BOARDING, *n.* : nîştebûn, siwarbûn, xwarin û nivistin.

- **~ HOUSE** : mangeh : mêhvanxane (bi pare).
- **~ SCHOOL** : dibistana hindurî.
- **~ WAGES**, *n.* : xwarin û nivistinina şûna kirê.
- **~ WALK** : rewta dar.

BOAST, *n.* : fêz, fort.

BOAST, *vt.i.* : pesin kirin, fortekî kirin.

BOASTER, *n.* : fortek, zircan, zirtek, zirtonek, pesnoyî.

BOASTFUL, *adj.* : rûreq, qorre, fortek, zirtonek.

BOASTFULLY, *adv.* : bi fortekî.

BOASFULNESS, *n.* : fortekîtî.

BOASTING, *n.* : fêz, zirt, zirtdan, fortekî.

BOAT, *n.* : belem, gemî, keşti, nawe.

- **MADE OUT OF LOG** : bot.

BOATMAN, *n.* : gemîvan.

BOAT RACE, *n.* : pêşbirkeya beleman.

BOAT SWAIN, *n.* : naskerê deryavanan.

BOAT TRAIN, *n.* : hevkêşa gemiyê.

BOB, *n., vt.i.* : rîşok, qutan, xapandin, hejandin.

- **SLED** : şemtoka kurt yan cot.
- **TAIL** : dûvkurt, dûvbirrî.
- **WHITE** : çêlsîsk.

BOBBED, *adj.* : kurtkirî, xapandî.

BOBBERY, *n.* : tevlehevî.

BOBBIN, *n.* : mekere, xuloke.

BOBBINET, *n.* : kunkirin.

BOBBING, *n.* : kurtkirin, xapandin.

BOBBLE, *vt.i., n.* = **FUMBLE.**

BOBBY, *n.* : polîs.

- **PIN**, *n.* : sinceqa pan.
- **SOCKER** : keçika sîpe, zerî.

BOBCAT, *n.* : werşaqê bakura Emerîka.

BOBOLINK, *n.* : balindeyek strankar keyfxoş emerîkanî.

BOBSTAY, *n.* : werîs yan zincîr.

BOCACCIO, *n.* : texlîtek masî ye.

BOCK, *n.* : bîreya xurta biharê.

BODE, *vt.i.* : nîşan kirin, mizgîn kirin, berbîn kirin.

BODED, *adj.* : berbînkirî.

BODEFUL, *adj.* : berbîndar.

BODICE, *n.* : suxme.

BODIED, *adj.* : leşdarkirî.

BODILESS, *adj.* : bê leş.

BODILY, *adv.* : bi leşî.

BODING, *n., adj.* : bi mizgînî.

BODKIN, *n.* : mîl, sojin.

BODY, *n.* : leş, ten, gewde, ceste, term, laş.

- **BULKINESS** : leşgirsî.
- **CORPORATE** : kesê wateyî.
- **DEAD ~** : term.
- **GUARD**, *n.* : piştmêr.
- **POLITIC** : netewe.
- **SNATCHING** : term dizîn (ji goran).

BODY, *vt.* : leşdar kirin, hêma kirin.

BODYING, *n.* : leşdar kirin, hêma kirin.

BOER, *n.* : bowêr : mirovê başûra Efrîqa (nijad holendî).

BOG, *n.* : avgir, zelaw, çirav, comaq.

BOGEY, *n.* : mêrkê şevê.

- **MAN** : tirsyar nexasme tirsyarê zarokan.

BOGGED, *adj.* : noqîbûyî (çiravê).

BOGGING, *n.* : noqîbûn (çirav).

BOGGLE, *vi.* : veciniqîn, perîşan bûn.

BOGGLED, *adj.* : guhişî, veciniqî.

BOGGLING, *n.* : veciniqîn.

BOGGY, *adj.* : çiravî.

BOGY, *n.* : erebaneya nizma guhaztinê.

BOGUS, *adj.* : zir, derew.

BOGWOOD, *n.* : darê reşê ebenos.

BOHEA, *n.* : çaya reş.

BOIL, *n., vt.i.* : kelîn, kel, qunêr, coş, dombel, rîşik, zîpik, pirzik, konêr, kelîn, kelandin.

BOILED, *adj.* : kelî, kelandî.

- **RICE** : çilaw.

- **WHEAT** : danî.

BOILER, *n.* : kolêner, qazan, kelîner.

- **MAKER** : qazan yan kelîner çêker.

BOILING, *n.* : kelandin, kelkel, kelîn, kolan, kel, coş.

- **POINT** : pintika kelînê.

BOISTEROUS, *adj.* : galegotî, dijwar.

BOISTEROUSLY, *adv.* : bi galegotî.

BOISTEROUSNESS, *n.* : galegotîtî.

BOLAR, *adj.* : teqnî.

BOLD, *adj.* : aza, dilêr, dilar, keleman, boke, şêrkuj.

BOLDFACE, *n.* : tîpa reş yan stûr. çapkirina tîpa reş.

BOLDFACED, *adj.* : rûqayim.

BOLDLY, *adv.* : bi azayî, azayekî.

BOLDNESS, *n.* : azayîtî.

BOLE, *n.* : qur, teqin, bask.

BOLERO, *n.* : bolêro : semayek îspanî yan mûzîqeya wê, saqoyek fireh.

BOLETUS, : kivark : hindek xwarinbar e û hindek jehrî ye.

BOLIDE, *n.* : nêzeya mezina peqî.

BOLL, *n.* : tovdank.

- **WEEVIL** : beltîka pembû.

- **WORM** : kirmê pembûyî yan genimî.

BOLLARD, *n.* : singê girêdana werîsên gemiyê.

BOLO, *n.* : kêrikek dirêj û mezin e.

BOLOGRAPH, *n.* : tomarkirina germetîrêjpîvî.

BOLOMETER, *n.* : germetîrêjpîv.

BOLONEY, *n.* = **BALONEY.**

BOLSHEVIK, *n.* : komî, bolşevîk (komî yê Rûs).

BOLSHEVISM, *n.* : komiyetî, bolşevîkî.

BOLSTER, *n., vt.* : berpalî, palpişt, berpalk, palpişt kirin.

BOLSTERED, *adj.* : berpalîkirî, palpiştkirî.

BOLSTERING, *n.* : palpiştkirin.

BOLT, *vt.* : revîn.

- **TO ~ A PERSON IN OR OUT** : derî li kesekê girtin.

BOLT, *n.* : sing, sirgî, mêx.

- **FROM THE BLUE** : guhişîna gêjker.

- **UPRIGHT** : rast wek tîrê.

- **TO MAKE A ~ FOR** : bezîn, revîn .

- **TO SHOOT ONE'S ~** : hindî bişêt kirin.

BOLTED, *adj.* : revî, teriqî, tertilî.

BOLTER, *n.* : dobjen.

BOLTHEAD, *n.* : serê bizmarî yan mêxî.

BOLTROPE, *n.* : werîsê dirîna rexên babirekî bo qayimkirinê.

BOLUS, *n.* : parî, hebik yan dêndika çareya nesaxiyê.

BOMB, *n., vt.* : bomba, bombaran kirin.

BOMBARD, *vt.* : bombaran kirin.

BOMBARDIER, *n.* : topçî.

BOMBARDMENT, *n.* : bombarkirin, bordoman, agirbaran.

BOMBARDON, *n.* : alavek mûzîqî yê bayî yê.

BOMBAST, *n.* : ziman yan axiftina fêz yan qebe.

BOMBASTIC(AL), *adj.* : zimanê fêz.

BOMBER, *n.* : bombavêj, bombahavêj.

BOMBIDAE, *n.* : mêşhingivîna gezok.

BOMBINATE, *vi.* : gizgiz kirin.

BOMBING, *n.* : bombardomankirin.

BOMBSHELL, *n.* : bomba.

BOMBSIGHT, *n.* : stêrka bombakirinê.

BOMBYCIDAE, *n.* : kirmê avirmîşî.

BONAFIDE, *adj.* : dilpak, dilqenc, qenc.

BONANZA, *n.* : bextewerî.

BONBON, *n.* : şekirk.

BOND, *n., vt.i.* : qoçan, bendî, pêt, benî, bend, bende, girêdan, girê dan.

- **IN ~** : girtî (li gumrikê).
- **IN ~S** : bendewar (li zindanê).
- **TO TAKE OUT OF ~** : anîn der (ji gumrikê).

BONDAGE, *n.* : bendî, bendîtî.

BONDED, *adj.* : bend, bendîkirî, girtî.

- **WAREHOUSE** : embara gumrikî.

BONDER, *n.* : bend.

BONDERIZE, *vt.* : (bi fosfatê) hinîn.

BONDERIZED STEEL, *n.* : polayê fosfatkirî.

BONDMAID, *n.* : bermalî, carî.

BOND(S)MAN, *n., adj.* : benî, zêrkirî.

BONDPAPER, *n.* : kaxeza senedan, kaxeza spiya nayab.

BOND SERVANT, *n.* = **BONDMAN.**

BOND WOMAN, *n.* : bermalî.

BONE, *n.* : hestî.

- **SETTER** : şkestebend, hestîgirtin.
- **SETTING** : hestîgirî, geldan.
- **TISSUE** : tevnê hestî.
- **TO THE ~** : ta hestî : hemî, temam.
- **WILL NOT MAKE OLD ~S** : dirêj nakit (jî dirêj nabit).

BONE BLACK, *n.* : reşiya hestî.

BONE CHINA, *n.* : kalotê hestî : kalotê spî û nivrohn ko ji xuliya hestî çêdikin.

BONEFIRE, *n.* : agirê ahengê.

BONE HEAD, *n.* : mirovê gewcê rikdar.

BONELESS (MEAT), *n.* : nerme (goşt).

BONE MEAL, *n.* : toza hestî : zibil yan alîfa terşî.

BONER, *n.* : çewtiya kirêt.

BONG, *n.* : zong, lêdana zengilê.

BONG, *vt., n.* : zing kirin, zing.

BONHOMIE, *n.* : nazikî.

BONIFACE, *n.* : xudan otêl yan aşxane.

BONITO, *n.* : texlîtek masî ye.

BONNET, *n.* : kulav, tote, pêşiya mekîneyê.

BONNILY, *adv.* : bi lawî, lawkî.

BONNY, *adj.* : law.

BONTEBOK, *n.* : pezkûvî.

BONUS, *n.* : padaşt, sermûçe, serpare.

BON VIVANT, *n.* : xoşxwara.

BON VOYAGE : oxir bit.

BONY, *adj.* : lawaz, barîk, zirav, qels.

- **LABYRINTH** : lerzeavîk (guh).

BONZE, *n.* : oldarê bûdî nexasme li Japon û Çînê.

BOO, *vi.t.* : qîj kirin.

BOO, *n.* : qîjkirina kirêtkirinê yan neviyanê.

BOOB, *n.* : dîn, gewc, xirpo.

BOO-BOO, *n.* : çewtiya mezin, xirmişîn.

BOOBY, *n.* : xirpo, gewc.

- **HATCH** : dînxane, zîndan.
- **TRAP** : telhe.
- **CAR** : otomobîla mînkirî.

BOODLE, *n.* : bertîl.

BOOK, *n.* : kitêb, pirtûk, reşbelek, nivîsk.

BOOK BINDER, *n.* : bergker.

- **BINDERY** : kargeha bergkirina kitêban.
- **BINDING**, *n.* : kitêbbergkirin.
- **CASE**, *n.* : dolaba kitêban.
- **END**, *n.* : berpalka kitêban.
- **KEEPER**, *n.* : defterdar.
- **KEEPING**, *n.* : defterdarî.
- **OF PSALMS**, *n.* : zebûr.
- **SHOP** : kitêbxane, pirtûkxane.
- **VALUE** : bihayê defterî (li damezranê nivîsî).

BOOKIE, *n.* : nimînendeyê girewan.

BOOKISH, *adj.* : kitêbî.

BOOK JACKET, *n.* : saqoyê kitêbê (berg).

BOOK MAKER : kitêbçêker, pirtûkçêker .

BOOKMAN, *n.* : kitêbfiroş, pirtûkfiroş .

BOOKMARK, *n.* : nîşanker : şerîta di navbera perên kitêbê de.

BOOKMOBILE, *n.* : kitêbxaneya gerok.

BOOK PLATE, *n.* : pîneya kitêbê : nav, xudan û dîr li kitêbxaneyê.

BOOK REVIEW, *n.* : bijarkirina pirtûkê, rexneya kitêbê.

BOOK SELLER, *n.* : kitêbfiroş, pirtûkfiroş .

BOOK SHELF, *n.* : texçika pirtûkan.

BOOK STACK, *n.* : texçikên pirtûkan.

BOOK STALL OR BOOK STAND : kişkê pirtûkan.

BOOK STORE : firoşgeha pirtûkan.

BOOK WORM, *n.* : hezkerê bêqamê xwandinê.

BOOM, *n.* : vegeşî, berfirehî, çalakiya bazirganî, girm, gimî, gumîn, gurmên, girme, avayî.

BOOM, *vt.* : geş bûn, girmên kirin.

BOOMERANGE, *vi., n.* : vedigerît ser dilê xudanî, tîr (çek) ko bi xudanî bi xwe dikevit.

BOOMING, *n.* : avabûn.

BOON, *n., adj.* : merdî, diyarî, pît.

BOONDOGGLE, *n.* : alava destkar, çermewerîsê li dor stûyê dîdevanî.

BOOR, *n.* : cotyar, gundî.

BOORISH, *adj.* : geveze.

BOOST, *n.* : vegeş.

BOOSTER, *n.* : piştgirê perûş, mezinker.

BOOT, *n.* : pêlav, potîn, cezme, lapçîn.

- **BLACK ~** : boyeçî.
- **TO ~** : li ser hindê re.
- **TO GET THE ~** : derxistin (ji karî).
- **TO GIVE SOMEBODY THE ~** : derdixit.
- **TO WIPE ONE'S ~S ON** : kirêt kirin, bêrûmet kirin.

BOOT CAMP, *n.* : serbazgeha meşqî.

BOOTED, *adj.* : pêlavkirî.

BOOTIE, *n.* : kurtepêlav, goreya hiriya vehînayî.

BOOT JACK, *n.* : kerete.

BOOT LACE, *n.* = **SHOE LACE.**

BOOTLEG, *n., adj.* : qeçaxiya meyî.

BOOTLESS, *adj.* : bê tewş.

BOOT LICKING, *n.* : pûsepûs, melaqî.

BOOTS, *n.* : xizmetkarê otêlê.

BOOT TREE, *n.* : qalibê pêlavê.

BOOTY, *n.* : talan, gelahe.

BOOZE, *vi.* : vexwarin (mey).

BOOZE, *n.* : vexwarin (mey).

BOOZY, *adj.* : mest, serxoş.

BOP, *n., vt.* : lêdan, lêdan.

BORA, *n.* : bayek sar zuha ye.

BORACIC, *adj.* = **BORIC.**

BORAGE, *n.* : gewriz, gurz, çawroke.

BORATE, *n.* : xwêya tirşiya borîk.

BORATED, *adj.* : bi xwêya tirşiya borîk têkilkirî.

BORAX, *n.* : tozika spiya belûrî.

BORDEL OR BORDELLO, *n.* : karxane.

BORDER, *n.* : serhed, sinor, tixûb; rade.

- **POINT** : serhed.

BORDER, *vt.i.* : sinor kirin, rex bûn.

BORDERED, *adj.* : radedar.

BORDERER, *n.* : serhedî, akinciyê sinorî.

BORDERLAND, *n.* : devera sinorî, serhed.

BORDERLINE, *n.* : rade.

BORE, *p.* **OF BEAR** : helgirt.

BORE, *vt.i.* : kun kirin, bêzar kirin.

BORE, *n.* : hestîgiran, kun, nikilderek, bêzar.

BOREAL, *adj.* : bayê bakurî, bakurî.

BORED, *adj.* : kunkirî, simitandî.

- **WITH** : canbêzar.

BOREDOM, *n.* : bêzarî, mirûzî, canbêzarî, toq, toqbûn, mirûsî, mirûçî.

BORER, *n.* : simtok, kunker, qolker.

BORIC, *adj.* : hêmaniyê reqê nemetalî.

BORING, *n., adj.* : kunkirin, simitandin, qewartin, mirûç, kolîn, dakolîn, simîn, bêzar, mirûs.

BORINGLY, *adv.* : bi mirûsî, mirûsekî.

BORINGNESS, *n.* : mirûsîtî.

BORN, *adj.* : zayî, zak, bûyî.

BORNE, *pp.* **OF BEAR** : helgirtî.

BORON, *n.* : boron : hêmanek req ne metalî.

BOROUGH, *n.* : bajêr, herêm.

- **DIRECTOR** : herêmdar.

BORROW, *vt.i.* : qer kirin.

BORROWED, *adj.* : xwaza, xwaste.

BORROWER, *n.* : qerker, xwazer.

BORROWING, *n.* : qerkirin, xwastin.

- **SHOP** : xwaze, xwastingeh.

BORT, *n.* : elmasa xirab yan şkestî.

BORZOI, *n.* : seyê gur(k)şeqîn.

BOSKAGE, *n.* : dehil, teraş.

BOSKY, *adj.* : dehlî, teraşdar.

BOSOM(S), *n.* : sing, pêsîr, memik, paşil, paxil, baxel, baweş.

BOSOM BUDDY, *n.* : destbira.

BOSOMY, *adj.* : memikbel.

BOSH, *n.* : pûç, kelevajî.

BOSS, *n., adj.* : serdar, serkar, kardar, kargêr, sing.

BOSS, *vt.* : ferman kirin

BOSSY, *adj., n.* : zorkar, çêl, golik, koqiz, xemilandî (bi qopçeyan).

BOSTON CREAM PIE, *n.* : kadeya Bostin : kiloca nîvişkirî.

BOSTON IVY, *n.* : mêwa sêbelg.

BOSTON TERRIER OR BULL, *n.* : seyê Bostin : seyek biçûk mû nerm û kurt e.

BOSWELL, *n.* : jînname nivîserê hevalan.

BOT(T), *n.* : kirmokeyê mêşî.

BOTANIC(AL), *adj., n.* : giyayî, helezî.

BOTANIST, *n.* : heleznas, roknas.

BOTANIZE, *vi.t.* : helez kom kirin yan xwandin.

BOTANIZED, *adj.* : helezxwandî.

BOTANIZING, *n.* : helezxwandin.

BOTANY, *n.* : heleznasî, roknasî, rokzanî, rowekzanî, şînewerzanî, şînatîzanî.

BOTCH, *n.* : pinî.

BOTCH, *vt.* : pinî kirin.

BOTCHER, *n.* : pinî.

BOTCHY, *adj.* : pinîkirî.

BOTFLY, *n.* : texlîtek mêş e.

BOTH, *adj., adv., pron., conj.*, pêkve, her du.

BOTHER, *vt.i.* : perîşan kirin, şepirze kirin, enirandin.

BOTHER, *n.* : perîşanbûn.

BOTHERATION, *n.* : perîşankirin.

BOTHERING, *n.* : cariskirin, perîşankirin, tengavkirin.

BOTHERSOME, *adj.* : perîşandar.

BOTRYOID(AL), *adj.* : îşiyî.

BOTTLE, *n.* : butil, dunav, şûşe, meşk.

- **CLUB** : yaneya şûşeyî : her mey pêşkêş kirin.

BOTTLED, *adj.* : girtî, kirî nav butlî de(butilkirî).

BOTTLENECK, *n., adj.* : tengî, tengavî, gîro.

BOTTLING, *n.* : butilkirin : kirina nav butlî de, girtin.

BOTTOM, *n., adj.* : jêr, bin.

- **OF THE HEART** : naxî dil, germiya dilî.

BOTTOMLESS, *adj.* : bê bin.

BOTTOMLESSLY, *adv.* : bi bêbinî, bêbinkî.

BOTTOMLESSNESS, *n.* : bêbinîtî.

BOTTOMMOST, *adv.* : jêrtir(în).

BOTTOMRY, *n.* : belêneya girewkirina gemiyê.

BOTULISM, *n.* : jehirbûn (ji xwarina goşt yan masiyên genî yan rizî).

BOUGAINVILLAEA, *n.* : helezek keprikî emerîkanî ye.

BOUGH, *n.* : çiq, liq, lik, şirtik.

BOUGHT, past of buy : kirî.

BOUGHTEN, *adj.* : kirî (ne li mal çêkirî).

BOUGIE, *n.* : mom, fitîl.

BOUILLABAISSE, *n.* : şorbe yan giraza masiyan.

BOUILLON, *n.* : şorbe yan giraza rohn.

BOULDER, *n.* : kevir, ber(mezin), al, tat, teht, helan.

BOULE, *n.* : civata pîran yan nimînenderan (li nik Girekan).

BOULEVARD, *n.* : kolan, rêya darkirî, kolana bidar.

BOUNCE, *vi.t.* : hilavêtin, vegerîn, derxistin.

BOUNCED, *adj.* : hilavêtî.

BOUNCE, *n.* : hilavêtin, bazdan, fortekî, perûşî, nişkî, derxistin, çalakî, çelengî.

BOUNCER, *n.* : derewa mezin, derewker, fortek, derxistinkar, tiştê mezin.

BOUNCILY, *adv.* : bi lîtikî, bi çalakî, bi çelengî, bi şadî, lîtkiyekî.

BOUNCING, *adj.* : hilavêtin, bazdan, qayim, xurt, çalak, fortek, qelew (saxlem), ejdeha.

BOUNCY, *adj.* : şad, perûş, nerm, vegerîn.

BOUND, *n.* : pabend, firqas.

- **BY LEAPS AND ~** : zû, bi lez.

- **IN ~S** : vekirî (destûr heye biçin navda).

- **OUT OF ~S** : girtî ye (destûr nîne).

BOUNDARY, *n.* : serhed, merz, sinor, tixûb.

BOUNDER, *n.* : mirovê şadê tiranekerê bêrewişt.

BOUNDLESS, *adj.* : bêsinor, bêrade.

BOUNDLESSLY, *adv.* : bêsinorkî, bêqamkî.

BOUNDLESSNESS, *n.* : bêsinorîtî.

BOUNTEOUS, *adj.* : dilvera, destfireh, merd, camêr, ciwamêr.

BOUNTEOUSLY, *adv.* : bi destfirehî.

BOUNTEOUSNESS, *n.* : destfirehîtî, dilverayîtî.

BOUNTIFUL, *adj.* : destfire, têrnan.

BOUNTY, *n.* : pît, xêrkarî, camêrî, destfirehî, dilverayî.

BOUQUET, *n.* : çepik, gurz.

BOURBON, *n.* : wiskî.

BOURG, *n.* : bajêr, birc.

BOURGEOIS, *n., adj.* : endamê çîna navî, dikandar, sermayedar.

BOURGEOISIE, *n.* : çîna navî, sermayedarî, borciwazî.

BOURGEOSIFICATION, *n.* : borciwazîkirin.

BOURGEOSIFY, *vt.* : borciwazî kirin.

BOURN(E), *n.* : celal, armanc, tûxîb, cîhanek.

BOURSE, *n.* : borse.

BOURTREE, *n.* : (xabor) : texlîtek tiya reş yan gir.

BOUSE, *vt.* : kêşan (bi dartûn û werîsan).

BOUSE, *n., vt.i.* : şeraba mestî, şadiya têrqîj.

BOUSING, *n.* : kêşan.

BOUSTROPHEDON, *n., adj.* : bêqam vedixwit (mey).

BOUT, *n.* : kaye, nobe.

BOUTIQUE, *n.* : firoşgeha cilên jinan.

BOUTONNIERE, *n.* : gula bersîngî.

BOVID, *adj.* : pêwendîdarê çêlan.

BOVINE, *adj., n.* : ga, wek gayî, xirpo.

BOW, *n.* : kevan, kewane.

- **AND ARROW** : tîr û kevan.

- **MAKER** : kevan çêker.

- **TO HAVE TWO STRINGS TO ONE'S ~** : ko mirovî jî melhezekê pitir hebit.

BOW, *vi.t.* : çemîn, çemandin.

- **TO ~ OUT** : paşve çûn (derve, wêve).

BOW COMPASS, *n.* : pergalê kevaneyî.

BOWDLERIZED, *adj.* : bijarkirî.

BOWDLERIZING, *n.* : bijarkirin.

BOWED, *adj.* : çemayî, çivandî, daçemandî.

- **HEAD** : sernixon, serbejêr, serçemandî.

BOWEL(S), *n.* : hinav, rûvîk, ûr, pizûr.

BOWER, *n.* : kepir, lenger, war.

BOWERY, *adj., n.* : kepirkî.

BOWFIN, *n.* : masiyek rûbarî emerîkanî ye.

BOWHEAD, *n.* : nehengê deryayê cemserê bakur.

BOWIE KNIFE, *n.* : kêrika mezina dirêja kalandar.

BOWING, *n.* : çivandin, çemandin, çokdan, rûxistin, kirnoşî.

BOWKNOT, *n.* : girêka werîsî.

BOWL, *n.* : dîzik, teşt, legen, kodik, tirar, sekre, taş, dolik, firaq, lalîk, tepik (bawling).

BOWL, *vt.i.* : tepk girêl kirin (bawling kirin).

BOWLDER, *n.* = **BOULDER**.

BOWLEG, *n.* : lingkevan.

BOWLEGGED, *n.* : lingkevanî.

BOWLER, *n.* : şefqeyek reş û girûvir e.

BOWLINE, *n.* : werîsê babirekê gemiyê.

BOWMAN, *n.* : tîrbaz, tîrhavêj.

BOWMAN'S CAPSULE, *n.* : pordanka bomanî.

BOW OAR, *n.* : şelbiya berahiyê.

BOW PEN, *n.* : pergarê xameyî.

BOW SAW, *n.* : xîzara kevaneyî.

BOWSE, *vt.* : rakirin (bi dartûnî û werîsî).

BOWSPRIT, *n.* : stûnê xwehrê li berahiya gemiyê.

BOW STRING, *n.* : jih, jehê kevanê.

BOW TIE, *n.* : bendika pelpelîtkî.

BOW WINDOW, *n.* : pencerka kevaneyiya derhatî.

BOW WOW, *n.* : rewîn.

BOWYER, *n.* : kevanvan, kevançêker.

BOX, *n.* : sindoq, qotî(k), qoto.

- **CAMERA** : kamêreya sindoqî.
- **IN A ~** : tengav.

BOX, *vt.i.* : kulm lêdan, kulmbazî kirin.

- **TO ~ OFFICE** : dabeş kirin jorîkan.
- **TO ~ UP** : girtin yan nahêlan ko derkevit.

BOX CALF, *n.* : çermê golikî.

BOXCAR, *n.* : barkêşa sindoqî.

BOXCOAT, *n.* : saqoyê hajoyî.

BOXER, *n.* : kulmbaz, kulmlîz, mistbaz.

BOXING, *n.* : kulmbazî, kulmlîzî, kulmanê, mistbazî.

- **DAY** : roja diyariyan (26 çileyê pêşî, roja piştî kirismisê (Noelê)).

BOXING GLOVE, *n.* : lepika kulmbaziyê.

BOX KITE, *n.* : firfiroka sindoqî.

BOXLIKE, *adj.* : sindoqî, wek sindoqê.

BOX OFFICE, *n.* : pencerka pisoleyan.

BOX SCORE, *n.* : kurtî, encam yan kurtiya pêkan.

BOX SEAT, *n.* : rûnişteka hajoyî.

BOX STALL, *n.* : tek pawan : pawana çarçikî bo hespekê.

BOX THORN, *n.* : tudirrik, tutirk, muxeylan.

BOX WOOD, *n.* : darê sindoqî.

BOXY, *adj.* : sindoqî.

BOY, *n.* : kur, kurik, law(ik).

- **PUBESCENT ~** : pişkurî.

BOYAR(D), *n.* : xanedanek Rûs.

BOYCOTT, *n.* : birrîn (pêwendî).

BOYFRIEND, *n.* : hevalkê keçikê, heval.

BOYHOOD, *n.* : kurkînî.

BOYISH, *adj.* : kurkî.

BOYLE'S LAW, *n.* : qanûna Boylî.

BOY SCOUT, *n.* : kurkê dîdevan.

BRA = BRASSIER.

BRABBLE, *n.* : cirecir.

BRABBLE, *vi.* : cirecir kirin.

BRACE, *n.* : toq, berpalk.

BRACE, *vt.i.* : qayim kirin, çalak kirin, xurt kirin.

BRACELET, *n.* : bazin(k), zendik.

BRACER, *n.* : parêzerê destî (tîrbazî), xurtker, her tiştê hişyarker.

BRACHIAL, *adj.* : zendikî, destî.

- **ARTERY** : sordemarê milî (şanî).
- **VEIN** : şîndemarê milî (şanî).

BRACHIALGIA, *n.* : demarjana milî.

BRACHIATE, *adj.* : çiqcot.

BRACHIO-, *pref.* : pêşgir e ko dest e, zend e.

BRACHIUM, *n.* : bask.

BRACHY, *adj.* : kurt.

BRACHYCEPHALIC, *adj.* : serkurt.

BRACHYCRANIC OR BRACHYCRANIAL, *adj.* : kiloxkurt.

BRACHYCRANY, *n.* : kiloxkurtî.

BRACHYDACTYLOUS, *adj.* : tilkurt.

BRACHYDACTYLY, *n.* : tilkurtî.

BRACHYPTEROUS, *adj.* : çeng yan bal kurt.

BRACHYURAN, *n.* : dûvkurtî.

BRACHYUROUS, *adj.* : dûvkurt.

BRACING, *adj.* : qayimker, azaker, xurtker.

BRACKEN, *n.* : dehil.

BRACKET(S), *n.* : milik, kevane.

BRACKISH, *adj.* : kevzî, sîr, şor.

- **WATER** : tehlîsk.

BRACKISHNESS, *n.* : şorîtî.

BRACT, *n.* : belge qepûçkî yan baskê gulê.

BRACTEAL, bracteate, bracted, *adj.* : belgdar.

BRACTEOLE OR BRACTLET, *n.* : belg.

BRAD, *n.* : bizmar (zirav), mêx, mîx.

BRADAWL, *n.* : kunker (bo qutana bizmaran).

BRADYCARDIA, *n.* : nişîva zîrî.

BRAE, *n.* : pesarê zîrî.

BRAG, *n., adj.* : fêz, rûreq, zirt.

BRAG, *vit.* : pesin kirin, zirt kirin.

BRAGGART, *n.* : fortek.

BRAGGED, *adj.* : zirtkirî.

BRAGGING, *n.* : fortekî, helat.

BRAHMAN, *n.* : gewher û giyanê balayê hebûnê (jîrzaniya Hindosî), xuyê bala, Birahma.

BRAID, *n.* : kezî, gulî, vehînk.

BRAID, *vt.* : vehînan.

BRAIDED, *adj.* : vehînayî, kezîkirî, vehandî, rîsiyandî.

BRAIDING, *n.* : vehandin, hunandin, kezîkirin

BRAILLE, *n.* : Rêbaza Birêl : nivîsîn bo koreyan.

- **WRITER** : tîp nivîsa Birêl.

BRAIN, *n.* : mejî, mejû, mêşik, mêjelak.

- **CASE** : mejîdank.

- **CHILD** : hizra mirovî.

- **NERVES** : rihên mejî.

- **HAEMORRAGE** : rîsîna mejî.

- **PAN** = **BRAIN CASE.**

- **POWER** : şiyana mejî.

- **SICK**, *n.* : dîn.

- **STEM** : mejiyê stûyî.

- **STORM** : gava dînê, hizrek nişkî şehreza.

- **TRUST** : desteka pisporan.

- **WASH**, *n., vi.* : şûştina mejî, mejî şûştin.

- **WASHING** : mejî şûştin.

- **WAVE** : pêla mejî.

BRAININNESS, *n.* : jîrî.

BRAINLESS, *adj.* : xirpo, bê mejî.

BRAINLESSLY, *adv.* : bêmejîkî.

BRAINLESSNESS, *n.* : bêmejîtî.

BRAINY, *adj.* : jîr.

BRAISE, *vt.* : qelandin.

BRAISED, *adj.* : qelandî.

BRAISING, *n.* : qelandin di nav qazanek girtî de.

BRAKE, *n.* : girtok, westîner.

- **HORSE POWER** : hêza hespî ya girtokî.

BRAKE, *vt.* : girtin (bi girtokî), rawestandin.

BRAMBLE, *n.* : tutirk, tudirrik, dirrî, devî, dirrik, stirî, tureşk.

BRAMBLY, *adj.* : tutirkî.

BRAN, *n.* : kepek, pîne.

BRANCH, *n.* : liq, çiq, çiqil, ta, şax, şirtik, lik, peyîn, pejin.

- **SMALL ~** : pejalok, pejik.

BRANCH, *vt.i.* : çiq dan, du rê bûn.

BRANCHED, *adj.* : çiqkirî, çiqdar, liqdar.

BRAKED, *adj.* : girtî, rawestandî.

BRAKELESS, *adj.* : bê girtok.

BRAKING, *n.* : girtin, rawestandin.

BRANCHIA, *n.* : guhmasî.

BRANCHIAL, *adj.* : ximximkî.

BRANCHIATE, *adj.* : ximximkdar.

BRANCHIPPED, *n., adj.* : pê ximximk.

BRANCHLET, *n.* : çiqik.

BRANCHY, *adj.* : çiqî.

BRAND, *n.* : dax, kemçe, dirf, pêt, texlît.

BRAND, *vt.* : dax kirin.

BRANDED, *adj.* : daxkirî.

BRANDING, *n.* : kemçekirin, daxkirin.

- **IRON** : asinê daxkirinê.

BRANDISH, *vt.* : gef kirin (bi şûrî).

BRANDLING, *n.* : kirme sorik (timlokê masiyan).

BRAND-NEW, *adj.* : temam nû.

BRANDY, *n.* : birandî.

BRANKS, *n. pl.* : lixavê şetahan : texlîtek lixavê kevnê sizakirina jinên zimandirêj yan şetah.

BRANNIGAN, *n.* : lêketin, keyfa girêçî.

BRANNY, *adj.* : pîneyî.

BRANT, *n.* : qaza bejî.

BRASH, *n., adj.* : rûqayim, leşêşî, taviyek baran, şkestok, hol.

BRASIER, *n.* = **BRAZIER.**

BRASS, *n., adj.* : sifr, misê zer, pirinc.

- **BAND** : tîpa mûzîqeya pirincî.

- **BOUND** : rûqayim, perwaz, pirinc, rikdar, kevneperist.

- **HAT** : efserê mezin, payedar.

BRASSAGE, *n.* : baca dirav lêdan.

BRASSARD, brassart, *n.* : zirêya destî.

BRASSIERE = BRA, *n.* : memikbend, pêsîrgir, memikdan.

BRASSILY, *adv.* : bi rûqayimî.

BRASSINESS, *n.* : rûqayîmîtî.

BRASS TACKS, *n. pl.* : rastî, rastiyên, binyat.

BRASSWARE, *n.* : amanên pirinc.

BRASS WINDS, *n.* : alavên misiyên mûzîqî.

BRASSY, *adj.* : misî, reng mis, rûqayim.

BRAT, *n.* : zaro, nexasme zaroyê bîjî.

BRATTICE, *n.* : cudaker (dar yan perûk) li kangehê.

BRATTLE, *n.* : şingîn.

BRATTLE, *vt.* : şingîn kirin.

BRATTLED, *adj.* : şingînkirî.

BRATTLING, *n.* : şingînkirin.

BRAVADO, *n.* : zirtok.

BRAVE, *n., adj.* : wêrek, aza, mêrxas, wêrok, merd, cindî, dilêr, lok, keleman, şêrdil, şevînger, çavqayim, egîd, mêr, wêra, serbest, rêzdirr.

BRAVE, *vt.* : wêrîn.

BRAVED, *adj.* : wêrayî.

BRAVELY, *adj.* : dilêrane, bi azayî, bi wêrayî, merdane, bi wêrekî.

BRAVERY, *n.* : dilêrî, mêrxasî, azayî, bokeyî, wêran, lehengî, wêrîn, zat, camêrî, merdayî, mêranî.

BRAVING, *n.* : wêran.

BRAVO, *n.* : sehet xweş! kujê kirêgirtî.

BRAVO, *vt.* : pesin kirin.

BRAVURA, *n.* : awaza şehrezaya mûzîqî.

BRAWL, *n.* : cerenîx, gelc, lêketin, çirt, hera.

BRAWL, *vi.* : cerenîx kirin.

BRAWLER, *n.* : gelcgîr.

BRAWLY, *adj.* : gelcgîrî.

BRAWN, *n.* : zeblek, masûlke.

BRAWNY, *adj.* : xurt, zeblekî, masûlkeyî, nêrdar.

BRAY, *vt.i., n.* : zir, zirîn.

BRAYER, *n.* : zirker.

BRAYING, *n.* : zirîn.

BRAZE, *vt.* : pirinc kirin, lehîm kirin.

BRAZED, *adj.* : lehîm kirî.

BRAZEN, *adj.* : rûqayim, gewc, req.

BRAZENLY, *adv.* : bi reqî, bi rûqayimî, bi gewcî.

BRAZIER, *n.* : hebeşk, meqelî.

BREACH, *n., vt.i.* : delaqe, qanûn yan soz şikandin, soz şikandin, peyiv şikandin, qanûn yan belên şikandin.

BREACH OF CONTRACT, *n.* : belên yan peyiv şikandin.

BREACH OF FAITH, *n.* : peyiv yan bawerî şikandin.

BREACH OF PROMISE, *n.* : peyiv şikên.

BREAD, *n.* : nan, sewik.

- **BUTTERED ON BOTH SIDES** : xweşî, lêhatî.
- **TO BREAK ~** : lexrînî şikandin.
- **TO KNOW WHICH SIDE ONE'S ~ IS BUTTERED ON** : berjewendiya xwe zanîn.

BREAD AND BUTTER, *n.* : nanê nîvişkirî. Jiyarî.

BREAD-AND-BUTTER, *adj.* : kirdarî, nanxwer, herzalî.

BREAD AND CHEESE, *n.* : besatiya nanî.

BREAD AND WINE, *n.* : şîva Xudayî yan Xudawendî.

BREAD BAKING ROD, *n.* : tîr.

BRED STUFF, *n.* : genim, ar(d), nan.

BREAD TIN, *n.* : sê(h)l.

BREAD BASKET, *n.* : sebeta nanî.

BREAD FRUIT, *n.* : mêweyî nanî.

BREADTH, *n.* : pehnî, panî, firehî, berpan.

BREADTH WAY(S), *adv.* : bi panî, panekî.

BREAD WINNER, *n.* : nander.

BREAK, *n.* : şikandin, şikestin, piçir, navbirr, navibirrî.

BREAK, *vt.i.* : şikandin.

- **TO ~ AWAY** : veqetîn, berdan, cuda bûn.
- **TO ~ FASTING** : roj̃î şikandin.
- **TO ~ UP** : şkestin, şikandin, pelixîn, pelixandin.
- **TO ~ CAMP** : konî rakirin û çûn.
- **TO ~ EVEN** : kar bê havil û bê dorandin berpê kirin.
- **TO ~ DOWN** : şkestin, herifin, xirab bûn.
- **TO ~ FREE OR LOOSE** : revîn, verestin.
- **TO ~ GROUND** : kêlîn, dest bi kar kirin.
- **TO ~ THE ICE** : dest pê kirin (sariyê nerm kirin).
- **TO ~ IN** : dan jor, birrîn (axiftinê).
- **TO ~ OFF** : rawestîn.
- **TO ~ OPEN** : vekirin.
- **TO ~ OUT** : dest pê kirin (şerî).
- **TO ~ THROUGH** : têre çûn.
- **TO ~ WIND** : fis kirin.
- **TO ~WITH** : şer kirin.

BREAKABLE, *adj.* : şikestinbar, şikestok.

BREAKAGE, *n.* : şikestin, daşikandin.

BREAK AWAY, *n.* : berbûn, cudabûn.

BREAKDOWN, *n.* : şikestin, hilşîn, hilweşîn, herifîn.

BREAKER, *n.* : şikên.

BREAKFAST, *n.* : taşt, lexrînî, xurînî, bertêşt, sertêşt, parêv.

BREAKFAST, *vi.t.* : taştî kirin, lexrînî şikandin.

BREAKING, *n.* : şikandin, daşikandin, şikest, pijilî, bizdîn.

CHARLATANRY, *n.* : cerbezî.

CHARLE'S WAIN, *n.* : hirça mezin.

CHARLESTON, *n.* : texlîtek sema ye, govend e.

CHARLEY HORSE, *n.* : jan yan reqbûna dest yan pêyî.

CHARLOCK, *n.* : xerdelk.

CHARLOTTE, *n.* : şirînatî.

CHARM, *n., vt.i.* : hestîsivikî, tazeyî, bazbend, daylan, destbend, nêreng, delalî, niviştî, nûştî; dilgir kirin, cadû kirin.

CHARMED (BY), *adj.* : şeyda, dêwane.

CHARMER, *n.* : jina ciwan, cadûbaz.

CHARMING, *adj.* : razirav, dilber, hestî sivik, qeşeng, sivikcan, delal, keleş, daylan.

CHARMINGLY, *adv.* : bi qeşengî.

CHARPOY, *n.* : çarpa.

CHARQUI, *n.* : qeliya goştê çêlê.

CHARRED, *adj.* : sotî (bûyî reji), xizmet karîkirî.

CHARRING, *n.* : sotandin, xizmetkarî kirin.

CHART, *n., vt.* : nexşe, nexşe kirin.

CHARTACEOUS, *adj.* : kaxezî.

CHARTER, *n.* : nazyarî, destûr, belên, mafên nivîsî.

CHARTERED ACCOUNTANT, *n.* : jimêryarê qanûnî.

CHARTISM, *n.* : seretayên xebata çakirina civakî li înglîzistanê : belgenameyîtî.

CHARTIST, *n.* : xebatker bo seretayên çakirina civakî (belgenamevan).

CHARTIST, *n.* : nexşker, pisporê bazarê kaxezên darayî.

CHARTULARY, *n.* = **CARTULARY.**

CHARWOMAN, *n.* : xidam (bi roj bo paqijkirinê).

CHARY, *adj.* : şermîn, wurya, hişyar.

CHASE, *n., vi.* : şeqandin, beredan, şeqîn, dûv keftin, diberditê, xemilandin, beredan.

CHASER, *n.* : şeqînker.

CHASING, *n.* : şeqandin, dûvketin, şeqîn, beredan.

CHASM, *n.* : kurtal.

CHASMOPHYTE, *n.* : helezê kevrî.

CHASSIS, *n.* : peykerê metalî.

CHASTE, *adj.* : bê gunehî, pak, dawpak, pakbîn, rûspî.

CHASTEN, *vt.* : siza kirin, hêsan kirin, pak kirin, sade kirin, hîn kirin.

CHASTENED, *adj.* : pakirî.

CHASTENER, *n.* : paker.

CHASTENESS, *n.* : pakî, sadeyî.

CHASTENING, *n.* : pakirin.

CHASTISE, *vt.* : siza kirin, lêdan.

CHASTISED, *adj.* : sizakirî.

CHASTISEMENT, *n.* : siza, lêdan.

CHASTISING, *n.* : sizakirin.

CHASTITY OR CHASTENESS, *n.* : pakî, rûspîtî, keçînî, narînî, pakbûn.

CHASUBLE, *n.* : kirasê oldarî.

CHAT, *n., vi.* : çelte, çenebazî; pûçbêjî, axiftin, çenebazî kirin.

CHATOYANT, *adj.* : teyisîn guhor (wek çavê kitkê li tariyê).

CHATTED, *adj.* : pûçbêjîkirî, çenebazîkirî.

CHATTEL, *n.* : cilûmil, xirûmir, zêrkirî, kelûpel, bende, benî, kole.

CHATTER, *vi.t.* : pitat, çelte, çenebazî, qerçî, gale-gal, pirbêjî.

- **BOX** : çenebaz, pirbêj.

CHATTING, *n.* : pûçbêjî yan pirbêjîkirin, çenebazîkirin.

CHATTY, *adj.* : pirbêj, çenebaz.

CHAUFFEUR, *n.* : hajo, ajo.

CHAUVINISM, *n.* : şovînî, demargirî, gelgirtî, dij neteweyek dî, netewe peristiya dijwar.

CHAUVINIST, *n., adj.* : şovenî, demargir.

CHAUVINISTIC, *adj.* = **CHAUVINIST.**

CHAUVINISTICALLY, *adv.* : demargîrekî, şovîniyekî.

CHAW, *n., vt.i.* : cîtin.

- **BACON** : gundî, gelho.

CHEAP, *adj., adv.* : erzan, herzan, kot, bed.

- **JACK** : bazirganê pertalê erzan.

- **SKATE** : çikûs.

- **TO FEEL ~** : şermizar bûn.

- **TO HOLD SOMETHING ~** : kirêt kirin, sivik dîtin.

CHEAPEN, *vt.i.* : erzan kirin.

CHEAPENED, *adj.* : erzankirî.

CHEAPISH, *adj.* : piçekê erzan.

CHEAPISHLY, *adv.* : erzanekî.

CHEAPLY, *adv.* : bi erzanî.

CHEAPNESS, *n.* : erzanîtî.

CHEAT, *n.* : dek, tepo, virr, fêlbaz, dekekar, çivo, ewan, lêbok, hevan.

CHEAT, *vt.* : fêlbazî kirin.

CHEATER, *n.* : fêlbaz, çivo, kose.

CHEATING, *n.* : zexelî, labandin, gizî, dilxapî.

CHECK, *n., vt.i.* : gîrdan, rast kirin.

- **IN ~** : tepeserkirî, desteserkirî, bendekirî.

- **TO ~ IN** : gihan belafirê an otêlê (û navê xu di nivîsîn).

- **TO ~ OFF** : jimarê nîşan kirin.

- **TO ~ OUT** : mirin, pareyên otêlê dan û derkeftin.

- **TO ~ UP** : seh kirin, dîtin.

CHECK (CHEQUE), *n.* : çek, çan.

CHECKBITE, *n.* : leqa azmûnî yan sehkirinê (didansazî).

CHECK BOOK, *n.* : deftera çekan.

CHECKED, *adj.* : rûçavkirî, çargoşekirî.

CHECKER, *n.* : dame, şetrenc.

CHECKERBERRY, *n.* : çaya keneda.

CHECKERBOARD, *n.* : dame.

CHECKERED, *adj.* : çendreng, çargoşekirî.

CHECKERS, *n.* : dame.

CHECKING, *n.* : lêkolîn, rûçavkirin.

CHECKMATE, *vi., n.* : şahî kiş kirin, kişkirina şahî (şetrenc).

CHECKPOINT, *n.* : berbestê pişkinînê.

CHECKERIN, *n.* : kurte lixav yan hevsar.

CHECKROOM, *n.* : jora sipartinê.

CHECK ROW, *n.* : rêza daran yan helezan ko erdê çargoşe dikit.

CHECK UP, *n.* : sehkirin nexasme sehkirina giştiya leşî.

CHEDDAR, *n.* : penîrê req (spî yan zer).

CHEEK, *n.* : serê rûyî, gep, rû, lam, hinark, gewcî.

CHEEK-BONE, *n.* : hinark, hestiyê rûçikî.

CHEEKILY, *adv.* : bi rû qayimî, rûqayimekî.

CHEEKY, *adv.* : rûqayim.

CHEEP, *n.* : çivte çivt, çivandin.

CHEEPER, *n.* : çivteçivtker, cirîwe.

CHEEPING, *n.* : cirîw.

CHEER, *vt.i.* : dilxoş kirin.

- **UP!** : xem nekit, ne qehire!.

- **TO ~ ON** : xurt kirin.

- **WHAT ~ ?** : tu çewanî ?.

CHEERFUL, *adj.* : dilgeş, şad, keyfxoş, rûgeş.

CHEERFULLY, *adv.* : bi şadî.

CHEERFULNESS, *n.* : rûgeşî, ruxoşî.

CHEERLESS, *adj.* : bê xoşî, bê şadî.

CHEERLESSLY, *adv.* : bêxweşiyekî.

CHEERLESSNESS, *n.* : bêxweşîtî.

CHEERLY, *adv.* = **CHEERFULLY.**

CHEERS! "**DRINKING**" : enoş, nûşî can!, nûş(e)can!.

CHEERY, *adj.* : şad, keyfxoş.

CHEESE, *n.* : penîr.

- **BURGER** : kade yan kesmeya penirî.

- **CAKE** : kiloca penîrî.

- **FLAVOURED** : jaji.
- **PARING** : rijd.
- **SWEET** : firo.

CHEESE, *vt.* : radiwestînit.

CHEESY, *adj.* : penîrî.

CHEETAH, *n.* : şîp, piling.

CHEF, *n.* : girarpêj.

CHELA, *n.* : çingal, penc (kêvjal), şagirdê hînkerê oliyê hindî.

CHELATE, *vt.* : çingalî yan xelekî kirin.

CHELATE(D), *adj.* : çingalî, pencî, xelekîkirî.

CHELATING, *n.* : xelekîkirin.

CHEESED, *adj.* : rawestandî.

CHEESINESS, *n.* : penîrîtî.

CHEESING, *n.* : rawestandin.

CHELONIA, *n.* : kîsel.

CHELONIAN, *adj., n.* : kîsel(e), kîselî.

CHEM(O)-, *pref.* : pêşgir e ko kîmya ye, kîmyayî ye.

CHEMIC, *adj.* : kîmyayî.

CHEMIC(AL), *adj.* : kîmyayî.

- **ENGINEERING** : endaziyariya kîmyayî.
- **WAR FARE** : şer yan cengê kîmyayî.

CHEMICALLY, *adv.* : kîmyayiyekî.

CHEMISE, *n.* : bin kirasê firehê jinê.

CHEMISETTE, *n.* : kumlek.

CHEMISM, *n.* : kîmyayîtî, endaziyarî ya kîmyayî.

CHEMIST, *n.* : kîmyager, kîmyazan.

CHEMISTRY, *n.* : kîmya, kîmyazanî.

CHEMOSYNTHESIS, *n.* : pêkhînana kîmyayî.

CHEMOTAXIS, *n.* : rakêşana kîmyayî.

CHEMOTAXONOMY, *n.* : polêna helez û caneweran li ser binyata pêkhatiya kîmyayî.

CHEMOTHERAPY, *n.* : dermankirina kîmyayî.

CHEMOTROPISM, *n.* : werarbûna kîmyayî.

CHEMURGY, *n.* : liqek ji kîmyaya rahînaniyê (bi kar înana xavên endamiyên helezan bo pîşesaziyê).

CHEQUE, *n.* : çekê diravî.

CHEQUER, *n., vt.* = **CHECKER.**

CHEQUERED, *adj.* = **CHECKERED.**

CHEQUERED BOARD, *n.* = **CHECKER BOARD.**

CHEQUERS, *n.* = **CHECKERS.**

CHERISH, *vt.* : xudan kirin, nazdar kirin, bihadar kirin.

CHEROOT, *n.* : texlîtek cigare ye.

CHERRY, *n.* : kerez, belalok, alobalo, gêlaz, kêlas, gilyaz.

- **PLUM** : alobal.
- **TREE** : dargêlas, dara gêlasê.
- **WOOD** : dargêlas, darê gêlasê.

CHERSONESE, *n.* : nîv girav.

CHERT, *n.* : kevrek beristeyî nebijîne(çêrt).

CHERTY, *adj.* : pêwendîdarê kevrê nebijîn(çêrtî).

CHERUB, *n.* : firîşte, perî.

CHERUBIC, *adj.* : firîşteyî.

CHERUBICALLY, *adv.* : firîşteyekî.

CHERVIL, *n.* : medenos (Ewropî).

CHESS, *n.* : kişk, şetrenc, şaxmat.

- **BOARD** : kiş, depkê şetrencê.

CHESS MAN, *n.* : kiş, berkê şetrencê.

CHEST, *n.* : sîng, sindoq.

- **CAVITY** : pêsîr.
- **OF DRAWERS** : dolaba çend sindoq.

CHESTERFIELD, *n.* : palto, qenepeyek dirêj.

CHESTER WHITE, *n.* : berazek spî ye.

CHESNUT, *n.* : şahber(r)û.

- **HORSE** : şê.

CHESTY, *adj.* : xudîtî.

CHEVAL GLASS, *n.* : xudîka dirêja veweşîn.

CHEVALIER, *n.* : çak siwar.

CHEVILLE, *n.* : kilîla kevanceyê.

CHEVIOT, *n.* : pezê têr hirî, tevnê vê hiriyê.

CHEVRON, *n.* : nîşana payeya leşkerî.

CHEVY = **CHIVY.**

CHEW, *vt.i.* : cîtin, cûtin.

CHEW, *n.* : cîtin, loçikandin.

CHEWING, *n.* : cîtin, cotin, kotin, loçikandin, cûtin.

CHEWING GUM, *n.* : benîşt, qaçik, mistekî.

CHEWINK, *n.* : çûçikek emerîkanî ye.

CHIAROSCURO, *n.* : rohn û tarîtî (wêne).

CHIASMA, *n.* : xaçbûn (nexasme hevbirrîn yan xaçbûna dîtinê).

CHIBOUK, *n.* : baskê dirêjê cigare kêşanê.

CHIC, *n.* : law, taze, ciwanpûş.

CHICALOTE, *n.* : helezek meksîkî ye.

CHICANE, *vi.t.*, *n.* : xapandin.

CHICANED, *adj.* : xapandî.

CHICANERY, *n.* : xapandin, fêlbazî, dilxapî, labandin.

CHICK, *n.* : çîçelok, têşka balindeyî.

CHICKAREE, *n.* : sivoreyê emerîkanî .

CHICK(S), *n.* : çûçik, çîçelok, têşka balindeyî, çêlî, beç, cûcik.

CHICKEN, *n.* : mirîşk, mamir.

- **FEED** : kêm, bêbiha.

- **HEARTED** : tirsinok.

- **POX** : mîrkute, mêkute.

CHICKEN, *vt.* : tirsîn, tirsandin.

CHICKEN BREAST, *n.* = **PIGEON BREAST.**

CHICKEN CHOLERA, *n.* : rişandina mirîşkan.

CHICKENED, *adj.* : tirsayî, tirsandî.

CHICKEN HAWK, *n.* : helûyê mirîşkan.

CHICKENING, *n.* : tirsandin, tirsîn.

CHICKEN-LIVERED, *adj.* = **CHICKEN HEARTED.**

CHICKEN SNAKE, *n.* : marê mirîşkan.

CHICK PEA(S), *n.* : nok.

CHICKWEED, *n.* : giyayê balindeyan.

CHICLE, *n.* : texlîtek şirêz (bo çêkirina qaçkî bi kar tê).

CHICKLING, *n.* : şolik, colik.

CHICORY, *n.* : xizêmok.

CHIDE, *vi.t.* : gazinde kirin, tehnê lêdan.

CHIDED, *adj.* : tehnlêdayî, gazindekirî.

CHIDING, *n.* : gazindekirin, serkunekirdin, serzenişt.

CHIEF, *adj.*, *n.* : serok, axa, serdar, rajorek, serek, koxe, girgirek.

- **EDITOR**, *n.* : sernivîser.

- **HARVESTER** : serbend.

- **JUSTICE** : serdadwer.

- **OF STAFF** : serokê erkanî.

- **OF STATE** : serokê dewletê.

CHIEFDOM, *n.* : serokîtî.

CHIEFLY, *adj.* : pêwendîdarê serokî.

CHIEFLY, *adv.* : bi serekî.

CHIEFSHIP, *n.* = **CHIEFDOM.**

CHIEFTAIN, *n.* : serok, axa.

CHIEFTAINCY, *n.* : serokîtî.

CHIEFTAINSHIP, *n.* = **CHIEFTAINCY.**

CHIEFCHAFF, *n.* : balindeyek strankare.

CHIFFON, *n.* : şîfon : tevnê avirmîşî.

CHIGGER, *n.* : kêç.

CHIGOE, *n.* : kêça deverên yeksaneker.

CHILBLAIN, *n.* : kulbûna ji sermayê.

CHILD, *n.* : zaro(k), min(d)al, biçûk, sava, çûk.

- **BEARING** : biçûkbûn.
- **FIRST ~** : nexrî.
- **KILLER** : çêlîkuj.
- **PLAY** : asane.
- **WITH ~** : bi tişt yan bi zik, avis.

CHILD BED, *n.* : li ber biçûkbûnê.

CHILD BIRTH, *n.* : biçûk bûn.

CHILDHOOD, *n.* : zarokîtî, biçûkîtî, mindalîtî, savayîtî.

CHILDING, *n.* : berdar, avis.

CHILDISH, *adj.* : zarokî.

CHILDISHLY, *adv.* : bi zarokî, mindalekî.

CHILDISHNESS, *n.* : zarokîtî.

CHILD LABOUR, *n.* : karê biçûkan.

CHILDLESS, *adj.* : korewar, bêwec.

CHILDLESSNESS, *n.* : bê zarokîtî, bêweçîtî, korewarî.

CHILDLIKE, *adj.* : zarokî, wek zarokî.

CHILDLY, *adj., adv.* = **CHILDLIKE.**

CHILDREN, *n. pl.* : zaro, sava, mindal, biçûk, weçe.

CHILE SALT PETER, *n.* : nîtratên sodyom (zîblê kîmyayî).

CHILI, *n.* : bîbera tij.

CHILIAD, *n.* : hezar.

CHILIASM, *n.* : bawerîtiya hezariya filehî.

CHILL, *n., adj., vi.t.* : sir, serma, sar, lerzî; sar kirin.

CHILLED, *adj.* : sarkirî, befirkirî.

CHILLNESS, *n.* : sarî, serma.

CHILLING, *adj.* : sar, sext, bizdihîn.

CHILLY, *adj.* : sar, bizdihîn, lerzîn, sext.

CHIMAERA, *n.* : masiya efsaneyiya şikil gêre.

CHIME, *n., vi.t.* : saz, awaza zengilan, zengilge, zengilê lêdan.

- **TO ~ IN** : axiftina mirovekê birrîn.
- **TO ~ IN WITH** : rêk keftin.

CHIMERA(S), *n.* : xewna aloz, aşop, dehbeyek efsaneyî (ser şêr, leşpez û dûv mar).

CHIMERE, *n.* : kirasê oldarî.

CHIMERICAL, *adj.* : aşopî.

CHIMNEY, *n.* : kulîn, pixêrîk, pêxirî, bace.

- **CAP** : ser kulîn, rojin, rojne.
- **CORNER**, *n.* : qoncalka kuçikî.
- **OUTLET** : pîpok, kulîn.
- **PIECE**, *n.* : texçika kuçikî.
- **POT** : qazana kulînê.
- **SWEEP(ER)** : malînkerê kulînan.
- **SWIFT**, *n.* : pereslêra kulînan.

CHIMP, *n.* = **CHIMPANZEE.**

CHIMPANZEE, *n.* : şempanze : texlîtek meymûn e.

CHIN, *n.* : erzînk, çene, zenî, çen.

- **UNDERFLESH** : gilar.

CHIN, *vt.* : xu rakirin (bi destan ta erzînkê, bi erzînkê girtin (kivance).

CHINA, *n.* : Çîn, ferfûrî, kalot.

- **ASTER**, *n.* : helezek gul ciwan.
- **BERRY** : dar yan berê azaderx.
- **MAN** : Çînî (mirov).
- **TREE** = **CHINABERRY.**
- **WALL** : dîwarê Çînê.
- **WARE** : amanên ferfûrî.

CHINCH, *n.* : axîrkeyê nivînan.

- **BUG ~** : axîrkeyê genimî.

CHINESE, *adj.* : Çînî.

- **WHITE**, *n.* : spiyê çînî (zinkê spiyê xest).

CHINK, *n., vt.i.* : kelş, derz, ker, kelşan girtin.

CHINKY, *adj.* : kelşî.

CHINO-, *pref.* : pêşgir e ko çînî ye.

CHINOISERIE, *n.* : xemla çînî.

CHINOOK, *n.* : çînok : gelê Hindokê sor.

CHINQUAPIN, *n.* : şaber(r)û.

CHINTZ, *n.* : çît, perûkê pembû.

CHIP, *n.* : telezm, telîş, parçe (dar yan kartol) kirtên.

- **A ~ OF OR OFF THE OLD BLOCK** : bi babê xuve çûyî.

- **A ~ ON ONE'S SHOULDER** : enirî.

- **MUNK**, *n.* : sivoreyek emerîkanî biçûk xiçkirî ye.

CHIP, *vt.i.* : pirtik kirin, şkênandin, yarî kirin, şkên.

- **TO ~ IN** : dirav yan harîkirinê pêşkêş kirin.

CHIPPED, *adj.* : pirtikirî.

CHIPPER, *n., adj., vt.i.* : birrok, şad pirbêjî kirin.

CHIPPINESS, *n.* : hişkî.

CHIPPING, *n.* : parçe, ker.

- **SPARROW** : pereslêrek emerîkanî biçûk e.

CHIPPY, *adj.* : hişk, (rewişt piştî vexwarinê), enirok.

CHIPS, *n.* : qaşil, qirş, çips.

CHIRK, *vi.t.* : çalak kirin, xurt kirin, şa bûn.

CHIROGRAPH, *n.* : belgename, dest nivîsîn.

CHIROGRAPHER, *n.* : belgenamezan, (xoş) destnivîsînzan.

CHIROGRAPHY, belgenamezanî, (xoş) destnivîsînzanî.

CHIROMANCER, *n.* : bextbîn, lepbîn.

CHIROMANCY, bextbînî, lepbînî.

CHIROPODY, *n.* : pêzanî.

CHIROPRACTIC, *n.* : rêbaza çarekirinê bi rastkirina karîteyê piştê.

CHIROPTER, *n.* : çekçekîle.

CHIROPTERAN, *n., adj.* : çekçekîleyî.

CHIRP, *n., vi.* : çivteçivt, cirîw, çivteçivt kirin.

CHIRPILY, *adv.* : çivteçivtekî.

CHIRPY, *adj.* : şad, keyfxoş.

CHIRR, *n., vi.* : sîrsîr kirin.

CHIRURGEON, *n.* : birînkar.

CHISEL, *n.* : eskene, hilkolk.

CHISEL(L)ED, *adj.* : (bi hilkolkî) kolayî.

CHISEL(L)ING, *n.* : kolîn yan kolan (bi hilkolkî).

CHIT, *n.* : pisole, sava, jinka zirava hûr.

- **CHAT** : çelte, çenebazî, pûçbêjî.

CHITIN, *n.* : çitîn : madeyek şaxikî yê pêtik yan qirşikiyan.

CHITINOUS, *adj.* : çitînî : pêwendîdarê madeyê şaxikiyê pêtikan.

CHITLINGS OR CHITLINS, *n.* : rîvîka dagirtî (sosec).

CHITON, *n.* : kirasê grekî (bo jin û mêran), canewerek nermokî xu bi keviran ve girtin.

CHITTER, *vi.* : dlerizîn (ji sermayê), pir bêjî kirin.

CHIVALRIC, *adj.* : merd, camêr, ciwamêr, siwari.

CHIVALROUS, *adj.* : merd, camêr.

CHIVALROUSLY, *adv.* : bi merdî.

CHIVALROUSNESS, *n.* : merdîtî, camêrî.

CHIVALRY, *n.* : merdî, camêrî.

CHIVE-GARLIC, *n.* : sîrê kevn.

CHIV(V)Y, *vt., n.* : bezîn, şepirze kirin, şeqandin.

CHLAMYDEOUS, *adj.* : qertişî.

CHLAMYDOSPORE, *n.* : zayendê qertişî.

CHLOR(O)-, *pref.* : pêşgir e ko keske (sewze), yan klor e (gaz).

CHLORAL, *n.* : şileye (avekî), pêkhatiyek ji alkuhol û kilorê bêrenge bo nivandinê.

CHLORAMINE, *n.* : kloramîn : pêkhatiyek ji klor û nîtrojenê.

CHLORATE, *n.* : klorat : texlîtek xwê ye.

CHLORIC, *adj.* : klorî.

- **ACID** : tirşiya klorî, asîd klorîk.

CHLORIDE, *n.* : klorîd.

CHLORINATE, *vt.* : klor kirin.

CHLORINATED, *adj.* : klorkirî.

CHLORINATING, *n.* : klorkirin.

CHLORINE, *n.* : klor.

CHLOROFORM, *n., vt.* : kiloroform : madeyê tezînkirinê, tezînker, tezîn.

CHLOROPHYL, *n.* : klorofîl : madeyê keskê helezî.

CHLOROPICRIN, *n.* : kloropikrîn : avekiyek bê reng pêtikkuj e.

CHLOROPLAST, *n.* : tovê keskiya helezî.

CHLOROUS, *adj.* : klorî.

CHLORPICRIN, *n.* = **CHLOROPICRIN.**

CHLOROSIS, *n.* : klorosis : kêm xu(y)nî ya keçikên bispor.

CHOANOCYTE, *n.* : xaneya kûvikî (li hewrikî).

CHOC-ICE, *n.* : çûklêta befirkirî.

CHOCK, *n., adv., vt.* : sing, qayim, sing kirin, bi qayimî (singî).

CHOCKABLOCK, *adj.* : qayîm girêdayî.

CHOCK-FULL, *adj.* : tijî, serdaçûyî.

CHOCOLATE, *n.* : çûklêt, çoqlete.

CHOICE, *n.* : helbijartin, jêgirtin, bijar.

- **OF THE FIRST ~** : nayab.

CHOICELY, *adv.* : bijareyekî.

CHOICENESS, *n.* : bijareyîtî.

CHOIR, *n.* : tîpa strenbêjan, koris, koro.

CHOIR-BOY, *n.* : kurikê korisê.

CHOIR LOFT, *n.* : berbankê korisê.

CHOIR MASTER, *n.* : rêberê korisê.

CHOKE, *vt.i., n.* : henase girtin, xeniqîn, girtin.

CHOKER, *n.* : stûvankê teng, stûpêç.

CHOKING, *adj.* : xeniqî, enirî(li ber xeniqînê ye).

CHOKY, *adj.* : xeniqîn.

CHOLECYSTECTOMY, *n.* : helkêşana zerdavdankê.

CHOLECYSTITIS, *n.* : zeravêş, telîşkulî yan kulbûn.

CHOLER, *n.* : enirîna lezîn, enirîn.

CHOLERA, *n.* : reşyaneve, qotik, rişandin.

CHOLERAIC, *adj.* : rişandinî.

CHOLERA INFANTUM, *n.* : reşyaneveya havînê.

CHOLERIC, *adj.* : tûre, enirî.

CHOLESTROL, *n.* : kolestrol : madeyek ronî ye di nav xu(y)nê, zerka hêkê û zerdavê de.

CHOLINE, *n.* : çolîn : madeyek e di nav hemî xane yan şaneyan da û pêviya ye bo erkê cergî.

CHONDR(O)-, *pref.* : pêşgire ko kirkirok e.

CHONDROCRANIUM, *n.* : kiloxê kirkirokî.

CHONDROMA, *n.* : awsan yan pejbûna kirkirokî.

CHOOSE, *vt.i.* : (hel)dibijêrit, jê girtin.

CHOOSER, *n.* : helbijêr, jêgir.

CHOOSING, *n.* : bijartin, helbijartin, jêgirtin.

CHOOSY, *adj.* : jêgir.

CHOP, *vt., n.* : brrîn, çep dan, hûr kirin, pêk guhorîn, lêdan, parçe, parçe goşt, çinîn.

- **FALLEN ! MIRÛS**, mirîto, sîkard.

CHOPHOUSE, *n.* : aşxane.

CHOPINE, *n.* : pêlava kapik bêqam bilinda jinan.

CHOPPED, *adj.* : birrî, çepdayî.

CHOPPER, *n.* : birrdar.

CHOPPING, *n.* : birrîn.

- **BLOCK** : qurmê birrînê.
- **KNIFE** : kêrika qîmekirinê.
- **OFF** : potkirin, jêkirin.

CHOPPY, *adj.* : derzdar, guhêr, (pêlik) lê dayî, kelişî, birrî (ne berdewan).

CHOP STICK(S), *n.* : darkê xwarinê (çînî pêdixut).

CHOP SUEY, *n.* : xwarinek çînî ye (goşt û zerzewat).

CHORAGUS, *n.* : rêberê korisekê yan giroyekê.

CHORAL, *adj.* : strana civakî, sirûda civakî.

CHORALE OR CHORAL, *n.* : strana civakî (korisî), sirûd.

CHORD, *n., vi.t.* : jen, jê, rayel, tîre, dijenit.

CHORDAL, *adj.* : jenî, jêyî, hijê, tuyî, tîreyî.

CHORE, *n.* : karê sivikê rojane.

CHOREA, *n.* : şepirzeyiya demarî.

CHOREOGRAPHY, *n.* : sema, dîlan, govend, dawet, nemaze balê.

CHORIC, *adj.* : pêwendîdarê korisê.

CHORION, *n.* : hijî, hevalok, hevalbiçûk.

CHORIPETALOUS, *adj.* = **POLYPETALOUS.**

CHORISTER, *n.* : kurikê korisê, stranbêjê korisê.

CHOROGRAPHY, *n.* : nexşezanî.

CHOROID, *adj.* : hevalokî.

CHORTLE, *vi.n.* : kenîn, strîn, stran.

CHORTLED, *adj.* : strangotî, strandî.

CHORTLING, *n.* : strandin, strangotin.

CHORUS, *n., vt.* : koris, strana korisî, giroyek ji stranbêjan yan dawetiyan.

- **IN ~** : hemû pêkve di yek demî da.

CHORUS GIRL, *n.* : keçika korisê.

CHOSE, *n.* : tişt, samanê kesî.

- **IN ACTION** : mafê şer li ser.
- **IN POSSESSION** : samanê di destî da.
- **LOCAL** : paşko.

CHOSEN, *adj.* : bijartî, helbijartî, jêgirtî.

CHOUGH, *n.* : qira pê sor.

CHOUSE, *vt.* : xapandin, garanê ajotin.

CHOUSED, *adj.* : xapandî.

CHOUSING, *n.* : xapandin.

CHOW, *n.* : seyek nijad çînî ye.

CHOW CHOW, *n.* : têkilî, rîçalek çînî ye.

CHOWDER, *n.* : şorbe yan giraza masî, kartol û pîvazan e.

CHOW MEIN, *n.* : xorak e : kivark, pîvaz, goşt û zerzewat e.

CHRESTOMATHY, *n.* : birgeyên helbijar (bo hînkirina zimanî), nivîsînên helbijarên danyarekê (di kitêbekê de).

CHRISM, *n.* : zeyta pîroz.

CHRISMATORY, *n.* : amanê zeyta pîroz.

CHRISOM, *n.* : kirasê nav(lê) kirinê.

- **CHILD** : zarokê li heyva yekem jiyî dimirit.

CHRIST, *n.* : Îsa pêxember.

CHRISTEN, *vt.* : nav(lê) kirin.

CHRISTENDOM, *n.* : filehatî.

CHRISTENED, *adj.* : nav(lê)kirî.

CHRISTENING, *n.* : ahenga nav(lê)kirinê.

CHRISTIAN, *n.* : fileh, fele.

- **ERA** : rozname yan dîroka filehî.

- **NAME** : navê yekem.

CHRISTIANITY, *n.* : filehatî, filehî, feleyî, filehîtî.

CHRISTIANIZATION, *n.* : filehkirin, felekirin.

CHRISTIANIZE, *vt., i.* : fileh kirin, fileh bûn, fele kirin.

CHRISTIANIZED, *adj.* : filehkirî, filehbûyî, felebûyî.

CHRISTIANIZING, *n.* : filehkirin, felekirin.

CHRISTIANLIKE, *adj.* : wek feleyî.

CHRISTIANLY, *adj., adv.* : wek feleyî(feleyekî).

CHRISTIAN SCIENCE, *n.* : zanistiya feleyî.

CHRISTIAN SCIENTIST, *n.* : zanayê feleyî.

CHRISTLY, *adj.* : feleyî, wek Îsa pêxemberî.

CHRISTMAS, *n.* : kirismis : cejna zayina Îsa pêxemberî (25 çileyê êkê), Noel.

- **EVE** : êvar yan şeva kirismisê Noelê.

- **TIDE** : demê cejna kirismisê.

- **TREE** : dara cejna kirismisê.

CHRISTOLOGY, *n.* : şirovekirina feleyiya kesê îsayî.

CHRIST'S THORN, *n.* : stiriya Îsa pêxemberî.

CHROM(O)-, *pref.* : pêşgir e ko reng e.

CHROMA, *n.* : zelalî yan xestiya rengî.

CHROMATIO-, *pref.* : pêşgir e ko reng e, kromatîn e.

CHROMATE, *n.* : kromat : xwêya tirşiya kromîk.

CHROMATIC, *adj.* : rengîn, rengdar.

- **ABERRATION** : ladana rengî.

- **SCALE** : pêstirka rengî.

CHROMATICITY, *n.* : rengîtî.

CHROMATICS, *n.* : rengzanî.

CHROMATIN, *n.* : rengker : madeyê rengkerê kakila xaneyê (kromatîn).

CHROMATOGRAPHIC, *adj.* : rengdar(î).

- **ANALYSIS** : şîkirina rengdarî, şîtelkirina rengdarî.

CHROMATOLYSIS, *n.* : şîtelbûna rengî.

CHROMATOMETER, *n.* : rengpîv.

CHROMATOPHIL, *adj.* = **CHROMOPHIL.**

CHROMATOPHORE, *n.* : renghelgir, rengdar, şane yan xaneya rengkirî, rengkirî.

CHROME, *n., vt.* : krom, tiştê kromkirî.

- **CHROME**, *suff.* : paşgir e ko reng e.

CHROMIC, *adj.* : kromî.

CHROMINENCE, *n.* : têrbûna rengî.

CHROMITE, *n.* : kromît : metal e.

CHROMOGEN, *n.* : çêkerê rengî.

CHROMOLITHOGRAPH, *n.* : wêneyê berî yê rengî : wêneyê rengîn li ser berî çapkirî.

CHROMOLITHOGRAPHY, *n.* : çapkirina rengîna li ser berî.

CHROMOMERE, *n.* : dendikê rengî.

CHROMOPHIL, *adj.* : rengxwaz.

CHROMOPLAST, *n.* : leşikê rengker.

CHROMOSOMAL, *adj.* : kromozomî : rengî.

CHROMOSOME, *n.* : kromozom : reng.

CHROMOSPHERE, *n.* : bayê rojê.

CHRON(O)-, *pref.* : pêşgir e ko dem e.

CHRONIC(AL), *adj.* : kevn, dirêjxayen, dirêjdem.

- **DISEASE** : nexoşî yan nesaxiya kevn.

CHRONICLE, *n.* : dîrok, mêjû.

CHRONICLER, *n.* : dîrokzan, mêjûzan.

CHRONOGRAM, *n.* : dîroka hevokî yan risteyî.

CHRONOGRAPH, *n.* : dempîv.

CHRONOLOGIC(AL), *adj.* : dirokî, demî.

CHRONOLOGIST, *n.* : demzan : pisporê dîrokzaniyê.

CHRONOLOGY, *n.* : demzanî, dîrokzanî, dîroktomarî.

CHRONOMETER, *n.* : demjimêr.

CHRONOMETRY, *n.* : demjimêrî.

CHRONOSCOPE, *n.* : kurtedempîv.

CHROUS, *adj.* : kromî.

CHRYS-, *pref.* : pêşgire ko zêre yan zere.

CHRYSALID, *n.* : (**CHRYSALIS**), pêtika ji qonaxa kirmokeyî.

CHRYSANTHEMUM, *n.* : beybûn.

CHRYSOBERYL, *n.* : berek nîv hêja ye, zer yan keskê vekirî.

CHRYSOLITE, *n.* = **OLIVINE.**

CHRYSOPRASE, *n.* : berê nîv hêja keskê vekirî.

CHUB, *n.* : masiyek wek mêkêye.

CHUBBY, *adj.* : qelew, xirp, dê(h)m gir û vir.

CHUCK, *vt.i.*, *n.* : derkirin, qit qit kirin, xorak, havêtin.

- **HOLE** : kun (dinav rêkê de), kendek.

- **WAGON** : erebaneya lênange.

CHUCKER OR CHUCKKAR, *n.* : demek leyiztinê (polo).

CHUCKLE, *vi.*, *n.* : dbişkurîn, kenîn, pirîqîn.

CHUCKLING, *n.* : pirqînî, tirîqe.

CHUFF, *n.*, *adj.* : gundî, cotyar.

CHUFFY, *adj.*, *n.* : qelew.

CHUG, *n.*, *vi.* : dengê kurtê nizmê peqînê, dengek hosa çêkirin.

CHUM, *n.*, *vt.* : heval, dost, hevalî kirin.

CHUMMED, *adj.* : hevalîkirî.

CHUMMING, *n.* : hevalîkirin.

CHUMMY, *adj.* : hezkar.

CHUMP, *n.* : ser, xirpo, gewc, qurm.

CHUNK, *n.* : ker, parçe, tibab, qurm, topel, baristayî.

CHUNKY, *adj.* : qut û qelew.

CHURCH, *n.* : dêr.

- **BELL** : zengila dêrê, cimxar.

- **GOER** : nivêjkerê berdewamê dêrê.

CHURCHLESS, *adj.* : bêdêr.

CHURCHLY, *adj.* : bidêrî, dêrekî.

CHURCHMAN, *n.* : qeşe.

CHURCHWARDEN, *n.* : niwênerê dêrê.

CHURCHWOMAN, *n.* : (jin) endama dêrê.

CHURCHY, *adj.* : dêrî.

CHURCHYARD, *n.* : hewşa dêrê.

CHURL, *n.* : cotyar.

CHURLISH, *adj.* : gundî, rijd, qinût.

CHURCHLISLY, *adv.* : bi rijdî, rijdekî.

CHURLISHNESS, *n.* : rijdîtî.

CHURN, *vt.i.*, *n.* : meşkê kirin, meşk, jenîn.

CHURNER, *n.* : meşk.

CHURNING, *n.* : meşikirin.

CHUTE, *n.* : sû, sûlav, sîp, tavge.

CHUTNEY, *n.* : metfînî, êxinî.

CHYLACEOUS, *adj.* : şîreyî.

CHYLE, *n.* : şîreya xwarina givêrîn berî mijînê.

CHYLIFACTION, *n.* : şîrebûn.

CHYLOUS, *adj.* = **CHYLACEOUS.**

CHYME, *n.* : kaym : madeyek kakili ye ko xwarin bi givaşeya ûrkî dikin.

CHYMIFICATION, *n.* : kayimbûn.

CHYMOUS, *adj.* : kayimî.

CIBORIUM, *n.* : amanê nanê qorbanê, sîwanka gomizî li ser qorbangeha dêrê.

CICADA, *n.* : pîtka dirînê.

CICALA, *n.* : cicada.

CICATRICIAL, *adj.* : şûnbirînî.

CICATRIX, *n.* : şûn birîn.

CICATRIZE, *vt.i.* : goşt girtin (birîn), sarêj bûn.

CICERONE, *n.* : rêberê gerîdeyan.

CICHLID, *n., adj.* : masiyek rûbarî şaper dirrikî ye.

CICINDELIDAE, *n. pl.* : kêzên pilingî.

- CIDAL, *suff.* : paşgir e ko kuj e, qirker e.

- CIDE, *suff.* : paşgir e ko kuj e, qirker e.

CIDER, *n.* : şerbeta sêvan.

CIGAR, *n.* : cigare, baçik, pêça tûtinê.

CIGARETTE, *n.* : cigare, baçik, cixare.

- HOLDER : darikê cigarê, darik.

CILIA, *n.* : mijûlank.

CILIARY : mijûlankî.

CILIATE, *adj.* : mijûlankdar.

CILIOLATE, *adj.* : mijûlank zirav.

CILIUM, *n.* : mijûlank.

CILWE, *n.* : kitêba pîroza Êzidiyan.

CIMEX, *n.* (*pl.* **CIMICES**) : axîrkeya nivînan.

CIMMERIAN, *n., adj.* : tarî, sîmerî : kesek efsaneyî ko her di nav tariyê de dijît.

CINCH, *n., vt.* : tenga zînî, texlîtek kaxezan; qayim kirin, desteber kirin.

CINCHONA, *n.* : darê kîna, tîvilê kîna.

CINCHONISM, *n.* : jehirbûn (bi kîna).

CINDER(S), *n.* : xulî, arî.

CINDERÎ, *adj.* : xuliyî.

CINE, *n.* : filmê sînemayî.

CINEMA, *n.* : sînema.

CINEMATIC, *adj.* : sînemayî.

CINEMATIZE, *vt.* : sînemayî kirin.

CINEMATIZING, *n.* : sînemayî kirin.

CINEMATOGRAPHER, *n.* : wênegirê sînemayî.

CINEMATOGRAPHIC(AL), *adj.* : sînemayî.

CINEMATOGRAPHY, *n.* : zanîna wênegirtina sînemayî.

CINERARIUM, *n.* : xulîgeh (bo parastina xuliya termên sotî).

CINERARY, *adj.* : xulîgehî (pêwendîdarê xulûgehê).

CINEROUS, *adj.* : xuliyî, gewr.

CINGULATE, *adj.* : piştênî.

CINGULUM, *n.* : piştên.

CINNABAR, *n.* : kibrîtîdê cîweyî, sorê rengîn.

CINNAMON, *n.* : darçîn.

CINQUE, *n.* : pênc.

CINQUE CENTIST, *n.* : nivîser yan hunermendê îtaliyê seda şanzdeyê.

CINQUECENTO, *n.* : seda şanzdemîn.

CINQUEFOIL, *n.* : helezê pênc belg.

CIPHER, *n., vt.* : sifir(hîç), sifir kirin.

CIRCA, *pref., n.* : nêzîk dîrokekê.

CIRCASSIAN, *adj.* : çerkesî.

CIRCINATE, *adj.* : xelekî.

CIRCINATELY, *adv.* : bi xelekî.

CIRCLE, *n.* : çemere, çerx, xelek, cixiz, hawîr, cerge, govek, bazne, govendek, xîzik.

CIRCLE, *vt., i.* : dor girtin.

CIRCLED, *adj.* : dorgirtî, lêwerkirî.

CIRCLET, *n.* : çemerek.

CIRCUIT, *n.* : gêjen, çivane.

- **BREAKER** : gêjenşikên, çivaneşikên.

CIRCUITIOUS, *adj.* : neêkser, neêkrast.

CIRCUITRY, *n.* : gêjenên kehrebayî.

CIRCUITY, *n.* : dor geran.

CIRCULAR, *adj.* : girûvir, çemereyî, belavok, dîkan, gildî, gilol, pexşe, xir.

- **CURRENT** : lozewa çemereyî, rewteka çemereyî.
- **MOTION** : livîna çemereyî.
- **NOTE** : nameya gerok, nameya sipartinê.
- **PLANE** : reneya çemereyî.
- **SAW** : xizara çemereyî.

CIRCULARITY, *n.* : çemereyîtî.

CIRCULARIZE, *vt.* : hinartin, şandin, girûvir kirin, belav kirin, nameyên gerok hinartin, weşandin.

CIRCULARIZED, *adj.* : belavokhinartî.

CIRCULARIZING, *n.* : belavkirin.

CIRCULATABLE, *adj.* : belavbar.

CIRCULATE, *vi., t.* : belav kirin, geryan, weşin, weşandn.

CIRCULATED, *adj.* : weşandî, gerandî, belavkirî.

CIRCULATING, *n.* : belavkirin, weşandin, gerandin.

- **CAPITAL** : sermayeyê berdest.
- **DECIMAL** : şikesteka dehekiya gerok.
- **LIBRARY** : kitêbxaneya gerok.
- **MEDIUM** : pare, dirav.

CIRCULATION, *n.* : belavkirin, geran, belavbûn, pertbûn.

CIRCULATIVE, *adj.* : belavdar, gerokî, gerokdar.

CIRCULATOR, *adj.* : gerandar, belavkerê nûçeyan.

CIRCULATORY, *adj.* : gerandarî.

CIRCUM, *pref.* : pêşgir e ko dor e.

CIRCUMAMBIENT, *adj.* : dorgirtî.

CIRCUMAMBIENTLY, *adv.* : bi dorgirtinî, dorgirtinekî.

CIRCUMAMBULATE, *vt., i.* : li dor digerit (olî).

CIRCUMAMBULATED, *adj.* : lidorgerîn (geriyan).

CIRCUMAMBULATING, *n.* : lidorgeran.

CICUMSIZE, *vt., i.* : sunet kirin.

CIRCUMSIZED, *adj.* : sunetkirî.

CIRCUMSIZING, *n.* : sunetkirin.

CIRCUMCISION, *n.* : sunetkirin.

CIRCUMFERENCE, *n.* : kemere.

CIRCUMFERENTIAL, *adj.* : kemereyî.

CIRCUMFLEX, *n., adj.* : nîşana bêjeyî li ser tîpê.

CIRCUMFLUENT, *adj.* : (li) dorçûyî.

CIRCUMFLUOUS, *adj.* : (li) dorgirtî.

CIRCUMFUSE, *vt.* : li dor belav kirin, li dor girtin, têkirin.

CIRCUMFUSED, *adj.* : lidorgirtî.

CIRCUMFUSING, *n.* : lidorgirtin.

CIRCUMGYRATE, *vi.* : zivirîn.

CIRCUMLOCUTION, *n.* : çenebazîtî.

CIRCUMLOCUTORY, *adj.* : çenebazî.

CIRCUMLUNAR, *adj.* : li dor heyvê.

CIRCUMNAVIGATE, *vt.* : deryayî geriyan.

CIRCUMPOLAR, *adj.* : li dor cemserê gerdonî yan esmanî.

CIRCUMSCISSILE, *adj.* : li dor hêla pan.

CIRCUMSCRIBE, *vt.* : hêl girtin, rade kirin, dor girtin.

CIRCUMSCRIBED, *adj.* : radedar.

CIRCUMSCRIPTION, *n.* : hêl girtin, rade kirin, dorgirtin.

CIRCUMSOLAR, *adj.* : (li) dor rojê.

CIRCUMSPECT, *adj.* : hişyar, wurya.

CIRCUMSPECTION, *n.* : hişyarî.

CIRCUMSPECTIVE, *adj.* : agehdar, wurya, hişyar.

CIRCUMSTANCE, *n.* : bar, merc, pergal, bar û dox.

- **IN EASY GOOD OR FLOURISHING ~S** : dewlemend.

- **IN REDUCED OR STRAINED ~S** : tengav, destteng, hejar.

- **IN OR UNDER NO ~** : êkcar, çi biqewmit.

- **IN OR UNDER THE ~** : di nav vî mercî da.

CIRCUMSTANCED, *adj.* : mercî, mercdar.

CIRCUMSTANTIAL, *adj.* : mercî.

CIRCUMSTANTIALITY, *n.* : mercîtî.

CIRCUMSTANITATE, *vt.* : rave kirin, dirûv kirin.

CIRCUMSTANTIATED, *adj.* : dirûvkirî.

CIRCUMSTANTIATION, *n.* : dirûvkirin.

CIRCUMVALLATE, *adj., vt.* : çeperkirî, sengerkirî, çeper kirin.

CIRCUMVENT, *vt.* : revandin, dor girtin, li dor gerîn.

CIRCUMVENTING, *n.* : berûpêç, dorgirtin, revandin.

CIRCUMVENTION, *n.* : berûpêçî, dorgirtin, revandin.

CIRCUMVOLUTION, *n.* : ger, geran.

CIRCUS, *n.* : sêrk(is), canbazxane, sîrk.

CIRQUE, *n.* : xelek, çemere, pêpikê sirûştî (yê çiyayî).

CIRRATE, *adj.* : parçeyên desdanên helezan ko wek dest û pêyan in.

CIRRHOSIS = CIRROSE OR CIRRHOSE, *n.* : mûmîbûn, sîroz.

- **OF LIVER** : cergmûmî.

CIRRHOTIC, *adj.* : mûmîbûnî.

CIRRIPED, *adj.* : pê mijûlankî.

CIRRICUMULUS, *n.* : ewrê wek hiriyê.

CIRRONEBULA, *n.* : ewrê wek perdeyê.

CIRROUS, *adj.* = **CIRRATE.**

CIRRUS, *n.* (*pl.* **CIRRI**) : benkî, leşê ziravê lûlekî.

CIS-, *pref.* : pêşgir e ko ev rex e.

CISATLANTIC, *adj.* : li vî rexê Etlantîkî.

CISCO, *n.* : texlîtek masî ye.

CISLUNAR, *adj.* : navbera erd û heyvê de .

CIST, *n.* : gor, sindoq.

CISTER, *n.* : embar, sê(h)rîc.

CISTERCIAN, *n.* : oldar (benediktî).

CITADEL, *n.* : kel(h)e, zîndan.

CITATION, *n.* : lêwergirtin.

- **MARK** : nêşandeka dutikan.

CITE, *vt.* : lê wergirtin.

CITHARA, *n.* : gîtar.

CITHERN, *n.* = **CITTER** : texlîtek kivanc e.

CITIED, *adj.* : bajêrkirî, bajêrdar, şarkirî.

CITIFY, *vt.* : bajêrî kirin.

CITIZEN, *n.* : hevwelatî, hevşarî, welatînî, rajêrî.

CITZENNESS, *n.* : hevwelatî (jin), welatî (jin).

CITIZENRY, *n.* : hevwelatî, welatî.

CITIZENSHIP, *n.* : (hev) welatî, hevşarî, welatînî, rajêrî.

CITR(I)-, *pref.* : pêşgir e ko lêmon e, tirşiya lêmonê ye.

CITRATE, *n.* : lêmonat.

CITRICULTURE, *n.* : çandina tirşemîweyî.

CITRON, *n.* : lêmon, limon, leymûn.

CITRUS (FRUITS, TREES), *n.* : mizremenî.

- **FRUIT** : tirinc.

CITY, *n.* : şar, bajêr, bajar.

- **LIMIT** : aqar.
- **STATE** : dewleta bajêrî.
- **WALL** : şurhe, beden (dîwarê lidorbajêrî).

CIVET, *n.* : bêhnxweşiya texlîtek sivoreyî.

- **CAT** : sivoreyê bêhnxweşiyê.

CIVIC, *adj.* : jiyarî, bajêrî.

- **MINDED** : jiyarîxwaz.

CIVICS, *n.* : perwerdejiyarîzanî.

CIVIES, *n.* : cilên jiyarî.

CIVIL, *n., adj.* : jiyar, şarî, bajêrî, jiyarî.

- **ACTION, SUIT OR PROCEEDINGS** : doza jiyarî.
- **AVIATION** : firîna jiyarî.
- **COURT** : dadgeha jiyarî.
- **DEATH** : mirina jiyarî, bêmafiya jiyarî.
- **DEFENCE** : bergiriya jiyarî.
- **ENGINEER** : endazyarê jiyarî.
- **ENGINEERING** : endazyariya jiyarî.
- **LAW** : qanûna jiyarî.
- **LIST** : xerciya malbata qiralî (şahî).
- **MARRIAGE** : şokirina jiyarî.
- **SERVANT** : xizmetkar yan fermanberê jiyarî.
- **SERVICE** : xizmetkariya jiyarî.

CIVILIAN, *adj.* : jiyarî, şaristanî, bajêrî.

CIVILLY, *adv.* : bi tazeyî, tazekî.

CIVILITY, *n.* : dildan.

CIVILIZATION, *n.* : şaristanî(tî), bajêrîtî, jiyarîtî, şarevanî, bajêrvanî, avadanî, jîwar, şaristan.

CIVILIZE, *vt.* : şaristanî kirin.

CIVILIZED, *adj.* : şaristanî(kirî), jîwer, jiyarî, jiyar, bajarvanî.

CIVILIZING, *n.* : şaristanîkirin.

CLABBER, *n., vi.* : şîrê meyînî, şîr meyandin.

CLACK, *n.* : şeqe, fiçik.

CLACK, *n., vt.* : pirbêjî, pûçbêjî, pirbêjî kirin.

- **VALVE** : derçeya dengdar.

CLACKING, *n.* : şeqe.

CLAD, *adj., vt.* : kinckirî, kinc kirin.

CLAIM, *vt., n.* : xwastin, daxwaz, doz.

CLAIMER, *n.* : daxwazkar, xwazeker.

CLAIMANT, *n.* : daxwazkar, daxwaz, dozekar, gilîdar, gilîvan.

CLAIRVOYANCE, *n.* : pêşbîn, xîzvedan.

CLAIRVOYANT, *n., adj.* : xîzvedan(î).

CLAM, *n.* : canewerek nermok e, masiya qapilkeyî.

CLAMBAKE, *n.* : seyran (li beravê).

CLAMBER, *vi., t.* : ser keftin (bi zehmetî), evraz çûn.

CLAMBERED, *adj.* : serketî.

CLAMBERING, *n.* : serketin.

CLAMMILY, *adv.* : bi xunavî.

CLAMMINESS, *n.* : xîsarîtî, xunavîtî.

CLAMMY, *adj.* : xunavî, xîsarî.

CLAMO(U)R, *vi.* : xwastin (qîjqîjî).

CLAMO(U)R, *n.* : qîj, girr, girêç, dinoyek, pêjîn, qerqeşe, qîrûqîj, galegot.

CLAMO(U)RED, *adj.* : qîjkirî.

CLAMO(U)RING, *n.* : qîjkirin.

CLAMOROUS, *adj.* : qîjî.

CLAMOROUSLY, *adv.* : bi qîjî, qîjkî.

CLAMOROUSNESS, *n.* : qîjekîtî.

CLAMP, *n., vt., i.* : çengal, çingal, çengal kirin, qayim kirin.

CLAMSHELL, *n.* : dolkeya (wek) şeytanokî, qapîlkeya nermokeyî.

CLAN, *n.* : hoz, êl, tîre, giro.

CLANDESTINE, *adj.* : nihênî.

CLANDESTINELY, *adv.* : bi nihênî, dizê, nepenekî.

CLANDESTINENESS, *n.* : nihênîtî, nepenîtî.

CLANDESTINITY, *n.* : nihênîtî, nepenîtî.

CLANG, *vi.t.* : ziringîn kirin, ziringîn, çeq.

CLANGO(U)R, *n.* : girêça tevlehev, qireqira berdewam, qireqir kirin.

CLANK, *n., vi.t.* : çeqçeq, reqreq, şingîn, reqreq kirin.

CLANNISH, *adj.* : hozî.

CLANNISHLY, *adv.* : bi hozî, hozkî, êlkî.

CLANNISHNESS, *n.* : hozîtî.

CLANSMAN, *n.* : (endamê) hozî : eşir.

CLAP, *vt., i., n.* : destan qutan, çepik kutan, çeple lê dan, şeqe, şirîxe.

- **BOARD** : depê darê dirêj (rexek tengtir).

CLAPPED, *adj.* : destqutayî.

CLAPPER, *n.* : destqut, zimanê zengilê, zimanê mirovê pirbêj.

CLAPPERCLAW, *vt.* : (bi nînokan) veçiranndin, têxurîn.

CLAPPING, *n.* : destqutan.

CLAPTRAP, *n.* : pûçaxiftin, zimanê pesindkirinê.

CLAQUE, *n.* : destqutên kirêgirtî.

CLARENCE, *n.* : erebaneya girtiya çarçerx.

CLARENDON, *n.* : tîpên stûr.

CLARET, *n.* : şeraba sor.

CLARIFICATION, *n.* : ro(h)nkirin, ravekirin, dêrandin, palîn, ravedan, xuyakirin, şirovekirin.

CLARIFIED, *adj.* : nîşandayî, ravekirî, şanîdayî, xuyakirî.

CLARIFIER, *n.* : şiroveker, raveker.

CLARIFY, *vt.i.* : bijîn kirin, rave kirin, ro(h)n kirin, şiro vekirin.

CLARIFYING, *n.* : ravek, nîşandan, şanîdan, vewerandin.

CLARINET, *n.* : zirna.

CLARINETIST, *n.* : zirnavan.

CLARION, *n., adj.* : borizan, bilind, eşkar.

CLARITY, *n.* : ro(h)nî, zelalî, berderî, xuyanî, xuyabûn.

CLARKIA, *n.* : helezek bakura Emerîka gulsor yan erxewanî ye.

CLARO, *n.* : cigareya nerma rengvekirî.

CLARY, *n.* : giyayek e.

CLASH, *n., vt.i.* : şer, çeqçeq; lêkdan, vêk ketin.

CLASP, *n., vt.* : girtin, toqe; girtin, toqe kirin.

- **KNIFE** : kêrika berîkê.

CLASPUS, *n.* : gasik.

CLASS, *n., adj., vt., i.* : çîn, pol, celeb, qol, dersxane; pol kirin.

- **BOOK** : deftera polê.

- **CONSCIOUSNESS** : agehiya çînî, xudîçî nî.

- **DAY** : roja polê.

CLASSIC, *adj.* : dêrîne, nemir, kilasîkî.

CLASSICISM, *n.* : çînîtî.

CLASSICAL, *adj.* : nemir (tor, huner).

CLASSICALISM, *n.* : kilasîkîtî.

CLASSICIST, *n.* : bawermendê çînî, kilasîkî.

CLASSICIZE, *vt.* : kilasîkî kirin.

CLASSIFIABLE, *adj.* : polênbar.

CLASSIFICATION, *n.* : rêzkirin, polên; dabirrîn, pirtûk danîn.

CLASSIFIED, *adj.* : polênkirî.

- **ADVERTISING** : agehiyên polênkirî.

CLASSIFIER, *n.* : polênkar.

CLASSIFY, *vt.* : polên kirin, rêz kirin.

CLASSING, *n.* : polên.

CLASSLESS, *adj.* : bêçîn.

CLASSMATE, *n.* : hevpol.

CLASS NUMBER, *n.* : renûsê polênê (li kitêbxaneyê).

CLASSROOM, *n.* : jora polê, dersxane, wanexane.

CLASTIC, *adj.* : kevneparçeyê kevrî.

CLATTER, *n., vt., i.* : çeqçeq, reqreq, şingîn, galegot, şingîn kirin.

CLAUDICATION, *n.* : lengî, kulî, qopî.

CLAUSAL, *adj.* : risteyî, bendî, hevokî.

CLAUSE, *n.* : riste, bend, hevok.

CLAUSTRAL, *adj.* = **CLOISTRAL.**

CLAUSTROPHOBIA, *n.* : tirsa dira daxistî.

CLAVATE(D), *adj.* : (wek) gurzî.

CLAVE, *p.* **OF CLEAVE** : kelişî.

CLAVER, *n., vi.* : geveze, gevezeyî kirin.

CLAVICHORD, *n.* : alavek mûzîqîjenî ye.

CLAVICLE, *n.* : bazinê sîngî, kirik, kilîlka milî.

CLAVICORN, *adj.* : gurzsehkerî.

CLAVIER, *n.* : depê kilîlan (piyano...).

CLAVIFORM, *n.* : (şikil) gopalî.

CLAW, *n., vt.* : penc, pencerok, bale, çirnok, çeng; çing, penc kirin, penc lê dan.

- **HAMMER** : kutekê pencî, mêkutê pencî.

- **HATCHET** : bivrê pencî.

CLAWED, *adj.* : pencdar.

CLAY, *n.* : qur, lîm, gil, axsor, teqin, cebil.

- **BANK** : hespê reng ber zerî ve.

- **JAR** : den, cer.

- **MORE** : şûrê duserî.

- **PIGEON** : kotira gilî (bo stêrkê).

- **POT** : hincan.

CLEAN, *n., adj.* : paqij, rast, temîz, xawên.

- **HANDED** : dawpak, destpak.

CLEAN, *vt.i.* : paqij kirin, pak kirin, vemiştin.

CLEANABLE, *adj.* : paqijbar, pakbar.

CLEANED, *adj.* : paqijkirî, pakirî, hincandî, vemiştî.

CLEANER, *n.* : paqijker.

CLEANING, *n.* : paqijkirin, damal(iştin), vemaliştin.

CLEANLILY, *adv.* : bi paqijî, paqijkî.

CLEANLINESS, *n.* : paqijîtî, destnivêjî, pakî(tî), pakbûn.

CLEANLY, *adj., adv.* : paqij, bi paqijî.

CLEANNESS, *n.* : paqijî(tî), pakî(tî), destnivêjî.

CLEANSE, *vt.* : paqij kirin, pak kirin.

CLEAN-SHAVEN, *adj.* : qenctiraşî (hulî).

CLEANSING, *n.* : paqijkirin.

CLEAN-THINKING, *n.* : bîrpak.

CLEAN-TONGUED, *adj.* : zimanpak.

CLEAN-UP, *n.* : paqijkirin.

CLEAR, *n., adj.* : diyar, sayî, sahî, ro(h)*n*.sa, nûma, penî, eşkera, aşkera, vewerandî, zelal, rûşen, xuya, belo, rûşen.

- **IN THE ~** : bê guneh.

- **EYED** : bîna.

- **PERFECTLY ~** : çîk sayî.

- **SIGHTED** : qencbîna, jîr.

CLEAR, *vt., i.* : paqij kirin, diyar kirin.

- **TO ~ AWAY** : rakirin, sahî bûn.

- **TO ~ OFF** : çûn, temam bûn.

- **TO ~ THE EXPENSES** : dirav kom kirin da ko bihayî bidit.

- **TO ~ OUT** : vala kirin, çûn, berîkan vala kirin.

- **TO ~ UP** : rave kirin, rêk kirin, dilniya kirin.

CLEARABLE, *adj.* : ro(h)nbar, paqijkirin yan rakirinbar.

CLEARANCE, *n.* : paqijkirin, vekirin, (gerden) azakirin, rê dan, destûr, firotina safîkirinê, valatî (li navbera du rûyan de).

CLEAR-CUT, *adj.* : eşkera, diyar.

CLEAR-HEADED, *adj.* : jîr.

CLEAR-HEADEDNESS, *n.* : jîrîti.

CLEARING, *n.* : beyava darbirrî (li nav daristanê de).

- **HOUSE** : berdêlgeh.

CLEARLY, *adv.* : bi eşkerayî, eşkerakî.

CLEARNESS, *n.* : diyarbûn, pakbûn, sahîtî, semale, berderî, zelalbûn.

CLEAR WING, *n.* : çengro(h)*n.* : .

CLEAT, *n., vt.* : sing : girê dan (bi singî ve).

CLEAVABLE, *adj.* : kelşbar.

CLEAVAGE, *n.* : şikaftin, kelş, kelişîn, derzbûn.

CLEAVE, *vt., i.* : kelîştin.

CLEAVED, *adj.* : kelişî.

CLEAVER, *n.* : sîkadr, birvê serjêkerî.

CLEAVING, *n.* : şikaftin.

CLEEK, *n.* : çingal (bo hilawîstina qazanê), darê golfê.

CLEF, *n.* : kilîl (nîşana mûzîqî).

CLEFT, *n.* : celx, kelş, derz, derzek, terk, kelişîn.

- **PALATE** : kelşa panka devî.

CLEMATIS, *n.* : yasemîna çolê.

CLEMENCY, *n.* : pexşîn, lêborîn.

CLEMENT, *adj.* : dilovan, mêşîn.

CLEMENTLY, *adv.* : bi dilovanî, dilovankî.

CLENCH, *n., vt.* : qayimkirin, perç, qayim, girtin, biryar dan.

CLEPSYDRA, *n.* : demjimêra avê.

CLEPTOMANIYA, *n.* = **KLEPTOMANIYA.**

CLERESTORY, *n.* : ronahîkera dêrê, çirayê dêrê.

CLERGY, *n.* : oldar.

CLERGY MAN, *n.* : qeşe.

CLERIC, *n., adj.* : oldar.

CLERICAL, *adj.* : oldarî.

- **COLLAR** : yaxeya oldarî : yaxeyek spî teng e.

CLERICALISM, *n.* : oldarîtî : kartêkirina ramyariya oldarî.

CLERICALIST, *n.* : piştgirê oldarîtiyê.

CLERISY, *n.* = **INTELLIGENTSIA.**

CLERK, *n., vi.* : mîrza, nivîsvan, kaxezdar, defterdar, mîrzayî kirin.

CLERKLY, *adj., adv.* : bi mîrzayî, mîrzakî.

CLERKSHIP, *n.* : mîrzayîtî.

CLEVER, *adj.* : jîr, zîrek, zîx, birbir, bîrewer, şehreza, çeleng, aqilmend, ziring.

CLEVERISH, *adj.* : zîrekî.

CLEVERLY, *adj.* : bi jîrî.

CLEVERNESS, *n.* : jîrî(tî), zîrekî(tî), finaz.

CLEVIS, *n.* : pêkhatiya girêdana zimanê gêsinî.

CLEW, *n.* : belge, kilîla vekirina aloziyekê, gilolka benkî yan rîsî.

CLICK, *n., vt. t.* : çirkîn, çirqîn, çeqîn.

- **BEETLE** : kêza çeqçeqok.

CLICKING, *n.* : repe.

CLICQUE, *n.* : texe, komel, deste, taxim.

CLIENT, *n.* : nûker, kiriyar.

CLIENTAGE, *n.* : kiriyar.

CLIENTAL, *adj.* : pêwendidarê kiriyarî.

CLIENTS, *n. pl.* : kiriyaran.

CLIFF, *n.* : givande, kendal, kurtal, zinar, teht, zanig.

- **DWELLER** : şikeftnişîn.
- **HANGER** (zincîreya filmên) şerûdî.
- **SWALLOW** : pereslêra kendalan.

CLIMECTRIC, *n., adj.* : xalka guhorîna serekî, koçeya berteng, jiyê bêhîviyê, bertengî.

CLIMATIC, *adj.* : gopîtkî.

CLIMATE, *n.* : keş, seqa, avûba.

CLIMATIC, *adj.* : keşî.

CLIMATOLOGICAL, *adj.* : seqayî.

CLIMATOLOGICALLY, *adv.* : bi seqayî, seqakî.

CLIMATOLOGIST, : keşzan.

CLIMATOLOGY, *n.* : keşzanî.

CLIMAX, *n.* : gopîtk, navser.

CLIMB, *n., vi., t.* : ser ketin (evrazî...), ser keftin, perikîn.

CLIMBED, *adj.* : serketî, perikî, hilpirjî.

CLIMBER, *n.* : hilpirj.

CLIMBING, *n.* : hilpirjîn, raperkandin, pêhilçûn, xwehelwas, hilkişîn, hilperiştin.

- **FLOWER** : guldîwar.
- **IRON** : pêlava panîbizmarkirî (bo sanahîkirina serketinê).
- **VINE** : sexme.

CLINCH, *n., vt., i.* : girtina qayim, qayim girtin, biryar dan, serê bizmariyê badayî.

CLINCHER, *n.* : karê vebirr, rasti yan têbiniya vebirr.

CLIN(O)-, *pref.* : pêşgir e ko lêjî, nişîvî ye.

CLING, *vi.* : pêve man.

CLINGING, *n.* : pêveman.

CLINGY, *adj.* : çirr.

CLINIC, *n.* : nexweşxane, timargeh.

CLINICAL, *adj.* : nexweşxaneyî, pijîşkî.

CLINICIAN, *n.* : pijîşkê textî.

CLINK, *n.* : dengê tij, zîndan, çeqçeq, reqreq.

CLINKER, *n., vt.* : kevir, çewtiya gêre, nayab, bin ketin, kevir kirin.

- **BUILT** : ji dep pêkhati yan avakirî.

CLINKERED, *adj.* : kevirkirî.

CLINKERING, *n.* : kevirkirin.

CLINOMETER, *n.* : lêjîpîv.

CLINTONIA, *n.* : giyayek gul zer yan spî.

CLIP, *n., vt.* : cilgir, kezax kirin, ade kirin.

- **BOARD** : depê çingalkirî.

CLIPPED, *adj.* : adekirî, kezaxkirî, bodemkirî, kezaxtî, kezixandî.

CLIPPER, *n.* : pencinînk, cawbirr, adûde.

CLIPPING, *n.* : adekirin, kezax, pencinîn, pejilandin.

CLIQUE, *n., vt.* : taxim, tîre, birr, pehlanî, deste, komele, pîlan kirin.

CLIQUEY, *adj.* : taximî, tîreyî, duberekî.

CLIQUISH, *adj.* : taximî, tîreyî.

CLISTO GASTRA, *n.* : kemerteng.

CLITORIAL OR CLITORIC, *adj.* : gîlikî.

CLITORIS, *n.* : gîlik, gilik.

CLOACAL PLATE, *n.* : depê zilqedanî.

CLOAK, *n.* : eba, xîlik.

- **AND DAGGER** : pîlankarî, polîsî.
- **FUR-LINED ~** : kûrk.
- **ROOM** : jora sipartina demdariya kulav û qaputan, avrêj.

CLOBBER, *vt.* : lê dan (dijwar), kirêt revandin.

CLOBBERED, *adj.* : lêdayî.

CLOBBERING, *n.* : lêdan.

CLÓCHE, *n.* : kon yan parêzera şûşeyî (bo parastina helezî).

CLOCK, *n.* : demjimêr, katjimêr.

- **MAKER** : demjimêrçêker, demjimêrvan.
- **WISE** : ber destikê demjimêrî ve.
- **WORK** : karê demjimêrî.

CLOD, *n.* : gomçika axê yan teqnê, ax, dinyayî û pîs, engotik, kersek.

CLODDISH, cloddy, *adj.* : axî.

CLOD HOPPER, *n.* : gundî, gelho, pêlava stûr û mezin.

CLOD HOPPING, *adj.* : gelho.

CLODPATE, *n.* = **CLODPOLL.**

CLODPOLL OR CLODPOLE, *n.* : xirpo, gewc.

CLOG, *n., vt.i.* : gîrokirin, berbestkirin, girtin, semaya qirqapkan, qirqap, gîro kirin, berbest kirin, hatin girtin.

- **DANCE** : semaya qirqapkan.

CLOGGY, *adj.* : berbestkirî.

CLOISONNE, *n., adj.* : cudakerê rengan.

CLOISTER, *n., vt.* : dêr, dira mita cuda, cuda bûn.

CLOISTERED, *adj.* : civînî.

CLONE, *n.* : zaye.

CLONE, *vt.* : zan(zayîn), rûnivîs kirin.

CLONIC, *adj.* : lerizî.

CLONUS, *n.* : lerz, lerizîn.

CLOSE, *vt.i.* : pêve dan (derî...), girtin, daxistin.

- **TO ~ ABOUT** : dor girtin.
- **TO ~ DOWN** : daxistin, rawestîn, girtin.
- **TO ~ IN** : kurt bûn (roj), lê bûn tarî.
- **TO ~ IN UPON** : dan ser neyarî re.
- **TO ~ UP** : bi êkcarî daxistin.
- **TO ~ WITH** : dan ser dijminî re.

CLOSE, *n., adj.* : daxistî, nêzîk, dûmahî, dawî, kutayî.

- **AT HAND** : berdest, ne dor ji.
- **CALL**, *n.* : rizgarbûna ecêb.
- **CORPORATION** : hevkariya daxistî.
- **CROP OR CUT** : kurttirașî.
- **CHAIN** : zincîreya girtî.
- **GRAINED** : qayim vehînayî.
- **HAULED** : deryagerana dij arasteya bayî.
- **LIPPED OR ~ MOUTHED** : devgirtî.
- **QUARTERS**, dira teng, şerê nêzîk (pêkve).
- **SHAVE** : rizgarbûna ecêb.
- **TIE** : îşik.
- **TO OR BY** : nêzîk.
- **UPON** : nêzîk.
- **TO SAIL ~ TO THE WIND** : nêzîk serkêşî kirin.

CLOSED, *adj.* : daxistî, berbestkirî, pêvedayî, girtî.

- **SHOP** : damezrîna daxistî : ko pêviya ye hemî karker endamên yekîtiyê bin.

CLOSEFISTED, *adj.* : destgirtî, rijid, qinût, kinûz, destmiç.

CLOSEFISTEDNESS, *n.* : destmiçandin.

CLOSELY, *adv.* : bi hûrî, nêzîk, qayim, bi çikûsî.

CLOSET, *n.* : jora biçûk, dolab.

CLOSING, *n.* : daxistin, pêvedan, zetim.

- **EYE** : (çav) neqandin.

CLOSURE, *n.* : zetim.

CLOT, *n.* : givîn (xwîn), gomçik, bariste.

CLOT, *vi.t.* : givîn, guvîn, meyîn.

CLOTH, *n.* : perûk, sifre, çît, kinc, pertal, kutal, caw, sîpal.

- **COTTON** : xam, cang, çît.

- **OVERCOAT ~** : qestûr.

- **ROLL** : tob.

CLOTH, *vt.* : kinc kirin.

CLOTHES, *n.* : cil(ik), kinc, pertal, perûk, pûşak.

CLOTHES LINE, *n.* : benkê balavê, rist.

CLOTHES' MOTH, *n.* : morane, xurik, xêrîk, xwêrîk.

CLOTHIER, *n.* : cilfiroş.

CLOTHING, *n.* : cil, pûşak, berg.

CLOTH IRONING, *n.* : ûtîkirin.

CLOTTED, *adj.* : tirm, meyandî.

CLOTTING, *n.* : meyîn, riçîn, gomçikbûn.

CLOTURE, *n., vt.* : dûmahiya berhevdanê (bo dengstandinê), girtin (yan bi dûmahî hînan), girtina berhevdanê.

CLOUD, *n., vt.* : ewr, hewr, ewr bûn.

- **IN THE ~ S** : guhişî, gêj.

- **THICK GROUP OF ~ S** : telp.

- **UNDER A ~** : gumanbar, şermizar.

CLOUDBERRY, *n.* : esmantû.

CLOUDBURST, *n.* : taviya baranê.

CLOUDILY, *adv.* : bi ewrî, şêlî yan alizî, ewrkî.

CLOUDINESS, *n.* : ewrîtî, şêlîtî.

- **OF CORNEA** : ewrîtiya gilêneyî.

CLOUDLAND, *n.* : devera ewran.

CLOUDLESS, *adj.* : bê ewr, sayî, sahî, semale.

CLOUDLESSLY, *adv.* : bi bêewrî.

CLOUDLESSNESS, *n.* : bêewrîtî.

CLOUDLET, *n.* : ewrik (ewrê biçûk).

CLOUDY, *adj.* : ewr(î), şêlî, lêl.

CLOUGH, *n.* : nihala teng.

CLOUT, *n., vt.* : dersok, kincir, armanc, kiras; lê dan.

CLOVE, *n.* : kakila sîrê, pîvazk, bişkova qarenfelî.

- **HITCH** : girêka singî.

CLOVER, *n.* : sêper, sêpel, nefel, wênce.

- **LEAVE** : belgê sêperê yan nefelê.

CLOWN, *n.* : zirtek, qeşmer.

CLOWNERY, *n.* : zirtekîtî.

CLOWNISH, *adj.* : zirtekî.

CLOWNISHLY, *adv.* : bi zirtekî.

CLOWNISHNESS, *n.* : zirtekîtî.

CLOY, *vt., i.* : tijî kirin, tijî bûn.

CLOYING, *n.* : bêqamî.

CLUB, *n.* : yane, gastîn, şînik, gazlîn, hîwezî, çomaq, çomax, gurz, şiv, doq, tutik, cerge.

- **FOOT** : pêgork, pêgoç, pêxar.

- **HAND** : destgoç.

- **SHAPED GLAND** : livika şînikî.

- **WITH HANDLE** : gurz.

CLUB(B)ABLE, *adj.* : civakbar.

CLUBBED, *adj.* : goc.

CLUBBING, *n.* : lêdan (bi şînikî).

CLUBBY, *adj.* : yaneyî.

CLUB CHAIR, *n.* : kursîka yaneyî : kursîkek nizim, perûkstûr û dudestik e.

CLUB FOOTED, *adj.* : pêgoçkirî.

CLUBHOUSE, *n.* : avahiyê yaneyê.

CLUBMAN, *n.* : endamê yaneyê, yanexwaz.

CLUB SANDWICH, *n.* : kadeya nanê birajtî, goştê mirîşkê, bacansork û aho.

CLUB STEAK, *n.* : parçegoştê kêlekê.

CLUCK, *n., vi.t.* : qitqit (mirîşk), qurq, kurk, qitqit kirin.

CLUCKING, *n.* : qirt, qitqitkirin.

CLUE, *n.* : dirûv, belge.

CLUMBER (SPANIEL), *n.* : seyek pêkurt e.

CLUMP, *n., vi., t.* : himbiz, dehil, kom bûn, kom kirin.

CLUMPY, *adj.* : himbizî.

CLUMSILY, *adv.* : bi xirpoyî yan gewcî, xirpokî.

CLUMSY, *adj.* : xirpo, neşehreza.

CLUPEID, *n.* : texlîtek masî ye.

CLUSTER, *n., vi., t.* : gûşî, îşî, civatek, baristayî, îşî bûn.

CLUSTERED, *adj.* : îşîbûyî, ûşîkirî.

CLUTCH, *vt., i.* : girtin (qayim).

CLUTCH, *n.* : girtek.

CLUTTER, *vt., i., n.* : pişêwî, şepirzeyî, têkçûn, qerqeşe, kom kirin (bê serûberî), tiji kirin (tevlihevî), livîn (qerqeşeyî), qerqeşe kirin, axiftin (bi lez û bê têgehiştin).

CLYPEATE(D), *adj.* : gêrî.

CLYSTER, *n.* : derziya qonê.

CNIDARIA, *n.* pl. : gezîndar.

CO-, *pref.* : pêşgir e ko hevre, pêkve, yeksan e û hevkar e.

COACH, *n.* : karêt, meşqvan, rahêner, werzişvan, guhêzok.

- **MAN** : hajo.

COACHABILITY, *n.* : rahênbarî.

COACHABLE, *adj.* : rahênbar.

COACH-AND-FOUR, *n.* : çarhespî (erebane).

COACH BOX, *n.* : rûnişteka hajoyî.

COACHER, *n.* : meşqvan.

COACHY, *n.* : hajo, hajoyê erebaneyê.

COACERVATE, *n.* : gomçika dilopan.

COACT, *vi.* : harî kirin, hevkarî kirin.

COACTION, *n.* : hevkarî.

COACTIVE, *adj.* : hevkar.

COADAPTED, *adj.* : hevrehînayî.

COADJUTOR, *n.* : harîker, harîkerê metranî.

COADUNATE, *adj.* : yekbûyî, hevwerar.

COAGULABILITY, *n.* : meyînbar.

COAGULANT, *n.* : givîdar, meyînkar.

COAGULASE, *n.* : haveyna meyî.

COAGULATE, *vt., i.* : meyîn, cemisîn, tîr bûn, gomçik bûn.

COAGULATED, *adj.* : tîrbûyî, cemisî, meyî, givî, guvî, givtî.

COAGULATING, *n.* : meyandin.

COAGULATION, *n.* : meyîn, cemisîn, givîn, guvîn, riçîn.

- **OF BLOOD** : firobûna xwînê, cemisîna xwînê, meyîna xwînê, gomçikbûna xwînê.

COAGULATIVE ENZYME, *n.* : enzîma firobûnê.

COAGULUM, *n.* : hewên.

COAL, *n., vt.* : reji, komir, xelûz, bûn reji yan komir.

- **BED** : çîna erdê komirdar.

- **FIRE** : pel.

- **MINE** : kangeya komirî.

- **TO CARRY ~ TO NEWCASTLE** : tiştekê bûn direkê ko tiji wî tiştî ye(karek pêneviyayî kirin).

COALER, *n.* : rejîvan.

COALESCE, *vi.* : pêkveman, gomçik bûn.

COALESCED, *adj.* : pêkvemayî, venûsî.

COALESCENCE, *n.* : pêkveman, venûsînîti.

FETE, *n.* : aheng, mehrecan.

FETE, *vt.* : rêz girtin (bîr hatin).

FETED, *adj.* : rêzgirtî.

FETI(O)-, *pref.* : pêşgir e ko zikmak e.

FETICIDE, *n.* : zikmakkujî, tovkujî, pizkujî.

FETID, *adj.* : genî, bogen.

FETIDLY, *adv.* : bi geniyî, genîkî.

FETIDNESS, *n.* : genîtî.

FETING, *n.* : rêzgirtin.

FETISH, *n.* : niviştî, nûşte, pot.

FETISHISM, *n.* : potîtî.

FETLOCK, *n.* : mûyê paşpaniya hespî.

FETOR, *adj.* : genî, sifto.

FETTER(S), *n.* : pêbend, pabend, kot, çîdan, girêdan, bendan, paşmend, zincîr.

FETTER, *vt.* : bend kirin, girê dan.

FETTERED, *adj.* : pêbendkirî, bendewar.

FETTERING, *n.* : pêbendkirin, pabendkirin.

FETTLE, *n.* : bar, xîz (bo firnê).

FETTLE, *vt.* : nixaftin (bi xîzî).

FETTLED, *adj.* : nixaftî.

FETTLING, *n.* : xîzkirin (firn).

FETUS, *n.* : piz, awlime, zikmak, korpele, pis.

FEU, *n., vt.* : kirêdana berdewam, berdewam kirê kirin.

FEUD, *n.* : dijminî, dujminî, şer, neyarî, derebegî.

FEUDAL, *n.* : derebeg.

FEUDALISM, *n.* : derebegîtî.

FEUDALITY, *n.* : derebegîtî.

FEUDALITY, *n.* : derebegîtî.

FEUDALIZATION, *n.* : derebegîbûn, derebegîkirin.

FEUDALIZE, *vt.* : derebegî kirin.

FEUDALIZED, *adj.* : derebegîkirî.

FEUDALIZING, *n.* : derebegîkirin.

FEUDATORY, *adj., n.* : derebeg, derebegî.

FEUDIST, *n.* : derebegî qanûnzan.

FEUILLETON, *n.* : laperê vesihînê (kovar yan rojname), romana zincîrkirî.

FEVER, *n.* : ta, lerizîn.

- **BLISTERS** : pirzikên ser devî.

- **FURUNCLE ~** : germişk.

- **MALIGNANT ~** : taya veşartî.

- **PUERPERAL ~** : taya zêstanî.
- **QUARTAN ~** : taya sar.
- **SCARLET ~** : taya sor, soreta.
- **TRINAL ~** : taya sêroj.
- **YELLOW ~** : taya zer.

FEVERED, *adj.* : tayî, tawî.

FEVERFEW, *n.* : giyayek belg perî ye.

FEVERING, *n.* : lerizîn.

FEVERISH, *adj.* : arhayî, tawî, perîşan.

FEVER TRAP, *n.* : wargehê tayê.

FEVER TREE, *n.* : darê tayê.

FEVEROUS, *adj.* : tayî, tawî.

FEW, *adj., n.* : kem, hindek, hindik, hinek.

FEWNESS, *n.* : hindekayî.

FEY, *adj.* : dûrbîn, xefzan, şêt, kembaxkirî.

FEZ, *n.* : fês.

FIACRE, *n.* : guhêzokek biçûk çarçerxî.

FIANCE, *n.* : dezgirtî, delende.

FIASCO, *n.* : têkçûn, binketina temam.

FIAT, *n.* : destûr, ferman.

FIB, *n.* : derewa pûç yan biçûk.

FIB, *vi.t.* : derew kirin.

FIBBED, *adj.* : derewkirî.

FIBBER, *n.* : derewker, direwîn.

FIBBING, *n.* : helat.

FIBRE, *n.* : rîs, rîşal, rîş.

- **BOARD** : depikê tenikê rîşalî.
- **GLASS** : şûşeyê ristî.

FIBERIZE, *vt.* : ristîn, rîşal kirin.

FIBERIZED, *adj.* : rîşalkirî.

FIBR(O)-, *pref.* : pêşgir e ko ristî ye yan tevnê ristî ye.

FIBRE, *n.* : rîşal.

FIBRIFORM, *adj.* : ristî.

FIBRIL, *n.* : rîşalk, riha mûyî.

FIBRILLAR, *adj.* : rîşalkî.

FIBRILLATION, *n.* : rihgirtina rîşalî, girjbûna masûlkeyî, lerizîna masûlkeyî.

FIBRIN, *n.* : rîşalk.

FIBRINOGEN, *n.* : rîşalk çêker.

FIBRINOUS, *adj.* : rîşalî.

FIBRO-, *pref.* : pêşgir e ko rîşal e.

FIBROID, *adj., n.* : rîşalî, pejbûn (ne bed).

FIBROIN, *n.* : madeyê binyatê avirmîşî.

FIBROMA, *n.* : pufbûna rîsî (ne bed).

FIBROSIS, *n.* : rîşalbûn.

FIBROUS, *adj.* : rîsî.

FIBROVASCULAR, *adj.* : amanê rîşalî.

FIBULA, *n.* : toq.

FICKLE, *adj.* : wergêr, dureng, guhork, dilkoçer.

FICTILE, *adj.* : nerm, gilîne.

FICTION, *n.* : çîrok, roman, aşop.

FICTIONAL, *adj.* : aşopî, çîrokî.

FICTIONALIZE, *vt.* : vegêrîn, kirin roman.

FICTIONEER, *n.* : çîrokbêj, romannivîs.

FICTIONIST, *n.* : romannivîs, çîroknivîs.

FICTITIOUS, *adj.* : aşopî.

FICTIVE, *adj.* : aşopdar.

FID, *n.* : singok.

FIDDLE, *n.* : kemence.

- **FIT AS A ~** : saxlem, şad .

FIDDLE, *vt.i.* : demî zehê kirin, jenîn (kemence).

- **TO PLAY FIRST OR SECOND ~** : karê serekî yan duwekî kirin.

FIDDLEBACK, *n.* : kemenceyî.

FIDDLE-FADDLE, *n.* : pûçbêjî.

FIDDLER, *n.* : kemanjen, lasar.

FIDDLESTICK, *n.* : kevana kemenceyî.

FIDDLING, *adj.* : pûç, hîçek.

FIDEISM, *n.* : baweridarî, (şûna mejîdarî).

FIDELITY, *n.* : emekdarîtî, emek, heyranî, dilsozî, sifet.

FIDGET, *n.* : bêzarî, gevşik.

FIDGET, *vi.* : perîşan bûn.

FIDGETY, *adj.* : gevşikî, bêzarî, perîşanî, biz.

FIDUCIAL, *adj.* : bawerî.

FIDUCIARY, *n., adj.* : nimînender, nuwêner, niwêner.

FIE, *interj.* : kembax bit!, wey bo vê şermê!.

FIEF, *adj.* : derebegî.

FIELD, *n., adj.* : zevî, şov, kêlgeh, kaye, biwar.

- **CORN ~** : zeviya genimî.

- **STRENGH** : xurtî yan hêza zeviyê (magnetîz).

- **TO HOLD THE ~** : êrîşker şikandin.

- **TO TAKE THE ~** : şerî kirin, meydan girtin.

FIELD, *vt.* : çûn meydanê, keftin meydanê.

FIELDER, *n.* : yarîkerê berevan.

FIELDFARE, *n.* : baldan.

FIELD GUN, *n.* : topa meydanê.

FIELD HOUSE, *n.* : xaniyê meydanê.

FIELD MARSHAL, *n.* : marşal.

FIELD OFFICER, *n.* : efserê meydanê.

FIEND, *n.* : dêw, beng, bedmirov, şehreza.

FIENDISH, *adj.* : bed, dirrinde, hov, dêwî.

FIERCE, *adj.* : dijwar, dirrinde, ziyandar, bed.

FIERCELY, *adv.* : bi dijwarî, dijwarekî.

FIERCENESS, *n.* : dijwarîtî.

FIERY, *adj.* : agirîn, gurîgirtî, agirgirtî, sorbûyî, dijwar, enirî, ateşî, argon.

FIESTA, *n.* : cejn.

FIFA, *abbr.* : **INTERNATIONAL FOOTBALL FEDERATION** : yeketiya cîhaniya tepka pêyan.

FIFE, *n.* : ney.

FIFERAIL, *n.* : werîsê li dor babirekê serekî(li gel singên girêdanê).

FIFTEEN, *n., adj.* : pazdeh, panzdeh.

FIFTEENTH, *adj.* : pazdehemîn, panzdehî, pazdehî.

FIFTH, *n., adj.* : pencem.

- **COLUMN** : biyanîperist, tabora pêncem (xiniz).

FIFTHLY, *adv.* : pêncemî.

FIFTY, *n., adj.* : pêncî, pencan.

- **FIFTY** : nîv nîv, nîvekî, pêncî pêncî.

FIG, *n.* : hêjîr, hêjîr, hencîr, cil, kiras.

- **LEAF** : belgê hêjîrê (bo nixaftina şermecê yan çêwtiyekê).

- **MARIGOLD** : mexmork hêjîrî : helezek gul spî yan qerenfilî.

- **IN FULL ~** : qenc karkirî.

- **IN GOOD ~** : taze diyar, li barek qenc de.

FIGHT, *n.* : şer, ceng, rezm, bergirî, têkoşîn.

- **SHAM ~** : zirşer.

FIGHT, *vi.t.* : şerî kirin, xebat kirin.

- **TO ~ SHY OF** : xwe vedan (ji pirsekê).

- **TO ~ OFF** : şikandin (dijmîn yan nesaxî bi bergiriyê).

- **TO ~ ON** : bi şerî ve çûn, xebat berdewam kirin.

- **TO ~ IT OUT** : bi şerî çare kirin.

- TO ~ ONE'S WAY IN LIFE : rêya xwe li jiyanê / bi xebatê (vekirîn) birrîn.

FIGHTER, *n.* : şerker, xebatker, cengbaz, cengawer, şerevan, têkoşer.

- PLANE : balafira şerker, firokeya şerker.

FIGHTING, *n.* : şerkirin, şer, ceng, têkoşîn.

- PARTRIDGE : kewê ribat.

FIGMENT, *n.* : tiştê derew, zir.

FIGURAL, *adj.* : wêneyî.

FIGURATION, *n.* : wênekirin, şêwe, xwaza, xemilandin.

FIGURATIVE, *adj.* : hêmadar, xwazayî.

FIGURE, *n.* : hejmar, tîp, tibab, jimare, nîgar, bejn, şewe, nexs, nirx, biha, wêne, peyker, xwaza.

- DANCING ~ : çopî.

- HEAD : serokê wêneyî (şiklî).

- OF SPEECH : xwazayî, mînakirin.

FIGURE, *vt.i.* hejmartin, wêne kirin, neqş-kirin.

- TO ~ ON : biryar dan, hizir kirin.

- TO ~ OUT : rave kirin, xeml kirin, hejmartin.

FIGURED, *adj.* : wênekirî, xemlkirî, neqşkirî.

FIGURINE, *n.* : peykerk.

FIGURING, *n.* : neqşkirin.

FIGWORT, *n.* : giyaberaz.

FILAMENT, *n.* : fetîlk, benik, rîş, ta.

FILAR, *adj.* : benikî, benikdar, tayî, tadar.

FILARIA, *n.* : kirmikek zirav mişexwer di nav xwînê de.

FILARIASIS, *n.* : derdê kirmikan.

FILATURE, *n.* : vekirina avirmîşî.

FILBERT, *n.* : darbindeq.

FILCH, *vt.* : dizîn.

FILE, *n.* : rêz, rêzgel, kardik, kartik, birr-bend, qewre, boş destbend, per-wend.

FILE, *vt.* : verenandin, rêz kirin, pêk hînan.

FILET, *n.* : tûrik, caş.

FILED, *adj.* : verenî, rêzkirî.

FILIAL, *adj.* : kurî.

FILIATION, *n.* : kurîtî, liqê çandayekê yan zimanekê, xizmatî, mirovatî.

FILIBUSTER, *n.* : gîrokirin, deryagir, caş.

FILIBUSTER, *vi.* : gîro kirin.

FILIFORM, *adj.* : benikî, wek benikî.

FILIGREE, *n.* : kunkirina xemlandinê.

FILING, *n.* : verenîn.

FILINGS, *n.* (iron) : hûrê asinî.

FILINGS, *n.* (wood) : telaş, telîşk.

FILL, *n.* : pir(r), tijî, tejî.

FILL, *vt.i.* : tijî kirin, dagirtin, pir kirin.

- TO ~ IN : ragehînê tijî dikit.

- TO ~ OUT : valayiyê tijî dikit.

- TO ~ THE BILL : kêr hatin.

- TO ~ UP : tijî kirin, tijî bûn.

FILLED, *adj.* : tijîkirî, têrkirî, dagirtî.

FILLER, *n.* : tijîker.

FILLET, *n.* : goştê çêlê, xemlandina bergê pirtûkê, dersoka eniyê.

FILLING, *n.* : axinîn, dagirtin, tijîkirin, tijîbûn, pirbûn.

- STATION : benzînxane.

- UP : tijîkirin, dagirtin, têrkirin.

FILLIP, *n., vt.* : tillêdan, hêmena aran, tilan lê dan.

FILLISTER, *n.* : kels bo hevîrk û cama pencerkê.

FILLY, *n.* : keç, canî, kûrîşk.

FILM, *n.* : tûk, pûstik, tûwêjek, perde, film.

FILMDOM, *n.* : filmsazî.

FILMY, *adj.* : rohn, tenik, perdeyî, tûkî.

FILOSE, *adj.* : benikî, tayî.

FILTER, *n.* : sefok, parzong, palêwk, parzin, palêwgeh.

- **TIP** : serikpalêwk, cigareya serikpalêwk.

FILTER, *vt.i.* : parizîn, dipalêwit, sepî kirin.

FILTERING, *n.* : sepîkirin, palawtin, palandin.

FILTH, *n.* : pîsatî, çirkin, gilêş, qilêr, qirêj, qirêjayî, çilk, gemar.

FILTHINESS, *n.* : pîsatî, gemar, gilêş, qirêj.

FILTHY, *adj.* : pîs, nepak, çepel, rêvin, mirdar, qirêjî.

FILTRABLE, *adj.* : parzinbar, sepîbar.

FILTRATE, *n.* : (hatî) sepîkirin.

FILTRATE, *vt.i.* : sepîkirin, sepandin.

FILTRATION, *n.* : sepîkirin, palawtin.

FILUM, *n.* (*pl.* **FILA**) : benik, ta.

FIMBRIATE(D), *adj.* : mijamgkirî, mijûlankirî.

FIN, *n.* : şaper, per, pereke, perê masiyê.

FINABLE, *adj.* : başbar, çakbar.

FINAGLE, *vt.i.* : xapandin.

FINAL, *n., adj.* : dûmahîk, dawîn, dawî, kutayî, paşîn.

FINALE, *n.* : dûmahî, dawî.

FINALISM, *n.* : armancîtî.

FINALIST, *n.* : yarîkerê pêşbirkeya dûmahî.

FINALITY, *n.* : dûmahîtî, dawîtî.

FINALISATION, *n.* : dûmahîbûn, kutayîbûn.

FINALISE, *vt.* : berpê kirin, temam kirin.

FINALISED, *adj.* : dûmahîkirî.

FINALISING, *n.* : dûmahîkirin.

FINALLY, *adv.* : bi vebirrî, dûmahîkî, vebirrkî.

FINANCE, *n.* : darayî, gencîne.

FINANCE, *vt.* : darayî kirin.

FINANCED, *adj.* : darayîkirî.

FINANCIAL, *adj.* : darayî.

FINANCIER, *n.* : darayîvan, pisporê darayî, sermayedar.

FINANCING, *n.* : paredan, darayîkirin.

FINBACK, *n.* : hirkol ! nehengê şaperkirî.

FINCH, *n.* : çûçik, çûkika mastî.

FIND, *n.* : peydakirin.

- **BY TOUCH** : depelandin.

FIND, *vt.i.* : peyda kirin, dîtin.

- **TO ~ FAULT (WITH)** : her gazinde kirin.

- **TO ~ OUT** : zanîn, seh kirin, pê hesîn.

FINDER, *n.* : peydaker, sehker, dûrbîn.

FINDING, *n.* : peydakirin, sehkirin, encama lêgeranê.

- **OUT** : serhilbûn.

FINE, *n., adj., adv.* : taze, baş, qenc, başbûn, hûrik, hilî, cindî, wurd, tawane, nerm, zebloq, siza.

- **CRUSHED WHEAT** : hîrik.

- **DRAWING** : hêvaştin.

- **SAND** : retem, xîzê hûr.

FINE, *vt.* : siza kirin.

FINE ARTS, *n.* : hunerên ciwan.

FINED, *adj.* : sizakirî.

FINELY, *adv.* : bi nayabî, bi tazeyî, tazekî.

FINENESS, *n.* : zebleqî, bijînî, çakî, başbûn, xasekîtî, nazikîtî, bijîniya zêrî.

FINERY, *n.* : parzong, cil yan çekên xemilandinê.

FINES, *n.* : arikê xavê metalî.

FINESPUN, *adj.* : hûr rês, aşopî, gelek hûr.

FINESSE, *n.* : naziki, hûrî, jîrî.

FINGER, *n.* : til, bêçî, pilk, engost, tipl.

- **CYMBAL** : xelîle.
- **INDEX** : nîşanker, şikefalîs, til.
- **JOINT** : geh, girêya tilê.
- **NAIL** : neynûk, nînok.
- **RING** : babeloç.
- **THUMB** : tila beranî.
- **TIP(S)** : sertil, gomik, pêçî.
- **LITTLE ~** : qiliç, qiliçk.
- **MIDDLE ~** : dolidemkêş.

FINGER, *vt.* : dest kirin, dapelandin, nîşan kirin.

FINGERING, *n.* : her tiştê biçûk nemaze masî.

FINGER PAINTING, *n.* : wênekirina tilî.

FINGER POST, *n.* : nîşankera tilî.

FINGER PRINT, *n.* : çapkirina tilî.

FINGER WAVE, *n.* : pêlkirina tilî (bo pirçê).

FINIAL, *n.* : dûmahîkî, gopîtka birc yan banî.

FINICAL, *adj.* : gazindeker, nazdar.

FINING, *n.* : sizakirin.

FINIS, *n.* : dûmahî, kutayî, paşî, paşîn, dawî.

FINISH, *n.* : gehiştina serî, gihana serî, dûmahî, kutayî.

FINISH, *vt.i.* : temam kirin, hêvişîn, gihan serî, temam bûn.

FINISHED, *adj.* : şimşat, hêvişyayî.

FINISHER, *n.* : temamker.

FINISHING, *n.* : hêvişîn, kutakirin, temamkirin, dûmahîanîn.

FINITE, *n., adj.* : sinordar, radedar.

FINITELY, *adv.* : bi sinordarî, radedarkî.

FINITENESS, *n.* : sinordarîtî.

FINITUDE, *n.* : sinordarîtî.

FINK, *n.* : sîxor.

FIN(N), *n.* : gelê rojhelata bakura Ewropî ko dibêjin xwe Somî.

FINNAN OR FINNAN HADDOCK, *n.* : masiya dûkêlkirî.

FINNER, *n.* : texlîtek neheng.

FINNIC, *adj.* : yek ji gelên Somî.

FINNISH, *n., adj.* : zimanê Finiyan.

FINNY, *adj.* : perdar.

FIORD, *n.* : ava zirav û dirêja navbera kendalan de.

FIPPLE, *n.* : serdevka fîtikê.

FIR, *n.* : kaj, pelk.

- **TREE** : kaj, merx, darok.

FIRE, *n.* : agir, şewat, kana agirî, şewla agirî, pêt, gurîk.

- **ALARM** : agehiya agirî.
- **ARM** : çekê agirî.
- **BALL** : goga agirî.
- **BRAND** : pel, pereng, bizût, pêt.
- **BRICK** : agire xişt, kelpûçê agirî.
- **BRIGADE** : agirkujîn.
- **CLAY** : agirgil.
- **DEPARTMENT** : (kargeha) agirkujîn.
- **DRILL** : meşqa agirkujî.
- **FIGHTER** : agirkuj.
- **FLY** : pispisok.
- **MAN** : agirkuj.
- **FIGHTING** : agirkujîn.
- **PLACE** : agirdan, koçik, argon, pixêrîk.
- **PLUG** : marpêça avê.

- **WORSHIPPER**, *n.* : agirperês.

FIRE, *vt.i.* : sotin, agir kirin, teqandin, derxistin, kirin der.

FIRED, *adj.* : sotî, derxistî, agirberdayî.

FIRELESS, *adj.* : bê agir.

FIRESTONE, *n.* : beriste.

FIREWOOD, *n.* : êzing, qoçik.

FIREWORKS, *n.* : yariyên agirî, agirbazî.

FIRING, *n.* : teqandin, derxistin, derkirin, çeqandin.

- **LINE** : hêla agirî.

- **PIN** : derziya çekî.

FIRKIN, *n.* : birmîlê biçûk.

FIRM, *n., adj.* : pitew, tund, qayim, xwegir, hevkarî, girdan, turt, xiwat.

FIRM, *vt.i.* : qayim kirin yan bûn.

FIRMAMENT, *n.* : esman, quba şîn, govek.

FIRMLY, *adv.* : bi qayimî, qayimkî.

FIRMNESS, *n.* : ragirtin, qayimî, paydarî, pitewî, hevgirtin, micik.

FIRST, *n., adj., adv.* : pêşîn, yekem, yekemîn.

- **AID** : harîkirin yan yarmetiya seretayî.

- **BORN** : nûber, nexrî, nixrî.

- **CHILD** : nexrî, nixrî.

- **FRUIT** : nûber, nûbar, berane.

- **NAME** : serenav, pêşnav.

- **PRODUCE** : kobarî.

- **TASTE** : xêv, xêvan.

- **STOREY** : nuhoma yekem.

- **STRING** : nijad.

FIRST LIEUTENANT, *n.* : efserê yekstêr.

FIRSTLING, *n.* : kobarî, berane, nûber, nexrî, nixrî.

FIRSTLY, *adv.* : yekem.

FIRSTH, *n.* : rêjgeh, navgeh, awerêj.

FISC (FISK), *n.* : gencîne, xezîne, darayîxane.

FISCAL, *n., adj.* : darayî, gencîneyî.

FISH, *n.* : masî, goştê masiyê.

- **CAKE** : kiloca masiyê.

- **EGGS** : xerz.

- **OTHER ~ TO FRY** : guh dan pirsên dî, çavê wî li tiştek dî ye.

- **TO FEED THE ~ES** : gêj bûn.

FISH, *vi.t.* : masî girtin.

- **TO ~ IN TROUBLED WATER** : nêçîr kirin di nav ava şêlî de.

- **TO ~ OUT** : girtin.

FISHABILITY, *n.* : nêçîrbarîtî.

FISHABLE, *adj.* : nêçîrbar.

FISH-AND-CHIPS, *n.* : masî û kartolên qelandî.

FISHER, *n.* : masîgir, torvan.

FISHERY, *n.* : masîgeh, damezrîna masiyan, masîgirtin, mafê masîgirtinê.

FISHING, *n.* : masîgirtin.

- **BOAT**, *n.* : gemiya masîgerî.

- **MAN** : masîgir, masîvan.

FISH HOOK, *n.* : niklok.

FISH MONGER, *n.* : masîfiroş.

FISH NET, *n.* : tor.

FISH STORY, *n.* : çîroka nebawer.

FISHTAIL, *vt.* : dûvik livandin (bo kêmkirina lezê).

FISH-TRAP, *n.* : maşelî.

FISHWIFE, *n.* : jina masîfiroşî.

FISHY, *adj.* : gumandar, tam yan bêhn masî, masiyî, têrmasî.

FISSILE, *adj.* : kelşdar.

- **ROCK** : temox.

FISSION, *n.* : kelişîn, kelşan, kerbûn, kertbûn.

- **ATOMIC ~** : kelişîna gerdîleyî.
- **BOMB** : bombeya gerdîleyî.
- **PRODUCTS** : berê kelişînê, berhemên kelişînê.

FISSIONABILITY, *n.* : kelişînbarîtî.

FISSIONABLE, *adj.* : kelşbar, kelişînbar.

FISSIONED, *adj.* : kelişî.

FISSIONING, *n.* : kelişîn.

FISSIPAROUS, *adj.* : dabeşî : za û zêya dabeşî.

FISSURE, *n.* : kelş, qelş, celx, com, derz.

FISSURE, *vt.i.* : kelştin, kelişandin.

FISSURED, *adj.* : kelişandî.

FISSURING, *n.* : şikaftin.

FIST, *n.* : mist, kulm.

FIST, *vt.* : mistek lê dan, kulmek lê dan.

FISTFUL, *n.* : mist, mistek.

FISTFULLY, *adj.* : bi harî, harkî.

FISTFULNESS, *n.* : harîtî.

FISTIC(AL), *adj.* : kulmbazî.

FISTICUFFS, *n.* : mistbazîkirin.

FISTULA, *n.* : nasor.

FISTULOUS, *adj.* : nasorî, vala wek zilkî.

FIT OR FYTTE, *n.* : parçeyek helbestê.

FIT, *n., adj.* : gunc, kêrhatî, nermenîşk, pirik, kêr, amade, lêkdayî, gerek, lebar, pêkhatî, nexweşî.

FIT, *vt.i.* : kêr hatin, saz kirin.

FITCH, *n.* : fisos, pûrtê fisosî.

FITCHET, *n.* : fisos.

FITCHEW, *n.* : fisos.

FITFUL, *adj.* : demdemî, girjbûnî.

FITMENT, *n.* : parçeya kelûpelî.

FITNESS, *n.* : kêrhatin, guncan, saxlemî.

FITTED, *adj.* : kêrhatîkirin, qaydekirin.

FITTER, *n.* : çaker, fiterçî.

FITTING, *n., adj.* : guncandin, kêrhatin, şayandin, bicih, qaydekirin, kêrhatîkirin.

FIVE, *n.* : pênc.

- **AND TEN (DIME)** : firoşgeha tiştên erzan.
- **FINGER** : qoça asikî.
- **FOLD** : pênc carî.
- **STAR** : pênc stêr, efserê payedar.

FIVER, *n.* : pêncek : pênc dolar yan pawind.

FIVES, *n.* : yariyek tepkê : bi destê lepikî, şînik (sêkes dileyizin).

FIX, *n.* : tengavî, têgîrane, perîşanî, bertîl.

FIX, *vt.i.* : çak kirin, çêkirin, qayim kirin, (biha) danan, rast kirin, lêk dan.

- **TO ~ ON OR UPON** : biryar dan, çare kirin, guno kirin.
- **TO ~ UP** : lêk dan.

FIXABLE, *adj.* : çakbar.

FIXATE, *vt.i.* : tewat kirin.

FIXATION, *n.* : tewatkirin.

FIXATIVE, *n., adj.* : tewat dar, tewatî.

FIXED, *adj.* : tewat, xwegir, radedar.

- **CHARGE** : bihayê tewat.
- **IDEA** : hizra tewat.

FIXEDLY, *adv.* : bi tewatî, tewatkî.

FIXEDNESS, *n.* : tewatîtî, tewatbûn.

FIXING, *n.* : tewatkirin.

FIXITY, *n.* : tewat.

FIXTURE, *n.* : dîroka (danayî bo) yariya, tewat, qayimkirin.

FIZZ, *n.* : gîze, dengê kelînê, kelîn.

FIZZ, *vi.* : kelîn.

FIZZLE, *n.* : sistbûn, binketin.

FIZZLE, *vi.* : sist bûn, bin keftin.

FIZZLED, *adj.* : sistbûyî, binketî.

FIZZLING, *n.* : sistbûn, bin ketin.

FLABBERGAST, *vt.* : şaş kirin, ciniqandin, guhişandin.

FLABBERGASTED, *adj.* : veciniqî, mat, guhişandî.

FLABBINESS, *n.* : sistîtî, rexe.

FLABBY, *adj.* : xwînsar, lawaz, şil.

FLABELLATE, *adj.* : baweşînkî.

FLABELLUM, *n.* : baweşînk, endamek leşî wek baweşînkî.

FLACCID, *adj.* : peşûş, nerm, xav.

FLACCIDITY, *n.* : xavîtî, sistîtî, rexe.

FLAG, *n.* : ala, bêraq, peydax, sosin, sîsin, beyax, regezname.

- **BEARER** : ala helgir, bêraqdar, aladar.
- **HOLDER** : aladar.
- **SHIP** : gemiya mîrderyayî.
- **STONE** : berê pan.

FLAG, *vt.i.* : ala helgirtin, nîşankirin (bi alayê), daweşîn, çilmisîn.

FLAGELLANT, *n.* : tajangvan.

FLAGELLATE, *vt., n.* : celde dan, tajang dan, çiqê xişok.

FLAGELLATED, *adj.* : celdekirî.

FLAGELLUM, *n.* : çiqikê xişok.

FLAGEOLET, *n.* : fitik.

FLAGGED, *adj.* : alakirî.

FLAGELLATING, *n.* : celdekirin.

FLAGGING, *n., adj.* : çilmisî, lawaz.

FLAGGY, *adj.* : têrsosinên çolê.

FLAGITIOUS, *adj.* : kirêt, şerm, bed, garîs.

FLAGITIOUSLY, *adv.* : bi garîsî.

FLAGITIOUSNESS, *n.* : garîsîtî.

FLAGMAN, *n.* : nîşan(hî)nêr (bi alayî).

FLAGON, *n.* : mesîn.

FLAGPOST, *n.* : darala.

FLAGRANT, *adj.* : zeq, bed, eşkera, bêqam.

FLAGRANTE DELICTO, *adv.* : tawana eşkera.

FLAGSTAFF, *n.* : darala.

FLAG STOP OR STATION, *n.* : êzgeha nîşankirinê (bo rawestanê).

FLAG-WAVING, *n.* : demargirî, şovînî, neteweperistina zêde.

FLAIL, *n.* : genimqutê destî.

FLAIL, *vt.* : qutan.

FLAIR, *n.* : hişa sehkirinê, hez.

FLAK, *n.* : topa dijbalafir, agirê vê topê.

FLAKE, *n.* : çinî.

FLAKE, *vi.t.* : çinî kirin.

FLAKED, *adj.* : çinîkirî.

FLAM, *n.* : dehol lêdana taybetî, fêlbazî, xapîn, derew.

FLAM, *vt.i.* : xapandin.

FLAMBEAU, *n.* : çirax, çira, xetire.

FLAMBOYANCE, *n.* : geşbûn, pêlbûn.

FLAMBOYANT, *adj.* : geş, pêlî.

FLAME, *n.* : gurî, girme, girr, gur, pêt, rivên, rivîn, rimîn, şewl, agir, alav, geşbûn, şewat, bilêse.

- **CULTIVATOR** : pêthavêja çandinê.
- **THROWER** : pêt havêt, gurî havêj.
- **OUT** : rawestana bizwên yan makîne ya balafira vizikdar.
- **PROOF** : dijgurî.

FLAME, *vi.t.* : sotin, gurî kirin, geş bûn, ronahî kirin (bi guriyê).

FLAMED, *adj.* : gurîkirî.

FLAMEN, *n.* : oldar.

FLAMING, *adj.* : geş, gurîn, dagirsaw.

FLAMINGO, *n.* : balindeyek avî ye.

FLAMMABLE, *adj.* : gurîbar.

FLAN, *n.* : kiloc.

FLANGE, *n.* : baho, lêvik, filence.

FLANGE, *vi.* : lêvik kirin, filence kirin.

FLANGER, *n.* : lêvik.

FLANK, *n.* : rexê leşkerî, rex, tenişt, kêlek.

FLANK, *vt.* : erîş kirin rexî, rexê leşkerî parastin.

FLANKER, *n.* : çeper yan senger gef dikit rexî yan rexî diparêzit.

FLANNEL, *n.* : fanêle, tevnê nermê hirî, binkirasê fanêle, şelwar.

FLAP, *n., vt.i.* : lêdan (li tiştekî pan), tiştê pan yan nermê dahêlayî, levdan, damen, dehmen, pêş lê dan, hesîn.

- **OF TENT** : hêşî.

FLAP DOODLE, *n.* : gevezeyî, pûçbêjî, pir û pûç.

FLAP JACK, *n.* : zilopî.

FLAPPED, *adj.* : hejayî.

FLAPPER, *n.* : mêşkuj.

FLARE, *n.* : ronahiya agirî, riv, rivîn, rivên, peqîn, enirîna bêqama nişkî.

- **UP** : hawit, citbûn, derbirrîna enirînê, agir berbûn.

FLARE, *vi.t.* : ronahî kirin, geş bûn, enirîn, nîşan kirin (bi agirî yan ronahiyê).

FLARING, *adj.* : gurî, sotina geş.

FLASH, *n.* : çirîsk, çirûsk, tirûsk, yarîker, kilpe, çirisîn, bişkurîn, gav, fêza erzan, şewqdan, zir.

- **BACK** : paşvebirina hunerî.

- **BOARD** : depê ser sikrî (bo zêdekirina kûriya avê).

- **FLOOD** : boşbûn (av rabûn) ya deverî (ji ber baranê).

- **OF LIGHTENING** : tirûsk.

- **POINT** : pileya çirîskê.

- **TUBE** : loleya peqînker.

FLASH, *vi.t.* : çirisîn, ronahî kirin.

FLASHED, *adj.* : çirisî.

FLASHER, *n.* : mûm.

FLASHING, *n.* : çirisîn, çirax.

FLASH LAMP, *n.* : çirayê çirîskî.

FLASHY, *adj.* : çirisî, zerkeş, xemilandî, bêtam, kuh, bêjiyan, bêsî (bêxwê).

FLASK, *n.* : kemole, gogim, şûşe.

- **ROSE WATER ~** : gulavdan.

FLASKET, *n.* : sebeta cilan.

FLAT, *n., adj.* : pan, pehn, tat, late, vêl, rast, xanîk, deşt.

- **BRICK** : qalo.

- **HEADED IRON BAR** : hestîv.

- **IRON** : ûtî.

- **LAND** : rasteder.

- **PLACE** : rastik.

FLAT BOAT, *n.* : gemiya binpan.

FLATCAP, *n.* : kum yan kulavê panê girûvir.

FLATCAR, *n.* : barkêşa pana vekirî.

FLATFISH, *n.* : masiya pan.

FLATFOOT, *n.* : pêpanî.

FLATFOOTED, *adj.* : pêpan.

FLAT-HAT, *vi.* : balafir nizim hajotin.

FLATHEAD, *n.* : masiyek serpan e, hindokê sor.

FLAT ROCK, *n.* : ferş (kevrê panê tenik).

FLAT SILVER, *n.* : amanên zîv.

FLATTEN, *vt.i.* : rast kirin, pan kirin.

FLATTENED, *adj.* : pankirî.

FLATTENER, *n.* : ba(n)gordan.

FLATTENING, *n.* : pankirin, bangerîn.

FLATTER, *n.* : dilrevînî, rûbazî.

FLATTER, *vt.i.* : rûbazî kirin.

FLATTERY, *n.* : durûyî, salasî, rûpayî, rûbazî.

FLATTOP, *n.* : gemiya balafir helgir.

FLATULENCE OR FLATULENCY, *n.* : tirr, qebeyî, zik bayî, nepexek.

FLATULENT, *adj.* : qebe, zikba.

FLATULENTLY, *adv.* : bi qebekî, qebkî.

FLATUS, *n.* : ba, zikba.

FLATWARE, *n.* : amanên zîv.

FLATWISE OR FLATWAYS, *adv.* : serzikî.

FLAUNT, *vi.t.* : xwe mezin kirin, xwe puf dan.

FLAUNTING, *n.* : fortekî.

FLAUTIST, *n.* : zurnavan.

FLAVESCENT, *adj.* : zerkok.

FLAVINE, *n.* : boyeyek zere.

FLAVO PROTEIN, *n.* : pirotînek pêgirek e.

FLAVOUR, *n.* : tam, çêşt, bêhna xoş.

FLAVOUR, *vt.* : (bi) tam kirin.

FLAVOURED, *adj.* : tamdarkirî.

FLAVOURFUL, *adj.* : tamdar.

FLAVOURING, *n.* : tam.

FLAVOURLESS, *adj.* : bêtam.

FLAVOUROUS, *adj.* : tamdar.

FLAW, *n.* : çewtî, kêmatî, derz, xewş, bahatin, kurtebahoz.

FLAW, *vt.i.* : kelîştin, derizîn.

FLAWLESS, *adj.* : bêkêmatî, bêçewtî.

FLAWLESSLY, *adv.* : bêçewtîkî.

FLAWLESSNESS, *n.* : bêçewtîtî.

FLAX, *n.* : kitan.

- **SEED** : tovê kitanî.

FLAXEN, *adj.* : kitanî.

FLAY, *n.* : giron.

FLAY, *vt.* : kevil kirin.

FLEA, *n.* : zîndî, kêç.

- **BANE** : kêç nifrîn (texlîtek helez e).
- **BITE** : geztina kêçê, tibabek biçûk, êşa sivik.
- **BITTEN** : kêçgezti.
- **MARKET** : bazarê tiştên erzan.
- **WORT** : giyakêç.

FLEAM, *n.* : niştera hespan.

FLECK, *n.* : pinî.

FLECK, *vt.* : pinî kirin.

FLECKED, *adj.* : bazo.

FLECTION, *n.* : çemîn, lolbûn, lolam, wergeran.

FLED, *p.* **OF FLEE** : revî, bazda.

FLEDGE, *vi.t.* : per derkeftin.

FLEDGED, *adj.* : perewaze.

FLEDG(E)LING, *n.* : çêl, çîçelok.

- **BOBWHITE** : çêlsûsk.
- **DUCK** : çêlwerdek.
- **GOOSE** : çêlqaz.
- **LION** : çêlşêr.
- **PARTRIDGE** : çêlkew.

FLEE, *vi.t.* : revîn, baz dan, koçer bûn.

FLEECE, *n.* : hiriya pezî, befra dibarit, xurî.

FLEECE, *vt.* : hirî kirin, şelandin, birrîn.

FLEECED, *adj.* : hirîkirî.

FLEEING, *n.* : revîn, teriqîn, bazdan, piştdan.

FLEEN, *n.* : teriqîn, rev, teriqandin, peyiv yan dîtina tirane.

FLEER, *vi.t.* : tirane kirin, pê kenîn.

FLEERING (AT), *n.* : pêkenîn.

FLEET, *vi.* : lez kirin, lezandin, xeware bûn.

FLEET, *n.* : gelekeşti, keştîgel, kerwanê keştiyan, qam(av), zîbal, celal, lezîn.

- **STREET** : kolona rojnamegerî.

FLEET, *vt.i.* : lez kirin.

FLEETING, *n.* : xewarebûn, awarebûn.

FLEETLY, *adv.* : bi xewareyî.

FLEETNESS, *n.* : xewarebûn.

FLENCH, *vt.* : (neheng) kevil kirin.

FLENSE, *vt.* : kevil kirin (neheng).

FLENSED, *adj.* : kevilkirî.

FLENSING, *n.* : kevilkirin.

FLESH, *n.* : goşt, leş, çerm, sirûştê mirovî, regezê mirovî, malbata mirovî, giyanewer.

- **AND BLOOD** : kakil, leş, sirûştê mirovî.

- **TO GO THE WAY OF ALL ~** : mirovi bo şerî yan kuştinê arandin, mirin.

FLESH, *vt.* : goşt jêve kirin, (bi) goşt kirin.

FLESHER, *n.* : goştfiroş.

FLESHINESS, *n.* : qelewî.

FLESHINGS, *n.* : parçeyên goştî, kirasê teng.

FLESHLY, *adj.* : sehdar, qelew, dinayayî, leşdar.

FLESHPOTS, *n.* : xosî, xweşî.

FLESHY, *adj.* : qelew, kakilî, bigoşt, têrgoşt.

FLETCH, *vt.* : (tîr) per kirin.

FLETCHER, *n.* : tîrvan.

FLEUR-DE-LIS, *n.* : sosin, sîsin.

FLEW, *p.* **OF FLY** : firî.

FLEWS, *n.* : lêvên şorên seyan.

FLEX, *n.* : çemîn.

FLEX, *vt.i.* : çemîn, çemandin.

FLEXIBILITY, *n.* : nermîtî, çemînbarîtî, cîrîtî, pêzîtî.

FLEXIBLE, *adj.* : nerm, cîr, çemînbar.

FLEXIBLY, *adv.* : bi nermî, nermîkî.

FLEXILE OR FLEXIBLE, *adj.* : nerm.

FLEXING, *n.* : çemandin, çivandin.

FLEXION, *n.* = **FLECTION.**

FLEXOR, *n.* : masûlka girtek.

FLEXUOSITY, *n.* : çep û çîrîtî.

FLEXUOUS, *adj.* : çepûçîr.

FLEXURE, *n.* : çemîn, badan, wergeran, lolan, lolbûn.

FLICK, *n.* : lêdana sivika tajangî, lêdana tilan, dengê lêdanê.

FLICK, *vt.* : lê dan (sivik û hêdî), daqutan.

FLICKER, *n.* : çirs, lerz, çikçiikan.

FLICKER, *vt.* : lerizîn, geşbûn û paşî temirîn, hejîn, çirisîn.

FLICKERED, *adj.* : çirisî, lerizî.

FLICKERING, *n.* : çirisîn, lerizîn.

FLIER OR FLYER, *n.* : balafirvan, pêpikê pêstirkê, şerûdê ramyarî yan sermayedarî, firokexan.

FLIGHT, *n.* : firîn, bazdan, revîn, rev, dûratiya firînê, livîna lezîn, balafira rêbarîkirin.

- **LINE** : hêl yan rawesta balafiran.

- **TO TAKE TO ~** : revîn.

FLIGHT, *vi.* : firîn.

FLIGHTINESS, *n.* : holî.

FLIGHTLESS, *adj.* : nefir, bê firîn.

FLIGHTLY, *adj.* : enirok, guhork, xewarok.

FLIMFLAM, *n.* : xirpo, sapîn, pûçbêjî.

FLIMFLAM, *vt.* : xapandin.

FLIMSY, *n., adj.* : peritî, tenik, kaxeza tenik, bedtexlîtek (xirab).

FLINCH, *n.* : ciniqîn, veciniqîn, cûhinîn.

FLINCH, *vi.* : ciniqîn, cûhinîn.

FLINCHER, *n.* : nekirar, cûhinînkar.

FLINDERS, *n.* : pirtik, parçeyên biçûk.

FLING, *n.* : havêtin, tirane, demek xoşiya, pehîn, bez, tîzik.

- **IN FULL ~** : pêşketî.

- **TO HAVE A ~ AT** : bizavek sivik kirin.

FLING, *vt.* : bezîn, tirane kirin, pehîn havêtin.

- **TO ~ AWAY** : kevandin, êxistin.

- **TO ~ DOWN** : gerifandin, kevandin, êxistin.

- **TO ~ OFF** :xwe vedan, bezîn derve.

- **TO ~ ONE'S CLOTHES ON** : zû cil kirin ber xwe.

- **TO ~ OPEN** : zû yan dijwar vekirin.

- **TO ~ OUT** : req axiftin, pehîn havêtin.

- **TO ~ UP** : mişext bûn.

FLINGING, *n.* : havêtin, tîzik.

FLINT, *n.* : beriste, sta, ste.

- **CORN** : genimê tovreq.

- **GLASS** : şûşeyê steyî.

FLINTLOCK, *n.* : tifenga têzekparastî.

FLINTY, *adj.* : beristeyî, steyî, req.

FLIP, *n., adj.* : teqle, kurte rêbarî, lêdan, texlîtek mey.

FLIP, *vt.i.* : lê dan, wergerandin, lerizî livîn, veweşîn.

FLIP-FLOP, *n.* : guhorîna nişkiya arasteyê.

FLIPPANT, *adj.* : pirbêj, rûqayim.

FLIPPANTY, *adj.* : rûqayimê zimanhilî.

FLIPPER, *n.* : dest, şaperê nehengî.

FLIPPERTY, *adj.* : dahêlayî, şor, sist.

FLIRT, *n.* : hezker, lêdana lezîn, livîna lezîn.

FLIRT, *vt.i.* : hez kirin, xurt havêtin, lerizî livîn yan livandin.

FLIRTATION, *n.* : hezkirin, hiwaxtin.

FLIRTATIOUS, *adj.* : lote, zîzok, hezker.

FLIT, *vi.* : mişext bûn, koç bûn, firîn, (çengan) hejandin, dem borîn, hizir borîn (di nav mejî de).

FLITCH, *n.* : parçeyek darê dirêj, goştê xwêkirî û dûkêlkirî.

FLITTED, *adj.* : derbazbûyî, borî (bi lez).

FLITTER, *vi.t.* = **FLUTTER.**

FLITTERING, *n.* : derbazbûn, borîn (bi lez).

FLIVVER, *n.* : kevneguhêzoka biçûk.

FLIX, *n.* : texlîtek kûrk (pûrt).

FLOAT, *n.* : serav, seravbûn, tiştê seravî, şimşatker, şeraba befirkirî, lêmişt, aşinê.

FLOAT, *vi.t.* : serav keftin, lêmişt bûn yan çûn, belav bûn, bizir bûn, dudilî kirin, şimşat kirin, nerm kirin, behr firotin.

FLOATABLE, *adj.* : seravbar.

FLOATAGE, *n.* = **FLOTAGE.**

FLOATATION, *n.* = **FLOTATION.**

FLOATER, *n.* : seravbûn, seravketin, seravker, mirovê her bêkar.

FLOATING, *n.* : lêmişt, lêfaw, mele, avjenî, ajne, seravbûn.

- **DOCK** : gera seravkirinê (bo çakkirina gemiyan).

- **ISLAND** : girava serav (şirînayî).

FLOC, *n.* : nafik (gomçik).

FLOCCOSE, *adj.* : gulikirî.

FLOCCULATE, *adj.* : gulîkirî.

FLOCCULATE, *vt.i.* : gulî kirin.

FLOCCULATED, *adj.* : gulîkirî.

FLOCCULATING, *n.* : gulîkirin.

FLOCCULE, *n.* : gulî (wek guliya hirî).

FLOCCULENT, *adj.* : hiriyî, wek hiriyê.

FLOCCULUS, *n.* = **FLOCCULE** : piniya ser rojê.

FLOCK, *n.* : celeb, rev, rem, reve, garan.

- **OF LAMBS** : sawe.

FLOCK, *vt.* : kom bûn, pêşve çûn, hirî kirin.

FLOCKS AND HERDS, *n.* : ajel.

FLOE, *n.* : serav, sehol.

FLOG, *vt.* : celde dan, tajang kirin.

FLOGGED, *adj.* : celdekirî yan lêdayî.

FLOGGING, *n.* : celdekirin.

FLOOD, *n.* : lêzim, avboş, lêsor, leyî, lafaw, lêmişt, avrabûn, avboşbûn, newal, teşqele, radan.

- **PLAIN** : deşta beravî.

- **TIDE** : avrabûn, radan.

- **TORRENT** : leyî, lehî.

FLOOD, *vt.i.* : (av) boş bûn, têr kirin, rabûn, dan ser.

FLOODGATE, *n.* : dergehê avê.

FLOODLIGHT, *n.* : ronahiya boş, çirayê ronahiya boş.

FLOODLIGHT, *vt.* : ronahî boş kirin.

FLOOR, *n.* : raxer, jêr, bin, qat, temaşeker, guhdar, lap, endamên civatekê, bermal.

- **TO TAKE THE ~** : axiftin (li civatê).

- **WOODEN ~** : lapê darîn.

FLOOR, *vt.* : kevandin, êxistin, li erdê dan, revandin, şikandin.

FLOORBOARD, *n.* : depê ser erdî yan lapî.

FLOORING, *n.* : erd yan lapê jorekê.

FLOOR LAMP, *n.* : çirayê ser erdê.

FLOOR LEADER, *n.* : rêberê partî li ser erdê parlemanî.

FLOOR SHOW, *n.* : ahenga ser erdê bezimgehê.

FLOORWALKER, *n.* : zêrevan.

FLOOZY, *n.* : hîz, dêhl, qehpe.

FLOP, *n., adv.* : gurm, ketin, binketin, guhorîna nişkî, otêla erzan, mirov yan tiştê binketî.

FLOP, *vi.t.* : xurt lê dan, guhorîn, bin keftin, çûn nav nivînan de, bilind û nizim bûn.

FLOPHOUSE, *n.* : otêla erzan.

FLOPPY, *adj.* : şepirze, pan û nerm.

FLORA, *n.* : Xudabanûya gulan di efsaneya Romanî de, jiyana helezî, helezê demekê yan rojgarekê.

FLORAL, *adj.* : heleziya demekê yan rojgarekê.

FLORESCENCE, *n.* : gulbûn, guldan.

FLORESCENT, *adj.* : guldayî, ronahîkirî.

FLORET, *n.* : gula biçûk, kulilk.

FLORI-, *pref.* : pêşgir e ko gul e.

FLORIATED, *adj.* : gulguli, xemilandî (bi gulan).

FLORIBUND, *n.* : heleza gulîşî.

FLORICULTURAL, *adj.* : pêwendîdarê gulçandinê.

FLORICULTURE, *n.* : çandina gulan.

FLORICULTURALIST, *n.* : çandinkarê gulan.

FLORID, *adj.* : sorav, pembe, gulî, xemilandî.

FLORIFEROUS, *adj.* : guldayî, ronahîdayî.

FLORI LEGIUM, *n.* : gulbijar.

FLORIN, *n.* : diravê giyanî, zêr yan zîv.

FLORIST, *n.* : gulfiroş.

FLORISTIC, *adj.* : helezî (pêwendîdarê helezî).

FLORUIT, *n.* : demê jiyanê yan karkirina mirovî.

FLORY, *adj.* : gulkirî (bi sosinan).

FLOSCULAR, FLOSCULOUS, *adj.* : kulîlkî, lîqe.

FLOSS, *n.* : pûrt, titik yan benê avirmîş.

FLOSSY, *adj.* : law, titikî, pûrtî.

FLOTAGE, *n.* = **FLOTATION** (tiştê ser av).

FLOTATION, *n.* : serav, seravbûn, seravkirin, damezrandina hevkariyekê, firotina behran.

FLOTILLA, *n.* : karwanê biçûkê keştiyan.

FLOTSAM, *n.* : parçe yan barê serav ji gemiya şikestî, mirovên derbeder, tiştên kêmbiha.

FLOUNCE, *n.* : pêşketina helingivtîn, rabûn, raperîn, bezîn, dehmen.

FLOUNCE, *vi.t.* : bezîn, raperitîn, helingivtîn.

FLOUNDER, *n.* : pêşketina helingivtîn.

FLOUNDER, *vi.* : helingivtîn.

FLOUNDERED, *adj.* : helingivtî.

FLOUNDERING, *n.* : helingivtin.

FLOUR OR FLOWR, *n.* : ar, ard.

- **BIN** : ardank.

FLOUR, *vi.* : ar kirin.

FLOURISH, *n.* : geşbûn, şên, şênî, avabûn, pêşketin.

FLOURISH, *vi.t.* : serkeftin, şîn yan şên bûn.

FLOURISHING, *n.* : şînyak, şîndan, geş û gewz gon, nûbişkuvîn, şên, avabûn, ava, rengîn, rengdêr.

FLOUT, *n.* : pêkenîn, pêkenandin, kirêtkirin.

FLOUT, *vt.i.* : pê kenîn, kirêt kirin.

FLOW, *n.* : şîp, tîr, belqîn, belqandin, celal, milyan, xur, dexl, mehik, rewanî, bilindbûna avê, ger, avrabûn, rewtik.

- **OVER** : hilçûn.

FLOW, *vi.t.* : rewan bûn, çûn, milyan, kişîn, xwîn dîtin (mehik).

FLOWAGE, *n.* : belqîn, şîp, şap, leyî, avrabûn.

FLOWED, *adj.* : milyayî.

FLOWER, *n.* : gul, kulîlk, çiçek, gulçiçek, mûm.

- **FLOWER** : gulik, kulîlk.

FLOWER, *vi.t.* : gul dan, bişkuvîn, şînbûn.

FLOWERAGE, *n.* : gulbûn.

FLOWERED, *adj.* : guldayî, rengizî, bişkuvî.

FLOWERET, *n.* : kulîlk.

FLOWERING, *n.* : bişkuvîn, şepal, kişîn.

FLOWER GIRL, *n.* : keçika gulfiroş.

FLOWER HEAD, *n.* : bijare.

FLOWERINESS, *n.* : gulîtî, rewanbêjî.

FLOWER POT, *n.* : guldank, încane.

FLOWERY, *adj.* : gulgulî.

FLOWING, *n.* : rewan.

- **OUT** : rêjne, rêjende.

FLOWINGLY, *adv.* : bi rewanî, rewanîkî.

FLOWN, *pp.* **OF FLY** : firî, firandî.

FLU, *n.* : înfilowenza : persîv, helamet, zekem.

FLUBDUB, *n.* : qebeyî, debdebiyiya vala.

FLUCTUANT, *adj.* : bê hedar, guhork, vehejîn.

FLUCTUATE, *vi.* : vehejîn, guhorîn, dudilî kirin.

FLUCTUATED, *adj.* : vehejandî, pêlkirî.

FLUCTUATING, *n.* : vehejandin, pêlkirin.

FLUCTUATION, *n.* : vehejandin, vehejîn.

FLUE, *n.* : tora masiyan, cogeha bayî (bo alava pifkirina mûzîqeyî), kulîn, boriya kûlînê, pûrt, perê nerm, derçe (bo gaz û dûkêlê).

FLUENCY, *n.* : rewanbêjî, rewanî.

FLUENT, *adj.* : rewan, bêja, bi ziman, rewanbêj, sivikziman, zimanhili.

FLUENTLY, *adv.* : bi rewanî, rewanîkî.

FLUFF, *n.* : memêle, gendeper, kurk, tûk, pûrt, pirt, perê mû, tift.

FLUFF, *vi.t.* : per dan.

FLUFFY, *adj.* : tûkî, gij, qij, tiftî.

FLUID, *n., adj.* : avî, avekî, şile, şilaw, rohn, ron, şil.

- **DRIVE** : gerandin (hajotin) ya avekî.

- **EXTRACT** : pûxteya avekî : gîrava alkuholî bo dermanê helezî.

FLUIDITY, *n.* : avekîtî, şilîtî, rohnîtî.

FLUIDIZE, *vt.* : avekî kirin.

FLUID MECHANICS, *n.* : mekanîkzaniya avekiyan.

FLUKE, *n.* : kirmek masiya pan, serketina mirovneliber.

FLUKY, *adj.* : guhork, qewmina helketinî, destketiniya helketinî (ne bi şehrezayî).

FLUME, *n.* : cok.

FLUMMERY, *n.* : pûçbêjî, şirînatî.

FLUMMOX, *vt.i.* : şepirze kirin, ciniqandin.

FLUMP, *n.* : ketin yan livîna giran.

FLUMP, *vi.t.* : giran livîn yan keftin.

FLUNG, *p., pp.* **OF FLING** : havêtî.

FLUNK, *n.* : binketin (di ezmonê de).

FLUNK, *vi.t.* : bin keftin, bin êxistin.

FLUNKEY, *n.* : xizmetxar, bîbar.

FLUOR, *n.* = **FLUORITE.**

FLUORESCE, *vi.* : vegeşîn.

FLUORESCENCE, *n.* : vegeşîn, vegeşanewe.

FLUORESCENT, *adj.* : vegeşînî.

- **LAMP** : çirayê vegeşînî.

FLUORIDATE, *vt.* : florîd kirin.

FLUORIDATED, *adj.* : floridkirî.

FLUORIDATION, *n.* : florîdkirin.

FLUORIDE, *n.* : florîd : pêkhatiya florîn û hêmanek dî.

FLUORINATE, *vt.* : florîn kirin.

FLUORINE, *n.* : florîn : gazek jehrî ye.

FLUORITE, *n.* : florît : metalek belûrî û rohn e.

FLUOROSCOPE, *n.* : hinavbîn.

FLUOROSIS, *n.* : jehrbûn bi florînê yan pêkhatiya wê.

FLUORSPAR, *n.* : florspar : berê florî, florît.

FLU, *n.* : filo : înflowenza.

FLURRIED, *adj.* : şepirzekirî.

FLURRY, *vi.t.* : arhan, şarîn, şepirze kirin.

FLURRYING, *n.* : şepirzekirin, şarandin.

FLUSH, *vi.t.* : firin (ji ciniqînê), geşbûn, çalak bûn, sorbûn (ji şermê), rewan çûn, şûtin.

FLUSH, *n., adj.* : zehf.

FLUSTER, *n.* : mestî.

FLUSTER, *vt.i.* : mest kirin, şepirze kirin.

FLUSTERED, *adj.* : mestkirî.

FLUSTERING, *n.* : mestkirin.

FLUTE, *n.* : şimşal, ney, zurna, bilûr, zirna.

FLUTING, *n.* : madeyê kezîkirî, xemla kezîkirî.

FLUTIST, *n.* : neyjen, neyvan.

FLUTTER, *n.* : lerizîn, lerz, çengqutan, firin.

FLUTTER, *vt.* : lerizîn, firîn, hejîn, şepirze kirin.

FLUTY, *adj.* : zurnayî (deng).

FLUVIAL, *adj.* : rûbarî.

FLUVIATILE, *adj.* : pêwendîdarê rûbarî.

FLUX, *n.* : guhorîn, milyan, derperîn, buhujîn, vizik, belqîn.

FLUXION, *n.* : şîp, rewanî, guhorîn.

FLY, *n.* : mêş, meges, mûzik, zimanê qopçegirtinê.

- **BOAT** : keştî yan gemiya lezîn.
- **BOY** : balafirvan, firokevan.
- **BY** : firîna nizim.
- **FISH** : masiya firek.
- **PAST** : firîn : li ber temaşekeran re.

FLY, *vi.t.* : firîn, çûn, serav bûn, rêbarî kirin (bi balafirê), revîn, xeware bûn, şeqandin, bezîn.

- **TO ~ AT** : dijwar êrîş kirin.
- **TO ~ HIGH** : bilind firîn.
- **TO ~ IN THE FACE** : berhengar bûn.
- **TO ~ INTO A RAGE** : enirîn.
- **TO ~ OPEN** : vekirin.
- **TO ~ OUT** : enirîn.
- **TO LET ~** : havêtin.

FLYAWAY, *adj.* : amade bo firînê.

FLYBLOW, *vt.* : mêş hêk kirin (li ser goştî).

FLY-BY-NIGHT : deyndarê şevrevî.

FLY CASTING, *n.* : masîgirtin (bi mêşa çêkirî yan destkarî).

FLYCATCHER, *n.* : mêşgir.

FLYER OR FLIER, *n.* : fira.

FLYING, *n., adj.* : firîn, firandin, kurt, lezîn, hilfirîn, hilfirandin.

- **BOAT** : balafira avî.
- **BUTTRESS** : nîvtaq.
- **SAUCER** : sêniya firek.

FLYKILLER, *n.* : mêşkuj.

FLYLEAF, *n.* : berperê spî (li destpêk yan dûmahiya kitêbê).

FLYOVER, *n.* : firîna nizim.

FLYSPECK, *n.* : pîsatiya mêşê, tiştê pûç.

FLYWAY, *n.* : rêfir.

FLYWEIGHT, *n.* : kêşa mêşê : kulmbazî (112 pawind).

FLYWHEEL, *n.* : çerxa hevsengiyê.

FLY WHISK, *n.* : mêşkuj.

FOAL, *n.* : canî, sêzîn, şîre, kurîşk, kurîn.

FOAM, *n.* : kef, pirotan.

FOAM, *vi.t.* : kef kirin, kef bûn.

FOAMILY, *adv.* : bi kefî, kefikî.

FOAMY, *adj.* : kefdar.

FOB, *n.* : berîka demjimêrê (saetê), zincîra demjimerê.

FOB, *vt.* : xapandin, kirin nav berîka demjimêrê de.

F.O.B. (FREE ON BOARD) : rasipartin li ser (pişta) gemiyê (bîha).

FOCAL, *adj.* : tîşkoyî, tîrêjî.

- **LINE** : hêla tîşkoyî.
- **PLANE** : asta tîşkoyî.

FOCALIZATION, *n.* : tîşkokirin.

FOCALIZE, *vt.i.* : tîşkoyî kirin, tîşkoyî bûn.

FOCUS, *n.* : tîşko.

FODDER, *n.* : alîf, alîk, êm.

FOE, *n.* : dijmin, dujmin, neyar.

FOEMAN, *n.* : dijmin (li şerî).

FOETUS (FETUS), *n.* : piz, awlime.

FOG, *n.* : tem, mij.

- **THICK ~** : telp.

FOG, *vt.i.* : mij kirin, mij bûn.

FOGGED, *adj.* : mijkirî.

FOGGING, *n.* : mijkirin.

FOGHOUND, *adj.* : mijkirî.

FOGGY, *adj.* : mijî.

FOGY OR FOGEY, *n.* : kevneperist.

FOGLE, *n.* : dersoka avirmîş.

FOIBLE, *n.* : xalka lawaz (ya sirûştî yan sincî), parçeya lawaza şûrî.

FOIL, *n.* : metalê spiyê tenik, şûrê dirêj.

FOIL, *vt.* : diyar kirin, revandin, têkdan (pîlanakê).

FOILING, *n.* : rûsarkirin, têkdan (pîlanek).

FOILSMAN, *n.* : şûrbaz.

FOIST, *vt.* : xapandin.

FOISTING, *n.* : hepişandin.

FOLD, *n.* : pawanê pezî, kerê pezî, pêç, gom, gov, qat, lo, hevişî.

FOLD, *vt.* : pêçan, alandin, pawan kirin, girtin, rawestandin.

- **FOLD**, *suff.* : paşgir e ko çend, hinde caran e.

FOLDAWAY, *adj.* : pêçdar.

FOLDED, *adj.* : pêçayî, pêçandî, berve.

FOLDER, *n.* : weşînka pêçandî.

FOLDEROL, *n.* : pûçbêjî, hîçek.

FOLDING, *n.* : pêçan.

- **MONEY** : dirav yan pareyên kaxez.

- **UP** : dapêçan.

FOLIACEOUS, *adj.* : belgî.

FOLIAGE, *n.* : belg, xemilandina neqşên belgan.

FOLIAGED, *adj.* : belgkirî.

FOLIAR, *adj.* : belgî.

FOLIATE, *adj.* : belgdayî, belgî.

FOLIATE, *vt.* : belg dan, tenik kirin, hejmar kirin.

FOLIATION, *n.* : belgdan, rûkeşkirin, belgkirin, tenikkirin.

FOLIO, *n.* : per, berper, rûpel, laper, renûsa laperê yan kaxezê, kitêba lapermezin.

FOLIO, *vt.* : berper hejmar kirin.

FOLIOLATE, *adj.* : rûpelkî.

FOLIOSE OR FOLIOUS, *adj.* : belgî.

FOLIUM, *n.* (*pl.* **FOLIA**) : çîna tenik.

FOLK, *n., adj.* : gel, xelk, xizim, hemî xelk, gelêrî.

- **DANCE** : govend.

- **TALE** : çîrok.

FOLKISH, *adj.* : gelêrî.

FOLKLIKE, *adj.* : gelêrî.

FOLKLORE, *n., adj.* : zargotin, folklor, edet, çirok, zargotina xelkê.

FOLKMOOT OR FOLKMOTE, *n.* : civata gelî.

FOLKSY, *adj.* : gelêrî.

FOLLICLE, *n.* : himbank.

FOLLOW, *n.* : şeqandin, dûvketin, dîvketin.

FOLLOW, *vt.i.* : şeqandin, bi dûv keftin.

- **AS ~S** : wek diêt (wek eva hatî).

- **TO ~ OUT** : li pey çûn (ta dawiyê).

- **TO ~ SUIT** : wek wî yan wê kirin.

- **TO ~ THROUGH** : kar kirin ta berpêkirinê.

- **TO ~ UP** : pêve çûn.

FOLLOWER, *n.* : rajêr, berdest, peyrew, destdar, alîkar, dûvik, dûvelank, bindest, mifrid.

FOLLOWING, *n.* : peyçûn, peydan, dîvketin, dîvçûn, dûvketin.

FOLLOW-THROUGH, *n.* : pêveçûn.

FOLLOW-UP, *n.* : haykarî.

FOLLY, *n.* : xirpoyî, gewcî, holî.

FOMENT, *vt.* : germ kirin, hajotin, şarandin.

FOMENTATION, *n.* : germkirin, hajotin, şarandin.

FOMENTED, *adj.* : germkirî, hajotî, şarandî.

FOMENTING, *n.* : germkirin, hajotin, şarandin.

FOND, *adj.* : hezker, evîndar, binyat, xoşevî, gewc.

- **OF** : bi yar.

FONDANT, *n.* : şekirk.

FONDLE, *vt.i.* : rû kirin, nazdar kirin, dest kirin (fêtkarî).

FONDLED, *adj.* : nazdarkirî, rûkirî, rûdayî.

FONDLING, *n.* : xoşevî, nazdar, nazdarkirin.

FONDLY, *adv.* : bi nazdarî, nazdarkî.

FONDNESS, *n.* : nazdarîtî, delalî.

FONDUE OR FONDU, *n.* : xwarinek penîrî pêjandî li gel nîvişk û hêkê.

FONT, *n.* : kanî.

FONTAL, *n.* : serkanî.

FONTANEL, *n.* : şilka serî.

FOOD, *n.* : xwarin, xurek, nan, zad xwardemenî.

- **BITTER ~** : gemor.

- **COOKED ~** : girar.

- **STUFF** : xurek, xwardemenî.

- **TASTER** : çaşnîgîr.

- **STORED ~** : dikak.

FOOL, *n., adj.* : xirpo, tiro, gewc, dîn, zirtek, tirok, sade.

- **TO MAKE A ~ OF** : xirandin.

FOOL, *vi.t.* : xapandin, zirtekî kirin, tirane kirin, yarî kirin, xirandin.

FOOLERY, *n.* : xirpoyî, gewcî.

FOOLHARDILY, *adv.* : bi holî, holîkî.

FOOLHARDINESS, *n.* : holîtî.

FOOLHARDY, *adj.* : hol.

FOOLING, *n.* : xirîn, xapîn.

FOOLISH, *adj.* : xirpo, kenok, aqilsivik.

FOOLISHNESS, *n.* : kerîtî, xirpoyîtî, kenokîtî.

FOOLPROOF, *adj.* : asan, misoger.

FOOLSCAP, *n.* : şefqeyê qoçekiyê zirtekî, kaxeza mezin.

FOOT, *n.* : pê, lez, gav, benar, pîv, jêr, bin, ling, nîştin, qaç.

- **LICKING** : pabûsî, pêramûsîn.

- **ON ~** : peya, peyade.

- **TO PUT ONE'S BEST ~ FORWARD** : hindî bişêt (yan çêbit) kirin.

- **TO PUT ONE'S ~ IN IT** : çewtiyek gêre kirin.

- **TO SET (SOMETHING) ON ~** : çêkirin, bi rêve bûn.

FOOT, *vi.t.* : bezîn, gore çêkirin, ko kirin, çûn.

- **TO ~ A BILL** : pare dan.

- **TO ~ IT** : peya çûn.

- **TO ~ UP TO** : sercem hinde digihît.

FOOTAGE, *n.* : pêyatî.

FOOT-AND-MOUTH DISEASE, *n.* : devkulî.

FOOTBALL, *n.* : tepka pê, goga pê, tepka pêyan.

FOOTBOARD, *n.* : binpê.

FOOTBOY, *n.* : xizmetkar.

FOOTBRIDGE, *n.* : pira peyadeyan.

FOOTCANDLE, *n.* = **CANDLE-FOOT.**

FOOTCLOTH, *n.* : berrik, mehfûr, mehfîr, mafûr.

FOOTED, *adj.* : pêdar.

FOOTER, *n.* : peya, (mirovê) bejin çend pê bilind.

FOOTFALL, *n.* : dengê pêyan.

FOOTGEAR, *n.* : pêlav, sol.

FOOTHILL, *n.* : benar, damên, kuntar, kûn.

FOOTHOLD, *n.* : pêgir, binikê pêşketinê.

FOOTING, *n.* : rîç, çûn, pêngav, dawet, sema, payedarî, qayimiya pêyan.

- **ON A FRIENDLY ~ WITH PEOPLE** : pêwendiyên baş hene li gel xelkê.

- **ON A WAR ~** : amade ye bo şerî.

FOOTLE, *vi.* : ba pîvan, yarî kirin, xirpotî kirin.

FOOTLED, *adj.* : xirpo, bapîv.

FOOTLESS, *adj.* : bê pê, bê binyat, gewc.

FOOTLESSLY, *adv.* : bi gewcî.

FOOTLESSNESS, *n.* : gewcîtî.

FOOTLIGHTS, *n. pl.* : ronahiya jêr şanoyê,* kiryariya şanoyî.

FOOTLING, *adj.* : gewc, pûç, bêtewş.

FOOTMAN, *n.* : peyade, peyar, peya, serbazê peyade.

FOOTNOTE, *n.* : têbînî, dehmen.

FOOTPACE, *n.* : pêngav.

FOOTPAD, *n.* : rêbirr.

FOOTPATH, *n.* : qerax, pêrew.

FOOTRACE, *n.* : pêşbirkeya bezê, pêşbezî.

FOOTREST, *n.* : balgeyê pêyan.

FOOTSLOG, *vi.* : çûn (nav teqnê de).

FOOT SOLDIER, *n.* : serbazê peyade.

FOOTSHACKLES, *n.* : çîtal, çîdar.

FOOTSTALK, *n.* = **PEDICEL.**

FOOTSTALL, *n.* : binkê karîteyî.

FOOTSTOCK, *n.* : jêrrende.

FOOT-TON, *n.* : pêten.

FOOTWAY, *n.* : peyare, peyarê.

FOOT WEAR, *n.* : sol, pêlav, şekal.

FOOTY, *adj.* : pûç, kevin.

FOOZLE, *n.* : kar yan leyiztina neşehreza.

FOOZLE, *vt.* : neşehreza kar kirin yan leyiztin.

FOP, *n.* : mirovê bêqam ciwanpoşî, law, şepal.

FOPLING, *n.* : bitir (keşxe).

FOPPERY, *n.* : gewcîtî, xirpotî, şepalîtî.

FOPPISH, *adj.* : ciwanpoş.

FOPPISHLY, *adv.* : bi ciwanpoşi, bi tirî.

FOPPISHNESS, *n.* : ciwanpoşîtî, bi tiritî.

FOR, *prep., conj.* : bo, bûna, lew, lewma, ji ber, ji bo.

- **HER OR ~ HIM** : jêra.

- **THAT REASON** : bo wê êkê, bo wê hoyê.

FORAGE, *n.* : alîf.

FORAGE, *vt.i.* : talan kirin, li alîfê geran.

FORAGED, *adj.* : alifkirî, talankirî.

FORAGING, *n.* : alîfkirin, talankirin.

FORAMEN, *n.* (*pl.* **FORAMINA OR FORAMENS**) : kun.

- **MAGNUM** : kuna mezina kiloxî.

FORAMINIFER, *n.* : kunqepîçk : giyanewerek deryayî ye.

FORASMUCH, conj. : ji ber ko.

FORAY, *n.* : êriş.

FORARY, *vi.* : êriş kirin.

FORBADE, *p.* **OF FORBID** : nehêla, qedexekir, tembîkir.

FORBEAR, *n.* : babik, bapîr.

FORBEAR, *vt.i.* : bêhna xwe fireh kirin, nekirin.

FORBEARANCE, *n.* : dilfirehî, aram, nermî, dilovanî.

FORBEARER, *n.* : bapîr.

FORBEARINGLY, *adv.* : bi aramî, aramkî.

FORBID, *vt.i.* : tembî kirin, qedexe kirin.

- **GOD ~t** : Xudê nekit !.

FORBIDDANCE, *n.* : ewşandin, qedexe (kirin), tembî.

FORBIDDEN, *adj.* : bende, qedexe, tembîkirî, asê, ewşandî.

FORBIDDING, *n.* : sext, asê, bende, tembîkirin, qedexekirin.

FORBY OR FORBYE, *adj.* : li ser hindê re.

FORCE, *n.* : nîro, zor, xurtî, hêz, kutek, zorayî, giroh, pergal, zordestî.

- **THE ~** : polîs.

FORCE, *vt.* : xurtî kirin.

- **TO ~ OUT** : bi xurtî hînan der.

FORCED, *adj.* : xurtîkirî, kutekîkirî, bê hemd.

- **LABOUR** : suxre, zîbare, zewd, olam, bêgar.

FORCE FEED, *n.* : ronkirina xurtî (makîne).

FORCE-FEED, *vt.* : bi xurtî alîf kirin.

FORCEFUL, *adj.* : xurt, zorbaz, gozm.

FORCEFULNESS, *n.* : zorbazîtî, xurtî.

FORCEMEAT, *n.* : qîme.

FORCEPS, *n.* : kêlbetan (zêringer yan nijdar).

FORCIBLE, *adj.* : çalak, kutekî, xurt.

FORCIBLY, *adv.* : bi kutekî, bi xurtî, bi zorî.

FORCING, *n.* : zorkirin.

- **TO SUBMIT** : çemandin.

FORD, *n.* : bor.

FORD, *vt.* : dan borî.

FORDO OR FOREDO, *vt.* : westandin, qerimandin.

FORE, *adj., adv., prep., n.* : berê yekem, pêş, berahî, berî, bo pêşve.

- **TO THE ~** : bo pêşve yan berahiyê.

FORE-, *pref.* : pêşgir e ko pêş e, pêşî ye yan berahî ye.

FORE-AND AFT, *adj.* : ji berehiya gemiyê ta dûmahiyê.

FOREARM, *n.* : bask, zend.

FOREARM, *vt.* : amade kirin, amade bûn, lêk dan.

FOREBEAR, *n.* : pêşîne, bapîr, babkalk.

FOREBEARING, *n.* : peşedirêj, bêhnfireh.

FOREBODE, *vt.i.* : ageh kirin, ber dîtin.

FOREBODING, *n., adj.* : agehiya nexweş.

FOREBODINGLY, *adv.* : bi berbînî, berbînkî.

FOREBODINGNESS, *n.* : berbînîtî.

FORBRAIN, *n.* : berahiya mejî.

FORECAST, *n.* : pêşbînî, berbînî.

FORECAST, *vt.* : vegotin, pêş dîtin.

FORECASTER, *n.* : berbêj.

FORECASTING, *n.* : pêşbînî, berbîn, bergotin.

FORECASTLE, *n.* : berahiya bilindtira gemiyê.

FORECITED, *adj.* : berê gotî.

FORECLOSE, *vt.i.* : gîro kirin, nehêlan, girew girtin.

FORECLOSURE, *n.* : girtina girewî.

FORECOURT, *n.* : berahiya eywanê.

FOREDECK, *n.* : banê berahiya gemiyê.

FOREFATHER, *n.* : pêşîne, bapîr, babkalk.

FOREFEEL, *vt.* : (pêş) hiş kirin.

FOREFINGER, *n.* : şikefalîs.

FOREFOOT, *n.* : pêyê berahî.

FOREFRONT, *n.* : berahî, sîng, pêş.

FOREGO, *vt.* : pêşkeftin, nekirin, (delîve) hinda kirin yan berze kirin.

FOREGOER, *n.* : pêşîn.

FOREGOING, *n.* : berê.

FOREGONE, *adj.* : berê, pêşî.

- **CONCLUSION** : biryara wergirtî, encama eşkera.

FOREGROUND, *n.* : berahî, pêşiya wêneyî.

FOREGUT, *n.* : berahiya hefkê.

FOREHAND, *n., adj.* : nav lepî berpêkîrî (tenis) berahiya hespî.

FOREHANDED, *adj.* : dewlemend, destgirtî.

FOREHEAD, *n.* : enî, tewêl.

FOREIGN, *adj.* : biyanî, bêgane.

- **AFFAIRS** : pirsên henderan.

FOREIGNER, *n.* : biyanî, bêgane.

FOREIGNISM, *n.* : zaravê biyanî.

FOREJUDGE, *vt.* : pêşbiryar kirin.

FOREKNOWLEDGE, *n.* : pêjin, pêşzanîn.

FORELAND, *n.* : erdê berahî, ser erdê di nav deryayî de.

FORELEG, *n.* : pê yan lingê berahî.

FORELOCK, *n.* : biji, perçem, nehitk, notik.

FOREMAN, *n.* : serkar.

FOREMAST, *n.* : darê babirekê berahiya gemiyê.

FOREMOST, *adj., adv.* : pêşîn, serekî, yekem, yekemîn.

FORENAME, *n.* : navê yekem.

FORENAMED, *adj.* : berêhatî gotin.

FORENOON, *n.* : berî nîvro.

FORENSIC, *adj.* : dadwerî, berhevdanî, rewanbêjî.

FOREORDAIN, *vt.* : pêşbiryar dan.

FOREPART, *n.* : pêş, berahiya tiştî.

FOREPAST, *n.* : berê.

FOREPEAK, *n.* : embara berahî.

FOREQUARTER, *n.* : çarêka pêşî (ji kelexî).

FOREREACH, *vi.t.* : pêşkeftin (li pêşbirkeyê yan pêşbeziyî).

FORERUN, *vt.* : pêş bezîn.

FORERUNNER, *n.* : agehker, berî, rêber.

FORESAID, *n.* : berê gotî.

FORESAIL, *n.* : babireka berahî.

FORESEE, *vt.* : ber dîtin.

FORESHADOW, *vt.* : dê çêbit, (li berê) biqewmit.

FORESHORE, *n.* : berê beravê.

FORESHORTEN, *vt.* : kurt kirin (bo babirekî).

FORESHOW, *vt.* : ber dîtin.

FORESIDE, *n.* : berahî.

FORESIGHT, *n.* : rastbînî.

FORESIGHTED, *n.* : rastbîn.

FORESKIN, *n.* : çermê serê kîrî (ko sunet dikin).

FOREST, *n.* : daristan, bîşe, lêr, rêl.

- **RANGER** : şehne.

FOREST, *vt.* : dar kirin (dar çandin).

FORESTAL(L), *vt.* : berbîn kirin.

FORESTER, *n.* : daristanvan.

FORESTRY, *n.* : daristan, daristanzanî, teraşzanî.

FORETASTE, *n.* : nîşana agehî, li berbûn, tamkirina seretayî.

FORETASTE, *vt.* : pêş tam kirin.

FORETELL, *vt.* : ber dîtin, pêş dîtin.

FORETELLER, *n.* : berbêj.

FORETELLING, *n.* : vegotin, pêşbînî, berbêjî, bergotin.

GOVERN, *vt.i.* : hukim kirin, biryar dan, rade kirin, damezrandin, desthelat kirin.

GOVERNABLE, *adj.* : hukimbar.

GOVRNANCE, *n.* : hikumet.

GOVERNESS, *n.* : jinkarbidestî, dadûka biçûkan, jina fermanrewayî.

GOVERNMENT, *n.* : hikumet, ramyarîzanî, hukimkirin, fermanrewayî.

- **HOUSE OR OFFICES** : sera.

GOVERNMENTAL, *adj.* : hikumetî, mîrî, fermanrewayî.

GOVERNMENTALISM, *n.* : hikumetîtî, dîtaneya berfirehkirina karê hikumetî.

GOVERNOR, *n.* : parêzkar, kardar, parêzyar, serdar, şehreyar, parêzger, amê-

ret bo qaydekirina germî yan pestênê.

- **GENERAL** : sermîr, hakim yan fermarewayê gelemper.

GOVERNORATE, *n.* : parêzgeh.

GOVERNORSHIP, *n.* : parêzkarî.

GOWAN, *n.* : gulbihar.

GOWK, *n.* : xirpo, gewc.

GOWN, *n.* : cil, kiras, xîlik, eba.

GOWN, *vt.i.* : kirinber, kirinberxwe.

GOWNSMAN, *n.* : mamosta yan seydayê zanistgehê.

GOY, *n.* : navê Cihiyan ko li gel yan neteweyê ne Cihî dikin.

GRAB, *n., adj.* : girtin, birin, revandin, standin, çingal, revandî.

GRAB, *vt.i.* : girtin, revandin, standin.

GRABBED, *adj.* : standî, girtî, revandî.

GRABBER, *n.* : revonek.

GRABBING, *n.* : revandin, birin, standin, rivandin.

GRABBLE, *vi.* : dapelandin.

GRABBLED, *adj.* : dapelandî.

GRABBLING, *n.* : dapelandin.

GRABEN, *n.* : nizmiya rûyê erdê li navbera çewtiyan de.

GRACE, *n.* : narînî, terpûşî, şoxî, rûmetî, ciwanî, perkal, qencî, payedarî, dilovanî, qeşeng, qayilbûn, mihirvanî.

- **ACT OF ~** : lêborîna giştî.

- **BY THE ~ OF GOD** : bi dilovaniya Xudê.

- **TO BE IN THE GOOD ~ S OF** : bi rûmet bûn li nik mirovekê.

- **WITH A BAD ~** : ne ji dil.

- **WITH A GOOD ~** : ji dil.

GRACE, *vt.* : ciwan kirin, xemilandin.

GRACED, *adj.* : rûmetdarkirî.

GRACEFUL, *adj.* : rûmetdar, şox, ciwan, narîn, nazenîn.

GRACEFULLY, *adv.* : bi rûmetdarî, bi lewendî, rûmetdarkî.

GRACEFULNESS, *n.* : lewendîtî, rindîtî, narînîtî.

GRACELESS, *adj.* : bêrûmet, rizî.

GRACILE, *adj.* : çeleng, barîk, zirav.

GRACILIS, *n.* : tenka ranî.

GRACILITY, *n.* : ziravîtî.

GRACING, *n.* : rûmetdarkirin.

GRACIOUS, *adj.* : dilgir, qenc, merd, taze, çeleng, dilovan, rûmetdar.

GRACIOUSLY, *adv.* : bi merdî, bi rûmetdarî, merdîkî.

GRACIOUSNESS, *n.* : merdîtî, rûmetdarîtî.

GRACKLE, *n.* : balindeyek perreş û teyisî ye.

GRADATE, *vi.t.* : pêpikî kirin, pêpikî bûn, têkil bûn.

GRADATED, *adj.* : pile dar, telan.

GRADATION, *n.* : qonax, paye, koçe, zincîrbûn, peyhatî, dûvyekbûn, pilebûn, têkilbûn.

GRADE, *n.* : paye, pile, pol, cor, koçe, qonax, nîsan, pileya nişîvbûnê, rêya nişîv.

GRADE, *vt.i.* : rê rast kirin, rêz kirin, nîşan kirin, paye kirin, perandin, pêpikî kirin, pêpikî bûn, pile kirin.

GRADE CROSSING, *n.* : duriyan.

GRADED, *adj.* : piledar, rastkirî.

GRADELY, *adj.* : nayab, law, rast, dirist.

GRADER, *n.* : rastker, payeker, şagird (li dibistanê).

GRADE SCHOOL, *n.* : dibistana seretayî.

GRADIENT, *n.* : berwar, lêjî, nişîvî.

GRADIN(E), *n.* : pêpikên nizmên pêstirkê.

GRADING, *n.* : pilebûn.

GRADUAL, *adj.* : berebere.

GRADUALLY, *adv.* : berebereyî.

GRADUAND, *n.* : mirovê li bere bawernameyê wergirit.

GRADUATE, *n., adj.* : derçûyî (xwendintemamkirî).

GRADUATE, *vt.* : derçûn, xwendin temam kirin.

GRADUATED, *adj.* : piledar, telan.

GRADUATING, *n.* : pilekirin, pilebûn.

GRADUATION, *n.* : pilebûn, derçûn.

GRADUS, *n.* : ferhenga helbestî ya latînî.

GRAFFITO, *n.* : dirûşm.

GRAFT, *n.* : bertîl, petrume, mûtirbe, petirme, heleza petrumekirî.

GRAFT, *vt.i.* : petrume kirin, nerewa dirav bi dest keftin yan standin.

GRAFTAGE, *n.* : petrumekirin, mutirbekirin.

GRAFTED, *adj.* : petrumekirî.

GRAFTER, *n.* : petrumeker.

GRAFTING, *n.* : petrumekirin, mutirbekirin.

GRAIL, *n.* : tirarê pîroz, lêgerana zehmet.

GRAIN, *n.* : gerdîle, cor, lib, texlît, rewişt, sirûşt, tov, dêndik, tene, dan, dane, dexl.

- **AGAINST THE ~** : dijî mad yan sirûştî.
- **BROTH** : virk.
- **WITH A ~ OF SALT** : gomandarî.

GRAIN, *vt.* : dane bûn, dêndik bûn, rih hênan der.

GRALLATORIAL, *adj.* : lingdirêj (balinde).

GRAM, *n.* : nok.

GRAM OR GRAMME, *n.* : gram : yek ji hezar kîlogramê (kêşan yan senga sentîmetrek sêcarekî avê).

- **ATOM** : kêşe gerdîleya gramî.
- **CALORIE** : germiya gramî.
- **MOLECULE** : kêşa pirtikiya gramî.

GRAM(M)E : giyayê çerê.

GRAMARYE, *n.* : cadû.

GRAMERCY, *n.* : sipas.

GRAMINACEOUS, *adj.* = **GRAMINEOUS.**

GRAMINEOUS, *adj.* : giyayî.

GRAMINOVOROUS, *adj.* : giyaxwer.

GRAMMALOGUE, *n.* : nivîsîn kurtkirin, tîpek yan nîşanek şûna peyivê.

GRAMMAR, *n.* : destûr, rêziman.

- **SCHOOL** : dibistana amadeyî yan navincî.

GRAMMARIAN, *n.* : rêzimanzan.

GRAMMATICAL, *adj.* : rêzimanî.

GRAMMATICALITY, *n.* : rêzimanîtî.

GRAMMATICALLY, *adv.* : bi rêzimanî, rêzimankî.

GRAMMATICALNESS, *n.* : rêzimanîtî.

GRAMMATICIZE OR GRAMMATICISE, *vt.* : rêzimanî kirin.

GRAMOPHONE, *n.* : bêjek.

GRAMP(S), *n.* : bapîr.

GRAMPUS, *n.* : texlîtek dolfîn e (dolîn, giyaneweri deryayî).

GRAM'S METHOD, *n.* : rêbaza gramî (rêbaza rengkirina mîkroban ya zana Gramî).

GRAN, *n.* = **GRANNY.**

GRANADILL, *n.* : meyweya viyanê.

GRANARY, *n.* : embara genimî, jêderê serekî, devera têrgenim, kadîn, pangeh.

GRAND, *adj., n.* : mezin, gewre, hemiyatî, hezar dolar.

- **CHILD** : newe, nevî.

- **DAUGHTER OR SON** : nevî.
- **FATHER** : bapîr.
- **GRAND CHILD** : nevîçîçirk.
- **MOTHER** : pîr, dapîr, pîrik.
- **NEPHEW** : neviyê birayî yan xuşkê.

GRAN(D)DAD, *n.* : bapîr.

GRANDAM(E), *n.* : pîr.

GRANDAUNT, *n.* : meta babê yan daykê.

GRAND DUCHESS, *n.* : doqbanûya mezin.

GRAND DUCHY, *n.* : doqnişîna mezin.

GRAND DUKE, *n.* : mîr yan doqê mezin.

GRAND DAME, *n.* : jîna şikûdar.

GRANDEE, *n.* : xanedan, giregir (Îspanî yan Portugalî).

GRANDEES, *n.* : debdebe, mezin, şikûdar.

GRANDEUR, *n.* : kawî.

GRANDIFLORA, *n.* : hewdedan, berhemdarê gulmezin.

GRANDILOQUENCE, *n.* : mezinkirin (axiftin).

GRANDILOQUENT, *adj.* : mezin(kirî).

GRANDIOSE, *adj.* : qebe, fêz, debdebe, mezinatî.

GRAND JURY, *n.* : desteka mezina sondxweran.

GRANDLY, *adv.* : bi mezinî, mezinikî.

GRANDNESS, *n.* : şikûdarî, debdebeyî, mezinatî.

GRAND PARENT, *n.* : bapîr, dapîr.

GRAND SI(E), *n.* : bapîr, bapkalk.

GRAND SLAM, *n.* : serketina temam.

GRAND STAND, *n.* : temaşgeha meydana leyiztina werzişî yan pêşbirke yan pêşbezînî.

GRAND STAND, *vt.* : leyiztin da ko kartêkirina temaşekeran bikit.

GRAND UNCLE, *n.* : mam(ap) yan xalê babê yan daykê.

GRANGE, *n.* : civata hevkariya çandinê.

GRANGER, *n.* : endamê civata hevkariya çandinê.

GRANGERIZE, *vi.* : kitêbek xemilandin bi wêneyên kitêbek dî.

GRANI-, *pref.* : pêşgir e ko tov e.

GRANOFFROUS, *adj.* : berhemdarê tovî.

GRANITE, *n.* : granît : beriste, rawesta rikdar.

GRANITEWARE, *n.* : amanên asinên bi mînayî hinîn (minakirîn).

GRANITIC, *adj.* : giranîtî, beristeyî.

GRANIVOROUS, *adj.* : tovxwer.

GRANNY, *n.* : pîr, pîrik.

GRANNY KNOT, *n.* : girêya asan vedibit.

GRANO-, *pref.* : pêşgir e ko beriste ye.

GRANT, *n.* : bexş.

GRANT, *vt.* : bexşîn, bûn.

GRANTED, *adj.* : bexşî.

GRANTEE, *n.* : mirovê bexşkirî.

GRANT-IN-AID, *n.* : bexşîn.

GRANTING, *n.* : dan.

- **ASYLUM** : penadan.

GRANULAR, *adj.* : savarkirî, danikî.

GRANULATE, *vt.i.* : danik kirin, danik bûn.

GRANULATION, *n.* : danikbûn.

GRANULE, *n.* : danik.

GRANULITE, *adj.* : danikî.

GRANULOMA, *n.* : pejbûna danikî yan dêndikî.

GRANULOSE, *adj.* : savarî, danikî.

GRAPE, *n.* : tirî, mêw.

- **FRUIT** : greypfrût : meyweya mizremerî.

- **HOUSE** : şerabgeh.
- **LARGE ~** : gozane.
- **BUNCHES** : îşî, ûşî.
- **JUICE** : ava tirî, şile, şîre.
- **SHOT** : bombeya îşî.
- **SOUR ~** : bêsîre, şilor.
- **STONE** : berik.
- **SUGAR** : şekira tirî.
- **UNRIPE ~** : bêsîre.
- **VINE** : mêw, rez.
- **VINE BRANCHES** : şiftik.

GRAPERY, *n.* : rez.

GRAPH, *n.* : nexşek, hêla diyarkirinê, hincekirina peyivê.

- **PAPER** : kaxeza nexşekirinê.

GRAPH, *vt.* : nexşe kirin, nivîsîn, wêne kirin.

- **GRAPH**, *suff.* : paşgir e ko nivîsî ye yan wênekirî ye, alava tomarkirinê.

GRAPHEME, *n.* : tîpên dengekî.

GRAPHIC(AL), *adj.* : nivîsî, nexşekirî, wênekirî, wêneyî, nexşeyî, zindî, çapî, nivîsînî.

- **ART** : hunerên nexşekirinê.

GRAPHICALLY, *adv.* : bi nexşekirinî, nexşekirinkî.

GRAPHICS, *n.* : hunera nexşekarî yan bîrkarî.

GRAPHITE, *n.* : grafît : karbona reşa nerm ko xame yan pênivîsan jê çêdikin.

GRAPHO-, *pref.* : pêşgir e ko nivîsîn e.

GRAPHOLOGY, *n.* : nivîsînzanî.

GRAPHY, *n.* = **GRAPH.**

GRAPNEL, *n.* : çingal, lenger.

GRAPPA, *n.* : brandiya paşmaya tirî.

GRAPPLE, *n.* : lenger.

GRAPPLE, *vt.i.* : girtî.

GRAPPLING, *n.* : lenger, çingal.

GRAPY, *adj.* : tiriyî, mêweyî.

GRASP, *n.* : girtin, destik, şiyana girtinê, têgehiştin.

GRASP, *vt.i.* : girtin, têgehîştin.

GRASPABLE, *adj.* : girtinbar, têgehiştinbar.

GRASPING, *n.* : kinoj, çikos, pêgirî.

GRASPINGLY, *adv.* : bi çikosî, çikoskî.

GRASPINGNESS, *n.* : çikosîtî.

GRASS, *n.* : giya, çîm, çer, pincar, lewer.

- **DRY ~** : pûş, pîş.
- **LAND** : çere, warkoz.
- **STALK** : qasik.

GRASS, *vt.i.* : çerandin, çerîn, giya çînîn, giya bûn.

GRASSHOPPER, *n.* : kulî.

GRASSLESS, *adj.* : bêgiya.

GRASSROOTS, *n.* : axa serve, gundewarî, binyat, binik.

GRASS WIDOW, *n.* : bîjin, jina bibîji, jina berdayî, jinebî.

GRASS WIDOWER, *n.* : mêrebî, bêjin.

GRASSY, *adj.* : giyayî, kesk.

- **COLOUR** : giyareng.

GRATE, *n.* : tanê bistkirî, êzinghelgir, koçik, agirdan, pencereya bistkirî.

GRATE, *vt.i.* : tan, koçik yan pencere kirin, hêrîn, şepirze kirin, perîşan kirin, arandin.

GRATED, *adj.* : hêrayî, dankirî, dêndikirî.

GRATEFUL, *adj.* : minêkar, sipaskar.

GRATEFULLY, *adv.* : bi sipaskarî, sipaskarkî.

GRATEFULNESS, *n.* : sipaskarîtî, malavayî.

GRATER, *n.* : rendik, rende, renek.

GRATICULE, *n.* : têrkirin.

GRATIFICATION, *n.* : şadkirin, têbûn, dilniyabûn, şadbûn.

GRATIFY, *vt.* : dilniya kirin, şa kirin, têr kirin.

GRATIFYING, *n.* : dilniyakirin.

GRATIFYINGLY, *adv.* : bi dilniyayî, dilniyayîkî.

GRATING, *n.* : çirikandin, çirkîn, çirîk, tanê bistkirî, êzingir.

GRATIS, *n.* : herwe, mift, belaş.

GRATITUDE, *n.* : sipas, sipasîtî, sipasdarîtî, malava.

GRATUTIOUS, *adj.* : herwe, mift.

GRATUTIOUSLY, *adv.* : bi herweyî, bi miftî, herwekî.

GRATUTIOUSNESS, *n.* : herweyîtî.

GRATUITY, *n.* : bexşîş.

GRATULATORY, *n.* : pesn, derbirrîna şadiyê bo serketina mirovekê.

GRAUNCH, *vt.i.* : dengê hêranê.

GRAVAMEN, *n.* : gazinde : eger û made.

GRAVE, *n., adj.* : giring, rûmetdar, kuj, tarî, gor, meng.

- **CLOTHES** : berteng, giran.
- **DIGGER** : gorkol.
- **STONE** : kêl, berbêlk.
- **ROOF** : hed.
- **YARD** : goristan, ziyaret, gor.

GRAVE, *vt.* : nexş kirin, tiraşîn.

GRAVECLOTHES, *n.* : qerqer.

GRAVEL, *n.* : berik, cercîr, zegir, bestîlok, bestik.

GRAVELLY, *adj.* : cercîrî, bestîlokî.

GRAVER, *n.* : simtok, peykertaş, nexşker.

GRAVES-DISEASE, *n.* : perîzadeya topka çavî.

GRAVI-, *pref.* : pêşgir e ko giran e.

GRAVID, *adj.* : avis.

GRAVIMETER, *n.* : giranpîv.

GRAVIMETRY, *n.* : giranpîvî, sengpîvan.

GRAVITATE, *vi.t.* : kêşan, hatin kêşan, livîn (bi kêşanê).

GRAVITATION, *n.* : rakêşan, kişan.

GRAVITATIONAL, *adj.* : kêşanî, rakêşanî.

GRAVITATIVE, *adj.* : kêşandar.

GRAVITATIVELY, *adv.* : bi kêşanî, kêşankî.

GRAVITY, *n.* : kêş, kêşan, rakêşan, metirsî, giringî, giranî, zemînkêşî.

GRAVURE, *n.* : kilîşe, kolana zengografî.

GRAVY, *n.* : avgoşt, êxinî.

GRAY, *n., adj.* : reşik, gewr, axkî, boz, reşboz.

- **FISH** : pezka avî.
- **HAIRED** : porspî, serspî.
- **SQUIRREL** : sincaw.

GRAY, *vt.i.* : gewr kirin, gewr bûn.

GRAYBEARD, *n.* : pîr, pîremêr, rihspî.

GRAYLING, *n.* : texlîtek masiya rûbarî ye.

GRAY MATTER, *n.* : mejî, hiş.

GRAZE, *vi.t.* : çerîn, çerandin.

GRAZE, *n.* : lewer, çer.

GRAZED, *adj.* : çerandî, çerî.

GRAZERY, *n.* : koz.

- **PRIVATE ~** : pawan.

GRAZIER, *n.* : şivan, gavan.

GRAZING, *n.* : çeryan, çer, warkoz, delge, şivanîtî.

- **GROUND** : koz, warkoz, çere.
- **LAND** : koz, pawan.

GREASE, *n.* : bez, hiriya birrî berî paqijkirinê.

GREASE, *vt.* : bez kirin, çewr kirin.

GREASED, *adj.* : bezkirî, çewrkirî.

GREASEPAINT, *n.* : karkirina şanoyî, madeyên karkirina şanoyî.

GREASER, *n.* : çewrker, bezker.

GREASING, *n.* : çewrkirin, bezkirin, ronkirin.

GREASY, *adj.* : kiz, bezdar, tehîsok.

GREAT, *adj., adv.* : mezin, gir, gewre, girs, dirêj, fire, zehf, navdar, pêgotî, payeberz, zil, şehreza raserîn.

- **APE** : meymûna bala.
- **BEAR** : stêra hirça mezin.
- **COAT** : palto.
- **GRAND CHILD** : nevîçirk.
- **GRAND FATHER** : babê bapîrî.
- **HEARTED** : aza, aram.
- **NEPHEW** : neviyê birayî yan xuşkê.
- **NIECE** : neviya birayî yan xuşkê.
- **SKUA** : hevçî.
- **TOE** : pêçî.
- **UNCLE** : mam, ap yan xalê babê yan daykê.

GREATEN, *vt.i.* : mezin kirin, fireh bûn, mezin bûn.

GREATER, *adj.* : mezintir.

- **FEAST** : cejna qurbanê.

GREATLY, *adv.* : gelek.

GREATNESS, *n.* : şikûdarîtî, meznayîtî, hewdedan, girî, mezinatî, mezinahî, debdebeyîtî, girî.

GREAVE, *n.* : zirêpûşê lingê balindeyî.

GREBE, *n.* : noqer (balinde ye).

GRECIAN, *adj.* = **GREEK.**

GRECO-, *pref.* : pêşgir e ko Girekî, Yûnanî ye.

GREED, *n.* : çavharî, çavbirsî.

GREEDINESS, *n.* : çavbirsîtî.

GREEDY, *adj.* : zixûnî, çav har, zikin, zikmar, xwara, pir xwer, çav birsî.

GREEK OR GRECIAN, *adj.* : Girek, kevneyûnanî, alizî.

- **CATHOLLIC** : endamê dêrek rojhelatî, endamê tîreya rojhelatiya katolokî.
- **FIRE** : agirê grekî (li nav avê de hilbûn).
- **ORTHODOX** : ortodoksî : rojhelatiya dêra grekî.

GREEN, *adj., n.* : kesk, sewz, kerik, şînî, jînî.

- **BACK** : piştkesk : dolarê emerîkanî.
- **BELT** : kemera kesk : darên li dor taxekê digirin.
- **BLIND** : keskkore.
- **BOOK** : belavoka mîrî.
- **CHEESE** : penîrê kesk.
- **CROP** : keskederamet (bo xwarinê).
- **EYED** : çavkesk, qîrok.
- **FAT** : bezê kîseleyî yan reqî.
- **FOOD** : xurek.
- **FINCH** : çûçik (per zer û kesk).
- **FLAME** : kilfe.
- **GAGE** : hilîkên şîn.
- **GROCER** : sewzefiroş.
- **HORN** : sade, neşehreza.
- **HOUSE** : xanîkê germê şûşeyî bo çandin û parastina helezî.
- **JAUNDICE** : nesaxê çermkeskî.
- **LIGHT** : ronahiya kesk : nîşana derketinê û borînê (bê tewekelê).
- **PEA(S)** : kelî, kelîk, polke.
- **ROOM** : jora kesk : bo vesihîna kirdarên şanoyê.

- **SHANK** : lingkesk : balindeyek wek çûçika tîtelanî.

- **SICKNESS = CHLOROSIS.**

- **STONE** : berê kesk : kevrek bazaltî birkanî kesk.

- **STUFF** : keskatî, sewzî.

- **TABLE** : mêza qumarê.

- **TURTLE** : req.

- **VITROIL** : zaxa kesk : sulfata asinkî.

- **WOOD**, *n.* : daristan.

GREEN, *vt.* : kesk kirin.

GREENERY, *n.* : şînkayî, şîn, şînyatî, keskayî, keskatî.

GREENING, *n.* : keskesêv.

GREENISH, *adj.* : kesk, keske.

GREENLAND, *n.* : girdav Girînlend.

- **WHALE** : nehengê Girînlend.

GREENLANDIC, *adj.* : zarav yan zimanê Girînlend.

GREENLING, *n.* : keskok : texlîtek masî ye.

GREEN MANURE, *vt.* : zibil kirin(bi rîxa ter).

GRENNESS, *n.* : keskîtî, keskbûn, keskayî.

GREEN ONION, *n.* : pîvazterk.

GREENS, *n.* : sewzî, zerzewat, şîn, şînkayî.

GREEN STUFF, *n.* : sewzî, şînkayî.

GRENSWARD, *n.* : mêrg.

GREENTH, *n.* : keskatî.

GREET, *vt.* : silav kirin.

GREETING, *n.* : silavkirin, silav, silaw, pêşwaz, derbirrîn.

GREFFIER, *n.* : tomarker, dadger.

GREGARIOUS, *adj.* : civakxwaz, rivdexwaz.

GRENADE, *n.* : narîncok.

GRENADIER, *n.* : narîncokhavêj, texlîtek masiyek derdayî ye.

GRENADINE, *n.* : texlîtek tevn e (perûk), şerbeta hinaran.

GRESHAM'S LAW, *n.* : qanûna Greşam : ko pareyên qelp pareyên rast pûç dikin (anko zirdirav cihê rastdiravî digirit).

GRESSORIAL, *adj.* : rêvçûn, pêvçûn.

GREW (PAST OF GROW) : werarbo, çizirî, rengizî.

GREY = GRAY : gewr.

- **WACKE** : gomçika kevriya tebelên girûvirên pêkve.

GREYHOUND, *n.* : tajî.

GREYISH, *adj.* : gewr, boz.

GREYLAG, *n.* (gooze) : qaza kûvî ya ewropî.

GRID, *n.* : tora bistkirî, depê metaliyê kunkirî, tewera kehrebî, tûj, tîj.

GRIDDLE, *n.* : sac, sêl.

- **CAKE** : kiloca hêk û şîrî.

GRIDE, *n., vi.t.* : dengê vereninê, verenîn, birrîn.

GRIDIRON, *n.* : asinka birajtinê, meydana tepkana pêyan.

GRIEF, *n.* : dilgiranî, xefet, qehir, xem, keser, kizî, şîn, kovan, kul, ahîn, xem û pejare, mixabin.

GRIEFED, *adj.* : xemdar, qehirî, dilgiran.

GRIEF STRICKEN, *adj.* : pest, mirîto, behîdar.

GRIEVANCE, *n.* : gazinde, azar, ziyan, sitem, gilî.

GRIEVANT, *n.* : gilîdar, dozekar, gazindeker.

GRIEVE, *vt.i.* : xem xwarin, qehir xwarin.

GRIEVED, *adj.* : pest, xemdar, qehirî, mirîto, şîndar, behîndar, kovandar, bi kul.

GRIEVING, *n.* : behîdar.

GRIEVOUS, *adj.* : şîndar, giran (birîn), giring.

GRIEVOUSLY, *adv.* : bi giringî yan giranî, girankî.

GRIEVOUSNESS, *n.* : giringîtî, giranîtî.

GRIFFIN OR GRIFFON, *n.* : sîmerx : canewerek efsaneyî nîv simsiyark e û nîv şêr e.

GRIFFON, *n.* : texlîtek se ye(biçûk e).

GRIFT, *n.* : destketina nerewa.

GRIFT, *vt.* : havil kirin yan feyde kirin(bi xapandinê).

GRIFTER, *n.* : kulî, marmasiya biçûk.

GRILL, *n.* : birajtin, birajgeh.

- **ROOM** : aşxaneya birajtinê, birajgeh.

GRILL, *vt.* : birajtin, eşkence kirin, pirsiyar kirin(req).

GRILLAGE, *n.* : tora darî yan asinî.

GRILLE OR GRILL, *n.* : tanê bistkirî.

GRILLING, *n.* : birajtin.

GRILSE, *n.* : masiya (somon) ya biçûk.

GRIM, *adj.* : rûtal, dirr, bizdihîn.

GRIMACE, *n.* : rûbadan.

GRIMACE, *vi.* : rû badan (bo pêkenandinê).

GRIMALKIN, *n.* : kitik nexasme kitika pîr.

GRIME, *n.* : tenî, pîsatî.

GRIMNESS, *n.* : tenîtî, pîsatî.

GRIMLY, *adv.* : bi dijwarî, bi miç û morî.

GRIMM'S LAW : qanûna Grim : ko têveliya li navbera tîpên dengderên zimanên hindûewropî diyar kirin.

GRIMY, *adj.* : pîs, tenîkirî, şêlî.

GRIN, *n.* : bişkurîn, rûbadan.

GRIN, *vi.* : hişkurîn, rû badan.

GRIND, *n.* : hêran, çirkandin, hesandin.

- **STONE** : distar, berê aşî, berê hesandinê, hesan.

GRIND, *vt.i.* : tuj kirin, şimşat kirin, hesandin, hêran, tepeser kirin, rêncberî kirin, bizav kirin(nexasme xwendin).

GROUND, *p.* **OF GRIND** : hêra.

GRINDER, *n.* : distar, didanê kursî.

GRINDING, *n.* : hêran, seqakirin, gejmirandin, çirkandin, hesankirin, qutan, pijkirin.

- **STONE** : hesan, berger.

GRINGO, *n.* : biyanî.

GRINNED, *adj.* : bişkurî.

GRINNING, *n.* : bişkurîn.

GRIP, *n.* : destik, girtin, têgeheştin, çenteyê rêbariyê.

GRIP, *vt.* : girtin.

GRIPE, *n.* : gazinde, girtin, destik, zikêş.

GRIPE, *vt.i.* : qayim girtin, gazinde kirin, qehirandin, êşandin.

GRIPED, *adj.* : girtî.

GRIPES, *n.* : arengî, qolinc, zikêş yan gîrî.

GRIPING, *n.* : girtin.

GRIPPE, *n.* : persîva giran, înfilowenza.

GRIPPED, *adj.* : girtî.

GRIPPER, *n.* : girtek.

GRIPPING, *n.* : gîre.

GRIPPINGLY, *adv.* : bi gîreyî, gîrekî.

GRISAILE, *n.* : wêneyê xemlê nemaze li ser şûşeyî.

GRISEOFULVIN, *n.* : dermanê dij zindî nemaze dij kirmên xelek.

GRISEOUS, *adj.* : gewr, mirarî.

GRISETTE, *n.* : keçika xurta çîna karkera frensî.

GRISINESS, *n.* : bizdihînîtî.

GRISLY, *adj.* : tirsîn, bizdihîn.

GRISON, *n.* : texlîtek delekê goştxwer e.

GRIST, *n.* : hêran, hejmar, genim (bo hêranê), tibab, madeyê çirokê yan xwendinê.

- **ALL IS ~ THAT COMES TO HIS MILL** : havil yan feyde : her çî bêt aşî xêr û bêr e.

- **TO BRING ~ TO THE MILL** : feyde, havil.

GRISTLE, *n.* : kirkirok.

GRISTLINESS, *n.* : kirkirokîtî.

GRIESTLY, *adj.* : kirkirokî.

GRITSMILL, *n.* : aşê genimî, aş, distar.

GRIT(S), *n.* : hîrik, hûrke, savar, kevrê xîzî, zebir.

- **FINE** : sindik, pişron.

GRIT, *vi.t.* : kirkir kirin(didan), mermer hisîn.

GRITTED, *adj.* : kirkirî.

GRITTILY, *adv.* : bi azayî.

GRITTINESS, *n.* : azayîtî.

GRITTING, *n.* : kirkirkirin.

GRITTY, *adj.* : aza, xîzî.

GRIVET, *n.* : texlîtek meymûn e.

GRIZZLE, *n.* : gewr, dehbeyê gewr.

GRIZZLE, *vt.i.* : gewr kirinyan bûn.

GRIZZLED, *adj.* : gewr, belek.

GRIZZLING, *n.* : gewrkirin, poke.

GRIZZLY, *adj.* : belek.

GROAN, *n.* : nalenal, nalîn, axîn, nal, nikin, nikandin, harjîn.

GROAN, *vi.* : nalîn.

GROANED, *adj.* : nalî.

GROANER, *n.* : axdar.

GROANING, *n.* : nalîn, nal, hertîn, niç, nikîn, axîn.

GROAT, *n.* : kevnediravek metalî ye.

GROAT(S), *n.* : savar.

GROCER, *n.* : beqal, ronfiroş.

GROCERY, *n.* : beqalî, firoşî, firoşgeh ya beqalî.

GROCETERIA, *n.* : firoşgeha zerzewatî, xwexizmet.

GROG, *n.* : texlîtek şerab e.

GROGGY, *adj.* : mest, serxweş, veweşî.

GROGRAM, *n.* : tevnê hirî yan avirmîş û hirî.

GROIN, *n.* : nêk, kenarê du girêkên hevbirr.

GROIN, *vt.* : (grêk) dirist kirin.

GROMET, *n.* : destik, xeleka girtinê.

GROMWELL, *n.* : texlîtek helez e, berê derman bû.

GROOM, *n.* : zava, meyter, mehter, seyis.

- **'S CAKE** : kiloca zavayî yan dawetê.

- **'S MAN** : birazava.

GROOM, *vt.i.* : meyterî kirin, lê kirin, şimşat kirin.

GROOMER, *n.* : amadeker.

GROOMING, *n.* : meyterî.

GROOVE, *n.* : loç, kelş, edet, kevdek, karê kêrhatî.

GROOVE, *vt.i.* : kelişîn, kelişandin.

GROOVED, *adj.* : kelişandî.

GROOVING, *n.* : kelişandin.

GROOVY, *adj.* : kelişînî, kelşdar.

GROPE, *vt.i.* : dapelandin.

GROPED, *adj.* : dapelandî.

GROPING, *n.* : dapelandin, pelandin.

GROSS, *adj.* : girs, mezin, dozdeh, deste, dilreq, dilhişk, têkre, eşkera, sedê sed, gelemper, dîtinî, leşdarî, sirûşî, seretayî, erzan, kirêt, têkreyî.

GROSS, *vt.* : qazanc kirin, havil kirin.

GROT, *n.* **(POET) = GROTTO.**

GROTESQUE, *n., adj.* : gêre, awêze, kirêt.

GROTTO, *n.* : şkeft, eşkewt.

GROTTY, *adj.* (*sl.*) : netaze, kirêt.

GROUNCH, *n.* : gazindeker, kîn.

GROUCH, *vt.* : gazinde kirin.

GROUND, *n.* : ax, bej, erd, bin, binyat, nîşte.

- **COVER** : nixava erdê : giya û helezê hûrê daristanê.
- **CREW** : desteya erdiya balafirê.
- **FLOOR** : tebeqa erdî, nihûma erdî.
- **NUT** : baqilên çolê (hov).
- **PLAN** : melheza erdî yan binyat.
- **PLATE** : depê erdî.
- **RULE** : seretaya karî.
- **STATE** : barê hedar.
- **SWELL** : pêla jêrî.
- **WATER** : karêz.
- **WAVE** : pêla rûyî.
- **WORK** : binyat.

GROUND, *vt.* : hênan xarê, keftin binî.

GROUNDAGE, *n.* : erdiya gemiyê.

GROUNDLESS, *adj.* : bêbinyat.

GROUNDSEL, *n.* : binyat, derazîn, depê erdî.

GROUP, *n.* : girûh, bend, celeb, kom, birr, tof, selef, cêrge, gişkek, qewte, kewte, komel, komele, telp.

- **THEORY** : dîtaneya girûhan, têriwaney girûhekan.

GROUP, *vt.i.* : kom bûn, polên kirin.

GROUPABLE, *adj.* : girûhbar.

GROUPER, *n.* : bahîv, texlîtek masî.

GROUPING, *n.* : girûhkirin.

GROUSE, *n.* : gazinde, texlîtek por (balinde).

GROUSE, *vi.* : gazinde kirin.

GROUSED, *adj.* : gazindekirî.

GROUSING, *n.* : gazindekirin, pornêçîr.

GROUT, *n.* : gêç, nîşte.

GROUT, *vt.* : hinîn, gêç kirin, ax kirin.

GROUTER, *n.* : hinînkar.

GROVE, *n.* : rez, bîstan, cinîk, daristan.

GROVEL, *vi.* : gevizîn.

GROVEL(L)ER, *n.* : gevêz.

GROVELING, *adj.* : pûç yan pûçemirov.

GROW, *vt.* : werar bûn, (rih) berdan, mezin bûn.

GROWABLE, *adj.* : şînbar, werarbar.

GROWER, *n.* : çandiyar, kiştkar.

GROWING, *n.* : çezirandin, lixwedan, werarbûn, şînbûn, çandin, werzkirin, perestên, resiyayî, şînbûyî, lixwedayî, geşinde.

- **RICH** : dewlemendbûn.
- **UP** : mezinbûn.

GROWL, *n.* : rewîn, mirremirr.

GROWL, *vi.t.* : rewîn, gazinde kirin, mirremirr kirin.

GROWLER, *n.* : gazindeker, çiyayê befrê biçûkê serav.

GROWLING, *n.* : mirremirrkirin.

GROWLINGLY, *adv.* : bi mirremirrî, mirremirrekî.

GROWN, *adj. pp.* : werarbûyî, rewzbûyî, çezirandî, şînbûyî.

- **UP** : gehiştî, mezin.

GROWTH, *n.* : werar, çezirandin, şîn bûn, ajar, li xwedan, rewzbûn, geşe.

- **FACTOR** : kolkeyê werarê.

GROYNE, *n.* : dîwarê nizim yan peykerê depê wek sikrî bo girtina ava deryayî li ber avê.

GROYNE, *vt.* : (ber avê bi diwarkî) sikir kirin.

GRUB, *n.* : kirmik, kinco, zehmetkêş, rêncber, xurek, xwarin.

GRUB, *vt.i.* : helkêşan, kolan, rêncberî kirin.

GRUBBED, *adj.* : kolayî.

GRUBBING, *n.* : kolan.

GRUBBY, *adj.* : kirmikî, pîs, nizim.

GRUDGE, *n.* : kîn, dexisîn, hêriz.

GRUDGE, *vt.* : dexisîn, gileyî kirin, gazinde kirin.

GRUDGED, *adj.* : dexisî.

GRUDGING, *adj.* : rijd.

GRUEL, *n.* : siza, teşrîb.

GRUEL, *vt.* : mandî kirin, siza kirin, westandin.

GRUEL(L)ING, *n., adj.* : sizayê dijwar, pirsyar kirina req.

GRUESOME, *adj.* : kirêt, tirsîn, bizdihîn.

GRUESOMENESS, *n.* : bizdihînîtî, kirêtîtî.

GRUFF, *adj.* : denggirs, zivir, dilreq, qebare.

GRUFFLY, *adv.* : bi qebareyî, qebarkî.

GRUFFNESS, *n.* : qebareyîtî.

GRUM, *adj.* : rûtal.

GRUMBLE, *n.* : gazind, pitpit.

GRUMBLE, *vt.i.* : pitpit kirin, gazinde kirin.

GRUMBLED, *p.* OF **GRUMBLE** : pitpitkir.

GRUMBLER, *n.* : pitpitok.

GRUMBLING, *n.* : pitpitkirin.

GRUMBLINGLY, *adv.* : pitpitokîkî.

GRUME, *n.* : givîn yan guvîna xwînê yan avekiya lincî.

GRUMMET, *n.* : xeleka werîsê badayî.

GRUMOUS, *adj.* : givînî.

GRUMP, *n.* : gazindeker, bêmad.

GRUMPINESS, *n.* : çirt.

GRUMPY, *adj.* : zîz, enirî, sil, gazindeker.

GRUNG, *adj.* : pîs.

GRUNION, *n.* : masiyek emerîkanî biçûk e.

GRUNT, *n.* : borrîn, hirrîn, lirxe, miqandin.

GRUNT, *vi.t.* : borrîn, hirrîn.

GRUNTER, *n.* : hirînker.

GRUNTLE, *vt.* : yarî kirin.

GRUNTLING, *n.* : yarîkirin.

GRYSBOK, *n.* : pezkûviyê gewrê biçûkê Efrîqa başûr.

GUAN, *n.* : balindeyek emerîkanî wek eloelo ye.

GUANA, *n.* = **IGUANA.**

GUANACO, *n.* : dehbeyek Emerîkanî memikdar wek hêştirê ye.

GUANO, *n.* : ziblê qotikirina masiya, ziblê zilqên balindeya, rîqne.

GUARANTEE, *vt.* : desteberkirin.

GUARANTEED, *adj.* : desteberkirî.

GUARANTEEING, *n.* : desteberkirin.

GUARANTOR, *n.* : desteber.

GUARANTY, *n.* : desteberî.

GUARD, *n.* : nobedar, werdiyan, pasvan, pasewan, şehne, pas, dîdevan, holikvan, bervanî, parastin.

- **'S ROOM** : pasgeh.

- **TO BE ON ONE'S ~** : hişyar, wurya.

- **TO MOUNT ~** : parastin, nêrevanî kirin.

- **TO ~ AGAINST ERRORS** : hişyar bûn.

GUARD, *vi.t.* : pawandin.

GUARDED, *adj.* : hişyar, wurya.

GUARDIAN, *n.* : serwer, semyan, rasipêr, qewît, pasvan.

GUARDIANSHIP, *n.* : serwerî.

GUARDING, *n.* : pas, pasvanî, dîdevanî, pasdan, pawandin, li ber man.

- **POST** : pasgeh.

GUARDSMAN, *n.* : pasvan.

GUAVA, *n.* : giwava : texlîtek dar e.

GUBBINS, *n.* : bêbiha, pûç, gilêş, tert.

GUBERNATORIAL, *adj.* : parêzyarî, parêzkarî.

GUDDLE, *vt.* : masî bi dest girtin.

GUDGEON, *n.* : masiya wek mêkê, enîşk, sade, timlok.

- **PIN** : mêxa zendî : bo pêkvegirêdana destikê pistinî yan pestênî û destikê pêkvegiredanê.

GUDGEON, *vt.* : xapandin.

GUENON, *n.* : meymûnek efrîqayî dûvdirêj e.

GUERDON, *n.*, *vt.* : xelat, xelat kirin.

GUERNSEY, *n.* : terşê şîrî ji Gêrnsî (girava Brîtanî).

GUERRILLA OR GUERILLA, *n.* : şerkerê nerêzikî, partîzan, pêşmerge, çete.

- **WAR** : şerê pêşmergeyî yan çeteyî.

GUESS, *n.* : hizir, pêjin, xeml.

- **WORK** : pêjin, hizirkar.

GUESS, *vt.i.* : hizir kirin, xeml kirin.

GUESSER, *n.* : hizirker.

GUESSING, *n.* : hizirkirin, nehandin.

GUESSTIMATE, *vt.* : hizir kirin, texmîn kirin, xeml kirin.

GUEST, *vt.i.* : mêhvan bûn, mêhvanî kirin.

GUEST, *n.* : mêhvan, mêvan.

- **HALL** : dîwanxane.

- **HOUSE** : koçk, mêhvanxanê.

- **ROOM** : koçk.

- **ROPE** : werîsê duwem.

GUFFAW, *n.* : pirq, pirqîn, tiq, kenîn.

GUGGLE = GURGLE.

GUIDANCE, *n.* : amûjkarî, rêberî, pend, pendiyarî, şiretname, raberî, serkarî.

GUIDE, *n.* : rêber, berbîn, pêşdar, rêzan, şiretker, pendiyar, rûkir, raber, pêşber.

- **BOOK** : rêber.

- **LINE** : rêber, kurtî (rêbaz yan ramyarî).

- **ROAD ~** : rêzan.

GUIDE, *vt.i.* : araste kirin, rêberî kirin, raberî kirin.

GUIDED, *adj.* : arastekirî, rêberîkirî, raberkirî.

- **MISSILES** : moşekên arastekirî.

GUIDO, *n.* : alaya ko li serê darê diçiqilînin.

GUILD, *n.* : tîre : yekîtiya pîşeger û bazirganan.

- **HALL** : avahiya yekîtiyê.

GUILDER, *n.* : yekeya diravê Holendî, gîlder.

GUILE, *n.* : fêlbazî, xapîn, durûyî.

GUILELESS, *adj.* : sade, sakar, rastbêj.

GUILLEMOT, *n.* : texlîtek balinde ye ji deryayên bakur.

GUILLOCHE, *n.* : kezîk.

GUILLOTINE, *n.* : serbirr, berhevdan birr, hestîk helkêşk.

GUILT, *n.* : guneh, gunehkarî, gunehberî, tawan, sûc, gunehbarî.

GUILTILY, *adv.* : bi gunehbarî, gunehbarkî.

GUILTINESS, *n.* : gunehbarîtî.

GUILTLESS, *adj.* : bêguneh, sade, bêsûc, dawpak.

GUILTLESSNESS, *n.* : dawpakîtî, bêgunehîtî, bêsçîtî.

GUILTY, *adj.* : sûcdar, ayîl, gunehkar, gunehber, gunehbar, tawanbar.

GUINEA, *n.* : Ginî : diravê înglîzî.

- **FOWL** : mirîşka hebeşî yan qeşeyî.
- **HEN** : mirîşka hebeşî yan qeşeyî.
- **PIG** : berazê Ginî : zeviya ezmonan.

GUISE, *n.* : cil, kinc, bejn, diyarde.

GUITAR, *n.* : gîtar.

GULCH, *n.* : nihala tenga kûr, celal.

GULES, *n., adj.* : sor.

GULF, *n.* : com, kendaw, qiliç.

- **WEED** : kevza deryayî, giyayê kendavî.

GULL, *n.* : texlîtek balinde (newres), sade.

GULL, *vt.* : xapandin.

GULLET, *n.* : gerû, gewrî, qûrk, soriçk.

GULLIBILITY, *n.* : sawîlkî, xapînbarî.

GULLIBLE, *adj.* : sawîlk, sade, xapînbar.

GULLIED, *adj.* : kelşkirî, nihalkirî, gelîkirî.

GULLISH, *adj.* : sade, xirpo.

GULLY, *n.* : zang, celal, gelî, xerend, kendal, nihal, kêrka mezin.

- **NARROW ~** : nihal, dol.

GULLY, *vt.* : birrîn, kelişandin.

GULLYING, *n.* : kelşbûn.

GULOSITY, *n.* : zikûnî, xwarayî.

GULP, *n.* : fir, firek, golpe, golp, lerif, daqurtîn, qurt, firk.

GULP, *vi.t.* : daqurtîn, daûran, vekuştin, temirandin, lerifandin.

GULPED, *adj.* : daqurtayî, daûrayî, lerifandî.

GULPER, *n.* : daqurtanker, lerifker.

GULPING, *n.* : loşdan, daqurtan, daûran, lerîfandin.

GUM, *n.* : pidî, pidû, pû, benîşt, stirk, şirêz, çesp, zemq, getîre, binêşt.

- **BOOTS** : potîn yan cezmeyên lastîk.
- **CHEWING ~** : qaçik, benîşt.
- **RESIN** : şirêz.
- **SHOE** : polîsê nihênî yan nepenî.

GUM, *vt.i.* : cîtin.

GUMBO, *n.* : banî, şorbe (metfinî) ya bamiyan.

GUMBOIL, *n.* : nêm yan edaba bamiyan.

GUMDROP, *n.* : sewka şirêzî (şekirkirî ye).

GUMMA, *n.* : pufbûna şirezî.

GUMMED, *adj.* : venûsyayî.

GUMMING, *n.* : venûsîn, cîtin.

GUMMOUS, *adj.* : venûsyayî, stirkî, şirêzî.

GUMMY, *adj.* : venûsyayî, stirkî, şirêzî.

GUMPTION, *n.* : jîrî, zirekî.

GUN, *n.* : tifeng, debance, top, çifte, havêjok.

- **BARREL** : loleya tifengê.
- **BOAT** : cengkeştî.
- **COTTON** : pembûyê teqînê.
- **DOG** : seyê nêçîrê.
- **FIRE** : tophavêtin.
- **FLINT** : beristeyê kevnetifengan.
- **GREAT ~** : mirovek navdar.
- **LOCK** : têzek.
- **MAN** : çekdar.
- **PIT** : çala topan (bo parastinê dij agirê dûjminî).
- **POWDER** : barût, şûre.
- **ROOM** : jora efserên biçûk (di nav cengkeştî de).

- **RUNNER** : qeçaxê çekî.
- **RUNNING** : qeçaxiya çekî.
- **SHOT** : fîşek.
- **SHY** : tirsonek.
- **SMITH** : çêkerê çekên sivik.
- **SON OF A ~** : kabrayê pûç.
- **WALE** : rexê bilindê gemiyê.

GUN, *vt.i.* : tifeng havêtin (teqandin), nêçîr kirin (bi tifengê).

GUNLESS, *adj.* : bê top, bê tifeng.

GUNNED, *adj.* : rawkirî (bi tifengê).

GUNNER, *n.* : topvan, topçî.

GUNNEL, *n.* : masiyek biçûk (wek marmasî).

GUNNERA, *n.* : helezek xemilandinê ye.

GUNNERY, *n.* : topxane.

GUNNING, *n.* : tophavêtin, nêçîrkirin (bi tifengê).

GUNNY, *n.* : telîs.

GUNTER, *n.* : rastek (du pê dirêj li gel terazî û rêzên logarîtmî bo çarekirina pirsên deryayî).

GUPPY, *n.* : masiyek biçûk e, noqar.

GURGITATION, *n.* : xirxira dengî.

GURGLE, *n.* : guvguv, tirîqe, givgiv, xirxir.

GURGLE, *vi.* : xirxir kirin, givgiv kirin.

GURGLED, *adj.* : xirxirkirî, givgivkirî.

GURGLING, *n.* : lêwerdan.

GURKHA, *n.* : Hindokê Nepalî, Gurxa.

GURNARD, *n.* : masiya serdirrik.

GURU, *n.* : seydayê giyaniyê hindokî, gûrû.

GUSH, *n.* : beliqîn, vizikîn.

GUSH, *vi.* : vizikîn.

- **TO ~ OUT** : vizikîn.

GUSHER, *n.* : vizik.

GUSHILY, *adv.* : bi vizikî, vizikîkî.

GUSHINESS, *n.* : vizikîtî.

GUSHY, *adj.* : dilsoz, hestiyay.

GUSSET, *n.* : pateyê sêgoşeyî.

GUST, *n.* : rêzgirtin, bahatin, teqîn (av, agir, dûkêl, deng, teqîna derûnî).

GUSTATION, *n.* : tamkirin, sehkera tamê.

GUSTATIVE, *adj.* : tamdar.

GUSTATORIAL, *adj.* : tamdar.

GUSTATORY, *adj.* : tamdar.

GUSTO, *n.* : xoşî, tam.

GUSTY, *adj.* : ewrî, bahozî.

GUT, *n.* : zik, hinav, jih, tenge, rûvîk, derbazgeh, kirmokê avirmîşî.

GUTLESS, *adj.* : tirsonek, sist.

GUTS, *n.* : rûvîk, rîvîk.

GUTSY, *adj.* : mêrxas, çalak, aza.

GUTTA, *n.* : dilop.

- **PERCHA** : nîvlastîk e (ji darî derkeftin).

GUTTER, *n.* : şîp, şirik.

GUTTER, *vt.* : şirik kirin.

GUTTERSNIPE, *n.* : kolanî, kurkê kolanan.

GUTTLE, *vi.t.* : zikûnî xwarin.

GUTTLER, *n.* : xurek, zikûnî, xwara.

GUTTURAL, *adj.* : gerûyî, gewriyî.

GUTTURILIZE, *vt.* : gerûyî axiftin.

GUTTY, *adj.* : aza, berhengar.

GUY, *n.* : kabra, mirov, kesê gêre, qayimker.

GUY, *vt.* : girê dan, qayim kirin, tirane kirin, pê kenîn.

GUZZLE, *vt.i.* : gelek vexwarin.

GUZZLED, *adj.* : firkirî, pir(vexwarî).

GUZZLING, *n.* : firkirin, pir(vexwarin).

GYM, *n.* = **GYMNASIUM** (zorxane).

GYMN(O)-, *pref.* : pêşgir e ko rîs e.

GYMNASIUM, *n.* : zorxane.

GYMNAST, *n.* : canbaz, zorbaz.

GYMNASTIC, *adj.* : werzişvanî, canbazî, yarîkerî.

GYMNASTICS, *n.* : canbazî.

GYMNOSOPHIST, *n.* : sofiyê hindokî.

GYMNOSPERM, *n.* : tovrût.

GYMNOSPERMAE, *n. pl.* : tovrût.

GYN(O)-, *pref.* : pêşgir e ko jin e, hêkdank e.

GYNANDROMORPH, *adj.* : nêremok.

GYNANDROMORPHISM, *n.* : jinane, duregezî, nêremokîtî.

GYNANDROUS, *adj.* : nêremok.

- **GYNE**, *suff.* : paşgir e ko jin e, mê ye, hêkdank e.

GYNAEC(O)-, *pref.* : pêşgir e ko jin e.

GYNEOCOCRACY, *n.* : hikumeta jinan.

GYNECOLOGIST, *n.* : pijîşkê jinan.

GYNECOLOGY, *n.* : jin nexoşîzanî, jin nesaxîzanî.

GYNOECUIM, *n.* : endamê mêya gulê yan helezê.

GYNOPHORE, *n.* : baskê endamê mêya helezî.

GYP, *n.* : fêlbaz, xapînok.

GYP, *n.* : xapandin, fêlbazî kirin.

GYPSEOUS, *adj.* : gêçî.

GYPSIFEROUS, *adj.* : gêçî.

GYPSOUS, *adj.* : gêçî.

GYPSOPHIL, *n.* : gêçik : heleza qerenfeliya gulbiçûk.

GYPSOPHILIA, *n.* : helezek baxçeyî.

GYPSUM, *n.* : gêç.

- **FINE ~** : koşte.

- **STONE** : kevrê gêçê, berê gêçê.

GYPSY, *n.* : qereç, boşe, dome.

GYR(O), *pref.* : pêşgir e ko xelek e, çemere ye, lole ye.

GYRATE, *adj.* : badayî, zivirî.

GYRATE, *vi.* : zivirîn.

GYRATED, *adj.* : zivirî.

GYRATING, *n.* zivirandin.

GYRATION, *n.* : zivirîn.

GYRATOR, *n.* : zivirok.

GYRATORY, *adj.* : zivirokî, badayî.

GYRE, *n.* : livîna çemereyî, şiklê çemereyî.

GYRED, *adj.* : zivirî (çemereyî).

GYR(O)-, *pref.* : pêşgir e ko badok, bazin, kemere ye.

GYRENE, *n.* = **MARINE** (deryayî).

GYRFALCON, *n.* : texlîtek baz, terlan, helû ye.

GYRING, *n.* : zivirîn (çemereyî).

GYRO, *n.* : jîroskop.

GYROCOMPASS, *n.* : cîhetnameya zivirokî.

GYROFREQUENCY, *n.* : lereya zivirokî.

GYROHORIZON, *n.* = **ARTIFICIAL HORIZON.**

GYROMAGNETIC, *adj.* : jîromagnetîk.

- **RATIO** : rêjeya jîroskopiya magnetîzî.

GYROPILOT, *n.* = **AUTOMATIC PILOT.**

GYROPLANE, *n.* : balafira jîroskopî yan zivirokî.

GYROSCOPE, *n.* : jîroskop : alava hevsengiyê û diyarkirina arasteya balafirê yan gemiyê.

GYROSCOPIC, *adj.* : jîroskopî.

GYROSCOPICALLY, *adv.* : bi jîroskopî.

GYROSE, *adj.* : pêçayî û pêlkirî, bi xiçên pêlînîşankirî (helez).

GYROSTABILIZER, *n.* : jîroskopê zivirokê alava balafirê yan gemiyê rast kirin.

GYROSTAT = GYROSTABILIZER.

GYRUS, *n.* : xelekên mejî.

GYTTJA, *n.* : nîşteya gulê.

GYVE, *n.* : pêbend.

GYVE, *vt.* : bend kirin.



H, H : êç : tîpa heştema elfabeya înglîzî.

H-IRON : beştê şikil H yê asinî.

HA, *inter.* : derbirrîna guhişîn, şadî, gomanê û kovanê ye.

HAAR, *n.* : beqa deryayî.

HABANERA, *n.* : govendek kuba ye.

HABEAS CORPUS, *n.* : fermana hatinê : fermana dadgehî ko pêdivêt mirov biçit ber dadgehê.

HABERDASHER, *n.* : xurdefiroş, firoşyarê tiştên mêran.

HABERDASHERY, *n.* : firoşgeha xurdeyan, xurdefiroşgeh, xurdefiroşî.

HABERGEON, *n.* : saqoyê bêhiçkê posteyî.

HABILE, *n.* : zîrek, şehreza.

HABILIMENTS, *n.* : kinc, cil.

HABILITATE, *vt.i.* : şiyanî kirin, sermaye dan (bo kanzayê).

HABILITATED, *adj.* : şiyanîkirî.

HABILITATING, *n.* : şiyanîkirin.

HABILITATION, *n.* : şiyandin.

HABIT, *vt.* : bi cil kirin, kinc kirin.

HABIT, *n.* : nerît, edet, kiras nexasme kirasê rebenî, pîşe, san, pêgirt, rewişt, sinc, avahiya leşî.

HABITABILITY, *n.* : nişînbarîtî.

HABITABLE, *adj.* : nişînbar.

HABITANT, *n.* : nişîn.

HABITAT, *n.* : war, şiwên, jînewar.

HABITATION, *n.* : nişîngeh, cênişîn, wargeh, rahatin.

HABITUAL, *adj.* : asayî, sirûşî, beng.

HABITUATE, *vt.* : hîn kirin.

HABITUATED, *adj.* : hînkirî.

HABITUATING, *n.* : hînkirin.

HABITUDE, *n.* : nerît.

HABITUE, *n.* : hatiyar.

HACHURE, *n.* : kurtnivîsîne bo wêne, tiraşîn û sihkirinê.

HACHURE, *vt.* : nivîsîn (kurt).

HACIENDA, *n.* : çandingeh yan avahiyê serekiyê wê.

HACK, *n., adj.* : kelşa darî, kuxik, bivr, *pîk, pehîn, tîzik, hêstir, hesp, guhê*-zoka kirê, taksî, hajoyê taksiyê, kirêgirtî.

HACK, *vt.* : parçe parçe kirin, birrîn, kêlan, kuxîn, taksî hajotin, tîzik havêtin.

HACKAMORE, *n.* : hevsar, hefsar.

HACKBERRY, *n.* : texlîtek tî ye.

HACKER OR HACKIE, *n.* : hajoyê taksiyê.

HACKLE, *n.* : şehê kitanî, perê stûyê balindeyî nemaze keleşêrî, mûyê stû yan pişta seyî, mêşa ji perî çêkirî (bo timloka masiyan).

HACKLE, *vt.* : şeh kirin, mêş kirin (perî).

HACKLED, *adj.* : şehkirî, birrî.

HACKLING, *n.* : şehkirin, birrîn.

HACKLY, *adj.* : kuh.

HACKMAN, *n.* : taksîhajo.

HACKNEY, *n.* : hespê siwarbûnê yan kêşanê, guhêzoka kirê, erzan.

HACKNEY, *vt.* : erzan bûn, gelek bi kar hînan.

HACKNEYED, *adj.* : erzan, dubare ta erzanbûnê.

HACKNEYING, *n.* : erzankirin.

HACKSAW, *n.* : mişar yan xîzara metalan.

HACKWORK, *n.* : karê torî yan huneriyê bazirganî.

HADDOCK, *n.* : texlîtek masî ye.

HADE, *n.* : ladan (ji serî), goşeya ladanê.

HADE, *vi.* : ladan.

HADES, *n.* : dojeh, goristana giyanan (efsaneya Girekî), cihana jêrî.

HADRON, *n.* : pirtika hêmaniya nav çalaka xurt, hadron.

HADRONIC, *adj.* : pêwendîdarê pirtika hêmaniya nav yan hindûr çalak, hadronî.

HAECCEITY, *n.* : eveyîtî, mirovîtî.

HAEM, HEME, *n.* : pêkhatiyek sor asin têde ye ko parçeya ne protîniya gilobînî ye.

HAEMAL, *adj.* : xwînî.

HAEMATIC, *adj.* : xwînî, xwîndar.

HAEMATI, *n.* : madeyek şîn-reş bêşikil di nav hexmoglobînî de.

HAEMATITE OR HEMATITE : kanê xavê oksîdê asinî (sor, reş yan gewr).

HAEMATO- OR HEMATO-, *pref.* : pêşgir e ko xwîn e.

HAEMATURIA, *n.* : xwînmîzî.

HAEMOCYANIN, *n.* : madeyê oksîjenhelgir mis têde di nav xwîn pilazmaya pêtik, tevnepirê û nermokeyan da.

HAEMOGLOBIN, *n.* : hemoglobîn : rengkerê pirtikên sorên xwînê.

HAEMOLYSIS, *n.* : nemana xwînxaneyên sor di nav hemoglobînî de.

HAEMOPHELIA OR HEMOPHELIA, *n.* : xwînverestin.

HAEMORRHAGE OR HEMORRHAGE, *n.* : risîn.

HAEMORRHOID OR HEMORRHOID, *n.* : mayesîr, basûr.

HAEMOSTASIS, *n.* : rawestana rewanî yan çûna xwînê.

HAEMOSTATIC, *adj.* : rawestaniya xwînê.

HAFFET, *n.* : enî, rû.

HAFNIUM, *n.* : hafniyom : hêmanek metalî ye.

HAFT, *n.* : destik, balçiq.

HAFT, *vt.* : (bi) destik kirin.

HAG, *n.* : pîrejina kirêt, dêw, cadûbaz, bedecine.

- **FISH** : masiyek masîxwer e.

HAGGADAH, *n.* : parçeya wêneyiya efsanetiya Telmûdê.

HAGGARD, *adj., n.* : çermok, lar, lawaz, laxir, qels, bazê dirr, şepirze, xefzan, mandî.

HAGGARDLY, *adv.* : bi lawazî, lawazkî.

HAGGARDNESS, *n.* : lawazîtî.

HAGGLE, *n.* : birrîn, bazar.

HAGGLE, *vt.i.* : birrîn (zivir), bazar kirin.

HAGGLED, *adj.* : (zivir) birrî, bazar dikit.

HAGI(O)-, *pref.* : pêşgir e ko pîroz e, pîroz in.

HAGIOGRAPHER, *n.* : jînnamenivîsê pîrozan.

HAGIOGRAPHY, *n.* : jînnameya pîrozan.

HAGIOLATRY, *n.* : pîrozperistin.

HAGIOLOGY, *n.* : tora pîrozan.

HAGRIDE, *vt.* : mandî kirin, eşkence kirin, şepirze kirin.

HAGSEED, *n.* : biçûk yan zarokê cadûbazê.

HA-HA, *interj.* : derbirrîna kenînê (yan keniyê).

HA-HA, *n.* : tanê nizimê çimen yan baxçeyî.

HAIL, *n.* : gijik, teyrok, tezre, tamor, zîpik, savarok, sîlav, gazî.

- **STONE** : gijik, tezre, xilxil.

- **STORM** : bahoza gijikî.

- **TINY ~** : savarok.

- **WITHIN ~** : nêzîkî bihîstina dengî (gazîkirinê).

HAIL, *vt.i.* : barîn (gijik), silav kirin, gazî kirin.

- **TO ~ A TAXI** : gazî taksî kirin.
- **TO ~ FROM** : hatin ji (direkê).

HAILER, *n.* : gazîker.

HAIL FELLOW OR HAIL-FELLOW-WELL-MET, *n.* : heval, hevalî, dostî.

HAIR, *n.* : mû, pirç, por, qij, pûrt, mî.

- **NOT TO TURN A ~** : şaş nebûn, perîşan nebûn, aza, mêrxas.
- **TO KEEP ONE'S ~ ON** : şaş nebûn.
- **TO SPLIT ~ S** : berhevdana bêtewş kirin.
- **BLACK AND WHITE ~** : ser belek.
- **BREATH ~** : nêzîk, zehmetî, stûriya mûyekê (hind nêzîk e).
- **BREADTH ESCAPE** : revîna zehmet.
- **BRUSH**, *n.* : firçeya pirçê yan porê.
- **CLOTH** : perûkê mûyê hêştirê.
- **CUT** : sertiraşîn.
- **DO** : şengilandin.
- **DRESSER** : sertaş, sertiraş, delak, berber, xemilgir.
- **FALLICLE** : binkê mûyî.
- **LINE** : derz, hêla mûyî, hêla gelek zirav.
- **LOCK OF ~** : bisk.
- **PIN** : sinceq.
- **PITH** : navka mûyî.
- **RAISER** : gûhişîn, hander (nemaze li şanoyê).
- **RAISING** : bizdihîn, guhişîn, perûş (pirç rawestan).
- **ROOT** : riha mûyî.
- **SEAL** : golikê avî yê têrmû.
- **SHEATH** : rûkêşê mûyî.
- **SPACE** : dûratiya mûyî.
- **SPLITTER** : berhevdankar (mezinker).
- **SPLITTING** : berhevdankarî (mezinkirî).
- **SPRING**, *n.* : zenbeleka zirav (mûyî).

HAIRLESS, *n.* : kos, kose, bêmû, porweşîn, rûhilî.

HAIRY, *adj.* : qij, mûyî, pûrtî, sext, req, bizdihîn.

HAKE, *n.* : texlîtek masî ye.

HALATION, *n.* : belavbûna ronahiyê.

HALBERD OR HALBERT, *n.* : kevneçek e (rimtevşo).

HALBERDIER, *n.* : helgirê rimtevşoyî.

HALCYON, *n.* : halkiyon : balindeyê efsaneyî ko pêlên deryayî mit dikit, mil, hedar, bextiyar.

HALE, *adj.* : saxlem.

HALE, *vt.* : kêşan, hajotin.

HALF, *n., adj., adv.* : nîv, nîwe, kaye, jin, nore, jin yan mêr, piştivanê harîker (tepka pêyan), nîvî, nîvekî, parçeyî, parçekî.

- **BY ~** : gelek, bêqam.
- **CELL** : nîvşane, nîvxane.
- **HUMAN** : mivro.
- **IN ~** : dunîv, nîvekî.
- **LIFE** : jînîvî, temenî nîwe.
- **NOT ~ BAD** : gelek baş.
- **WAVE** : nîvpêl.

HALF-AND-HALF, *adj., adv., n.* : nîvek, yeksan, nîvekî, yeksaneyî, parçeyî, têkiliya du şeraban.

HALF-BACK : piştivanê harîker (tepka pêyan).

HALF-BAKED, *adj.* : nîv pehtî yan pêjandî, nezan, sade.

HALFBEAK, *n.* : masiya nikildar.

HALF-BINDING, *n.* : nîvberg.

HALF-BLOOD, *n.* : melez.

HALF-BLOODED, *adj.* : melezî.

HALF-BOOT, *n.* : nîvpotîn.

HALF-BOUND, *adj.* : nîvbergkirî.

HALF-BRED, *adj.*, *n.* : durîh.

HALF-BROTHER, *n.* : nîvbira.

HALF-CASTE, *adj.*, *n.* : durîh.

HALF-COCK, nîvdiklok (tifeng), şaş.

HALF-COCKED, *adj.* : nîvdiklokî, nelêkdayî.

HALF-CROWN, *n.* : nîv kirawn : du şiling û nîv (du derhem û nîv) (diravê înglîzî ye).

HALF-EVERGREEN, *adj.* : nîv herkesk.

HALF-GAINER, *n.* : nîvnoqî (melevanî).

HALF-HEARTED, *adj.* : sist, ne ji dil.

HALF-HITCH, *n.* : nîvgirê (ko zû vedibit).

HALF-LEATHER, *n.* = **HALF BINDING.**

HALF-LENGTH, *n.* : nîvwêne (dirêjî nîv leşî).

HALF-LIGHT, *n.* : nîvronahî (tariya wêneyî).

HALF-LONG, *adj.* : dirêjî navîn.

HALF-MAST, *n.*, *vt.* : nîv darala (nîşana behiyê), nîv darala kirin, ala nîv bilind kirin.

HALF-PENNY, *n.* : nîv Penî (kevnediravê înglîzî : nêzik du fils).

HALF-SISTER, *n.* : nîvxuşk.

HALF-STEP, *n.* : nîvpêngav.

HALF-TIDE, *n.* : nîvradan.

HALF-TIMBER(ed) : nîvdarî (peyker dar û parçê gêçkirî).

HALF-TIME, *n.* : nîvdem (leyiztin).

HALF-TITLE, *n.* : navnîşana navdaya kitêbê (li ser laperê berî deqî).

HALF-TONE, *n.* : nîvawaz, nîvrengî (ne tarî û ne gelek vekirî).

HALF-TRACK, *n.* : otomobîl yan zirêpûşa nîvzincîrkirî.

HALF-WAY, *n.* : nîvrê.

HALIBUT, *n.* : masiyek mezin û pan e.

HALIDE, *n.* : pêkhatiya duwaneya halojenî.

HALIEUTIC, *adj.* : masîgiriyî.

HALIOTIS, *n.* : texlîtek pêzik e.

HALITE, *n.* : kevrê xwê yan xwêya kevrî (klorîdê sodyomê sirûştî).

HALITOSIS, *n.* : bêhnnexoşiya mirovî.

HALL, *n.* : hol, sif.

HALLELUJAH, *interj.*, *n.* : sirûda sipasiyê.

HALLMARK, *n.* : nîşana mîrî, nîşana çek û mitayî.

HALLOO, *vi.t.* : qîj yan gazî kirin helo!.

HALLOW, *vt.* : pîroz kirin.

HALLOWED, *adj.* : piroz(kirî).

Halloween, *n.* : şeva cejna hemî pîrozan.

Hallomas, *n.* : cejna hemî pîrozan.

HALLUCINATION, *n.* : şipestayî, virave, fişar, jiberaxiftin.

HALLUCINOGEN, *n.* : dermanê şipestayî.

HALLUCINOSIS, *n.* : şipeste, eletewş.

HALLUX, *n.* : pêçî.

HALLWAY, *n.* : derîke.

HALO, *n.* : xermane.

HALOGEN, *n.* : xwêzê (wek flor û kilorî).

HALOGENATE, *vi.* : halojen kirin (bi halojenî çare kirin).

HALOPHILE, *n.* : xwêxwaz.

HALOPHYTE, *n.* : heleza xwêxaz (li nav axa têrxwê de şîn dibit).

HALT, *adj., n.* : leng, kulek, rawest, êsgeh, rawestan.

HALT, *vi.t.* : kulîn, rawestîn, rawestandin, lalî axiftin, helin givîn, veweşîn, sist diyar bûn, temam bûn, temam kirin.

HALTER, *n.* : rişme, lixav, hevsar, serdifin, werîsê sêdareyê, leng, dudil, bersîngek jinan (mirina) sêdare kirin, hevsenger (pêtik), rawestayî.

- **CHAIN** : qeraze.

HALTER, *vt.* : gîro kirin, bend kirin, pêbend kirin, sêdare kirin.

HALTERES, *n.* : endamên hevsengiyên pîtikên dûçeng.

HALTING, *adj., n.* : çikandin, rawestan, rawestandin, rawes, rawestayî, kulek, qop.

HALVE, *vt.* : nîvî kirin.

HALVES, *pl.* **OF HALF** : nîv .

HALVING, *n.* : nîvîkirin.

HALYARD, *n.* : werîsê babirekê.

HAM, *n.* : goştê ranê berazî.

HAMADRYAD, *n.* : periya daristanan, marek jehrî mezin e, kolhelgir, meymûn.

HAMBURGER, *n.* : hamburger (nermerihik e di nav nanê babole de).

HAME, *n. pl.* : parçestûyiya hespî bo girêdana hevsarî.

HAMITE, *n.* : hamî : kevne Misrî yan Qiptî.

HAMITE, *n.* : berdîneyek, pêser (qalik şikil çingal).

HAMITIC, *adj.* : Hamiyî.

- **LANGUAGES** : zimanên hamî (wek Qiptî).

HAMLET, *n.* : gund(biçûk).

HAMMER, *n.* : kutek, kirçe, çekûç.

- **AND SICKLE** : das û kutek (dirûşma komiyetî).

- **AND TONGS** : gelek dijwar.

- **HEAD** : texlîtek masî ye (serkutek), xirpo.

- **LOCK** : girtina kotekî (gemş) yan zoranî.

HAMMER, *vi.t.* : vekutandin, qutan.

HAMMERED, *adj.* : vekutandî.

HAMMERING, *n.* : kutan, vekutandin.

HAMMERLESS, *adj.* : zendveşartî, (destiknediyar).

HAMMOCK, *n.* : hêsk.

HAMMY, *adj.* : wek goştê ranê berazî.

HAMPER, *n.* : tegere, gîro.

HAMPER, *vt.* : gîro kirin, bend kirin, şaş kirin.

HAMPERED, *adj.* : gîrokirî.

HAMPERING, *n.* : gîrokirin, berpêk.

HAMSHACKLE, *vt.* : hespî bend kirin (bi girêdana serî û pêyek pêşî : bi werîsî).

HAMSTER, *n.* : giyanewerek kirinde wek cirdî ye (hamster).

HAMSTRING, *vt.* : qap kirin (bi jihbirrînê).

HAMSTRINGING, *n.* : qopkirin.

HAMSTRUNG, *adj.* : qopkirî.

HAMULUS, *n.* : niklok.

HAND, *n.* : dest, destik, lep, çembil, çepik, serperiştî, rex, nivîsîn, yarîker, harîkirin, hevkarî, rêbaz, şehrezayî.

- **A HEAVY ~** : sitem, zordarî.

- **A HIGH ~** : sitemkarî, bêdadî.

- **AT ALL ~ S** : ji hemî rexan.

- **AT ~** : nêzîk, amade, ber dest, li ber çêbûnê ye.

- **AT THE ~ OF** : li ser destê mirovekê.

- BY ~ : bi destî.

- CLAPPING : dest qutan.

- CLEAN ~ : pakî.

- FOR ONE'S OWN ~ : bo berjewendiya mirovî bi xwe.

- FROM ~ TO ~ : ji kesekê bo kesek dî (ji destekê bo destek dî).

- FROM ~ TO MOUTH : jînkarî, debar.

- GRENADE : narincok.

- ~ AND GLOVE OR ~ IN GLOVE : dostî ya rast.

- ~ IN ~ : dest bi dest.

- ~ OVER ~ : bi pêşketina lezîn û berdewam.

- OFF : destê xwe jê rake!, têkiliyê neke!.

- UP : dêstên xwe rake!, çîz bike!.

- ~ TO ~ : şerê ketina nav yek de.

- IN ~ : berdeste.

- LAMP : pîl.

- ON ALL ~ S : li her dirê.

- ON ~ : amade ye, heye, berdest e.

- ON THE ONE ~ : ji alekê ve, ji layekê ve.

- OUT OF ~ : cihde, dem û dest.

- TO ASK THE ~ OF : xwastin (jin înan).

- TO CHANGE ~ S : xudan guhastin.

- TO COME TO ~ : gehîn, wergirtin.

- TO HAVE ONE'S ~ S FULL : gelek mijûl.

- TO JOIN ~ IN ~ : harî hev kirin.

- TO LAY ~ S ON : dest li ser girtin.

- TO SHAKE ~ S WITH : dest hejandin.

- TO TAKE A ~ : beşdarî kirin (leyiztina kaxezan).

- TO WASH ONE'S ~ OF : destê xwe jê şûştin.

HAND, *vt.* : gehandin, (bi destî) dan.

- TO ~ OVER : rasipêr kirin.

HAND AND FOOT, *adv.* : bi temamî (bi dest û pêyan).

HAND BAG, *n.* : çenteyê destî.

HAND BILL, *n.* : agehî yan belavoka bi destî.

HAND BOOK, *n.* : namîlke, raberê geştiyaran.

HANDCART, *n.* : galîske.

HANDCRAFT, *n.* : bidestçêkirin, bidestkar.

HANDCUFFS, *n.* : kelepçe, çîdan, zincîr.

HANDCUFF, *vt.* : destbest kirin.

HANDCUFFED, *adj.* : destbestkirî.

HANDED, *adj.* : destdar.

HANDEDNESS, *n.* : destrastîtî yan destçepîtî.

HANDFUL, *n.* : kulm, çeng, mistik.

HAND GLASS, *n.* : xudîka destî.

HAND GRIP, *n.* : destik, destgirtin, şerkirin (bi destan).

HANDHOLD, *n.* : destgir.

HANDICAP, *n.* : kosp, gîro.

HANDICAPPED, *adj.* : mivro.

HANDICRAFT, *n.* : pîşegerî, pîşe, şehrezayiya destî.

HANDILY, *adv.* : bi asanî, bi şehrezayî, asanîkî.

HANDIWORK, *n.* : karê destî.

HANDKERCHIEF, *n.* : dersok, destmal, desmal.

HANDLE, *n.* : destik, balçîq, çembil, dapelandin.

- OF WATCH : mîl.

HANDLE, *vt.* : rakirin û danan, girtin, bi kar hînan, çare kirin, kardarî kirin.

HANDLE BAR, *n.* : destikê duçerxê (bîsîkletê).

HANDLER, *n.* : kardar, meşqvanê kulmbaziyê, berdêl.

HANDLESS, *adj.* : bê dest.

HANDLING, *n.* : rakirin û danan.

HANDMADE, *adj.* : bi dest çêkirî.

HANDMAID OR HAND MAIDEN, *n.* : xidam.

HAND-ME-DOWN, *n.* : bikarhatî, amade û erzan.

HAND-MILL, *n.* : distar, destar.

HAND-OUT, *n.* : qencî.

HAND-OVER, *n.* : pêdan.

HANDRAIL, *n.* : destgirê pêstirkan.

HANDSAW, *n.* : mişar yan xîzara destî.

HANDSEL, *n.* : pêşekî, diyarî (nemaze serê salê), yekem bazirganî.

HANDSEL, *vt.* : pêşkêş kirin, diyarî dan.

HANDSET, *n.* : telefona pêkhatî : (bo hinartin û wergirtinê).

HANDSHAKE, *n.* : miçirandin, mîçirîn, dest hejandin.

HANDSOME, *adj.* : law, çeleng, çelebî, kêrhatî, bedew, keleş.

HANDSOMENESS, *n.* : lawîtî, çelengitî, delalîtî, terpûşîtî.

HAND SPINDLE, *n.* : teşî.

HAND-TO-MOUTH, *n.* : jînkarî.

HANDWHEEL, *n.* : çerxa destî.

HANDWORK, *n.* : karê destî.

HANDWRITE, *vt.* : (bi destî) nivîsîn.

HANDWRITING, *n.* : destnivîsîn.

HANDY, *adj.* : gîx, rind, law, kêrhatî, berdest.

HANDYMAN, *n.* : zelamê her karî dikit.

HANG, *n.* : dahêlan, şopewerî, dudilî, nişîv, rêbaza karî.

- **MAN** : tajangbaz.

- **NAIL** : çermê dahêlayî (ji rih yan rexê nênokê).

INDUSTRIALIST, *n.* : pîşesaz.

INDUSTRIALIZATION, *n.* : pîşesazîkirin.

INDUSTRIALIZE, *vt.i.* : pîşesazîkirin.

INDUSTRIALIZED, *adj.* : pîşesazîkirî.

INDUSTRIALIZING, *n.* : pîşesazîkirin.

INDUSTRIOUS, *adj.* : xebatker, bizavker, kedker, rêncber.

INDUSTRY, *n.* : pîşesazî, sazkarî.

INDWELL, *vi.t.* : nişt bûn.

INDWELLER, *n.* : nîştecî.

- INE, *suff.* : paşgir e ko jî ... , çêkirî ye jî ....

INEBRIANT, *adj., n.* : mestbar, şeraba mestî.

INEBRIATE, *vt.* : mest kirin, serxoş kirin.

INEBRIATE(D), *adj.* : mest, serxoş.

INEBRIATING, *n.* : mestkirin, serxoşkirin.

INEBRIATION, *n.* : serxoşbûn, mestbûn.

INEBRIETY, *n.* : mestî, serxoşî.

INEDIBLE, *adj.* : nexwarinbar.

INEDITED, *adj.* : nebelavkirî, belavkirî bê rastkirin yan bijare kirin.

INEDUCABILITY, *n.* : nehînbarîtî.

INEDUCABLE, *adj.* : nehînbar.

INEFFABILITY, *n.* : neravebarîtî.

INEFFABLE, *adj.* : neravebar (naêt ravekirin ko hind pîroz e).

INEFFABLENESS, *n.* : neravebarîtî.

INEFFABLY, *adv.* : bi neravebarî, neravebarkî.

INEFFACEABILITY, *n.* : neheşivînbarîtî.

INEFFACEABLE, *adj.* : neheşivînbar.

INEFFACEABLY, *adv.* : bi neheşivînbarî, neheşivînbarkî.

INEFFECTIVE, *adj.* : nekarîger, bêtewş, bêhêz, sist.

INEFFECTIVELY, *adv.* : bi sistî, bi nekarîgerî, sistîkî, nekarîgerkî.

INEFFECTIVENESS, *n.* : nekarîgerîtî.

INEFFECTUAL, *adj.* : nekarîger.

INEFFECTUALITY, *n.* : nekarîgerîtî.

INEFFECTUALLY, *adv.* : bi nekarîgerî, nekarîgerîkî.

INEFFICACIOUS, *adj.* : neçalak, nekarîger.

INEFFICACIOUSLY, *adv.* : bi sistî, sistîkî.

INEFFICACIOUSNESS, *n.* : neçalakîtî.

INEFFICACY, *n.* : nekarîgerî.

INEFFICIENCY, *n.* : neçalakî, necostî.

INEFFICIENCT, *adj.* : neçalak, necost.

INELASTIC, *adj.* : neçir, naçir, turt.

- COLLISION : lêkdana neçir.

- IMPACT : lêkdana neçir.

INELASTICITY, *n.* : necîrîtî, neçîrîtî.

INELEGANCE, *n.* : neterpûşî, neşepalî, nelewendî.

INELEGANT, *adj.* : neşepal, neşeng, neterpûş.

INELEGANTLY, *adv.* : bi neterpûşî, neterpûşîkî.

INELIGIBILITY, *n.* : nejêhatinbarîtî, nejêhatîtî.

INELIGIBLE, *adj.* : nejêhatintîbar, nejêhatî, nehêja, nemafbar, kêrnehatî.

INELOQUENT, *adj.* : nerewan.

INELOQUENTLY, *adv.* : bi nerewanî, nerewanîkî.

INELUCTABLE, *adj.* : nebergirbar, neguhêrbar, neçarbar (mirov neşêt jê birevit).

INELUDIBLE, *adj.* : neçarbar.

INENARRABLE, *adj.* = **INDESCRIBABLE.**

INEPT, *adj.* : ne hêja, kêrnehatî, gewc, ne şehreza.

INEPTITUDE, *n.* : neşehrezayî.

INEPTLY, *adv.* : bi gewcî, gewcîkî.

INEPTNESS, *n.* : kêrnehatin.

INEQUABLE, *adj.* : neyekbar.

INEQUALITY, *n.* : neyeksanî(tî).

INEQUI-, *pref.* : pêşgir e ko neyeksan e.

INEQUILATERAL, *adj.* : nehevla, neheval.

INEQUITABLE, *adj.* : zordar.

INEQUITY, *n.* : zordarîtî, sitemkarî, sitem.

INERADICABILITY, *n.* : neheşivînbarîtî.

INERADICABLE, *adj.* : neheşivînbar, nehelkêşanbar.

INERADICABLY, *adv.* : bi neheşivînbarî, nehelkêşanbarkî.

INERRABLE, *adj.* : neçewtbar.

INERRANCY, *n.* : neçewtbarî.

INERRANT, *adj.* : neçewt.

IN ERROR, *adj.* : çewt, hele, nerast.

INERT, *adj.* : neçalak, çost, sist, leşgiran, xav.

INERTIA, *n.* : danekizî, yekbarî, berdewamî.

INERTIAL, *adj.* : yekbar.

INERTLY, *adv.* : bi çostî, çostîkî.

INERTNESS, *n.* : sistîtî, leşgiranîtî.

INESCAPABILITY, *n.* : neçarîtî, nerevînbarîtî.

INESCAPABLE, *adj.* : neçar, nerevînbar.

INESCUTCHEON, *n.* : zirêyek biçûkê (li ser zirêyek mezintir).

INESSENTIAL, *adj.* : pêneviyayî.

INESTIMABLE, *adj.* : bêqam hêja, naêt bihakirin, nebihabar.

INESTIMABLY, *adv.* : bi hêjayî, hêjayîkî.

INEVITABILITY, *n.* : neçarîtî, neçarbarîtî.

INEVITABLE, *adj.* : neçar, neçarbar.

INEVITABLENESS, *n.* : neçarîtî, neçarbarîtî.

INEVITABLY, *adv.* : bi neçarî, neçareki.

INEXACT, *adj.* : ne rast, netemam.

INEXACTITUDE, *n.* : nerastîtî, netemamîtî.

INEXACTLY, *adv.* : bi nerastî, bi netemamî, netemamîkî.

INEXACTNESS, *n.* : nerastîtî, netemamîtî.

INEXCUSABLE, *adj.* : lêneborînbar, nebexşînbar.

INEXCUSABLENESS, *n.* : lêneborînbarîtî, nebexşînbarîtî.

INEXCUSABLY, *adv.* : bi lêneborînbarî, bi nebexşînbarî, nebexşînbarkî.

INEXECUTABLE, *adj.* : neniwandinbar.

INEXHAUSTIBILITY, *n.* : bênemanbarîtî (zehfî).

INEXHAUSTIBLE, *adj.* : bênemanbar (zehf).

INEXHAUSTIBLY, *adv.* : bi zehfî, zehfîkî.

INEXISTENT, *adj.* neheyî.

INEXORABILITY, *n.* : rikdarîtî.

INEXORABLE, *adj.* : rikdar.

INEXORABLY, *adv.* : bi rikdarî, rikdarîkî.

INEXPECTANT, *adj.* : neavis, nebizik, nebitişt.

INEXPEDIENCE, *n.* : kêrnehatin.

INEXPEDIENCY, *n.* : kêrnehatin.

INEXPEDIENT, *adj.* : kêrnehatî.

INEXPEDIENTLY, *adj.* : bi kêrnehatî, kêrnehatîkî.

INEXPENSIVE, *adj.* : ne giran (erzan).

INEXPENSIVELY, *adv.* : bi negiranî, bi erzanî, negiranîkî, erzanîkî.

INEXPENSIVENESS, *n.* : negiranîtî, erzanîtî.

INEXPERIENCE, *n.* : bê serhatin.

INEXPERIENCED, *adj.* : bêserhatî, xam.

INEXPERT, *adj.* : neşehreza, nepispor.

INEXPERTLY, *adv.* : bi neşehrezayî, bi nepisporî, nepisporîkî.

INEXPERTNESS, *n.* : neşehrezayîtî, nepisporîtî.

INEXPIABLE, *adj.* : nelêborînbar.

INEXPIABLY, *adv.* : bi lênebirînbarî, lêneborinbarkî.

INEXPLICABILITY, *n.* : neravebarîtî, neşirovebarîtî.

INEXPLICABLENESS, *n.* : neravebarîtî.

INEXPLICABLY, *adv.* : bi neravebarî.

INEXPLICIT, *adj.* : ne eşkera, nediyar.

INEXPLICITLY, *adv.* : ne eşkerayîtî.

INEXPLOSIVE, *adj.* : neteqîndar.

INEXPRESSIBILITY, *n.* : ne derbirrînbarîtî.

INEXPRESSIBLE, *adj.* : nederbirrînbar.

INEXPRESSIBLY, *adv.* : bi nederbirrînbarî.

INEXPRESSIVE, *adj.* : nederbirrîndar.

INEXPRESSIVELY, *adj.* : nederbirrîndarî.

INEXPRESIVENESS, *n.* : nederbirrindarîtî.

INEXPUGNABLE, *adj.* : neheşaftinbar, nerakirinbar, asê.

INEXPUGNABLENESS, *n.* : neheşaftinbarîtî, asêyîtî, sextîtî.

INEXPUGNABLY, *adv.* : bi sextî, bi asêyî, asêyîkî.

INEXTENSIBLE, *adj.* : nedirêjkirinbar.

IN EXTENSO, *adv.* : bi dirêjayî, dirêjkî.

INEXTINGUISHABLE, *adj.* : netemirînbar, nevekujînbar.

INEXTINGUISHABLY, *adv.* : bi netemirînbarî, nevekujînbarkî.

IN EXTREMIS : li ber mirinê.

INEXTRICABILITY, *n.* : alozîtî, alozbarîtî.

INEXTRICABLE, *adj.* : alozbar.

INEXTRICABLY, *adv.* : bi alozbarî, alozbarîkî.

INFALLABILISM, *n.* : neketinbarîtî, bêçewtîtî : baweriya ko Papa bê çewtî ye.

INFALLABILITY, *n.* : neketinbarîtî, bêçewtîtî.

INFALLIBLE, *adj.* : neketinbar, bêçewtî, neçewtbar.

INFAMIZE, *vt.* : bêrûmet kirin, bednav kirin.

INFAMOUS, *adj.* : bednav, bednaw.

INFAMOUSLY, *adv.* : bi bednavî, bednavîkî.

INFAMY, *n.* : bednavî, riswayî.

INFANCY, *n.* : savayî.

INFANT, *adj.*, *n.* : sava, memikmij, şîrmij.

- **SUCKLING ~** : sava.

INFANTE, *n.* : kurkê sava.

INFANTICIDAL, *adj.* : savakuj.

INFANTICIDE, *n.* : sava kujî.

INFANTILE, *adj.* : savayî.

- **ECZEMA** : êzmik.
- **DIARRHEA** : virçik.
- **PARALYSIS** : falinc yan şehtiya biçûkan.

INFANTALISM, *n.* : savayîtî, zarokîtî.

INFANTALIZATION, *n.* : savayîkirin.

INFANTALIZE, *n.* : savakirin.

INFANTALIZED, *adj.* : savakirî.

INFANTALIZING, *n.* : savakirin.

INFANTINE, *adj.* = **INFANTILE** (savayî, zarokî).

INFANTRY, *n.* : peyade.

- **MAN** : serbazê peyade.

INFARCT, *n.* : piniya tevnê mirî (ji ber negehiştina xwînê).

INFARCTION, *n.* : bestin, girtin, tijbûn.

INFARE, *n.* : pêşwaziya bûk û zavayî.

INFATUATE, *adj.* : şeyda.

INFATUATE, *vt.* : şeyda kirin, dêwane kirin.

INFATUATED (BY), *adj.* : şeyda(kirî bi), dêwane.

INFATUATING, *n.* : şeydakirin.

INFATUATION, *n.* : şeydabûn.

INFEASIBILITY, *n.* : nekirdarbarîtî, neniwandinbarîtî.

INFEASIBLE, *adj.* : nekirdarbar, neniwandinbar.

INFECT, *vt.* : vegirtin, pîs kirin, nesax kirin.

INFECTED, *adj.* : vegirtî, nesaxkirî.

- **WITH SMALLPOX** : rûxûrî(k).

INFECTION, *n.* : kotîbûn, teşene, kulbûn, vegirtin.

INFECTIOUS, *adj.* : vegir, kotî, dirm, peta, jêkvegir, lêkvegir.

- **DISEASE** : nexoşiya jêkvegir.

INFECTIOUSNESS, *n.* : vegirîtî.

INFECTOR, *n.* : vegirker.

INFELICIFIC, *adj.* : kêrnehatî, xembar.

INFELICITOUS, *adj.* : kêrnehatî, nebextewer.

INFELICITOUSLY, *adv.* : bi nebextewerî, nebextewerkî.

INFELICITY, *n.* : nebextewerîtî, xemdarîtî, nebextiyarîtî, têbîniya pûç.

INFER, *vt.i.* : nîşan kirin, diyar kirin, xeml kirin, encam kirin.

INFERENCE, *n.* : encamkirin, nîşan, nîşandan.

INFERENTIAL, *adj.* : nîşandanî.

INFERENTIALLY, *adv.* : bi nîşandanî, nîşandankî.

INFERIOR, *adj.* : sik, bed, kotî, jêr, nizimtir, neşehreza, (paye) kêmtir.

INFERIORITY, *n.* : kotîtî, bedîtî, sikîtî.

INFERIORLY, *adv.* : bi kotî, bi sikî, kotîkî.

INFERNAL, *adj.* : dojehî.

INFERNALLY, *adv.* : bi dojehî, dojehîkî.

INFERNO, *n.* : gurîn, gurî, kana agirî.

INFERO-, *pref.* : pêşgir e ko jêr e.

INFERRED, *adj.* : nîşankirî.

INFERRING, *n.* : nîşankirin.

INFERTILE, *adj.* : bêpêz, bêber.

- **LAND** : xerşov.

INFERTILITY, *n.* : bêberîtî, bêpêzîtî.

INFEST, *vt.* : şepirze kirin, êrîş kirin, dagîr kirin (pêtik, kulî...).

INFESTANT, *adj.* : dagîrker, vegir.

INFESTATION, *n.* : dagîrkirin, êrîşkirin (kulî...).

INFESTER, *n.* : dagîrker, êrîşker.

INFIBULATION, *n.* : girêdana şermecêyan (bo nehêlana daketinê).

INFIDEL, *adj.* : bê ol yan ayîn.

INFIDELITY, *n.* : bêolîtî, bêayînîtî, xinizî, xirabkariya mêrî yan jinê.

INFIELD, *n.* : zeviya nik malê, meydan.

INFIGHTING, *n.* : şerkirina nêzîk, kulmbaziya nêzîk.

INFIL, *vt.* : tijî kirin (kilorî).

INFILTRATE, *vt.i.* : delandin, (bi dizîkî ve) çûn nav dûjminî de.

INFILTRATED, *adj.* : delînkirî.

INFILTRATING, *n.* : delînkirin.

INFILTRATION, *n.* : delîn, delandin, têreçûn, sûrikandin.

INFILTRATOR, *n.* : sûrikî.

INFINITE, *adj., n.* : bêpayan, bêrade, bêdûmahî, bêdawî, bêkutayî, nediyarkirî.

- **DILUTION** : ronbûna bêrade.

- **SERIES** : zincîreya bêdûmahî.

INFINITELY, *adv.* : bi bêrade, bi bêdawî, bêradekî.

INFINITENESS, *n.* : bêradeyîtî.

INFINITESIMAL, *adj., n.* : pirtik (parçeyek bêqam biçûk).

INFINITIVAL, *adj.* : jêderî.

INFINITIVE, *adj.* : rader, çawig, jêder.

INFINITIVELY, *adv.* : bi raderî, raderkî.

INFINITUDE, *n.* : bêdûmahî, bêdawî, bêkutayî.

INFINITY, *n.* : bêdûmahîtî, bêdawîtî.

INFIRM, *adj.* : lawaz, dudil, zerbiçî.

INFIRMARIAN, *n.* : tîmargehvan.

INFIRMARY, *n.* : tîmargeh, nexoşxane.

INFIRMITY, *n.* : nesaxî, lawazî, binesaxî, nesaxîkî.

INFIX, *n.* : navîn.

INFIX, *vt.* : têre kirin, avî kirin, çespandin.

INFLAME, *vt.i.* : şewitandin, gurî girtin.

INFLAMED, *adj.* : girgîn, rivînkirî, gurîgirtî, gurîkirî.

INFLAMING, *n.* : rivînkirin, gurîkirin, gurkirin.

INFLAMMABILITY, *n.* : gurîbarîtî, agirgirîtî.

INFLAMMABLE, *adj.* : gurîbar, agirgir, agirîn.

INFLAMMATION, *n.* : kul, kulik, kulî, kulbûn, alyan, amas, sorbûn.

INFLAMMATORY, *adj.* : gurîdar, handar, kulbûnî, sorbûnî, arandinî, têkvedanî.

INFLATABLE, *adj.* : pufdar.

INFLATE, *vt.i.* : puf dan, puf kirin.

INFLATED, *adj.* : pufkirî.

INFLATING, *n.* : pufkirin.

INFLATION, *n.* : pare yan dirav zorî, awsan, pufbûn, enflasyon.

INFLATIONISM, *n.* : parezoritî, pufbûnîtî : ko pare zehf dibin vêca kêm biha dibin, enflasyonîzm.

INFLATIONIST, *n.* : piştgirê parezorîtiyê.

INFLECT, *vt.i.* : çemandin, badan, rêziman : dûmahiya peyivê diguhorit bo derbirrîna pêwendiya rêzimanî mûzîqe : tûj kirin.

INFLECTION, *n.* : çemandin, çivandin.

INFLECTIONAL, *adj.* : çivandinî.

INFLECTIONALLY, *adv.* : bi çivandinî, çivandinkî.

INFLECTIOUS, *adj.* : çivandî, alandî.

- **DISEASE** : nexoşiya têkvegir.

INFLECTIVE, *adj.* : guhêr (peyiva guhartî).

INFLEXED, *adj.* : guhartî, çemandî.

INFLEXIBILITY, *n.* : neguhêrbarîtî, neguhêr, reqîtî, pitewî.

INFLEXIBLE, *adj.* : neguhêr (bar), req, bênermî, neçemîn.

INFLEXIBLY, *adv.* : bi reqî, neçemînekî, reqîkî.

INFLEXION, *n.* : veçemîn, çemandin, çivandin.

INFLICT, *vt.* : lê dan, siza kirin, tûş kirin.

INFLICTABLE, *adj.* : lêdanbar.

INFLICTION, *n.* : lêdan, sizakirin, derd.

INFLICTIVE, *adj.* : lêdandar.

INFLORESCENCE, *n.* : gulbûn.

INFLORESCENT, *adj.* : guldayî.

INFLOW, *n.* = **INFLUX.**

INFLUENCE, *n.* : destçûnî, kartêkirin, desthelatî, bandûr, têçûn, gozerkirin.

INFLUENCED, *adj.* : kartêkirî.

INFLUENCING, *n.* : kartêkirin.

INFLUENT, *adj., n.* : zê, vizikî, rûbark, çem.

INFLUENTIAL, *adj.* : desthelatdar, destdirêj, bandûrî.

INFLUENTIALLY, *adv.* : bi bandûrî, bi desthelatdarî, bandûrîkî.

INFLUENZA, *n.* : înfilowenza : persîva giran, peta.

INFLUX, *n.* : rêjgeya rûbarî, vizik.

INFOLD, *vt.i.* : pêçîn, bergkirin.

INFORM, *vt.i.* : dan zanîn, ragehandin.

INFORMAL, *adj.* : nemîrî.

INFORMALITY, *n.* : asayî, nemîrîtî.

INFORMALLY, *adv.* : bi nemîrî, nemirîkî.

INFORMANT, *n.* : sîxor, paşbêj, xeberdok.

INFORMATICS, *n.* : ragehînzanî.

INFORMATION, *n.* : ragehîn, agehkirin, agadarî, zanyarî, berat, ragehandin, nûçe, salox, agehî.

- **BUREAU** : pirsgeh.

- **MEDIA** : awayên ragehandinê.

- **SCIENCE** : ragehînzanî.

INFORMATIVE, *adj.* : rewşenbîr.

INFORMED, *adj.* : zana, bilyan, jîr, hînkirî, ragehandî.

INFORMER, *n.* : saloxdar, sîxor, paşbêj, qomsî, nûçebêj.

INFORMING, *n.* : danezanîn, nasandin, ragehandin, agehkirin, dazanîn.

- **AGAINST** : teşqele, sîxorî.

INFRA-, *pref.* : pêşgir e ko jêr e, bin e.

INFRACT, *vt.* : çirandin, gelşî kirin.

INFRACTION, *n.* : çirandin.

INFRANGIBLE, *adj.* : neçirînbar.

INFRARED, *adj.* : jêrsor.

INFRASONIC, *adj.* : jêrbihîs.

INFRA SPECIFIC, *adj.* : texlîtek taybet.

INFRASTRUCTURE, *n.* : jêravahî.

INFREQUENCY, *n.* : kêmî, kêm caran.

INFREQUENT, *adj.* : kêm.

INFREQUENTLY, *adv.* : bi kêmî, kêmîkî.

INFRINGE, *vt.i.* : çirandin, bêrûmet kirin, destdirêjî kirin.

INFRINGED, *adj.* : çirandî, destdirêjîkirî.

INFRINGEMENT, *n.* : destdirêjî, peyivşikandin.

INFRINGING, *n.* : çirandin, destdirêjîkirin.

INFRUCTESCENCE, *n.* : bernegirtin, mîwenebûn, mîwenedan.

INFUNDIBULAR, *adj.* : kovikî.

INFUNDIBULIFORM, *adj.* : kovikî.

INFUNDIBULUM, *n.* : kovik.

INFURIATE, *adj.* : enir, torebar.

INFURIATE, *vt.* : enirandin, har kirin.

INFURIATED, *adj.* : enirandî, harkirî.

INFURIARING, *n.* : enirandin, harkirin.

INFURIATINGLY, *adv.* : bi enirînî, bi harî, enirînkî.

INFUSE, *vt.* : têkirin, şilkirin, çikilandin.

INFUSED, *adj.* : têkirî.

INFUSIBILITY, *n.* : nebuhujînbarîtî.

INFUSIBLE, *adj.* : nebuhujînbar.

INFUSING, *n.* : têkirin.

INFUSION, *n.* : têkirin, avdan.

INFUSORIA, *n.* : giyanewerên di nav şilatiya madeyê endamî de.

- **ING**, *suff.* : paşgire bo navê karan.

- **ING**, *suff.* : paşgir e ko kar be, kiryarî be.

INGATHER, *vt.i.* : kom kirin, kom bûn, dirîn (dirûn).

INGATHERING, *n.* : komkirin, dirîn (dirûn).

INGEMINATE, *vt.* : dubare kirin.

INGENIOUS, *adj.* : belîmet, helkefte, helkewto.

INGENIOUSLY, *adv.* : bi helkefteyî, helkeftekî.

INGENIOUSNESS, *n.* : helkefteyîtî, belîmetî.

INGENUITY, *n.* : jîrîtî, şehrezayî, alava şehreza.

INGENUOUS, *adj.* : sade, sakar, rastbêj.

INGENUOUSLY, *adv.* : bi sakarî, sakarîkî.

INGENUOUSNESS, *n.* : sakarîtî.

INGEST, *vt.* : xwarin xwarin.

INGESTA, *n.* : xurek, xwarin.

INGESTION, *n.* : xwarin.

INGESTIVE, *adj.* : xurekî.

INGLE, *n.* : koçik (kuçik, tifik), kulîn, qoncalka koçkî (kuçik, tifik).

- **NOOK** : gurî.

INGLORIOUS, *adj.* : ne navdar, nenas, bê abrû, bêrûmet.

INGLORIOUSLY, *adv.* : bi bêrûmetî, bêrûmetîkî.

INGLORIOUSNESS, *n.* : bêrûmetîtî.

INGOING, *n.* : çûyînjor : pareyên kirêdar xerc dikit li ser çakkirinê hînga diçit jor.

INGOT, *n.* : darêje, darişte.

INGRAFT, *vt.* = **ENGRAFT** (petrume kirin).

INGRAIN, *adj., n.* : çêkirî (ji benkê rengkirî berî vehandinê), rihgirtî (di derûnî de), nîşaneya rihgirtî.

INGRAIN, *vt.* : çandin (di derûnî de).

INGRAINED, *adj.* : rihgirtî, çandî, xwegir.

INGRATE, *n.* : nankor.

INGRATIATE, *vt.* : xwe şirîn kirin.

INGRATIATED, *adj.* : xweşirînkirî.

INGRATIATING, *adj.* : durû, rûbaz, dilniya.

INGRATITUDE, *n.* : nankorî.

INGRAVESCENCE, *n.* : xirabtirbûn.

INGRAVESCENT, *adj.* : xirabtirbûyî.

INGREDIENT, *n.* : têkilek.

INGRESS, *n.* : çûnjor, mafêçûnjor, derîke.

INGRESSION, *n.* : çûnjor.

INGRESSIVE, *adj.* = **INCHOATIVE.**

INGROUP, *n.* : girûha hevyaz.

INGROWING, *adj.* : werara hindurî yan di nav goştî de.

INGROWN, *adj.* : werariya hindurî.

INGROWTH, *n.* : werarbûna hindurî.

INGUINAL, *adj.* : kemaxî.

INGULF, *vt.* = **ENGULF.**

INGURGITATE, *vt.* : qurt kirin.

INGURGITATION, *n.* : qurtdan, loşdan, qurtkirin.

INHABIT, *vt.i.* : akincî bûn, nişte bûn.

INHABITABLE, *adj.* : nişînbar.

- **CAVE** : zivîng.

INHABITANCY, *n.* : nişîtîmen, nişîngeh.

INHABITANT, *n.* : nîşt, nişteni, xelk.

INHABITATION, *n.* : niştebûn, nişîn.

INHABITED, *adj.* : ava, şên, nişteкirî, avabûyî.

INHABITER, *n.* : akincî, nişteci.

INHABITING, *n.* : nişteкirin, nişîn, akincîbûn.

INHALANT, *n.* : bêhnkêşan : çareya bêhnkêşanê.

INHALATING, *n.* : vepirsandin.

INHALATION, *n.* : vepirsandin, helmijîn, bêhnkêşan.

INHALATOR, *n.* : bêhnkêşank.

INHALE, *vt.i.* : bêhn kêşan.

INHALED, *adj.* : bêhn kêşayî.

INHALER, *n.* : bêhnkêşa pencê.

INHALING, *n.* : helmijîn.

INHARMONIC, *adj.* : nerêk, nesaz.

INHARMONIOUS, *adj.* = **INHARMONIC.**

INHARMONY, *n.* : nesazî.

INHAUL, *n.* : werîsê pêçanê (bo babirekî).

INHERE, *vi.* : pêve man.

INHERED, *adj.* : pêvemayî.

INHERENCE, *n.* : pêveman.

INHERENCY, *n.* : pêveman.

INHERENT, *adj.* : zikmakî, mit, veşartî.

INHERING, *n.* : pêveman.

INHERIT, *vt.i.* : mirat bûn.

INHERITABLE, *adj.* : mîratbar.

INHERITANCE, *n.* : mîrat, pêmayî, kelepûr.

INHERITED, *adj.* : mîratgirtî.

INHERITING, *n.* : mîratgirtin, beşbirin.

INHERITOR, *n.* : beşbir, mîratxwer, pêna.

INHESION, *n.* : pêveman.

INHIBIT, *vt.* : qedexe kirin, nehêlan.

INHIBITION, *n.* : nehêlan, berhelistî.

INHIBITIVE, *n.* : bergir, nehêl.

INHIBITORY, *adj.* : nehêldar.

INHOMOGENEOUS, *adj.* : nerêk, nesaz.

INHOMOGENEITY, *n.* : nerêkîtî, nesazîtî.

INHOSPITABILITY, *n.* : bêar (bar)îtî.

INHOSPITABLE, *adj.* : bê ar (bar).

INHOSPITABILITY, *adv.* : bi bêarî, bêarîkî.

INHOSPITABLENESS, *n.* : bêar(bar)îtî.

INHOSPITALITY, *n.* : bêarîtî.

INHUMAN, *adj.* : nemirovî, req, hov.

INHUMANE, *adj.* : nedilovan, nemirovî, req, hov.

INHUMANITY, *n.* : hovîtî, berberîtî.

INHUMATION, *n.* : veşartin, gorkirin.

INHUME, *vt.* : veşêrit, gor kirin.

INIMICAL, *adj.* : dûjminî, neyar, dijminî.

INIMITABLE, *adj.* : qetlaz.

INIMITABLENESS, *n.* : qetlazîtî.

INIMITABLY, *adv.* : bi qetlazî, qetlazîkî.

INIQUITOUS, *adj.* : zordar, garis, bed, sitemkar.

INIQUITIOUSLY, *adv.* : bi zordarî, zordarîkî.

INIQUITIOUSNESS, *n.* : sitemkarîtî, zordarîtî.

INIQUITY, *n.* : zordarî, sûc, guneh.

INITIAL, *n., adj.* : seretayî, destpêkî, tîpa destpêker, destpêk : çend xaneyên ko endamê çêdikin.

INITIAL, *vt.* : îmza kirin (bi tîpa yekema navî).

INITIALED, *adj.* : îmzakirî (bi tîpa yekema navî).

INITIALIZATION, *n.* : destpêkirin.

INITIALIZE, *vt.* : dest pê kirin.

INITIALIZED, *adv.* : destpêkirî.

INITIALLY, *adv.* : bi destpêkî, destpêkîkî.

INITIATE, *vt.* : destpêkirin.

INITIATED, *adj.* : destpêkirî.

INITIATION, *n.* : destpêkirin.

INITIATING, *n.* : destpêkirin.

INITIATIVE, *n.* : destpêkerî.

INITIATOR, *n.* : destpêker.

INITIATORY, *adj.* : seretayî, destpêkî.

INJECT, *vt.* : têre kirin (derzî...).

INJECTED, *adj.* : têrekirî.

INJECTION, *n.* : têrekirin, derzî(şirenqe).

INJECTIVE, *adj.* : yekikiya hawkolkeyê bîrkarî.

INJUDICIOUS, *adj.* : gewc, hol.

INJUDICIOUSLY, *adv.* : bi holî, holîkî.

INJUDICIOUSNESS, *n.* : holîtî.

INJUCTION, *n.* : pend, ferman, raspêrî, haydana dadwerî.

INJURE, *vt.* : birîndar kirin.

INJURED, *adj.* : birîndar, zede.

INJURIA, *n.* : destdirêjî li ser mafên mirovekê.

INJURING, *n.* : birîndarkirin.

INJURIOUS, *adj.* : ziyandar, jandar.

INJURIOUSLY, *adv.* : bi ziyandarî, bi birîndarî.

INJURIOUSNESS, *n.* : birîndarîtî, ziyandarîtî.

INJURY, *n.* : birîn, ziyan, hingavtin.

INJUSTICE, *n.* : sitemî, zorî, zordarî, têşikan, sitem, sitemkarî, bêdadî.

INK, *n.* : murekeb.

INK, *vt.* : murekeb kirin.

INKBERRY, *n.* : texlîtek tî ye (tiya murekebî : tîşembî).

INKHORN, *n.* : murekebdan.

INKINESS, *n.* : murekebîtî.

INKLE, *n.* : şerîtê kitanê rengkirî.

INKLING, *n.* : kêm zanîn, hizra şêlî.

INKSTAND, *n.* : murekebdan, xane û murekeb.

INKWELL, *n.* : murekebdank.

INKY, *adj.* : murekebî.

INKY CAP, *n.* : kulavê merekebî : texlîtek qarçik e (kulavê hacîreşkî).

INLAID, *adj.* : neqşkirî.

INLAND, *n., adj., adv.* : bej, hindura welatî.

INLANDER, *n.* : nişteciyê hindura welatî.

IN-LAW, *n.* : mirov yan xizmê jinînanê yan şûkirinê.

INLAY, *n.* : neqşkirin.

INLAY, *vt.* : neqşkirin.

INLAY-ING, *n.* : deqandin, qurdanîn.

INLET, *n.* : derîke.

INLIER, *n.* : çîna kevriya nû.

IN LOVE WITH, *adj.* : şeyda, dêwane.

INLY, *adv.* : hindurî.

INMATE, *n.* : girtî, bend, nişteciyê zîndanê.

IN MEDIAS RES : li nîva çîrokê.

IN MEMORIAM : bo yadgarî.

INMOST, *adj.* : kûrtir(în).

INN, *n.* : xan.

- **KEEPER** : xançî.

INNARDS, *n.* : hinav.

INNATE, *adj.* : kesî, rihdar, sirûşî, nijadî, naxî.

INNATELY, *adv.* : bi kesî, bi rihdarî, kesîkî.

INNATENESS, *n.* : kesîtî, rihdarîtî.

INNAVIGABLE, *adj.* : nederyagerîbar.

INNER, *adj.* : navxwe, hindur.

- **TUBE** : loleya hindurî (çop).

INNERMOST, *adj., n.* : nax, kakil, nîhad.

INNERVATE, *vt.* : demar kirin.

INNERVATED, *adj.* : demarkirî.

INNERVATING, *n.* : demarkirin.

INNERVATION, *n.* : demarkirin.

INNERVE, *vt.* : qayîm kirin, bi zir(r)av kirin, xurt kirin, demarkar kirin.

INNING, *n.* : xul, ger, çakkirina zeviyê nexasme li ber avê, xalkên beysbol û kirîkitê.

INNOCENCE, *n.* : bêsûcî, dawpakî, pakî.

INNOCENCY, *n.* : bêsûcî, bêgunehî.

INNOCENT, *adj., n.* : bêsûc, rûspî, bêguneh.

INNOCENTLY, *adv.* : bi bêgunehî, bi dawpakî, bêgunehîkî.

INNOCUOUS, *adj.* : bêsûc, dawpak.

INNOMINATE, *adj.* : bênavî, nenavî.

- **BONE** : hestiyê nenavî (kemax).

INNOVATE, *vt.i.* : nû kirin, afirandin, dahênan.

INNOVATED, *adj.* : nûkirî, dahênayî.

INNOVATING, *n.* : nûkirin, dahênan, dahanîn.

INNOVATION, *n.* : dahênan, nûjenî, nûkirîn.

INNOVATIVE, *adj.* : dehênerî, nûjen.

INNOVATOR, *n.* : dahêner.

INNOVATORY, *adj.* : dahênerî.

INNOXIOUS, *adj.* : bêziyan.

INNUENDO, *n.* : paşgotin, pilar, paşbêjî.

INNUENDO, *vi.t.* : paşgotin kirin, paşbêjî kirin.

INNUMERABLE, *adj.* : nehejmarbar, bêhejmar, naêt hejmartin, bêqam, gelek.

INNUMERABLENESS, *n.* : bêhejmarbarîtî.

INNUMERABLY, *adv.* : bi bêhejmarbarî, bêhejmarbarîkî.

INNUMERATE, *adj.* : nezanê bîrkariyê.

INNUMEROUS, *adj.* : gelek, naêt hejmartin, nehejmardar.

INNUTRITION, *n.* : nexwarandin.

INNUTRITOUS, *adj.* : nexwarandinî.

INOBSERVANCE, *n.* : guhnedan, rêznegirtin (peyman, pêkhatin).

INOCCUPATION, *n.* : bêkarî.

INOCULANT, *n.* = **INOCULUM.**

INOCULATE, *vt.* : qutan, kutan.

INOCULATED, *adj.* : qutayî, kutayî.

INOCULATING, *n.* : qutan, kutan.

INOCULATION, *n.* : qutan, deqdan, kutan.

INOCULUM, *n.* : qutan (derman), kutan.

INODOROUS, *adj.* : bêbêhn.

INOFFENSIVE, *adj.* : bê ziyan, bê hêriş, aştîxwaz, ne ziyandar.

INOFFENSIVELY, *adv.* : bi nehêrişî, bi neziyandarî, nehêrişîkî.

INOFFENSIVENESS, *n.* : bêziyanîtî, bêhêrişîtî, bêdijwarîtî.

INOFFICIOUS, *adj.* : bê erk û fermange, bê sincî.

INOPERABLE, *adj.* : nekirdarbar.

INOPERATIVE, *adj.* : nêçalak, bêkar.

INOPPORTUNE, *adj.* : bêdelîve.

INOPPORTUNELY, *adv.* : bi bêdelîveyî, ne di demî de, bêdelîveyîtî.

INOPPORTUNENESS, *n.* : bêdelîveyîtî.

INORDINATE, *adj.* : pergir.

INORGANIC, *adj.* : ne endamî.

INORGANICALLY, *adv.* : bi ne endamî, ne endamîkî.

INORGANIZATION, *n.* : bêrêkxistin.

INOSCULATE, *vi.t.* : pêkve man, têkil bûn.

INOSCULATED, *adj.* : pêkvemayî.

INOSCULATING, *n.* : pêkveman.

INOSCULATION, *n.* : pêkvebûn.

INOSITOL, *n.* : **INOSCULATION** : pêkveman, têkilbûn, madeyek belûrî şirîn e.

INPATIENT, *n.* : nesaxê nişte (li nexoşxaneyê).

IN PERSONAM : dijî kesekê.

IN PETTO, *adj., adv.* : bi dizîkî ve, bi nihênî, biçûk, nepenîkî.

IN PROPRIO PERSONA, *adv.* : bi kesî (bê parêzer), kesîkî.

INPUT, *n.* : hat, deramet, derav.

INQUEST, *n.* : vepirsîn.

INQUIETUDE, *n.* : şilezan.

INQUILINE, *n., adj.* : giyanewerê mişexwer (di nav leşê giyanewerek dî de).

INQUIRE, *vt.i.* : pirsyar kirin.

INQUIRED, *adj.* : pirsyarkirî.

INQUIRER, *n.* : pirsyarker.

INQUIRING, *n.* : pirsyarkirin.

INQUIRINGLY, *adv.* : bi pirsyarkirinî, pirsyarkirinkî.

INQUIRY, *n.* : pirsyarî, vepirsîn.

INQUISITION, *n.* : lêkolîna mîrî û dadwerî, dîwan yan dadgeha lêkolînê, pirsyarkirina req.

INQUISITIVE, *adj.* : devdirî, demdirî.

INQUISITIVELY, *adv.* : bi devdirî, bi demdirî, devdirîkî.

INQUISITIVENESS, *n.* : devdirîtî.

INQUISITOR, *n.* : lêkolînkar.

INQUISITORIAL, *adj.* : lêkolînkarî.

INQUISITORIALLY, *adv.* : bi lêkolînkarî, lêkolînkarîkî.

INRADIUS, *n.* : nîvtîra navdayî.

IN ROAD, *n.* : êrîş.

IN RUSH, *n.* : êrîş, vizik.

INSALIVATE, *vt.* : gilîz kirin.

INSALUBRIOUS, *adj.* : kuşinde.

INSALUBRITY, *n.* : kuşindeyîtî.

INSANE, *adj.* : dîn, dînok, şêt, har.

- **ASYLUM** : dînxane, şêtxane.

INSANELY, *adv.* : bi dînokî, bi şêtî, bi harî, dînokîkî, harîkî.

INSANENESS, *n.* : dînokîtî, harîtî, şêtîtî.

INSANITARY, *adj.* : pîs, ne tendirust.

INSANITY, *n.* : dînokîtî, şêtîtî, harîtî.

INSATIABILITY, *n.* : zik kûrîtî, têrnebûnîtî, têrnebûnbarîtî, xwarokîtî, xwareyîtî.

INSATIABLE, *adj.* : xwarok, zikkûr, xware, çilek, kolb, têrnebûnbar, zikmezin.

INSATIABLENESS, *n.* : zikkûrîtî, xwarokîtî, têrnebûnbarîtî.

INSATIABLY, *adv.* : bi zikkûrî, bi têrnebûnbarî, zikmezinkî.

INSATIATE, *adj.* : xwarok, xware, xwara.

INSATIATELY, *adv.* : bi xwareyî, bi xwarayî, xwarekî.

INSATIATENESS, *n.* : xwareyîtî, xwarayîtî.

INSCAPE, *n.* : derbirrina huneriya heyberên zêrevankirî.

INSCRIBE, *vt.* : nivîsîn, neqş kirin.

INSCRIBED, *adj.* : nivîsî, neqşkirî.

- **CIRCLE** : çemereya dorgirtî.

INSCRIBER, *n.* : nivîser, nivîsevan, nivîskar.

INSCRIPTION, *n.* : nivîsîn, neqş.

INSCRIPTIONAL, *adj.* : nivîsînî, neqşî.

INSCRIPTIVE, *adj.* : nivîsînî, neqşî, neqşdar.

INSCRIPTIVELY, *adv.* : bi nivîsînî, bi neqşî, nivîsînkî.

INSCROLL, *vt.* : nivîsîn (li ser kaxezê), tomar kirin.

INSCRUTABILITY, *n.* : şêlîbarîtî, alozbarîtî, şêlîbûn, alozbûn.

INSCRUTABLE, *adj.* : şelîbar, alozbar, aloz, şêlî, neravebar.

INSCRUTABLENESS, *n.* : neravebarîtî.

INSCRUTABLY, *adv.* : bi neravebarî, neravebarîkî.

INSEAMS, *n.* : dirîna hindurî (pêlav yan kiras).

INSECT, *n.* : zêndî, kirmik, kormil, pêt, pêtik, gezinde.

- **COMBATTING** : gezindeqiran.

INSECTERIA, *n.* : pêtgeh, zêndîgeh.

INSECTARIUM, *n.* : pêtgeh, zêndîgeh.

INSECTARY, *n.* : pêtgeh : ezmongeha xwendina pêtikan.

INSECTICIDAL, *adj.* : pêtkuj.

INSECTICIDE, *n.* : pêtkujî.

INSECTIFUGE, *n.* : pêtşeqîn, pêtdorke.

INSECTILE, *adj.* : pêtikî, zêndiyî.

INSECTIVORE, *n.* : pêtxwer, pêtxwer, zêndîxwer.

INSECTIVOROUS, *adj.* : pêtxwerî, zêndîxwerî.

INSECTOLOGY, *n.* : pêtzanî, zêndîzanî.

INSECURE, *adj.* : nehêmin.

INSECURELY, *adv.* : bi nehêminî, nehêminkî.

INSECURENESS, *n.* : nehêminîtî.

INSECURITY, *n.* : nehêminîty.

INSEMINATE, *vt.* : tuxmav kirin, avis kirin.

INSEMINATED, *adj.* : tuxmavkirî.

INSEMINATING, *n.* : tuxmavkirin.

INSEMINATION, *n.* : tuxmavkirin, aviskirin.

INSEMINATOR, *n.* : aviskar.

INSENSATE, *adj.* : bêhiş, gewc.

INSENSATELY, *adj.* : bi gewcî, gewcîkî.

INSENSATENESS, *n.* : bêhişîtî, gewcîtî.

INSENSIBILITY, *n.* : bêhişbarîtî, reqîtî, bêhişîtî.

INSENSIBLE, *adj.* : bêhişbar, bêhişî.

INSENSIBLENESS, *n.* : bêhişîtî.

INSENSIBLY, *adv.* : bi reqî, reqîkî.

INSENSITIVE, *adj.* : nehestiyar, nehişdar.

INSENSITIVELY, *adv.* : bi nehestiyarî, bi nehişdarî, nehişdarîkî, nehestiyarîkî.

INSENSITIVENESS, *n.* : nehestiyarîtî, bêhişdarîtî.

INSENSIVITY, *n.* : nehestiyarîtî, bêhişdarîtî.

INSENTIENT, *adj.* : bêhiş.

INSEPARABILITY, *n.* : necudabarîtî.

INSEPARABLE, *adj.* : necudabar.

INSEPARABLENESS, *n.* : necudabarîtî.

INSEPARABLY, *adv.* : necudabarkî.

INSERT, *n.* : kaxezek çapkirî di nav rûpel yan laperên kitêbê de, axinîn.

INSERT, *vt.i.* : kirin nav de, çikandin.

INSERTION, *n.* : qîmkirin, têdexistin, têxistin, çikandin.

INSERTIONAL, *adj.* : têxistinî.

INSESSORIAL, *adj.* : vemiştî.

INSET, *n.* : vizkîn, nukend, wêneyê di nav perwazî de yan neqşê biçûk di nav neqşeyek dî de.

INSET, *vt.* : kirin nav de.

INSETTED, *adj.* : kirî nav de.

INSETTING, *n.* : kirin nav de.

INSHORE, *adj., adv.* : beravî.

INSIDE, *adj., adv., prep., n.* : hindur, têde, nav de.

- **TRACK** : nêşane, rexê hindurî yê rêya pêşbirkeyê yan pêşbezînê.

INSIDER, *n.* : zana : mirovê ko desthelatdarî yan ragehîna karî hebit.

INSIDES, *n.* : hinav.

INSIDIOUS, *adj.* : fêlbaz, xapînok, dizîkî, nihênî, fêt(kar), nepenî.

INSIDIOUSLY, *adv.* : bi fêlbazî, bi xapînî, bi dizîkî ve, nepenîkî.

INSIDIOUSNESS, *n.* : fêlbazîtî, xapînîtî, dizîkîtî, nihênîtî, nepenîtî.

INSIGHT, *n.* : jîrî, dûrbînî.

INSIGHTFUL, *adj.* : jîr, dûrbîn.

INSIGHTFULLY, *adv.* : bi jîrî, jîrîkî.

INSIGNE, *n.* (*pl.* **INSIGNIA**) : nîşan.

INSIGNIA, *n.* : nîşan, hêm, dirûşm.

INSIGNIFICANCE, *n.* : bêşopewerî.

INSIGNIFICANCY, *n.* : kêmî, kemî, negiringî, bêşopewerî.

INSIGNIFICANT, *adj.* : netişt, hîçok, neşopewer, potal, negiring.

INSIGNIFICANTLLY, *adv.* : bi potalî, bi neşopewerî, bêşopewerekî.

INSINCERE, *adj.* : durû, rûbaz, ne dilsoz, ne emekdar.

INSINUATE, *vt.* : nîşan kirin.

INSINUATED, *adj.* : nîşankirî.

INSINUATING, *n.* : nîşankirin.

INSINUATION, *n.* : nîşankirin, serinc, pilar.

INSINUATIVE, *adj.* : serincî, nîşandar.

INSINUATOR, *n.* : nîşanker.

INSIPID, *adj.* : sist, bêtam, netişt.

INSIPIDLY, *adv.* : bi sistî, sistîkî.

INSIPIDNESS, *n.* : bêtamîtî.

INSIPIENCE, *n.* : netiştî, pûçîtî.

INSIST, *vi.t.* : pelp kirin.

INSISTENCE, *n.* : pelpkirin, daman.

INSISTENCY, *n.* : pelp kirin, daman.

INSISTENT, *adj.* : xwazok, heter, pelpkar.

INSISTENTLY, *adv.* : bi xwazokî, bi pelpkarî, pelpkarîkî.

INSOBRIETY, *n.* : mestî, serxoşî.

INSOCIABILITY, *n.* : necivakîtî.

INSOCIABLE, *adj.* : necivakî.

INSOCIABLY, *adv.* : bi necivakî, necivakîkî.

INSOLATE, *vt.* : dan ber tavê.

INSOLATED, *adj.* : dayî ber tavê.

INSOLATING, *n.* : dan ber tavê.

INSOLATION, *n.* : danber tavê.

INSOLE, *n.* : sol yan hindurî.

INSOLENCE, *n.* : sîtarî, gewcî, fêz, bêarî.

INSOLENT, *n., adj.* : gewc, lewçe, rûreş, zimandirêj, zimantal.

INSOLENTLY, *adv.* : bi lewçeyî, bi zimandirêjî, lewçeyekî.

INSOLUBLE, *adj.* : nebuhujînbar, neçarebar (pirs).

INSOLVABLE, *adj.* : nêçarebar.

INSOLVENCY, *n.* : rûtbûn, daşûştin.

INSOLVENT, *adj.* : rût (bê pare).

INSOMNIA, *n.* : bêxewî, xewverevîn, xewzirran.

INSOMNIAC, *n., adj.* : bêxew.

INSOMUCH, *adv.* : ta ko.

insomuch as : ta ko.

INSOUCIANCE, *n.* : tembelî, zexelî.

INSOUCIANT, *adj.* : tembel.

INSPECT, *vt.* : seh kirin, pişkinandin.

INSPECTION, *n.* : sehkirin, pişkinîn, sorax, çavdêrî, nêrîn, velokirin, velokarî, gerîn.

INSPECTOR, *n.* : pişkiner, çavdêr, soraxvan.

INSPECTORATE, *n.* : pişkinerî, fermangeha pişkinerî.

INSPIRATION, *n.* : sirûş.

INSPIRATIONAL, *adj.* : sirûşî.

INSPIRATIONALLY, *adv.* : bi sirûşî, sirûşîkî.

INSPIRATOR, *n.* : sirûşkar.

INSPIRE, *vt.i.* : sirûş kirin.

INSPIRED, *adj.* : sirûşkirî.

INSPIRER, *n.* : sirûşkar.

INSPIRING, *n.* : siirûşkirin.

INSPIRIT, *vt.* : xurt kirin.

INSPISSATE, *vt.i.* : meyandin.

INSPISSATED, *adj.* : meyandî.

INSPISSATING, *n.* : meyandin.

INSPISSATION, *n.* : meyîn.

INSTABILITY, *n.* : şilejawî, nehîminîtî, bêtenayîtî.

INSTABLE, *adj.* = **UNSTABLE.**

INSTALL OR INSTAL, *vt.* : damezrandin.

INSTALLATION, *n.* : damezrîn, serbazgeh, damezrandin.

INSTALLED, *adj.* : damezrandî.

INSTALLING, *n.* : damezrandin.

INSTALLMENT, *n.* **OR INSTALEMENT** : bêş, elqe, paj, damezrandin.

INSTANCE, *n.* : nimûne, gewah, dadgeh, pêşniyaz, daxwaz, koçe (qonax).

INSTANCE, *vt.* : nîşan kirin, nimûne kirin, rave kirin.

INSTANCED, *adj.* : nimûnekirî.

INSTANCING, *n.* : nimûnekirin.

INSTANCY, *n.* : zûyî, pelp, pelp kirin.

INSTANT, *n., adj.* : gav, gavek, çendek, tiroke, pêlek, hingav, dem û dest, taw.

INSTANT OF DEATH : akamî merg.

INSTANTANEOUS, *adj.* : di cih de, dem û dest.

INSTANTER, *adv.* : dem û dest, di cih de.

INSTANTIATE, *vt.* : nimînende kirin (bi nimûneyekê).

INSTANTLY, *adv.* : di cih de, dem û dest.

INSTANTNESS, *n.* : dicihdeyîtî.

INSTATE, *n., vt.* : kuçe yan qonax di jiyana pêtikî de neqş kirin (bi stêran).

INSTATE, *vt.* : damezrandin.

IN STATU QUO : li barê niho.

INSTAURATION, *n.* : nûkirin, çakkirin.

INSTEAD, *adv., prep.* : ciyatî, le batî, şûn, le berî, ji pêş.

INSTEAD OF : şûna, (ji) dêl.

INSTEP, *n.* : piştpê.

INSTIGATE, *vt.* : hajotin, arandin, hawût kirin, dest pê kirin.

INSTIGATED, *adj.* : hawûtkirî, destpêkirî.

INSTIGATING, *n.* : hawûtkirin, destpêkirin.

INSTIGATION, *n.* : hawût, arandin, hajotin, fêt, destpêkirin.

INSTIGATOR, *n.* : hajo, destpêker, hawûtkar.

INSTIL, *vt.* : çandin, dilop kirin.

INSTILLATION, *n.* : çandin (wateyî).

INSTILLED, *adj.* : çandî (wateyî).

INSTILLING, *n.* : çandin (wateyî).

INSTINCT, *n., adj.* : sirûş, sirûşt.

INSTINCTIVE, *adj.* : zikmakî, sirûştî.

INSTINCTIVELY, *adv.* : bi sirûştî.

INSTINCTUAL, *adj.* : sirûştî.

INSTITUTE, *n.* : zanîngeh, amojgeh.

INSTITUTE, *vt.* : damezrandin, dest pê kirin.

INSTITUTED, *adj.* : damezrandî.

INSTITUTING, *n.* : damezrandin.

INSTITUTION, *n.* : damezrandin, nerît, qanûn, damezrîna civakî.

INSTITUTIONAL, *adj.* : damezrînî.

INSTITUTIONALISATION, *n.* : damezrandin.

INSTITUTIONALISATED, *adj.* : damezrandî.

INSTITUTIONALISING, *n.* : damezrandin.

INSTITUTIONISM, *n.* : damezrînîtî.

INSTITUTOR, *n.* : damezrîner, destpêker.

INSTRUCT, *vt.* : hîn kirin, ferman kirin, rêberî kirin.

INSTRUCTION, *n.* : hînkirin, hînkarî, fêrkarî.

INSTRUCTIONS, *n.* : hînek, amojgarî.

INSTRUCTIVE, *adj.* : fêrdar, hîndar.

INSTRUCTIVELY, *adv.* : bi hîndarî, hîndarîkî, fêrdarîkî.

INSTRUCTIVENESS, *n.* : hîndarîtî, fêrdarîtî.

INSTRUCTOR, *n.* : hînker, fêrker, seyda, mamosta, rêber, şiretkar.

INSTRUCTORESS, *n.* : rêber (mê).

INSTRUMENT, *n.* : alav, amêret.

INSTRUMENT PANEL : depikê alavan.

INSTRUMENTAL, *adj.* : behaneyî.

INSTRUMENTALISM, *n.* : behaneyîtî.

INSTRUMENTALIST, *n.* : behaneyîkar, alavkar.

INSTRUMENTALITY, *n.* : havil, awayîtî.

INSTRUMENTATION, *n.* : alavkirin, amêrkirdin.

INSUBORDINATE, *adj.* : serkêş, serbizaftî.

INSUBORDINATELY, *adv.* : bi serbizaftî, bi serkêşî, serbizaftîkî.

INSUBORDINATENESS, *n.* : serbizafitî, serkêşîtî, yaxîbûnîtî.

INSUBORDINATION, *n.* : yaxîbûn, serkêşî, serbizaftin.

INSUBSTANTIAL, *adj.* : lawaz, aşopî.

INSUFFERABLE, *adj.* : fêz, hestîgiran, nehemwarbar.

INSUFFERABLENESS, *n.* : nehemwarbarîtî, hestîgiranîtî.

INSUFFERABLY, *adv.* : bi hestîgiranî, hestîgiranîkî.

INSUFFICIENCE, *n.* : kêmî, kemî, têranekirin.

INSUFFICIENCY, *n.* : kêmî, kemî, têranekirin.

INSUFFICIENT, *adj.* : kêm, kem, têranekirî.

INSUFFLATE, *vt.* : werandin, puf kirin.

INSUFFLATION, *n.* : pufkirin.

INSUFFLATOR, *n.* : pufkar.

INSULANT, *n.* : cudakar.

INSULAR, *adj.* : negehîn, cudaker, ciyaker.

INSULATE, *vt.* : cuda kirin.

INSULATION, *n.* : cudakirin.

INSULATOR, *n.* : cudaker, ciyaker, negehîn.

INSULIN, *n.* : ensulîn : dermanê dij şekirê di nav xwînê de.

INSULT, *n.* : kirêtî, riswa, dijûn.

INSULT, *vt.* : kirêt kirin, riswa kirin.

INSULTED, *adj.* : kirêtkirî, riswakirî.

INSULTING, *n.* : kirêtkirin, riswakirin, çêrr.

INSUPERABLE, *adj.* : neşikênbar, nederbazbar, neçêtirbar (kêm).

INSUPERABLY, *adv.* : bi derbazbarî, nexêtirbarkî.

INSUPPORTABLE, *adj.* : nehemwarbar, hestîgiran.

INSUPPORTABLENESS, *n.* : nehemwarbarîtî, hestîgiranîtî.

INSUPPORTABLY, *adj.* : bi hestîgiranî.

INSUPPRESSIBLE, *adj.* : netepeserbar.

INSURABLE, *adj.* : dabînbar.

INSURANCE, *n.* : dabînkir(d)in.

INSURANT, *n.* : dabînvan.

INSURE, *vt.i.* : dabîn kirin.

INSURED, *adj.* : dabînkirî.

INSURER, *n.* : dabînkar.

INSURGENCE, *n.* : serkêşî, serhildan.

INSURGENCY, *n.* : serkêşî, serhildan.

INSURGENT, *adj.* : serkêş, serhildayî.

INSURGENTLY, *adv.* : bi serhildanî, serhildanîkî.

INSURING, *n.* : dabînkirin.

INSURMONTABLE, *adj.* = **INSUPERABLE** : serketinbar.

INSURMOUNTABLY, *adv.* : bi nederbazbarî, bineserketinbarî, neserketinbarîkî.

INSURRECTION, *n.* : serhildan, raperîn.

INSURRECTIONAL, *n.* : serhildan, raperîn.

INSUSCEPTIBLE, *adj.* : parêzbar, kartêneki-rinbar.

INTACT, *adj.* : sax.

INTAGLIATED, *adj.* : (bi rû neqşî) xemilandî.

INTAGLIO, *n.* : dahênana neqşkirî.

INTAKE, *n.* : wergir, helmijîn, wergirtin, kon.

INTANGIBLE, *n., adj.* : nedestdanbar.

INTARSIA, *n.* : neqşekaşî.

INTEGER, *n.* : jîmarxişt, jîmarrast.

INTEGRAL, *n., adj.* : tekûz, temam, tewaw.

- **CALCULUS** : jîmarekariya kalkulesî.
- **STRESS** : ergê hemûkî.

INTEGRAND, *n.* : tekûzîtî, tibaba pêviyayî bo temamkirinê yan tekûzkirinê.

INTEGRANT, *n., adj.* : parçeyên pêkhên ko hemû dibin yek.

INTEGRATE, *vt.i.* : tekûz kirin, temam kirin, tewaw kirin.

INTEGRATED, *adj.* : tekûzkirî, temamkirî, tewawkirî, yekkirî.

INTEGRATING, *n.* : tekûzkirin, temamkirin, tewaw kirin, yekkirin.

INTEGRATION, *n.* : tekûzkarî, temamkarî, tewawkarî, yekxistin, lîkdan, yekkirin, yekbûn, yekîtî.

INTEGRATIONISM, *n.* : tekûzkarîtî.

INTEGRATIONIST, *n.* : rexisîn, yekbûnîkar.

INTEGRATIVE, *adj.* : tekûzdar.

INTEGRATOR, *n.* : tekûzkar, tekûzk, yekbûnîkar.

INTEGRITY, *n.* : temerî, xwegirî, pakîtî, rastîtî, hemûkîtî, tekûzîtî.

INTEGUMENT, *n.* : perde.

INTEGUMENTORY, *adj.* : perdeyî.

INTELLECT, *n.* : bîr, hiş.

INTELLECTION, *n.* : ramankirin, hizirkirin.

INTELLECTIVE, *adj.* : hişekî, hişdar.

INTELLECTUAL, *n., adj.* : ronakbîr, hozan, hişekî, rewşenbîr.

INTELLECTUALISM, *n.* : baweriya ko zanîn (hemûkî yan parçekî) jî semedê derdikevit (anko jî hişê).

INTELLECTUALIZATION, *n.* : hişkarîbûn.

INTELLECTUALIZE, *vt.* : hişkarî kirin.

INTELLECTUALIZED, *adj.* : hişkarîkirî.

INTELLECTUALIZING, *n.* : hişkarîkirin.

INTELLIGENCE, *n.* : jîrî, zîrekî, aqilî, jîrvanî, agehî, hewaldarî, hînayî.

- **AGENCY** : saloxgerî.
- **DIRECTOR** : saloxger.
- **QUOTIENT** : sercemêjîriyê.

INTELLIGENCER, *n.* : sîxor.

INTELLIGENT, *adj.* : jîr, zîrek, hîna, şehreza, aqil.

INTELLIGENZIA OR INTELLIGENTIA, *n.* : ramankar (bijareya hunermend, nivîser û hozanan).

INTELLIGIBILITY, *n.* : têgehiştinbarîtî.

INTELLIGIBLE, *adj.* : têgehiştinbar, hişbar, diyar.

INTELLIGIBLENESS, *n.* : têgehiştinbarîtî.

INTEMPERANCE, *n.* : mestkarî, serçilî.

INTEMPERATE, *adj.* : mestkar, serçil.

INTEMPERATELY, *adv.* : bi dijwarî, dijwarîkî.

INTEND (TO), *vt.* : dan xwe, arezû kirin, niyaz kirin.

INTENDANCY, *n.* : damezrîna kargerî, serkarî, kargerî.

INTENDANT, *n.* : karger, parêzkar.

INTENDED, *adj.* : niyazkirî, arezûkirî.

INTENDEDLY, *adv.* : bi niyazî, bi arezûyî, arezûyîkî, viyanîkî.

INTENDING, *n.* : niyazkirin, viyan.

INTENDMENT, *n.* : wate, kam, armanc, niyaz, niyazîtî.

ITINERATE, *vt.* : nerm kirin, nazik kirin.

INTENERATED, *adj.* : nermkirî, nazikkirî.

INTENERATING, *n.* : nermkirin, nazikkirin.

INTENERATION, *n.* : nermbûn, nazikbûn.

INTENSE, *adj.* : tûj, qayim, tund, xest, dijwar, xurt.

- **HEAT** : kelegerm.

- **INTEREST** : hêrisdan.

INTENSIFICATION, *n.* : dijwarkirin.

INTENSION, *n.* : tîn, zebir.

INTENSIFY, *n.* : tundî, zebir, tîn, xurtî.

INTENSIVE, *adj.* : tîndar.

- **CARE** : sexbîriya tîndar.

INTENSIVELY, *adv.* : bi tîndarî, tîndarîkî.

INTENT, *n., adj.* : mebest, niyaz, armanc, wate.

INTENTION, *n.* : niyaz, mebest, daxwaz, merem, armanc.

INTENTIONAL, *adj.* : viyanî, qestî, xwazekî.

INTENTIONALITY, *n.* : xwazekîtî.

INTENTIONALLY, *adv.* : bi qestî, bi enqestî, bi xwazekî, xwazekîkî.

INTENTLY, *adv.* : bi mebestî, bi meremî, meremîkî.

INTENTNESS, *n.* : mebestîtî.

INTER, *vt.* : veşartin, gorkirin.

INTER-, *pref.* : pêşgir e ko navber e.

INTERACT, *vi.* : kar lê kirin.

INTERACTION, *n.* : karlêkirin.

INTERACTIVE, *adj.* : karlêkirindar.

INTERBLEND, *vt.* : têkil kirin.

INTERBRAIN, *n.* : mejiyê navî (parçeya paş ji pêşiya mejî).

INTERBRED, *adj.* : durihkirî (hêstir).

INTERBREED, *vt.* : du rih kirin (ker + mehîn = hêstir), du rih bûn.

INTERBREEDING, *n.* : durihkirin.

INTERCALARY, *adj.* : sala pirî, rojek pitir.

INTERCALATE, *vt.* : sal pir kirin, rojek berdan ser.

INTERCEDE, *vi.* : navbêjî kirin.

INTERCEDED, *adj.* : navbêjîkirî.

INTERCEDING, *n.* : navbêjîkirin.

INTERCELLULAR, *adj.* : ketî navbera xameyan de.

INTERCEP, *n.* : birgeh.

INTERCEPT, *n.* : rêgirtin, birrîn (rê).

INTERCEPTER OR INTERCEPTOR, *n.* : birrkar.

INTERCEPTION, *n.* : rêbirrîn.

INTERCEPTOR, *n.* : rêbirr.

INTERCESSION, *n.* : navbêjî, navçîtî, berhengarî.

INTERCESSOR, *n.* : navbêj.

INTERCESSIONAL, *adj.* : navbêjî.

INTERCHANGE, *n.* : pêk guhartin, alûgor, berdêlî.

INTERCHANGE, *vt.i.* : pêk guhartin.

INTERCHANGEABILITY, *n.* : pêkguhêrîtî, pêk guhêrbarîtî.

INTERCHANGEABLE, *adj.* : pêkguhêr (bar).

INTERCHANGEABLENESS, *n.* : pêkguhêrbarîtî.

INTERCHANGEABLY, *adj.* : bi pêkguhêrbarî, berkêlekî.

INTERCOLLEGIATE, *adj.* : nav zanistegehî.

INTERCOLUMNIATION, *n.* : stûnkirin, valatiya li navbera du stûnan de.

INTERCOM, *n.* = **INTERCOMMUNICATION SYSTEM.**

INTERCOMMUNICATION, *vt.* : rawêj kirin, *gehandin navbera du joran de.*

INTERCOMMUNICATION, *n.* : rawêjî.

- **SYSTEM** : rêzika gehîna hindurî (navbera joran de).

INTERCOMMUNION, *n.* : gehîna hindurî (navberî).

INTERCOMMUNITY, *n.* : nav civakî.

INTERCONNECT, *vt.* : pêkve gehandin yan girê dan.

INTERCONTINENTAL, *adj.* : nav kîşwerî, navqareyî, navkerteyî.

INTERCOOLER, *n.* : navsarkerî.

INTERCOSTAL, *n., adj.* : navperasî.

INTERCOURSE, *n.* : daketin, nihandin, gan.

INTERCROP, *vt.i.* : deramet kirin (derametekê navbera derametek dî çandin).

INTERCROSS, *n.* : durihî.

INTERCROSS, *vt.* : du rih kirin.

INTERCULTURAL, *adj.* : navçandeyî.

INTERCURRENT, *adj.* : birr, berhelist : navkirdarekî.

INTERCUT, *vt.* : (nebûyî) wêne girtin.

INTERDENOMINATIONAL, *adj.* : navtîreyî (ayînî yan olî).

INTERDENTAL, *n.* : navdidanî.

INTERDEPARTMENTAL, *adj.* : navfermangehî.

INTERDEPENDENCE, *n.* : hevhemetî, navhemetî.

INTERDEPENDENT, *adj.* : hevhemet, navhemet.

INTERDICT, *n.* : qedexekirin, heramkirin, tembîkirin.

INTERDICT, *vt.* : qedexe kirin, heram kirin, tembî kirin.

INTERDICTION, *n.* : tembî, qedexe, nehiştin, ewşandin.

INTEREST, *n.* : hewes, wic, wirc, berjewendî, lişt, bayexdan, sû, sûd, havil, pûte, pîte, mereq, heweskarî, hewesdarî.

- **RATE** : nirx yan bihayê sûdî yan havilî.

INTERESTED, *adj.* : heweskar.

INTERESTEDLY, *adv.* : bi heweskarî, heweskarekî.

INTERESTING, *adj.* : seyr, hewesbar.

INTERESTINGLY, *adj.* : bi hewesbarî, hewesbarîkî.

INTERFACE, *n.* : navrû, nêwanrû.

INTERFACING, *n.* : madeyê reqê navbera perûkê cilan de.

INTERFACIAL, *adj.* : navber rûyî.

INTERFERE, *vt.* : têkilî kirin, têkil bûn, vêkketin, lêk dan.

INTERFERED, *adj.* : têkilîkirî.

INTERFERENCE, *n.* : têkilîkirin, xwe navrekirin, têhelkêş, têkilî, desttêvedan, demdirîtî.

INTERFERING, *n.* : têhelkêş, têkilî, desttêvedan, têkilîkirin, demdirîtî.

INTERFEROMETER, *n.* : têkilbûnpîv (ronahî).

INTERFEROMETRY, *n.* : têkilbûnpîvî.

INTERFERON, *n.* : protîna ko nahêlit mîkrob werar bit nav xaneyê de.

INTERFLUENT, *adj.* : rewaniya di nav hev de.

INTERFERTILE, *adj.* : durihdar.

INTERFRUITFUL, *adj.* : durihpeyîndar.

INTERFUSE, *vt.* : lehîm kirin, navber kirin.

INTERFUSION, *n.* : navber kirin, lehîm kirin.

INTERGALACTIC, *adj.* : navstêrî.

INTERGENERIC, *adj.* : nêvregezî.

INTERGLACIAL, *adj.* : nav dugerên seholî.

INTERGRADATION, *n.* : navber pile kirin, navbera peyhatî, navberpilebûn.

INTERGRADE, *n.* : bereberebûn.

INTERGRADE, *vi.* : bereber kirin.

INTERGRAFT, *vi.* : pêk petrume kirin.

INTERIM, *n., adj.* : demdar, demî, navxwe, nav(ber).

INTERIOR, *adj.* : navxwe, hindur, nav.

- **ANGLES** : goşenavxweyî, goşenavikî, goşehindurî.

INTERJACENT, *adj.* : navber.

INTERJECT, *vt.* : havêtin nav de, birrîn (axiftin) ji nişkekê ve.

INTERJECTION, *n.* : axiftinbirrîn, havêtin nav de.

INTERJECTIONAL, *adj.* : axiftin birrînî.

INTERJECTION, *n.* : axiftinbirr.

INTERJECTORY, *adj.* : axiftinbirrî.

INTERLACE, *vt.i.* : tor kirin, kezî kirin, têkil kirin, herbilîn.

INTERLACED, *adj.* : tor asa, herbilî.

INTERLACEMENT, *n.* : herbilîn.

INTERLACING ARCHES, *n.* : taqên qurkirî.

INTERLAND, *vt.* : neqş kirin, têkil kirin.

INTERLAYER, *n.* : qatê navber.

INTERLEAF, *n.* : belgê navber, kaxeza spî (li navbera du laperan de).

INTERLEAVE, *vt.* : kaxez dakirin (li nav bera du laperan de).

INTERLINE, *vt.* : kiras ber kirin.

INTERLINEAR, *adj.* : navbera rêzan de.

INTERLINING, *n.* : berê navber.

INTERLINK, *vi., t.* : pêgirek kirin.

INTELOCK, *n.* : kodnavber.

INTERLOCK, *vi.t.* : kod navber kirin.

INTERLOCKING, *n.* : kodnavberkirin, herbilîn.

INTERLOCUTION, *n.* : berhevdan, axiftin, suhbet.

INTERLOCUTORY, *adj.* : berhevdanî, bêdûmahî.

INTERLOPE, *vi.* : mişexwerî kirin.

INTERLOPER, *n.* = **INTRUDER.**

INTERLUDE, *n.* : awaza serbar.

INTERLUNAR, *adj.* : heyvnavber (demê xewarebûna heyvê).

INTERMARRIAGE, *n.* : şûkirin (yan jin înan) navbera du malbatan yan du hozan de.

INTERMARRY, *vt.* : navber şûkirin yan jin hînan (du malbat yan hoz).

INTERMEDDLE, *vt.* : têkilî kirin.

INTERMEDDLER, *n.* : têkilîkar.

INTERMEDIACY, *n.* = **INTERMEDIATENESS.**

INTERMEDIARY, *n.* : navincî.

INTERMEDIATE, *adj., n.* : navîn, navî, navincî, nawendî.

INTERMEDIATELY, *adv.* : bi navînî, navînekî, navînîkî.

INTERMEDIATENESS, *n.* : navînîtî.

INTERMEDIATION, *n.* : navbêjî.

INTERMEDIUM, *n.* : navî.

INTERMENT, *n.* : veşartin.

INTERMIGRATION, *n.* : navberkoçerî.

INTERMINABLE, *adj.* : bê dûmahî, bê dawî, bê kutayî.

INTERMINABLENESS, *n.* : bêdûmahîtî.

INTERMINABLY, *adv.* : bi bêdawî, bêdawîkî.

INTERMINGLE, *vt., i.* = **INTERMIX.**

INTERMISSION, *n.* : wiçan, vesîn, paydos.

INTERMISSIONLESS, *adj.* : bêwiçan.

INTERMIT, *vt., i.* : birrîn (demdarî).

INTERMITTENCE, *n.* : birrîn (demdarî).

INTERMITTENCY, *n.* : birrîn (demdarî).

INTERMITTENT, *adj.* : birrî.

- **CURRENT** : lozew yan rewtekê demdarî birrî.

INTERMIX, *vt.i.* : têkil bûn, têkil kirin.

INTERMIXTURE, *n.* : têkilbûn.

INTERMOLECULAR, *adj.* : navber gerdî, navgerdî.

INTERN, *vt.* : desteser kirin.

INTERNAL, *adj.* : navxweyî, nawekî, navxwe, hinavî, derûnî, hindurî, hindurîn.

- **BISECTOR** : nîvbirrî navxweyî.
- **MEDICINE** : pijîşkiya hindurî.
- **ORGAN** : hinav.
- **RESPIRATION** : bêhnkêşana hindurî.
- **RHYME** : awaza hindurî.
- **SECRETION** = **HORMON.**

INTERNALIZATION, *n.* : xuyîbûn.

INTERNALIZE, *vt.* : xuyî kirin.

INTERNALIZED, *adj.* : xuyîkirî.

INTERNALIZING, *n.* : xuyîkirin.

INTERNATIONAL, *adj.* : navneteweyî.

- **UNIT** : yekeya navneteweyî.

INTERNATIONALE, *n.* : sirûda navneteweyî.

INTERNATIONALISM, *n.* : navneteweyîtî.

INTERNATIONALIST, *n.* : navneteweyî (bawermendê navneteweyîtiyê).

INTERNATIONALIZATION, *n.* : navneteweyîbûn, navneteweyîkirin.

INTERNATIONALIZE, *vt.* : navneteweyî kirin.

INTERNATIONALIZED, *adj.* : navneteweyîkirî.

INTERNATIONALIZING, *n.* : navneteweyîkirin.

INTERNEE, *n.* : dîl.

INTERNIST, *n.* : pijîşkê hindurî.

INTERNMENT, *n.* : girtin nemaze demê şerî.

INTERNODE, *n.* : navgirêkên lingî.

INTERNUNCIAL, *adj.* : navbalyozpapayî.

INTEROCEPTIVE, *adj.* : navbera xaneyên demarên hişî û livkê hayî hindurî.

INTEROCEPTOR, *n.* : haykerê hindurî.

INTER OFFICE, *n.* : navber fermangehî.

INTERPAGE, *vt.* : li ser laperên navber çap kirin yan kirin navbera van laperan de.

INTERPELLATE, *vt.* : pirsyar kirin (ji wezîrî).

INTERPENETRATE, *vt.i.* : têre kirin, têre çûn, têk helkêşîn.

INTERPENETRATED, *adj.* : têk helkêş.

INTERPERSONAL, *adj.* : nav(ber)kesî.

INTERPHASE, *n.* : nav(ber)bar, navkuçe.

INTERPHONE, *n.* : nav(ber)bihîs.

INTERPLANETARY, *adj.* : navber stêrên gerok.

INTERPLANT, *vt.* : navber çandin.

INTERPLAY, *n., vi.* : karlêkirin, kar lê kirin.

INTERPLEAD, *vi.* : (pêkve) doz birin dadgehê.

INTERPLEADER, *n.* : navber dozvan.

INTERPOLATE, *vt., i.* : çandin (navbera daran).

INTERPOLATION, *n.* : hepişandin.

INTERPOSE, *vt.i.* : kirin nav de.

INTERPOSITION, *n.* : kirin nav de.

INTERPRET, *vt.i.* : rave kirin, şirove kirin.

INTERPRETABILITY, *n.* : ravebarîtî.

INTERPRETABLE, *adj.* : ravebar.

INTERPRETATION, *n.* : ravekirin.

INTERPRETATIONAL, *adj.* : ravekirinî, şirovekirinî.

INTERPRETED, *adj.* : ravekirî, şirovekirî.

INTERPRETER, *n.* : raveker, wergêr, şiroveker.

INTERPRETING, *n.* : ravekirin, şirovekirin.

INTERPRETIVE, *adj.* : raveyî, ravedar.

INTERPUPILLARY, *n.* : nav(ber) bîbiyên çavî.

INTERRACIAL, *adj.* : nav(ber) regezî.

INTERREGNUM, *n.* : demê valatiya textî.

INTERRELATE, *vt.i.* : nav(ber) pêwendî kirin.

INTERRELATION, *n.* : nav(ber)pêwendî.

INTERROGATE, *vt.* : pirsyar kirin.

INTERROGATED, *adj.* : vepirsî.

INTERROGATING, *n.* : vepirsîn.

INTERROGATION, *n.* : pirsyar, vepirsîn.

INTERROGATOR, *n.* : pirsyaryar, pirsyarkar.

INTERROGATORY, *adj.* : pirsyarkî.

INTERRUPT, *vt.i.* : birrîn (axiftin).

INTERRUPTER OR INTERROPTOR, *n.* : axiftinbirr.

INTERRUPTION, *n.* : navbirr, pêbirrîn.

INTERRUPTIVE, *adj.* : birrînî, birrîndar.

INTER SE : nav(bera) wan.

INTERSECT, *vt.i.* : kelişandin, yektir birrîn, hev birrin.

INTERSECTING, *n.* : yektirbirr, hevbirr.

INTERSECTION, *n.* : xalka hevbirrînê.

INTERSEX, *n.* : nav(ber)zayendî, navregezî, nêrmo.

INTERSEXUAL, *adj.* : nav(ber) zayendî yan regezî.

INTERSPACE, *adj., vt.* : navbervala, cuda kirin.

INTERSPECIFIC, *adj.* : nav(ber)cor.

INTERSPERSE, *vt.* : belav kirin.

INTERSPERSION, *n.* : belavkirin.

INTERSTATE, *adj.* : navber wîlayetan, nexasme wîlayetên Emerîka.

INTER STELLAR, *adj.* : navber stêran.

INTERSTICE, *n.* : valatî, kelş, demê navber.

INTERSTITIAL, *adj.* : navber vekirinan nexasme vekirinên tevnê zindî.

INTERTESTAMENTAL, *adj.* : navber du rojgerên kevn û nûyen filehî.

INTER TILL, *vt.* : navber kêlan.

INTERTRIBAL, *adj.* : navber hoz yan êl.

INTERTROPICAL, *adj.* : nîvqadbirrî.

INTERTWINE, *vt.i.* : kezî kirin, kezî bûn.

INTERTWIST, *n.* : herbilîn, kezîkirin.

INTERTWIST, *vt.i.* : herbilîn, alizîn, vehînan, kezî kirin.

MERGANSER, *n.* : qaza noqar.

MERGE, *vt.i.* : têkil bûn, têkil kirin (bûn yek).

MERGED, *adj.* : têkilkirî, yekbûyî.

MERGENCE, *n.* : têkilbûn, yekbûn.

MERGER, *n.* : yekbûn, têkilbûn, yekgirtin.

MERGING, *n.* : têkilkirin, yekkirin.

MERIDIAN, *n., adj.* : dirêjehêl.

MERIDIONAL, *n., adj.* : başûrî, nîştecêyê başûrî.

MERIDIONALLY, *adv.*: bi başûrî, başûrkî.

MERINGUE, *n.* : mering : şirînayiya şekir û spîlka hêkê, kiloca vê şirînayiyê.

MERINO (SHEEP), *n.* : pezê îspaniyê spî û hirîhêja.

MERISTEM, *n.* : tevnê piziyê " dabeşbar ".

MERISTIC, *adj.* : birgehî.

MERISTICALLY, *adv.*: bi birgehî, birgehkî.

MERIT, *n.* : jêhatin, lêhatin, beha.

- **SYSTEM** : rêzika jêhatinê.

MERITED, *adj.* : stêle, jêhatî.

MERITOCRACY, *n.* : hikumeta jêhatiyan.

MERITORIOUS, *adj.* : jêhatî, berketî bo rêz û rêzaneyê.

MERITORIOUSLY, *adv.*: bi stêleyî, bi jêhatî, stêlekî.

MERITORIOUSNESS, *n.* : stêleyîtî, jêhatîtî.

MERL(E), *n.* : şalûl.

MERLIN, *n.* : helûyek biçûk e.

MERLON, *n.* : dîwar (du kunên telarê kelheyê cuda kirin).

MERMAID, *n.* : periya deryayî.

MERMAN, *n.* : canewerê deryayiyê efsaneyî : gewde mêr û dûv masî ye.

MEROBLASTIC, *adj.* : parçekelşînî (wek hêkê).

MERRILY, *adv.*: bi şadî, şadkî.

MERRIMENT, *n.* : şênahî, şadî, keyfxoşî.

MERRY, *adj.* : tewzî, keyfxoş, şa.

- **ANDREW** : zirtek.
- **GO-ROUND** : gerînek.
- **MAKER** : zirtek.
- **MAKING** : zirtekî, şayî.
- **TO MAKE ~** : keyf kirin.
- **TO MAKE ~ OVER** : tirane pê kirin.

MERRY THOUGHT, *n.* : hestiyê qirka balindeyî.

MES-, *pref.* : pêşgir e ko navîn e.

MESA, *n.* : banikê rastê rex nişîvî.

MESALLIANCE, *n.* : şûkirin yan jinînana nehevta.

MESCAL, *n.* : darê kaktusiyê meksîkî, şeraba vî darî.

MESENCHYMAL, *adj.* : çîna navînî (pêwendîdarê çîna navîn).

MESENCHYME, *n.* : çîna navîn.

MESENTRIC, *adj.* : kinteyî.

- **ARTERY** : sordemarê kinteyî.

MESENTERON, *n.* : kunka torî, hinavpêç.

MESENTERY, *n.* : kinte.

MESH, *n.* : nêrûmê, tor, tele.

- **WORK** : tele.

MESH, *vt.i.* : nêr û mê bûn (yan kirin), keftin telhê, goncan bûn.

MESHED, *adj.* : torasa, nêrûmêkirî, nêrûmêbûyî.

MESHING, *n.* : nêrûmêkirin.

MESHY, *adj.* : torkirî.

MESIAL, *adj.* : navîn (ko canewerî dabeş dikit rast û çep).

MESIALLY, *adv.*: bi navînî, navînkî.

MESITYLENE, *n.* : mesîtlîn : hîdrokarbonek rûnî ye.

MESMERIC, *adj.* : nivandiniya magnetîzî.

MESMERIST, *adj.* : razankarê magnetîzî.

MESMERIZATION, *n.* : nivandina magnetîzî, dilgîrkirin.

MESMERIZE, *vt.* : magnetîz nivandin, dilgîr kirin.

MESMERIZED, *adj.* : şeyda, dêwane, dilgîkirî.

MESMERIZING, *n.* : nîvandin, şeydakirin.

MESNE, *adj.* : navîn.

MESNE LORD, *n.* : derebegê biçûk (zeviyê ji derebegek mezintir bi kirê digirit).

MESOBLAST, *n.* : çîna navîna pizî.

MESOCARP, *n.* : berîk, kakil.

MESOLITHIC, *adj.* : pêwendîdarê rojgarê beriyê navîn.

MESON, *n.* : mezon : hûreke (lok di navbera proton û elektronê de ye).

MESONEPHRIC, *adj.* : gulçîskiya navîn.

MESONEPHROS, *n.* : gulçîsk navîn.

MESONIC, *adj.* : mezonî.

MESOPHYLL, *n.* : tevnê navîn (yê belgê helezî).

MESOPHYTE, *n.* : heleza qenceaxê.

MESOPOTAMIA, *n.* : welatê nîhala du rûbar.

MESOSPHERE, *n.* : çînek ji bergê esmanî (bayî) ye 250 mîlan bilind e (li ser rûyê erdî).

MESOTHELIUM, *n.* : çîna hunînî (berê valatiyên pizî).

MESOTHORAX, *n.* : kîzîka navîna singê pêtikê.

MESOTHORIUM, *n.* : toryoma navîn.

MESOTRON, *n.* = **MESON**.

MESOZOIC, *adj.* : rojgarê navîn.

MESS, *n.* : bêserûber, şêlûbêl, tevlihev.

MESS, *vt.i.* : tevlihev kirin.

MESSAGE, *n.* : peyam, name.

- **OF CONDOLENCE** : şînname, behîname.

MESSALINE, *n.* : tevnek avirmîş tenik e.

MESSED UP, *adj.* : perîşan.

MESSENGER, *n.* : şandiyar, şandiyek, peyamber, şandox, namebir, peyik, pêşvenêr.

MESSIAH, *n.* : Îsa pêxember, Mesîh.

MESSIANIC, *adj.* : mesîhî.

MESSILY, *adv.*: bi tevlihevî yan bêserûberî, tevlihevîkî.

MESSINESS, *n.* : tevlihevîtî, bêserûberîtî.

MESS JACKET, *n.* : sindoqa serbaziya xwarinê.

MESSRS (*pl.* **OF MISTER**) : rêzdar(an).

MESSUAGE, *n.* : xanî (li gel erd û avahî).

MESSY, *adj.* : bê ser û ber, pîs, nerêk, marêk.

MESTIZO : durih (melez).

MET, *p.* **OF MEET** : kombo.

MET-, META-, *pref.* : pêşgir e ko piştê, paşê.

METABOLIC, *adj.* : jînkar.

METABOLISM, *n.* : metabolîzm : jînkarî(ti) : kirdara ko xurek ava dikit madeyek jînî û protoplazim diherifit bo afirandina wîzeyî.

METABOLITE, *n.* : madeyê jînkarî çêdikit.

METABOLIZATION, *n.* : jînkarîbûn.

METABOLIZE, *vt.* : jînkarî kirin.

METABOLIZED, *adj.* : jînkarîkirî.

METABOLIZING, *n.* : jînkarîkirin.

METACARPAL, *n., adj.* : şehî.

METACARPUS, *n.* : şehê zendî.

METACENTRE, *n.* : nîveka navber : nîveka rakêşana leşê serav.

METACHROMATISM, *n.* : rengguhorîn.

METAGALAXY, *n.* : hesareyên derekî, gerdûn.

METAGENESIS, *n.* : zayîna ladanî.

METAL, *n.* : kan, metal.

- **BAR** : şîş, bista metalî.
- **RECTIFIER** : rastkerê kanî yan metalî.
- **SEMI STABLE ~** : kanê nîvsirewto.
- **STATE** : barê kanî.

METAL, *vt.* : kan kirin, metal kirin.

METALANGUAGE, *n.* : zimanê berhevdanê.

METALLED, *adj.* : kankirî, metalkirî.

METALLIC, *adj.* : kanî, metalî.

METALLIFEROUS, *adj.* : kandar.

METALLING, *n.* : kankirin, metalkirin.

METALLIZE, *vt.* : kan kirin.

METALLOGRAPHER, *n.* : kanzan, metalzan.

METALLOGRAPHIC, *adj.* : pêwendîdarê kanzaniyê.

METALLOGRAPHY, *n.* : kanzanî.

METALLOID, *n., adj.* : nekan, nemetal, nîv yan nîmce kan, nekanî.

METALLOPHONE, *n.* : alava mûzîqeyî wek darînkî lê bi bistên asinî.

METALLURGIC(AL), *adj.* : kanî, metalî.

METALLURGIST, *n.* : kanzan, metalzan.

METALLURGY, *n.* : kanzanî, metalzanî.

METAL WORKING, *n.* : çêkirina alavên kanî yan metalî.

METAMERE, *n.* : parçeyek ji zincîreya leşê hevparçe.

METAMERIC, *adj.* : pêwendîdarê hevpêkhatin û kêşa gerdîlê (bi taybexuya têvel).

METAMERISM, *n.* : hevpêkhatin û kêşa gerdîlê taybexuya têvel.

METAMORPHIC, *adj.* : şikilguhorî, şêweguhorî.

METAMORPHISM, *n.* = **METAPHORSIS**.

METAMORPHOSE, *vt.i.* : şikil yan şêwe guhartin.

METAMORPHOSING, *n.* : şikil yan şewe guhartin.

METAPHOR, *n.* : xwaze, xwastinî.

METAPHORIC(AL), *adj.* : xwazeyî.

METAPHORICALLY, *adj.* : bi xwazeyî, xwazekî.

METAPHRASE, *n., adj.* : wergêran nemaze wergêrana tîpî (peyiv bi peyiv).

METAPHRASE, *vt.* : wergêran (tîp yan peyiv).

METAPHYSIC, *n., adj.* : paşsirûşt, sersirûşt, nepenî, paşxwerist.

METAPHYSICAL, *adj.* : paşsirûştî, sersirûştî.

METAPHYSICIAN, *n.* : paşsirûştzan.

METAPHYSICS, *n.* : paşsirûşt, piştsirûştî.

METAPLASIA, *n.* : tevinbûn : guhorin ji tevnekê ko dibit tevnek dî (kirkirok dibit hestî...).

METAPLASM, *n.* : dariştin, derhînan.

METAPLASMIC, *adj.* : derhînanî.

METAPOLITICS, *n.* : rêzaniya zanistiya bijîn.

METAPOLITICAL, *adj.* : pêwendîdarê rêzaniya zanistiya bijîn.

METAPOLITICIAN, *n.* : rêzanê zanistiya bijîn.

METAPROTEIN, *n.* : madeyê ji protînî derhatî yan derînayî.

METAPSYCHICS, *n.* : jîrzaniya dîtaneyiya bûn û zanînê, jîrzaniya hişê.

METAPSYCHOLOGY, *n.* : derûn ramanzanî.

METASOMATIC, *adj.* : guhorîna kanî yan metalî.

METASTABLE, *adj.* : nîvhedar.

METASTASIS, *n.* : belavbûn.

METASTASIZE, *vi.* : belav bûn.

METATARSAL, *n., adj.* : şehê pêyî.

METATARSUS, *n.* : şehê pê.

METATHETIC(AL), *adj.* : guhorînî.

METATHESIS, *n.* : guhorîn (dir yan bar).

META THORAX, *n.* : paşsîng.

META ZOA, *n. pl.* : canewerên zehfxane.

METAZOAN, *n., adj.* : canewerek zehfxane.

METE, *n.* : rade.

METE, *vt.* : belav kirin (beş).

METEMPIRIC(S), *n.* : jîrzaniya heyberên derveyî serhatiyan.

METEM PSYCHOSIS, *n.* : paşkoçkirin.

METENCEPHALIC, *adj.* : paşmejiyî.

METENCEPHALON, *n.* : paşmejî.

METENCEPHALOUS, *adj.* : paşmejiyî.

METEOR, *n.* : şolik, nêze, tîrêjstêr.

METEORIC, *adj.* : nêzeyî.

METEORICALLY, *adv.*: bi nêzeyî, nêzekî.

METEORITE, *n.* : stêra rijyar, nêze.

METEORITICS, *n.* : nêzezanî.

METEOROGRAPH, *n.* : alavka tomarkirina diyardeyên banimayî.

METEOROGRAPHIC, *adj.* : pêwendîdarê alavka tomarkirina diyardeyên banimayî.

METEOROID, *n.* : nêzeya gerok (li dor rojê).

METEOROLOGIC(AL), *adj.* : banimayî.

- **AIRCRAFT** : balafira banimayê.

METEOROLOGIST, *n.* : banimazan.

METEOROLOGY, *n.* : banimayîzanî, keşzanî.

METER OR METRE, *n.* : metir, pira metrî.

METHACRYLATE, *n.* : xwêya tirşiya mêtakrilîk.

METHADONE, *n.* : dermanek hedarker.

METHAMPHETAMINE, *n.* : dermanek çalakker.

METHANE, *n.* : mîtên : gaza zong, çal û komiran.

METHANOL, *n.* : mêthanol : avekiyek alkuholî gurîbar û jehr e.

METHEDRINE, *n.* : dermanê çalakkerê hîdrokloriki.

METHEGLIN, *n.* : şeraba hingvîniya dermankirî yan beharatkirî.

METHEMOGLOBINE, *n.* : pêkhatiya oksîjen û gilomobîn.

METHANAMINE, *n.* : qijilandarê tirşiya mîzî.

MRTHIONINE, *n.* : tirşiyek emînî ye.

METHOD, *n.* : rêbaz, awa, cor, şêwe, çitoyî, şêwaz, loke, teher, reftar, rewişt, rewşek.

METHODIC, *adj.* : melhezeyî, rêzikî.

METHODICAL, *adj.* : rêzikî, pêrewî, melhezeyî.

METHODICALLY, *adv.*: bi rêzikî, melhezekî.

METHODICALNESS, *n.* : rêzikîtî.

METHODISM, *n.* : dêr û tîre ya mêtodiya încîlî.

METHODIST, *n.* : endamê tîreya mêtodiya filehî, melhezeyî.

METHODISTIC, *adj.* : melhezeyî.

METHODIZE, *vt.* : melheze kirin, rêbaz kirin.

METHODIZED, *adj.* : melhezekirî, rêbazîkirî.

METHODIZING, *n.* : melhezekirin, rêbazîkirin.

METHODOLOGY, *n.* : melhezezanî.

METHUSELAH, *n.* : oldarek berî Nûh pêxemberî.

METHYL, *n.* : riha hîdrokarbona alkuholî (spîrto ya darî), metîl.

METHYLAL, *n.* : pêkhatiyek avekî ye (bo nivandinê), metîlal.

METHYLAMINE, *n.* : gazek teqemenî û gurîbar e, metîlamîn.

METHYLATE, *n., vt.* : pêkhatiyek mêtanolî ye, mêtanol kirin, metîlat.

METHYLATED SPIRIT, *n.* : alkuhola mêtanolkirî : bo ronahîkirin û germkirinê.

METHYLENE, *n.* : rihek hîdrokarbonî du hevtayî : metîlen.

METIC, *n.* : biyanî.

METICULOUS, *adj.* : miçink.

METIER, *n.* : pîşe, pîşegerî.

METIS, *n.* : zarokê mirovê spî û hindokê sor.

METOL, *n.* : toza derhînana filman.

METONIC, *adj.* (~ cycle) : demê 19 salan (235 heyv) ko hemî guhorînên heyvê diyar dikit.

METONYM, *n.* : bêjeya berdêl.

METONYMICAL, *adj.* : pêwendîdarê bêjeya berdêlî.

METONYMY, *n.* : bêje berdêlî.

METOPE, *n.* : vekirina ko du baran cuda dikit.

METOPON, *n.* : dermanek tezînî morfînî ye.

METRAZOL, *n.* : dermane bo çalakkirina dilî û pişî.

METRE, *n.* : metir, metre : yekeya dirêjiyê (sed sentîmetre).

METRIC, *adj.* : metrî.

METRIC(AL), *adj.* : hevrist, pîvayî, hunandî.

METRIC HUNDRED WEIGHT, *n.* : yekeya kêşanê (pêncî kîlogram e).

METRICS, *n.* : helbestzanî.

METRIST, *n.* : rêzik, şehrezayê pîvanên helbestê (helbestzan).

METRITIS, *n.* : kulbûna malbiçûkî (pizdankî).

METRO, *n.* : mêtro : hevkêşa jêrerdî.

METROLOGY, *n.* : pîvanzanî, rêzika pîvan û kêşanê.

METRONOME, *n.* : alava demgira awazan.

METROPOLIS, *n.* : bajar yan welatê serekî, serbajêr, paytext, metranxane.

METROPOLITAN, *n., adj.* : metran, paytextî, (ser)bajêrî.

METRORRHAGIA, *n.* : xwîn verestina malbiçûkî, riskîna malbiçûkî(pizdankî).

METTLE, *n.* : aram, mad, çalakî.

- **ON ONE'S ~** : handayî da ko hindî bişêt bikit.

METTLED, *adj.* : çalak, çeleng.

MEW, *n.* : mewjandin, miyewmiyew (dengê kitikê).

MEWL, *vi.* : giryan (girîn) (wek biçûkî).

MEWS, *n.* : çend axûr yan afirên girûvirên li meydankek vekirî.

MEXICAN HAIRLESS, *n.* : Meksîkiyê bêmû (seyek biçûk kêmmû ye).

MEZEREON, *n.* : helezek erxiwanî ye.

MEZZANINE, *n.* : qat yan nihûma navîn, tilarê jêrî.

MEZZO FORTE, *adj., adv.*: bilind (navîn).

- **RELIEVO** : neqşenavîn, neqşê navê derketî.

MEZZOTINT, *n.* : neqşkirina sihkirî(rêbazek neqşkirinê îtalî ye).

MHO, *n.* : yekeya gehînbariya kehrebî ye.

MI(O)-, *pref.* : pêşgir e ko kêmtir e, biçûktir e.

MIAOW, *n.* : mewjandin, miyewmiyew.

MIASMA, *n.* : genîtiya hilmê.

MIASMAL, *adj.* : hilmgeniyî.

MICA, *n.* : madeyek nîvşûşeyî ye (bo cudakirinê).

MICAWBER, *n.* : tembelmirov.

MICE, *n.* (*pl.* of mouse) : mişk.

MICELLE, *n.* : leşikê kehrebkirî di nav madeyek nîv şirêzî de.

MICK, *n.* : (*sl.*, **DERG.**) : Îrlendî (kirêtkirinî).

MICK(E)Y, (*sl.*) (**TO TAKE THE ~ OUT OF**) : tirane kirin.

MICKLE, MUCKLE, *n., adj.* (*arch.*) : gelek.

MICRO, *adj.* = **MICROSCOPIC**.

MICRO-, *pref.* : pêşgir e ko hûr e, biçûk e.

MICROBAROGRAPH, *n.* : pestapîvê biçûk.

MICROBE, *n.* : mîkrob, xore, dirm.

MICROBIC, *adj.* : mîkrobî, dirmî.

MICROBIAL, *adj.* : mikrobî, dirmî.

MICROBICIDE, *n.* : mîkrobkuj.

MICROBIOLOGY, *n.* : hûrzindewerzanî, mîkrobiyolojî.

MICROCLIMATE, *n.* : keş yan banima ya deverî.

MICROCLINE, *n.* : maykroklayn : texlîtek kan e.

MICROCOPY, *n.* : rûnivîsa biçûk.

MICROCOSM, *n.* : gerdûna biçûk, mirov.

MICROCRYSTALLINE, *n.* : hûrbelûrî.

MICROCYTE, *n.* : hûrtopel.

MICROREVOLUTION, *n.* : hûrguhorîn.

MICROFILM, *n., vi., t.* : hûrfilm (filmik), filmik kirin.

MICROGAMETE, *n.* : hûrzayende.

MICROGRAM, *n.* : yek ji milyon giramê, mîkrogram.

MICROGRAPHY, *n.* : sehkirina hûrbînî, derhînana wêneyî.

MICROGROOVE, *n.* : hurkelş.

MICROMETEORITE, *n.* : hûr nêze.

MICROMETER, *n.* : hûrpîv.

- **CALIPER** : hûrstûrpîv.

MICROMETRY, *n.* : hûrpîvî.

MICROMICRON, *n.* : yek ji milyon mîkronî.

MICRON, *n.* : yek ji hezar milîmetrê, mîkron.

MICRONIZE, *vt.* : hûr kirin.

MICRO-ORGANISM, *n.* : hûrzindî.

MICROPALEONTOLOGY, *n.* : hûrkevneberdînezanî.

MICROPARASITE, *n.* : hûrmişexwer.

MICROPHONE, *n.* : dengkêş, dengweş, mîkrofon.

MICROPHOTOGRAPH, *n.* : hûrwêne.

MICROPRINT, *n.* : hûrçap.

MICROPROJECTOR, *n.* : hûrarastek : bo havêtina wêneyê mezinkirî li ser perdeyê.

MICROPYLE, *n.* : kunik.

MICRORADIOGRAPH, *n.* : hûrwêneyê tîrêjî.

MICROREADER, *n.* : hûrxwendeyar.

MICROSCOPE, *n.* : hûrbîn.

MICROSCOPIC(AL), *adj.* : hûrbînî.

MICROSCOPY, *n.* : hûrbînkarî.

MICROSECOND, *n.* : yek ji milyon çirkeyî.

MICROSEISM, *n.* : lerzik yan lerzek (hûrlerze).

MICROSOME, *n.* : mîkrosom, libek (hûrek) ji protoplazme.

MICROSPOROPHYLL, *n.* : tovbelg.

MICROSTRUCTURE, *n.* : hûrbinyat (yan avahî).

MICROWAVE, *n.* : hûrpêl.

MICTURATE, *vi.* : mîztin, mîz kirin.

MICTURITION, *n.* : mîzkirin, destav.

MID, *adj., prep.* : nîv, navîn.

MIDAS, *n.* ~ touch : şiyana destveînana para.

MIDBRAIN, *n.* : nîvê mejî.

MIDDAY, *n.* : nîvro.

- **MEAL** : firavîn.

MIDDEN, *n.* : gûfik, gûmik, koma rîxê.

MIDDLE, *n., adj.* : navincî, nawend, navî, nav, navîn, nîvanî, nîvek, nîvnîve, nîvî, navber, navrêz.

- **AGE** : navîna jî, kalî, nîvincayî, pîrî.

- **AGED** : reşkal, navsere, nivinci, nawerastî temen.

- **CLASS** : çîna navîn, çînî nawerast, pî.

- **DISTANCE** : pêşbeziya navîn (400-1500 metir).

- **EAST** : rojhelata navîn.

- **FINGER** : navçar, tila navîn, doli demkêş.

- **MAN** : kostek, miyankar.

- **TERM** : radeyê navîn.

- **WAVE** : pêla navîn.

- **WEIGHT** : navîkêş(kulmbazî).

MIDDLE AGES, *n.* : sedên navîn (ji sale 500 p.z. ta 1500 p.z.).

MIDDLEBREAKER OR MIDDLE BUSTER, *n.* : gêsin, gasin, hevcar, (cot).

MIDDLEBROW, *n., adj.* : rewşenbîrê navîn (çandonavîn).

MIDDLE ENGLISH, *n.* : îngîliziya navîn : zimanê înglîzî yê nivîsî ji seda 12 ta seda 16.

MIDDLE FRENCH, *n.* : frensiya navîn : zimanê frensî yê nivîsî ji seda 14 ta seda 16.

MIDDLING, *n., adj.* : navincî, asayî.

MIDDORSAL, *adj.* : nîvpiştî.

MIDDY, *n.* : sedvanyarê deryayî.

MIDGE, *n.* : mêşk.

MIDGET, *adj.* : quto, rîwele.

MIDI, *n.* : kirasê dirêjê navî.

MIDIRON, *n.* : şînkê asin.

MIDLAND, *n., adj.* : navîna welatî.

MIDMOST, *adj., adv., n.* : navincî, nivî.

MIDNIGHT, *n.* : nîva şevê, nîvşev.

- **SUN** : roja nîvşevê.

MIDNIGHTLY, *adv.*: nîvşevî, nîvşevîkî.

MIDNOON, *n.* : nîvro.

MIDPOINT, *n.* : xalka navîn yan nîvê.

MIDRIB, *n.* : lanavî (belgê helezê).

MIDRIFF, *n.* : perdeya navbirê, parxan, parhan, pincik.

MIDSECTION, *n.* : beşê navîn.

MIDSHIPMAN, *n.* : sedvanyarê deryayî.

MIDST, *n., prep.* : nav, di nav de.

MIDSUMMER, *n.* : nîva havînê.

- **DAY** : 24 hizêranê (roja nîva havînê).

- **MADNESS** : dînatiya temam.

MIDWAY, *n.* : nîveka rê.

MIDWEEK, *n., adj.* : nîv hefte.

MIDWEEKLY, *adj.* : li nîv heftiyê, nîv heftikî.

MIDWEST, *n., adj.* : rojavaya navî.

MIDWIFE, *n.* : dapîr, maman, mamano.

MIDWIFERY, *n.* : dapîrî, dapîrzanî, mamanî.

MIDWINTER, *n.* : nîva zivistanê.

MIDYEAR, *n.* : nîva salê.

MIEN, *n.* : rûxsar, bejnûbal.

MIFF, *n.* : bêzarî.

MIFF, *vt.i.* : bêzar kirin.

MIGHT, *n.* : hêz, zordestî, zorayî, pergal.

MIGHT, *p.* **OF MAY** : belko, ma çi ye.

MIGHTILY, *adv.*: bi hêzdarî, gelek, hêzdarkî.

MIGHTINESS, *n.* : zorbazî, hêzdarîtî.

MIGHTY, *adj., adv.*: zîl, zorbaz, hêzdar, koto, kote.

MIGRAINE, *n.* : şeqeser, nîvserêşî.

MIGRANT, *n., adj.* : koçer.

MIGRATE, *vi.* : koçer bûn, mişext bûn.

MIGRATED, *adj.* : koçerkirî, mişextbûyî.

MIGRATING, *n.* : koçerkirin, koçerî, koç, mişextbûn.

MIGRATION, *n.* : koç, koçerî, barkirin, vekoçandin.

MIGRATOR, *n.* : koçer.

MIGRATORY, *adj.* : rewend.

MIKADO, *n.* : qiralê Japonî.

MIKE, *n., vi.* (*sl.*) : tembel, tembelî kirin.

MIKE, *n.*(COLLOQ) = MICROPHONE.

MIKE, *n., sl.* = MICK : FOR THE LOVE OF MIKE, FOR HEAVEN'S SAKE : bo xatra Xudê.

MILADY, *n.* : jina înglîz ya xanedan.

MILAGE, *n.* = MILEAGE.

MILCH, *n.* : şîrde.

MILD, *adj.* : nerm, fênik, niyan, destvîlk.

MILDEN, *vt.i.* : nerm kirin (polayî).

MILDEW, *vt.i.* : jeng, jengar, genî, kufik.

MILDEWY, *adj.* : genî, kufikbûyî.

MILDLY, *adv.*: nermîkî.

MILDNESS, *n.* : nermîtî, destvîlkî.

MILE, *n.* : mîl : yekeya dirêjiyê : 5280 pê, 1760 yard.

- **POST** : nîşaneya mîlî.
- **STONE** : nîşane.

MILEAGE, *n.* : dirêjî bi mîlan.

MILFOIL, *n.* : hezar belg.

MILIARIA, *n.* : garisîtî : kulbûna çermî li gel xurîn û xwehdanê.

MILIARY, *adj.* : garisî : pêwendîdarê nesaxiya garisîtiyê ye.

MILIEU, *n.* : dorûber, jîngeh.

MELILOT, *n.* : kinêr.

MILITANCY, *n.* : şerkarî, şerdarî, xebatkarî, bizavkarî.

MILITANT, *adj.* : şerkar, şerdar, koşa.

MILITANTLY, *adv.*: bi şerkarî, şerkarkî.

MILITARILY, *adv.*: bi leşkerî, leşkerkî.

MILITARISM, *n.* : leşkerîtî.

MILITARIST, *n.* : leşkerî(kar), serbaz.

MILITARISTIC, *adj.* : leşkerî(karî).

MILITARIZATION, *n.* : leşkerîkirin, sûpahîkirin.

MILITARIZE, *vt.* : leşkerî kirin, sûpahî kirin.

MILITARIZE, *adj.* : leşkerîkirî, sûpahîkirî.

MILITARIZING, *n.* : leşkerîkirin, sûpahîkirin.

MILITARY, *n., adj.* : leşkerî, sûpahî, cengî, serbazî.

- **ARMOUR** : çekbend.
- **COURT** : dadgeha leşkerî.
- **SERVICE** : leşkerî, xizmeta serbazî.

MILITATE, *vi.* : xebitîn, bizav kirin, kar têkirin.

MILITATED, *adj.* : kartêkirî, bizavkirî.

MILITATING, *n.* : kartêkirin, bizavkirin.

MILITIA, *n.* : leşkerê nerêzikî : milîs.

- **MAN** : şerkerê nerêzikî.

MILIUM, *n.* (*pl.* MILIA) : keresteya garisî : pirzik e li ser çermî wek dêndika garisî ye.

MILK, *n.* : şîr.

- **AND HONEY** : şîr û hingvîn : têrxoşî.
- **AND WATER** : sivik.
- **BAR** : firoşgeha şîremenî.
- **CRUST** : lîra biçûkan.
- **FEVER** : şîrta.
- **FLOAT** : erebaneya şîrî.
- **LEG** : şîrling, pejbûna lingî ya zayînî.
- **LIVERED** : tirsinok.
- **MAID** : şîrdoş.
- **MAN** : şîrfiroş.
- **OF HUMAN KINDNESS** : şîrê dilovanîtiya mirovî.

- OF MAGNESIA : şîrê magnesya (bo zikçûnê).
- POWDER : şîrtoz.
- PRODUCTS : şîremenî, spiyatî.
- PUDDING : birincşîr.
- PUNCH : şeraba alkuhol û şîr û şekirê.
- SHAKE : hêkûşîr (têkvedayî).
- SICKNESS : şîrnesaxî.
- SUGAR : şîrşekir : laktoz.
- STRAINER : şîrparzong, şîrpalek.
- TOOTH : didanşîrî, didanê şîrî.
- WALK : gerana şîrfiroşî.
- WATERED ~ : xara.
- WEED : şîrgiya.
- WORT : şîrhelez.

MILK, *vt.* : dotin.

MILKED, *adj.* : dotî, doşandî.

MILKER, *n.* : şîrde, bêrîvan.

MILKING, *n.* : dotin, doştin, doş, doşîn, doşandin, doşanî.

MILKSOP, *n.* : nêrmok.

MILKY, *adj.* : şîrî.

MILKY WAY, *n.* : kadiz, rakêşe, rêya kadizan.

MILL, *n.* : aş, kargeh.

- BOARD : kaxeza qayimkirî (karton).
- DAM : sikrê aşî.
- MAN : aşger, aşvan.
- OPERATOR : aşger.
- STONE : beraş, berê aşî.
- WHEEL : çerxa aşî, çerxa hêranê.
- WRIGHT : aşkar.

MILL, *vt.i.* : hêran (hêrîn).

MILLENARIAN, *n., adj.* : hezarî, hezarsalî, baweriya hatina rojgarê bextiyarê hezarsal.

MILLENARIANISM, *n.* : hezarîtî : baweriîtiya rojgarê bextiyarê hezarsal.

MILLENARY, *n., adj.* : hezar, hezarsal, bawer karê rojgarê bextiyarê hezarsal.

MILLENNIAL, *adj.* = MILLENARY.

MILLENNIUM, *l.* (*pl.* MILLENIA OR MILLENIUMS): hezarsal, rojgarê hezarî, bîrhatiyek hezarî, yadgarî hezarî.

MILLEPED OR MILLIPED, *n.* : hezarpê (kirm e).

MILLEPORE, *n.* : hezar kun yan kunîle, mercanek mezin e.

MILLER, *n.* : aşvan, aşewan, qeraş.

MILLER INDICES, (s) : pêristên Miler.

MILLERITE, *n.* : milerît : sulfadên nikilî.

MILLER'S THUMB, *n.* : beranê aşvanî : masiyek şaperdirrik e.

MILLESIMAL, *n., adj.* : yek ji hezarê.

MILLET, *n.* : garis, baçik, herzin.

MILLI-, *pref.* : pêşgir e ko parçeyek e ji hezarê.

MILLIAMPER, *n.* : milîamper : yek ji hezar ji amperê (1/1000 ampér), miliamper.

MILLIARD, *n.* : hezar milyon.

MILLIARY, *adj.* : pêwendîdarê milê Romanî ko 1620 yarde ye.

MILLIBAR, *n.* : yekeya pestanpîvanê ye (1/1000 barî), milîbar.

MILLICURIE, *n.* : yek ji hezar ji kurî (milîkurî).

MILLIFARAD, *n.* : yek ji hezar ji faradî, milîfarad.

MILLIGRAM, *n.* : yek ji hezar ji giramê, milîgram.

MILLIHENRY, *n.* : yek ji hezar ji henrî, milîhenrî.

MILLILAMBERT, *n.* : yek ji hezar ji lambertê, milîlambert.

MILLILITER, *n.* : yek ji hezar ji litre, mililitre).

MILLIMETER, *n.* : yek ji hezar ji metre, milimetre).

MILLIMICRON, *n.* : yek ji hezar ji mikronê, milimikron.

MILLINER, *n.* : çêker, dahêner yan firoşê kulavên jinan.

MILLING, *n.* : rexê kuhkiriyê diravî.

- **CUTTER** : birrokê firêzî.

- **MACHINE** : makîneya firêzî.

MILLION, *n.* : milyon : hezar hezar.

MILLIONNAIRE, *n.* : milyonêr : xudanê milyon dolaran.

MILLIONTH, *n., adj.* : yek ji milyonî.

MILLIOROENTGEN, *n.* : yek ji hezar ji rontgnê (milirontgen).

MILLISECOND, *n.* : yek ji hezar ji çirkeyê.

MILLIVOLT, *n.* : yek ji hezar ji voltê (milivolt).

MILLIPOND, *n.* : gêra aşî.

MILLS, *n.* ~ **BOMB** : narincok.

MILLSTREAM, *n.* : celalê aşî.

MILOMETER, *n.* : milpîv.

MILORD, *n.* : xanedanê înglîz.

MILT, *n.* : tuxmavk, masî, tov.

MILT, *vt.* : tov kirin, peyandin.

MILTER, *n.* : nêremasî.

MILTONIAN OR MILTONIC, *adj.* : miltonî : pêwendîdarê rêbaza hozanê înglîz (Milton).

MIME, *n.* : kirdarê mit : zirtek, şanogeriya mit.

MIME, *vt.* : tirane kirin, mit kirin.

MIMED, *adj.* : (mit) kirdarîkirî.

MIMING, *n.* : (mit) kirdarî kirin.

M.I. MECH.E (*abrr.* **FOR MEMBER OF THE INSTITUTE OF MECHANICAL ENGINEERS**) : kurtiya endamê amojgeha endazyarên mekanîk.

MIMEOGRAPHER, *n.* : rûnivîsk.

MIMEOGRAPH, *vt.* : rûnivîs kirin (rû nivîsîn).

MIMESIS, *n.* : lasayî, çavlêkirin, nepenîkirina jîngehî.

MIMETIC, *adj.* : çavlêkirinî, pêwendîdarê nepenîkirina jîngehî.

MIMIC, *n., adj.* : kirdarê bêdeng (mit), çavlêker, zir, derewkar.

MIMIC, *vt.* : tirane pê kirin, çav lê kirin, wek jîngehî diyar bûn.

MIMICRY, *n.* : nepenîbûna jîngehî, çavlêkirin.

MIMOSA, *n.* : şermîn (helez), mîmoza.

MIMULUS, *n.* : heleza gulî (tuxm).

MINA, *n.* : yekeya kevna kêşanê (min).

MINACIOUS, *adj.* : gefdar.

MINACIOUSLY, *adv.*: bi gefdarî, gefdarki.

MINACITY, *n.* : gefdarî(tî).

MINARET, *n.* : minare.

MINATORY, *adj.* : gefdar.

MINCE, *n.* : qîme (goşt).

- **MEAT** : goştê qîme.

- **PIE** : kadeya qîmeyî.

MINCE, *vt.i.* : qîme kirin.

MINCED, *adj.* : qîmekirî, hencandî, hûrkirî.

MINCING, *n.* : qîmekirin, hencandin, hencinîn.

MIND, *n.* : hiş, bîr, bal, sewda, hûş, hûşmendî, jîrî.

- **NOT TO KNOW ONE'S OWN** ~ : dudil.

- **OUT OF ONE'S (RIGHT)** ~ : dîn.

- **OUT OF SIGHT, OUT OF** ~ : dûr ji çavî dûre ji dilî.

- **TIME OUT OF ~** : ji mêje.

- **TO BE IN TWO ~ S** : dudilî kirin.

- **TO BE OF A ~** : yek hizrîn.

- **TO BE OF A PERSON'S ~** : li gel mirovekê pêk hatin.

- **TO BE OF THE SAME ~** : yek hizre yan yek hizrîn.

- **TO CALL(BRING)TO ~** : hînan bîra xwe.

- **TO HAVE A GOOD(GREAT) ~ TO** : qenc hez kirin.

- **TO HAVE HALF A ~** : piçekê hez kirin.

- **TO ONE'S ~** : bi hizra wî, bi hewesa wî(wê).

- **TO PUT ONE IN ~ OF** : hînan bîrê.

- **TO SET ONE'S ~ ON** : biryar kirin (ko tiştekê bikit).

- **TO SPEAK ONE'S ~** : eşkera gotin yan axiftin.

MIND, *vt.* : berhelisti kirin, serinc kirin, hişyar bûn, qebûl nekirin.

- **NEVER ~** : xem nakit.

MINDED, *adj.* : niyazkar, hişdar.

MINDFUL, *adj.* : hişyar, wurya.

MINDFULLY, *adv.*: bi hişdarî, hişdarkî.

MINDFULNESS, *n.* : hişyarî(tî).

MINDLESS, *adj.* : bêmejî, hov, naşî, bêhiş.

MINDLESSLY, *adv.*: bi bêhişî, bêhişkî.

MINDLESSNESS, *n.* : bêhişîtî, bê hişyarîtî.

MIND READER, *n.* : hişxwendiyar.

MIND'S EYE, *n.* : aşop.

MINE, *poss. pron., adj.* : ya min, yê min.

MINE, *n.* : mîn, kan, kangeh, tepînk.

- **DETECTOR** (alav) sehkera mînê.

- **LAYER** : cenggemiya mînçin (mîn çandin).

- **SWEEPER** : cenggemiya mîn mal (mîn malîn).

MINE, *vi.t.* : mîn kirin.

MINER, *n.* : komirvan, kanger.

MINERAL, *n., adj.* : kanza, kanzayî, bêgiyan.

- **WATER** : kanav.

MINERALIZABLE, *n.* : kankirinbar.

MINERALIZATION, *n.* : kankirin.

MINERALIZE, *vt.* : kan kirin.

MINERALIZED, *adj.* : kankirî.

MINERALIZING, *n.* : kankirin.

MINERALOGICAL, *adj.* : kanzaniyî.

MINERALOGIST, *n.* : kanzan.

MINERALOGY, *n.* : kanzanî.

MINERVA, *n.* : Xudabanûya pendiyê (li nik Romanan).

MINESTRONE, *n.* : şorbe yan giraza tîr (birinc û zerzewat).

MINGLE, *vt.i.* : têkil bûn, têkil kirin.

MINGLED, *adj.* : têkilkirî.

MINGLING, *n.* : têkilkirin, têkilbûn.

MINGY, *adj.* : çikos, sefil, rezîl.

MINI-, *pref.* : pêşgir e ko biçûk e.

MINIATE, *vt.* : (bi heşa sor) neqş kirin.

MINIATURE, *n., adj.* : nîgarok, biçûkkirî.

MINIATURIST, *n.* : nîgarokvan.

MINIATURIZE, *vt.* : biçûk kirin.

MINIATURIZED, *adj.* : nîgarokkirî.

MINIATURIZING, *n.* : nîgarokkirin.

MINICAB, *n.* : guhêzoka biçûk.

MINICAMERA, *n.* : wênegira biçûk, kamêraya biçûk.

MINIFY, *vt.* : kêm kirin, bereş kirin.

MINIFYING, *n.* : kêmkirin, bereşkirin.

MINIKIN, *n., adj.* : hûremirov.

MINIM, *n., adj.* : nîvawaz, gelek hûr yan

biçûk, xalik yan dilop : yekeya kêşana avekiyan.

MINIMAL, *adj.* : kêmtir.

MINIMALIST, *n.* : kêmtirkar, nermkar, bawermendê kêmtir dixwazit.

MINIMIZATION, *n.* : kêmtirkirin, bereşkirin.

MINIMIZE, *vt.* : kêmtir kirin, bereş kirin.

MINIMIZED, *adj.* : kêmtirînkirî.

MINIMIZING, *n.* : kêmtirînkirin, bereşkirin.

MINIMUM, *n.* : emper, kêmtirîn, kemtirîn, biçûktirîn.

- **THERMOMETER** : germepîva biçûktirîn yan kêmtirîn.

- **WAGE** : kirêya biçûktirîn yan kêmtirîn.

MINING, *n.* : kanzanî, kanzakirin.

- **COAL ~** : komir kankirin yan kanzanî.

- **GOLD** : zêr kankirin yan kanzanî.

MINION, *n.* : erkdar, pêrew.

MINI SKIRT, *n.* : kurtekirasê jinan.

MINISTER, *n.* : şahyar, şalyar, wezîr, oldar, balyoz, nêroy.

- **PLENIPOTENTIARY** : şalyarê destheladtarê reha.

- **RESIDENT** : şalyarê nîştecê.

- **WITHOUT PORTFOLIO** : şalyarê dewletê, wezîrê bêwezaret.

MINISTER, *vi.t.* : oldarî kirin, harî kirin, yarmetî dan.

MINISTERED, *adj.* : oldarîkirî.

MINISTERING, *n.* : oldarî kirin.

MINISTERIAL, *adj.* : oldarî, şalyarî.

MINISTRANT, *n., adj.* : harîker, xizmetkar.

MINISTRATION, *n.* : xizmeta oldarî.

MINISTRY, *n.* : wezaret, şalyarî.

MINIUM, *n.* : minyom : oksîdê zirêçê sor.

MINIVER, *n.* : kurkê spiyan pinîkirî.

MINK, *n.* : qîjk.

MINNOW, *n.* : zîtke, masiyek ewropî biçûk e.

MINOAN, *n., adj.* : pêwendîdarê şaristaniya Girîtî (3000-1500 B.Z.) li ser navê qiralî (Mînos).

MINOR, *n., adj.* : biçûk, negehiştî : negiring.

- **PREMISE** : pêşekiya biçûktir (kurt).

- **SUIT** : rêzika biçûk.

- **TERM** : radeyê biçûktir.

- **TRAP** : davik.

MINORESS, *n.* : rebena tîreyek filehan.

MINORITE, *n.* : rebenê tîreyek filehan.

MINORITY, *n.* : kêmayetî, kemayeti, kemine, kêmî, kemêtî.

MINATAUR, *n.* : mirovê serga (efsane).

MINSTER, *n.* : dêr.

MINSTREL, *n.* : stranbêj, dengbêj.

MINSTRELSY, *n.* : stranbêjî, dengbêjî, helbesta stranbêjî.

MINT, *n.* : lêdange, pûng, pîng, tehtavik, dariştgeha diravî yan pareyan.

MINT, *vt.* (diravî) : lê dan.

MINTAGE, *n.* : (dirav) lêdan.

MINTED, *adj.* : lêdayî (dirav), pûngkirî.

MINUEND, *n.* : tibab yan jimara ko jimarek dî jê kêm bibit.

MINUET, *n.* : semayek hêdî û giran e, mûzîqeya vê semayê.

MINUS, QUASI- *prep., adj.* : kêm, der, nîşander (-).

MINUSCULE, *n., adj.* : biçûk, hûr, pirtikek.

MINUTE, *n., adj.* : pûç, hûr, hûrek, taw, bîrname.

- **HAND** : destikê hûrekan (demjimêr).

- **STEAK** : parçeya goştî ya zû disewhit.

MINUTE, *vt.* : bi kurtî nivîsîn.

MINUTED, *adj.* : (bi kurtî) nivîsî.

MINUTELY, *adv.*: bi hûrî, hûrîkî.

MINUTENESS, *n.* : hûrî(tî).

MINUTES, *n.* (**OF A MEETING**) : civatname, karname zayend, guzarişta kombûnê.

MINUTIAE, *n. pl.* (*sing.* **MINUTIA**) : hûrî, dirêjî.

MINUTING, *n.* : nivîsîn (bi kurtî).

MINX, *n.* : keçika rûqayim.

MIOCENE, *adj.* : Miyosînî : rojgarê sêyekiyê navîn.

MIOSIS, *n.* = **MYOSIS**.

MIR, *n.* : civaka gundê rûsî.

MIRACLE, *n.* : derasa, ecêb, bûyera sersirûştî.

MIRACULOUS, *adj.* : sersirûşt.

MIRACULOUSLY, *adv.*: bi sersirûştî(tî).

MIRADOR, *n.* : berbank yan telarê derketî.

MIRAGE, *n.* : leylan, serab, seraw, tirawîlke.

MIRE, *n.* : herî, qur, teqn.

MIRE, *vt.* : teqn kirin, noqî bûn (di nav teqnê de).

MIRED, *adj.* : çikilî (di nav teqnê de).

MIRING, *n.* : çikilîn.

MIRROR, *n.* : awêne, neynik, xwedîk, qudîk, eynik, mirêk.

- **CONCAVE ~** : xwedîka rûçal.

- **CONVEX ~** : xwedika koqizkûr.

- **PLANE ~** : rastexwedîk.

MIRROR, *vt.* : (wek xwe) diyar kirin, awêne kirin.

MIRRORED, *adj.* : awênekirî.

MIRTH, *n.* : şadî.

MIRTHFUL, *adj.* : şad, dilgeş, sivikcan.

MIRTHFULLY, *adv.*: bi şadî, şadkî.

MIRTHFULNESS, *n.* : dilgeşîtî.

MIRTHLESS, *adj.* : bê şadî.

MIRT, *adv.*: teqnî, qurî.

MIS-, *pref.* : pêşgir e ko bed e, xirab e.

MISADVENTURE, *n.* : bextreşî.

MISALIGN, *vt.* : çewt rêz kirin.

MISALLIANCE, *n.* : çewtpeyman (peymana nerêk), çewthevbendî.

MISANTHROPE, *n.* : dijmirov.

MISANTHROPIC(AL), *adj.* : dij mirovî.

MISANTHROPICALLY, *adv.*: bi dij mirovî, dijmirovkî.

MISANTHROPIZE, *vt.* : dijî mirov kirin.

MESAPPLICATION, *n.* : bed rahênan.

MISAPPLY, *vt.* : bed rahênan.

MISAPPREHEND, *vt.* : çewt têgehîştin, tênegehîştin.

MISAPPREHENSION, *n.* = **MISUNDERSTANDING**.

MISAPPROPRIATE, *vt.* : dizîn, çewt bi kar hînan.

MISAPPROPRIATION, *n.* : (dirav) dizîn.

MISBECOME, *vt.* : kêr nehatin.

MISBEGOTTEN, *adj.* : bîjî.

MISBEHAVE, *vt.* : xirabî kirin, bêrewişti kirin.

MISBEHAVIOUR, *n.* : çewtrewişt, bedreftar.

MISBELIEF, *n.* : çewtbawer, çewthizir.

MISBELIEVER, *n.* : zendîq.

MISBRAND, *vt.* : qelp kirin, zir kirin.

MISCALCULATE, *vt.i.* : çewt hejmartin yan hizir kirin.

MISCALCULATION, *n.* : çewt hejmartin yan hizir kirin.

MISCALL, *vt.* : çewt nav kirin.

MISCARRIAGE, *n.* : êxistin, jiberçûn(biçûk).

MISCARRY, *vi.* : jî ber çûn, keftin (biçûk).

MISCAST, *vt.* : çewt dabeş kirin (kirdaran).

MISCASTING, *n.* : çewtdabeşkirin.

MISCEGENATION, *n.* : têkilbûna regezan (bi şûkirinê).

MISCELLANEA, *adj.* : tişt yan nivîsînên têvel yan hemecor.

MISCELLANEOUS, *adj.* : keşkol, têvel, hemecor.

MISCELLANEOUSLY, *adv.*: bi hemecorî, bi têvelî, hemecorkî.

MISCELLANEOUSNESS, *n.* : hemecorîtî, têvelîtî.

MISCELLANIST, *n.* : nivîserê hemecorî yan têvelî.

MISCELLANY, *n.* : pirtûk.

MISCHANCE, *n.* : bedbextî, bextreşî.

MISCHIEF, *n.* : şeytanî, ziyankarî.

- **TO MAKE ~** : têkvedanê (du berekiyê)kirin.

- **TO PLAY THE ~ WITH** : têkdan, êşandin.

MISCHIEVOUS, *adj.* : ziyankar.

- **PERSON** : şofar.

MISCHIEVOUSLY, *adv.*: bi ziyankarî, ziyankarkî.

MISCHIEVOUSNESS, *n.* : ziyankarîtî.

MISCHMETALL, *n.* : têkiliya kanên lantanîdê ko agirî digirin gava dikevin ber bayî.

MISCIBLE, *adj.* : têkilbar.

MISCONCEIVE, *vt.* : çewt têgehiştin yan hizir kirin.

MISCONCEPTION, *n.* : çewtbawerî.

MISCONDUCT, *n.* : çewt rewişt, çewt kardarî, bed reftar, bêrûmetî.

MISCONDUCT, *vt.* : bêrûmetiyê kirin.

MISCONSTRUCTION, *n.* : çewt têgehiştin yan ravekirin.

MISCONSTRUE, *vt.* : çewt têgehiştin.

MISCOPY, *vt.* : çewt rûnivîs kirin.

MISCOUNT, *n.* : çewt hejmartin.

MISCOUNT, *vt.i.* : çewt hejmartin.

MISCOUNTING, *n.* : çewt hejmartin.

MISCREANT, *n., adj.* : bîjî, bêol.

MIS-CUE, *n.* : çewtlêdan (bilyard).

MIS-CUE, *vi.* : çewt lê dan (bilyard).

MISDATE, *vt.* : çewt roj kirin, çewt dîrok kirin.

MISDEAL, *vt.i.* : çewt balav kirin (kaxezanê).

MISDEAL, *n.* : çewtbalavkirin.

MISDEED, *n.* : bedkar, tawan, guneh.

MISDEEM, *vt.i.* : çewt hizir kirin.

MISDEMEANANT, *n.* : gunehkar, gunahkar.

MISDEMEANO(U)R, *n.* : guneh, gunah, serkeşî.

MISDIRECT, *vt.* : şaş kirin.

MISDIRECTION, *n.* : şaşkirin.

MISDO, *vt.* : çewtî kirin.

MISDOING, *n.* : bedkar, tawan.

MISDOUBT, *n.* : guman, dudilê.

MISDOUBT, *vt.* : guman kirin, dudilî kirin.

MISE, *n.* : pêkhatin.

MISER, *n.* : rijd, kodo, perist, rezîl, destgirtî, çikos, çikod, destmiç, diravgenî, babidest, xopan, malwêran.

MISERABLE, *adj.* : şepirze, perîşan, qelender, hejar, jar, melûl, pepûk, belengaz, reben, xizan, xopan, xembar, bêbext, bi kul, sefîl, stûxar.

- **WOMAN** : porkoz.

MISERABLENESS, *n.* : hejarîtî, perîşanîtî, belengazîtî.

MISERABLY, *adv.*: bi hejarî, bi perîşanî, belengazkî.

MISERICORD, *n.* : xanîkê vesihînê li dêrê.

MISERLINESS, *n.* : çikosîtî, destmiçandin.

MISERLY, *adj.* : çikos, rijd, qinot, qarnan, mendebûr, leçer, xizanî, diravgenî, malwêranî, kinoj, kinos.

MISERY, *n.* : xopanî, rijdî, xembarî, jarîtî, belengazî, perîşanî, sefîlî, stûxarî.

MISESTEEM, *vt.* : rêz negirtin (bêqedir kirin).

MISESTIMATE, *vt.* : çewt xeml yan texmîn kirin.

MISFEASANCE, *n.* : çewt bi karînana qanûnê yan desthelatiyê.

MISFILE, *vt.* : çewt fayel kirin.

MISFIRE, *n.* : neteqîn (çek).

MISFIRE, *vi.* : neteqîn (çek) (ya çewt teqîn).

MISFIT, *n.* : bedgoncan, kêrnehatin.

MISFORTUNE, *n.* : bedbextî, bextreşî, dewbirr, qeş, mere, belengazî, sergerandî, nuşistî.

MISGIVE, *vt.* : guman kirin.

MISGIVEN, *adj.* : gumankirî.

MIDGIVING, *n.* : diltepî.

MISGOVERN, *vt.* : çewt hukim yan kardarî kirin, çewt fermanrewayî kirin.

MISGOVERNMENT, *n.* : çewt hukimkirin yan ferman rewayîkirin.

MISGUIDANCE, *n.* : şaşkirin, xapandin.

MISGUIDE, *vt.* : xapandin.

MISGUIDED, *adj.* : şaş(kirî).

MISGUIDEDLY, *adv.*: bi şaşî, şaşkî.

MISGUIDEDNESS, *n.* : şaşîtî.

MISHANDLE, *vt.* : çewt kardarî kirin, xirab rakirin û danan (pirsê).

MISHAP, *n.* : bedbextî, bûyera bextreş.

MISHEAR, *vt.* : çewt bihîstin.

MISHEARD, *adj.* : çewt bihîstî.

MISHEARING, *n.* : çewt bihîstin.

MISHIT, *n.* : lênedan, vêneketin.

MISHIT, *vt.* : lê nedan.

MISHMASH, *n.* : têkiliya şaş.

MISHNA(H), *n.* : binyata telmodî.

MISINFORM, *vt.* : çewt ragehandin.

MISINFORMATION, *n.* : çewt ragehandin yan ragehîn.

MISINFORMING, *n.* : çewtragehandin.

MISINTERPRET, *vt.* : çewt rave kirin, çewt têgehiştin.

MISINTERPRETATION, *n.* : çewt ravekirin, çewt têgehiştin.

MISJUDGE, *vt.i.* : çewt biryar dan.

MISKNOW, *vt.* : çewt zanîn, çewt têgehiştin.

MISLAID, *adj.* : winda, hinda, wun, berze.

MISLAY, *vt.* : winda kirin, hinda kirin, wun(d) kirin, berze kirin.

MISLEAD, *vt.* : sews kirin, dagerandin, xapandin, şaş kirin.

MISLEADING, *n.* : şaş kirin, sews kirin, dagerandin.

MISLED, *adj.* : şaşkirî, sewskirî.

MISLIKE, *vt.* : hez nekirin, nevêtin.

MISMANAGE, *vt.* : çewt kardarî kirin.

MISMANAGEMENT, *n.* : çewtkardarî.

MISMANAGING, *n.* : çewtkardarîkirin.

MISMARRIAGE, *n.* : çewtşûkirin (yan jinînan), şûkirina kêrnehatî.

MISMATCH, *vt.* : kêrnehatî şûkirin.

MISNAME, *vt.* : çewt nav kirin yan nav gotin.

MISNOMER, *n.* : çewtnavkirin, çewtenav.

MISO-, *pref.* : pêşgir e ko kîn e.

MISOGAMIST, *n.* : kîndarê şûkirinê (yan jinînanê).

MISOGAMY, *n.* : kîna şûkirinê yan jin înanê.

MISOGYNY, *n.* : kîna jinan.

MISOLOGY, *n.* : kîna hizirkirinê berhevdanê yan ronakbîriyê.

MISONEISM, *n.* : kîna nû û nûkirinê.

MISPLACE, *vt.* : çewt danîn (li dira çewt danîn).

MISPLACEMENT, *n.* : çewtdanîn.

MISPLAY, *n., vt.* : çewt leyiztin, çewt yarî kirin.

MISPRINT, *n.* : çewtçapî.

MISPRISION, *n.* : serkêşî, hêvişandina erkî, veşartina tawanê, kotkirin.

MISPRISON, *n.* : çewt bendkirin yan zîndan kirin.

MISPRIZE, *vt.* : kotî kirin, bêrûmet kirin.

MISPRONOUNCE, *vt.* : çewt bil lêv kirin.

MISPRONUNCIATION, *n.* : çewtbilêvkirin.

MISQUOTATION, *n.* : çewtlêwergirtin.

MISQUOTE, *vt.* : çewt lê wergirtin.

MISREAD, *vt.* : çewt xwendin.

MISREAD, *adj.* : çewt xwendî.

MISREADING, *n.* : çewtxwendin.

MISRECKON, *vt.i.* : çewt hejmartin yan hizir kirin.

MISREMEMBER, *vt.* : çewt bîr kirin.

MISREPORT, *vt.* : çewt gotin yan guhaztin (gotinê).

MISREPRESENT, *vt.* : çewt kirin (ne rast gotin), guhartin (axiftin yan bûyer).

MISREPRESENTATION, *n.* : çewtgotin.

MISRULE, *vt.* : çewt hukim kirin.

MISRULE, *vt.* : çewt hukim kirin.

MISS, *n.* : şahbanûya ciwaniyê.

MISS, *n.* : xatû, xatûn, lênedan, ketin, bêrîkirin.

MISSISH, *adj.* : xatûnî, xatûyî.

MISSISHNESS, *n.* : xatûnîtî, xatûyîtî.

MISS, *vt.i.* : hêvişandin, bêrî kirin, xwe vedan, lê nedan.

MISSAL, *n.* : kitêba nivêjên hemî salê.

MISSEL, *n.* ~ **THRUSH** : balindeyek mezin strankar e.

MISSEND, *vt.* : çewt hinartin.

MISSHAPE, *vt.* : kirêt kirin (çewt şikil kirin).

MISSHAPEN, *adj.* : kirêtkirî, (çewtşikilkirî).

MISSILE, *n., adj.* : moşek, havêjbar.

MISSILEER, *n.* : moşekhavêj.

MISSILERY, *n.* : moşekzanî, moşek.

MISSING, *adj.* : winda, hinda, berze.

- **LINK** : elqeya berze.

MISSION, *n.* : şandek, şandin, spare, hinartok, şandik, şandî, nêrdraw, desta, mijdeberî, hinartî, nêrje.

MISSIONARY, *n., adj.* : mîjdeber.

MISSIONED, *adj.* : şandî.

MISSIONER, *n.* : mijdeber.

MISSIONING, *n.* : şandin.

MISSIVE, *n., adj.* : nameya destnivîsî, hinartî.

MIS-SPELL, *vt.* : çewt hecan kirin.

MISSPELLING, *n.* : çewthecanî.

MISSPEND, *vt.* : çewt xerc kirin, destê xwe berdan.

MISSPENDING, *n.* : destberdan, çewtxerckirin.

MIS-STATE, *vt.* : çewt gotin.

MISSTATEMENT, *n.* : çewtgotin.

MISSTEP, *n.* : çewthengav (yan pêngav).

MISSY, *n.* : xatû(n), keçika law.

MIST, *n.* : mij, xunav, şewnim, tem, temûmij, perde (li ser çavan).

MIST, *vi.t.* : perde girtin, (çav) şêlî bûn, mij bûn, pizirîn.

MISTAKABLE, *adj.* : çewtbar.

MISTAKE, *n.* : çewtî, şaşî, çevtî, şepînî, hele, pin.

- **AND NO ~** : bê guman.

- **BY ~** : bi çewtî.

MISTAKE, *vt.i.* : çewtî kirin.

MISTAKEN, *adj.* : şepnî, çewt, şaş.

MISTAKER, *n.* : şepnî, çewtkar.

MISTER, *n.* : birêz, rêzdar, kak(e).

MISTILY, *adv.*: bi mijî, bi şêlî, bi şaşî, mijkî.

MISTIME, *vt.* : çewt dem kirin.

MISTINESS, *n.* : mijîtî.

MISTLESS, *adj.* : bêmij, sahî.

MISTLETOE, *n.* : demokane : helezek mişexwer e debîşî ye li ser darê sêvê şin dibit, heke kiçek li Kirismisê (Noelê) li bin vê darê rawestit mirov dişêt wê maçî bikit (edet e).

MISTRAL, *n.* : bayê sar û dijwar yê bakurî.

MISTRANSLATE, *vt.* : çewt wergêran, nerast tercime kirin.

MISTRANSLATION, *n.* : çewt wergêran yan tercime kirin.

MISTREAT, *vt.* : dilreqî yan zordarî kirin.

MISTRESS, *n.* : dostik, yarik, jinaxa, yara, kebanî (kabanî).

MISTRIAL, *n.* : çewt dadpirsî yan dadgerî.

MISTRUST, *n.* : gumankirin, bawerîpênehînan.

MISTRUST, *vt.* : guman kirin, bawerî pê nehînan.

MISTRUSTFUL, *adj.* : gumandar.

MISTRUSTFULLY, *adv.*: bi gumandarî, gumandarkî.

MISTRUSTFULNESS, *n.* : gumandarîtî.

MISTY, *adj.* : mijî.

MISUNDERSTAND, *vt.* : çewt têgehiştin.

MISUNDERSTANDING, *n.* : çewttêgehiştin.

MISUNDERSTOOD, *adj.* : çewt têgehiştî.

MISUSAGE, *n.* : çewtbikarînan.

MISUSE, *n.* : çewtbikarînan.

MISUSE, *vt.* : çewt bi kar hînan.

MISVALUE, *vt.* = **UNDERVALUE**.

MISVENTURE, *n.* = **MISADVENTURE**.

MISWRITE, *vt.* : çewt nivîsîn.

MITE, *n.* : tiştek biçûk, morane, speha genimî, xorik (xîrk) parçebiçûka diravî.

MITER OR MITRE, *n.* : kulavê metranî.

MITER OR MITRE, *vt.* : kirin metran (kulavê metran kirin serî), dep pêkve jî goşeyan rast girê dan.

MITER BOX, *n.* : goşegir.

MITHRA(S), *n.* : Xudaroj, Mîtra.

MITHRAIC, *adj.* : Xudarojî (pêwendîdarê Xudarojî), Mîtrayî.

MITHRIDATE, *n.* : tiryak (dijjehr e).

MITHRIDATISM, *n.* : parêziya (dij) jehrî.

MITHRIDATIZE, *vt.* : dijjehrî kirin.

MITICIDE, *n.* : soskuj yan beltîkkuj.

MITIGABLE, *adj.* : hedarbar.

MITIGATE, *vt.* : sivik yan hedar kirin, sivik kirin (êş).

MITIGATION, *n.* : hedarkirin, hedirandin.

MITIGATIVE, *adj.* : hedardar.

MITIGATOR, *n.* : hedarkar.

MITOCONDRION, *n.* : avahiya taybetiya xaneyê (bo enzîman).

MITOSIS, *n.* : dabeşbûna dirêjki (taykî) ya xaneyê yan kakilî.

MITRAL, *adj.* : kulavî.

- **VALVA** : serdevk yan derçeyê kulavî.

MITRE, *n.* : kulav.

MITT, *n.* : lepika jinaniya tilvekirî.

MITTEN, *n.* : texlîtek desgork e.

- **TO GET THE ~** : derdixin.

- **TO GIVE THE ~** : derxistin.

MIX, *n.* : têkil, têk, col.

MIX, *vt.i.* : têkil kirin, têkil bûn.

MIXABLE, *adj.* : têkilbar.

MIXED, *adj.* : têkilkirî, têkel, bernavdayî.

- **FARMING** : çandina têkil.

- **NUMBER** : hejmara şikeste.

- **SECTOR** : birgeha têkel, beşê têkil (aborî).

- **UP** : gebar, şaş.

MIXEDNESS, *n.* : têkilkirîtî.

MIXEN, *n.* : koma rixê.

MIXER, *n.* : têkilker, nawşêl.

MIXING, *n.* : têkilkirin, levdan, bernavdan.

MIXTURE, *n.* : têkilî, col, têkil, têkel, têkilêk.

MIZZEN, *n.* : babirekê li ser darê paşiya gemiyê.

- **MAST** : darbabirekê paşî.

MIZZLE, *vi.t.* : (pizûrk) barîn.

MIZZLED, *adj.* : (pizûrk)barî.

MIZZLING, *n.* : (pizûrk)barîn.

MOAN, *n.* : nalîn, nike, axîn, nalenal.

MNEMONIC, *n., adj.* : bîrkark, pêwendîdarê bîranînê.

MNEMONICS, *n.* : bîrkirinzanî.

MOA OR MO, *n.* : kevnebalindeyek Neozelandî ye.

MOAN, *n.* : nike, nirke, nalîn, axîn, harjîn.

MOAN, *vi.t.* : nalîn.

MOANED, *adj.* : nalî.

MOANER, *n.* : axdar.

MOANING, *n.* : nalîn, nal, nikîn, oxîn, gilî, nikandin, axîn.

MOAT, *n.* : çal yan kendalê avê (ya ko li dor kelhê dikolin).

MOAT, *vt.* : çal yan kendalê avê li dor kelhê kolîn.

MOB, *n.* : kom, eşamet, birrek mirov, cerde, nijdeya gunehkarî.

MOB, *vt.i.* : cerdeyî kirin.

MOBBED, *adj.* : cerdekirî.

MOBBING, *n.* : cerdekirin.

MOBBISH, *adj.* : cerdeyî.

MOBCAP, *n.* : kulavek jinanî ye (li bin erzînkê girê didin).

MOBILE, *adj.* : gerok, bizok, livînbar, guhêzdar.

- **BED** : textguhêz (textê guhêzbar).

- **FORCE** : hêzguhêz : hêza gerok, hêza tevger.

MOBILIARY, *n.* : samanê guhêzbar.

MOBILITY, *n.* : livînbarî(tî).

MOBILIZABLE, *adj.* : lêkdanbar, têhilanbar.

MOBILIZATION, *n.* : lêkdan, têhilan, têhilandin.

MOBILIZE, *vt.i.* : lêkdan, livandin, destdihilandin.

MOBILIZED, *adj.* : lêkdayî, desthilandî, têhilanî.

MOBILIZING, *n.* : lêkdan, desthilandin, têhilan.

MOBOCRACY, *n.* : hukmê cerbezan, çîna cerbezan, nijdevanîtî.

MOBSTER, *n.* : cerbez, tawanbar, nijdevan.

MOCCASIN, *n.* : sola bê panî, pêlava bê panî.

MOCHA, *n.* : qehweya Yemenê.

MOCK, *n., adj.* : pêkenîn, tirane pêkirin.

- **HEROIC** : tiranekerî.

- **ORANGE** : zirpirteqal.

- **UP** : nimûneyê qebare xweristî.

MOCK, *vt.i.* : pê kenîn, tirane pê kirin.

MOCKED, *adj.* : tiranepêkirî, pêkenî, pêkenandî.

MOCKER, *n.* : tevzker, pêkenok.

MOCKERY, *n.* : tinaz, qeşmerî, tirane, pêkenîn, tevzkerî, tevz, finaz, tewz(e), tîz, galte.

MOCKING, *n.* ~ at : pêkenîn, pêkenandin.

- **BIRD** : balindeya strankara emerikanî.

MOCKINGLY, *adv.*: bi tiraneyî, tiranekî.

MODAL, *adj.* : merckirî, şiklê negewherî.

MODALITY, *n.* : mercîtî, şiklî.

MODE, *n.* : çitoyî, çawayî, cor, awa, baw, şêwaz, rêbaz.

- **OF OSCILLATION** : corek ler e.

- **OF VERB** : rawe.

MODEL, *n.* : nimûne, nexşe, modêl.

MODEL, *vt.* : nimûne kirin.

MODELER, *n.* : nîşankera cilan.

MODENA, *n.* : binefşiyê tarî.

MODERATE, *n., adj.* : nermenîşk, nîvnîve, negiran, navîn, hedar, nerm, navîn.

MODERATE, *vt.i.* : nerm kirin, hedar kirin, serokatiya civînekê kirin, navîn kirin.

MODERATED, *adj.* : nermkirî.

MODERATELY, *adv.*: bi nermî, bi navînî, navînkî.

MODERATENESS, *n.* : nermenişkîtî, navînîtî.

MODERATING, *n.* : nermenîşkirin, navînkirin.

MODERATION, *n.* : hêwarîn, hawsanî, navînî.

MODERATO, *adj., adv.*: hedar, nerme rêbaz, navîn.

MODERATOR, *n.* : hêwrênk.

MODERN, *n., adj.* : nûwîn, nû, nî, nûhîn, nûjen, taze, nûwê, nivar.

MODERNESS, *n.* : nûjenîtî, nûbûn, nîbûn.

MODERNISM, *n.* : nûjenîtî.

MODERNIST, *n.* : nûjenkar.

MODERNISTIC, *adj.* : nûjenkarî.

MODERNITY, *n.* : nûjenî.

MODERNIZATION, *n.* : nûjenkirin.

MODERNIZE, *vt.i.* : nûjen kirin.

MODERNIZER, *n.* : nûjenkar.

MODEST, *adj.* : bêfêz nefsbiçûk.

MODESTLY, *adv.*: bi bêfêzî, bêfêzkî, nefsbiçûkî.

MODESTY, *n.* : bêfêzî, bêfêziyetî.

MODICUM, *n.* : tibabek kêm yan biçûk.

MODIFIABLE, *adj.* : guhêrbar.

MODIFICATION, *n.* : guhorînkarî, goorankarî, rastkirin.

MODIFIER, *n.* : guhêr, nermker, rastker.

MODIFY, *vt.* : rast kirin, nerm kirin, guhorîn.

MODISH, *adj.* : nûjen, mode, baw.

MODIST, *n.* : dirûnkerê nûjen yê cilên jinan.

MODULATE, *vt.i.* : dengî guhorîn, rast kirin, derbaz bûn (ji awazekê bo êke dî).

MODULATED, *adj.* : dengguhartî.

- **WAVE** : pêla dengê guhartî.

MODULATION, *n.* : şiqîn, şeqîn, kotkirin, dengguhorîn, deng goncandin yan rastkirin.

MODULATOR, *n.* : guhêr.

MODULATORY, *adj.* : guhêrkar.

MODULAR, *adj.* : pîvayî.

MODULE, *n.* : yekeya pîvanê, guhêzoka heyvê.

MODULUS, *n.* : pîver, pêwer, hawkolke.

- **OF ELASTICITY** : pîverê çiriyê.

- **OF RIGIDITY** : pîverê reqiyê.

MODUS VIVENDI : rêbaza jiyanî, pêkhatina demdar.

MOF(F)ETTE, *n.* : kuna li ser erdî ko duwem oksîdê karbonî û hindek nîtrojen û oksîjen jê derdikevit.

MOGUL, *n., adj.* : Mexol, teftik.

MOHAIR, *n.* : merez.

MOHO, *n.* (Mohorovicic discontinuity) (geol.) : neberdewamiya rû û qalkê zemînê (yan navbera kevrên bazeltî û kevrên hindurî).

MOHOCK, *n.* : kevnecerbezê şevêyê xanedanê London (seda 18).

MOHOLE, *n.* : kuna pêşniyazkirî bo kolanê ji binê deryayî ta qalkê zemînê.

MOHS' SCALE, *n.* : pêstirka Mohs (ya reqiya kanan).

MOIETY, *n.* : nîv, parçe.

MOIL, *n.* : rêncberî.

MOIL, *vt.* : rêncberî kirin, pîs kirin, şil kirin (karê teqnê).

MOILER, *n.* : rêncber (karê teqnê...).

MOILING, *n.* : zehmet kêşî, rêncberî, kedkirin.

MOIRE, *n., adj.* : perûkê pêlkirî, pêlkirî, wêneyê pêlkirî (li ser pûlî).

MOIST, *adj.* : ter, şil, şê, tem, şil û mil.

MOISTEN, *vt.i.* : şil kirin, ter kirin.

MOISTENED, *adj.* : şilkirî, temkirî.

MOISTENING, *n.* : şikirin, temkirin.

MOISTNESS, *n.* : şilîtî.

MOISTLY, *adv.*: bi şilî, şilkî.

MOISTURE, *n.* : xunav, şilatî, terî, xîsar, şê, şilî, şilîtî.

MOISTURIZE, *vt.* : ter kirin, şil kirin.

MOLAL, *adj.* : gerdî, pêwendîdarê gerdîgiranî (di nav litrek qijilandarî de).

MOLAR, *adj.* : gerdîgiranî.

MOLAR, *n.* : hêran, didanê hêranê.

- **TOOTH** : didanê kursî yan hêranê.

MOLARITY, *n.* : peytiya gerdîgiranî (di nav litrek qijilandarî de).

MOLASS(ES), *n.* : celaqî (doşava kelandî).

- **ICED ~** : befirdoşav.

- **SWEET ~** : herîr.

MOLD, *n.* : gûfik, genîbûn, darêje, dariştin.

- **BOARD** : depê dariştina çimentoyê, asinkê gêsinî yê ko axê radikit û werdigêrit.

MOLDER, *vi.* : rizîn, genî bûn.

MOLDINESS, *n.* : genîbûn.

MOLDING, *n.* : dariştin, selende, sivîng.

MOLDY, *adj.* : rizok, genî.

MOLE, *n.* : korebeşk, koremişk, xal, mol, avahiyê mezin, kêşana gerdîgiranî, qulind.

- **SKIN** : kurkê koremişkî.

MOLECULAR, *adj.* : gerdî.

- **WEIGHT** : kêşa gerdî.

MOLECULE, *n.* : gerd.

MOLEHILL, *n.* : girkê korebeşkî.

- **TO MAKE A MOUNTAIN OUT OF A ~** : pirs yan giriftarî mezin kirin.

MOLEST, *vt.* : caris kirin, şepirze kirin, tengav kirin.

MOLESTATION, *n.* : cariskirin, daberzîn, tengavkirin.

MOLESTING, *n.* : cariskirin.

MOLINE, *adj.* : serik tûj û pan yê paşçemayî.

MOLL, *n.* : dê(h)l, qehpe, yara rêgirî, leyiztok.

MOLLIENISIA, *n.* : masiyek rengîn e.

MOLLIFICATION, *n.* : hedarkirin, hawîşkirin, mitkirin.

MOLLIED, *adj.* : hawîşkirî.

MOLLIFY, *vt.* : hedar kirin, hawîş kirin, mit kirin.

MOLLUSC, *n.* : canewerê nermik (wek şeytanokî).

MOLLUSCAL, *adj.* : pêwendîdarê canewerê nermikî.

MOLLUSCOID, *adj.* : nermikî (wek şeytanokî).

MOLLUSCOUS, *adj.* : nermikî.

MOLLY OR MOLLIE, *n.* = **MOLLIENISIA**.

MOLLY, *n.* : mêrik yan kurikê nêrmok.

- **CODDLE** : nazdar kirin.

MOLT, *vi.t.* : mû yan per jî bo demekê havêtin yan werhandin.

MOLTEN, *adj.* : buhujî, givaştî.

- **SNOW** : lox.

MOLY, *n.* : helezek efsaneyîhêz û cadûyî yê rihreş û gulspî ye.

MOLYBDENNE, *n.* : kanek şîn e (molîbdîn).

MOLYBDENUM, *n.* : molîbdînom : hêmanek metalî wek kromî ye (bo qayimkirina polayî).

MOMENT, *n.* : zebir, gav, çirke, nizûke, bîstek, kêlîk, bêhnek, taw, birûke, pêlek.

- **OF COUPLE** : zebra cotbûnê.

- **OF FORCE** : zebra hêzê.

- **OF INERTIA** : zebra berdewamiyê.

- **OF DEATH** : merg, akamî.

- **THE MAN OF THE ~** : mêrê demjimêrê (gavê).

- **THE ~ THAT** : gava.

- **TO THE ~** : di demî de.

MOMENTARILY, *adv.*: gavdarî, gavîkî.

MOMENTARY, *adj.* : gavî, katî.

MOMENTLY, *adv.*: hergav, gavekê, gav bi gav.

MOMENTOUS, *adj.* : (bêqam)giring.

MOMENTOUSLY, *adv.*: bi giringiya bêqam, giringkî.

MOMENTOUSNESS, *n.* : giringîtiya bêqam.

MOMENTUM, *n.* : tewjim.

MOMUS, *n.* : Momos : Xudayê tiraneyê (li nik Girekan).

MON(O)-, *pref.* : pêşgir e ko yek e.

MONACHAL, *adj.* = **MONASTIC**.

MONACHISM, *n.* = **MONASTISM**.

MONAD, *n.* : hêman, gerdîle yan riha yek hevhêzî, yeke, hûrik, yek, gewherê yek (li nik mirovên berê), yek jî hêmanên seretayên hebûnê(li nik hindek jirzanan).

MONADIC, *adj.* : yekeyî.

MONADISM, *n.* : yekeyîtî.

MONADELPHOUS, *adj.* : yekbira (helezên hevbask).

MONADNOCK, *n.* : banikê erdê rûtkirî.

MONANDROUS, *adj.* : yekmêr (şûkirin), yekmêrik (helez e).

MONANDRY, *n.* : yekmêrî (şûkirin).

MONARCH, *n.* : şah, qiral, şahbanû : pelpelîtkek mezin e.

MONARCHAL, *adj.* = **MONARCHIAL** (şahî, qiralî).

MONARCHIC(AL), *adj.* : şahî, qiralî.

MONARCHISM, *n.* : şahîtî, qiralîtî.

MONARCHIST, *n., adj.* : şahî, qiralî.

MONARCHY, *n.* : qiralîtî, şahîtî, padîşahî.

MONARDA, *n.* : pûng yan pîngê emerîkanî.

MONASTERIAL, *adj.* : dêrî.

MONASTERY, *n.* : dêr.

MONASTIC, *adj.* : rebenî, dêrî.

NUCLEIN, *n.* : kakilîn (nafikîn) : madeyek e ko ji kakila xaneyan dihînin der.

NUCLEOLAR, *adj.* : kakilî, nafikî.

NUCLEOLATE, *adj.* : nafikî, kakilî.

NUCLEOLATED, *adj.* : kakilîkirî.

NUCLEOLE, *n.* : nafikok, kakilk, (di nav kakilek dîda).

NUCLEOLUS, *n.* : kakilok, kakilk, nafikok.

NUCLEON, *n.* : nafikok.

NUCLEONICS, *n.* : kakilzanî, nafikzanî (gerdîle).

NUCLEOPHILE, *adj.* : kakilxwaz.

NUCLEOPLASM, *n.* : plazma (xwînav) ya kakilî yan nafikî.

NUCLEOPROTIN, *n.* : protînê nafikî yan kakilî.

NUCLEUS, *n.* : nawok, kakil, nafik, sîsk.

NUCLIDE, *n.* : kakil, nafik.

NUCLIDIC, *adj.* : (şikil) kakilî.

NUDE, *adj.* : rîs, rût, zilît, tazî, kot, rûs.

NUDELY, *adv.*: bi rîsî, bi rûtî, rûtkî.

NUDENESS, *n.* : rîsîtî, rûtîtî.

NUDGE, *n.* : paldan.

NUDGE, *vt.* : pal dan.

NUDIBRANCH(IA), *n.* : ximximrût.

NUDISIM, *n.* : rîsîtî, rûtîtî, rûsîtî.

NUDIST, *n.* : rîskar, rûtkar, rûskar.

NUDITY, *n.* : rîsîtî, rûtîtî, taziti, rûtayî.

NUGATORY, *adj.* : pûç, bêbiha, nehêja.

NUGGAR, *n.* : belemek berahî pan û mezin.

NUGGET, *n.* : kerê zêrî, axa zêr.

NUISANCE, *n.* : carisî, cariskirin, tengavkirin, azar.

- **TAX** : bacakîndar : ko êkser ji têberî distînin.

NUKE, *n.(sl.)* : bombaya gerdîleyî.

NULL, *n., adj.* : pûç, nerewa.

- **AND VOID** : helweşandî, helweşayî.
- **POINT** : xalka sifrê, xalka temirînê (vekujînê).
- **VALENCE** : hevhêz, sifir.

NULLA, *n.* : şînkê dar.

NULLAH, *n.* : celal, nihal.

NULLIFICATION, *n.* : helweşandin, rakirin.

NULLIFIDIAN, *n., adj.* : mirovê bê ayîn yan ol.

NULLIFIED, *adj.* : helweşandî.

NULLIFY, *vt.* : helweşandin.

NULLIFYING, *n.* : helweşandin.

NULLIPARA, *n.* : jina jêrebiçûknebûyî.

NULIPAROUS, *adj.* : stewr.

NULLIPORE, *n.* : şiklek helezî ko dişêt sincûvî derbikit.

NULLITY, *n.* : neman, pûçkirin, tunebûn, nebûn.

NULL LINE, *n.* : hêla temirînê yan vekujînê.

NULL PLANE, *n.* : rêkarê temirînê.

NUMB, *adj.* : mit, bêhiş, bêhest.

- **FISH** : tîrêja kehrebî yan torpido.

NUMB, *vt.* : mit bûn.

NUMBER, *n.* : hejmar, jimar, jimare, renûs.

- **ABSOLUTE ~** : hejmara reha yan bijin.
- **BY THE ~ S** : bi rêzikî yan alavkî.
- **COMPLEX ~** : hejmara aloz yan awête.
- **DECIMAL ~** : hejmara şikesti.
- **HIS ~ IS UP** : li ber mirinê ye.
- **INTEGER ~** : hejmara tekûz.
- **TO LOOK AFTER ~ ONE** : guhê xwe dan serokî.
- **THEORY** : dîtaneya jîmareyên tekûz.
- **WHOLE ~** : jîmareya tekûz.
- **WITHOUT ~** : bêqam, bê hejmar.

NUMBER, *vt.* : hejmartin.

NUMBERED, *adj.* : hejmartî.

NUMBERER, *n.* : hejmarker.

NUMBERING, *n.* : hejmarkirin.

- **SIGNS OR MARKS** : nîşandank.

NUMBERLESS, *adj.* : bêhejmar, bêqam gelek.

NUMBER OF PEOPLE, *n.* : mixrîk.

NUMBING, *n.* : tezînok.

NUMBINGLY, *adv.*: bi sirî, bi bêhişî, tezînkî.

NUMBLY, *adv.*: bi bêhişî.

NUMBNESS, *n.* : sirbûn.

NUMDAH, *n.* : tatiyê xemilkirî.

NUMEN, *n.* (*pl.* numina) : giyan yan hêza Xudayî.

NUMERABLE, *adj.* : hejmardar yan hejmarbar.

NUMERAL, *n.* : hejmar, jimar(e).

NUMERALLY, *adv.*: bi hejmarî.

NUMERARY, *adj.* : hejmarî.

NUMERATE, *vt.* = **ENUMERATE** : hejmartin.

NUMERATED, *adj.* : hejmarkirî, hejmartî.

NUMERATING, *n.* : hejmarkirin, hejmartin.

NUMERATION, *n.* : hejmartin.

NUMERATOR, *n.* : sere, serbeş.

NUMERIC, *n.* : jimar.

NUMERICAL, *adj.* : jimareyî, hejmarî, jimarîn.

NUMERICALLY, *adv.*: bi hejmarî, hejmarkî.

NUMEROLOGICAL, *adj.* : hejmarî.

NUMEROLOGIST, *n.* : hejmarzan.

NUMEROLOGY, *n.* : hejmarzanî.

NUMEROUS, *adj.* : zehf, pir, gelek, boş, zor, fireh, bêqam.

NUMEROUSLY, *adv.*: bi zehfî, firehî, gelekî yan zorî.

NUMEROUSNESS, *n.* : boşîtî, zehfîtî, firehî, gelekîtî, bêqamîtî, boşakî.

NUMINOUS, *n.* : pîroz, giyanî.

NUMISMATIC, *adj.* : diravî, pareyî.

NUMISMATICS, *n.* : diravzanî, dirav û medalîzanî.

NUMISMATIST, *n.* : diravzan.

NUMISMATOLOGY, *n.* : parezanî, diravzanî.

NUMMARY, *adj.* : diravî, pareyî.

NUMMET, *n.* : têşt yan firavîn.

NUMMILITIC (LIMESTONE), *adj.* : kevirê çîna rojgarê sêyemê crdî.

NUMMULAR, *adj.* : çemereyî yan hêkeyî.

NUMMULARY, *adj.* : çemereyî, cixizî yan hêkeyî.

NUMMULITE, *n.* : qalkê berdîneyê wek sewkê (ji endamkê kunîleyê çîna erdiya sêyem).

NUMNAH, *n.* : perûkê bin xurcezînî.

NUMSKULL, *n.* : serê mirovê gewç, xirpo.

NUN, *n.* : reben, perîstar.

- **BUOY** : seravka nîv girûvîr û rex nişîv.
- **'S CLOTH** : perûkê tenikê hirî.
- **LIKE** : wek rebenê.
- **'S THREAD** : tayê ziravê pembûyê dirûnê.
- **'S VEILING** : perûkê tenikê kirasî.

NUNATAK, *n.* : serê kevirê ji bin befrê yan seholê derketî.

NUNCIATURE, *n.* : balyozxaneya papayî, şandiyê papayî.

NUNCIO, *n.* : balyozê papayî.

NUNCLE, *n.* : ap, mam.

NUNCUPATE, *vt.* : qewîtî yan rasipêrî li zarokî kirin yan (bi devkî) agehdar kirin.

NUNCUPATIVE, *adj.* : bi devkî (ne nivîskî).

NUNHOOD, *n.* : rebenî.

NUNNERY, *n.* : rebengeh.

NUNNISH, *adj.* : (wek) rebenê.

NUNSHIP, *n.* : rebenî.

NUPTIAL, *n., adj.* : bûkînan, şûkirin.

- **PLUMMAGE** : rengbûna perên nêrebalindeyê.

NUPTIALITY, *n.* : têkraya şûkirinê.

NURSE, *n.* : nexoşevan, dadok, dayîn, nexoşnêr, peristar.

- **MAID** : dadok.

NURSE, *vt., i.* : mêtin (mêjtin), mêjandin, sexbîrî kirin.

- **TO ~ A COLD** : persîve çare kirin (li germiya malê).

NURSED, *adj.* : mêjandî.

NURSER, *n.* : peristar, sexbîrkar.

NURSERY, *n.* : koşgireh, dayîngeh, şitilgeh.

- **MAID** : dadok, koşgir.
- **MAN** : xudanê şitilgehê.
- **PLANT** : şitil, derkik, derik.
- **RHYME** : lorî.
- **SCHOOL** : dayîngeh.
- **SHARK** : texlîtek sêmasî.

NURS(E)LING, *n.* : şîrmij, bermak, sava, memikmijîn.

NURSING, *n.* : berşîr, memikandin, meyterî, mêjandin, mêjtin, nexweşnêrî, şîrdan.

- **BOTTLE** : şûşeyê şîrî.

NURTURE, *n.* : qît, xudankirin, xwarindan, xwarandin, perwerde.

NURTURE, *vt.* : xwarin dan, xudan kirin.

NURTURED, *adj.* : xurekkirî, xwarandî, xudankirî.

NURTURING, *n.* : xurekkirin, xwarandin, xudankirin.

NUT, *n.* : giriftarî, dînoke, pêçgir.

NUT, *n., vt.* : guwêz, kakila guwêzî, guwêzan kom kirin serê mirovî, gewc, giwêz.

- **A HARD ~ TO CRACK** : giriftariya sext, mirovê neşikestok.
- **BUTTER ~** : guwêznîvişk.
- **CRACKER** : guwêzşkên.
- **FOR ~S** : êkcar ne.
- **GALL** : mazî.
- **GRASS** : giyaguwêz (rih wek guwêzan e), pîvok.

- OFF HIS ~ : serxoş, mest, dîn.

- OIL ~ : guwêza rûnî.

- TO BE ~ S OR DEAD~S ON : şad.

- TREE : darguwêz, darê gîzê yan giwêzê.

NUTANT, *adj.* : dahêlayî, şorbûyî.

NUTATE, *vi.* : şor kirin, dahêlan, serî çemandin.

NUTATED, *adj.* : serçemandî.

NUTATING, *n.* : serçemandin.

NUTATION, *n.* : serşorî (dahêlan) ji ber xewê.

NUT-BROWN, *adj.* : qehweyî, genimî.

NUT HATCH, *n.* : guwêzşikên : balindeyek guwêzxwer e.

NUTLIKE, *adj.* : guwêzî (wek guwêzê).

NUTLET, *n.* : guwêzk.

NUT MEG, *n.* : guwêza bêhnxweş.

- APPLE : berê darguwêza bêhnxweş.

- TREE : darguwêza bêhnxwêş.

- LIVER : cergnesaxî.

NUTPICK, *n.* : kakilgir.

NUTRIA, *n.* : kevl yan qijkê seavî.

NUTRIENT, *adj.* : xurekî.

NUTRIMENT, *n.* : xurek, xwardemenî.

NUTRIMENTAL, *adj.* : xurekî.

NUTRITION, *n.* : xurek, xwarin, xwarandin.

NUTRITIONAL, *adj.* : xwarandinî.

NUTRITIONALLY, *adv.*: bi xwarandinî.

NUTRITIONIST, *n.* : xurekzan.

NUTRITIOUS, *adj.* : xurekî.

NUTRITIOUSLY, *adv.*: bi xurekî.

NUTRITIOUSNESS, *n.* : xurekîtî.

NUTRITIVE, *adj.* : xurekdar.

NUTRITIVELY, *adv.*: bi xurekdarî, xurekdarekî.

NUTS AND BOLTS, *n.* : hêman yan alavên karî.

NUTSHELL, *n.* : kelpikê guwêzê.

- IN A ~ : kurt û kirmancî.

NUTTINESS, *n.* : dînokîtî, têrguwêzî.

NUTTY, *adj.* : têrguwêz, guwêzî, gêre, dînoke.

NUX VOMICA : guwêza veriştinê, darê dermanê isterkininê, berê vê darê.

NUZZLE, *vt.i.* : bi difnê (pozê) kolan, kar kirin, difna xwe kirin nav axê de (wek berazî).

NUZZLED, *adj.* : bi difnê karkirî.

NUZZLING, *n.* : (bi difnê) karkirin.

NYALA(S), *n.* : texlîtek pezkûvî ye.

NYCT-, NYCTI-, NYCTO-, *pref.* : pêşgir e ko şev e.

NYCTALOPIA, *n.* : şevkoreyî.

NYCTALOPIC, *adj.* : şevkore.

NYCTITROPIC, *adj.* : şevger.

NYLGHAU, *n.* = NIGLAI (INDO-EUR : NYL : BLUE, GAI : GA OR GE).

NYLON, *n.* : goreyên naylon : madeyek çêkirî ye, tayê qayim û nerm e bo tevnî û nermokî.

NYMPH, *n.* : perî, zerî, kirmoke.

- LIKE : wek periyê.

NYMPHALID, *n.* : pelpelîtk.

NYMPHEAN, *adj.* : wek perî.

NYMPHET, *n.* : periya pispor.

NYMPHISH, *adj.* : wek periyê.

NYMPHO, *n.(sl.)* = NYMPHOMANIAC.

NYMPHOLEPSY, *n.* : perîharî, hariya sozyarî, hariya mirovê periyê cadû dikir (efsane).

NYMPHOLEPTIC, *adj.* : pêwendîdarê perîhariyê.

NYMPHOMANIA, *n.* : heşîr, heşerî.

NYMPHOMANIAC, *n., adj.* : heşer.

NYSTAGMIC, *adj.* : pêwendîdarê lerziya topka çavî.

NYSTAGMUS, *n.* : lerza topka çavî.

NYX, *n.* : Xudabanûya şevê (di efsaneya romayî de).



O, o : tîpa pazdehema elfabeya înglizî.

O, *interj.* : hey !.

O(O)-, *pref.* : pêşgir e ko hêk e.

OAF, *n.* : zarokê ecineyê, berdêlê zarokî, sade, gewc.

OAFISH, *adj.* : xirpo, sade.

OAFISHNESS, *n.* : gewcîtî.

OAK, *n.* : berû, dar berû, çilî, çilo, palîte, berî.

- **APPLE** : sêva berûyî : pirzika li ser darberûyî ko mêşberû çêdikit.
- **BRANCH** : deqelok.
- **FIG** : hêjîra berû : pirzika li ser darberûyî.
- **GALL** : barû, mazî.
- **MOSS** : kivarka berûyî : pirzika darberûyî.
- **PLUM** : hilîk yan helojeya berûyî : pirzika darberûyî.
- **POTATO** : kartola berûyî : pirzika darberûyî.
- **SPANGLE** : teyisoka berûyî (pirzik).
- **TIMBER** : darberû.
- **TREE** : darberû.
- **WART** : pirzika berûyî ko mêşberû çêdikit.
- **WILT** : nesaxiya dijwara darberûyî : çilmisîn, bêrengî û belg werhan ji ber kivarkî.
- **WOOD** : darberû.

OAKEN, *adj.* : berûyî.

OAKLET, *n.* : berûk (berûya biçûk).

OAK-LEAF CLUSTER, *n.* : medaliya belgê berû.

OAKLING, *n.* : berûk.

OAKUM, *n.* : benê kevnewerîsî.

OAR, *n.* : şelpî, sewl.

- **CHAINED TO THE ~** : zehmetkêş.
- **TO LIE OR REST ON THE ~** : vesihîn, bêhna xwe vekirin.
- **TO PUT ONE'S ~ IN** : têkilî berhevdanê bûn.
- **TO SHIP ~ S** : sewl yan şelpî li cihî danan.

OAR, *vt., i.* : sewl kirin, şelpî kirin.

OARED, *adj.* : şelpîkirî, sewlkirî.

OARFISH, *n.* : şelpîmasî, sewlmasî (texlîtek masî ye).

OARLESS, *adj.* : bêsewl, bêşelpî.

OARLOCK, *n.* : malka sewlî yan şelpî.

OARSMAN, *n.* : sewlvan, şelpîvan.

OARSMANSHIP, *n.* : sewlvanî, şelpîvanî.

OARSWOMAN, *n.* : sewlvan, şelpîvan (jin).

OARSWOMANSHIP, *n.* : sewlvanî, şelpîvanî (jin).

OASIS, *n.* : mêrg (nexasme li çolê yan sehrayê).

OAST, *n.* : kûrheyê zuhakirina giyadînarî.

- **HOUSE** : xanîkê kûrheyê yê zuhakirina giyadînarî.

OAT(S), *n.* : cehdarî, çewdar, cehdasî, wilêre, perişt, xirpok.

- **CAKE** : kiloca çewdarî.
- **GRASS** : giya çewdar.
- **MEAL** : danê çewdarî.
- **STEM** : baskê çewdarî.
- **TO FEEL ONE'S ~ S** : şad û çalak hiş kirin.
- **TO SOW ONE'S WILD ~** : serserî bûn (serserîtî kirin).

OATEN, *adj.* : çewdarî.

OATH, *n.* : sond.

- **TAKING** : sondxwarin, sonddan.

OB-, *pref.* : pêşgîr e ko vajî ye.

OBBLIGATO, *n., adj.* : xurt, kotekî, necudabar (mûzîqe : ji note yan awaza nivîsî), pêviyayî, gerek.

OBCONIC(AL), *adj.* : qoçekiyê ser û bin.

OBCORDATE, *adj.* : wek dilî.

OBDURACY, *n.* : rikdarî, dilreqî, gunehkarî.

OBDURATE, *adj.* : rikdar, dilreq, gunehkar.

OBDURATELY, *adv.*: bi rikdarî.

OBDURATENESS, *n.* : rikdarîtî.

OBEDIENCE, *n.* : rajêrbûn , rambûn , mildan, guhdarî, bihîstyarî.

OBEDIENT, *adj.* : ram, mildayî, bihîstyar.

OBEDIENTLY, *adv.*: bi mildanî.

OBEDIENTIARY, *n.* : erkdarê (olî) yê ko li jêr rêberiya oldarekê li dêrê karkirin.

OBEDIENTLY, *adv.*: bi mildanî, bi rambûnî.

OBEISANCE, *n.* : çîzbûn , bindestî.

OBEISANT, *adj.* : çîzbûyî.

OBEISANTLY, *adv.*: bi çîzbûnî, çîzbûnkî.

OBELIA, *n.* : canewerek seretayî yê deryayî ye (wek darî kom dibit).

OBELISK, *n.* : kokel.

OBELIZE, *vt.* : nîşan kirin (bi (-) yan %), peyiv yan bendên bi guman.

OBELIZED, *adj.* : nîşankirî.

OBELIZING, *n.* : nîşankirin.

OBELUS, *n.* : nîşana (-) yan (%) ko berê bi kar dihînan bo peyivên bi guman.

OBERON, *n.* : qiralê folklorî yê periyan.

OBESE, *adj.* : qelew.

OBESITY, *n.* : qelewî(tî).

OBEY, *vt., i.* : mil dan, guh dan.

OBEYED, *adj.* : mildayî.

OBEYER, *n.* : mildayî.

OBEYING, *n.* : mildan.

OBFUSCATE, *vt.* : reş kirin, şaş kirin.

OBFUSCATED, *adj.* : şaşkirî.

OBFUSCATING, *n.* : şaşkirin.

OBFUSCATION, *n.* : şaşbûn .

OBFUSCATORY, *adj.* : şaşî.

OBIT, *n.* = **OBITUARY**.

OBITER, *adv.* : bo axiftinê yan gotinê, û bi vê helketinê.

- **DICTUM** : hizra (ne biryara) dadwerî.

OBITUARIST, *n.* : behîker, şînîker.

OBITUARY, *n.* : şînî (li gel kurtejînnameyê).

OBJECT, *n.* : heyber, armanc, amanc, tişt, şit, pêkirî, têker, têrker, berkar, mebest.

- **BALL** : tepka armanc.

- **FINDER** : peydakera heyberî (kamêra...).

- **GLASS** : nîskeya heyber.

- **LESSON** : waneya kirdarî, têr serhatî (nimûneya kirdarî ya seretayekê).

- **PLATE** : depkê heyberî (ko tiştî li ser dadinin bo dîtinê).

- **STAFF** : darê rastkirinê (yê pîverî).

OBJECT, *vt., i.* : berhelistî kirin, bergirî kirin.

OBJECTIFICATION, *n.* : heyberîkirin.

OBJECTIFIED, *adj.* : heyberîkirî.

OBJECTIFY, *vt.* : heyberî kirin.

OBJECTIFYING, *n.* : heyberîkirin.

OBJECTING, *n.* : berhelistî, berrabûn , berperç, bergirî.

OBJECTION, *n.* : berperç, berhelistî, berrabûn .

OBJECTIONABLE, *adj.* : berperçbar, berhelistîbar, kirêt.

OBJECTIONABLENESS, *n.* : berhelistîbarî(tî), berperçbarîtî.

OBJECTIONABLY, *adv.* : bi berhelistînbarî, bi berperçbarî.

OBJECTIVE, *n., adj.* : armanc, heyber(î), babetî, mebest.

- **LENS** : niskeya heyberî.

- **POINT** : xalka heyberî.

OBJECTIVELY, *adv.* : bi heyberî, heyberîki.

OBJECTIVENESS, *n.* : heyberîtî.

OBJECTIVISM, *n.* : heyberîtî.

OBJECTIVIST, *n.* : heyberî (mirov).

OBJECTIVISTIC, *adj.* : heyberiyî (pêwendîdarê mirovê heyberî).

OBJECTIVITY, *n.* : heyberîtî.

OBJECTLESS, *adj.* : bêarmanc, bêheyber, bêmebest.

OBJECTNESS, *n.* : heyberîtî.

OBJECTOR, *n.* : berhelist, berrabûyî, berperçker.

OBJET D'ART, *n.* : heyber yan tiştê hunerî.

OBJURGATE, *vt.* : (dijwar) têxurîn.

OBJURGATION, *n.* : têxurîn.

OBJURGATORY, *adj.* : têxurînî.

OBLANCEOLATE, *adj.* : rimikî-serûbinî.

OBLATE, *adj.* : pan û serperitî.

OBLATE, *n.* : xizmetkarê dêrê.

OBLATENESS, *n.* : nizmîtî, panîtî (li nik teweran).

OBLATION, *n.* : qurbanî, gorîkirin, pêşkêşî : bo meremek ayînî yan xêrxwazî.

OBLIGATE, *vt.* : derbest kirin.

OBLIGATE, *adj.* : pêviyayî, gerek.

OBLIGATED, *adj.* : derbestkirî.

OBLIGATELY, *adv.* : bi pêviyayî yan gerekî.

OBLIGATING, *n.* : derbestkirin, gerekîkirin, pêviyayîkirin.

OBLIGATION, *n.* : qebale, best, vexwegirtin, erk, tewzîm, belên.

OBLIGATIONAL, *adj.* : belênî, erkî.

OBLIGATORY, *adj.* : kotek, zoremilî, zorkî, kotekî, bêhemd, pêwîst, vîn, tewzim.

OBLIGE, *vt.* : derbest kirin.

OBLIGED, *adj.* : derbestkirî, neçar.

OBLIGEE, *n.* : derbest bo kirî (derbestkirî).

OBLIGING, *adj.* : qenc, rûmetdar, destfireh, taze.

OBLIGINGLY, *adv.* : bi qencî.

OBLIGINGNESS, *n.* : qencîtî.

OBLIGOR, *n.* : peyivdar, belêndar.

OBLIQUE, *adj.* : lader, ladaw, lar, nişîv, xwehr (xahr).

- **ANGLE** : goşeya lar.

- **PROJECTION** : ketingeh yan xistinî lar.

OBLIQUE, *vi.*: xwehr (xahr) yan lar bûn.

OBLIQUELY, *adv.* : bi xwehrî yan larî.

OBLIQUENESS, *n.* : xwehrîtî, larîtî, larbûn .

OBLIQUITY, *n.* : xwehrîtî, larîtî.

- **OF THE ECLIPTIC** : larîtiya hêlkeyî.

OBLIQUUS EXTERNUS ABDOMINIS, *n.* : qepirxe.

OBLITERATE, *vt.* : qirandin, nehêlan, heşifandin, birhandin.

OBLITERATED, *adj.* : heşaftî, heşifandî, qirandî, birhandî.

OBLITERATION, *n.* : heşifandin, qirandin, birhandin.

OBLITERATIVE, *adj.* : qutkirinî, qirkirinî, birhandinî.

OBLIVION, *n.* : feramoş, lêborîn, matbûn .

- **FALL INTO ~** : ji bîr çûn, (êdî) bi kar nehînan, (dihêt) ji bîr kirin.

OBLIVIOUS, *adj.* : mat, şaş, feramoşkar.

- **TO** : hay jî xwe ne, neagedar.

OBLIVIOUSLY, *adv.* : bi matî, bi şaşî.

OBLIVIOUSNESS, *n.* : matîtî, şaşîtî.

OBLONG, *n., adj.* : lakêşe (rexên nêzîk hev ne yeksan e).

OBLOQUY, *n.* : riswa, şerm.

OBMUTESCENCE, *n.* : mitiya rikdar.

OBNOXIOUS, *adj.* : kirêt, kîndar, golor.

OBNOXIOUSLY, *adv.* : bi kindarî, kîndarkî.

OBNOXIOUSNESS, *n.* : kîndarîtî.

OBNUBILATE, *vt.* = **BECLOUD** (tarî kirin, veşartin, ewr kirin).

OBNUBILATED, *adj.* : tarîkirî, ewrkirî.

OBNUBILATING, *n.* : tarîkirin, ewrkirin.

OBNUBILATION, *n.* : tarîkirin, ewrkirin.

OBOE, *n.* : zirna, zurna (yan zirne û zurme).

OBOEIST, *n.* : zirnavan.

OBOL, *n.* : diravek Girekî (şeşyeka derhemî).

OBOVATE, *adj.* : hêkî (vajî wek hindek meyweyan).

OBSCENE, *adj.* : tirek, çepel, pîs, kirêt, xirabkar.

OBSCENELY, *adv.* : bi tirekî.

OBSCENENESS, *n.* : tirekîtî.

OBSCENITY, *n.* : tirekîtî, xirabkarîtî.

OBSCURANT, *n., adj.* : giroker, tarîkarî (dijpêşketin).

OBSCURANTISM, *n.* : tarîkarî, gîrokirin.

OBSCURANTIST, *n.* : gîrokar.

OBSCURE, *n., adj.* : şêlî, tarî, nediyar, veşartî, nenas, nepenî, lêl.

OBSCURE, *vt.* : veşartin, tarî kirin.

OBSCURED, *adj.* : veşartî.

OBSCURELY, *adv.* : bi veşartî.

OBSCURENESS, *n.* : veşartinîtî.

OBSCURING, *n.* : veşartin, tarîkirin.

OBSCURITY, *n.* : tarîtî, cudayî, dûrî, şêlî, nenasî, kesnezanîtî.

OBSECRATION, *n.* : germelave.

OBSEQUIES, *n.* : term, darbest.

OBSEQUIOUS, *adj.* : rûbaz, tepeser.

OBSERVABLE, *adj.* : zêrevanbar, sehkirinbar.

OBSERVABLY, *adj.* : bi zêrevanî.

OBSERVANCE, *n.* : zêrevanî.

OBSERVANCY, *n.* : zêrevanî(kirin).

OBSERVANT, *n., adj.* : zêrevan, têbîn.

OBSERVANTLY, *adv.* : bi zêrevanî.

OBSERVATION, *n.* : zêrevanî, nêrvanî, dîdevanî, pandîn.

- **BALLOON** : balona zêrevaniyê.

- **POST** : dîdgeh.

OBSERVATIONAL, *adv.* : zêrevanî.

OBSERVATIONALLY, *adv.* : bi zêrevanî.

OBSERVATORY, *n.* : zêrevangeh, dîdgeh, ruwangeh, nêrîngeh, pandîgeh, têbîn.

OBSERVE, *vt., i.* : zêrevanî kirin, temaşe kirin.

OBSERVED, *adj.* : zêrevanîkirî.

OBSERVER, *n.* : zêrevan, nêrevan, pavan, pandî, bîner, nêrînvan, dîdevan, çavdêr.

OBSERVING, *n.* : zêr, zêrevanîkirin, nêrevanî, çavdêrî, zêrevanîkirin.

OBSERVINGLY, *adv.* : bi zêrevanî yan nêrevanî.

OBSESS, *vt.* : hewes kirin.

OBSESSED, *adj.* : hewesdar.

OBSESSION, *n.* : hewes dîltepî, waswasî.

OBSESSIVE, *adj.* : hewesdar.

OBSESSIVELY, *adv.* : bi hewesdarî.

OBSESSIVENESS, *n.* : hewesdarîtî.

OBSIDIAN, *n.* : şûşeyê agirpijînê yê reş.

OBSOLESCE, *vi.* : kevn bûn.

OBSOLESCENCE, *n.* : kevnbûn , kevnatî.

OBSOLESCENT, *adj.* : kevn.

OBSOLESCENTLY, *adv.* : bi kevnî.

OBSOLETE, *adj.* : kevn, kûn, dêrîn, rizok.

OBSOLETED, *adj.* : kevnkirî.

OBSOLETENESS, *n.* : kevnîtî.

OBSOLETING, *n.* : kevnbûn .

OBSOLETISM, *n.* : kevnîtî.

OBSTACLE, *n.* : kosp, gîro, tegere, rêgir, berbest, berpêk.

- **RACE** : pêşbirkeya tegereyan, pêşbezîna berbestan.

OBSTETRIC(AL), *adj.* : dapîrî (pêwendîdarê dapîrê).

OBSTETRICALLY, *adv.* : bi dapîrî, dapîrkî.

OBSTETRICIAN, *n.* : dapîr, pijşkê biçûkbûnê.

OBSTETRICS, *n.* : dapîrîzanî.

OBSTINANCY, *n.* : rik, rikdarî, lasarî.

OBSTINATE, *adj.* : rikdar, lasar, sehend.

OBSTINATELY, *adv.* : bi rikdarî, rikdarkî.

OBSTINATENESS, *n.* : rikdarîtî.

OBSTREPEROUS, *adj.* : şemûz, sext, qîrûqîjî (qerqeşeyî).

OBSTREPEROUSLY, *adv.* : bi şemûzî yan qerqeşeyî, şemûzkî.

OBSTREPEROUSNESS, *n.* : şemûzîtî, qerqeşeyîtî.

OBSTRUCT, *vt., i.* : gîro kirin, rê girtin.

OBSTRUCTION, *n.* : tegere, gîrokirin, berbest, kosp, astengî, berpêk (lêdan).

OBSTRUCTIONISM, *n.* : gîrokirinîtî, tegereyîtî, berbestîtî.

OBSTRUCTIONIST, *n.* : gîroker.

OBSTRUCTIONISTIC, *adj.* : gîrokerî.

OBSTRUCTIVE, *n., adj.* : gîrokar, rêgir, gîrodar.

OBSRTRUCTIVENESS, *n.* : gîrokarîtî.

OBSTRUCTOR, *n.* : gîroker.

OBSTUPEFY, *vt.* : gewc yan xirpo kirin, bêhiş kirin.

OBTAIN, *n.* : standin, (bi) dest ketin.

OBTAIN, *vt.* : standin, peyda kirin, (bi) dest keftin.

OBTAINABILITY, *n.* : destketinbarîtî, standinbarîtî.

OBTAINABLE, *adj.* : destketinbar, standinbar.

OBTAINER, *n.* : standinkar.

OBTAINING, *n.* : standin, destxistin.

OBTAINMENT, *n.* : destgirkirin, standin, berpekirin.

OBTECT, *adj.* : kalankirî, req bergkirî.

OBTEST, *vt.* : hîvî kirin, lave kirin, gewah kirin, bêzarî kirin.

OBTESTATION, *n.* : lave, lavekî, hîvî.

OBTRUDE, *vt.* : mişexwerî kirin, diyar kirin, axiftin (bê rêdan yan destûr).

OBTRUDED, *adj.* : diyarkirî, derhatî.

OBTRUDER, *n.* : mişexwer.

OBTRUDING, *n.* : derhatin, diyarkirin, têkilbûn .

OBTRUSION, *n.* : diyarkirin, mişexwerî, têkilbûna bê destûr.

OBTRUSIVE, *adj.* : destketî (derhatî), mişexwer, zanxwaz.

OBTRUSIVELY, *adv.* : bi mişexwerî, bi derhatî.

OBTRUSIVENESS, *n.* : mişexwerîtî, diyarkirinîtî.

OBTRUNCATE, *vt.* : ser jê kirin.

OBTUND, *vt.* : kuh kirin.

OBTURATE, *vt.* : girtin, daxistin.

OBTURATION, *n.* : daxistin, girtin.

OBTURATOR, *n.* : serdevk.

- **NERVE** : demarê serdevk.

OBTUSE, *adj.* : vekirî, gelho, xirpo.

- **ANGLE** : goşevekirî, goşekiraw.

OBTUSELY, *adv.* : bi vekirinî.

OBTUSENESS, *n.* : vekiritî.

OBTUSITY, *n.* : vekiritî.

OBVERSE, *n., adj.* : rûber, beramber, binteng, rûyê diravî, rexê diyê rastiyê.

OBVERSELY, *adv.* : bi rûberî yan beramberî.

OBVERSION, *n.* : vajî.

OBVERT, *vt.* : wergêran (da ko rûyek nû diyar bikit).

OBVIATE, *vt.* : xwe vedan, nehêlan.

OBVIATED, *adj.* : nehêlayî.

OBVIATING, *n.* : nehêlan.

OBVIATION, *n.* : nehêlan, ewşandin, xwevedan.

OBVIOUS, *adj.* : eşkera, diyar, kifş, xûya, şanî, aşkar, belû.

OBVIOUSLY, *adv.* : bi eşkerayî.

OBVIOUSNESS, *n.* : eşkerayîtî.

OBVOLUTE, *adj.* : alandî, pêkhatî.

OCARIANA, *n.* : alavek mûzîqeyî yê sade (bayî ye).

OCCAM, ~'S RAZOR : seretaya ko kêmtir baştir e.

OCCASION, *n.* : car, bûyer, qewmîn, helketin, fesal, delîve, kar, aheng, eger.

- **ON ~** : caran, car car.

- **TO RISE TO THE ~** : dest hilandin.

- **TO TAKE ~ TO** : delîve girtin.

OCCASION, *vt.* : qewmandin, çêkirin.

OCCASIONAL, *adj.* : caran, bûyerî, helketinî.

OCCASIONALISM, *n.* : qewmînîtî, bûyerîtî.

OCCASIONALITY, *n.* : bûyerîtî, qewmînîtî.

OCCASIONALLY, *adv.* : (bi) caran, car car.

OCCASIONED, *adj.* : helketîkirî, qewmî.

OCCASIONING, *n.* : helketîkirin, qewmandin.

OCCIDENT, *n.* : rojava.

OCCIDENTAL, *n., adj.* : rojavayî.

OCCIDENTALLY, *adv.* : bi rojavayî.

OCCIDENTALISM, *n.* : rojavayîtî (çanda rojava).

OCCIDENTALIST, *n.* : rojavayîxwaz.

OCCIDENTALIZATION, *n.* : rojavayîbûn , rojavayîkirin.

OCCIDENTALIZE, *vt.* : rojavayî kirin.

OCCIDENTALIZED, *adj.* : rojavayîkirî.

OCCIDENTALIZING, *n.* : rojavayîkirin.

OCCIPITAL, *adj.* : patikî.

- **BONE** : hestikê patikê.

OCCIPITALLY, *adv.* : bi patikî.

OCCIPUT, *n.* : patik.

OCCIPUTAL, *adj.* : patikî.

OCCLUDE, *vt.* : girtin, mêtin, bend kirin.

OCCLUDED, *adj.* : daxistî, gîrokirî.

OCCLUDENT, *adj.* : girtî.

OCCLUDING, *n.* : daxistin, gîrokirin.

OCCLUSAL, *adj.* : pêwendîdarê rûyê didanî yê leqê (geztinê) yan hêranê.

OCCLUSION, *n.* : girtin, ritmîn, daxistin.

OCCLUSIVE, *adj.* : girtî, daxistî.

OCCULT, *n., adj.* : şêlî, nepenî, cadûyî, razdar, aloz, xirsî.

- **SCIENCES** : xirsî û stêrzanî.

OCCULT, *vt.* : veşartin, nepenî kirin.

OCCULTATION, *n.* : veşartin, nepenîkirin.

OCCULTING, *n.* : veşartin.

OCCULTISM, *n.* : nepenîti.

OCCULTIST, *n.* : nepenîkar, xirsker.

OCCULTLY, *adv.* : bi nihînî yan nepenî.

OCCULTNESS, *n.* : nihînîtî, nepenîti.

OCCUPANCY, *n.* : dagîrkirin, xudanî, nîştin.

OCCUPANT, *n.* : nişîn.

OCCUPATION, *n.* : pîşe, kar, pîşegerî, dagîrkirin, bindestî.

OCCUPATIONAL, *adj.* : pîşeyî.

- **DISEASE** : nesaxiya pîşeyî.
- **THERAPY** : çarekirin bi karî.

OCCUPATIONALLY, *adv.* : bi pîşeyî.

OCCUPIED, *adj.* : dagîrkirî, mijûl, xerîk, bindest.

OCCUPIER, *n.* : dagîrker.

OCCUPY, *vt.* : dagîr kirin.

OCCUR, *vi.* : qewmîn, çêbûn.

OCCURED, *adj.* : qewimî, çêbûyî.

OCCURRENCE, *n.* : qewmîn, bûyer, rûdaw, helketin, hatinser, çêbûn .

OCCURENT, *adj.* : helketî, qewimî.

OCCURING, *n.* : qewmîn, çêbûn .

OCEAN, *n.* : zerya, okyanûs.

- **GOING** : zeryager, deryager (gemî).
- **GREYHOUND** : gemiya lezîn.

OCEANIA, *n.* : giravên zeryayê (derya).

OCEANIC, *adj.* : zeryayî, deryayî, oqyanûsî.

OCEANID, *n.* : periya zeryayî.

OCEANOGRAPHER, *n.* : deryazan.

OCEANOGRAPHIC, *adj.* : deryazanî (pêwendîdarê deryazanî).

OCEANOGRAPHY, *n.* : deryazanî.

OCEANOLOGY, *n.* = **OCEANOGRAPHY**.

OCEANUS, *n.* : Xudayê mezin yê derveyî deryayî (efsane).

OCELLAR, *adj.* : nimûnekî.

OCELLATED, *adj.* : nimûnekdar, wek nimûnekî.

OCELLUS, *n.* : çavê sadeyê pêtikê.

OCELOT, *n.* : dehbeyek emerîkanî wek pilingî ye.

OCH, *interj., exp.* : guhişîn yan derbirrîna guhişînê.

OCHER, *n.* : axa gilî (û hîdrata oksîdê asinî).

OCHEROUS, *adj.* : pêwendîdarê axa gilî.

OCHLOCRACY, *n.* : desthelatiya ebebozan.

OCHLOCRAT(IC), *adj.* : ebebozî.

OCHRE, *n.* = **OCHER**.

OCHROUS, *adj.* = **OCHEROUS**.

OCHRY, *adj.* = **OCHROUS**.

O'CLOCK, *n.* : demjimêr.

OCREA, *n.* : kalanê baskê biçûk (helez e).

OCREATE, *adj.* : kalanî(kirî) : pêwendîdarê baskê biçûk.

OCTA-, OCTO-, *pref.* : pêşgir e ko heşt e.

OCTAHORD, *n., adj.* : heşt jê.

OCTACHORDAL, *adj.* : heştjêyî, heştar.

OCTAD, *n.* : heştekî.

OCTAGON, *n., adj.* : heşt la yan al, heşt layî yan alî, heştgoşe, heştek, heştparsû.

OCTAGONAL, *adj.* : heştkunci, heştlayî, heştalî, heştrexî, heşgoşe.

OCTAGONALLY, *adj.* : bi heşt goşeyî yan alî (layî).

OCTAHEDRAL, *adj.* : heştrû.

OCTAHEDRALLY, *adv.* : bi heştrûyî.

OCTAHEDRON, *n.* : heştrû.

OCTAL, *adj.* : heştekî.

OCTAMEROUS, *adj.* : heştparçeyî.

OCTAMETER, *n.* : heştînekpîv.

OCTANE, *n.* : oktan : hîdrokarbona heştgerdîle.

- **NUMBER** : hejmara (renûs) oktanî.

OCTANGULAR, *adj.* : heştgoşe.

OCTANT, *n.* : heşteka beyava çemereyî (goşeya 45°), heştînek : alava pîvana goşeyan ko kevan 45° dabeşkirî ye).

OCTAPEPTIDE, *n.* : pirtik yan gerda protînî ko birîtî ye jî heşt tirşiyên amîno bi zincîreya polî peptîd pêkve girêdayî.

OCTARCHY, *n.* : koma heşt şanişînên biçûk.

OCTASTYLE, *n., adj.* : heştkarîte (ber yan pişta avahî).

OCTATEUCH, *n.* : heşt kitêbên yekem yên Încîlê.

OCTAVE, *n.* : awazî welamheşteyî, awaza bersivheştmalikî (helbest), heştînek.

- **COUPLER** : pêgirek kilîlên yan pêkarkên organî.

- **FLUTE** : neyrawesta organî.

OCTAVO, *n.* : heştekbirrîn, kitêb yan kaxeza heştekbirrînê.

OCTET(TE), *n.* : heştik (awaza heştalav yan heştdeng).

OCTILLION, *n.* : hêza heştemîna milyonê (1,000,000^8).

OCTOBER, *n.* : çiriya berê, çiriya pêşî : heyva dehema salê.

OCTOCENTENARY OR OCTOCENTENNIAL, *n.* : heştsedemîn salane.

OCTODECIMO : hejdemî (heşt+deh) : qebareya pirtûkê ko 18 rûpel li ser yek kaxezê dihên çapkirin.

OCTOGENERIAN, *n., adj.* : heştêyî (mirovê jî 80-90 sal).

OCTONAL, *adj.* : heşt heşt pêveçûn.

OCTONARIAN, *n., adj.* : heştpîv (rêz).

OCTONARIUS, *n.* : helbesta heştpîv (pê).

OCTONARY, *n., adj.* : heştikî.

OCTOPLOID, *adj.* : heşt parçe yan nîjyar.

OCTOPOD, *n., adj.* : heştpê.

OCTOPODA, *n.* : heştpê.

OCTOPUS, *n.* : heştpê, heştepê.

OCTOSYLLABIC, *n., adj.* : heştbirgehî, heştbêjeyî, heştmalkî (helbest).

OCTOROON, *n.* : zarokê jina parçereşek û mêrê spî.

OCTOSYLLABIC, *n., adj.* : heştbirgehî.

OCTOSYLLABLE, *n., adj.* : heştbirgeh, heştbêje, heştmalik.

OCTROI, *n.* : baca bajêrî (li hindek welatên ewropî).

OCTUPLE, *vt.* : heştcar kirin.

OCULAR, *n., adj.* : çavikî.

- **LENS** : nîskeya çavkî.

OCULARIST, *n.* : pijîşkê çavan.

OCULATE(D), *adj.* = **OCELLATE**.

OCULIST, *n.* : çavsaz.

OCULISTIC, *adj.* : (pêwendidarê) çavsazî.

OCULOMOTOR, *adj.* : çavlivînk.

OD, *n.* : hêza girîmanekiya sirûştî.

ODAL = **UDAL**.

ODALOSQUE, *n.* : carî, bendewar, navmalî, bermalî.

ODD, *n., adj.* : kit, nejê, seyr, gêre, beloq, tek, awêze.

- **BALL** : rewiştgêre.

- **FELLOW** : gêremirov.

- **MAN** : mirovê gêre.

- **MAN OUT** : mirovê karê têvel dikit.

ODDITY, *n.* : gêreyîtî, seyrîtî.

ODD LOT, *n.* : tibaba ne di nav bazarî de.

ODDLY, *adv.* : bi gêreyî.

ODDMENT, *n.* : gêreyî.

ODDNESS, *n.* : gêreyîtî.

ODDPINNATE, *adj.* : baskokiyê her du rex belgkirî û yek belgik li serî.

ODDPINATELY, *adv.* : bi baskokî (baskê biçûk).

ODDS, *n.* : ciyawazî, têvelî, hevyazî, nîşane, pêşbiryarî, havil, lêketin, şer, lagirî.

- **AND ENDS** : pirtûk.
- **AT ~ WITH** : bi şere (li gel), lêketiye.
- **BY LONG ~** : bi têveliyek mezin.
- **IT MAKES NO ~** : çi ciyawazî nîne.
- **WHAT IS THE ~** : û çi têvel e ?.

ODDS-ON, *adj.* : li ber serketinê ye.

ODE, *n.* : helbest, dastan, hunrawey goranî.

O'DEAR : teh.

ODEUM, *n.* : şano.

ODIC, *adj.* : pêwendîdarê hêza girîmanekiya sirûştî.

ODIOUS, *adj.* : kîndar, bogen, genî, kirêt.

ODIOUSLY, *adv.* : bi kîndarî, bi kirêtî, kîndarkî.

ODIOUSNESS, *n.* : genîtî, bogenîtî, kirêtîtî, kîndarîtî.

ODIUM, *n.* : kîndarî, riswa, şerm, rûreşî.

ODOGRAPH, *n.* : pêngavpîv (terş).

ODOMETER, *n.* : lezpîv, rêpîv.

ODONTATE, *n.* : texlîtek pêtik e.

ODONT(O)-, *pref.* : pêşgir e ko didan e.

-ODONT, *suff.* : paşgir e ko didandar e.

-ODONTIA, *suff.* : paşgir e ko şiklê didanî ye.

ODONTOID, *adv.* : wek didanî.

ODONTOLOGY, *n.* : didanzanî.

ODO(U)R, *n.* : bêhn.

ODORANT, *n., adj.* : bêhndar.

ODORED, *adj.* : bêhndar.

ODORIFEROUS, *adj.* : bêhindar, rewiştkirêt.

ODORIFEROUSLY, *adv.* : bi bêhndarî.

ODORIFEROUSNESS, *n.* : bêhndarîtî.

ODORIZE, *vt.* : bêhndar kirin.

ODORIZED, *adj.* : bêhndarkirî.

ODORIZING, *n.* : bêhndarkirin.

ODORLESS, *adj.* : bê bêhn.

ODOROUS, *adj.* : bêhngenî, bêhndar.

ODOROUSLY, *adv.* : bi bêhndarîtî.

ODOROUSNESS, *n.* : bêhndarîtî.

ODOUR, *n.* = **ODOR**.

ODYSSEY, *n.* : dastana Girekî ya Homerusî, Odîsey.

OECIST, *n.* : danerê dagirgehê.

OECOLOGY, *n.* = **ECOLOGY**.

OECUMENICAL, *adj.* = **ECUMENICAL**.

OECUMENICITY, *n.* : cîhanîtî (dêr yan tevgera katolikiya cîhanî).

OEDEMA, *n.* : tevnpejbûn .

OEDEMATOSE, OEDEMATOUS, *adj.* : tevnpejbûnî.

OEDIPAL, *adj.* : Odîpî : pêwendîdarê girêka Odîpî.

OEDIPUS COMPLEX, *n.* : girêka Odîp : hezkirina kurî bo dayikê û hezkirina keçê bo babê.

OEILLADE, *n.* : dîtina çavî (nexasme evînî).

OENOPHILE, *n.* : şerabzan.

OERSTED, *n.* : oristid : yekeya xurtiya magnetîzî.

OESOPHAGUS, *n.* : sorçik, sorsorik.

OESTROGEN, *n.* : hormona zayendî.

OESTROUS, OESTRUS, = **ESTROUS, ESTRUS.**

OESTRUM(US), *n.* : hander, viyana dijwar, harî, mêşega (mêşa hesp û terşî).

ŒUVRE, *n.* : hemû karê daner yan nivîserekê.

OF, *prep.* : daçek : wek : ji, li, bi, di.

OFAY, *n.* : mirovê spî yan nezincî.

OFF, *adv., prep., n., adj., vt.* : der, ji wê ve, dûr, helweşandin.

- **BADLY ~** : destteng e.
- **AND ON** : demdemî.
- **BEAT** : rewiştgêr, neasayî.
- **CAST** : feramoşkar, feramoşkirî.
- **CHANCE** : kêm, piçekê dûr e.
- **COLOUR** : leşêş, pêtî.
- **DAY** : roja wiçanê.
- **DRIVE** : ji wê ve, darkê yekemê armancê yê kirîkitê (darkê (jî) wê ve yan derveyî : ji her sê darkan : derveyî, navî, ling.
- **DUTY** : ne li karî ye, ne di erkî de ye.
- **HAND** : req, demekî.
- **HANDED** : serpilkî.
- **HANDEDLY** : bi serpilkî.
- **HANDEDNESS** : serpilkîtî.
- **HOUR** : demê neasayî.
- **KEY** : nerêzikî.
- **LICENCE OR LICENSE** : rênedayî.
- **LOAD** : bar hînan xwehrê.
- **ONE'S FEED** : dilneçûna xwarinê.
- **PEAK** : ne ewperî.
- **PRINT** : ji çapê (jî çapkiriya nijadî).
- **ROAD** : varê.
- **SCREEN** : neberçav.
- **SEASON** : nekeşî.
- **SHOOT** : çiq.
- **SHORE** : piçekê dûr ji ber avê.
- **SIDE** : çewt (yarîkerê hember li pişt berevanî di nav beyava sizayî de : tepka pêyan û hokî.
- **SMOKING** : cigarenekêş.
- **STAGE** : wêveyî şanoyî.
- **THE MAP** : nemayî.
- **THE POINT** : çi pêwendî li gel xalkê nîne.
- **THE PRICE** : biha kêmkirî.
- **THE RECORD** : nihînî, ne bo belavkirinê yan weşînê.
- **THE SHELF** : berdest.
- **THE WALL** : bêqam neasayî.
- **WELL ~** : dewlemend.
- **WHITE** : spî yan gewrê ber bi zerî ve.
- **WITH YOU!** : here!.
- **WITH HIS HEAD!** : serî jêveke!, serî bibirre !
- **YEAR** : sala bêhelbijartin yan çalakî.

OFF, *vt.* : xwe (ve)kêşan (ji danûstandinê), gîro kirin yan bi dûmahî hînan.

OFFAL, *n.* : gilêş, paşmawe, sûçger.

OFFENCE, *n.* = **OFENSE.**

OFFEND, *vi., t.* : gunehî kirin, şepirze kirin, êşandin, enirandin.

OFFENDED, *adj.* : enirandî, dilmayî, dilhêlayî.

OFFENDEDLY, *adv.* : bi dilmanî, dilmankî.

OFFENDER, *n.* : gunehkar, serpêç.

OFFENDING, *n.* : şepirzekirin, çêr.

OFFENSE, *n.* : serpêçî, riswakirin, sûç, serkeşî, riswa, kirêtkirin, êrîş, enirîn, gunehî.

OFFENSELESS, *adj.* : bêgunehî, bêşepirze.

OFFENSIVE, *n., adj.* : êrîş, hêriş, destdirêjî, şepirzeyî, gulor.

- **ARMS** : çekên êrîşê.

- **LANGUAGE** : zimanê kirêt (bê rûmet).

OFFENSIVELY, *adv.* : bi êrîşî, êrîşkî.

OFFENSIVENESS, *n.* : êrîşîtî.

OFFER, *n.* : pêşkêşkirin, bexşîn, bizav, jinxwastin, bihayê pêşniyazkirî, pêşniyaz.

OFFER, *vt., i.* : pêşkêş kirin, pêşniyaz kirin, nivêj kirin, jin xwastin.

- **AS OCCASION ~S** : gava delîve vebit.

- **TO ~ A FREE PARDON** : lêborîn pêşkêş kirin.

- **TO ~ AN OPINION** : hizra xwe derbirrîn.

- **TO ~ NO APOLOGY** : poşman nebûye, lêborînê naxwazit.

OFFERED, *adj.* : pêşkêşkirî.

OFFERING, *n.* : pêşkêşkirin.

OFFERTORY, *n.* : pêşkêşkirina qurbanî, nivêja qurbanê, komkirina xêran.

OFFICE, *n.* : dîwan, nivîsxane, nivîsîngeh, nûsînge, fermangeh, desgeh, gerînk, xaf.

- **GOOD ~** : qencnavbêjî, navçîtî.

- **BOY** : kurkê nivîsîngehê (bo erkên sivik).

- **HOLDER** : erkdar, fermanber.

- **HOURS** : demjimêrên karî.

- **THE LAST ~S** : nivêja li ser mirî.

OFFICER, *n.* : efser, fermanber, mûçexwer, serbend.

OFFICER, *vt.* : kardarî kirin, rêberî kirin, ferman kirin.

OFFICIAL, *n., adj.* : fermanber, mîrî, fermî, dîwanî, mûçexwer, gizîr.

- **DUTIES** : erkên mîrî.

- **GOVERNMENT ~** : fermanber.

OFFICIALDOM, *n.* : çîna fermanberan.

OFFICIALISM, *n.* : fermanberîtî.

OFFICIALLY, *adv.* : bi mîrî yan mîrkarî, mîrekî.

OFFICIANT, *n.* : oldarê sernivêjan.

OFFICIARY, *n., adj.* : efser, fermanber, erkdar.

OFFICIATE, *vi., t.* : erkî kirin (pêrabûn), fermanberî kirin.

OFFICIATED, *adj.* : erkirî.

OFFICIATING, *n.* : erkirin.

OFFICIATION, *n.* : erkirin.

OFFICINAL, *adj.* : lêkdayî, amade, berkar, têz, pijîşkî, qanûnî (derman), dermanê têz yan amade, heleza pijîşkî.

OFFICINALLY, *adv.* : bi têzî.

OFFICIOUS, *adj.* : zanxwaz, nemîrî.

OFFICIOUSLY, *adv.* : ne bi mîrî, bi zanxwazî.

OFFICIOUSNESS, *n.* : zanxwazîtî, nebimîrîtî.

OFFING, *n.* : deryayê beravê, paşeroja nêzîk.

- **IN THE ~** : nêzîk e çebit, ne gelek dûr e.

OFFISH, *adj.* : cudaxwaz, dûrketî.

OFFSCOURING, *n.* : gilêş.

OFFSET, *n., adj.* : berdêl, çiq, birale, guhorîn, çapkirina ofsêt.

OFFSET, *vt., i.* : hevseng kirin, hevta kirin, çiq dan, berdêl kirin.

OFF SPRING, *n.* : ber, tov, del, weçe, bere, devl, dondan, pêço, nevî.

OFF STAGE, *n.* : dûr jî şanoyê.

OFT, *adv.*= **OFTEN**.

OFTEN, *adj.* : gelek caran.

OFTEN TIMES, = **OFTTINESS**, *adv.*= **OFTEN**.

OGDOAD, *n.* : hejmar, heşt.

OGEE, *n.* : darêj.

OGE-OG, *n.* : xişir (xeml) ya avahî.

OG(H)AM, *n.* : kevneelfabeya bîsttîpî ya Brîtanî-îrlendî.

OGIVAL, *adj.* : pêwendîdarê kevana sertîj.

OGIVE, *n.* : kevana sertîj, parsûyê ladayî.

OGLE, *n.* : dîtina evînî.

OGLE, *vi., t.* : bi çavê evîniyê dîtin.

OGLED, *adj.* : dîtî (evîndarî).

OGLING, *n.* : dîtin (evîndarî).

O, GOD : o Xudêyo!.

OGRE, *n.* : dêw, ejdehayê mirovxwer.

OGYGIAN, *adj.* : berî dîrokî.

OGREISH OR OGRISH, *adj.* : dêwî.

OH, *interj., n.* : oh, ax!.

OHM, *n.* : om : yekeya bergiriya kehrebî.

- **'S LAW** : qanûna om.
- **METER** : ompîv.

OHMAGE, *n.* : bergiriya omî.

OHO, interj. : oho!.

OIL, *n.* : rûn, neft, newt, dûhn.

- **BEETLE** : kêza rûnî (pê rûnhavêj e).
- **CAKE** : kiloca rûnî : tilpa tovê pembûyî.
- **CAN** : rûndank : tenekeyê rûnî.
- **CLOTH** : perûkê rûnî (bo sifrê).
- **COLOUR** : rengrûnî.
- **COOKING ~** : rûnê lênanê yan patinê.
- **CRUDE ~** : nefta xav.
- **DREDGE** : rûnpaqijkirin.
- **DREGS** : tilp.
- **FIELD** : zeviya neftê, newtî zewî.
- **GAUGE** : rûnpîv.
- **MAN** : rûnfiroş.
- **PALM** : rûnê darên devera yeksanekerî.
- **PAN** : axlewîk, amanê rûnî (otombîl).
- **PRESS** : rûnpestên.
- **SHALE** : rûnê qêr.
- **SILK** : avirmîşê rûnkirî.
- **SLICK** : nefta seravî.
- **STONE** : berê rûnî (bo tijkirinê).
- **STRIKE** : peydakirin neftê.
- **TANKER** : gemiya neftguhêz.
- **WELL** : çaleneft, çala neftê.

OIL, *vt., i.* : rûn kirin.

- **TO ~ A PERSON'S PALM** : mirovek bertîl kirin.

OILED, *adj.* : rûnkirî.

OILER, *n.* : rûnvan, rûnkar.

OILILY, *adv.* : bi rûnî.

OILINESS, *n.* : rûnîtî.

OILING, *n.* : rûnkirin.

OILY, *adj.* : rûnî, kiz, tewaş, dûhnî.

OINK, *n.* : girêça sirûştiya berazî.

OINTMENT, *n.* : hetwan, melhem, cirk.

O.K. : serçava, baş e, O.K..

OKAPI, *n.* : canewerek kayî rengvekirî û parçerêzkirî wek kerê zêbra ye.

OKRA, *n.* : helezek dirêj efrîqayî zerzewatî ye bo tirkirina girazî bi kar dihêt, bamya.

OLD, *adj.* : pîr, kal, kevn, kevnaretî, kûn, serspî, şûnewarî, kevnarî, dêrîn, kevnar.

- **ANY ~ THING** : her tiştek.
- **AGE** : pîrîtî, kalî, pîrî, pîrbûn , kalîtî.
- **AGE PENSIONER** : xanenişîn.
- **BIRD** : şehreza, hişyar.

- **COUNTRY** : welatê kevnê koçerî nemaza Ewropa.
- **ENGLISH** : kevne zimanê înglîzî (seda VII ta seda XI).
- **FANGLED** = **OLD FASHIONED**.
- **FASHIONED** : kevnemode.
- **FOGEY** : keftar.
- **HAND** : têr serhatî (mirov), qeyre.
- **MAID** : qeyre.
- **MAN** : pîremêr, pîr.
- **MASTER** : kevne seyda.
- **PAPERS** : tertepêl.
- **ROSE** : sorê gewr.
- **SCHOOL** : kevnedibistan, parêzkar.
- **SQUAW** : werdeka deryayî.
- **TESTAMENT** : kevnerojgar : beşê yekemê kitêba pîroz (Încîl).
- **TIME** : kevn.
- **WIFE** : jina pîr.
- **WIFE'S TALE** : çîroka pîrejinan.
- **WOMAN** : pîrek, pîrejin.
- **WOMAN'S COLD** : sermaya pîrejinê.
- **WORLD** : Ewropa.

OLDEN, *vt.* : pîr bûn.

OLDER, *adj.* : mezintir (pîrtir).

- **BROTHER** : kek, kak.

OLDEST, *adj.* : mezintirîn, pîrtirîn.

OLD GLORY, *n.* : alaya emerîkanî (wîlateyên yekgirtî).

OLD GUARD, *n.* : kevnedesteka parêzkar.

OLDISH, *adj.* : piçekê kevn yan pîr.

OLDNESS, *n.* : pîrîtî, mezinîtî.

OLDSTER, *n.* : pîr, kal.

OLD-WORLD, *adj.* : kevn, pêwendîdarê kevnecîhanê.

OLEACEOUS, *adj.* : wek tuxmê zeytûn û yasemînê.

OLEAGINOUS, *adj.* : rûnî.

OLEANDER, *n.* : jale, rolik, sinco, zol, wirk.

OLEANDOMYCIN : dijzîndewer (derman).

OLEASTER, *n.* : sinc, gosinc, zeytûna hov.

OLEATE, *n.* : oleat : rûnan.

OLECRANON, *n.* : serenîşk.

OLEFIN(ES), *n.* : olifen hîdrokarboniya etilenî.

OLEIC, *adj.* : rûnî, pêwendîdarê tirşiya rûnî.

OLEIFEROUS, *adj.* : berhemdarê rûnî.

OLEO, *n.* : rûnê pîşesazî.

OLEOGRAPH, *n.* : zirkeval.

OLEOGRAPHIC, *adj.* : pêwendîdarê zirkevalî.

OLEOGRAPHY, *n.* : zirkevalî.

OLEOMARGARINE, *n.* : bezê destkar (pîşesazî).

OLEORESIN, *n.* : rûnşirêz.

OLERICULTURE, *n.* : çandin û firotina zerzewatî.

OLEUM, *n.* (*pl.* **OLEA**) : rûn.

OLFACTION, *n.* : bêhnkirin, hişa bêhnkirinê.

OLFACTIVE, *adj.* : bêhndar.

OLFACTOMETER, *n.* : bêhnpîv.

OLFACTORY, *n., adj.* : bêhn, bêhnî.

- **NERVE** : bêhndemar (demara bêhnê).

OLIBANUM, *n.* : helm, hilm.

OLID, *adj.* : genî.

OLIG(O)-, *pref.* : pêşgir e ko piçek e, kêm e, hindik e.

OLIGARCH, *n.* : endamê desteka hikûmeta biçûk.

OLIGARCHIC(AL), *adj.* : pêwendîdarê hukmê girûhek biçûk.

OLIGARCHY, *n.* : desteka girûha biçûk ya hukimdar.

OLIGOCENE, *n.* : rojgarê nûjenê paşî.

OLIGOCLASE, *n.* : texlîtek kan e.

OLIGOCYTHEMIA, *n.* : sorkêmî : kêmiya topkên sor yên xwînê.

OLIGODENDROCYTE, *n.* : xaneyek demarî ye.

OLIGODENDROGLIA, *n.* : şiklek tevnê pêgirekê demarî ye.

OLIGOMER, *n.* : texlîtek polîmer e.

OLIGOPHAGOUS, *adj.* : kêmxwarinxwerî.

OLIGOPOLY, *n.* : pawaniya kêmiyê.

OLIGOPSONY, *n.* : kawdanek bazarî ko çend kiriyar kartêkirinek mezin dikin.

OLIGOSACCHARIDE, *n.* : şekira kêm yekeyên şekira sade têde (zincîreyê ji 2 ta 10).

OLIGOTROPHIC, *n.* : kêmxureka helezî.

OLIO, *n.* : danê têkil.

OLIVACEOUS, *adj.* : keskê zeytûnî.

OLIVERY, *adj.* : zeytûnî.

OLIVE, *n.* : zeytûn, darzeytûn, rengzeytûn.

- **BRANCH** : çiqê zeytûnê : hêma yan nîşana aştiyê.
- **DRAB** : zerê ber bi keskî ve.
- **GREEN** : keskê zeytûnî, sewzîzeytûnî.
- **OIL** : rûnê zeytûnê, tewaş.

OLIVENITE, *n.* : olîvnît : xwêya tirşiya zirnîxî ya mesî (kanek binyat keskzeytûnî, qehweyî, pêtî, yan zer e).

OLIVER, *n.* : kutekê çemikî (bo rastkirina bizmaran).

OLIVINE, *n.* : berê hêja yê keskzeytûnî.

OLIVINIC, *adj.* : zeytûnî.

OLIVINITIC, *adj.* : zeytûniyî.

OLLA, *n.* : qazan.

OLM, *n.* : kimkimeyê şikeftan.

OLYMPIAD, *n.* : olimpiyad : pêşbirkeya cîhaniya her çar salan çarekê.

OLYMPIAN, *adj.* : olimpî.

- **GAMES** : geme yan yariyên werzişiyên olimpî.

OLYMPIC, *adj.* = **OLYMPIAN**.

OLYMPUS, *n.* : çiyayê grekî ko hizir dikirin nişîngeh yan jîngeha Xudayan e.

OMASUM, *n.* : pêçdar : ûrkê sêyemê canewerê kayî.

OMBRE, *n.* : yariya kaxezan (bo sê kesan).

OMBRO-, *pref.* : pêşgir e ko baran e.

OMBUDSMAN, *n.* : nêrevan, zêrevan.

OMEGA, *n.* : tîpa grekî ya dûmahiyê.

OMELET(TE), *n.* : hêkên qelandî.

OMEN, *vt.* : berbîn kirin.

OMENTUM, *n.* : perdeya beziya pêgira parçeyên hinavan.

OMENTUMAL, *adj.* : pêwendîdarê perdeya beziya ûrkî.

OMINOUS, *adj.* : enîreş, enîbeş.

OMINOUSLY, *adv.* : bi enîbeşî.

OMINOUSNESS, *n.* : enîbeşîtî.

OMISSIBLE, *adj.* : feramoşbar.

OMISSION, *n.* : feramoş, hilqetandin, hilqetîn, guhnedan.

OMISSIVE, *adj.* : hilqetîndar.

OMIT, *vt.* : hilqetandin, rakirin, guh nedan.

OMITTED, *adj.* : hilqetandî, rakirî.

OMITTING, *n.* : hilqetandin, rakirin.

OMMATIDIUM, *n.* : hêmanek çavî ya çavên pêkhatiyên movikiyan.

OMNI-, *pref.* : pêşgir e ko hemî yan hemû ye.

OMNIBUS, *n., adj.* : bes, pas (otombîl).

OMNIDIRECTIONAL ANTENNA, *n.* : hewayiya hemû al yan arasteyan.

OMNOFARIOUS, *adj.* : hemecor, hemû texlît.

OMNIFICENT, *adj.* : afirînkarê hemûkî.

OMNIPOTENCE, *n.* : hêzdariya hemûkî, hêza hemûkî.

OMNIPOTENT, *adj.* : şiyayê hemûkî, tuwanayê hemûkî, şiyaniya hemûkî.

OMNIPRESENCE, *n.* : hebûna hemûkî.

OMNIOPRESENT, *adj.* : hebûniya hemûkî.

OMNIRANGE, *n.* : mewdayê hemela.

OMNISCIENCE, *n.* : hemûkîzanî.

OMNISCIENT, *adj.* : hemûkîzan.

OMNIUM GATHERUM, *n.* : koma hemecorî.

OMNIVORA, *n.* : hemûxwer.

OMNIVOROUS, *adj.* : pêwendîdarê hemûxwerî.

OMPHALO-, *pref.* : pêşgir e ko nafik e.

OMPHOLOS, *n.* : nîvek, serkê metalî.

ON, *prep., adv., adj.* : ser, di ber, ber, li ser, cem, nik.

- **AGAIN, OFF AGAIN**, *adj.* : kurtehebûn paşî windabûn .
- **AND OFF** : car caran.
- **AND ~** : berdewam.
- **FOOT** : peya, peyade.
- **PURPOSE** : qestî.
- **SALE** : berfirotin.
- **THE CARPET** : (li ser berkê) sizakirî.
- **THE CHEAP** : erzan.
- **THE OTHER HAND** : li aliyê dî, ji layê dî ve.
- **THE TAPIS** : ber çavî.
- **THE WHOLE** : bi tevayî, giştî yan-gelemperî.
- **TIME** : di demî de.

ONAGER, *n.* : kerê kûvî.

ONANISM, *n.* : kêmdaketin, tuxmav, havêtina derve, tuxmav havêtina bi destî.

ONCE, *adv., conj., n.* : carekê, yekcar.

- **ALL AT ~** : ji nişkekê ve, di yek demî de.
- **OR TWICE** : carekê yan didwan.
- **AND AGAIN** : çend caran.
- **FOR ALL** : dûmahî, carekê û hew.
- **FOR (THIS) ~** : bes ev care, her vê carê.
- **IN A WHILE** : carekê ji caran.
- **OVER** : lez dîtin.
- **UPON A TIME** : carek ji caran.

ONCO-, *pref.* : pêşgir e ko pej e.

ONCOGENESIS, *n.* : pejbûn yan pej(çê)kirin.

ONCOGENIC, *adj.* : pejbûnî.

ONCOGENICITY, *n.* : pejbûnîtî, pejkirinîtî.

ONCOLOGY, *n.* : pejzanî.

ONCOMING, *n.* : hatî, nêzîkbûnî.

ONCORN VIRUS, *n.* : girûha vîrûsên pejbûnê.

ONE, *adj., n., pron.* : yek, êk, kit, tek, kesek.

- **AFTER THE OTHER** : yeke yeke, yek li dûv yek.
- **AT A TIME** : yeke yeke.
- **AND ALL** : hemû.
- **BY ONE** : yeke yeke, yek yek, tek tek.
- **CHAIN** : yekrizde, yekzincîre.
- **EYED** : yekçav, tircal.

- **FIFTH** : pêncek.

- **LEGGED** : yekling.

- **NINETEENTH** : nozdehek.

- **OPINION** : yekraman, yekhizir, yekrayî.

- **SEEDED** : yektovî.

- **THIRTIETH** : sihyek, siyek.

- **WITH ANOTHER** : bi gelemperî, bi gişti, bi tebayî.

- **TO BE MADE ~** : şûkirin.

ONE-EGG, *adj.* = **MONOVULAR.**

ONE-HORSE, *adj.* : yekhesp (kişan).

ONEIRO-, *pref.* : pêşgir e ko xewn e.

ONEIROCRITICAL, *adj.* : xewnraveyî.

ONEIROCRITICISM, *n.* : xewnraveyîtî.

ONEIROMANCY, *n.* : xewnravekirin.

ONE LINER : kurtetirane.

ONENESS, *n.* : yekîtî.

ONER, *n.* : navdar.

ONEROUS, *adj.* : sext, zehmet.

ONEROUSLY, *adv.* : bi zehmetî, bi sextî.

ONEROUSNESS, *n.* : zehmetîtî, sextîtî.

ONESELF, *pron.*: xwe (xo).

ONE-SHOT, *adj.* : yekberik.

ONE-SIDED, *adj.* : yek-rex.

ONE-STEP, *n.* : yekpêngav (sema).

ONE-TAILED, *adj.* : (yekdûv) : azmûna hejmarî.

ONE-TIMER, *adj.* : berê, kevn.

ONE-TRACK, *adj.* : yekrê, teng.

ONE-WAY, *adj.* : yekrê, yekaraste, yekber.

ONGOING, *adj.* : pêşveçûyî (werar).

ONION, *n.* : pîvaz, piyaz.

- **DOME** : quba pîvazî.

- **GREEN ~** : pîvazterk.

- **SEA ~** : pîvaza kûvî.

- **SKIN** : kaxezpîvazî (kaxezek qayim û rohn e).

ONIONRY, *adj.* : pîvazî.

ONIUM, *n.* : iyona erêbargehkirî.

ONE-LINE, *n.* : li ser hêla rêasinî.

ONLOOKER, *n.* : bîner, temaşeker.

ONLY, *adj., adv.* : her, tenha, tenê, tinê, encex, meger.

ONOMASTIC, *adv.* : navî : pêwendîdarê nav û navan.

ONOMASTICS, *n.* : peyivzanî.

ONOMATOLOGY, *n.* = **ONOMATICS.**

ONOMATOPOEIA, *n.* : navkirina tiştan ji dengan.

ONOMATOPEIC, *adj.* : pêwendîdarê navkirina tiştan ji dengan.

ON RUSH, *n.* : vizik, êrîş, pêşveçûn.

ONSET, *n.* : sereta, destpêk.

ON SHORE, *adj., adv.* = **ASHORE.**

ON SIDE, *adj., adv.* : li rexê rast.

ONSLAUGHT, *n.* : pelamar, êrîş, hêriş.

ONT(O)-, *pref.* : pêşgir e ko heyîn e, zindî ye.

ON-THE-JOB, *adj.* : li ser karî (rahînan).

ONTIC, *adj.* : rastheyî.

ONTO, *prep.* : li ser, jor, hîdar.

ONTOGENESIS, *adj.* : pêwendîdarê guhorîna mirovî.

ONTOGENY, *n.* : guhorîna mirovî.

ONTOLOGICAL, *adj.* : hebûnî, hebûnîzanî.

ONTOLOGIST, *n.* : hebûnzan.

ONTOLOGY, *n.* : hebûnzanî.

ONUS, *n.* : erk, bar, berpirs.

ONWARD(S), *adv., adj.* : pêşve.

- ONYM, *suff.* : paşgir e ko nav e, peyiv e.

ONYMOUS, *adj.* : penî.

ONYX, *n.* : oniks : berek hêja ye, texlîtek kiwartz e.

- MARBLE : mermerê oniksî.

OOCYTE, *n.* : (piz) hêk berî gehiştinê.

OOGAMETE, *n.* : mêzayend.

OOGAMOUS, *adj.* : (çêkirî) ji çend zayendên nêrikên livok û gelek zayendên mêyên nelivok.

OOGENESIS, *n.* : çêbûn û gehiştina (piz) hêkê.

OOH, *interj.* : oh!.

OOLITE, *n.* : kilsa dêndikî.

OOLOGY, *n.* : balindehêkzanî.

OOLONG, *n.* : çapa girana Çînî.

OOMPH, *n.* : çalakî, çelengî, dilber, rakêşana zayendî.

OONT, *n.* : hêştir.

OOSPHERE, *n.* : (piz) hêka nepeyînkirî.

OOSPORE, *n.* : peyînker.

OOTHECA, *n.* : kelpikê reqê hêkê.

OOTID, *n.* : hêkxane.

OOZE, *n.* : teşene, zengaw, zong, şîrbûyî, delîn, lîm, teqn.

OOZE, *vt.* : dilop kirin, delîn kirin.

OOZED, *adj.* : delînkirî.

OOZING, *n.* : teşenekirin.

OOZY, *adj.* : şirî, teqnî, delînî.

OPACITY, *n.* : tarîtî, lêlî.

OPAH, *n.* : texlîtek masiya deryayî ye.

OPAL, *n.* : opal : berek hêja ye (rengî diguhorit).

OPALESCENCE, *n.* : çirîskbûn , teyisîn.

OPALESCENT, *adj.* : çirîskdar.

OPALESCENTLY, *adv.* : bi çirîskdarî.

OPALINE, *n., adj.* : opalî, çirîskdarî, teyisî.

OPAQUE, *n., adj.* : tarî, lêl.

OPE, *adj., vt., i.* = **OPEN**.

O.P.E.C. **ABBR. FOR ORGANIZATION OF PETROLEUM EXPORTING COUNTRIES**: rêxistina welatên hinartinderên neftê.

OPED PAGE, *n.* : laperê gotarên taybet.

OPEN, *n., adj.* : vekirî, kiraw, ve, beş.

- AIR : derve.

- AND-SHUT : gelek asan diyar.

- CHAIN : rizde yan zincîra vekirî.

- CIRCUIT : gera vekirî, gêjenî kiraw.

- DOOR : derî vekirî (bo hemûyan).

- EARS : guhdar.

- ENDED : neradekirî.

- EYED : hişyar, çavvekirî, wurya.

- EYES : hişyar.

- HAND : merd, dilvera.

- HANDED : destvekirî, destfireh, têrnan.

- HANDEDLY : bi destfirehî.

- HANDEDNESS : destfirehîtî.

- HEARTED : dilsoz, rast, dilovan.

- HEARTEDLY : bi dilsozî.

- HEARTH PROCESS : rêbaza kûrheya vekirî (bo çêkirina polayî).

- HEARTH STEEL : polayê kûrheya vekirî.

- HOUSE : mala vekirî (bo mêvanan).

- MINDED : dilfireh, bêpêşbiryar.

- MINDEDLY : bi dilfirehî, bi bêpêşbiryar.

- MINDEDNESS : dilfirehîtî, bêpêşbiryarîtî.

- MOUTHED, *adj.* : guhişî.

- PLACE : evş.

- POLINATED : peyînxweristî.

- **SESAME** : weke kuncî : cadûgerî : çiroka Elî Baba û çil dizan (ji hezar û şev) .

- **SEASON** : demê nêçîrê û masîgirtinê.

- **SHOP** : kargeha vekirî (bo endam û ne endamên yekîtiya karkeran).

- **SYSTEM** : rêzika vekirî, pêroy kirawe.

- **WORK** : neqşê kunkirî.

- **WEATHER OR WINTER** : nesirî (neqerisî).

- **THE ~** : nîva deryayî, çol, bayêhîn.

- **TO COME UP INTO THE ~** : hizra xwe eşkera kirin.

- **WITH ~ ARMS** : germepêşwazî.

OPEN, *vt.i.* : vekirin, vebûn, dest pê kirin.

- **TO ~ A BUSINESS** : karek dest pêkirin.

- **TO ~ AN ACCOUNT** : hejmarek li diravgehî vekirin yan dest pê kirin.

- **TO ~ A CAMPAIGN** : dest bi xebata helbijartinê kirin.

- **TO ~ FIRE** : teqe kirin, agir vekirin.

- **TO ~ ONE'S EYES** : çavên xwe vekirin (anko guhişînê diyar dikit).

- **TO ~ THE HEART** : dil vekirin, eşkera axiftin.

- **TO ~ THE MIND** : hiş berfireh kirin.

OPEN-OUT, *vt.i.* : vekirin, berfireh kirin.

OPENABLE, *adj.* : vekirbar.

OPENED, *adj.* : vekirî, vebûyî.

OPENER, *n.* : vekirek, qotîbirr.

OPENING, *n.* : vekirin, vebûn , kunîle, keliştek, derçe.

OPENING-TIME : demê vekirinê (bo karî), demê destpêkirina karî.

OPENLY, *adv.* : vekirî, bi eşkerayî.

OPENNESS, *n.* : vekirîtî.

OPEN-UP, *vt.* : diyar kirin, berdest kirin.

O PEOPLE : gelî xelkê, gidyano.

OPERA, *n.* : opera : kirdara dramiya stran û mûzîqeyî.

- **COMIC ~** : operaya tiraneyî.

- **GRAND ~** : operaya şikûdar (bê berhevdan).

- **GLASS** : dûrbîn.

- **HOUSE** : opera xane.

- **LIGHT ~** : operaya sivik.

OPERABILITY, *n.* : karbarîtî, karkirinbarîtî.

OPERABLE, *adj.* : karbar (karkirinbar).

OPERAND, *n.* : çarebariya nijdarî, tibaba kirdarî.

OPERANT, *adj.* : karîger.

OPERANTLY, *adv.* : bi karîgerî.

OPERATE, *vi.t.* : kar kirin, kar têkirin, nişterî li ser kirin.

OPERATED, *adj.* : karkirî.

OPERATIC, *adj.* : operayî.

OPERATING, *n.* : dadan, gerandek, geranek, kirdarkirin, karkirin (makîne).

- **ROOM** : jora nijdariyê.

- **TABLE** : mêzanijdariyê.

- **THEATRE** : nijdarîgeh.

OXONIAN, *n., adj.* : Oksfordî (pêwendîdarê Oksfordê).

OXTAIL, *n.* : gadûv : (nemaze dûvkê terşî yê girazê jê çêdikin).

OXTER, *n., vt.* : kefş, harî kirin bi girtina destî û binkefşî.

OXTONGUE, *n.* : gûriz, gewriz (gaziman).

OXY-, *pref.* : pêşgir e ko oksîjen e, tûj e.

OXYACETYLENE, *adj.* : oksîjenî-asetilenî (her du gazên lehîmkirinê).

OXYACID, *n.* : tirşiya oksîjen têde.

OXYCALICIUM, *adj.* : oksîjenî-kalsiyomî.

OXYCARPOUS, *adj.* : ber yan mûyê tûjkirî.

OXYGEN, *n.* : oksîjen : hêmanek gaza bêreng, bêtam û bêbêhn e di nav bayî de ye (21%), yan pêkhatiye di nav avê, kevir û kanan (metalan) de.

OXYGENATE, *vt.* : oksîjen kirin.

OXYGENATED, *adj.* : oksîjenkirî.

OXYGENATING, *n.* : oksîjenkirin.

OXYGENATION, *n.* : oksîjenkirin.

OXYGENATOR, *n.* : oksîjenker.

OXYGEN CYCLE, *n.* : ger yan çerxa oksîjenê.

OXYGENIC, *adj.* : oksîjenî.

OXYGENIZE, *vt.* : oksîjen kirin.

OXYGEN MASK, *n.* : rûpoşa oksîjenî : ko oksîjen têre dihêt kêşan.

OXYGEN TENT, *n.* : konê oksîjen : ko teji oksîjen e bo nesaxî.

OXYHEMOGLOBIN, *n.* : hemoglobîn-oksîjen dan tevnî.

OXYHYDROGEN, *adj.* : oksîjenî-hîdrojenî : têkiliya her du xazan.

OXYMEL, *n.* : skencebîn.

OXYMORON, *n.* : yekbûna du bêjeyên hevdij.

OXYPHILIC, *adj.* : oksîjenxwaz.

OXYSALT, *n.* : xwêya oksîjen têde.

OXYSULFIDE, *n.* : pêkhatiyek oksîjen û kibrîtî (gogirdî).

OXYTOCIC, *adj.* : zêker.

OXYTOCIN, *n.* : hormonek çilmî ye (bo derkirina şîrî).

OXYTONE, *n., adj.* : peyiva ko birgeha dawî xurt e.

OXYURIASIS, *n.* : nesaxiya kirmê denbozî.

OYER, *n.* : dadgerîna tawanî.

- **AND TERMINER** : bihîstin û biryardan.

OYES, OYEZ, *interj.* : gelî mirovan! guh bidin! bibihîsin!.

OYSTER, *n.* : şeytanok, guwêçkemasî, robyan.

- **BANK** : şeytanokgeh (dir yan şûna zehfiya şeytanokan).

- **BED** : şeytanokge (binê ava şeytanok têde zehf in).

- **CATCHER** : şeytanokxwer, şeytanokgir (texlîtek balindeyê deryayî ye).

- **CRAB** : kêvjaleyê şeytanokî (di nav şeytanokî de dijît).

- **CRACKER** : biskiwîta şeytanokî (ev biskiwîte li gel şeytanokî dihêt xwarin).

- **FARM** : çandingeha şeytanokî : binê deryayî bo xudankirina şeytanokî.

- **KNIFE** : kêrika şeytanokî (pê dixwin).

- **MAN** : şeytanok komker yan firoş.

- **PARK** = **OYSTERBED OR OYSTER FARM.**

- **PLANT** : gerbelok.

OYSTERING, *n.* : şeytanok girtin yan firotin.

OYSTER WHITE, *adj.* : spî li gel gewrê pêtî.

OZOKERITE, *n.* : têkiliyek kanî hîdrokarbonî wek mûmî ye.

OZON, *n.* : ozon : oksîjena peyt (xest yan tîr) ko sê gerdîle hene di nav yek gerdî de.

OZONIC, *adj.* : ozonî.

OZONID, *n.* : pêkhatiyek ozonî ye.

OZONIFEROUS, *adj.* : ozonî (ozondar).

OZONIZE, *vt., i.* : ozon kirin, têrozon kirin, têkilî ozon kirin, bi ozonî çarekirin, ozonê diguhorit oksîjenê.

OZONIZATION, *n.* : ozonkirin.

OZONIZED, *adj.* : ozonkirî.

OZONIZER, *n.* : ozonker.

OZONIZING, *n.* : ozonkirin.

OZOMETER, *n.* : ozonpîv.

OZONOSPHERE, *n.* : çîna ozonî, keşîozon, bayê ozon.

OZONOUS, *adj.* : ozonî.

OZOSTOMIA, *n.* : bêhngenî, bêhna genî ya devî.



P, p : pî : tîpa hevdehemîn ya elfabeya înglîzî.

P.A., *abbr.* : per annum, bi salê, bi salekê.

PA, *n.* : bab, bav, bawk.

PABULUM, *n.* : xurek, parçetora pûç.

PACA, *n.* : canewerek kirindeyê Emerîkaya navîn e.

PACE, *n.* : zûyî, lez, pêngav, hengaw, pêngav havêtin, rêje yan têkraya pêşketinê.

- **CAR** : otomobîla ko rêberiya pêşbirkeyê dikit.

- **MAKER** : lezker, pirteker.

- **SETTER** : lezker, pirteker.

PACE, *vi., t.* : pîvan (bi pêngavan), hatin û çûn, pêş keftin, çargav kirin (hêdî).

PACED, *adj.* : bi pêngavan pîvayî.

PACER, *n.* : hesp hêdî çargav kirin.

PACHYDERM, *n.* : çermqayim (canewerên memikdar, nekaya û simdar wek fil û hespî).

PACHYDERMATOUS, *adj.* : çermstûr.

PACIFIABLE, *adj.* : aştkirinbar.

PACIFIC, *n., adj.* : hedar, hêmin, asûde.

- **OCEAN** : zeryayê hedar.

PACIFICATION, *n.* : aştkirin, hedarkirin, hêminkirin.

PACIFICATORY, *adj.* : hedarî, hêmindar.

PACIFIED, *adj.* : hedarkirî, hedirî, aştkirî.

PACIFIER, *n.* : hedarker, mitker, aştker, aramker.

PACIFISM, *n.* : aştî (dijserî).

PACIFIST, *n.* : aştkar, dijser.

PACIFISTIC, *adj.* : (pêwendîdarê) aştkarî.

PACIFISTICALLY, *adv.* : bi aştkarî, aştkarkî.

PACIFY, *vt.* : hedar kirin, aşt kirin.

PACIFYING, *n.* : hedarkirin, aştkirin.

PACING, *n.* : (bi pêngavê) pîvan.

PACK, *n.* : beste, gurze, quto, qutik, qûtî.

- **ANIMAL** : dewar, wulax, qûş.

- **HORSE** : hespê barî, bergîr (bargîr, beygîr).

- **ICE** : beyava sehola serav.

- **MAN** : firoşyarê gerok.

- **RAT** : mişkê darî.

- **SACK** : kurtan.

- **SADDLE** : palan.

- **THREAD** : benê sûjînê.

PACK, *vt., i.* : tijî kirin, bar kirin, dagirtin.

- **TO ~ UP** : kar rawestandin.

PACKAGE, *n.* : gurze, beste, qûtî.

- **DEAL** : pêkhatina gişti.

PACKAGED, *adj.* : hepişandî, dagirtî.

PACKAGING, *n.* : dagirtin, hepişandin.

PACKED, *adj.* : tijî, tijîkirî, dagirtî, sift.

PACKER, *n.* : bestebend.

PACKET, *n.* : beste, qûtî.

PACKING, *n.* : hepişandin, dagirtin, daçirandin, vepêçan, pestawtin, pêçranewe.

- **CASE** : sindoqa dagirtinê.

- **HOUSE** : goştgeh.

- **NEEDLE** : sûjin.

- **NEEDLE HEAD** : sersûjin.

PACT, *n.* : peyman.

PAD, *n.* : serîn, pişti, pêç, pêyê caneweri, belga serav, xanîk, jor, herzala havêtinê.

PAD, *vt., i.* : çûn (peya), ber kirin, deng birrîn.

PADDED, *adj.* : (peya) çûyî.

PADDING, *n.* : ber kirin, nawpûşîn, hepişandin.

PADDLE, *n.* : sewl, şelpî.

- **BOAT** : belema payder.

- **BOX** : sindoqa çerxa sewlî yan şelpî.

PADDLE, *vi., t.* : sewl kirin, şelpî kirin, siza kirin, lê dan.

- **TO ~ ONE'S OWN CANOE** : xwe li ser bizava xwe girtin (barê xwe bi xwe rakirin).

PADDLED, *adj.* : sewlkirî, şelpîkirî.

PADDLER, *n.* : sewlker, şelpîker.

PADDLING, *n.* : sewlkirin, şelpîkirin.

PADDOCK, *n.* : zevîk (bo rahênana hespî).

PADDY, *n.* : birinc, zeviya birincî, mereze.

PADLOCK, *n.* : çilmîre, kod.

PADLOCK, *vt.* : girtin, daxistin.

PADOUK, *n.* : texlîtek darê depî ye.

PADRE, *n.* : qeşe.

PADUASOY, *n.* : perûkê qayimê avirmîş.

P(A)ED(O)-, *pref.* : pêşgir e ko biçûk e, zaro ye.

P(A)EDERASTY, *n.* : lotîyayî.

PAEDIATRIC, *adj.* = **PEDIATRIC.**

P(A)EDOGENESIS, *n.* : za û zê yan canewerên biçûk.

PAELLA, *n.* : pilav, pilaw, (girara birincî).

PAEON, *n.* : pîvan-pêya helbestê : birgehek dirêj yekem, duhem, sêhem yan çarem û sê birgehên kurt.

PAGAN, *n., adj.* : pot, gawir, pûtperist.

PAGANISM, *n.* : pûtîtî.

PAGANIZE, *vt.* : pûtî kirin.

PAGANIZER, *n.* : pûtîker.

PAGANIZING, *n.* : pûtîkirin.

PAGE, *n.* : kurkê xizmetkar, laper, rûpel, per, rûper, pere, berdest.

- **BOY** : lêz.

PAGE, *vt.* : gazî kirin, laper hejmar kirin.

PAGEANT, *n.* : gerdûne.

PAGEANTRY, *n.* : mehrecan, debdebeyî, mezinatiya vala.

PAGED, *adj.* : rûpelkirî, laperkirî, xizmetkirî.

PAGER, *n.* : rûpeljimêr, rûpelnîşanker.

PAGINAL, *adj.* : rûpelî, laperî.

PAGINATE, *vt.* : rûpel hejmar kirin.

PAGINATED, *adj.* : rûpelkirî.

PAGINATING, *n.* : rûpelkirin.

PAGINATION, *n.* : rûpelkirin.

PAGING, *n.* : rûpelkirin, laperkirin.

PAGODA, *n.* : peristgeh (li Çînê, Hindistanê...).

PAGURIAN, *n., adj.* : pêwendîdarê kêvjaleyê postnişîn.

PAH, interj. expr : peh.

PAHLAVI, *n.* : zimanê Eceman yê dema Sasaniyan, pehlewî.

PAID, *p.* **OF PAY** : da.

PAID, *pp.* **OF PAY**, *adj.* : dayî.

- **OUT** : lêçûyî.

- **WORK** : (agriculture) : sipanî.

PAIL, *n.* : elb, dewlik, avdank, sitil.

PAILFUL, *adj.* : dewlikek tejî.

PAILLASE, *n.* : doşeka qirşikan.

PAILLETE, *n.* : parçeyek metalê rengîn yê bo xemilkirinê.

PAIN, *n.* : jan, dax, cefa, kovan, arhan, şikenc(e), azar, ês, êşan, derd, renc, kirrên.

- **TO SPARE NO ~** : her çi bişêt dê bikit.
- **TO TAKE ~ S** : dê bizavek mezin bikit.
- **UNDER ~ OF** : li ber gefa sizakirinê.

PAIN, *vt., i.* : êşandin, êşîn.

PAINFUL, *adj.* : eşdar, derdedar, liyan, derdnak, rencor, jandar.

PAINFULLY, *adv.* : bi êşdarî, êşdarkî.

PAINFULNESS, *n.* : êşan.

PAINKILLER, *n.* : êşbir(r), êşkuj.

PAINLESS, *adj.* : bêêş, bêazar.

PAINLESSLY, *adv.* : bi bêêşî, bêazarkî.

PAINLESSNESS, *n.* : bêêşanî(tî), bêazarîtî.

PAINS, *n.* : cefa, dilêş.

PAINSTAKING, *n.* : hûrkarî, rêncberî, kedker.

PAINSTAKINGLY, *adv.* : bi hûrkarî.

PAINT, *n.* : boye, boyax, reng, den.

- **BOX** : qutîka boye yan rengan.
- **BRUSH** : firçeya wênekirinê yan boyekirinê.

PAINT, *vt., i.* : wêne kirin, boye kirin.

PAINTED, *adj.* : boyekirî, kevalkirî, sihandî, wênekirî.

- **BUNTING** : çûçikek rengîn e.
- **LADY** : pelpelîtk.
- **TRILLIUM** : gula sêyîne (tirilyom).

PAINTER, *n.* : rengrêj, boyeçî, boyevan, wênekêş, nîgarkêş.

- **CUT THE ~** : cuda kirin.

PAINTERLY, *adj.* : rengrêjî.

PAINTING, *n.* : rûkeş, wêne, rengrêjî, nîgar, keval, sihandin.

PAINTY, *adj.* : boyeyî.

PAIR, *n.* : cot.

- **BOND** : pêkhatina dengnedanê (du mirovên neyar), pêwendiya xêzaniya yekjinî.
- **OAR** : cote sewl yan şelpî.
- **OARED** : cot sewlkirî yan şelpîkirî.
- **OF SCISSORS** : cawbirr.
- **OF TONGS** : gasik.
- **OF TROUSERS** : şelwar, penteron, ranik, pantor, pantalon.

PAIR, *vt., i.* : şû kirin, dan şû, cot kirin, cot cot kirin.

- **TO ~ OFF** : cot cot çûn.

PAIRED, *adj.* : cote, cotkirî.

- **ECHO** : cotedengvedan.

PAISLEY, *n., adj.* : tevnê hiriyê yê neqşkirî.

PAJAMAS, *n.* : pêcame.

PAL, *n.* : dost, heval, hevrê, hawrê.

PAL, *vi.* : hevalî kirin, dost bûn.

PALADIN, *n.* : qehreman, qareman, gernas (girnas), siwar, yek ji duwazdeh mîrên şarlemanî, qehremanê dozekê, qehremanê mîrê derebeg.

PALACE, *n.* : koşk, koçk, telar.

PALAEARCTIC, *adj.* : pêwendîdarê devera cemserî.

PALAEO-, *pref.* : pêşgir e ko kevn e.

- **MAGNETISM** : magnetîziya mayî di nav keviran de.

PALAESTRA, *n.* : amojgeha gemşê li nik Girekan, zorxane.

PALAFITTE, *n.* : zincê berî dîrokê.

PALANQUIN, *n.* : helgirk, erebaneya girtî.

PALATABILITY, *n.* : tamdarîtî, tambarîtî.

PALATABLE, *adj.* : xweş, xoş, tamdar, tambar.

PALATABLENESS, *n.* : tambarîtî, tamdarîtî.

PALATABLY, *adv.* : bi xoşî, bi tamdarî.

PALATAL, *adj.* : pêwendîdarê panka devî.

PALATALIZATION, *n.* : axiftina ji panka devî.

PALATALIZE, *vt.* : jî panka devî axiftin.

PALATALIZED, *adj.* : jî panka devî axiftî.

PALATALIZING, *n.* : jî panka devî axiftin.

PALATE, *n.* : panka devî, alome, pidî, polke, melasû.

PALATIAL, *adj.* : nayab, koşkî.

PALATIALLY, *adv.* : bi nayabî.

PALATIALNESS, *n.* : nayabîtî.

PALATINATE, *n.* : dever.

PALATINE, *n., adj.* : mîrê derebeg, erkdarê mezin, kurkê stûyî û ser milî.

PALATOGRAM, *n.* : tomara bikarînana panka devî (bo derînana dengî).

PALAVER, *n.* : rûbazî, pûçbêjî, berhevdan, gotina xapîn.

PALAVERED, *adj.* : pûçbêjkirî.

PALEVERING, *n.* : pûçbêjîkirin.

PALE(O)- OR PALAE-, *pref.* : pêşgir e ko lêgerokê şiklên kevn e, kevn, seretayî.

PALE, *adj.* : pêtî, vemirtî, virmor, kêmreng, spîçolk, bêreng.

- **COLOUR** : virtonî.

- **FACE** : pêtî, rûzerk.

PALE, *vt., i.* : pêtî bûn.

PALEO, *n.* : belgê gula giyayî.

PALED, *adj.* : pêtîbûyî.

- **FACE** : rûzerk.

PALEETHNOLOGY, *n.* : mirov, nijadzanî.

PALENESS, *n.* : vemirtin, pêtîbûn.

PALEOANTHROPOLOGICAL, *adj.* : kevnemirovzaniyî.

PALEOANTHROPOLOGIST, *n.* : kevnemirovzan.

PALEOANTHROPOLOGY, *n.* : kevnemirovzanî.

PALEOBOTANY, *n.* : helezberdînezanî.

PALEOCENE, *n.* : rojgarê nûjenê berê.

PALEOGRAPHER, *n.* : kevnenivîsînzanî.

PALEOGRAPHIC, *adj.* : kevnenivîsînzaniyî.

PALEOGRAPHY, *n.* : kevnenivîsînzaniyî.

PALEOLITH, *n.* : alavkê berî jî rojgarê kevnê berî.

PALEOLITHIC PERIOD, *n.* : rojgarê kevnê berî.

PALEONTOLOGIC(AL), *adj.* : hûrberdîne-hestîzaniyî.

PALEONTOLOGIST, *n.* : hûrberdîne-hestîzan, berdînezanî, zevîkolzanî.

PALEOZOIC ERA, *n.* : rojgarê kevn.

PALEOZOOLOGICAL, *adj.* : kevne canewerzaniyî.

PALEOZOOLOGY, *n.* : kevnecanewerzanî.

PALETOT, *n.* : ebayek fireh e, palto.

PALETTE, *n.* : depkê rengan.

- **KNIFE** : kêrika rengan (bo têkilkirinê).

PALFREY, *n.* : hespê hûr.

PALIMPSET, *n.* : dep yan kevalê paqijkirî.

PALIDROME, *n.* : bêje yan risteya ji her du seran dihêt xwendin.

PALINDROME, *n., adj.* : peyiv, helbest ko wek yek pêş û paş dihêt xwendin wek : nik-kin, al-la, tîp-pît, xîz-zîx (bi înglîzî : level...).

PALINDROMIC, *adj.* : peyiva pêş û paşî yek xwendinî.

PALING, *n.* : tan, teyman, perjîn.

PALINGENESIS, *n.* : za û zê, vejiyan.

PALINGENETIC, *adj.* : za û zêyî, vejiyanî.

PALINODE, *n.* : helbesta paşveçûnê, paşveçûn.

PALISADE, *n.* : tan, perjîn, teyman.

PALISADE, *vt.* : tan kirin.

PALISADED, *adj.* : tankirî.

PALISADING, *n.* : tankirin.

PALISH, *adj.* : piçekê pêtî.

PALL, *n.* : term, derbest, serterm.

- **BEARER** : termhelgir.

PALL, *vi., t.* : nixaftin, pûç bûn, pûç kirin.

PALLADIAN, *adj.* : pêwendîdarê zirrêbaza avahîkariya Îtalî ya seda şazdehemê.

PALLADIUM, *n.* : wêne yan peykerê (palas) yê Xudaya pendê li nik Girekan ko dibêjin palasa Atênê ko bawer dikirin (Terewade) diparast, parêzer, hêmanek metalî (kanî) wek platînî ye.

PALLAS, *n.* : Xudaya pendê li nik Girekan.

PALLED, *adj.* : hogirîkirî.

PALLING, *n.* : hogirîkirin.

PALLET, *n.* : doşeka pîşî, depkê bin kefşî, hestîv.

PALLETIZE, *vt.* : guhaztin (bi herzala guhêzbar).

PALLETIZED, *adj.* : guhaztî.

PALLETIZING, *n.* : guhaztin.

PALLIASSE, *n.* : nivînên pîşî.

PALLIATE, *vt.* : hedar kirin.

PALLIATED, *adj.* : hedarkirî.

PALLIATING, *n.* : hedarkirin.

PALLIATIVE, *n., adj.* : hedar(dar).

PALLIATIVELY, *adv.* : bi hedarî.

PALLID, *adj.* : pêtî, virmor, qels.

PALLIDLY, *adv.* : bi qelsî, qelskî.

PALLIDNESS, *n.* : pêtîtî, qelsîtî.

PALLIUM, *n.* : kelpikê mejî, kirasê lakêşeyê mêrî.

PALL-MALL, *n.* : kevneyarî ye (tepka dar di nav bazina asinî de diborînin).

PALLOR, *n.* : pêtîtî, zerayî.

PALLY, *adj.* : hevalî.

PALM, *n.* : lep, çing, çep, berê destî, darqesp, texlîtek darên deverên yeksanekerî, serketin, çiqê darqespê.

- **OF THE HAND** : lep, navmist, navdest, şep.

- **TREE** : hevrîs.

- **TO BEAR THE ~** : bi ser keftin (zal bûn).

- **TO HAVE AN ITCHING ~** : bertîlxwer.

- **TO YIELD THE ~ TO** : çîz kirin.

PALM, *vt.* : bertîl kirin, xapandin.

- **TO ~ OFF** : xapandin, xirandin.

PALMA CHRISTI, *n.* : genek (darê dermanê zikçûnê).

PALMAR, *adj.* : lepikî.

PALMARIS LONGUS : masûlkeya panka lepî.

PALMARY, *adj.* : serek, birêz, baştir, berz.

PALMATE(D), *adj.* : lepî.

PALMATELY, *adv.* : bi lepî, lepkî.

PALMATIFIED, *adj.* : lepvebûyî.

PALMATION, *n.* : lepkirin yan lepbûn.

PALMER, *n.* : heçiyê xaçkirî (bi çiqên darqespî).

- **WORM** : kirmê darên berhemdar.

PALMETTE, *n.* : xemila gulperên tîrêjî.

PALMETTO, *n.* : texlîtek darqesp e.

PALMIPED(E), *n., adj.* : pêlepî (pêyê til pêkve).

PALMIST, *n.* : lepbîn.

PALMISTRY, *n.* : lepbînî, destxwendin.

PALMITATE, *n.* : xwêya tirşiya darqespî.

PALMITIC ACID, *n.* : tirşiya darqespî.

PALMITIN, *n.* : darqespîn.

PALM SUNDAY, *n.* : yekşemba berî roja cejna qiyametê : yekşemba hevrisî ko roja Îsa pexember çûyî Qudsê û belgên hevrisî li ser rê lê werhandin.

PALMY, *adj.* : têrdarqesp.

PALMYRA, *n.* : tedmur, darqespek çiqbaweşînk e.

PALOLO, *n.* : kirmek kevirên zeryayê hedar ko xoş dihên xwarin.

PALOMINO, *n.* : hespê zêrîn yan zerê vekirî.

PALOVERDE, *n.* : darek bi stirî û gulzer e.

PALP = PALPUS.

PALP, *vt.* : seh kirin, rakirin û danan.

PALPABILITY, *n.* : destdanbarîtî, berhestbarîtî, sehkirinbarîtî.

PALPABLE, *adj.* : destdanbar, berhest, seh(kirin)bar, eşkera, diyar, nêreban.

PALPABLY, *adv.* : bi berhestî, bi nêrebanî.

PALPAL, *adj.* : sehkirî.

PALPATE, *vt.* : sehkirin (destdanî).

PALPATED, *adj.* : sehkirî (destdanî).

PALPATING, *n.* : sehkirin.

PALPEBRA, *n.* : qepûlk.

- **INFERIOR** : berê çavî.

- **SUPERIOR** : pişta çavî.

PALPEBRAL, *adj.* : qepûlkî.

PALPITANT, *adj.* : pirteyî, lereyî.

PALPITATE, *vt.* : pirte kirin, qutîn.

PALPITATION, *n.* : dilkutî, dilhilavêtin, teptep, pirte, levdan, nukuç.

PALPUS, *n.* : sehker, şaxîhestiyar.

PALSHIP, *n.* : hogirîtî.

PALSIED, *adj.* : şeht.

PALSTAVE, *n.* : alavek pirinc ya berî dîrokê bo kelşa destikî.

PALSY, *n.* : şehtî, falinc, goçî.

- **WALSY** : hevalê gelek nêzîk.

PALSY, *vt.* : şehtî kirin.

PALTER, *vt.* : bazar kirin, fêlbazî kirin, têk vedan kirin, xapandin.

PALTERED, *adj.* : xapandî, fêlbazîkirin.

PALTERING, *n.* : fêlbazîkirin, xapandin.

PALTRINESS, *n.* : pûçî, kotî, potalî.

PALTRY, *adj.* : potal, bêbiha, nehêja.

PALUDAL, *adj.* : zongî, zengawî.

PALUDISM, *n.* = **MALARIA (TA).**

PALUDRINE, *n.* : palodrîn : dermanê tayê (malarya).

PALY, *adj.* : piçekê pêtî.

PALYNOLOGICAL, *adj.* : (helez) gerikî.

PALYNOLOGY, *n.* : (helez) gerikzanî.

PAMPA, *n.* : deştek mezin û bêdar e li başûra Amazonê.

PAMPER, *vt.* : nazdar kirin, rû dan.

PAMPERED, *adj.* : nazdarkirî.

PAMPERING, *n.* : nazdarkirin, rûdan.

PAMPERO, *n.* : bayê sarê çiyayê Endîz.

PAMPHLET, *n.* : belavok, namîlke.

PAMPHLETEER, *n., vt.* : belavokvan, namîlkevan, belavok yan namîlke nivîsîn û belav kirin.

Pan, *n.* : Xudayê daristanan, kozan û şivanan.

PAN, *n.* : tawe, axlewîk, çalayî, nizman.

- **FISH** : masiya biçûk ya qelandinê (hemû).

- **OF SCALES** : ta.

PAN, *vt., i.* : bi axlewîkê bijartin.

- **TO ~ OFF** : cercîr yan bestîloka zêrî bi axlewîkê bijartin (wek bêjingê).

- **TO ~ OUT** : cercîr yan bestîloka zêrî bi axlewîkê bijartin (bêjing kirin), zêrî berhem kirin.

PAN, *pref.* : pêşgir e ko hemî, hemû ye.

- **American** : Emerîkanî (hemû).

- **Americanism** : bizava yekitiya Emerîkanî.

- **HELLENISM** : yekitiya Yûnanî (bizav yan tevger).

- **HUMAN** : pêwendîdarê hemû mirovatiyê.

- **ISLAMIC** : bizava yekitiya musilmanî yan îslamî, pan îslamî.

- **LOGISM** : jîrbêjî (Hegelî) ko her hişdar rast didît.

- **LOGISTIC** : pêwendîdarê jîrbêjiya Hegelî.

- **SEXUAL** : fireregezî.

- **SEXUALITY** : fireregezîtî.

PANACEA, *n.* : dermanê hemû derdan, hibirman.

PANACHE, *n.* : gurzeyê peran li ser xodeyî (bo xemlê).

PANADA, *n.* : qawît.

PANAMA, *n.* : şefqeyê qirşikî.

PANAMANIAN, *n., adj.* : Panamayî.

PANCAKE, *n.* : zilopî.

PANCAKE, *vi., t.* : li ser binî hatin xwarê (danan : balafir).

PANCAKE LANDING, *n.* : dahatin (danan), ya li ser binî.

PANCHAYAT, *n.* : civata gundî ya Hindî.

PANCHROMATIC, *adj.* : hestiyarê hemû rengên şebengî.

PANCRATIC, *adj.* : pêwendîdarê pêşbirkeya werzişî ya grekî.

PANCRATIUM, *n.* : pêşbirkeya werzişî ya grekî (zoranî û kulmbazî pêkve).

PANCREAS, *n.* : şêlav.

PANCREATIC JUICE, *n.* : şîrêza şêlavê.

PANCREATIN, *n.* : penkiryatîn : têkiliya haveynên şîrêza şêlavê.

PANCREATITIS, *n.* : şêlavkulî.

PANCYTOPENIA, *n.* : nesaxiya kêmxwînê.

PANDA, *n.* : dehbeyê wek hirçê (biçûktir e).

PANDECT, *n.* : kitêba qanûnên Romanî.

PANDEMIC, *n., adj.* : derdê vegir.

PANDEMONIUM, *n.* : xiroş.

PANDER, *n.* : qeprax, gewad.

PANDER, *vi., t.* : gewadî kirin.

PANDERED, *adj.* : gewadîkirî.

PANDERING, *n.* : gewadîkirin.

PANDIT, *n.* : pendiyar (Hindî).

PANDOR, *n.* : pendor : alavek mûzîqeyî wek gîtarê ye.

- **'S BOX** : sindoqa pandora : ko hîvî bi tenê têde maye û hemû xirabkarî jê derketine.

PANDORA OR PANDORE, *n.* : alavek mûzîqeyî jenîn (pendor).

PANDOWDY, *n.* : şirînayiya sêvê.

PANDURATE, *adj.* : kivanceyî.

PANDURIFORM, *adj.* : (wek) kivanceyî.

PANDY, *vt.* : (şagird) siza kirin.

PANDYING, *n.* : sizakirin.

PANE, *n.* : parçeya cama pencerê yan pêçgirê, beşek jî rûpelê pûlên posteyî.

PANEGYRIC, *n., adj.* : pesn, stayîş.

PANEGYRICAL, *adj.* : pesnî, pesindar.

PANEGYRICALLY, *adv.* : bi pesnî, pesinkî.

PANEGYRIST, *adj.* : pesinkar.

PANEGYRIZE, *vt.* : pesn kirin.

PANEL, *n.* : deste, dep, dehmen, girûhek berhevdankaran (berpirsên rêzikî civakî ~), xişteya dadbexşan, desteka dadbexşan.

- **DOCTOR** : pijîşkê xişteyî (ko kesên navên xwe li nik dinivîsîn çare dikit).

- **HEATING** : germkirina tîrêjî.

- **TRUCK** : barkêşa biçûk ya sivik.

PANEL, *vt.* : dep kirin, dadbexş helbijartin.

PANEL(L)ED, *adj.* : depkirî.

PANEL(L)ING, *n.* : depên darî ko dîdarî dinixêvin.

PANELIST, *n.* : endamê desteka rawêjan.

PANFUL, *adj.* : axlewîkek (axlewîkek tejî).

PANG, *n.* : niquç, çizandin, zixtik, jana nişkî.

PANGA, *n.* : bivirê Efrîqayî.

PANGENESIS, *n.* : hemûyatiya bûnê : dîtaneyek ko hemû xaneyên zindewerî leşikên zikmakî dihavên û li nav leşî de digerin û dizên (bi dabeşbûnê) û kom dibin di nav hêkan de ko birîtî ne ji leşikên parçe yên babî bi xwe.

PANGOLIN, *n.* : canewerek mêrîxwer e.

PANHANDLE, *n., vt.* : destikê axlewîkê, deverek ji welatekê ketî navbera du welatên dî de, parsêkî kirin.

PANIC, *n., adj.* : tirs, sehm, sahmek, hejivîn.

- **BUTTON** : karê tengavî.
- **MONGER** : tirsgêr.
- **STRICKEN** : bizdihiya, bizdihî, tirsayî.
- **STRUCK** : tirsayî, bizdihayî.

PANIC, *vt., i.* : tirsîn.

- **GRASS**, *n.* : texlîtek giya ye.

PANICKED, *adj.* : toqandî, tirsayî, bizdihayî.

PANICKING, *n.* : toqandin.

PANICKY, *adj.* : tirsinok.

PANICLE, *n.* : îşî, gulîşî.

PANICLED, *adj.* : îşikirî.

PANICUM, *n.* : giya.

PANIFICATION, *n.* : nanpehtin.

PANJANDRUM, *n.* : zirerkdar, (kesê) karbidest, bernavê tiraneyê mirovê giring, giremirov.

PANMIXIA, *n.* : têkiliya koraneya za û zêyî.

PANNAGE, *n.* : (bihayê) kirêya kozê.

PANNE, *n.* **(~ VELVET)** : perûkê qedîfe yan mexmel).

PANNED, *adj.* : axlewîkkirî (sepîkirî bo zêrî).

PANNIER, *n.* : berşîne, sewî, selik, sebet, kirasê firehkirî (bo olkî), olkê kiras (ko nermok e bo firehkirinê).

PANNIKIN, *n.* : tirar, qazana biçûk.

PANNING, *n.* : sepîkirin (bo peydakirina zêrî).

PANOPLIED, *adj.* : kinckirî, zirêkirî.

PANOPLY, *n.* : kinc, zirê.

PANOPTICON, *n.* : zindana girûvir.

PANORAMA, *n.* : panorama : dîtina berfireha hemûkî, zincira wêneyan.

PANORAMIC, *adj.* : panoramî, dîtina hemûkî.

PANORAMICALLY, *adv.* : bi dîtina hemûkî.

PANPIPE(S), *n.* : fîtke : alavek mûzîqeyî ji boriyên dirêj û peyhatî çêkirî ye û dengî wek fîtikan dihînit der.

PANSY, *n.* : nêremok, lotî, texlîtek binefş.

PANT, *n.* : pirte, navkutik, helkelk.

- **DRESS** : cilkek kiras dabeşkirî.
- **SUIT** : deste cilên vî kirasî.

PANT, *vt., i.* : helkelkê kirin, pirte kirin, helm kirin.

PANTAGRUELION, *n.* : tiranekerê geveze.

PANTAGRUELISM, *n.* : tiraneyîtiya gevezeyî.

PANTALETS, *n.* : bin şelwar.

PANTALOON, *n.* : penteron, zirtek, pantor, pantalan.

PANTECHNICON, *n.* : erebane yan barkêşa girtî (daxistî).

PANTHEISM, *n.* : yeketiya hebûnê : ola dibêjit ko Xuda û sirûşt yek tişt e, ko gerdûnê madî û mirov diyardeyên xwe yên Xudayî ne.

PANTHEIST, *n.* : bawermendê yekitiya hebûnê, panteîst.

PANTHEISTIC(AL), *adj.* : pêwendîdarê bawermendê yekitiya hebûnê.

PANTHEISTICALLY, *adv.* : bi baweriya yeketiya hebûnê.

PANTHEON, *n.* : panteon : xudageh, goristana mezinên neteweyekê.

PANTHER, *n.* : piling.

PANTHERESS, *n.* : (mê) piling.

PANTIE, *n.* : kurtederpê.

- **GIRDLE** : piştêna jinanî.

PANTIHOSE, *n.* : derpê.

PANTILE, *n.* : kerpûçê pêliyê pêkhatî yan awêtê.

PANTING, *n.* : navkutik, nîxenîx, helkelk.

PANTISOCRACY, *n.* : civata aşopî ko hemû xelk yeksane ne û hemû hukim dikin.

PANT(O)-, *pref.* : pêşgir e ko hemî, hemû ye.

PANTOFLE, *n.* : şimik.

PANTOGRAPH, *n.* : rûnivîsk : bo rûnivîsîna nexşe û dahênanan.

PANTOGRAPHIC, *adj.* : rûnivîskî.

PANTOLOGIC, *adj.* : zanîniya cîhanî (hemûkî).

PANTOLOGY, *n.* : dîtina rêzikiya hemû zanîna mirovî.

PANTOMIME, *n.* : kirdarê yan kirdara şanogeriya nîşankerî, nîşankerîtî, hunera kirdariya nîşankerî.

PANTOMIME, *vt., i.* : kirdar kirin (nîşankerî).

PANTOMIMIC, *adj.* : nîşankerî.

PANTOMIMED, *adj.* : kirdarkirî (bi nîşanê).

PANTOMIMING, *n.* : kirdarkirin (bi nîşanê).

PANTOMIMIST, *n.* : kirdarê nîşanker.

PANTOMORPHIC, *adj.* : hemû şikil, hemecor.

PANTOSCOPE, *n.* : wênegira hemûkî, nîskeya goşeberfire.

PANTOSCOPIC, *adj.* : hemûkî binî.

PANTOTHENIC ACID, *n.* : vîtamîna grûpa (B) ko pêviya ye (di nav kezebê de) bo werarê.

PANTROPIC, *adj.* : bûyeriya yeksanekerî.

PANTRY, *n.* : jor yan mezelka azoqeyî û amanan, jora çêkirina xwarinên sar.

- **MAN** : azoqevan.

PANTS, *n.* : şelwar, derpê, ranik.

PANTY OR PANTIE, *n.* : hevalkiras.

- **HOSE** : binkirasê jinê (derpê).

- **WAIST** : qonde.

PANZER, *n., adj.* : zirêpûş.

- **DIVISION** : tîpa zirêpûş.

PAP, *n.* : çiçe, çiçikî, xureknerm bo zaro û nesaxan.

PAPA, *n.* : bab.

PAPACY, *n.* : papatî, papayî.

PAPAIN, *n.* : anzîma pirteqalek lakêşeyî negehiştî (bo nazikkirina goştî bi kar dihêt).

PAPAL, *adj.* : papayî.

- **CROSS** : xaça papayî.

- **INFALLIBILITY** : neçewtiya papayî.

PAPARAZZO, *n.* : wênegirê çalakê navdaran.

PAPAVERACEOUS, *adj.* : xurîfkî.

PAPAVERINE, *n.* : nîvtiftek belûrî ye.

PAPAVEROUS, *adj.* : xurifkî.

PAPAW (PAW PAW), *n.* : pirteqalek lakêşî ye, darek jî bakura Emerîka gulbinefşî û ber lakêş e ko pirteqal e.

PAPAYA = PAWPAW.

PAPER, *n., adj.* : kaxez, pel, pelk, belg, per.

- **BACK** : kitêba bergtenik (kaxez).

- **BIRCH** : heyzeranê Emerîkanî.
- **BOARD** : karton, kaxeza qayimkirî.
- **BOUND** : bergkaxez.
- **CUTTER** : kaxezbirr, kêrika kaxezan.
- **HANGER** : kaxezkerê dîwaran.
- **HANGING (DİWAR)** : kaxezkirin.
- **HOLDER** : kaxezgir.
- **KNIFE** : kaxezbirr.
- **MILL** : aşê kaxezan (çêkirin).
- **MONEY** : kaxeza diravî.
- **MULBERRY** : tiya kaxezan.
- **WEIGHT** : girankera kaxezan (senga kaxezan).
- **WORK** : karê kaxezî.

PAPER, *vt., i.* : kaxez kirin.

PAPERINESS, *n.* : kaxezîtî.

PAPERING, *n.* : kaxezkirin.

PAPERY, *adj.* : kaxezî.

PAPHEAN, *n., adj.* : felîte, jinbaz, sîtar, bêsincî, pêwendîdarê evîniya regeziya nerewa : pafosî, ji kevnebajarê Pafosê Qinrisî ko Afrodît diperistin.

PAPILIONACEOUS, *adj.* : pelpelîtkî.

PAPILLA, *n.* : çiçik, çiçe (wek sermemikî yan çiçeyî li ser leşî).

PAPILLARY, papillate, papillose, *adj.* : çiçeyî.

PAPILLOMA, *n.* : pejbûna çiçeyî.

PAPILLO, *n.* : seyê biçûk, tîle.

PAPIST, *n.* : papayî (katolîk).

PAPISTIC(AL), *adj.* : (mirovê) katolîkî (papayî).

PAPISTICALLY, *adv.* : bi papayî.

PAPOOSH, *n.* : pêpûş (baboç).

PAPPUS, *n.* : derhatina hêkdankê yan berê hindek helezan.

PAPRIKA, *n.* : bîber.

PAPULA, *n.* : zîpik, pirzik.

PAPULAR, *adj.* : zîpkî, pirzikî.

PAPULE, *n.* : zîpik, rîşik, pirzik.

PAPYRACEOUS, *adj.* : kaxezî.

PAPYRO-, *pref.* : pêşgir e ko kaxez e.

PAPYROLOGICAL, *adj.* : kevnekaxeznasiyî.

PAPYROLOGIST, *n.* : kevnekaxeznas.

PAPYRUS, *n.* : leven, zel, kaxeza levenî, papîrûs.

PAR, *n.* : bihayê navekî, yeksanî, bihayê hevtayiya du diravan.

- **ABOVE ~** : pitir e ji bihayê navekî.
- **AT ~** : bihayê navekî.
- **BELOW OR UNDER ~** : kêmtir ji bihayê navekî.

PARA-, *pref.* : pêşgir e ko pişt, nerêk (nerêzik), çewt, rexekî, berdêl, wek e.

PARABASIS, *n.* : axiftina korsî û guhdaran li şanogerî ya tiraneyî ya grekî.

PARABIOSIS, *n.* : yekîtiya kelşînî û endamerkzanî.

PARABLE, *n.* : çîroka hêmayî, metelok.

PARABOLA, *n.* : birrîna hevta.

PARABOLIC(AL), *adj.* : birrîniya hevtayî.

PARABOLICALLY, *adv.* : bi birrîniya hevtayî.

PARABOLOID, *n.* : leşê zivrokiyê hevtayî.

PARACETAMOL, *n.* : dêndik (cebik) ya pêkhatiya toza belûriya spî, hedarkerek nerm û dijtayê ye.

PARACHROMATIC, *adj.* : hestiyarê rengî, hestiyarê bireng.

PARACHRONISM, *n.* : çewtiya dîroktomarî.

PARACHUTE, *n.* : paraşût, sêwaneya dahatinê (hatin xarê).

PARACHUTE, *vt., i.* : hatin xarê (bi paraşûtê).

PARACHUTIC, *adj.* : paraşûtî.

PARACHUTIST, *n.* : paraşûtvan.

PARACLETE, *n.* : rawêjkar, parêzer.

PARADE, *n.* : leşkerniwandin : gerdûne, bijarkirin, san.

PARADE, *vt., i.* : bijar kirin.

PARADED, *adj.* : bijarkirî.

PARADICHLOROBENZE, *n.* : belûriyek spî dij morane yan xorik.

PARADIDDLE, *n.* : dehol (ya lêdana du darikan).

PARADIGM, *n.* : nimûne.

PARADIGMATIC(AL), *adj.* : nimûneyî.

PARADIGMATICALLY, *adv.* : bi nimûneyî, nimûnkî.

PARADISE, *n.* : beheşt, behişt.

PARADISAIC(AL), *adj.* = **PARADISIACAL.**

PARADISAL, *adj.* = **PARADISIACAL.**

PARADISIACAL OR PARADISIAC, *adj.* : beheştî.

PARADOS, *n.* : bilindiya erdî li pişt çeperî yan sengzirî bo parastina paşiyê.

PARADOX, *n.* : netebayî, nerêkî, narêkayetî.

PARADOXIC(AL), *adj.* : nerêk.

PARADOXICALITY, *n.* : nerêkîtî.

PARADOXICALLY, *adv.* : bi nerêkî, nerêkeyî.

PARADOXURE, *n.* : texlîtek sivoreyê darqespan.

PARADOXY, *n.* : nerêkî.

PARAFFIN, *n.* : parafîn : ji darî, rejiya komirî û neftê çêdikin û bo mûmikan bi kar dihînin.

PARAFORMAL DEHYDE, *n.* : toza spî ya formaldîhayd.

PARAGENESIS, *n.* : peydabûna lêkxişanî (kan).

PARAGENETIC, *adj.* : peydabûniya lêkxişanî.

PARAGENETICALLY, *adv.* : bi peydabûna lêkxişanî.

PARAGOGE, *n.* : berdansera tîpekê yan birgehekê li ser peyivekê.

PARAGON, *n.* : nayab.

PARAGRAPH, *vt.* : birgeh yan bend kirin.

PARAGRAPHER, *n.* : nivîserê kurtegotaran nemaze sergotaran.

PARAGRAPHIC, *adj.* : birgehî.

PARAGRAPHICALLY, *adv.* : bi birgehî, birgehkî.

PARAGRAPHIST, *n.* : bendnivîs.

PARAHELIOTROPISM, *n.* : xwaziya helezî ko berê belgan terîb bikit li gel ketina tîrêja rojê.

PARAHELIOTROPIC, *adj.* : pêwendîdarê xwaziya helezî ko berê xwe bidit rojê.

PARAHYDROGEN, *n.* : gerda hîdrojenê ko kakil dij araste dizivirîn.

PARAINFLUENZA VIRUS, *n.* : vîrûsa persîva zarokan.

PARAKEET (PARAQUET), *n.* : tûtiyek biçûk e û dûv dirêj e.

PARALAMBDACISM, *n.* : zimanfisî, zimanxwarî.

PARALANGUAGE, *n.* : karîgeriya bijare ya dengiya ko wateyê diyar dikit.

PARALDEHYDE, *n.* : polîmera oldîhayd (hedarker û tezînker e).

PARALIPOMENA, *n. pl.* : kitêbên dîrokî yên Tewratê.

PARALIPSIS, *n.* : dîtiniya têvel.

PARALLACTIC, *adj.* : dîtintêvelî.

PARALLAX, *n.* : dîmentêvelî, şûnciyawazî, têveliya şûna tiştî nemaze stêran) ji ber guhartina xalka zêrevaniyê.

PARALLEL, *n., adj.* : terîb, terîbî, hember, bateve, rêk, hawşan, parsûyî, hevhesû, mişlaq.

- **BARS** : hevhesûyî yan asûyî.

- **FORCES** : hêzên terîbî, hêzên parsûyî.

- **LINES** : xêzên hevhesû, rêzên hevhesû, xiçên hevhesû, dêrên terîb.

- **S OF LATITUDE** : hêlên pana.

- **VEINES** : demarên terîbî.

PARALLEL, *vt.* : hev hesû yan asû kirin, parsûyî kirin, terîb kirin.

PARALLELISM, *n.* : hevhesûyîtî yan hevasûyîtî, terîbîtî.

PARALLELOGRAM, *n.* : pelterîbî, la yan al terîb.

PARALOGISM, *n.* : nejîrbêjîtî.

PARALYSATION, *n.* : şehtî, goçî, demle.

PARALYSED, *adj.* : şat, şeht.

PARALYSIS, *n.* : falic, falinc, felc, şehtî, demle, goçî, şeple, îflîcbûn, felcbûn.

PARALYTIC, *adj.* : şeht, şehtî, felcî.

PARALYTICALLY, *adv.* : bi şehtî, bi felcî.

PARALYZATION, *n.* : şehtbûn, felcbûn.

PARALYZE, *vt.* : şeht kirin, felc kirin.

PARALYZED, *adj.* : şehtbûyî, felcbûyî.

PARALYZING, *n.* : şehtkirin, felckirin.

PARAMAGNET, *n.* : magnetîzterîb.

PARAMAGNETIC, *adj.* : magnetîziya parsûyî yan terîbî.

PARAMAGNETISM, *n.* : parsûyîtiya magnetîzî.

PARAMATTA, *n.* : tevnek tenik e (hirî û avirmîş yan hirî û pembû).

PARAMETER, *n.* : tîbaba neguhor.

PARAMILITARY, *n., adj.* : wek leşkerî.

PARAMNESIA, *n.* : nesaxiya bîrê nemaze wateyên peyivan.

PARAMORPHIC OR PARAMORPHOUS, *adj.* : guhurîniya belûrî.

PARAMORPHISM, *n.* : guhurîna belûrî.

PARAMOUNT, *n., adj.* : bala, serokî, bêqam.

- **IMPORTANCE** : bêqam giring.

PARAMOUNTCY, *n.* : serdestî.

PARAMOUNTLY, *adv.* : bi giringî, bi serdestî, serdestkî.

PARAMOUR, *n.* : yar, hevalk.

PARAMYLUM, *n.* : karbohîdrata kevzî (wek nişayê).

PARANG, *n.* : şûr yan kêrika kurt.

PARANOIA, *n.* : dînatiya tepeseriyê, dînatiya mezinatiyê, dînatiya guman û dudiliyê, paranoya.

PARANOIAC, *adj.* : pêwendîdarê dînatiya mezinatiyê yan guman û dudiliyê.

PARANORMAL, *adj.* : paşasa.

PARANYMPH, *n.* : birazava, xuşkbûk.

PARAPET, *n.* : çeper, senger, berbesta banî, pirê yan berbankî.

- **OF TRENCH** : sper.

PARAPETED, *adj.* : çeperkirî, berbestkirî, sengerkirî.

PARAPH, *n.* : neqşa mohrkirina îmzayê (dij zirkirinê).

PARAPHERNALIA, *n.* : kereste, samanê kesî yê jinê, samanê kesî.

PARAPHRASE, *n.* : dariştinve (riste yan hevok).

PARAPHRASE, *vt.* : dadirêjîtve (risteyê), wate bi peyivên dî derbirrîn.

PARAPHRASER, *n.* : darêjer (jî nûve).

PARAPHRASING, *n.* : dariştinve.

PARAPHRASTIC, *adj.* : raveyî, şiroveyî.

PARAPHRASTICALLY, *adv.* : bi şiroveyî.

PARAPHSIS, *n.* : tovta.

PARAPLEGIA, *n.* : şehtiya lingan û jêr leşî.

PARAPSYCOLOGICAL, *adj.* : derûnzaniyî.

PARAPSYCHLOGIST, *n.* : derûnzan.

PARAPSYCHOLOGY, *n.* : derûnzanî, parapsîkolojî.

PARAQUAT, *n.* : giyakujê dijwar.

PARASANG, *n.* : fersex : 3 _mîl (sêmîl û nîv).

PARASELENE, *n.* : zirheyv.

PARASITE, *n.* : mişexwer, miftxwer, dûvdehol, terefe, hewantexwer, çilterîfe, lakot.

PARASITIC(AL), *adj.* : mişexwerî, terîfeyî, lakotî.

PARASITICALLY, *adv.* : bi mişexwerî, bi terîfeyî, bi lakotî.

PARASITICIDAL, *adj.* : mişexwerkuj, lakotkuj.

PARASITICIDE, *n.* : mişexwerkuje, lakotkujî.

PARASITISM, *n.* : mişexwerîtî, pelmişîn.

PARASITIZATION, *n.* : mişexwerbûn, lakotbûn.

PARASITIZE, *vt.* : lakot kirin.

PARASITOLOGIC, *adj.* : lakotî.

PARASITOLOGICAL, *adj.* : lakotiyî.

PARASITOLOGICALLY, *adv.* : bi lakotî, lakotkî.

PARASITOLOGY, *n.* : lakotîzanî.

PARASITOSIS, *n.* : nesaxiya mişexwerî yan lakotî.

PARASOL, *n.* : sîbera rojê, sîwan, sêhwane.

PARASYMPATHETIC, *adj.* : dost.

- **NERVOUS SYSTEM** : rêzika demariya dost.

PARASYNTHESIS, *n.* : çekirina peyivan (bi derînan û pêkînanê).

PARASYNTHETIC, *adj.* : çêkirinî.

PARASYNTHETICAL, *adj.* : çêkiriniyî.

PARASYNTHETICALLY, *adv.* : bi bêgirêdanî yan bê risyanî.

PARATHION, *n.* : jehrek pêtik, zendî yan edî kuje.

PARATHYROID, *adj.* : rex hefkî, rex zençelok.

PARATROOP, *adj.* : paraşûtî, serbaziya paraşûtî.

PARATROOPER, *n.* : paraşûtî : serbazên paraşûtan.

PARATYPHOID, *adj.* : wek giranetayê.

PARAVANE, *n.* : mînmalîk.

PARBOIL, *vt.* : bêqam germ kirin, kelîn (parçekî).

PARBUCKLE, *n.* : werîs : du girê, jî nîvê bilind girêdayî bo nizimkirina birmîlan û topan.

PARCEL, *n.* : boxçe, beste, gurze, bapêç, parçe, parçeyî.

- **POST** : posteyê gurze yan besteyan.

- **GILT** : parçe zêrkirî.

PARCEL, *vt.* : belav kirin, pêçîn.

PARCELLED, *adj.* : parçekirî.

PARCELLING, *n.* : belavkirin, dabeşkirin.

PARCENARY, *n.* : hevkariya mîratî, beşgeha pêmayî.

PARCENER, *n.* : hevkarê mîratî.

PARCH, *vi., t.* (sivik) biraştin, zuha kirin, têhnî kirin, zuha bûn, têhnî bûn.

PARCHED, *adj.* : hişk yan zuha.

- **PEAS** : leblebî.

PARCHMENT, *n.* : keval, kevlê tenik.

PARCHMENTY, *adj.* : kevalî.

PARCLOSE, *n.* : perde yan asinkê cudakirina perisgehê dêrê.

PARD, *n.* : dost, heval, piling.

PARDNER, *n.* : dost, heval.

PARDALOTE, *n.* : balindeyek biçûk û rengîn ya Awistiralî ye.

PARDON, *n.* : bexşîn, lêborîn, têborîn, bexşandin.

- **I BEG YOUR ~ ?** : bibore? belê? lebê?.

PARDON, *vt.* : bexşîn, lêborîn.

PARDONABLE, *adj.* : bexşbar.

PARDONABLENESS, *n.* : bexşbarîtî.

PARDONABLY, *adv.* : bi bexşbarî.

PARDONED, *adj.* : bexşkirî, lêborî.

PARDONER, *n.* : bexşînfiroş, têbor, lêbor.

PARDONING, *n.* : têborandin.

PARE, *vt.* : kezax kirin, lêl kirin, spî kirin.

PARED, *adj.* : bodemkirî, kezaxkirî, lêlkirî.

PAREGORIC, *adj.* : afyoniya hedar kirinê.

PAREIRA, *n.* : dermanê riha teraşek brazîlî (bo mîzkirinê bi kar dihêt).

PARENCHYM, *n.* : madeyê gewheriyê livik yan endamî.

PARENCHYMATOUS, *adj.* : pêwendîdarê madeyê gewheriyê livikî yan endamî.

PARENT, *n.* : bab yan dayk.

PARENTAGE, *n.* : malbat, binemale, dayk û bab.

PARENTAL, *adj.* : babînî, bavînî.

PARENTALLY, *adv.* : bi deybavî.

PARENTERAL, *adj.* : nerîvîkî, nesorçikî.

PARENTERALLY, *adv.* : bi nesorçikî.

PARENTHESIS, *n.* : peyiv yan risteya di navbera du kevanan de.

PARENTHESIZE, *vt.* : kevane kirin (kirin di navbera du kevanan de).

PARENTHETIC(AL), *adj.* : kevanekirî (riste), duwemîn.

PARENTHETICALLY, *adv.* : bi risteya kevanekirî.

PARENTHOOD, *n.* : deybabî.

PARENTING, *n.* : xudankirina zarokî (bi deybaban).

PARENTS, *n.* : deybab.

PARERGON, *n.* : karê harîker.

PARESIS, *n.* : şehtiya parçekî ko masûlke ya nesehkera digirit.

PARESTHESIA, *n.* : şaşiya sehkirinê.

PARESTHETIC, *adj.* : şaşiya sehkirinê.

PARETIC, *n., adj.* : şeht yan şehtî (parçekî).

PAREVE, *adj.* : bêşîr û goşt çêkirî.

PAR EXCELLENCE, êkane, baştirîn, nayab, qetlaz.

PAR EXAMPLE : bo nimûne.

PAR FLECHE, *n.* : kevlê terşî.

PARFOCAL, *n.* : nîvtîrêjî, nîmçetîşkoyî.

PARFOCALIZE, *vt.* : nîv tîrêjî kirin.

PARGE, *n.* = **PARGET.**

PARGET, *n.* : gêç, gêçkarî.

PARGET, *vt.* : gêç kirin.

PARGETED, *adj.* : gêçkirî.

PARGETING, *n.* : gêçkirin.

PARGYLINE, *n.* : texlîtek anzîm e.

PARHELIC CIRCLE, *n.* : cixiza rojikî.

PARHELION, *n.* : rojik, zirroj.

PARIES, *n.* : dîwar, dîwarê endamê valayî.

PARITAL, *adj.* : dîwarî.

- **BONE** : yek ji cote hestiyên berdeyî, hestîkê tatî.

- **CELL** : xaneya tirşiya hîdrolîkî çêkirin.

PARING, *n.* : kezax, bodem, lêkirin, pijilandin, teşkirin.

- **KNIFE** : kêrika kezaxê.

PARING CHISEL, *n.* : hilkolkê spîkirinê.

PARIS, *n.* : Parîs : paytext yan serbajêrê Fransa.

- **GREEN** : madeyek kîmyayî jehrî ye (bo rengî û pêtik yan edîkujî).

PARISH, *n.* : bajêr, devera dêrekê.

PARISIAN, *n.* : Parîsî : xelkê Parîsê.

PARISON, *n.* : gomçika germa şûşeyî.

PARISYLLABIC, *adj.* : hevbirgeh.

PARITY, *n.* : hevyekî, yeksaneyî, hevhêzî, hawhêzî, hemberiyekî, hawmanendî.

- **BIT** : pirtika yeksanekirinê.

PARK, *n.* : çîmen, parîz, seyrangeh, medan.

- **WAY** : kolana pana darkirî.

PARK, *vt.* : rawestandin (otomobîl) û li meydanê hêlan.

PARKER, *n.* : rawestker.

PARKING, *n.* : kiloca riçalî (bi zencebîlî tamandî).

PARKING LOT, *n.* : meydana rawestandina otomobîlan, parking.

PARKING METER, *n.* : rawestanpîv, parkmetir.

PARKINSON'S DISEASE, *n.* : nesaxiya parkinsonî : şehtiya lerziyê.

PARKY, *adj.* (*sl.*) : sar.

PARLANCE, *n.* : suhbet, berhevdan (mîrî, ziman).

PARLAY, *n.* : girew (pêşbeziya hespan).

PARLAY, *vt.* : girew kirin.

PARLEY, *n.* : danûstandin (nemaze li gel dijminî), suhbet, berhevdan.

PARLEY, *vt.* : dan û standin kirin (dan û distandin).

PARLEY VOO, *n., vi.* (*joc*) : Fransî, zimanê fransî, fransî axiftin yan zanîn.

PARLIAMENT, *n.* : parleman : civata gelî, encumena nîştimanî.

PARLIAMENTARIAN, *n.* : parlemanî : endamê parlemanî yan civata gelî.

PARLIAMENTARY, *adj.* : parlemanî.

- **GOVERNMENT** : hikûmeta parlemanî.
- **LAW** : qanûna parlemanî.

PARLOUR, *n.* : bermal, dalan, jora pêşxwaziyê, damerzan.

- **BEAUTY ~** : ciwangeh, xemilgeh.
- **CAR** : jor xwemaliya hevkêşê.
- **MAID** : xidam (bo mêhvanan).

PARLOUS, *adj., adv.* : sehm, metirsî.

- **SHE IS ~ ! HANDSOME** : bêqam taze yan law e.

PARMA, *n.* (**~ VIOLET**) : binefşa gulxizêmê.

PAROCHIAL, *adj.* : radedar, teng.

- **SCHOOL** : dibistana dêrê.

PAROCHIALISM, *n.* : hiştengîtî.

PAROCHIALITY, *n.* : hiştengîtî.

PAROCHIALIZE, *vt.* : teng yan tengdeverî kirin.

PAROCHIALLY, *adv.* : bi hiştengî.

PARODIC, *adj.* : tiranekerî.

PARODIST, *n.* : tiraneker.

PARODY, *n.* : tirane : karê torî yan mûzîqeyî ko çav li kesek dî dikit bo tirane pê biket.

PARODY, *vt.* : tirane kirin.

PAROL, *n., adj.* : lêvikî, bêje.

PAROLE, *n.* : berdana merckirî, raz, perol.

PAROLE, *vt.* : berdan (bi merc).

PAROLED, *adj.* : berdayî (bi merc).

PAROLEE, *n.* : berdayî (bi merc).

PAROLING, *n.* : berdan (bi merc).

PARONOMASIA, *n.* : peyivleyiztin.

PARONOMASTIC, *adj.* : peyivleyiztinî.

PARONYCHIA, *n.* : pizî, nêrik, kolemê.

PARONYM, *n.* : bêjeya hevrih, hevrihî.

PARONYMOUS, *adj.* : hevrik.

PAROTID, *n., adj.* : livik, nik guhî.

- **GLAND** : livika bin guhî.

- **SALIVA GLAND** : gilîziya bin guhî.

PAROTITIS, *n.* : bineguh.

PAROUS, *adj.* : zayî, berdayî, berhemdayî.

PAROXYSM, *n.* : pejî.

PAROXYTONE, *n., adj.* : xurtkirina gotina birgehan.

PARPEN, *n.* : berê dûmahiyê : berê di nav dîwarî re.

PARQUET, *n.* : bermala depkirî, darê bermalê.

PARQUTED, *adj.* : depkirî.

PARQUETING, *n.* : depkirin.

PARQUETRY, *n.* : darê neqşkirî.

PARR, *n.* : masiya biçûk ya samon.

PARRAKEET, *n.* : tûtiyek biçûk e.

PARRAMATTA, *n.* : perûkê sivik yê kirasî (hirî, pembû yan avirmîş).

PARRIED, *adj.* : xwevedayî.

PARROT, *n., adj.* : tûtî, tûtiyî.

- **FASHION** : dubarekirin, wek tûtî.

- **FEVER = PSTTACOSIS.**

- **FISH** : tûtîmasî.

PARROT, *vt.* : dubare kirin (wek tûtî).

PARRY, *n.* : xwevedan.

PARRY, *vt.* : xwe vedan (ji lêdanekê).

PARRYING, *n.* : xwevedan.

PARSE, *vt.* : rêzimanî kirin.

PARSEC, *n.* : fersexa stêrî : yekeya pîvana dûratiya stêran.

PARSED, *adj.* : rêzimankirî.

PARSEE, *n.* : zerdeştî, zimanê farisî.

PARSEEISM, *n.* : zerdeştîtî.

PARSÎ, *n.* : zerdeştiyê neviyê penaberê bombayê (li Hindistanê).

PARSIMONY, *n.* : rijdî.

PARSIMONIOUS, *adj.* : rîjd, çirûk, çavmiç, qinût.

PARSIMONIOUSLY, *adv.* : bi rijdî, bi çikosî.

PARSIMONY, *n.* : destmiçandin, çikosî.

- **LAW** : qanûna hindikayî : ko çi hêz yan doz nehên girîmankirin jî ewên pêviyayî pêve bo rastiyan.

PARSING, *n.* : rêzimankirin, hevoksazî.

PARSLEY, *n.* : medenos, bexdenûs.

- **WILD ~** : zorik.

PARSNIP, *n.* : gêzera spî.

PARSON, *n.* : oldar.

PARSONAGE, *n.* : oldargeh.

PARSONIC, *adj.* : qeşeyî, oldarî.

PART, *n., adj.* : parçe, par, paj, pert, behr, kert, teş, tax, tar, tîş, pişk, parek, beş, rol.

- **FOR MY ~** : ji al yan layê min ve.

- **FOR THE MOST ~** : şîmaneya pitir.

- **IN GOOD ~** : bi aramî, bi bêhn firehî, bi dilniyayî.

- **IN ~** : parçeyî, parçkî.

- **ON THE ~ OF** : ji alê yan layê filanî ve.

- **OF SPEECH** : beşek axiftinê.

- **TO PLAY A ~** : xapandin.

- **TO TAKE ~ (IN)** : beşdarî kirin.

- **TO TAKE THE ~ OF** : lagîrî kirin, tagîrî kirin.

PART, *vi., t.* : cuda bûn, belav bûn, mirin, çûn, parçe kirin.

- **TO ~ WITH** : (jê) cuda bûn.

- **TO ~ COMPANY** : cuda bûn, jêkve bûn.

PARTAKE, *vi., t.* : beşdar bûn, beşdarî kirin.

PARTAKER, *n.* : beşdar.

PARTAKING, *n.* : beşdarkirin.

PARTAN, *n.* : kêvjal.

PARTHENOCARPIC, *adj.* : (ber) bêpeyînî yan gerikî.

PARTHENOCARPY, *n.* : bergirtina bêpeyîn yan bêgerik.

PARTHENIGENESIS, *n.* : zayîna keçî.

PARTHENOGENETIC, *adj.* : zayîniya keçî.

PARTHENON, *n.* : peykerê xudabanû etîna.

PARTHIA, *n.* : Part(iya) : kevneqiraliya rojavaya Asiya (bakura Îranê).

PARTHIAN, *adj.* : partiyayî.

PARTIAL, *adj.* : parçekî, alîgir, hevaldar, pertî, parçeyî, hindikî.

- **ECLIPSE** : roj yan hevgirtina parçekî.

- **FRACTIONS** : şikesteyên parçeyî.

- **TONE** : parçeawaz.

PARTIALITY, *n.* : alîgirîtî, lagîrî, layengirî, tagirî, bendîtî, hewes, hevaldarî, dubendî.

PARTIAL PRESSURE, *n.* : pestên yan wişara parçekî.

PARTIBLE, *adj.* : dabeşbar.

PARTICIPANT, *adj.* : pêşkdar, beşdar.

- **IN A CELEBRATION** : beşdarê şayiyan.

PARTICIPATE, *vt., i.* : beşdar bûn.

PARTICIPATED, *adj.* : beşdarkirî.

PARTICIPATING, *n.* : beşdarkirin.

PARTICIPATION, *n.* : hevpişkî, hevbehrî, beşdarî.

PARTICIPATIONAL, *adj.* : hevbehriyî, beşdariyî.

PARTICIPATOR, *n.* : pişkdar, beşdar, hevbehr.

PARTICIPATORY, *adj.* : pişkdarî.

PARTICIPIAL, *adj.* : pêwendîdarê navê karan.

PARTICIPLE, *n.* : navê karan, navê heyber.

PARTICLE, *n.* : pirtik, gerdîle, gerd, leşik, tenoçke.

- **PHYSICS** : fizyaya (fizika) leşikan.

PARTI-COLOURED, *adj.* : rengandî, renga-rengkirî.

PARTICULAR, *adj., n.* : taybet, taybetî.

- **IN ~** : bi taybetî.

- **NOUN** : serenav.

- **TO GO INTO ~S** : bi dirêjî vegêrîn yan rave kirin.

PARTICULARISM, *n.* : taybetîtî.

PARTICULARIST, *n.* : taybetmend.

PARTICULARITY, *n.* : şan, ged.

PARTICULARIZATION, *n.* : taybetîkirin.

PARTICULARIZE, *vt.* : taybetî kirin.

PARTICULARIZED, *adj.* : taybetîkirî.

PARTICULARIZING, *n.* : taybetîkirin.

PARTICULARLY, *adv.* : bi taybetî, nemaze, nexasme.

PARTICULATE, *adj.* : hûrkar.

- **INHERITANCE** : paşmayiya rûçikan bi guhaztina bi corî qanûna Mendel.

PARTIED, *adj.* : ahengkirî.

PARTIES, *n.* : part, partî.

- **TWO ~** : dubendî.

PARTING, *n., adj.* : çûn, mirin, jêvebûn, du riyan, têvelî, cudayî, koçkirî.

PARTI PARIS : alîgirî, pêşbiryarî.

PARTISAN, *n.* : alîkar, hevdest, lagir, hevpişt, hevaldar.

PARTISANSHIP, *n.* : bendîtî, dubendî, hevpiştî, hevaldarî.

PARTITE, *adj.* : dabeşkirî.

PARTITION, *n.* : dabeşkirin, parçekirin, parçeparçekirin, perde, sikir, berbest.

PARTITION, *vt.* : dabeş kirin, parçe kirin.

PARTITIONIST, *n.* : cudaxwaz.

PARTITIVE, *adj.* : parçeyî, parçedar.

- **GENITIVE** : nîşandarê hemû yan parçekî dabeşkirî.

PARTITIVELY, *adv.* : bi parçekî.

PARTIZAN, *n.* = **PARTISAN.**

PARTLET, *n.* : kirasek (bo stûyî û sermilan).

PARTLY, *adv.* : bi parçekî.

PART MUSIC, *n.* : mûzîqeya parçekirî (bo mûzîqevanan da ko serbixwe lê bidin).

PARTNER, *n.* : hevkar, hawkar, hevrê, hevbeş, pardar, hevpişk.

PARTNER, *vt.* : hevkarî kirin.

PARTNERSHIP, *n.* : hevayî, hevbeşî, pardarî, hevkarî.

PARTRIDGE, *n.* : por, sîsk, kew.

- **BLACK ~** : por.
- **FIGHTING ~** : kewê ribat.
- **HUNTING EXPEDITION** : karekew.
- **MALE ~** : nêrekew.
- **FEMALE ~** : mêkew, marî.

PART-SONG, *n.* : parçestran.

PART-TIME, *adj.* : parçeyî (ji demê karî).

- **TEACHING** : hînkirin yan fêrkirina parçeyî.

PARTURIENT, *adj.* : li ber biçûkbûnê, zêstanî.

PARTURITION, *n.* : biçûkbûn, zêstan.

PARTY, *n., adj.* : şayî, aheng, partî, şadî, bezm, bend, part.

- **COLOUR** : rengandî, rengareng.
- **LINE** : hêl, rêz yan rêzika partî.
- **WALL** : dîwarê hevbeş.

PARTYING, *n.* : ahengkirin.

PARURE, *n.* : taxima çekan (gewheran).

PARVENU, *n., adj.* : nû dewlemend.

PARVIS, *n.* : pêşmal.

PAS, *n.* : mafê berahiyê, pêngava semayê, sema.

PASCH, *n.* : cejna qiyametê.

PASCHAL LAMB, *n.* : pezê qurbanê.

PASHM, *n.* : kej.

PASQUE FLOWER, *n.* : gula qiyametê.

PASQUINADE, *n.* : rexnek, birgehek rexneki.

PASS, *n.* : gelî, rêrew, guhaztin, serketin, hinartina tepk (borandin) bo yarîkerek dî, derbend, derbaz.

- **TO HOLD THE ~** : piştgîrî yan bergîrî kirin (gelî parastin yan girtin).
- **TO SELL THE ~** : xinizî kirin.
- **WORD** : raz, perol, dirûşm.
- **WATER ~** : bor.

PASS, *vt., i.* : serkeftin, borandin, hinartin, borîn.

- **TO ~ A BALL** : tepik borandin.
- **TO ~ A REMARK** : serinc kirin, têbîniyek yan gotinek gotin.
- **TO ~ AWAY** : çûn, mirin.
- **TO ~ BY** : ji ber yan jê borîn, ji bîr kirin.
- **TO ~ BY THE NAME OF** : bi filan navî dihêt naskirin yan nasîn.
- **TO ~ FOR ANOTHER** : wek mirovek dî diyar bûn (hizir dikin ku mirovek dî ye).
- **TO ~ OFF** : wêve çûn, zir kirin.
- **TO ~ OUT** : dilgirtin, mirin.
- **TO ~ OVER** : guh nedan.
- **TO ~ THE TIME OF DAY** : silav kirin.
- **TO ~ THROUGH** : têre borîn, kêşan.
- **TO ~ THE WATER** : mîztin.

- TO ~ TO : rahişîn, derbaz bûn, borandin bo.

- TO ~ UP : qebûl nakit, berperç kirin.

PASSABLE, *adj.* : borînbar.

PASSABLY, *adv.* : bi qencî.

PASSAGE, *n.* : rê, rêguzar, derbazkirin, têperkirin, parçe, bend, bor, daborîn.

- IN ~ : bê pişkinîn, bi lez.

- OF ARMS : şer.

- WAY : rêgozar.

- WATER ~ : bor.

PASSAGED, *adj.* : derbazkirî.

PASSAGING, *n.* : derbazkirin.

PASSBOOK, *n.* = BANK BOOK.

PASS DEGREE, *n.* : bawernameya bi pileya serketinê (ne nayab).

PASSÉ, kevn, qurmiçî, pîr.

PASSEL, *n.* : birr, jimar yan tîbabek mezin, girûhek.

PASSENGER, *n.* : rêbar, rêwî, geştyar.

PASSER, *n.* : rêbar.

- BY : rêbar, rêbiwar, rêbor.

PASSERINE, *n., adj.* : lûskirî, lûsîn.

PASSIBILITY, *n.* : derdmendîbarî(tî).

PASSIBLE, *adj.* : derdmendîbar.

PAS SEUL : sema (daweta yek mirovî).

PASSIM, *n.* : li vêrê û wêrê û her dirê.

PASSIMETER, *n.* : alavka xwekariya pisûlekirîna hevkêşê.

PASSING, *n.* : borandin, rêborîn, derbazbûn, derbazkirin, têperkirin, avabûn, rewandin, dabor, têperîn, borîn.

- AWAY : candan, mirin.

- OVER : çavgirtînk.

- THROUGH : borîn.

PASSING BELL, *n.* : zengila şînîyê yan behiyê.

PASSION, *n.* : evdalî, giz, bengî, viyan, yarî, helçûn, sewda, sewda serî, hewes, şeydayî.

PASSIONAL, *n., adj.* : soza, pirtûka pîrozan.

PASSIONATE, *adj.* : sewda, giz.

- LOVE : şeydayî.

- LOVER : şeyda, giz.

PASSION FLOWER, *n.* : gula kovanan.

PASSION FRUIT, *n.* : berê hindek gul kovanan.

PASSION PLAY, *n.* : şanogeriya derasa.

PASSION SUNDAY, *n.* : yekşemba êşan yan kovanan.

PASSION WEEK, *n.* : heftiya êşan yan kovanan.

PASSIVE, *n., adj.* : sist, aştî, lêkirî.

- DEBT : deynê bêsûd.

- RESISTANCE : bergiriya nerêyî.

- VOICE : lêkerên karî nîşan dikin kesekê.

PASSIVELY, *adv.* : bi nerêyî.

PASSIVENESS, *n.* : nerêyîtî.

PASSIVISM, *n.* : nerêyîtî.

PASSIVITY, *n.* : sistî, nerêtî, helçûn.

PASSKEY, *n.* = MASTER KEY (kilîla taybet).

PASSOVER, *n.* : cejna Qiyametê (li nik Cihiyan).

PASSPORT, *n.* : derbazname, geştname, paseport.

PASSWORD, *n.* : peyiva borînê, peyiva razê, peyiva naskirinê, parola.

PAST, *adj., n., adv., prep.* : borî, berê, demborî, raburdû, dîrok, mêj, mêjedem.

- AT HALF ~ THREE : sê û nîv (demjimêr).

- ACTION : kar yan demê borî.

- ENDURANCE : barê bêqam giran.

- **LIFE** : pîşe yan karê borî.
- **PRAYING FOR** : bêhîvî.
- **TIME** : mêj.
- **VERB** : borî.
- **WORK** : êdî ne yê karî ye.

PASTA, *n.* : hevîr.

PASTE, *n.* : stirk, hevîr, çevrink, getîre, hewîr, şirêz.

- **BOOK BINDER'S ~** : golk.
- **SHOEMAKER'S ~** : golk, şirêz.

PASTE, *vt.* : venûsîn.

PASTED, *adj.* : venûsî, nûsikandî, risyayî.

PASTEL, *n.* : heşa şîn, rengvekirî, tenik, wêneyek torî raveyî sivik, toza çêkirina qelemên rengî, hevîrê hişkê heşî û ava şirêzî.

PASTEL(L)IST, *n.* : xamekar.

PASTER, *n.* : zendê dewarî.

PASTEURISM, *n.* : pastorîtî : pakkiriniti (paqijkiriniti).

PASTEURIZATION, *n.* : pastorkirina (pakkirin) şîrî.

PASTEURIZE, *vt.* : pak kirin.

PASTEUR TREATMENT, *n.* : çarekirina pastorî : (rêbaza Pastorî bo parêziyê ji nesaxiyan).

PASTEURIZED, *adj.* : pakkirî.

PASTEURIZING, *n.* : pakkirin.

PASTICCIO, *n. pl.* = **PASTICHE.**

PASTICHE, *n.* : girew, têkilî, berheliste.

PASTIL(LE), *n.* : tepka xoşhilmê bo malê.

PASTIME, *n.* : mijûlî, mijûlbûn, mijûlahî.

PASTINESS, *n.* : hevîrîti, pêtîti.

PASTING, *n.* : venûsîn, nûsikandin.

PAST MASTER, *n.* : pispor, serokê civatê yê berê.

PASTORAL, *n., adj.* : şivanî, terşî, gundewarî, sade, oldarî, nameya oldarî.

PASTORALE, *n.* : operaya şivanî yan gundewarî.

PASTORATE, *n.* : erkê oldarê bajêrî, desteyek ji oldarên bajêrî.

PAST PARTICIPLE, *n.* : navê lêkirî.

PAST PERFECT, *n., adj.* : dariştina borî yê berê.

PASTRAMIT, *n.* : bastirme.

PASTRY, *n.* : hevîrk.

- **STUFFED ~** : şemborak.

PESSARY, *n.* : fitîlka şermecêyî bo nehêlana avisiyê, alavka şermecêhelgir.

PESSIMISM, *n.* : reşbînî.

PESSIMIST, *n.* : reşbîn.

PESSIMISTIC, *adj.* : reşbîniyî.

PESSIMISTICALLY, *adv.* : bi reşbînî, reşbînkî.

PEST, *n.* : derd, êş nemaze reşav, pêtika ziyandar, giriftar.

- **HOLE** : şûna nesaxiyan, êşwar.

- **HOUSE** : nexoşxaneya nexoşiyên êşdar yan vegir.

PESTER, *vt.* : perîşan kirin, şepirze kirin, caris dike, tengav kirin.

PESTERED, *adj.* : şepirzekirî.

PESTERING, *n.* : şepirzekirin, tengavkirin.

PESTICIDE, *n.* : mêş yan mişkkuj.

PESTIFEROUS, *adj.* : bed : metirsî li ser civat, akar yan asayîşê.

PESTIFEROUSLY, *adv.* : bi derdî, derdkî.

PESTIFEROUSNESS, *n.* : bedîtî, derdîtî.

PESTILENCE, *n.* : reşav, êş, nesaxî.

PESTILENT, *adj.* : kuj, jehrî, metirsî, vegir, giriftar.

PESTILENTIALLY, *adv.* : bi derdî, derdkî, êşkî.

PESTILENTLY, *adv.* : bi giriftarî, giriftarkî.

PESTLE, *n.* : destikê hawinî, kutik, kutek, mîkut.

PESTLE, *vt.* : bi kar hînan, qutan, kutan, lêdan.

PESTELED, *adj.* : qutayî.

PESTLING, *n.* : qutan.

PESTOLOGICAL, *adj.* : derdî, êşî.

PESTOLOGIST, *n.* : derdzan, êşzan.

PESTOLOGY, *n.* : derdzanî, êşzanî.

PET, *n., adj.* : nazdar, dilber, enirîn, zarok yan canewerê nazdar.

- **ONE'S ~ AVERSION** : tiştê mirovî neviyayî.

- **NAME** : navê nazdariyê.

PET, *vt.* : nazdar kirin, maçî kirin, enirîn, sil bûn.

PETAL, *n.* : perê gulê, gul per, pere.

PETAL-LIKE : wek perê gulê.

PETAL(L)ED, *adj.* : gulperkirî.

PETALOID, *adj.* : gulperdar.

PETALOUS, *adj.* : gulperkirî.

PETARD, *adj.* : bereyişk.

PETASUS, *n.* : şefqeyê efsaneyê çengkiriyê grekî (yûnanî).

PETAURIST, *n.* : canewerê kîsdar.

PETCOCK, *n.* : pêtikê biçûk.

PETECHIA, *n.* : zîpik, pirzik.

PETER, *vi.* : qerimîn, westîn, namandin.

- **TO ~ OUT** : temirîn.

PETER PAN, *n.* : qehremanê romana bi vî navî yê ko dijît bêî ko mezin bibit (li aşopistanê).

PETER'S PENCE, *n.* : pensê Pitrisî : baca yek pensî ko malbata Înglîzî dida Papayî, bêşa salane ko katolîk didin papayî.

PETERSHAM, *n.* : şerîta avirmîş, kevnesaqo yan berciz.

PETHIDINE, *n.* : madayek qilêyî, qijilînbar û hedarker e.

PETIOLAR, *adj.* : pêkî, baskî (pê biçûk).

PETIOLATE, *adj.* : pêkdar, baskdar.

PETIOLE, *n.* : pêkok (pêyê biçûk), baskok.

PETIOLED, *adj.* : baskokirî.

PETIOLULE, *n.* : baskê belgikî.

PETIT, *adj.* : biçûk, hûr.

- **BOURGEOIS** : burjiwaziya biçûk.

- **JURY** : desteka sondxwarên biçûk.

- **LARCENY** : diziya biçûk.

PETITE, *adj.* : hûr, gewd, biçûk û law.

PETITENESS, *n.* : hûrîtî.

PETITFOUR, *n.* : kilocek biçûk e.

PETITION, *n.* : berxistek, skalaname, hilname, dawxaz.

PETITION, *vt. i.* : hîvî kirin, daxwaz kirin.

PETITIONARY, *adj.* : berxistekî, xwastî.

PETITIONED, *adj.* : daxwazkirî, berxistekî.

PETITIONER, *n.* : xwaz.

PETITIONING, *n.* : xwastin.

PETR-, PETRI- OR PETRO-, *pref.* : pêşgir e ko ber e, kevir e.

PETREL, *n.* : balindeyek deryayî ye.

PETRIDISH, *n.* : amanê pêtrî : amanek şûşê tenik û devek nerm e.

PETRIFACTION, *n.* : berkirin, berbûn, berîn, kevrîn.

PETRIFACTIVE, *adj.* : berkerî, kevirkerî.

PETRIFY, *vt.* : ciniqîn, kirin ber, mirandin, şeht kirin, ber yan kevir kirin.

PETROCHEMICAL, *n., adj.* : petrokîmyayî.

PETROCHEMISTRY, *n.* : kîmyaya keviran.

PETROGENESIS, *n.* : nijad yan çêbûna keviran.

PETROGRAPHER, *n.* : pisporê keviran, kevirzan.

PETROGRAPHIC(AL), *adj.* : pisporiya keviran.

PETROGRAPHY, *n.* : kevirzanî.

PETROL, *n.* = **GASOLINE** (petrol, neft).

PETROLATUM, *n.* : madeyek petrolî, nêtar, bêreng û bêbêhn e.

PETROLEUM, *n.* : petrol, neft, newt.

PETROLIC(AL), *adj.* : petrolî, neftî.

PETROLOGICALLY, *adv.* : bi petrolî, petrolkî.

PETROLOGIST, *n.* : petrolzan, neftzan, kevirzan.

PETROLOGY, *n.* : kevrzanî, petrolzanî.

PETRONEL, *n.* : kevnedebanceya mezin.

PETROSAL, *adj.* : kevrî.

PETROUS, *adj.* = **PETROSAL.**

PETTED, *adj.* : nazdarkirî.

PETTING, *n.* : nazdarkirin.

PETTICOAT, *n., adj.* : hevalkiras.

- **GOVERNMENT** : hukmê jinan.

- **INSULATOR** : cudakerî qepûçkî yan binkirasî.

PETTIFOG, *vt.* : xapandin (di pirsên qanûnî de), berevaniya pirsên biçûk kirin.

PETTIFOGGER, *n.* : perêzerê biçûk.

PETTIFOGGING, *n.* : pûç, mijûlê pûçatiyan.

PETTILY, *adv.* : bi pûçîtî, pûçkî.

PETTINESS, *n.* : pûçîtî, kotî.

PETTING, *n.* : nazdarkirin, rûdan.

PETTISH, *adj.* : enirok, bedmad.

PETTISHLY, *adv.* : bi bedmadî, bedmadkî.

PETTISHNESS, *n.* : çirtîtî.

PETTITOES, *n.* : pêyên mirovî nemaze zarokî, pêyên berazî bo kêpayî (paçe) ye.

PETTY, *adj.* : pûç, hûr, negiring, biçûk, nizm, hîçek.

- **CASH** : diravê hûr.

- **OFFICER** : efserk (deryayî).

- **STATE** : dewletok (dewleta biçûk).

PETULANCE, *n.* : çirtî.

PETULANCY, *n.* = **PETULANCE.**

PETULANT, *adj.* : çirt.

PETULANTLY, *adv.* : bi çirtî.

PETUNIA, *n.* : helezek gul kovikkî, spî, binefşî yan sor e.

PETUNTSE, *n.* : berê giranîtê yê spî tozkirî bo gilkariyê.

PEW, *n.* : xanîk li dêrê, textê dirêj yê rûniştinê (piştkirî) li dêrê, rûnîştek.

- **OPENER** : raberê rûnîştekan li dêrê.

PEWEE, *n.* : balindeyek mêşrevîn e.

PEWIT, *n.* : balindeyek serreş e.

PEWTER, *n.* : darişteyê gewr yê teneke û qurquşmî, amanê ji vê darişteyê çêkirî.

PHAETON, *n.* : payton.

- **PHAGE**, *suff.* : paşgir e ko xwer yan daûrk e.

PHAGED(A)ENA, *n.* : kulbûna belav.

PHAGOCYTE, *n.* : daûrk : xaneyeke leşên biyanî daûrîn.

PHAGOCYTICE INDEX, *n.* : raberê daûrkî.

PHAGOCYTIZE, *vt.* : daûrîn.

PHAGCYTOSIS, *n.* : daûrandin.

- **PHAGOUS**, *suff.* : paşgir e ko xwer e.

- **PHAGY**, *suff.* : paşgir e ko xwer yan xwerê madeyekê yan tiştekê ye.

PHALANGE, *n.* : tilhestî.

- **DIGITAL** : bûne movik.

PHALANGEAL, *adj.* : tilhestiyî.

PHALANSTERY, *n.* : avahiya komeleya civakiyetî.

PHALANX, *n.* : movik (tilên dest û pêyan), rêza rezma şerî, komeleya civakiyetî.

PHALAROPE, *n.* : balindeyek avî ye.

PHALLIC, *adj.* : kîrî, kîrperistinî.

PHALLICISM, *n.* : kîrperistin.

PHALLUS, *n.* : kîr, sawîrê kîrî.

- **OUTLET** : mîzok, mûzî.

PHANEROGAM, *n.* : helezek guldar e, mêyek û nêrek (herdu) hene.

PHANEROGAMIC OR PHANEROGAMOUS, *adj.* : jî heleza mêyekî û nêrekî pêkve.

PHANTASM, *n.* : peş, şebeng, aşop.

PHANTASMA, *n.* = **PHANTASM.**

PHANTASMAGORIA, *n.* : diyardeyek bînayî ye ko wêne diyar dibit heçko wêve diçit yan hirve dihêt.

PHANTASMAL, *adj.* : aşopî.

PHANTASMIC, *adj.* = **PHANTASMAL.**

PHANTASY, *n.* = **FANTASY.**

PHANTOM, *n.* : peş, şebeng, sawîr, leylan.

- **TUMOUR** : zir perçiftin yan peybûn.

PHARAOH, *n.* : Fîron, Firêwn, qiral.

- **ANT** : mêriya fironî (mêriyek biçûk û sor e).

PHARISAIC(AL), *adj.* : zirdîndar.

PHARISAICALLY, *adv.* : bi zirdîndarî, zirdîndarkî.

PHARISAISM, *n.* : zirdîndarîtî.

PHARISEE, *n.* : zirdîndar, Cihiyê demê Îsa pêxemberî.

PHARMACEUTIC(AL), *adj.* : (pêwendîdarê) dermansazî.

PHARMACEUTICS, *n.* = **PHARMACY.**

PHARMACIST, *n.* : dermansaz, dermanfiroş.

PHARMACO-, *pref.* : pêşgir e ko derman e.

PHARMACODYNAMICS, *n.* : dermanzanî.

PHARMACOLOGIC(AL), *adj.* : dermansazî.

PHARMACOLOGIST, *n.* : dermansaz.

PHARMACOLOGY, *n.* : dermansazî, dermanzanî.

PHARMACOPOEIA, *n.* : destûr yan kitêba dermansazî.

PHARMACOTHERAPY, *n.* : çarekirin bi dermanî.

PHARMACY, *n.* : dermanxane.

PHAROS, *n.* : fener, far.

PHARYNG(O)-, *pref.* : pêşgir e ko gewrî, gerû ye.

PHARYNGEAL, *adj.* : gerûyî, gewriyî.

PHARYNGITIS, *n.* : gerûkulî, gewrîkulbûn.

PHARYNGOLOGY, *n.* : gewrîzanî.

PHARYNGOSCOPE, *n.* : gewrîbîn, gerûbîn.

PHARYNGOTOMY, *n.* : gewrî yan gerû birîn yan helkêşan.

PHARYNX, *n.* : gewrî, hefk, zengilok.

PHASE, *n.* : gîhanek, qonax, bar, tewr, koçe.

- **IN ~** : hevdemî.

- **ANGLE** : goşeya tewr, goşeya koçeyî.

- **DIAGRAM** : neqşeya tewr yan koçeyî.

- **REVERSAL** : berevajî tewr yan koçeyî.

- **OUT OF ~** : nehevdemî.

PHASE, *vt.* : koçe kirin (melheze).

- **TO ~ OUT** : rawestandin (berhem yan kar).

PHASED, *adj.* : qonarkî, koçeyî.

PHASIC, *adj.* : koçeyî.

PHASICALLY, *adv.* : bi koçeyî, koçekî.

PHASING, *n.* : hevdemkirin, qonaxkirin, koçekirin.

PHATIC, *adj.* : axiftiniya qenc ya gişti.

PHATICALLY, *adv.* : bi axiftina qenc.

PHEASANT, *n.* : por, tirac, çor, qerqawon, tezero.

PHELLEM, *n.* : çînek, xaneyên tepedorî.

PHELLODERM, *n.* : çermê tepedorî.

PHELLOGEN, *n.* : tepedorzê.

PHEN(O)-, *pref.* : pêşgir e ko fenîl e : madeyê qetranê (qîra reşiyê).

PHENACAIN(E), *n.* : fenakaîn.

PHENACETIN, *n.* : dermanê (dij) tayê (esîtîl), fenasetîn.

PHENOBARBITAL, *n.* : dermanê hedarkerê barbîturît.

PHENOL, *n.* : fenol : pakker, paqijker.

PHENOLOGICAL, *adj.* : pêwendîdarê keş û jîn zanistiyê.

PHENOLOGY, *n.* : zanyarî yan zanistiya keşî û diyardeyên jînî yên gerî.

PHENOMENA, *n.* = **PHENOMENON.**

PHENOMENAL, *adj.* : diyardeyî, awarte, mezin, neasayî.

PHENOMENALISM, *n.* : zanîna diyardeyî, diyardeyîtî.

PHENOMENALIST, *n.* : diyardekar.

PHENOMENALISTIC, *adj.* : diyardekarî.

PHENOMENOLOGICAL, *adj.* : pêwendîdarê mirovagehzanî.

PHENOMENOLOGISM, *n.* : mirovagehzanî, diyardeyî.

PHENOMENOLOGIST, *n.* : diyardezan, mirovagehzan.

PHENOMENOLOGY, *n.* : mirovagehîzanî, diyardezanî.

PHENOMENON, *n.* : diyarde, diyare, şanîk.

PHENOTYPIC, *adj.* : pêwendîdarê rûçikên mirovî.

PHENOTYPE, *n.* : rûçikên nimûneyî yên mirovî.

PHENYL, *n.* : riha benzînî pişti rakirina gerdîleya hîdrojenî.

PHEROMONAL, *adj.* : pêwendîdarê madeyê şûn sehkirinê.

PHEROMONE, *n.* : madeyê derkirî bo şûnsehkirinê.

PHEW, *int. exp.* : way, wax.

PHIAL, *n.* : şûşe, kemole.

PHIL(O)-, *pref.* : pêşgir e ko xwaz e.

PHILADELPHUS, *n.* : texlîtek teraş e.

PHILANDER, *vi.* : jinbazî kirin.

PHILANDERED, *adj.* : jinbazîkirî.

PHILANDERER, *n.* : jinbaz.

PHILANDERING, *n.* : jinbazîkirin.

PHILANTHROPE, *n.* = **PHILANTHROPIST.**

PHILANTHROPIC, *adj.* : xêrkarî, xêr, qencî.

PHILANTHROPICAL, *adj.* : xêrkarî.

PHILANTHROPICALLY, *adv.* : bi xêrkarî.

PHILANTHROPISM, *n.* : xêrkarîtî.

PHILANTHROPIST, *n.* : xêrkar.

PHILANTHROPIZE, *vt. i.* : xêran kirin, xêrkarî kirin.

PHILANTHROPY, *n.* : xêrkarî.

PHILATELIC, *adj.* : polî, pûlî.

PHILATELICALLY, *adv.* : bi polî.

PHILATELIST, *n.* : polkomker.

PHILATELY, *n.* : polkomkirin.

PHILHARMONIC, *n., adj.* : mûzîqexwaz, civatiya mûzîqeyî nemaze orkestra.

PHILHELLENE, *n., adj.* : yûnanxwaz.

PHIHELLENIC, *adj.* : yûnandost.

PHIHELLENISM, *n.* : yûnanîxwazîtî, yûnandostî.

PHIHELLENIST, *n.* : yûnanîxwaz.

- **PHILIA**, *suff.* : paşgir e ko viyan e.

- **PHILIC**, *suff.* : paşgir e ko xwaz e, hez e.

PHILISTINE, *n.* : mirovê kevnxwaz, kevnefilistînî.

PHILISTINISM, *n.* : kevnxwazîtî.

PHIL(O)-, *pref.* : pêşgir e ko xwaz e, hezker e.

PHILOGYNY, *n.* : jinviyan.

PHILOLOGIAN, *n.* = **PHILOLOGIST.**

PHILOLOGIST, *n.* : zimanzan.

PHILOLOGICAL, *adj.* : zimanzanî.

PHILOLOGICALLY, *adv.* : bi zimanzanî, zimanzankî.

PHILOLOGY, *n.* : zimanzanî, peyivzanîn.

PHILOMEL, *n.* : hezar, bilbil.

PHILOPROGENETIVE, *adj.* : berdar, zayîndar.

PHILOSOPHE, *n.* : filosof : nivîser yan ramankerê serbest.

PHILOSOPHER, *n.* : jîrzan, zorzan (feylesof).

PHILOSOPHER'S STONE, *n.* : berê jîrzanan : ji xwe ve metalên erzan diguhorit zêr û zîvî û jiyê mirovî direj dikit.

PHILOSOPHIC(AL), *adj.* : jîrzanî.

PHILOSOPHICALLY, *adv.* : bi jîrzanî, jîrzankî.

PHILOSPHISM, *n.* : filosofîtî : rêzika jîrzaniyê.

PHILOSOPHIZE, *vt.i.* : jîrzanî kirin.

PHILOSOPHIZED, *adj.* : jîrzanîkirî.

PHILOSOPHIZER, *n.* : jîrzanker.

PHILOSOPHIZING, *n.* : jîrzankirin.

PHILOSOPHY, *n.* : jîrzanî, zorzanî, sincîzanî, jîrbêjîzanî.

- **OF LIFE** : dîtin yan jîrzaniya jiyanê.

- **PHILOUS**, *suff.* : paşgir e ko xwaz e.

PHILTER(R), *n.* : şeraba evîniyê, şeraba cadûyî yan xirsî.

PHIMOSIS, *n.* : tengbûna çermê serê kîrî.

PHLEBITIS, *n.* : kulbûna şîndemarî.

PHLEBOGRAM, *n.* : wêne yan tomara livîna demarî.

PHLEBOGRAPHIC, *adj.* : pêwendidarê wêneyê demarî.

PHLEBOGRAPH, *n.* : hunera wênegirtina demarî.

PHLEBOLOGY, *n.* : demarzanî.

PHLEBOMITIST, *n.* : şîndemarbirr yan şîndemarkelêş.

PHLEBOTOMIST, *n.* : pisporê verestina xwînê.

PHLEBOTOMIZE, *vi.t.* : birrîn, kelêşîn.

PHLEBOTOMUS FEVER, *n.* : taya mêşa xîzî.

PHLEBOTOMY, *n.* : şîndemarkelêşîn.

PHLEGETHON, *n.* : rûbarek agirî.

PHLEGM, *n.* : bilxem, sarî, tembelî, neguhdanî.

PHLEGMATIC, *adj.* : bilxemî, tembel, lasarî.

PHLEGMATICALLY, *adv.* : bi tembelî, bi lasarî.

PHLEGMON, *n.* : qunêr yan pejbûn kul.

PHLEGMONIC, *adj.* : kul qunêrî yan pejbûnî.

PHLEGMONOUS, *adj.* = **PHLEGMONIC.**

PHLEGMY, *adj.* : bilxemî.

PHLOEM, *n.* : tîvil, tûvil, tûşil, kewl, qaşil, qaşik.

- **RAY** : demarek tîrêjî ya tûşilî.

PHLOGISTIC, *adj.* : kulî (kulbûnî), tayî.

PHLOGISTON, *n.* : flociston : guriya aşop di nav madeyan de ko berê dihat bawerkirin (berî peydakirina oksîjenê) ko ewe sotinê çêkirin.

PHLOGOPITE, *n.* : şiklek qehweyî sor e ji n:ika (nîvşûşeyî).

PHLOX, *n.* : çirîsk.

PHLYCTENULE, *n.* : pirzik, zîpika gilêneyî.

- **PHOBE, SUFF.** : paşgir e ko tirsayî ye jî, kîndar e.

PHOBIA, *n.* : tirs, segeztî.

PHOBIC, *adj.* : segeztî.

- **PHOBIC OR -PHOBOUS**, *suff.* : paşgir e ko nexwaz e, nehez e, kîndar e.

PHOEBE, *n.* : balindeyek emerîkanî mêşgir e.

PHOEBUS, *n.* : roj (hozanî).

PHOENICIAN, *n.* : Fînîqî.

PHOENIX, *n.* : sîmerx.

PHOLAS = PIDDOCK.

PHON, *n.* : fon : yekeya bilindiya dengî yan dengbilindî.

PHONATE, *vi.* : bêje kirin, gotin.

PHONATED, *adj.* : bêjekirî.

PHONATING, *n.* : bêjekirin.

PHONATION, *n.* : bêje, gotin.

PHONATORY, *adj.* : bêjeyî.

PHONE, *vt.i.* : telefon kirin.

PHONE, *n.* : telefon, dûrbihîs, deng.

- **METER** : dengpîv.

- **TELE ~** : dûrbihîs, bihîstok, telefon.

- **PHONE**, *suff.* : paşgir e ko deng e.

PHONEME, *n.* : fonem : yekeya axiftinê ko bêjeyê diyar dikit.

PHONEMIC, *adj.* : dengî.

PHONEMICS, *n.* : fonemzanî.

PHONENDOSCOPE, *n.* : dengçêker (alav e).

PHONETIC(AL), *adj.* : dengî.

PHONETICALLY, *adv.* : bi dengî, dengkî.

PHONETICIAN, *n.* : dengzan.

PHONETICISM, *n.* : dengzanîtî.

PHONETICS, *n.* : dengzanî, dengnasî.

PHONETIST, *n.* : dengzan, dengnas.

PHONETIZE, *vt.* : dengî kirin.

PHONEY, *adj.* : zir.

PHONIC, *adj.* : dengî, zarî.

PHONICALLY, *adv.* : bi dengî, dengkî.

PHONICS, *n.* : dengzanî, dengnasî.

PHONILY, *adv.* : bi zirî, zirkî.

PHONINESS, *n.* : zirîtî.

PHONO-, *pref.* : pêşgir e ko deng e.

- **CARDIOGRAM** : tomara dengê dilî.

- **FILM** : newar.

PHONOCARIOGRAPH, *n.* : tomara dengê dilî.

PHONOCARDIOGRAPHIC, *adj.* : pêwendîdarê tomara dengê dilî.

PHONOCARDIOGRAPHY, *n.* : tomarkirina dengê dilî.

PHONOGRAM, *n.* : hêmaya peyivekê yan birgehekê, tîpên yek bihayê dengî hene.

PHONOGRAPH, *n.* : fonograf : bêjek.

PHONOGRAPHICALLY, *adv.* : bi bêjekî.

PHONOGRAPHY, *n.* : neqşkirin yan nivîsîna peyivan wek bêjeyê (gotinê).

PHONOLITE, *n.* : kevrê birkanî (agir pijînî).

PHONOLOGIC(AL), *adj.* : pêwendîdarê dengzanî.

PHONOLOGIST, *n.* : (axiftin) dengzanî, dengsazî, (deng) axiftinzanî.

PHONOMETER, *n.* : dengpîv.

PHONON, *n.* : çendeya dengî.

PHONORECEPTION, *n.* : dengbihîstin.

PHONOSCOPE, *n.* : dengdoz.

- **PHONY**, *suff.* : paşgir e ko deng e.

PHOOEY, *int. expr.* : derbirrîna bêzariyê.

- **PHORE**, *suff.* : paşgir e ko helgir e.

- **PHORESIS**, *suff.* : paşgir e ko guhastin e.

PHORMIUM, *n.* : helezek wek sosinê ye.

- **PHOS, SUFF.** : paşgir e ko ronahî ye.

PHOSGENE, *n.* : gazek jehr e.

PHOSPH(O)-, *pref.* : pêşgir e ko fosfor e.

PHOSPHAMIDON, *n.* : moranekuj yan edîkuj.

PHOSPHATE, *n.* : fosfat, madeyê peyîna fosfatî : şerabek helçûyî.

PHOSPHATIC, *adj.* : fosfatî.

PHOSPHATID, *n.* : fosfatîd : yek ji pêkhatiyên ronî.

PHOSPHATIZATION, *n.* : fosfatkirin.

PHOSPHATIZE, *vt.* : fosfat kirin, bi tirşiya fosforîk yan fosfatî çare kirin.

PHOSPHATIZED, *adj.* : fosfatkirî.

PHOSPHATIZING, *n.* : fosfatkirin.

PHOSPHATURIA : mîz fosfatî : fosfata bêqam di nav mîzê de.

PHOSPHENE, *n.* : fosfin : wêneyê ronahî (ji handana alavekî torê çêdibit).

PHOSPHIDE, pêkhatiya fosforî li gel hêmanên dî.

PHOSPHINE, *n.* : gazek gurîbar jehrî ye bêreng û bêhn e, genî ye (fosfîn).

PHOSPHITE, *n.* : fosfît : xwêya tirşiya fosforî.

PHOSPHONIC, *adj.* : fosfonî.

PHOSPHOR, *n.* : fosfor : madeyê geşdar yan teyisok.

PHOSPHORATE, *vt.* : fosfor kirin : têkilî fosforî kirin.

PHOSPHOR-BRONZE, *n.* : fosforê pirincî : darişteyek req û qayim e.

PHOSPHORESCE, *vi.* : fosfor bûn, çirisîn yan teyisîn wek fosforî.

PHOSPHORESCED, *adj.* : fosforîkirî.

PHOSPHORESCENCE, *n.* : çirîsîn (teyisîn), fosforbûn.

PHOSPHORESCENT, *adj.* : çirisî, teyisî.

PHOSPHORESCING, *n.* : fosforkirin.

PHOSPHORET(T)ED, *adj.* : fosforkirî.

PHOSPHORIC, *adj.* : fosforî.

PHOSPHORISM, *n.* : jehrbûna fosforî.

PHOSPHORITE, *n.* : fosfata kalsium û filorîda ne belûrî.

PHOSPHOROUS, *n.* : fosfor : hêmanek ne metalî, madeyek zer wek-mûmî hêdî disojit vêca diteyisit.

PHOSPHORYLASE, *n.* : haveyna tirşiya fosforî şitel kirin.

PHOSPHORYLATE, *vt.* : fosfata endamî guhorîn.

PHOT, *n.* : fot : yekeya derketina ronahiyê.

PHOT(O)-, *pref.* : pêşgir e ko ronahî ye.

PHOTIC, *adj.* : ronahiyî, ronakî.

PHOTISM, *n.* : hişa aşopî yan bînayiya ronahiyê.

PHOTO, *n., adj.* : ronahî.

- **BIOTIC** : ronahîxwaza jînî.

- **CELL** = **PHOTO ELECTRIC CELL.**

- **CHEMICAL** : kîmyayî-ronahî.

- **CHEMISTRY** : kîmyaya-ronahî.

- **CHRONOGRAPH** : wênegirê demekî.

- **CONDUCTIVE** : gehînê ronahîkî.

- **COPY** : rûnivîsê ronahîkî.

- **CURENT** : rewtek yan lozewa ronahîkî.

- **DRAMA** : filma sînemayî.

- **DYNAMIC** : dînamîkî(livînî) ronahîkî.

- **ELECTRIC** : kehrebî-ronahîkî.

- **ELECTRIC CELL** : xaneya kehrebî-ronahî.

- **ELECTRIC EMISSION** : derdana kehrebî-ronahî.
- **ELECTRICITY** : kehrebî-ronahîkî.
- **ELECTRON** : elêktrona ronahîkî.
- **ENGRAVING** : neqşkirina ronahîkî.
- **FINISH** : pêşbirkeya hevta (soxî).
- **FLASH** : mûmikê kehrebî.
- **FLOOD** : geşmûmik.
- **GEN** : texlîtek parafîn e.
- **GENIC** : kêrhatî bo wênegiriyê, ronahîkî, çirisî.
- **GRAM** : wêneyê beyaviyê ronahîkî.
- **GRAMMETRY** : wênegiriya beyaviya ronahîkî.

PHOTO, *vt. i.* : wêne girtin.

PHOTOGRAPH, *vt.* : wêne girtin.

PHOTOGRAPHER, *n.* : wênegir, wênekêş, wênevan.

PHOTOGRAPHIC, *adj.* : wêneyî.

PHOTOGRAPHY, *n.* : wênegirî.

- **STUDIO** : nîgargeh.

PHOTOKINESIS, *n.* : livîna ronahîkî.

PHOTOKINETIC, *adj.* : lîvîniya ronahîtî.

PHOTOLITH, *n., adj.* : litografî (çapa berî) ya ronahîkî, litografî-ronahîkî, litografî-ronahîkî.

PHOTOLITHOGRAPH, *n.* : çapa berî-ronahîkî.

PHOTOLITHOGRAPHY, *n.* : litografiya ronahîkî.

PHOTOLYSIS, *n.* : şîtelbûna ronahîkî.

PHOTOMAP, *n.* : nexşeya ronahîkî.

PHOTOMECHANICAL PRINTING, *n.* : çapkirina makîneyî ya ronahîkî.

PHOTOMETER, *n.* : ronahîpîv.

PHOTOMETRIC(AL), *adj.* : ronahîpîvî.

PHOTOMETRY, *n.* : pîvana ronahiyê (ronahî pîvî).

PHOTOMICROGRAPH, *n.* : wêneyê hûrpîvî.

PHOTOMICROGRAPHIC, *adj.* : pêwendîdarê wêneyê hûrpîv.

PHOTOMURAL, *n.* : wêneyê li ser dîwarî.

PHOTON, *n.* : **FOTON** : yekeya tîbaba ronahiyê.

PHOTO-OFFSET, *n.* : çapkirina wêneyî.

PHOTOPERIOD, *n.* : demronahî.

PHOTOPERIODIC(AL), *adj.* : demî-ronahî.

PHOTOPHILIC, *adj.* : ronahîxwaz.

PHOTOPHOBIA, *n.* : tirsa ronahiyê, ronahînexwaz.

PHOTOPHOBIC, *adj.* : ronahîtirsî.

PHOTOPLAY, *n.* : şanogeriya sînemayî.

PHOTORECEPTION, *n.* : dîtin, bînîn.

PHOTOSENSITIVE, *adj.* : ronahîhestiyar, hestiyarî ronahîkî.

PHOTOSPHERE, *n.* : tepka (goga) ronahîkî, rûyê ronahiyê rojê.

PHOTOSTAT, *n.* : fotostat : alavka rûnivîsa wênegirî.

PHOTOSYNTHESIS, *n.* : pêkhînan yan çêkirina ronahîkî.

PHOTOSYNTHETIC, *adj.* : ronahîkî çêkirî.

PHOTOTACTIC, *adj.* : livînî ronahîkî.

PHOTOTAXIS, *n.* : livîna ronahîkî.

PHOTOTELEGRAPHY, *n.* : birûskiya ronahîkî.

PHOTOTHERAPY, *n.* : çarekirina ronahîkî.

PHOTOTHERMIC, *adj.* : germî-ronahîkî.

PHOTOTROPISM, *n.* : ronahî xwazî.

PHOTOTUBE, *n.* : lûleya ronahîkî.

PHOTOVOLTAIC, *adj.* : voltiya ronahîkî.

- **CELL** : xaneya voltiya ronahîkî.

PHOTOZINCOGRAPHY, *n.* : neqşkirina zinkografî.

PHRASAL, *adj.* : risteyî (ziman) yan hevokî.

PHRASE, *n.* : peyiv, riste, destewaj, rêbaza derbirrîne, birgeh, derbirrîn, hevok.

PHRASE, *vt.* : derbirrîn, dabeşkirin derbirîna mûzîqeyî.

PHRASEOGRAM, PHRASEOGRAPH, *n.* : hêmaya derbirrînê.

PHRASEOLOGICAL, *adj.* : dariştiniya mîrî, darêjî, bêjeya dariştî.

PHRASEOLOGIST, *n.* : (bêje) dariştinsaz, hevoksaz.

PHRASEOLOGY, *n.* : rêbaz, zimanê nîşandar, hevok yan ristesazî.

PHRASING, *n.* : rawe.

PHRATRY, *n.* : hoz.

PHREN(O)-, *pref.* : pêşgir e ko hiş e, perdeya navbirrê ye.

PHRENETIC, *adj.* = **FRANTIC.**

PHRENIC, *adj.* : hişikî.

PHRENOLOGIC(AL), *adj.* : pêwendîdarê kiloxzanî.

PHRENOLOGIST, *n.* : kiloxzan.

PHRENOLOGY, *n.* : kiloxzanî.

PHRONTISTERY, *n.* : ramangeh, hizirgeh.

PHTALEIM, *n.* : boyeyek endamî çêkirî.

PHTHARIASIS, *n.* : spehîbûn, spehketin.

PHTHISIC, *n., adj.* : êşa zirav, êşa ziravî.

PHTHISIS, *n.* : êşa zirav.

PHYCOLOGY, *n.* : qarçikzanî.

PHYCOMYCETE, *n.* : qarçika kevzî.

PHYL(O)-, *pref.* : pêşgir e ko hoz e.

PHYLACTERY, *n.* : nivistî.

PHYLESIS, *n.* : gorankarî.

PHYLETIC, *adj.* : tuxmî, regezî.

PHYLL(O)-, *pref.* : pêşgir e ko belg e.

PHYLLINE, *adj.* : belgî.

PHYLLOCLADE, *n.* : baskê belgî.

PHYLLOME, *n.* : belg.

PHYLLOMIC, *adj.* : belgî.

PHYLLOPHAGOUS, *adj.* : belgxwer.

PHYLLOPOD, *n., adj.* : belgpê.

PHYLLOPODAN, *n., adj.* : belgpê.

PHYLLOPODOUS, *adj.* : belgpêyî.

PHYLLOTACTIC, *adj.* : belgrêk.

PHYLLOTAXIS, *n.* : belgrêkî.

- **PHYLLOUS**, *suff.* : paşgir e ko çend belg e.

PHYLLOXERA, *n.* : texlîtek speha helezî ye.

PHYLO-, *pref.* : pêşgir e ko hoz e.

PHYLOGENETIC, *adj.* : dîrokiya nijadî.

PHYLOGENY, *n.* : dîroka nijadî.

PHYLUM, *n.* : liq, xêzan.

PHYSI(O)-, *pref.* : pêşgir e ko sirûşt e.

PHYSIC, *n.* : fîzya, fizîk, şiyafîk, şîlik.

PHYSIC, *vt.* : çare kirin, derman kirin.

PHYSICAL, *adj.* : sirûştî, leşî, tenî.

- **EDUCATION** : perwerdiya leşî.

- **THERAPY** : çarekirina sirûştî.

- **TRAINING** : werzişî, werzişvanî, werzan, werzişetanî, rahênana leşî.

PHYSICIAN, *n.* : pijîşk, doktor.

PHYSICIST, *n.* : fîzyazan, fizîkzan.

PHYSIO CHEMICAL, *adj.* : kîmya-fîzyayî.

PHYSICS, *n.* : fîzya, fizîk, sirûştzanî.

PHYSIOCRACY, *n.* : ola serbestiya bazirganî-pîşesazî.

PHYSIOGNOMIC, *adj.* : jîrî.

PHYSIOGNOMY, *n.* : jîrzanî.

PHYSIOGRAPHER, *n.* : sirûştzan.

PHYSIOGRAPHIC, *adj.* : pêwendîdarê sirûştzanî.

PHYSIOGRAPHY, *n.* : sirûştzanî.

PHYSIOLOGIC(AL), *adj.* : endamerkî.

PHYSIOLOGIST, *n.* : endamerkzan.

PHYSIOLOGY, *n.* : (leş) endamerkzanî.

PHYSIOTHERAPY, *n.* = **PHYSICAL THERAPY.**

PHYSIQUE, *n.* : binyatê leşî.

PHYT(O)-, *pref.* : pêşgir e ko helez e.

- **PHYTE**, *suff.* : paşgir e ko helezek taybetî ye.

PHYTIN, *n.* : pêkhatiya endamiya fosforî.

PHYTOGENESIS, *n.* : helezek guharkarî.

PHYTOGENIC, *adj.* : nijad helezî.

PHYTOGENY, *n.* : helezek guharkarî yan gorankarî.

PHYTOGEOGRAPHY, *n.* : erdnîgariya helezî.

PHYTOGRAPHY, *n.* : helezravezanî.

PHYTOLOGY, *n.* : heleznasî.

PHYTOPATHOLOGIC(AL), *adj.* : pêwendîdarê heleznesaxîzanî.

PHYTOFAGOUS, *adj.* : helezxwer.

PHYTOPLANKTON, *n.* : helezên noqî yan hilawîstî.

PHYTOSOCIOLOGY, *n.* : helez civakîzanî.

PHYTOTOXIC, *adj.* : jehrî bo helezî.

PI, *n.* : rêjeya neguhor (22/7).

PIAFFE, *vi.* : hêdî çargavî kirin.

PIAL, *adj.* : daykiya dilovan.

PIA MATER, *n.* : dayka dilovan.

PIANISM, *n.* : hunera piyanolêdanê.

PIANIST, *n.* : piyanovan.

PIANO, *adj., adv.* : birgeh bo nermelêdanê.

PIANO(IT.), *n.* : piyano.

- **ACCORDION** : akordiyona piyanoyî.

- **FORTE** : piyano.

PIANOLA, *n.* : piyanoya xwekar.

PIASTER, *n.* : pêse (dirav), qirş.

PIAZZA, *n.* : meydan.

PICA, *n.* : yekeya qebareya tîpê.

PICADON, *n.* : siwarê rimbaz.

PICADOR, *n.* : siwarê ga şerî dest pê dikit.

PICARESQUE, *adj.* : ebebozî.

PICARO, *n.* : ebeboz.

PICAROOM, *n.* : diz.

PICALILLI, *n.* : tirsî.

PICCANINNI, *n.* : zarokê reşekê biçûk.

PICCOLO, *n.* : zirna, zurna.

PICEOUS, *adj.* : zifti, qîrî.

PICK, *vt. i.* : çinîn, helbijartin, goşîn.

- **TO HAVE A BONE TO ~ WITH** : ho dîtin bo gazindeyê.

- **TO ~ AT** : rexne kirin, şepirze kirin, dan şermê.

- **TO ~ OFF** : rût kirin, verûçkandin, nîşan kirin (bo kuştinê).

- **TO ~ ON** : şepirze kirin, perîşan kirin.

- **TO ~ ONE'S WAY(STEPS)** : hişyar çûn.

- **TO ~ OUT** : helbijartin, diyar kirin.

- **TO ~ OVER** : bijartin.

- **TO ~ TO PIECES** : şîtel û rexne kirin.

- **TO ~ UP** : bilind kirin, rakirin, hilgirtin, hildan.

- **TO ~ UP WITH** : hevalî kirin, bûn dost.

PICKABACK, *adv.* : li ser pişt û milan.

PICKAX(E), *n.* : pîk, dudevok.

PICKED, *adj.* : goşî, çinî, helbijartî.

PICKER, *n.* : çin.

PICKEREL, *n.* : texlîtek masiya biçûk e.

PICKERELWEED, *n.* : giya, helezavî.

PICKET, *n.* : serkarê lêdanê (mangirtinê),

berevanê lêdanê (mangirtinê), paşvan, sing.

PICKET, *vt. i.* : sing kirin.

PICKING, *n.* : çinîn, helgirtin.

- **A QUARREL** : daberzîn.

- **UP** : rakirin.

PICKINGS, *n.* : çinîn.

PICKLE, *n.* : sihik, tirşî, tibabek biçûk (piçek, hindek).

- **TO HAVE A ROD IN ~ FOR** : darî berdest kirin bo sizakirina mirovekê.

PICKLE, *vt.* : sihik kirin, tirşî kirin, çare yan paqij kirin bi germava tirşiyê.

PICKLED, *adj.* : tirşîkirî, sihikkirî.

- **VEGETABLES** : tirşî.

PICKLING, *n.* : sihikkirin.

PICKLOCK, *n.* : diz, kodvekir, çilmîrevekir.

PICK-ME-UP, *n.* : vejiyank : şeraba xurt.

PICK POCKET, *n.* : berîk bir, destbir.

PICKUP, *n.* : barkêş, wergir.

PICKY, *adj.* : gazindeker.

PICNIC, *n.* : seyran, geşt.

- **AND TOUR** : geşt û seyran.

- **SITE** : seyrangeh.

PICNIC, *vi.* : seyran kirin, çûn seyranê.

PICNICKER, *n.* : seyranî.

PICOT, *n.* : kulpeka xemlê.

PICOT, *vt.* : kulpek kirin (bo xemlê).

PICOTEE, *n.* : binefş.

PICRATE, *n.* : xwêya tirşiya bekrîk.

PICRIC ACID, *n.* : madayek zer û gelek tal e bo heşê, birînkariyê û teqemeniyê bi kar dihêt.

PICTOGRAPHIC, *adj.* : pêwendîdarê nivîsîna wênehêmayî.

PICTOGRAPHY, *n.* : wêne yan tîpa hêma ko şûna hizrekê bi kar dihêt.

PICTORIAL, *adj.* : wêneyî, wênekirî.

PICTURE, *n.* : wêne, nîgar, şikil, reng, rû nîgarî.

- **BOOK** : kitêba wênekirî.

- **GALLERY** : wênegeh.

- **HAT** : kulavek jinan û law e.

- **POSTCARD** : karta posteyî-wêneyî.

- **THEATRE** : sîneme, sînema.

- **WRITING** : nivîsîna wêneyî.

PICTURE, *vt.* : wêne kirin.

PICTURED, *adj.* : neqşkirî.

PICTURESQUE, *adj.* : taze, ciwan.

PICTURESQUENESS, *n.* : tazeyîtî.

PICTURING, *n.* : wênegirtin, wênekirin, neqşkirin, nîgarkirin.

PICTURIZATION, *n.* : wênebûn, wênekirin, nîgarkirin.

PICTURIZE, (**-ISE**), *vt.* : wêne kirin, nîgar kirin.

PICTURIZED, *adj.* : wênekirî, nîgarîkirî.

PICTURIZING, *n.* : wênekirin, nîgarkirin.

PICUL, *n.* : kêşan yan senga çînî ye (133 1/3 pawin).

PIDDLE, *vi.* : ba pîvan, dem zeh kirin.

PIDDLED, *adj.* : mîzkirî, mîzî.

PIDDLING, *adj.* : erzan, bêbiha, pûç.

PIDDOCK, *n.* : texlîtek şeytanok e.

PIDGIN, *n.* : zimanê asankirî.

PIE, *n.* : kade, şirînayî, canewerê rengareng, qîjk.

- **AS A PIECE OF ~** : bêqam hêsan.

- **IN THE SKY** : xweşiya paşerojê pişti derdê demî.

- **TO HAVE A FINGER IN THE ~** : tila wî di nav pirsê de ye.

- **MAN** : kadefiroş.

PIEBALD, *n., adj.* : belek, têkil, rengîn, baçe.

PIECE, *n.* : zîvar, leh, parçe, pirtik, telîş, ker, let, pel.

- **A ~ OF ONE'S MIND** : hizra eşkera (rast-bêjî).
- **IN ~ S** : şikestî.
- **OF OR ONE ~ (WITH)** : heman texlît e.
- **BY ~** : pela pel.
- **OF LAND** : siltênî, silûmî.
- **OF SOAP** : leheka bikef, sabûn.
- **WORK** : parçe karî.
- **TO ~ S** : parçe parçe.
- **TO WORK BY THE ~** : bi parçe kar kirin.

PIECE, *vt.* : pinî kirin, çak kirin, pîne kirin, pate kirin.

- **TO ~ OUT** : temam kirin.
- **TO ~ UP** : pîne kirin.

PIECED, *adj.* : nûkirî, çakkirî.

PIECE-DYE, *vt.* : heş kirin (piştî ristinê).

PIECE OF GOODS, *n. pl.* : kutal.

PIECE MEAL, *adv., adj., n.* : parçe parçe, bere ber.

PIECE OF MERCHANDISE, *n.* : kutal.

PIECING, *n.* : çakkirin.

PIED, *adj.* : belek, baçe, çend reng.

PIEDMONT, *adj.* : rawend yan benar.

PIEPLANT, *n.* : rêvaza bistanî.

PIER, *n.* : dingê pirê, karîte, stûn.

- **GLASS** : xudîka dîwarî.
- **TABLE** : mêza bin xudîka biçûk.

PIERCE, *vt.i.* : kun kirin, tê re çûn, tê re kirin, têgehiştin.

PIERCED, *adj.* : kunkirî, têrekirî.

PIERCER, *n.* : nikilderek.

PIERCING, *n.* : kunkirin, tijtew, simtin.

PIERCINGLY, *adv.* : bi kunkirinî.

PIERCING SPRING, *n.* : kaniya zanîn û sirûşta helbestê.

PIERCING THROUGH, *n.* : daçikandin.

PIERROT, *n.* : zirtek.

PIETA, *n.* (*I.*) : girînkar (wêneyê Meryema li ser Îsayî digirît).

PIETISM, *n.* : dîndarîtî, tevgera ayînî ya almanî seda 17 ko bizivirin ser Încîlê.

PIETIST, *n.* : dîndar.

PIETISTIC, *adj.* : dîndarî.

PIETY, *n.* : dîndarîtî.

PIEZO-, *pref.* : pêşgir e ko pestên, wişar e.

PIEZOELECTRIC, *adj.* : kehrebewişarî.

PIEZOELECTIRCITY, *n.* : kehrebewişarî.

PIEZOMETER, *n.* : kehrebwişarpîv.

PIEZOMETRY, *n.* : kehrebwişarpîvî.

PIFFLE, *n.* : pûçbêjî.

PIFFLE, *vt.* : pûç axiftin, pûçbêjî kirin.

PIFFLED, *adj.* : pûçbêjîkirî.

PIFFLING, *n.* : pûçbêjîkirin.

PIG, *n.* : beraz.

- **BED** : darêjdana berazî : qalibê xîzî bo darijtina asinî.
- **BOAT** : noqar.
- **HEADED** : serhişk, serzeq, rikdar.
- **S MIGHT FLY** : ma çî ye ecêbî çêbin.
- **TO BRING ONE'S ~ TO THE WRONG MARKET**: baş nafiroşit (çûnko ne xoş yan ne rast bazar e).
- **TO BUY A ~ IN A POK** : tiştekê dikirit bê ko bibînit.
- **TO MAKE A ~ OF ONESELF** : wek berazî xwarin.

PIG, *vi.* : wek berazî jiyan.

PIGEON, *n.* : kotir, kevok, totak, keç, sade, fatimok.

- **ATTENDANT, N.** : kevokbaz.

- **BREEDING** : kevokbazî.

- **PAIR** : cêmik (kur û keç), yan zarok kur û keç bi tenê.

- **POUTER ~** : kevoka teqla.

PIGEON, *vt.* : xapandin.

PIGEON BREAST, *n.* : sîngê kotirê : kirêtiya sîngî.

PIGEON BREASTED, *adj.* : sîngkotir.

PIGEON HAWK, *n.* : eyloyê kotiran (kotirxwer e).

PIGEON HEARTED, *adj.* : tirsinok.

PIGEON HOLE, *n., vt.* : kotirgeh, kunik yan kelşa nameyan (ya derî), rêz kirin, polên kirin.

PIGEON-LIVERED, *adj.* : nazik.

PIGEON PEA, *n.* : kotirkelîk.

PIGEONRY, *n.* : kotirgeh.

PIGEON-TOED, *adj.* : pêkotir (til hindûrî diçin).

PIGEON WING, *n.* : çengê kotirê : texlîtek sema ye.

PIG FISH, *n.* : masîberaz : masiyek deryayî ye.

PIGGERY, *n.* : berazgeh.

PIGGED, *adj.* : berazkirî.

PIGGIN, *n.* : dolkeya bidestik.

PIGGING, *n.* : berazkirin, paqijkirin (borî).

PIGGISH, *adj.* : berazî (wek berazî).

PIGGY, *n., adj.* : berazk.

PIGGYBACK, *adv., adj.* : li ser pişt û milan.

PIG IRON, *n.* : asinê xav (piştî derketinê ji kûrheya buhujînê).

PIG LEAD, *n.* : zirêçexav.

PIGLET, *n.* : kodik.

PIGMENT, *n.* : reng, heş, boye.

PIGMENTARY, *adj.* : heşî, boyeyî.

PIGMENTATION, *n.* : heşbûn, boye.

PIGMY, *n.* = **PYGMY** : rîwele.

PIG NUT, *n.* : dargiwêza emerîkanî.

PIGPEN, *n.* : pawana berazan, dir yan şûna pîs.

PIG SKIN, *n.* : kevlê berazî, xurcezîn, tepka pêyan.

PIG STICK, *vt.* : bi rimî kirina nêçîra berazan.

PIGSTY, *n.* : pawana berazan.

PIGTAIL, *n.* : kezî.

PIGTAILED, *adj.* : kezîkirî.

PIGWASH, *n.* : xwarina berazan.

PIGWEED, *n.* : pêqazê (giya ye).

PIKA, *n.* : canewerek memikdar wek kêvrûşkê ye.

PIKE, *n.* : bizmarê dirêj yê sertîj, serê rimî, rim, singo, texlîtek masî, dergeh (li ser rê).

PIKE, *vi.*: rêya xwe birrîn, kuştin yan birindar kirin, nişkî çûn (bi rimî).

PIKED, *adj.* : sertûjkirî.

PIKELET, *n.* : kilocek biçûk ya çayê.

PIKEMAN, *n.* : rimbaz.

PIKE PERCH, *n.* : (masî) ferxê wek rimî.

PIKER, *n.* : çivo, qomarçiyê biçûk.

PIKE STAFF, *n.* : darê wek rimî, kunka rimî.

PIL-, PILI- OR PILO-, *pref.* : pêşgir e ko mû ye, pirç e, por e.

PILAF, PILAFF OR PILAU, *n.* : pelav (birinc).

PILASTER, *n.* : karîte yan stûna lakêşe.

PILCH, *n.* : cilên savayî.

PILCHARD, *n.* : texlîtek masî ye.

PILE, *n.* : kom, pûrt, tift, ro, rok, lot, lod,

qorç, cez, gidîş, serê rimî, tibabek mezin, saman, karlêker, avahiyek mezin, bargegeh, nasor, bawesîr.

- **ATOMIC ~** : karlêgeha gerdîleyî.

- **BREEDER ~** : karlêgeha çêker.

- **CARBON ~** : karlêgeha karbûn.

PILE, *vt.i.* : kom kirin, ro kirin.

PILEATE(D), *adj.* : komkirî, rokirî.

PILED, *adj.* : komkirî.

PILE DRIVER, *n.* : kuteka komê.

PILE HAMMER, *n.* : kuteka singan yan karîteyan.

PILEOUS, *adj.* : mûyî, mûdar, têrmû.

PILES, *n.* : bawesîr, basûr, bayê sûr.

PILEUS, *n.* : qarçikan : kulavkê tatiyî.

PILEWORT, giya basûr.

PILFER, *vi. t.* : dizîn (jî firoşgehan).

PILFERAGE, *n.* : dizî.

PILFERED, *adj.* : dizî.

PILFERER, *n.* : diz, hûrdiz.

PILFERING, *n.* : dizîn, hûrdizî.

PILGARILIK, *n.* : keçel.

PILGRIM, *n., vt.* : hecî, hec kirin.

PILGRIMAGE, *n., vt.* : hec, heckirin, hec kirin.

PILGRIMIZE, *vt.* : hec kirin, çûn hecê.

PILIFEROUS, *adj.* : mûdar, pirçdar, pûrdar.

PILIFORM, *adj.* : mûyî (wek mûyî).

PILING (UP), *n.* : komkirin, kokirin, rokirin, gidîşkirin, xomandin, ding.

PILL, *n.* : dêndik (derman), mirovê kîndar, tepka tenisê, golf, hebik.

- **BOX** : dêndikdan.

- **PILL**, *vt.* : kelpik bûn, spî kirin, talan kirin, (dij) deng dan, (dermanî) dêndik kirin.

PILLAGE, *n.* : şelandin, talankirin, talan, yexterme.

PILLAGE, *vt.* : talan kirin.

PILLAGER, *n.* : talanker.

PILLAR, *n.* : ding, karîte, stûn.

- **BOX** : sindoqa gelemperiya posteyî.

- **FROM ~ TO POST** : hatin û çûn, hirve û wêve.

PILLARED, *adj.* : karîtekirî.

PILL BUG, *n.* : kirmikê dêndikî (gogî) : kirmikê zovikî yê ko xwe girûvir dikit gava mirov dest bikitê.

PILLION, *n., adv.* : xurcezîna sivik (bo jinan), xurcezîna ser barî, balifka li ser xurcezînê (bo hevsiwarî), li ser xurcezînê.

PILLIWINKS, *n.* : alava azardanê (tilgivêj), alava eşkenceyê.

PILLORY, *n.* : navdarok : alava eşkencedanê yan kirêtkirinê.

PILLORY, *vt.* : eşkence kirin, (nav) kirêt kirin.

PILLOW, *n.* : balîfk, balge, serîn, balgî, berpal, palik.

- **BLOCK** : rûniştek.

- **CASE** : kîskê balîfkê.

- **SHAM** : kîskê xemilandî yê balîfkê.

PILOW, *vt. i.* : balifk kirin, li ser balîfkê rûniştin, serê xwe danan ser balîfkê.

PILO-, *pref.* : pêşgir e ko mû ye.

PILOCARPINE, *n.* : madeyek nîv qilê ye.

PILOSE, *adj.* : mûkirî.

PILOSITY, *n.* : mûkirin.

PILOT, *n.* : rêberê dezgînê yan gemiyê, notî, balafirvan, firokevan.

- **AUTOMATIC ~** : dezgîna xwekar.

- **BALOON** : balona azmûnî.

- **HOUSE** : rêbergeh.

- **SCHEME** : melhezeya azmûnî.

PILOT, *vt.* : rêberî kirin, hajotin.

PILOTAGE, *n.* : kirêya rêberî.

PILOT ENGINE, *n.* : makîneya berahiyê.

PILOT FISH, *n.* : texlîtek masî ye (li rex gemiyan diçit).

PILOT LIGHT, *n.* : çirayê rêberî.

PILULAR, *adj.* : dêndikî.

PILULE, *n.* : dêndik.

PILULOUS, *adj.* : dêndikî.

PIMENTO, *n.* : bîbera şirîn.

- **CHEESE** : penîrê bîberkirî.

PI-MESON, *n.* : pîmezon : mezona bariste mezin.

PIMOLA, *n.* : zeytûna bîberkirî.

PIMP, *n.* : teres, gewad, qeprax, karxaneçî.

PIMP, *vi.* : gewadî kirin.

PIMPERNEL, *n.* : gijnija rûvî (rovî).

PIMPING, *adj.* : pûç, biçûk, lawaz.

PIMPLE, *n.* : zîpik, pirzik, bizrok, zilp, rîşik, germişk, pîzoke.

PIMPLED, *adj.* : pirzikî, zîpikî, germişkî.

PIMPLY, *adj.* : pirzikî, germişkî.

PIN, *n.* : mêx, sing, topiz, toq, cilgir, arêx.

- **DON'T CARE A ~** : êkcar guh nedan (pûte pê nekirin).

- **ON ~ S AND NEEDLE** : bêqam bêrî kirin.

- **CARRIER** : gurzvan.

- **S AND NEEDLES** : hîşa tezînî.

PIN, *vt.* : girê dan.

- **TO ~ ONE'S FAITH TO** : xwe êkcar li ser girtin (tiştekê yan mirovekê).

PINACEOUS, *adj.* : sinewberî.

PINAFORE, *n.* : pêşmal(k).

PINASTER, *n.* : sinewbera çolê.

PINBALL MACHINE (PINBALL GAME), *n.* : yariya tepk û denbozan (filipers).

PIN BONE, *n.* : kilot, nêk.

PINCE-NEZ, *n.* : berçavika ber difnê.

PINCERS, *n.* : kelbetan, gasik, pense.

PINCH(ING), *n.* : qurincîk, quncirîk, nuqurc, qurçî.

- **AT A ~** : gava pê viyabit.

- **IF IT COMES TO THE ~** : gava bişarhit.

PINCH, *vt.* : dizîn, qurincîk lê dan, qurmiçîn.

PINCH BAR, *n.* : gasik.

PINCH BECK, *n., adj.* : erzan, têkiliya mis û zinkî.

PINCH COCK, *n.* : zimaneya nuquçiyan (bo marpêçan).

PINCHER, *n.* : gasik.

PINCH-HIT, *vt.* : berdêl lê dan (li tepkê).

PINCH HITTER, *n.* : yarîkerê berdêl (beysbol).

PINCH CURL, *n.* : guliya toqî.

PINCH CUSHION, *n.* : balîfka derziyan (bo helgirtinê).

PINDLING, *adj.* : lawaz, nesax.

PINE, *n.* : sinewber, kaj.

- **APPLE** : enenas.

- **BRANCH** : kajok.

- **CONE** : deq.

- **DROPS** : giyayek emerîkanî (li bin sinewberî şîn dibit)- dilopa kajî-.

- **MARTEN** : delekê sinewberî.

- **NEEDLE** : derziya sinewberî.

- **NUT** : sinewber.

- **SISKIN** : çûçika sinewberî.

- **TAR** : qetrana sinewberî.

- **TREE** : darê sinewber, kaj, qaç.

- **WOOD** : daristana sinewberî.

PINE, *vt.* : lawaz bûn.

PINEAL, *adj.* : sinewberî, qaçî.

- **BODY** : livîka sinewberî.

- **GLAND** : livîka sinewberî.

PINENE, *n.* : paynîn.

PINERY, *n.* : sinewbergeh, daristana sinewberî.

PINETUM, *n.* : sinewbergeh.

PIN FEATHER, *n.* : perik.

PIN FOLD, *n., vt.* : kozik, pawan, dom, korî, kor, gom, gov, pawan kirin.

PING, *n.* : dengê fîşekan.

PING, *vt.* : deng vedan (fîşek).

PING-PONG, *n.* : ping-pong (tenîsa mêzê).

PINGUID, *adj.* : bezdar, qelew.

PINGUIM, *n.* : meyweyek enenasî ye.

PIN HEAD, *adj.* : xirpo, serdenbozî (bê mejî).

PIN HEADED, *adj.* : gewc.

PINHOLE, *n.* : kunik.

PINING, *n.* : pirgeh.

PINION, *n.* : nêr û mê, çeng, per.

PINION, *vt.* : girê dan, bend kirin.

PINK, *n.* : al, soravî, sorê vekirî, gulfam, mêxek, pîvazî, qerenfil, pembeyî.

PINK, *vt.* : kun kirin, birîndar kirin, xemilandin.

PINK EYE, *n.* : kulbûna hindura qepûlkê çavî.

PINKIE OR PINKY, *n.* : qiliç (tila biçûk).

PINKING SHEARS, *n.* : cawbirra binefşî.

PINKINESS, *n.* : al.

PINK LADY, *n.* : koktêla cin, brandî û şîrêza lêmonê.

PINKNOT, *n.* : girêka darî.

PINKO, *n.* : çepramanê nerm, rihdarê nerm, soro.

PINK ROOT, *n.* : giyayek emerîkanî, guldar û rih sor e.

PINKSTER, *n.* : gula al.

PIN MONEY, *n.* : xerciya berîkê.

PINNA, *n.* : kirûje, çeng, per, belgik.

PINNACLE, *n.* : gopîtk, ewc, lotke, raser, dûçik.

PINNACLE, *vt.* : li ser direk bilind danan, birc kirin.

PINNANCE, *n.* : gemiya biçûk ya babirekî.

PINNATE(D), *adj.* : (şikil) perî, wek perî.

PINNATELY, *adv.* : bi perî.

PINNER, *n.* : kulavek jinanî (bi du rexên dirêj yên şor).

PINNIPED, *adj.* : pêşaperî.

PINNULA, *n.* : mûyek jî baskê perî.

PINNULAR, *adj.* : mûyekî, perikkî (wek perên biçûk).

PINNULATED, *adj.* : perikdar.

PINNULE, *n.* : perik.

PINOLE, *n.* : ar, ard.

PINON, *n.* : texlîtek dargiwêz (dargûz) e.

PINPOINT, *n.* : bêqam rast, serê denbozê, tiştê hûr yan pûç.

PINPOINT, *v.* : armanc qenc diyar kirin, stêrk baş girtin.

PIN PRICK, *n.* : kunik.

PINPRICK, *vt. i.* : şepirze kirin.

PINT, *n.* : payint : yekeya kêşanê ye (nemaze bîreya ko temet perdaxek mezin e).

PINTABLE, *n.* = **PINBALL MACHINE.**

PINTADO, *n.* : balindeyek deryayî wek kotirê ye.

PINTAIL, *n.* : dûv perdirêj wek werdekê.

PINTLE, *n.* : texlîtek sing e.

PINTO, *n., adj.* : pinîkirî, hespê pinîkirî.

PINT POT, *n.* : amanê yek payentî.

PINT-SIZE(D), *adj.* : biçûk.

PINUP, *n., adj.* : tiştê bi dîwarî ve dihilawîsin, çira.

- **GIRL** : wêneya keçika ciwan, keçika dîwarî (wêne).

PINWHEEL, *n.* : çerxa bayî.

PIN WORM, *n.* : kirmê denbozî : kirmek tayî û biçûk.

PINY, *adj.* : sinewberî.

PIONEER, *n.* : pêşeng, pêşdar, rêber, pêşrew.

PIONEER, *vt.* : rêberî kirin.

PIOSITY, *n.* : dîndarîtî.

PIOUS, *adj.* : dîndar, ayîndar, ayînxwaz.

PIOUSLY, *adv.* : bi dîndarî, dîndarkî.

PIOUSNESS, *n.* : dîndarîtî, ayîndarîtî.

PIP, *n., vi., t.* : dênik, sîsik, berik, tov, şikandin, (ji hêkê) derkeftin.

PIPA, *n.* : beq.

PIPAGE, *n.* : borî, guhaztin bi boriyan.

PIPAL, *n.* : darhêjîrek mezin e.

PIPE, *n.* : borî, lûle (lolî), zirna, kezîn, kêzîn, qelîn, bask, sebîl, defdefink, fiteya bilûrê.

- **BAG** : cihar.

- **DREAM** : hîviya derew (aşopî).

- **MAJOR** : serkarê devîkevanan.

- **MAKER** : sebîlsaz.

- **SMOKER** : sebîlkêş.

PIPE, *vt.i.* : guhaztin (bi boriyan), serinc kirin, dîtin.

- **TO ~ DOWN** : mit bûn, hedar bûn, sar bûn.

- **TO ~ UP** : dest bi axiftin û stranan kirin.

PIPE-CLAY, *n.* lîma boriyan (spî ye).

PIPE-CLAY, *vt.i.* : spî kirin yan paqij kirin bi lîma spî.

PIPECUTTER, *n.* : borîbirr.

PIPE FISH, *n.* : masiya lûleyî.

PIPE FITTER, *n.* : borîçaker, borîdirêjker (lehîmker).

PIPE FITTING, *n.* : borî çakirin yan dirêj kirin.

PIPEFUL, *adj.* : têrborî.

PIPELESS, *adj.* : bêborî.

PIPELINE, *n.* : hêleborî.

- **IN THE ~** : li ber çêbûnê ye.

PIPER, *n.* : bilûrvan, zurnavan.

PIPERAZINE, *n.* : madayek qilêyî (rîvîkê ji kirman paqij dikit).

PIPERIDINE, *n.* : madeyek qilêyî û avekî ye.

PIPERINE, *n.* : medeyek nîv qilêyî di nav bîberan de heye.

PIPERONAL, *n.* : madeyek bêhnxweşî ye.

PIPESTONE, *n.* : berê baskî.

PIPETTE OR PIPET, *n.* : lûleya biçûk, mijok.

PIPING, *n.* : tora boriyan, awaza zurnayê, tijhedar.

- **HOT** : bêqam germ, gelek tij.

PIPIT, *n.* : balindeyek wek şivankujî ye.

PIPKIN, *n.* : qazana biçûk.

PIPPING, *n.* : sêv, berik, mirov yan tiştê nayab.

PIPSISSEWA, *n.* : giyayek dermanî ye.

PIP-SQUEAK, *n.* : mirovê pûç yê kotî.

PIPY, *adj.* : dengtij, lûleyî.

PIQUANCY, *n.* : zimangezî.

PIQUANT, *adj.* : zimangez.

PIQUANT, *n.* : enirîn, hempaziya birîndar.

PIQUE, *vt.* : henpazî yan şanaziya kesekê birîndar kirin (di êşandin).

- **TO ~ ONESELF ON OR UPON** : serfirazî kirin.

PIQUET, *n.* : texlîtek leyiztina kaxizan e.

PIRACY, *n.* : talanî, deryagirî.

PIRAGUA, *n.* : belemek zirav û dirêj e.

PIRANHA OR PIRAYA, *n.* : masiyek dirr û rûbarî ye.

PIRATE, *n.* : cerde, deryagir, korsan (korsar).

PIRATE, *vt.i.* : talan kirin.

PIRATICAL, *adj.* : deryagirî, talankerî.

PIROGUE, *n.* : belema darî (jî qurmî çêdikin).

PIROUETTE, *n.* : zivirîn (li ser pêyekê yan tilekê : balêt).

PIROUETTE, *vi.* : li ser pêyekê yan tilan sema kirin.

PISCARY, *n.* : masîgeh, mafê masîgirtinê.

PISCATORIAL, *adj.* : masîgirtinî.

PISCATORY, *adj.* = **PISCATORIAL.**

PISCES, *n.* : herdumasî (Bîrca Nehem).

PISCI-, *pref.* : pêşgir e ko masî ye.

PISCICULTURE, *n.* : masîxudankirin.

PISCINA, *n.* : gera masiyan.

PISCINE, *adj.* : masiyî.

PISCIVOROUS, *adj.* : masixwer.

PISH, *interj.* : eh.

PISIFORM, *n., adj.* : kelikî.

PISMIRE, *n.* : mêrî.

PISOLITE, *n.* : ber yan kevrek kilsî ye.

PISS, *n.* : mîz.

PISS, *vt.i.* : mîztin.

- **TO ~ OFF** : derkeftin.

PISSED, *adj.* : enirî, bêzar.

PISTACHIO, *n.* : fisteq, piste, darfisteq.

PISTIL, *n.* : mêyek : endamê mêyatiya gulê.

PISTILLATE, *adj.* : mêyekî.

PISTILLEFEROUS, *adj.* : mêyekî.

PISTILLINE, *adj.* : mêyekî.

PISTOL, *n.* : debance, werwer, şeşgir, şeşderb, pişto, piştok.

- **BUTT** : qontaxa debanceyê.

- **GRIP** : destikê debanceyê.

- **SHOT** : fişek.

PISTOL, *vt.* : agir jî debanceyê berdan.

PISTOLE, *n.* : diravê kanî, biyanî.

PISTOLEER, *n.* : debancehelgir.

PISTON, *n.* : pestên, pestêw, pistin, mîrkut.

- **PIN** : bizmarê pestênî.

- **ROD** : destikê pestênî.

PIT, *n.* : çal, tepk, kûrik, kûr, kortal, goncal, kangeh.

- **HEAD** : serkangeh.

PIT, *vt.i.* : çal kirin, kirin nav çalê de.

PIT-A-PAT, *adv., n.* : tep tep.

PIT-A-PAT, *vi.* : teptepkirin.

PITCH, *n.* : qîr, pile, bilindî (deng), xurtiya awaza dengî.

- **BALL** : reşgog.

- **BLACK** : tarî, reş tarî (bê ronahî).

- **BLENDE** : kanek reş û teyisî ye (oksîdê uranyom ko radyomê berhem dikit).

PITCH, *vt.i.* : qîr (zift) kirin, vegirtin, vedan.

- **TO ~ IN** : hevkarî kirin, karî dest pê kirin.

- **TO ~ INTO** : mijûl bûn, dijwar êrîş kirin.

- **TO ~ ON OR UPON** : helbijartin.

- **TO ~ OUT** : havêtin, dest jê berdan.

- **TO QUEER SOMEBODY'S ~** : pîlanên filanî têk dan.

PITCH-AND-TOSS, *n.* : yariya diravî.

PITCH-DARK, *adj.* : reş tarî.

PITCHED BATTLE, *n.* : bezma dijwar.

PITCHER, *n.* : mesîn, şikev.

- **COPPER** : mesîn.

- **PLANT** : megezgire.

PITCHFORK, *n.* : karêj, milêb, tebûr.

PITCHFORK, *vt.* : milêbî kirin.

PITCHING, *n.* : vedan.

PITCHMAN, *n.* : şûstefiroş : mêrkê her li direkê li ser şûsteyî difiroşit.

PITCH PINE, *n.* : sinewbera şirêzê.

PITCH PIPE, *n.* : devîkeya awazî.

PITCH STONE, *n.* : berê ziftî.

PITCH WOMAN, *n.* : jinka li direkê (şûnekê) difiroşit.

PITCHY, *adj.* : reş tarî, ziftî, debîşî.

PITEOUS, *adj.* : hejar, (dilê mirovî pê ve man).

PITEOUSLY, *adv.* : bi hejarî, hejarkî.

PITEOUSNESS, *n.* : hejarîtî.

PITFALL, telhe, metirsî yan tengaviya nepenî.

PITH, *n.* : nax, nawcerge, kakil, gewher, mejiyê hestî.

PITH, *vt.* : ser jê kirin (terşî).

PITHECANTHROPE, *n.* : mirovmeymûn.

PITHECANTHROPUS, *n.* : mirovê Cawa (mirovek seretayî û birhayî (wek meymûnê bû).

PITHILY, *adv.* : bi naxî, bi kakilî, kakilkî.

PITHINESS, *n.* : naxîtî, kakilîtî.

PITHY, *adj.* : naxî, kakilî, qayim, rewabêj; têr hêz, made yan jî wate .

PITIABLE, *adj.* : dilovanbar, pûç, kotî.

PITIABLENESS, *n.* : dilovanbarîtî.

PITIER, *n.* : dilovan.

PITIFUL, *adj.* : reben, belengaz.

- **PERSON** : gede.

PITIFULLY, *adv.* : bi dilovanî.

PITILESS, *adj.* : bêdilovanî.

PITILESSLY, *adv.* : bi bêdilovanî, bêdilovankî.

PITILESSNESS, *n.* : bêdilovanîtî.

PITMAN, *n.* : komirvan, karkerê kangehê.

PITON, *n.* : singê kevrî (bo serketinê).

PITPAN, *n.* : lûleya goşe rast û çemandî (bo pîvana leza balafirê).

PIT SAW, *n.* : belema kolayî.

PITTANCE, *n.* : kêmkire, tibabek biçûk, serbarê biçûk.

PITTED, *adj.* : nikilandî, kûrkirî, çalkirî.

PITTER-PATTER, *n., adj., vi.* : teqtek, teqtek kirin.

PITTING, *n.* : nikilandin, kûrkirin, çalkirin.

PITUITARY, *n., adj.* : çilm, kilmîş, livika kilmîşî.

- **GLAND** : livika kilmîşî yan çilmî.

PITUITRIN, *n.* : çilmîn.

PITY, *n.* : dilovanî, bezeyî, cergsojî, bana, behenya, xemdarî, kovanî, mihrvanî.

PITY, *vt. i.* : dil pê ve man, dilovanî kirin.

PITYING, *adj.* : dilovan.

PITYRIASIS, *n.* : pînek : nesaxiyek çermî (kelpikê wek pîneyî derdikevit).

PIVOT, *n., adj.* : gare, sing, tewere, nawçeq.

PIVOT, *vi. t.* : tewere kirin, sertewereyî gerandin.

PIVOTAL, *adj.* : jînî, giring, binyatî.

PIXIE OR PIXY, *n., adj.* : yerîker, ecine.

PIXILATED, *adj.* : dînoke.

PIZZA, *n.* : pîtza (xwarinek e).

PIZZERIA, *n.* : pîtzaxane, pîtzafiroşî.

PIZZICATO, *n.* : awaza destjen.

PIZZLE, *n.* : kîrê gayî.

PLACABILITY, *n.* : bexşbarîtî, nermîtî.

PLACABLE, *adj.* : bexşbar, nerm.

PLACABLENESS, *n.* : bexşbarîtî, nermîtî.

PLACABLY, *adv.* : bi nermî.

PLACARD, *n.* : agehdarî (li direk gişti hilawîstî), agehdariya helgirtî yan bi dîwaran ve hilawîstî.

PLACARD, *vt.* : agehdar kirin.

PLACATE, *vt.* : aşt kirin, qayil kirin, hedar kirin.

PLACATED, *adj.* : aştkirî, qayilkirî, hedarkirî.

PLACATER, *n.* : aştker, qayilker, hedarker.

PLACATING, *n.* : aştkirin, qayilkirin, hedarkirin.

PLACATION, *n.* : aştkirin, qayilkirin, hedarkirin.

PLACATIVE, *adj.* : aştdar, qayildar.

PLACATORY, *adj.* : aştkerî.

PLACE, *n.* : dir, şûn, cî, cih, dever, war, cigeh.

- **OF BIRTH** : bûngeh.
- **OF CONSOLATION** : şûngeh, behîgeh.
- **OF ORIGIN** : serkanî, serçav, nijad, jêder.
- **OF WORK** : şûnkar.
- **OF WORSHIP** : peristgeh.
- **IN ~** : li dir yan şûna rast.
- **IN ~ OF** : şûna.
- **IN THE FIRST ~** : yekem : li berî her tiştî.
- **OUT OF ~** : ne di cihê xwe de ye.
- **TO GIVE ~** : rê vekirin, çîz kirin.
- **TO GIVE ~ TO** : cihê xwe dan mirovek dî.
- **TO KNOW ONE'S ~** : ko qedrê xwe bizanit.
- **TO TAKE ~** : çêbûn (/çêdibit), qewimîn (/diqewimit).
- **TO TAKE THE ~ OF** : cihê kesekê girtin.

PLACE, *vt.i.* : danan, danîn.

PLACEBO, *n.* : nivêja êvarî bo canê mirî, hedarker dermanê dilniyakirina nesaxî.

PLACED, *adj.* : danayî.

PLACE-KICK, *n.* : pehîna tepka pêyan piştî danana ser erdê.

PLACE-KICK, *vt.i.* : pehîn (tizik) li tepkê dan.

PLACELESS, *n.* : bêcî, bêcih, bêşûn.

PLACEMAN, *n.* : fermanber yan erkdarê hikûmetê.

PLACEMENT, *n.* : danan, diyarkirina şûna kêrhatî.

PLACE-NAME, *n.* : navê şûnekê (erdnîgarî).

PLACENTA, *n.* : hevalbiçûk, hevalok, hijî.

PLACENTAL, *adj.* : hevalokî.

PLACENTATION, *n.* : hijîbûn, hevalokbûn, çêbûna hevalbiçûkî.

PLACER, *n.* : cercîr, cercîrgeh (bo şûştin û peydakirina zêrî).

- **MINING** : cercîr şûştin bo peydakirina pirtikên zêrî.

PLACE SETTING, *n.* : amanên mêzê (bo mirovekê).

PLACID, *adj.* : hedar, hêmin, asode, mit.

PLACIDITY, *n.* : hedarîtî, hêminîtî, mitîtî.

PLACIDLY, *adv.* : bi hedarî, bi mitî, bi nermî, mitkî.

PLACIDNESS, *n.* : mitîtî, nermîtî.

PLACING, *n.* : danan, danîn.

PLACKET, *n.* : berîk.

PLAGE, *n.* : pilac : berava deryayî.

PLAGIARISM, *n.* : raman yan peyiv dizîn.

PLAGIARIST, *n.* : raman yan peyivdiz.

PLAGIARIZE, *vt.i.* : raman yan peyiv dizîn.

PLAGIARIZER, *n.* : raman yan peyivdiz.

PLAGIARY, *n.* : raman yan peyivdizî.

PLAGUE, *vt.* : reşav girtin, enirandin, azar dan, eşkence dan, derdek girtin.

PLAGUEY OR PLAGUY, *adj.* : caris.

PLAICE, *n.* : texlîtek masî ye.

PLAID, *n., adj.* : perûkê hirî (çargoşe neqşkirî).

PLAIN, *adj., adv., n.* : rohn, zelal, petî, eşkera, tisî, sade, diyar, şanî, zebloq, deşt, asayî, lûs, rastbêj, dilsoz, kirêt.

- **PAPER** : rûpel yan berpera sade.

PLAIN, *vt.* : gazinde kirin, tazî kirin, behî kirin.

PLAIN-CLOTHES MAN, *n.* : polîsê nihênî.

PLAIN DEALING, *n.* : bazarê eşkera.

PLAIN SAILING, *n.* : asan, hêsan, sanahî, deryageriya hêsan.

PLAINSMAN, *n.* : deştî (mirov).

PLAINSONG, *n.* : mûzîqe yan awaza çend dengan.

PLAINSPOKEN, *adj.* : eşkera axiftin.

PLAINT, *n.* : gazinde, bêzarî, tawankirin, gunehkirin.

PLAINTIFF, *n.* : gilîkar, gazindeker, dawakar, dadxwaz, gilîdar.

PLAINTIVE, *adj.* : dilkovan, mirîto, keserî, mirûs.

PLAINTIVELY, *adv.* : bi mirîtoyî, bi mirûsî, mirûskî.

PLAINTIVENESS, *n.* : mirîtoyîtî, mirûsîtî.

PLAIT, *n.* : kezî, vehînek, wîna, hûna, pêlik, gulî.

PLAIT, *vt.* : vehandin.

PLAITING, *n.* : vehandin, çermiqandin.

PLAN, *n.* : melheze, nexşe, pîlan.

PLAN, *vt.i.* : nexşe kirin, melheze kirin.

- **TO ~ TO** : dan xwe.

PLAN(O)-, *pref.* : pêşgir e ko gerok e, pan e.

PLANAR, *adj.* : pêwendîdarê rasterûyî, rûyî.

PLANARIAN, *n.* : belgokî : kirmek biçûk û pan e wek belgê helezî ye.

PLANCHET, *n.* : sewka lêdanê : metalê rastrûyê lêdana diravî.

POSITRON, *n.* : pozîtron : leşikê erênî (bariste temet ewa elektironî ye).

POSITONIUM, *n.* : rêzike pozîtron û elektronê.

POSOLOGY, *n.* : dermanzanî.

POSSE, *n.* : birr, girûh, hêza qayim.

POSSESS, *vt.* : xudan bûn, zanîn, xwe ragirtin, bi dest keftin, dagîrtin.

- **TO ~ ONESELF OF** : bo xwe bûn.

POSSESSED, *adj.* : hewesgirtî, dagîrayî, dînoke, bedgiyangirtî.

- **BE ~ OF** : malxwe bûn.

POSSESSEDLY, *adv.* : dînokeyî.

POSSESSEDNESS, *n.* : dînokeyîtî.

POSSESSION, *n.* : saman, xudanbûnî, heyetî, xweyîtî, xweragirtin, dêran.

POSSESSIONAL, *adj.* : samanî, dêranî.

POSSESSIONS, *n.* : xirûmir.

POSSESSIVE, *n., adj.* : heyî, arizî, xweyîtî.

- **CASE** : barê samandarî (ziman).
- **PRONOUN** : ranavê xweyîtî.

POSSESSIVELY, *adv.* : bi xweyîtî.

POSSESSIVENESS, *n.* : xudanîtî, xweyîtî, dêranîtî.

POSSESSOR, *n.* : xudan, xweyî, samandar.

POSSESSORY, *adj.* : xudanî, dêranî.

POSSIBILIST, *n.* : çêbûnkar.

POSSIBILITY, *n.* : çêbûnbarîtî, luwan.

POSSIBLE, *adj.* : çêbûnbar.

POSSIBLES AND PROBABLES, *n.* : tîpên azmûniyên tepika pêyan.

POSSIBLY, *adv.* : heye ko, dibit ko, dibe ko, çêdibit ko.

POSSUM, *n.* : posom.

- **TO PLAY ~** : xwe nesax kirin, xwe mirandin.

POST, *n.* : poste, pasgeh, kiran, şinkar, sing, ragire.

- **BAG** : torbeyê posteyî.
- **BOX** : sindoqa posteyî.
- **BOY** : nameber, posteçî.
- **CARD** : karta posteyî.
- **MAN** : nameber.
- **MARK** : kêl.
- **MASTER** : namevan (kargerê postexaneyê).
- **MILL** : aşê bayî.
- **MISTRESS** : nameber (mê).
- **OFFICE** : postexane.
- **OFFICE BOX** : namedan.
- **PARTUM** : çille.
- **BEATEN AT THE ~** : li dûmahiyê revandî.
- **DEAF AS A ~** : kerrê temam (nabihîsit).
- **LEFT AT THE ~** : ji destpêkê li pişt xwe hêlayî.

POST, *adv.* : paş, pişt.

- **AXIAL** : pişt tewereyî.
- **CARDINAL** : pişt dilî.
- **CLASSICAL** : paş kilasikî.
- **COMMUNION** : paş wergirtina qurbanî.
- **DILUVIAN** : paş tofan.
- **DOCTORATE** : paş bawernameya doktorayê.
- **GRADUATE** : paş derçûnê.
- **HYPNOTIC** : piştî nivandina magnetîzî.
- **MILLINEAL** : paş hezarî.
- **MORTEM** : piştî mirinê.
- **NASAL** : pişt difnê.
- **NUPTIAL** : paş şûkirinê.
- **ORBIT** : piştî mirinê.
- **PARTUM** : paş biçûkbûnê, zêstanî.
- **PRANDIAL** : piştî firavînê.
- **TAX** : paş bacê (dahatî).
- **WAR** : piştî şerî yan cengî.

POST, *vt., i.* : hinartin, poste kirin, damezrandin, bi lez çûn.

POSTAGE, *n.* : kirêya posteyî.

- **STAMP** : pare yan dirav guhêz.

POSTAL, *adj.* : posteyî.

POST CHAISE, *n.* : guhêzoka çarçerxî (bo kirê).

POSTER, *n.* : hespek posteyî, mûsank (bo agehdariyê yan ragehînê).

POSTERIOR, *n., adj.* : paş, pil, qûrik.

- **CHAMBER** : valatiya paşî.
- **RING** : zûçik.

POSTERIORITY, *n.* : paş hatin.

POSTERITY, *n.* : nevî, weçe, bere.

POSTERN, *n.* : paşî, rexî, deriyê paşî.

POST EXCHANGE, *n.* : firoşgeha leşkerî.

POST EXILE : paş sirgûna Cihiyan.

POST FACE, *n.* : têbînî li paşiya pirtûkê.

POST-FREE, *adj.* : posteya herwe.

POST GLACIAL : paş rojgarê seholê.

POST HASTE, *adv., n.* : bêqam bilez.

POST HOC : ji ber vê, piştî vê.

POST-HORSE, *n.* : hespê posteyî.

POSTHUMOUS, *adj.* : piştî mirina babî (bûn).

POSTHUMOUSLY, *adv.* : li piştî mirinê.

POSTICHE, *n.* : zirpirç, zirpor.

POSTICOUS, *adj.* : paşî, piştî.

POSTIL, *n.* : têbînî yan lêdiwan li ser deqê Încîlê.

POSTIL(L)ION, *n.* : siwarê hespê nêziktirê serokî.

POSTILIMINY, *n.* : vegerandina mafan (piştî sirgûnkirinê yan aştiyê).

POSTING, *n.* : hinartin, pêguhastin, virêkirin.

POSTLUDE, *n.* : paşmayî, paşmawe.

POST MERIDIAN, *adj.* : qewmîna piştî nîvro.

POST MERIDION : piştî nîvro.

POST OPERATIVE : piştî kirdarê.

POST ORBITAL : pişt kuna çavî.

POST PAID, *adj.* : poste kirêdayî, kirêya bijîn.

POSTPONABLE, *adj.* : paşxistinbar.

POSTPONE, *vt., i.* : paş xistin, dan paş, gîro kirin.

POSTPONED, *adj.* : paşxistî, paşvexistin, danpaş, paşdexistin, hêlan.

POSTPONING, *n.* : paşxistin, gîrokirin.

POST POSITION, *n.* : pirtik yan bêjeya paşhevxistî, bêjeya paşxistî.

POST POSITIVE, *adj.* : peyiv paşdamayî.

POST ROAD, *n.* : rêya posteyî.

POSTSCRIPT, *n.* : têbînî.

POSTULANT, *n.* : navkirî nemaze bo rebeniyê.

POSTULATE, *n.* : seretaya binyatî, girîmankarî.

POSTULATE, *vt., i.* : girîman kirin, xwastin.

POSTULATED, *adj.* : daxwazkirî, xwestî.

POSTULATING, *n.* : daxwazkirin.

POSTULATION, *n.* : daxwazkirin.

POSTULATOR, *n.* : girîmankar.

POSTULE, *n.* : pirzik, pizik, rîşik, pizrûk.

POSTURAL, *adj.* : rawestî.

POSTURE, *n.* : mad, bar, rawest, helwêst.

POSTURE, *vt.* : rawest yan helwêst wergirtin.

POSTURER, *n.* : rawestker.

POSTURIZE, *vt., i.* = **POSTURE.**

POST VOCALIC, *adj.* : piştî tîpa nedengdar.

POST WAR, *adj.* : piştî şerî.

POSY, *n.* : neqşa malka helbestê, gul, destikê gulan, çepik.

POT, *n.* : sincik, qap, aman, berûş (beroş), qûşxane, lalîk.

- **BELLIED** : zikmezin.
- **BELLY** : zikmezin.
- **BIG ~** : mencel.
- **BOILER** : karê destketinê (karê hunerî û torî bo diravî).
- **BOY** : meygêr.
- **COOKING ~** : qazan.
- **HOLE** : kûrka liserrê, kûrka zivrekî.
- **HOOK** : çembilê qazanê.
- **HOUSE** : meyxane, meyfiroşgeh.
- **HUNTER** : nêçîrvanê karî yan pîşeyî.
- **HUNTING** : nêçîrvanê pîşeyî.
- **LIQUOR** : avgoşt, avka zerzewatî (metfînî).
- **LUCK** : çi hebit bo xwarinê (bextqazan).
- **PIE** : kadeya goştî, metfîniya goştê mirîşkê yan golikî.
- **ROOST** : goştê çêlê (birajtî paşî kelandî).
- **SHOT** : fîşeka danî : nêçîr bo xwarinê, serinca rexneyî.
- **SMALL ~ (WITH HOLDER)** : mencelok.
- **STILL** : nit, bêlivîn.
- **STONE** : dêndiksabûn.
- **VALIANT** : mestaza.
- **VALOUR** : mestazayî.
- **TO KEEP THE ~ BOILING** : ked kirin, pirs yan kar bi çalakî berdewam kirin.

POT, *vt., i.* : pehtin, kirin nav qazanê de : fîşek berdan yan havêtin.

POTABILITY, *n.* : vexwarinbarî(tî).

POTABLE, *n., adj.* : vexwarinbar, vexwarin.

POTABLENESS, *n.* : vexwarinbarî(tî).

POTAGE, *n.* : giraz yan şorbeya tîr.

POTAMIC, *adj.* : rûbarî.

POTAMOLOGY, *n.* : rûbarîzanî.

POTASH OR POTASS, *n.* : potas (madeyek qilêyî).

- **CAUSTIC ~** : hîdroksîd yan hîdrat ya potasyom.

- **WATER** : vexwarinek firhayîkirî.

POTASSIC, *adj.* : potasyomî.

POTASSIUM, *n.* : potasyom : hêmanek metalî, spî, nerm û qilêyî ye.

POTATION, *n.* : vexwarin, qurt, fir.

POTATO, *n.* : kartol.

- **BEETLE OR BUG** : kîza kartolî.

- **CHIP(S)** : pirtik yan kîzîka kartolî, çips.

POTATORY, *adj.* : vexwarinî.

POTBOIL, *vi.* : karê torî yan hunerî bo diravî kirin (pîşeyî).

POTENCE, *n.* : hêz, çalakî, desthelatî, mêrayî.

POTENCY, *n.* : hêzdarî, karîgerî, çalakî, karîn, qam, hêz, nêrayî, çêbûnî.

POTENT, *adj.* : xurt, hêzdar, çalak, nêr.

POTENTATE, *n.* : xonkar, qiral, şah, fermandar.

POTENTATES, *n.* : giregir.

POTENTIAL, *n., adj.* : mit, erk, erkî, şiyanî.

- **DIFFERENCE** : cudayiya erkî, ciyawaziya erkî.

- **ENERGY** : wizeya mit, ozya mit.

POTENTIALITY, *n.* : şiyanîtî, mitîtî, erkîtî.

POTENTIALLY, *adv.* : bi şiyanî, şiyankî.

POTENTIALIZE, *vt.* : erkî kirin.

POTENTIATE, *vt.* : çalak kirin, qayim kirin, xurt kirin.

POTENTIATED, *adj.* : xurtkirî.

POTENTIATING, *n.* : xurtkirin.

POTENTIATION, *n.* : xurtbûn.

POTENTILLA, *n.* : hêzgiya (giyayê hêzê).

POTENTIOMETER, *n.* : erkpîv, erkpêw.

POTENTIOMETRIC, *adj.* : erkpîvî.

POTENTLY, *adv.* : bi hêzdarî, hêzdarkî.

POTFUL, *adj.* : qazanek (teji qazankê).

POTHER, *n.* : toz yan dûkêla xeniqîn, şaşî, jawe, şepirzeyî, arhan, teqûreq.

POTHER, *vt., i.* : perîşan kirin, şepirze kirin, perîşan bûn, arhan (arihîn).

POTHERB, *n.* : giyayê xwarinê : her giyayê lênanê yan patinê, giyayê tamê.

POTHERED, *adj.* : şepirzekirî.

POTHERING, *n.* : şepirzekirin.

POTICHE, *n.* : guldank yan amanê kirêçî (kaloti).

POTION, *n.* : qurt, firek.

POTLATCH, *n.* : şayî yan mehrecana zivistanê, diyarî.

POTLATCH, *vt.i.* : diyarî dan yan kirin, pêşkêş kirin.

POTOROO, *n.* : mişkekengeroyê difndirêj.

POTSHERD, *n.* : kevneamanê şikestî.

POTSHOT, *n.* : derbê hêsan.

POTTAGE, *n.* : şorbe, giraz.

POTTER, *n.* : qewaq, gosker, pirût.

- **'S CLAY** : (potter's earth) : lîma gilkarî.

- **'S FIELD** : zeviya gilkarî : goristana hejar, kesnezan û tawankaran.

- **'S WHEEL** : çerxa gilkarî.

POTTER, *vi. t.* : gilkarî kirin.

POTTERY, *n.* : kirêç, gilkarî, çînî, ferfûrî, goskerî, gilêne.

POTTING, *n.* : qehfik, gilkarî.

POTTLE, *n.* : nîv gelen : şerabek mestî, selka meyweyî.

POTT'S DISEASE, *n.* : nesaxiya poł : êşa zirava karîteyê piştê.

POTTY, *n.* : bêşûpewerî, negiring, pûç, sincik.

POUCH, *n.* : tûrk, kîsk, çente, berîk, gurz, girjîya bin çavî.

- **OF THE CHEEK** : lam.

POUCH, *vt.i.* : dirav danê, daûran, heban kirin (kirin heban).

POUCHED, *adj.* : hebanî, hebankirî.

POUCHY, *adj.* : hebanî.

POUDRETTE, *n.* : têkiliya gû û rejiyê.

POUFE, *n.* : guliya pirçê, parçeya pufa kirasî.

POULARD(E), *n.* : mirîşka mezin û qelewkirî.

POULPE, *n.* : heştpê.

POULT, *n.* : varik, çîçelok.

POULTERER, *n.* : miîşkfiroş.

POULTICE, *n., vt.* : kemade, koma nermenan, kemade (pate) danan ser pejbûnê yan şûna êşê.

POULTRY, *n.* : kehîbalinde (qaz, werdek, mirîşk ~), perdar, çîneker.

- **LICE** : pembok.

- **MAN** : xudankerê mirîşkan.

POUNCE, *n.* : êrîş, hêriş, penca balindeyî, toza hûra zuhakirinê.

- **BOX** : tozdank.

POUNCE, *vt.i.* : êrîş kirin, toz kirin (merekebî), zuha kirin.

POUNCED, *adj.* : êrîşkirî, tozkirî, gemirandî.

POUNCET BOX, *n.* : qotîka tepka bêhnxweş.

POUNCING, *n.* : tozkirin, êrîşkirin.

POUND, *n.* : pawin (pare, dirav), pawin (pîvana kêşanê), pawana terşî, lêdanek yan kulmek qayim, gov, gem.

- **CAKE** : kiloca yek pawin.

- **FOOLISH** : xirpo.

- **NET** : tora pêkhatî.

- **STERLING** : pawinê înglîzî.

POUND, *vt.* : lê dan, herişandin, kutan, qutan, rêncberî kirin.

POUNDAGE, *n.* : girtin, zîndankirin, baca pawinî.

POUNDAL, *n.* : yekeya hêzê ye.

POUNDER, *n.* : kutek, kutik, mîkut, sîrkut, mêkut.

POUR, *n.* : rištin, barîn, rištin, şelpîn, şerpilîn, rêj, rêtin.

- **POINT** : xalika rištinê.

POUR, *vt.i.* : têkirin, rištin, ro kirin, barîn.

POURED, *adj.* : verêtî, rištî, rijandî, porkirî.

POURED, *p.* **OF POUR** : porkir, rišt, rijiya.

POURING, *n., adj.* : têkirin, verêtin, rijan, darijtin, helrêjan, porkirin, rokirin, rijandin, rištin, rêtin, rijîn, barîn (giran).

POUSSETTE, *n.* : govend.

POUSSETTE, *vi.* : sema yan dawet kirin (govend).

POUSSETTED, *adj.* : semakirî.

POUSSETTING, *n.* : semakirin.

POUSSING, *n.* : çîçeloka mirîşkê (bo xwarinê xudankirî).

POUT, *n.* : masıyek sermezin e.

POUT, *vt.i.* : rûyê xwe tirş kirin.

POUTER, *n.* : texlîtek kotir yan kevok e.

POUTY, *adj.* : rûtirşkirî, zîz.

POVERTY, *n.* : hejarî, jarî, tengjîn, xizanî, jarbûn, rebenî, belengazî, dijgonî, perîşanî, sefîlî.

- **STRICKEN** : hejar, destteng.

POW, *n.* : ser dengê teqînê, peqînê yan lêdanekê.

POWAN, *n.* : gulmasî.

POWDER, *n.* : toz, şore, gejmîrek.

- **BLUE** : rengek şînê vekirî ye.

- **HORN** : qoç yan cerê gejmîrê.

- **MAGAZINE** : embara gejmîrê.

- **METALLURGY** : metalzaniya tozekan.

- **MONKEY** : meymûnê şoreyê : xizmetkarê guhastina şoreyî.

- **ROOM** : jora karê jinan.

- **TUBE** : wezn.

POWDER, *vt.* : toz kirin, hêran.

POWDERED, *adj.* : ardik, arik, hêrayî, piloxe.

POWDERING, *n.* : tozkirin.

POWDER PUFF, *n.* : qedîfeyê tozkirina rûyî.

POWDERY, *adj.* : tozî.

POWER, *n., adj.* : hêz, wize, oz, desthelatî, şiyan, tîn, şên, zorayî, dor, karîn, kanîn, pêkarîn, zor, qam, muxtarî, pergel, zordestî, tiwanayî.

- **IN ~** : li ser hukmî, desthelatdar.

- **THE ABOVE ~** : Xuda (Xweda), Xudê(Xwedê), Xuwa.

- **THE ~ THAT BE** : karbidest, hukimdar, desthelatdar.

POWER, *vt.* : bi hêz kirin, bi êzîng kirin, hêzdar kirin.

POWER BOAT, *n.* : belema bizwênkirî yan makînekirî.

POWER DRIVE, *n.* : êrîşa lezandî bi hêza bizwênê yan makîneyê.

POWER-DRIVEN, *adj.* : amêrsaz, amêrger, xwekar, bizwênhajotî.

POWERED, *adj.* : bizwênkirî, amêrgerî.

POWERFUL, *adj.* : hêzdar, tund, xurt, zorbaz, zordest, dijwar, pît, bihêz.

POWERFULLY, *adv.* : bi hêzdarî, hêzdarkî.

POWER HOUSE, *n.* : kehrebgeh.

POWERLESS, *adj.* : sist, sefîl, qels, lawaz, bêşên, bêhêz.

POWERLESSLY, *adv.* : bi bêhêzî, bêhêzkî.

POWERLESSNESS, *n.* : bêhêzîtî, lawazîtî, bêkare.

POWER PACK, *n.* : koma kargeha hêzê (helhênîn).

POWER PLANT, *n.* : kargeha hêzê (kehrebê).

POWER POLITICS, *n.* : rêzika hêzê (desthelatiyê).

POWER SERIES, *n.* : zincîreyên hêzê.

POWER SHOVEL, *n.* : ramala amêrgerî.

POWER STATION, *n.* : kargeha hêzê (kehrebê).

POW POW, *n.* : oldar yan pijîşkê Hindokên sor.

POX, *n.* : nesaxiya pinîkan (wek xurîkan), ateşek, firengî.

PRACTICABILITY, *n.* : kirdarbarîtî.

PRACTICABLE, *adj.* : kirdarbar.

PRACTICAL, *adj.* : kirdarî, kirdenî.

- **JOKE** : gevezeyî.

- **NURSE** : peristara serhatî.

PRACTICALLY, *adv.* : bi kirdarî, kirdarkî.

PRACTICALNESS, *n.* : kirdarîtî.

PRACTICE OR PRACTISE, *n.* : nerît, pêrabûn, baw, rêzik, meşq, rewişt.

PRACTICE, *vt.* : kirdar kirin, kar kirin.

PRACTICED OR PRACTISED, *adj.* : kirdarkirî, serhatî, pispor.

PRACTICIAN, *n.* : karker.

PRACTISE, *vt.* = **PRACTICE.**

PRACTISED, *adj.* = **PRACTICED.**

PRACTISING, *n.* : kirdar kirin, meşq kirin.

PRACTITIONER, *n.* : pîşekar, karmend.

PRAECOCIAL, *adj.* : balindeyî.

PRAEDIAL, *adj.* : aqarî.

PRAENOMEN, *n.* : navê yekem.

PR(A)E POSTOR, *n.* : dibistana xwemalî.

PRAETOR, *n.* : dadwer (li nik Romanan).

PRAETORIAN, *adj.* : împaratorî.

PROFLUENT, *adj.* : rêjende.

PRAGMATIC, *adj.* : behaneyî, kirdarî.

- **SANCTION** : ferman.

PRAGMATICAL, *adj.* : behaneyî, mehaneyî.

PRAGMATICALLY, *adv.* : bi behaneyî yan mehaneyî.

PRAGMATISM, *n.* : behaneyîtî, mehaneyîtî.

PRAGMATIST, *n.* : behanegir, mehanekar.

PRAGMATISTIC, *adj.* : behangerî, behaneyî.

PRAGMATIZE, *vt.* : behane kirin, mehane kirin.

PRAIRIE, *n.* : mêrg, çol, deşt.

- **BREAKER** : gêsinê deştan yan mêrgan.

- **CHICKEN** : mirîşka deştan : (texlîtek mirîşka emerîkanî ye).

- **DOG** : seyê mêrgan : canewerek kirinde yê emerîkanî ye.

- **SCHOONER OR WAGON** : erebaneya deştan yan mêrgan.

PRAISE, *n.* : pesn, fort, zort, aferîn, stayiş, qepe.

- **FALSE ~** : fort.

PRAISE, *vt.* : pesn kirin.

PRAISED, *adj.* : pesinkirî.

PRAISER, *n.* : pesinker, pesindar (yan pesinkar).

PRAISING, *n.* : pesinkirin, pesandin.

PRAISEWORTHILY, *adv.* : bi pesindarî.

PRAISEWORTHINESS, *n.* : pesindarîtî.

PRAISEWORTHY, *adj.* : pesindar.

PRAKRIT, *n.* : zaravê bakur û navîna Hindistanê.

PRALINE, *n.* : texlîtek şekirok.

PRALL TRILLER, *n.* : rawestana awazek mûzîqeyî nivîsî : lezîn paşî awazek li ser re.

PRAM, *n.* : erebaneya zarokan.

PRANCE, *n.* : bazdan, fêz, fort, lîtik.

PRANCE, *vi.t.* : bazdan, dawet kirin, lîtik havêtin.

PRANCED, *adv.* : bazdayî, lîtikhavêtî.

PRANCER, *n.* : fêzkar.

PRANCING, *n.* : fort.

PRANDIAL, *adj.* : firavînî.

PRANG, *n., vt.* : vêketin, vêketin.

PRANK, *n.* : yarî, finaz.

PRANK, *vt.i.* : xemilandin.

PRANKFUL, *adj.* : finazkar.

PRANKISH, *adj.* : tiranekerî, finazî, yarîkerî.

PRANKISHLY, *adv.* : bi finazî, finazkî.

PRANKISHNESS, *n.* : finazîtî.

PRANKSTER, *n.* : yarîker.

PRASE, *n.* : berek hêja ye.

PRASEODYMIUM, *n.* : hêmanek kanî yan metalî ye jî zincîreya lantandî.

PRATE, *n.* : çenebazî, pirbêjî.

PRATE, *vi.t.* : çenebazî kirin, pirbêjî kirin.

PRATED, *adj.* : pirbêjîkirî.

PRATER, *n.* : çenebaz, pirbêj.

PRATFALL, *n.* : çewtiya gêre.

PRATING, *n.* : pirbêjîkirin.

PRATINCOLE, *n.* : balindeyek wek çûçikê ye.

PRATIQUE, *n.* : rêdana dan û standinê li gel bendergehê.

PRATTLE, *n.* : eletewş, pirbêjî, kelevajî, çenebazî.

PRATTLE, *vi., t.* : pirbêjî kirin, çenebazî kirin.

PRATTLED, *adj.* : pirbêj.

PRATTLER, *n.* : devşîl, çenebaz, pelpelo.

PRATTLING, *adj.* : pirbêjî, pelpel, pitat, pûçbêjî, çenebazî, devşîlî.

PRAVITY, *n.* : devî.

PRAWN, *n.* : kêça deryayî, robyan.

PRAWN, *vi.* : robyan girtin.

PRAWNER, *n.* : robyangir (wek masîgirî).

PRAXIS, *n.* : meşq, rahînan.

PRAY, *vt., i.* : nivêj kirin.

PRAYER, *n.* : nivêj, nimêj, nuwêj, lavayî, lavahî.

- **BEADS** : tizbî.
- **LEADER** : rêberê nivêjê, nivêjber, pêşnivêj.
- **NICHE** : nivêjgeh.
- **ROOM** : xaneqa.
- **RUG** : şemilk.

PRAYER BOOK, *n.* : kitêba nivêjan.

PRAYERFUL, *adj.* : nivêjdar.

PRAYERLESS, *adj.* : bênivêj.

PRAYING, *n.* : nivêjkirin.

- **PAST ~ FOR** : bêhîvî (çûyî, naveresit).

PRE-, *pref.* : pêşgir e ko berî ye.

PRE-CAST, *adj.* : berî dariştinê (çimento).

PRE-ELECTION : berî helbijartinê.

PRE-ENGAGEMENT : berî dezgiriyê.

PRE-EXISTENCE : berî hebûnê.

PRE-HISTORIC : berî dîrokê.

PRE-PERCEPTION : berî têgehiştinê.

PREACH, *vi.t.* : pend kirin.

- **TO ~ DOWN** : daşikandin, mit kirin (bi pendî).

PREACHABLE, *adj.* : pend bar.

PREACHER, *n.* : amojgar, mûçkar, reben, pendiyar, pêşgo, oldar.

PREACHIFY, *vi.* : pend kirin (mirûsî).

PREACHING, *n.* : temî, pendiyarî.

PREACHMENT, *n.* : pendkirin (mirûsî).

PREACHY, *adj.* : pendxwaz.

PREADOLESCENT, *adj.* : pêşherzekar, pêşsîpe.

PREAMBLE, *n.* : pêşgotin, pêşekî, berahî.

PREAMBLE, *vi.* : pêşekî nivîsîn.

PREARRANGE (MENT), *n.* : pêşrêkxistin.

PREATOMIC, *adj.* : pêşgerdîleyî.

PREAUDIENCE, *n.* : mafê parêzeriyê pêş bihîstinê.

PREAXIAL, *adj.* : ber yan pêştewere.

PREBEND, *n.* : oldar, mûçeyê oldarî, bexşa dêrê.

PREPENDARY, *n.* : oldarê bimûçe, oldarê avrûyî.

PRECANCEL, *vt.* : helweşandin yan rakirin (berî bi karînanê).

PRECANCEROUS, *adj.* : pêşpenceşêr (penceşêrbar).

PRECARIOUS, *adj.* : xilole, leqîn, gumandar, metirsî, nehedar, neqayim, neseqamgîr.

- **LIFE** : jiyana bêhedarî.
- **LIVING** : jiyana bêhedarî.

PRECARIOUSLY, *adv.* : bi xiloleyî, bi metirsî.

PRECARIOUSNESS, *n.* : xiloleyîtî, metirsîtî.

PRECATIVE, *adj.* : lavayî, hîvîdar.

PRECATORY, *adj.* : hîvîdar, lavayî (spardeyî).

- **TRUST** : peyiva desteber.

- **WORDS** : hîvî ko tiştek çêbit.

PRECAUTION, *n.* : hişyarî, wuryayî, parêz, haş, hay, qayimekarî.

PRECAUTIONARY OR PRECAUTIONAL, *adj.* : parêzî.

PRECAUTIOUS, *adj.* : wurya, hişyar, parêzî.

PRECEDE, *vt.i.* : serkeftin (paye), pêşkeftin, berî hatin, destpêkirin.

PRECEDED, *adj.* : pêşxistî.

PRECEDENCE, *n.* : pêşkî, pêşîn, berahî.

PRECEDENCY, *n.* : pêşkî, berahî.

PRECEDENT, *n., adj.* : pêşberîn, rabirde, pêşkî.

PRECENTED, *adj.* : pêşkîkirî.

PRECEDING, *adj.* : berî, pêşî, pêşxistî.

PRECENSOR, *vt.* : berê xwe dan, temaşe kirin (temaşekirina filmî berî bo xelkê nîşandanê).

PRECENTOR, *n.* : serekdengbêjê dêrê.

PRECENTORSHIP, *n.* : serekdengbêjî.

PRECEPT, *n.* : ferman, pend, sereta, rasipar, fêrkirina sincî.

PRECEPTIVE, *adj.* : hînkirinî, fêrkirinî.

PRECEPTOR, *n.* : mamosta, hînker, fêrker, seyda.

PRECEPTORIAL, *adj.* : hînkerî.

PRECEPTORSHIP, *n.* : hînkerîtî.

PRECEPTORY, *n.* : hînkerî.

PRECEPTRESS, *n.* : hînker, fêrker (mê).

PRECESSION, *n.* : pêşkirin.

PRECESSIONAL, *adj.* : pêşkirinî.

PRECINCT, *n.* : tax, gerek, dever (bo helbijartinê), tûxîb.

PRECIOSITY, *n.* : zimanhilîtî.

PRECIOUS, *adj., adv.* : giran, bihadar, binirx, kaw, berketî, nirxdar, pirbiha, bihadar, hêja, rûbaz.

- **METALS** : metalên hêja.

- **STONE** : berê hêja.

PRECIOUSLY, *adv.* : bi nirxdarî, bihakî.

PRECIOUSNESS, *n.* : nirxdarîtî, bihadarîtî.

PRECIPICE, *n.* : zang, kendal, şax, teht.

PRECIPITABILITY, *n.* : nîştebarîtî.

PRECIPITABLE, *adj.* : nîştebar.

PRECIPITANCE, *n.* : nîşte.

PRECIPITANCY, *n.* : nîşte.

PRECIPITANT, *adj.* : nîştêner.

PRECIPITANTLY, *adv.* : bi nîştenêrî.

PRECIPITATE, *n.* : nîşte, lezo, nîşto, pirk.

PRECIPITATED, *adj.* : nîştebûyî, nîşteyî.

PRECIPITATENESS, *n.* : nîştbûn, holî.

PRECIPITATING, *n.* : nîştokirin.

PRECIPITATION, *n.* : nîştin, nîşte.

PRECIPITATOR, *n.* : nîşteker.

PRECIPITIN, *n.* : leşê bergirê nîşteker, leşê dijmîkrob ko di xwînê de peyda dibit, pîştî qutanê û madeyên nîşte nîv spîlkî çêdikit.

PRECIPITIOUS, *adj.* : nişîviya tîj, hol.

PRECIPITIOUSNESS, *n.* : holîtî.

PRECIS, *n.* : kurtî, kurte, puxte.

PRECIS, *vt.* : kurt kirin.

PRECISE, *adj.* : rast, hûr, wurd.

PRECISELY, *adv.* : bewurdî, bi siftî, bi hûrî, bi rastî, siftekî.

PRECISENESS, *n.* : siftîtî.

PRECISIAN, *n.* : vebirrî.

PRECISIANISM, *n., adj.* : vebirrîtî.

PRECISION, *n., adj.* : rastî, hûrî, wurdî, qayim, pêtbûn.

PRECLINICAL, *adj.* : berî diyarbûna nîşanên nesaxiya nivînî.

PRECLUDE, *vt.* : gîro kirin, qedexe kirin, hînan der, dûre kirin, derxistin.

PRECLUSIVE, *adj.* : gîro, qedexe, berbest.

PRECLUSIVELY, *adv.* : bi berbestî, berbestkî.

PRECOCIAL, *adj.* : şiyaniya çalakiya serxwebûn.

PRECOCIOUS, *adj.* : zûwerar, zûberdayî (helez), zûçêbûyî, berî demî gehiştî.

PRECOCIOUSLY, *adv.* : zû werarî yan gehiştî, zûwerarkî.

PRECOCIOUSNESS, *n.* : zûgehiştin.

PRECOGNITION, *n.* : dûrbînî, dûrdîtin.

PRECONCEIVE, *vt.* : pêşhizir kirin.

PRECONCEPTION, *n.* : pêşhizirkirin, pêşbiryarî.

PRECONCERT, *vt.* : pêş pêk hatin.

PRECONDITION, *n., vt.* : merc, pêşlêkdan.

PRECOOK, *vt.* : pêş pehtin.

PRECRITICAL, *adj.* : pêştengavî.

PRECURSOR, *n.* : mizgîn, gef, pêşî.

PRECURSORY, *adj.* : mizgîndar, gefdar, destpêkî.

PREDACEOUS OR PREDACIOUS, *adj.* = **PREDATORY.**

PREDACITY, *n.* : dirrî, rawirî, cinawirî.

PREDATE, *vt.* : pêş yan berî hatin.

PREDATION, *n.* : rawirî.

PREDATOR, *n.* : rawir, cinawir.

PREDATORIAL, *adj.* : rawirî.

PREDATORY, *adj.* : rawirî.

- **ANIMAL** : rawir.

PREDECEASE, *vt.i.* : berî yan pêşekî mirin (berî mirovek dî).

PREDECEASED, *adj.* : berî mirî.

PREDECEASING, *n.* : berî mirin.

PREDECESSOR, *n.* : pêşîn.

PREDESIGNATE, *vt.* : pêş bijartin.

PREDESTINARIAN, *n., adj.* : pêşbiryardanî, qederî.

PREDESTINARIANISM, *n.* : qeder, pêşbiryardayîtî, berî biryardarîtî.

PREDESTINATE, *adj., vt.* : pêşbiryardayî, pêşbiryarkirî.

PREDESTINATING, *n.* : pêşbiryarkirin.

PREDESTINATION, *n.* : pêşbiryardan, pêşbiryarkirin, qeder.

PREDESTINE, *vt.* = **PREDESTINATE.**

PREDETERMINATE, *adj.* : pêşbiryardayî.

PREDETERMINATION, *n.* : pêşbiryardan, qeder.

PREDETERMINE, *vt.* : pêşbiryar dan.

PREDETERMINER, *n.* : rastkerê navîn.

PREDIABETES, *n.* : berî şekirmîzî (pêşnîşan).

PREDIABETIC, *adj.* : nesaxê berî şekirmîzî.

PREDIAL, *adj.* : gundî, qarî.

PREDICABILITY, *n.* : selmênbarî.

PREDICABLE, *adj.* : selmênbar.

PREDICAMENT, *n.* : tengavî, berveketin, têgîrane, çîn, gor, cor, texlît, tûş.

PREDICAMENTAL, *adj.* : tengaviyî.

PREDICANT, *n., adj.* : pendiyar.

PREDICATE, *n., adj.* : selmandî, selmandin, selmênraw.

PREDICATE, *vt.* : selmênîn, nîşan kirin, binyat dike.

PREDICATED, *adj.* : selmênraw, selmandî, têrker.

- **SENTENCE** : hevoka têrkerî.

PREDICATING, *n.* : nîşankirin, binyatkirin.

PREDICATION, *n.* : selmandin.

PREDICATIVE, *adj.* : selmandî, dûpatkirî, dupatî.

PREDICATORY, *adj.* : pendî.

PREDICT, *vt.* : berbîn kirin, vegotin, pêşbînî kirin (berî dîtin).

PREDICTABILITY, *n.* : berbînbarî(tî).

PREDICTABLE, *adj.* : berbînbar.

PREDICTABLY, *adv.* : bi berbînî, berbînkî, pêşbînkî.

PREDICTED, *adj.* : berbînkirî, vegotî, pêşbînkirî.

PREDICTING, *n.* : pêşbînî, berbînî.

PREDICTIVE, *adj.* : berbîndar.

PREDICTIVELY, *adv.* : bi berbîndarî, berbîndarkî.

PREDICTION, *n.* : pêşbînkirin, berbêjî, xeftbêjî, vegotin, bergotin, berbînî, pêşbînî.

PREDICTOR, *n.* : berbêj, xeftbêj, berbîn, pêşbîn.

PREDIGEST, *vt.* (pê) givêrtin.

PREDIGESTION, *n.* : pê givêrtin.

PREDILECTION, *n.* : hewes, lagîrî.

PREDISPOSE, *vt.* : xwaza kirin.

PREDISPOSITION, *n.* : lêkdan, amadebûn.

PREDNISONE, *n.* : dermanek wek (kortîzon) lê xurtir e.

PREDOMINANCE, *n.* : raserbûn, zalî.

PREDOMINANCY, *n.* : zalî, zalbûn.

PREDOMINANT, *adj.* : zal, baw.

PREDOMINANTLY, *adv.* : bi zalî, zalkî.

PREDOMINATE, *adj.* = **PREDOMINANT.**

PREDOMINATE, *vi.* : zal bûn.

PREDOMINATION, *n.* : zalbûnî, zalî.

PREDOMINATIVELY, *adj.* : bi zaldarî, zaldarkî.

PREE, *vt.* : seh kirin, tam kirin.

PREED, *adj.* : sehkirî, tamkirî.

PREEING, *n.* : sehkirin, tamkirin.

PRE-EMERGENCE, *n.* : berî derketina helezê tovî.

PRE-EMINENCE, *n.* : nayabî.

PRE-EMINENT, *adj.* : nayab.

PRE-EMINENTLY, *adv.* : bi nayabî, nayabkî.

PRE-EMPT, *vt.i.* : pêşdagîr kirin (bo kirînê û xudaniyê).

PRE-EMPTION, *n.* : mafê pêş dagîriyê.

PRE-EMPTIVE, *adj.* : parêzî, pêş dagîrî, pêşdagîrdar.

PRE-EMPTOR, *n.* : pêşdagîrker.

PRE-EMPTIVELY, *adv.* : bi pêş dagîrî yan parêzî, pêşparêzkî.

PREEN, *vt., n.* : law kirin, perî (bi niklî) rast kirin, serfirazî kirin, karê xwe kirin, sinceq (biroş).

- **GLAND** : toşpî yan livîka bin dûvikê balindeyî).

PRE-EXILIAN, *adj.* : pêş sirgunî.

PRE-EXIST, *vi., t.* : pêş hebûn.

PRE-EXISTENCE, *n.* : pêş bûnê yan hebûnê.

PRE-EXISTENT, *adj.* : pêşbûnî.

PRE-FAB, *n.* : avahiyê pêş (berî) çêkirî (ava kirin).

PRE-FABRICATE, *vt.* : pêş çêkirin (ava kirin).

PRE-FABRICATION, *n.* : pêşçêkirin (avakirin).

PREFACE, *n.* : pêşekî, pêşgotin, berahî, sereta, serrû.

PREFACE, *vt.i.* : pêşekî kirin (dinivîsit), pêşgotin nivîsîn.

PREFACED, *adj.* : pêşekîkirî.

PREFACER, *n.* : pêşekîker.

PREFACING, *n.* : pêşekîkirin.

PREFATENAL, *adj.* = **PREFATORY.**

PREFATORY, *adj.* : beramber, destpêkî.

PREFECT, *n.* : zêrevan, serperişt, kardarê balbazî, fermanrewayê Romayî.

- **APOSTOLIC** : kardarê peyamberî.

PREFACTORAL OR PREFECTORIAL, *adj.* : zêrevanî, deverî, fermanrewayî.

PREFECTORIAL, *adj.* : deverî.

PREFECTURAL, *adj.* = **PREFECTORIAL.**

PREFECTURE, *n.* : dever, karê parêzkarî, ostan, karê parêzgerî.

PREFER, *vt.* : hevyaz kirin.

PREFERABILITY, *n.* : hevyazbarî(tî).

PREFERABLE, *adj.* : hevyazbar.

PREFERABLY, *adv.* : bi hevyazbarî, hevyazbarkî.

PREFERENCE, *n.* : hevyaz, pesindkirin.

- **BOND** : qoçana hevyaz.
- **SHARE** : behra hevyaz.
- **STOCK** : qoçana hevyaz.

PREFERENTIAL, *adj.* : hevyazî.

PREFERENTIALLY, *adv.* : bi hevyazî.

PREFERMENT, *n.* : pêşxistin, hevyaz.

PREFERRED, *adj.* : hevyazkirî.

- **DEBT** : deynê hevyaz (pêşî standin).
- **STOCK** : beşê hevyaz.

PREFERRING, *n.* : hevyazkirin.

PREFIGURATION, *n.* : pêşwênekirin.

PREFIGURE, *vt.* : pêşwêne kirin, aşop kirin.

PREFIGUREMENT, *n.* : pêşwênekirin.

PREFIX, *n.* : pêşgir, pêşko.

PREFIXION, *n.* : pêşgirî.

PREFLIGHT, *n.* : pêşfirîn.

PREFORM, *vt.* : pêş çêkirin.

PREFORMATION, *n.* : pêşçêkirin : dîtaneya ko hemû endamên pizî pêş çêkirîne di nav tovî de.

PREFORMATIVE, *n., adj.* : pêşçêbûnî, pêşçêbûndar.

PREFRONTAL, *adj.* : pêşberahî, pêşber.

PREGNABLE, *adj.* : têreçûnbar, neasê.

PREGNANCY, *n.* : bitiştî, zikpirî, avisî.

PREGNANT, *adj.* : bitişt, bizik, pir(r), bizar, zar, avis, hamîle.

PREGNANTLY, *adv.* : bi avisî, aviskî.

PREHEAT, *vt.* : pêş germ kirin.

PREHENSIBLE, *adj.* : girtinî (çêkirî bo girtina tiştekê).

PREHENSILITY, *n.* : girtinîtî.

PREHENSION, *n.* : girtin, têgehiştin, sehkirin.

PREHISTORIC, *adj.* : pêşdîrokî, pêşmêjûyî.

PREHISTORY, *n.* : pêşdîrok, pêşmêjû.

PREHOMINID, *n.* : seretayê wek mirovê nemayî.

PRE-IGNITION, *n.* : pêşrivînkirin, pêşdadan.

PRE JUDGE, *vt.* : pêş biryar dan.

PREJUDGMENT, *n.* : pêşbiryardan.

PREJUDICATION, *n.* : pêşbiryardan.

PREJUDICE, *n.* : pêşbiryarî.

- **TO THE ~ OF SOMEBODY'S RIGHTS** : ko ziyan gehandin mafê filanî.
- **WITHOUT ~** : bê pêşbiryarî.

PREJUDICE, *vt.* : pêşbiryar kirin.

PREJUDICED, *adj.* : pêşbiryar (kirî).

PREJUDICIAL, *adj.* : pêşbiryar.

PREJUDICIALNESS, *n.* : pêşbiryarîtî.

PREJUDICIALLY, *adv.* : bi pêşbiryarî, pêşbiryarkî.

PREJUDICING, *n.* : pêşbiryarkirin.

PREJUDICIOUS, *adj.* : ziyandar.

PRELACY, *n.* : kar yan şûnkarê metranî, desteka metranan, hikûmeta metranan.

PRELATE, *n.* : petrek, sermetran, oldarê mezinê dêrê.

PRELATESS, *n.* : seroka dêra rebenan.

PRELATIC(AL), *adj.* : metranî, petrekî.

PRELATICALLY, *adv.* : bi metranî, metrankî.

PRELATIZE, *vt.* : dêrê danan ber hukmê petrekî.

PRELATURE, *n.* : desthelatiya metranî.

PRELECT, *vi.* : gotar gotin, axiftin.

PRELECTION, *n.* : gotar, axiftin.

PRELECTOR, *n.* : gotarkar.

PRELIBATION, *n.* = **FORETASTE.**

PRELIMINARILY, *adv.* : bi destpêkî, destpêkkî.

PRELIMINARY, *n., adj.* : seretayî, destpêkî.

- **TAILORING** : şêlandin.

PRELITERATE, *adj.* : pêşnivîsînî.

PRELUDE, *n.* : pêşekî, berahî.

PRELUDE, *vt. i.* : dest pê kirin (bi pêşekiya mûzîqeyî), pêşkiya mûzîqeyî lê dan.

PRELUDED, *adj.* : destpêkirî.

PRELUDIAL, *adj.* : pêşekiyî.

PRELUDING, *n.* : destpêkirin.

PRELUDIZE, *vt.* : pêşekî kirin.

PRELUSION, *n.* : pêşekî, berahî, destpêk.

PRELUSIVE, *adj.* : destpêkî.

PRELUSIVELY, *adv.* : bi destpêkî.

PREMATING, *n.* (**FOR ANIMALS**) guhnêl.

PREMATURE, *adj.* : pêşdem, negehiştî, kavişkî.

- **BABY** : zarokê berî demî bûyî.

- **BIRTH** : kavişkî.

PREMATURELY, *adv.* : bi kavişkî, kavişkkî.

PREMATURENESS, *n.* : kavişkîtî.

PREMATURITY, *n.* : kavişkîtî.

PREMEDIAN OR PREMEDIAL, *adj.* : nîvleşî.

PREMEDICAL, *adj.* : pêşpijîşkî (xwendin).

PREMEDITATE, *vt.* : raman kirin.

PREMEDITATED, *adj.* : ramankirî, hizirkirî, qestî.

PREMEDITATEDLY, *adv.* : bi qestî, bi ramanî, ramankî.

PREMEDITATOR, *n.* : ramanker.

PREMEDITATION, *n.* : ramankirin.

PREMEDITATIVE, *adj.* : ramandar.

PREMEDITATIVELY, *adv.* : bi ramandarî.

PREMENSTRUAL, *adj.* : berî yan pêş mehikî.

PREMENSTRUALLY, *adv.* : bi pêşmehikî, pêşmehikkî.

PREMIER, *n., adj.* : serekwezîr.

PREMIER, *n., adj.* : yekem pêşkêşkirin (şano, sîneme).

PREMIER, *vt.i.* : yekem car pêşkêş kirin (şano, sîneme).

PREMIERED, *adj.* : (yekem car) pêşkêşkirî yan nîşandayî.

PREMIERING, *n.* : nîşandan (yekem car).

PREMIERSHIP, *n.* : serekwezîrî.

PREMILLENARIAN, *n.* : bawermendê ko hatina duwema Îsayî dê berî rojgarê hezarî bit.

PREMILLENNIAL, *adj.* : pêwandîdarê pêşrojgarê hezarî.

PREMILLENNIALISM, *n.* : baweriya ko hatina Îsayî dê berî rojgarê hezarî bit.

PREMISE, *n.* : girîmankarî, avahî, binyat, pêşekiya jîrbêjî.

PREMISE, *vt.* : girîman kirin, pêşekiya jîrbêjî kirin.

PREMISING, *n.* : girîmankirin.

PREMISS, *n.* : gotina berê ko gotinek dî nîşan dikit.

PREMIUM, *n.* : xelat, padaşt, diyarî, beşa dabînkirinê, awarte.

- **AT A ~** : hêja, giran, ji bîhayê asayî pitir e.

- **TO PUT A ~ ON** : xurt kirin.

PREMIX, *vt.* : pêş têkil kirin (berî bi kar înanê).

PREMOLAR, *n., adj.* : pêşdidanên hêranê yan xirê.

PREMONISH, *vt.i.* : pêşageh kirin.

PREMONITION, *n.* : pêşagehkirin, diltepî.

PREMONITOR, *n.* : pêşagehker.

PREMONITORILY, *adv.* : bi pêşagehî, pêşagehkî.

PREMONITORY, *adj.* : pêşagehî.

PREMORSE, *adj.* : dûmahî (ser) birrî (helez).

PREMUNE, *adj.* : pêşparêz.

PREMUNITION, *n.* : pêşparêzî.

PRENAME, *n.* : yekem nav.

PRENATAL, *adj.* : pêşzayîn.

PRENOMEN, *n.* = **PRAENOMEN.**

PRENOTION, *n.* : hewes, weswas, diltepî, xûlya.

PRENTICE, *n.* = **APPRENTICE.**

PREOCCUPANCY, *n.* : mijûlbûn.

PREOCCUPATION, *n.* : mijûlî, pêşbiryarî, kar, berî nişînî.

PREOCCUPIED, *adj.* : mijûl.

PREOPERATIVE, *adj.* : pêşkirdarî (nijdarî).

PREOCCUPY, *vt.* : mijûl bûn.

PREORBITAL, *adj.* : pêşgerî, pêşxûlgehî.

PREORDAIN, *vt.* : pêşbiryar kirin.

PREORDAINED, *adj.* : pêşbiryardayî.

PREORDAINMENT, *n.* : pêşbiryardan.

PREORDINATION, *n.* = **PREORDAINMENT.**

PREP, *vi., t.* : lêk dan, (li dibistana amadeyî) xwandin.

PREPAID, *adj.* : pêşînekirî.

PREPARATION, *n.* : lêkdan, amadekirin, karkirin, şayandin, vegurizîn, pêkhînan, amadebûn, amadeyî, karûbar, xweşkirin.

PREPARATIVE, *n., adj.* : amadeyî, lêkdayî, lêkdanî.

PREPARATIVELY, *adv.* : bi lêkdanî, lêkdankî.

PREPARATIVELY, *adv.* : bi lêkdanî, lêkdankî, amadekî.

PREPARATORY, *n., adj.* : lêkdanî, amadeyî, xweşkirin.

- **SCHOOL** : dibistana amadeyî.

PREPARE, *vt.i.* : lêk dan, amade kirin, vegurizîn, pêk hînan, pêk hatin.

PREPARED, *adj.* : amade, vegurizî, şaşbûn, hazir, şazkirî, têzbûyî, têz, kare, karkirî, berdest.

PREPARED FOR TILLAGE : bercot.

PREPAREDLY, *adv.* : bi amadeyî, amadekî.

PREPAREDNESS, *n.* : karûbar, lêkdan, lezda, amadeyîtî.

PREPARING, *n.* : têzkirin, lêkdan, sazkirin, pêkhînan, amadekirin, xweşkirin.

PREPAY, *vt.* : pêşîne dan.

PREPAYING, *n.* : pêşînedan.

PREPAYMENT, *n.* : pêşîne.

PREPENCE, *n.* : niyazî, qestî.

PREPENSELY, *adv.* : bi qestî, biryarkî.

PREPONDERANCE, *n.* : zalbûn, bawbûn .

PREPONDERANCY, *n.* = **PREPONDERANCE.**

PREPONDERANT, *adj.* : zal, baw.

PREPONDERANTLY, *adv.* : bi zalî, zalkî.

PREPONDERATE, *vi.* : zal bûn.

PREPONDERATED, *adj.* : zalbûyî.

PREPONDERATING, *n.* : zalbûn.

PREPOSITION, *n.* : daçek, bernav.

PREPOSITIONAL, *adj.* : daçekî.

PREPOSITIVE, *adj.* : pêşgirî.

PREPOSSESS, *vt.* : hewesî kirin, dilgir kirin, pêşbiryar kirin.

PREPOSSESSING, *adj.* : dilgir.

PREPOSSESSINGLY, *adv.* : bi dilgirî, dilgirkî.

PREPOSSESSINGNESS, *n.* : dilgirîtî.

PREPOSSESSION, *n.* : pêşbiryarî.

PREPOSTEROUS, *adj.* : dûre, nejîrbêj.

PREPOSTEROUSLY, *adv.* : bi dûreyî, dûreykî.

PREPOSTEROUSNESS, *n.* : dûreyîtî, nejîrbêjîti.

PREPOTENCE, *n.* : têr yan pir hêzdarî.

PREPOTENCY, *n.* : pirhêzdarî.

PREPOTENT, *adj.* : pirhêzdar.

PREPOTENTLY, *adv.* : bi pirhêzdarî, pirhêzdarkî.

PRE PREFERENCE, *n.* : pêşbehrên hevyaz.

PREPRINT, *n.* : pêşçapkirinê (bo belav kirinê), çapa berî belavkirinê.

PREPUBERAL, *adj.* : pêşherzekar yan sîpe.

PREPUBERTY, *n.* : pêş (berî) herzekarî yan sîpeyî.

PREPUBESCENCE, *n.* : pêşherzekarî, pêşsîpeyî.

PREPUBESCENT, *adj.* : pêşherzekar, pêşsîpe.

PREPUCE, *n.* : çermê pêşiyê, çermê dûmahiya kîrî (serî).

PREPUTIAL, *adj.* : pêwendîdarê çermê serê kîrî.

PRE RECORD, *vt.* : pêştomar kirin.

PRE REGISTRATION, *n.* : pêştomarkirin.

PREREQUISIT, *n., adj.* : pêviyayî, merec, gerekî, pêwîstî, pêviyan, pêwîstin.

PREROGATIVE, *n., adj.* : maf.

PRESAGE, *n.* : mizgînî, gef, hişa hindurî, hişkirin, berbînkirin, agehî.

PRESAGED, *adj.* : agehkirî.

PRESAGING, *n.* : agehkirin.

PRESBY(O)-, *pref.* : pêşgir e ko pîrî ye.

PRESBYOPIA, *n.* : pîrdîtin yan bînîn.

PRESBYTER, *n.* : oldar, qeşe.

PRESBYTERAL, *adj.* : pîrekî.

PRESBYTERATE, *n.* : pîrê dêrê, kar yan şûnkarê oldarî, desteka oldar yan pîrên dêrê.

PRESBYTERSHIP, *n.* : pîrkarî.

PRESBYTERIAN, *n., adj.* : pîrekî, pîrkarî : endamê dêrek piroti ko pîrên yeksane û helbijartî kardariya dêrê dikin.

PRESBYTERIANISM, *n.* : pîrekîtî : rêzika dêra ko pîrekên yeksan û helbijartî kardariya dêrê dikin.

PRESBYTERY, *n.* : civata dêra pîrekî, mala oldarî, parçeya dêrê bo oldarên kara.

PRESCHOOL, *n.* : pêşdibistan, zarokistan.

PRESCIENCE, *n.* : pêşbînî, pêşzanî, dûrbînî.

PRESCIENT, *adj.* : dûrbîn, pêşzan.

PRESCIENTIFIC, *adj.* : pêşzanyarî.

PRESCIND, *vt.i.* : guh nedan, birrîn (berî demî yan nişkî).

PRESCORE, *vt.* : pêştomar kirin (dengî).

PRESCRIBE, *vt.i.* : ferman kirin, derman (bo nesaxî) nivîsîn yan bijartin, mafê bi kar înanê xwastin, maf keftin (ji ber borîna demî).

PRESCRIBED, *adj.* : fermanker, çareker, nivîserê dermanî yan derman nivîsîn.

PRESCRIPT, *n.* : ferman, qanûn, binik.

PRESCRIPTION, *n.* : mafê demborînê (kevnbûnê), rêzikdanan, ferman, nivîsîna dermanî, dermanê pijişkî nivîsî (bo nesaxî).

PRESCRIPTIVE, *adj.* : rêberî, fermanî, kutekî, demborînî (kevnbûnî).

PRESELECT, *vt.* : pêş helbijartin.

PRESELECTION, *n.* : pêşbijartin.

PRESELECTIVE, *adj.* : pêşbijartî.

PRESENCE, *n.* : pêşber, pêşçavî, pêşçav, berçav, hentes.

- **IN THE ~ OF** : li ber çavê ...., di hizûra...

- **CHAMBER** : jora pêşwaziyê.

- **OF MIND** : jîrî, hişyarî, bi hişî.

PRESENT, *n., adj.* : niho, noke, êstekî, berçav, dan, pêşkêş, diyarî, demê niho, raneburdû, bero, amade, hazir, ayînde, pêşkêş, dayîn, êste, xelat, bexşandin, perwe, şabaş.

- **BY THESE ~** : bi van peyivan yan belgenameyan.

- **FOR THE ~** : demdarî, niho.

PESENT, *vt.i.* : pêşkêş kirin.

- **ARMS!** : çek silav bike, çek pêşkêş bike!.

- **TO ~ WITH** : pêşkêş kirin.

PRESENTABILITY, *n.* : çaknijyarîtî, lawîtî, tazeyîtî.

PRESENTABLE, *adj.* : çaknijyar, taze, law.

PRESENTABLENESS, *n.* : tazeyîtî.

PRESENTATION, *n.* : pêşkêşkirin, berxistek, dadgerîn, pengizandin, pêşînan, aheng, bexşîn, diyarîkirin, ruquçandin.

PRESENTATIONAL, *adj.* : pêşkêşkirinî.

PRESENTATIONALISM, *n.* : hizir yan baweriya ko bi têgehiştinê hiş di cih de heyberî dinasit, pêşkêşkirinîtî.

PRESENTATIONALIST, *n.* : bawermendê pêşkêşkirinîtiyê.

PRESENTATIONISM, *n.* : baweriya ko li têgehiştinê, hizir di cih de heyberî dîtin.

PRESENTATIVE, *adj.* : ji mafê pêşkêşkirinê, pêşkêşkiriniya hizrekê (bo hiş e).

PRESENT-DAY, *adj.* = **CURRENT.**

PRESENTED, *adj.* : diyarîkirî, ruquçandî.

PRESENTEE, *n.* : oldarê pêşkêşkirî, mirovê pesindkirî bo karî, mirovê li şanişînê pêşkêşkirî.

PRESENTIENT, *adj.* : pêjinî, hişdar (hindurî).

PRESENTIMENT, *n.* : pêjin.

PRESENTING, *n.* : pêşkêşkirin, pêşînan, diyarîkirin.

PRESENTIVE, *adj.* : pêşkêşdar : pêwendîdarê peyiva ko heyberê yan hizrê êkser pêşkêşî hişî dikit.

PRESENTLY, *adv.* : niho, zû, di cih de, noke, nêzîk.

PRESENTMENT, *n.* : sûsekirdin, ruquçandin.

PRESENTNESS, *n.* : berçavîtî.

PRESENT PARTICIPLE, *n.* : navê karan.

PRESENT PERFECT, *n.* : karê tekûzê niho.

PRESENT TENSE, *n.* : niho (hevok).

PRESERVABILITY, *n.* : parêzbarîtî.

PRESERVABLE, *adj.* : parêzbar.

PRESERVATION, *n.* : parêz, parastin, hilxistin.

PRESERVATIVE, *n., adj.* : parêz, parezdar.

PRESERVE, *n.* : erd yan zeviya parastî, pawanî bo parastina caneweran yan daran, xwarina qotîkirî.

PRESERVE, *vt.* : parastin, werdan.

PRESERVED, *adj.* : parastî, werdayî.

PRESERVER, *n.* : parêzker.

PRESERVING, *n.* : parastin.

PRESET, *vt.* : pêş (alav) vedan yan lêk dan.

PRESHRUNK, *adj.* : pêşgirnijî.

PRESIDE, *vt.* : serokî kirin (civat), araste kirin, serperişt kirin.

PRESIDED, *adj.* : serokirî.

PRESIDENCY, *n.* : serokî, pêşewayî, serîne, serokayetî, serokîtî.

PRESIDENT, *n.* : serok, pêşewa, serkomar.

PRESIDENTESS, *n.* : jinserok, serok (mê).

PRESIDENTIAL, *adj.* : serokî.

- **SYSTEM** : rêzika serokî.

PRESIDENTSHIP, *n.* = **PRESIDENCY.**

PRESIDIAL, *adj.* : serokî, pasvanî.

PRESIDIARY, *adj.* = **PRESIDIAL.**

PRESIDING, *n.* : serokîkirin.

PRESIDIUM, *n.* : serokayetî.

PRESIGNIFY, *vt.* : gef kirin.

PRESS, *n.* : rojnamegerî, berzxan, givaştin, dînge, çapxane, givaştek, çapkirin, çap, pestên, çapegerî, guşar.

PRESS, *vt.i.* : givaştin, tepeser kirin, tepandin.

PRESS AGENCY, *n.* : nuwêneriya agehdarî, nimînendeyî yan şûnkariya agehdarî yan rojnamegerî.

PRESS AGENT, *n.* : nimînendeyê agehdarî yan rojnamegerî, şûnkariya rojnamegerî.

PRESS BOARD, *n.* : civata rojnamegerî.

PRESS-CLIPPING, PRESS CUTTING, *n.* : parçe kaxeza rojnamegerî.

PRESS CONFERENCE, civîna rojnamegerî.

PRESSED, *adj.* : givaştî, tepeserkirî, tepandî, pestandî, puwandî.

- **FRUIT ROLL** : herîr, çirk.

PRESS GALLERY, *n.* : xanîkê rojnameger yan rojnamevanan.

PRESS GANG, *n.* : taxima serbazkirinê.

PRESSING, *n., adj.* : givaştin, tepandin, pestan, pestên, lezdar, dakirin, vegivaştin, puwîn, ûtî, perûş, pestane.

PRESS LORD, *n.* : xudanê çend rojname û kovaran.

PRESSMAN, *n.* : rojnamevan, rojnameger.

PRESS MARK, *n.* : nîşana kitêbê (li kitêbxanêyê).

PRESS RELEASE, *n.* : danezanîna rojnameyî.

PRESS ROOM, *n.* : çapgeh, çapxane (jora çapkirinê).

PRESS RUN, *n.* : çap, hejmara çapkirî.

PRESSURE, *n.* : pesto, weraftin, tepeserî, pestandin, tewjim, wuşar, givaştin, pestên, pestawtin, hemet, germişandin, puwandin, pestin.

- **BLOOD ~** : xwînpestin.

PRESSURE, *vt.* : pestên kirin, tewjim kirin, hemet kirin.

PRESSURE CABIN, *n.* : jora rast hemetkirî yan puwandî.

PRESSURE-COOKER, *n.* : qazana hemetî.

PRESSURED, *adj.* : hemetkirî, pestênkirî, puwandî.

PRESSURE GROUP, *n.* : girûha hemet kirinêyan pestênkirinê.

PRESSURING, *n.* : pestandin, hemet kirin, puwandin.

PRESSURIZATION, *n.* : pestandin, hemetkirin, puwandin.

PRESSURIZE, *vt.i.* : hemet kirin, pestan kirin.

PRESSURIZED, *adj.* : pestênkirî, hemetkirî, puwandî.

PRESSURIZING, *n.* : pestênkirin, hemetkirin, puwandin.

PRESSWORK, *n.* : karê tîpnivîsan.

PRESTIDIGATOR, *n.* : cerbez.

PRESTIGE, *n.* : paye, şikû, avrû, reçaw, rûmetî, meznahî, meznayî, serfirazî.

PRESTIGEFUL, *adj.* : şikûdar.

PRESTIGOUS, *adj.* : şikûdar, rûmetdar.

PRESTIGOUSLY, *adv.* : bi şikûdarî.

PRESTISSIMO, *adv., adj., n.* : lez, lezîn, lezdar.

PRESTO, *adj., adv.* : zû, lez.

PRESTRESSED, *adj.* : pêşerkirî, têl qayimkirî.

PRESUMABLE, *adj.* : girîmane.

PRESUME, *vt.i.* : girîman kirin.

PRESUMED, *adj.* : girîmankirî.

PRESUMEDLY, *adv.* : girîmankî.

PRESUMING, *adj.* : rûqayim, fêzbûyî.

PRESUMINGLY, *adv.* : girîmankî, bi girîmanî.

PRESUMPTION, *n.* : fêzbûn, girîmankirin, rûqayimî.

PRESUMPTIVE, *adj.* : girîmankirî.

PRESUMPTOUS, *adj.* = **PRESUMING** (fêzbûyî).

PRESUMPTOUSLY, *adv.* : bi fêzî, bi rûqayimî, rûqayimkî.

PRESUMPTOUSNESS, *n.* = **PRESUMPTION.**

PRESUPPOSE, *vt.* : girîman kirin, nîşan kirin.

PRESUPPOSITION, *n.* : girîmankarî.

PRESUPPOSITIONAL, *adj.* : girîmankariyî.

PRESYNAPTIC(AL), *adj.* : pêwendîdarê xalka torbûna demarî.

PRETENCE, *n.* = **PRETENSE.**

PRETEND, *vt.i.* : diyar kirin (derew), daxwaz kirin (ne rewayî), wêrîn.

PRETENDED, *adj.* : zir, derew diyarkirî.

PRETENDEDLY, *adv.* : bi derewînî, derewînkî.

PRETENDER, *n.* : daxwazker.

PRETENSE, *n.* : doz, behane, gotin.

PRETENSION, *n.* : dozname, behane, daxwaz, fêz, têkurkî.

PRETENSIONLESS, *adj.* : bêfêz.

PRETENTIOUS, *adj.* : fêzî, bitir, gilîdar, rûqayim.

PRETENTIOUSNESS, *n.* : fêzîtî, rûqayîmîtî.

PRETER-, *pref.* : pêşgir e ko paşî, piştpitir e.

- **HUMAN** : paşmirovî.

- **NATURAL** : paşsirûştî, awarte.

- **NATURALISM** : paşsirûştîtî.

PRETERIT(E), *n., adj.* : borî, dariştina borî.

- **TENSE** : hevoka karê berê derdibirrît.

- **PRESENT** : hevoka nijad demê berê bû lê bo niho bi kar dihêt.

PRETERITION, *n.* : feramoş.

PRETERMINAL, *adj.* : pêşmirinî.

PRETERMISSION, *n.* : feramoş.

PRETERMIT, *vt.* : rakirin, feramoş kirin, guh nedan, birrîn, rawestandin, paş xistin.

PRETEST, *n.* : azmûna seretayî.

PRETEST, *vt.* : seretayî azmûn kirin.

PRETEXT, *n.* : behane, mehane, bûne.

PRETEXT, *vt.* : behane kirin, mehane kirin.

- **ON OR UNDER THE ~** : bi behaneya ko.

PRETONE, *n.* : birgeh yan tîpebizwêna berî birgeha zebirkirî.

PRETONIC, *adj.* : pêwendîdarê birgeh yan tîpebizwêna berî birgeha zebirkirî.

PRETOR OR PRETORIAN, = **PRAETOR, PRAETORIAN.**

PRE TREATMENT, *n.* : pêşçarekirin.

PRETTIED, *adj.* : tazekirî.

PRETTIFIED, *adj.* : tazekirî, lawkirî.

PRETTIFY, *vt.* : taze kirin, ciwan kirin, law kirin.

PRETTIFYING, *n.* : tazekirin.

PRETTILY, *adv.* : bi tazeyî, tazekî.

PRETTINESS, *n.* : tazeyîtî, ciwanîtî, rindîtî, qeşengîtî.

PRETTY, *n., adj.* : bedew, ciwan, çeleng, tît, rind, spehî, şen, şepal, xweş, xiş, toflaz, neşmîle, taze, delal, qeşeng.

- **PENNY** : tîbabek mezin ji diravî.

- **PRETTY** : zirtaze, netaze.

- **MUCH** : nêzîk.

- **SITTING ~** : dewlemend, bar yan rewşbaş.

- **SPOKEN** : suhbetxweş.

PRETTYING (UP), *n.* : tazekirin, rindkirin.

PRETTYISM, *n.* : tazeyîtî.

PRETZEL, *n.* : biskwîta xwêkirî.

PREVAIL, *vt.* : zal bûn, bi ser keftin.

PREVAILING, *n.* : zal, zalbûn.

PREVAILINGLY, *adv.* : bi zalî, zalkî.

PREVALENCE, *n.* : belavbûn, zalbûn, bawbûn.

PREVALENT, *adj.* : belav, zal, baw.

PREVALENTLY, *adv.* : bi zalî, zalkî.

PREVARICATE, *vi.* : ladan (ji rastiyê), fêlbazî kirin, dûr keftin (ji rastiyê).

PREVARICATED, *adj.* : ladayî, fêlbazîkirî, vedayî.

PREVARICATING, *n.* : ladan, fêlbazîkirin, vedan.

PREVARICATION, *n.* : çîv.

PREVARICATOR, *n.* : çîvo.

PREVENANCE, *n.* : rêzgirtin, (ber hizir) diyarkirin.

PREVENIENCE, *n.* = **PREVENANCE.**

PREVENIENT, *adj.* : rabînî, parêz, berê.

PREVENIENTLY, *adv.* : bi rabînî, rabînkî.

PREVENT, *vt., i.* : berbend kirin, qedexe kirin, nehêlan, gîro kirin.

PREVENTABILITY, *n.* : nehêlanbarî(tî).

PREVENTABLE, *adj.* : nehêlanbar, nehêlbar.

PREVENTATIVE, *adj.* = **PREVENTIVE.**

PREVENTATIVELY, *adv.* = **PREVENTABLE.**

PREVENTED, *adj.* : nehêlayî, ewşandî.

PREVENTER, *n.* : nehêlkar.

PREVENTIBLE, *adj.* = **PREVENTABLE.**

PREVENTION, *n.* : nehêlan, ewşandin, nehiştin, qedexekirin, berbendkirin.

PREVENTING, *n.* : nehêlan.

PREVENTIVE, *n., adj.* : nehêl, parêzî.

- **AGENT** : hokarê nehêl.

- **SERVICE** : gomrika dijqaçaxiyê.

PREVENTIVELY, *adv.* : bi nehêlî, nehêlkî.

PREVENTIVENESS, *n.* : nehêlîtî, nehêlanîtî.

PREVIEW, *n.* : pêşditin (berî nîşandanê bo xelkê).

PREVIEW, *vt.* : pêş yan berî nîşandanê bo xelkê.

PREVIEWER, *n.* : dîtinkar (berî nîşandanê yan ruçuqandinê).

PREVIOUS, *adj., adv.* : berê, dêrîn.

- **QUESTION** : pirsa serokî (li berhevdana parlemanî).

PREVIOUSLY, *adv.* : ji berê ve, berêkî.

PREVIOUSNESS, *n.* : berêtî.

PREVISE, *vt.* : pêşageh kirin.

PREVISION, *n.* : pêşditin, pêşbînî.

PREVISION, *vt.* : pêşbînî kirin, berbînî kirin.

PREVISIONAL, *adj.* : pêşbînî, berbînî, pêşditinî.

PREVISIONED, *adj.* : pêşbînîkirî.

PREVISIONING, *n.* : pêşbînîkirin.

PREVOCALIC, *adj.* : pêş tîpebizwênî.

PREVOCATIONAL, *adj.* : pêşqebûliya dibistanî.

PREWAR, *adj.* : pêş cengî yan şerî.

PREWRITING, *n.* : berî yan pêş nivîsînê (hizir).

PREX(Y), *n.* : serok nemaze serokê zanistgehê.

PREY, *n.* : nêçîrkirin, êrîşkirin, zehêkirin, herifandin, êşandin.

- **TO ~ ON OR UPON** : qayil kirin (pişti pelpkirinê).

PREYER, *n.* : nêçîrkar.

PRIARIC, *adj.* : kîrî.

PRIAPISM, *n.* : repî(tî).

PRIAPUS, *n.* : Xudayê mêraniyê (di hizra grekî-Romanî de).

PRICE, *n.* : biha, nirx.

- **AT ANY ~** : bi her bihayî, çend pê bivêt.

- **BEYOND ~** : bêqam giran û hêja.

- **EVERYMAN HAS HIS ~** : her mirovekê bihayê xwe heye.

PRICE, *vt.* : biha kirin, nirx kirin.

PRICE-CUTTER, *n.* : bihaşikên (kêmkirina bihayî ji ber hevrikiyê).

PRICED, *adj.* : bihakirî, giran, viyayî.

PRICE FIXING, *n.* : bihakirina pêkhatinî.

PRICELESS, *adj.* : bêqam giran, bihadar, giranbiha, kaw, bêbiha.

PRICER, *n.* : bihaker.

PRICING, *n.* : bihakirin, nirxandin.

PRICK, *vt., i.* : zixt lê dan, kun kirin, nîç bûn (guhên dewarî).

- **TO ~ IN, OFF OR OUT** : tov kirin.

- **TO ~ UP ONE'S EAR** : guhê xwe nîç kirin.

PRICKER, *n.* : stirî, simtok.

PRICKET, *n.* : pezkûvî.

PRICKING, *n.* : niquç, çizandin, zixtkirin, zixt, niquçandin, ajinîn.

PRICKLE(S), *n.* : zixt, dirrik, stirî, dirrî.

PRICKLE, *vt., i.* : kun kirin, zixt lê dan.

PRICKLED, *adj.* : zixtkirî.

PRICKLINESS, *n.* : dirrikîtî.

PRICKLING, *n., adj.* : dirrikî.

PRICKLY, *adj.* : dirrikî, çiqildar.

- **ASH** : helezek emerîkanî û gul zer e.

- **HEAT** : germişk, giremişk.

- **PEAR** : hêjîra dirrikî.

- **POPPY** : xeşxaşa dirrikî.

PRIDE, *n.* : şahnazî, şanazî, serfirazî, fortekî, hempazî, kawî, serbilindî, lûtberzî.

- **OF CHINA** : ezderext.

PRIDE, *vt.* : hempazî kirin, serfirazî kirin.

- **TO ~ ONESELF ON** : serfirazî kirin bi.

PRIDED, *adj.* : serfirazkirî.

PRIDEFUL, *adj.* : qebe, serfiraz, bûng.

PRIDING, *n.* : serfirazkirin.

PRIDELESS, *adj.* : bêserfirazî, bêhempazî.

PRIED, *adj.* : sehkirî.

PRIER, *n.* : sehkerê zanxwaz.

PRIEST, *n.* : qeşe, oldar.

PRIEST, *vt.* : qeşe kirin.

PRIESTCRAFT, *n.* : oldarzanî.

PRIESTHOOD, *n.* : qeşeyîtî, oldarîtî.

PRIESTLINESS, *n.* : qeşeyîtî, oldarîtî.

PRIESTLESS, *adj.* : bêqeşe, bêoldar.

PRIESTLIKE, *adj.* : wek qeşeyî yan oldarî.

PRIESTLY, *adj.* : qeşeyî, oldarî.

PRIEST-RIDDEN, *adj.* : bi qeşeyan tepeserkirî, li bin destê yan hukmê qeşeyan yan oldaran.

PRIG, *n.* : serhişk, fortek, diz, rastiya axiftin, rêbaz yan sinciyê.

PRIGGERY, *n.* : serhişkî.

PRIGGISH, *adj.* : bûng, serhişk.

PRIGGISHNESS, *n.* : serhişkîtî.

PRIGGISM, *n.* : serhişkîtî.

PRIM, *adj.* : law, zirgiran.

PRIM, *vi., t.* : xwe giran kirin, law kirin.

PRIMA, *adj.* : yekem.

- **DONNA** : yekem stranbêja opera.
- **BALLERINA** : yekem semakera balê.

PRIMACY, *n.* : biserketin, serdestî, pêşengî, rajorî, raserbûn, zalî.

PRIMA FACIE, *n.* : diyare, berder, jixweve, dîtinî. Bes e bo çespandina qewmînê yan dozê ger belge mandel nekin.

PRIMAGE, *n.* : kirêya serbar.

PRIMAL, *adj.* : serekî, seretayî, binyatî, serokî.

PRIMALITY, *n.* : seretayîtî.

PRIMALLY, *adv.* : bi serekî, seretakî.

PRIMARILY, *adv.* : bi serekî, seretakî.

PRIMARY, *n., adj.* : serekî, seretayî, berîn, berayî.

- **CELL** : xaneya seretayî.
- **EDUCATION** : perwerdeya seretayî.
- **SCHOOL** : dibistana seretayî.
- **SYPHILIS** : sûsenekiya seretayî (destpêkî).

PRIMATE, *n.* : serekmetran, petrek, serek giyanewer.

PRIMATIAL, *adj.* : serekgiyanewerî.

PRIMATOLOGICAL, *adj.* : serekgiyanewerî.

PRIMATOLOGIST, *n.* : serekgiyanewerzan.

PRIMATOLOGY, *n.* : serekgiyanewerzanî.

PRIME, *n., adj.* : serok, sereta, serejimar, berayî, baştir, nayab, beng, serekî, heret, tolazî.

- **COST** : bihayê nijadî.
- **MERIDIAN** : hêla dirêjî ya serokî.
- **MINISTER** : serekwezîr, serekşalyar.
- **MOVER** : bizwêner.
- **NUMBER** : serejimar.
- **OF YOUTH** : gomil.
- **RATE** : kêmtirîn têkraya havila deynkirî.
- **TIME** : girantirîn bihayê agehdariyê (televizion...).

PRIME, *vt., i.* : bargeh kirin, lêk dan (bo karî), tejî kirin.

PRIMED, *adj.* : amadekirî (ronkirî).

PRIMER, *n.* : yekem kitêb (bo hînkirin yan fêrkirina xwendinê), tîpa çapê (mezin yan biçûk), kitêba seretayî, rivînk.

PRIMARO, *n.* : leyîztinek kaxezane.

PRIMEVAL, *adj.* : seretayî, sade.

PRIMIER, *n.* : serekwezîr, serekşalyar.

PRIMING, *n.* : amadekirin, ronkirina destpêkê (makîne), rivînk.

PRIMIPARA, *n.* : nixrî, mêya yekzikbûyî.

PRIMIPAROUS, *adj.* : pêwendîdarê mêya yekzikbûyî.

PRIMITIVE, *n., adj.* : sereta, hov, sakar, kûvî, rih, seretayî, sirûştî, kevn.

PRIMITIVELY, *adv.* : bi hovî, hovkî.

PRIMITIVENESS, *n.* : hovîtî, seretayîtî.

PRIMITIVISM, *n.* : seretayîtî, hovîtî, xweristîtî, hunera xweristî.

PRIMITIVIST, *n.* : bawermendê xweristitiyê.

PRIMITIVISTIC, *adj.* : xweristiyî.

PRIMLY, *adv.* : bi zirgiranî, zirgirankî.

PRIMMED, *adj.* : lawkirî.

PRIMMING, *n.* : lawkirin.

PRIMNESS, *n.* : zirgiranîtî.

PRIMOGENITAL, *adj.* : babikî, pêşîn.

PRIMOGENITARY, *adj.* : babikî, pêşîn.

PRIMOGENITOR, *n.* : babîk, pêşîne.

PRIMOGENITURE, *n.* : nixrînî, mafê nixrîniyê.

PRIMORDIAL, *adj.* : seretayî, nijadî, binyatî.

- **MATTER** : heyola.

PRIMORDIUM, *n.* : seretaya endamî.

PRIMP, *vt., i.* : xemilandin, xemilîn.

PRIMROSE, *n.* : gulbihar.

- **PATH** : rêbaza keyfê, çepeliyê.

- **YELLOW** : zerê vekirî.

PRIMULA, *n.* = **PRIMROSE.**

REDEEM, *vt.* : vegerandinve, qorbanî dan, berpe kirin, berdêl kirin, bihayê

qoçanê dan, guhorîn (diravî), girewê vekirin.

REDEEMABLE, *adj.* : vegerînbar.

REDEEMER, *n.* : rizgar(ker), Îsa pêxember, qorbanker.

REDEMPTION, *n.* : qorbandan, mizdan, vegerandin, rizgarkirin, nûkirin, çakkirin, girew, berdan, têçûna qoçanan.

REDEMPTIVE, *adj.* : qorbandar, rizgardar, berdêldar, berdandar.

REDEMPTORY, *adj.* : qorbankirî, rizgarkirinî, berdanî.

REDEPLOY, *vt.* : guhaztin (hêz yan karker).

REDESCEND, vi. : nişîv bûnve.

REDESIGN, *vt.* : dahînanve, nexşe kirinve.

REDEVELOPMENT, *n.* : avakirinve.

RED-EYE, *n.* : wiskiyên erzan.

REDFIN, *n.* : şapersor (texlîtek masî ye).

RED FISH, *n.* : masîsork.

RED FLAG, *n.* : alaya sor.

RED HEAD, *n.* : sersor.

RED-HEADED, *n.* : pirçsor, porsor, qijsor.

RED HEAT, *n.* : germa sor.

RED HERRING, *n.* : texlîtek masî ye, varêkirin.

REDIAL, *vt.* : telefon kirinve.

REDIFFUSION, *n.* : belavkirinve.

RED INDIAN, Hindokê sor.

REDINTEGRATE, *vt., i.* : nû bûnve, nû kirinve.

REDIRECT, *vt.* : araste kirinve.

REDIRECTED, *adj.* : arastekirîve.

REDIRECTION, *n.* : arastekirinve.

REDISCOUNT, *n., vt.* : daşikandinve, daşikandinve.

REDISCOVER, *vt.* : peyda kirinve.

REDISCOVERY, *n.* : peydakirinve.

RIDISSOLVE, *vt.i.* : buhujandinve, veqijilandinve.

REDISTRIBUTE, *vt.* : belavkirinve.

REDISTRIBUTION, *n.* : belavkirinve.

REDISTRIBUTIONAL, *adj.* : belavkirinveyî.

REDISTRIBUTIVE, *adj.* : belavdarve.

REDISTRICT, *vt.* : dever kirinve (ji nûve diyar kirin).

REDIVIDE, *vt.* : dabeş kirinve.

REDIVISION, *n.* : dabeşkirinve.

REDIVIVUS, *adj.* : veîyayîve.

RED LEG, *n.* : lingsor (balindeyek sor e).

RED-LETTER, *adj.* : bûyera bêqam şad, jî bîr naçît.

- **A ~ DAY** : roja bêqam şad.

RED LIGHT DISTRICT, *n.* : tax yan gereka karxaneyan.

RED MULBERRY, *n.* : tûsor.

REDNESS, *n.* : sorbûn, sorîtî.

REDO, *vt.* : kirinve.

REDOLENCE, *n.* : bêhnxweşî.

REDOLENT, *adj.* : bêhnxweş.

REDOUBLE, *vt.i.* : ducar kirinve (bizavê...), li xwe danve.

REDOUBLING, *n.* : ducarkirinve, li xwedanve.

REDOUT, *n.* : çeper.

REDOUTABLE, *adj.* : şikûdar, tirsnak.

REDOUTABTABLY, *adv.* : bi şikûdarî, şikûdarkî.

REDOUBTED, *adj.* : (arch.) : şikûdar, bizdihîn.

REDOUND, *vi.* : serbar kirin, qayim kirin, vegerinve.

REDOX, *n., adj.* : pêwendîdarê oksîdkirinê û kurtkirinê.

RED-PENCIL, *vt.* : zêrevanî kirin (çapemenî), çavdêrî kirin, rast kirin, bijare kirin.

REDPOLL, *n.* : çûçikek sersor e.

RED RAG, *n.* : perûkê sor : tiştê ko mirovî dienirînit.

REDRAW, *vt.* : neqş kirinve.

REDRESS, *n., vt.* : çakkirin, berdêlkirin, rêbaza çarekirinê, çak kirin, tole vekirin, berdêl kirin.

RED ROOT, *n.* : rihsor : helezek emerîkanî ye.

RED SHANK, *n.* : çûçika tîtelaniya sor.

RED SKIN, *n.* : Hindokê sor.

RED SNOW, *n.* : befra sor (ji ber tozê).

RED START, *n.* : balindeyek ewropî û dengbêj e (strankar).

RED TAPE, *n.* : karê rotînî, qirtasiye.

RED TOP, *n.* : giyayek emerîkanî ye.

REDUCE, *vt.i.* : biha kêm kirin, buhujîn, hîdrojen kirin, kêm bûn, xest yan tîr bûn, beres kirin, kêm kirin, biçûk kirin, kurt kirin, tepeser kirin, mawaz kirin, herişandin.

- **TO ~ TATTERS** : parçe parçe kirin, perîtandin, zivar zivar kirin.

- **TO ~ AN OFFICER TO THE RANKS** : efser zivirandinve serbazî, serbaz kirinve (efserî), kêm kirin (pile yan paye).

REDUCED, *adj.* : bereşkirî, lawazkirî, biçûkkirî, kêmkirî.

REDUCER, *n.* : kêmker, lawazker, biçûker.

REDUCIBILITY, *n.* : kêmkirinbarî(tî), biçûkirinbar.

REDUCING, *n.* : bereşkirin.

REDUCTION, *n.* : kêmkirin, kurtkirin, daşikandin, biçûkkirin.

REDUCTIONAL, *adj.* : kêmkirinî, kurtkirinî.

REDUCTIONISM, *n.* : kêmkirinîtî, kurtkirinîtî.

REDUCTIVE, *adj.* : kêmkirî, kêmdar, sivikirî, biçûkkirî, kurtdar, kurtkirî.

REDUNDANCY, *n.* : zehfî, zêdeyî.

REDUNDANT, *adj.* : zêde.

REDUNDANTLY, *adv.* : bi zêdeyî, zêdekî.

REDUPLICATE, *vt., adj.* : dubare kirin, rûnivîsînve, dubarekirî, ducarkirî, guhaztokirî.

REDUPLICATION, *n.* : rûnivîskirinve, guhaztokirinve.

REDUPLICATIVE, *adj.* : rûnivîsdar, guhaztodar.

REDUPLICATIVELY, *adj.* : bi rûnivîsdarî, bi guhaztodarî.

REDWING, *n.* : balindeyek qelew û stranbêj ye : (çengsor).

REDWOOD, *n.* : darê sor.

REDYE, *vt.* : heş kirinve.

REEBOK, *n.* : pezkûviyek şaxtûj e.

REECHO, *vi.t.* : deng vedanve, mole kirin.

REED, *n.* : leven; zil, zel, zîlik, çîtik, sîpelk, pîke, qamîş.

- **BABBLER BIRD, WARBLER OR WREN** : balindeya levenan.

- **FLUTE** : zirna, zurna.

- **LONG HOLLOW ~** : kelkele.

- **PHEASANT** : por (ya levenan).

- **PIPE** : zurna, zirna.

- **STOP** : orgen-rawestan levenî.

REEDBUCK, *n.* : pezkûviyê levenan.

RE-EDIFIED, *adj.* : avakirîve.

RE-EDIFY, *vt.* : ava kirinve.

RE-EDIFYING, *n.* : avakirinve.

RE-EDIT, *vt.* : bijar kirinve.

RE-EDITION, *n.* : bijarkirinve.

REEDING, *n.* : xişlek biçîk û gomizî ye.

REEDLING, *n.* : pora levenan.

RE-EDUCATE, *vt.* : perwerde kirinve, hîn kirinve.

REEF, *n.* : sirta kevrê avê, kospê metirsî, riha kanî, kêmkirina beyava babirekê (bi pêçanê), pêça babirekê.

- **KNOT** : girêya babirekî.

REEF, *vt.* : dar alayî nizm kirin, babirek pêçan.

REEFER, *n.* : saqoyê teng (perûk stûr), guhêzok, sarker.

REEK, *n.* : dûkêl, hilm, mij.

REEK, *vi.* : hilm kirin, xuh dan, dûkêl kirin, bêhna xweş dan.

REEKY, *adj.* : hilm qayim yan genî.

REEL, *n.* : alandin, çirîk, dartûn, bekre, xuloke, xilênke, xingilîn, veweşîn, qenek, gotolk, tire, xiloke.

- **OFF THE ~** : bi lez û hêsan.

REEL, *vt.i.* : veweşîn, xingilandin .

- **TO ~ OFF** : bi lez û hêsan gotin.

RE-ELECT, *vt.* : helbijartinve.

RE ELECTION, *n.* : helbijartinve.

RE-ELEGIBLE, *adj.* : kêrhatîve.

REELING, *n.* : xingilîn, veweşîn, leqîn.

- **MOTION** : livîna veweşîn.

REELINGLY, *adv.* : bi veweşînî, veweşînkî.

RE-EMBARK, *vi.t.* : siwarbûnve.

RE-EMERGE, *vi.* : derketinve.

RE-EMERGENCE, *n.* : derketinve.

RE-EMERGENT, *adj.* : derketîve.

RE-ENABLE, *vt.* : şiyanî kirinve.

RE-ENACT, *vt.* : qanûnî kirinve, kirdar kirinve.

RE-ENACTMENT, *n.* : kirdarkirinve.

RE-ENERGIZE, *vt.* : oze kirinve, wize kirinve.

RE-ENFORCE, *vt.i.* = **RE-INFORCE.**

RE-ENGINE, *vt.* : bi makîne kirinve.

RE-ENTER, *vi.t.* : hatin jorve.

RE-ENTRANCE, *n.* : çûn bi nav de ve.

RE-ENTRANT (ANGLE), *n.* : goşeya ber lunduri ve.

RE-ENTRY, *n.* : vegerandina samanî, hatina bi nav de ve.

RE-EQUIP, *vt.* : kereste kirinve.

RE-EQUIPMENT, *n.* : kereste kirinve.

RE-ERECT, *vt.* : damezrandinve (avakirinve).

RE-ESTABLISH, *vt.* : damezrandinve.

RE-ESTABLISHMENT, *n.* : damezrandinve.

RE-ESTIMATE, *vt.* : xeml kirinve.

RE-EVALUATE, *vt.* : biha kirinve.

RE-EVALUATION, *n.* : bihakirinve.

REEVE, *n.* : girêdan (werîsî kirin nav kunê de yan li dor tiştekê alandin).

REEVED, *adj.* : girêdayî (werîs).

RE-EXAMINATION, *n.* : sehkirin yan pirsiyarkirinve.

RE-EXAMINED, *vt.* : seh kirinve, pirsiyar kirinve.

RE-EXIST, *vt.* : hebûnve.

RE-EXPORT, *vt.* : hinartinve derve.

REFACE, *vt.* : rûkirinve.

REFASHION, *vt.* : nû kirinve, rast kirinve.

REFECTION, *n.* : têrkirin, avdan, têrbûn, xurek, xwarin, dan (xwarin).

REFECTORY, *n.* : jora xwarinê (li dêrê yan zanistgehê).

- **TABLE** : mêza dirêja zirav.

RE-FEEL, *vt.* : seh kirinve.

REFEL, *vt.* : paşve bûn, qebûl nekirin.

REFELLED, *adj.* : paşvebirî.

REFELLING, *n.* : paşve birin.

REFER, *vt.i.* : nîşan kirin, vegerînve (ser), sûc kirin, hinartin (bo çarekirin, harîkirin, ragehîn yan biryardanê).

REFERABLE, *adj.* : nîşankirinbar, jêderkirinbar.

REFERED, *adj.* : guhaztî.

REFEREE, *n., vi.t.* : dawer, navbêj, navbêjî kirin.

REFEREED, *adj.* : navbêjîkirî.

REFEREEING, *n.* : navbêjîkirin.

REFERENCE, *n.* : gewahiya jêhatinê, jêder, jêderkirî, nîşandan.

- **IN OR WITH ~ TO** : nîşan bi.
- **TERMS OF ~** : mewdayê desthelatiyê.
- **TO MAKE ~ TO** : nîşan kirin, hînan bîrê.
- **WITHOUT ~ TO** : bê nîşankirina.

REFERENCE, *vt.* : jêder kirin, nîşan kirin.

REFERENCE BOOK, *n.* : kitêba jêder.

REFERENCE LIBRARY, *n.* : kitêbxaneya jêder.

REFERENCED, *adj.* : jêderkirî.

REFERENCE MARK, *n.* : nîşana jêderkirinê.

REFERENCING, *n.* : jêderkirin.

REFERENDUM, *n.* : hizirwergirtin.

REFERENT, *n.* : peyiva hêmadar.

REFERENTIAL, *adj.* : jêderî.

REFERRING, *n.* : guhaztin.

REFILL, *n., vt.* : tejîkirinve, tejî kirinve.

REFINE, *vt.i.* : palandin, parzîn kirin, bijîn kirin, sepî kirin .

RE-FINE, *vt.* : siza kirinve.

REFINED, *adj.* : meles, nislî, palandî, nislandî, sepîkirî.

- **PERSON** : xwenda.

REFINEMENT, *n.* : bijînkirin, palandin, sepîkirin.

REFINER, *n.* : palanvan.

REFINERY, *n.* : palanek, palawgeh, parzong, sepî.

REFINING, *n.* : nislîn, parzinîn, palandin, palawtin, sepîkirin.

REFINISH, *vt.* : rû nû kirinve.

REFIT, *n., vt.* : çakkirin, nûkirin, nîpêdan, nû kirin, çak kirin, pêdan danve.

REFLATE, *vt.* : dirav zehf kirin.

REFLATION, *n.* : parezehfkirin.

REFLECT, *vt.i.* : vebeyandin (ronahî, germî, deng), diyar kirin, vebeyîn, riswa kirin, kirêt kirin (nav), raman kirin, serbaz kirin.

REFLECTANCE, *n.* : hokarê vebeyînê.

REFLECTED, *adj.* : vebeyî.

REFLECTING, *n.* : vebeyandin.

REFLECTINGLY : bi vebeyandinî, vebeyînkî.

REFLEXION OR REFLECTION, *n.* : serinc, vebeyîn, hizirkirin, rengdan.

- **TO CAST ~ S ON** : rexne kirin, gomandar kirin.

REFLECTIONAL, *adj.* : vebeyînî.

REFLECTIVE, *adj.* : vebeyîndar, perçî, vebeyînî, ramanî.

REFLECTIVELY, *adv.* : bi ramanî, ramankî.

REFLECTIVENESS, *n.* : ramanîtî, vebeyînîtî.

REFLECTOR, *n.* : vebeyînker, perça, wêne, helgêr.

REFLECTORIZE, *vt.* : vebeyandin.

REFLECTORIZED, *adj.* : vebeyî.

REFLECTORIZING, *n.* : vebeyandin.

REFLEX, *n., adj.* : ronahî, germî yan rengê vebeyî, wêneyê vebeyî, vedan, nevên, rûnivîsa wek resenî, karê bêhemdî, vebeyîna bêhemdî, rêbaza hizr û rewiştê, çemîn, badan.

REFLEX ACTION, *n.* : karê bêhemdî.

REFLEX ANGLE, *n.* : goşeya vebeyînê.

REFLEX CAMERA, *n.* : kamêreya wêneyê vebeyî.

REFLEXIBLE, *adj.* : vebeyînbar.

REFLEXION, *n.* = **REFLECTION.**

REFLEXIVE, *n., adj.* : vebeyî, vebeyîndar.

- **PRONOUN** : ranavê vebeyî yê ko vegerit ser karayê risteyê (hevokê).

REFLEXIVELY, *adv.* : bi vebeyînî, vebeyînkî.

RE-FLOAT, *vt.* : serav kirinve.

REFLOW, *n.* : avrabûnve, radana nizm, kêmbûn.

REFLOW, *vi.* : av kêm bûn yan boş bûn.

REFLUENCE, *n.* : dakişan, avdahatin.

REFLUENT, *adj.* : kêm radanî.

REFLUX, *n.* : dakişan.

REFOCILLATE, *vt.* : vejandinve.

RE-FOLD, *vt.* : pêçînve.

REFOOT, *vt.* : pêlav nû kirinve.

REFOREST, *vt.* : daristan kirinve, (dar çandinve).

REFORESTATION, *n.* : daristan kirinve.

REFORAGE, *vt.* : çêkirinve.

REFORM, *n.* : sazkirin, başkirin, çakkirin, saz.

- **SCHOOL** : çakgeha herzekaran.

REFORM, *vt.* : çak kirin, saz kirin.

RE-FORM, *vt. i.* : çêkirinve, civînve.

REFORMABILITY, *n.* : sazbarîtî.

REFORMABLE, *adj.* : sazbar, çakbar.

RE-FORMATION, *n.* : civînve.

REFORMATION, *n.* : çakkirin, başkirin.

REFORMATIONAL, *adj.* : çakkirinî, başkirinî.

REFORMATIVE, *adj.* : çakkirinî, çakdar.

REFORMATORY, *n., adj.* : çakgeh, çakkirin.

REFORMED, *adj.* : çakkirî, pirotî.

- **SPELLING** : vekitandina çakkirî.

REFORMER, *n.* : çakkar.

REFORMISM, *n.* : çakkirînîtî.

REFORMIST, *n.* : çakker.

REFORMULATE, *vt.* : darêştinve.

REFOUND, *vt.* : damezrandinve.

REFRACT, *vt.* : şikestin (tîrêja ronahiyê).

REFRACTING TELESCOPE, *n.* : dûrbîna şikestinî (ya şikestina ronahiyê), ladan.

REFRACTION, *n.* : şikestin (ronahî), şikanewe, ladan.

- **ANGLE OF ~** : goşeya ladanê.

- **DOUBLE ~** : ladana du tîrêjan li du arasteyên têvel.

REFRACTIONAL, *adj.* : şikestinî, ladanî.

REFRACTIVE, *adj.* : şikestinî, şikêndar.

- **INDEX** : hokarê şikestinê yan ladanê.

REFRACTIVELY, *adv.* : bi şikêndarî, bi ladandarî, şikêndarkî.

REFRACTOMETER, *n.* : tîrêjşikestinpîv.

REFRACTOR, *n.* = **REFRACTING TELESCOPE.**

REFRACTORINESS, *n.* : rikdarîtî, şemûzîtî, serkêşîtî.

REFRACTORY, *n., adj.* : rikdar, şemûz, serkêş, bergirê çarekirinê yan çareyê, bergir, dijbuhujîn.

REFRAIN, *n.* : biryar, derbirrina dubarebûnê (li helbestê yan stranê).

REFRAME, *vt.* : çarkinar kirinve, dagirtinve.

REFRANGIBILITY, *n.* : vebeyînbarîtî (yan mewdayê wê).

REFRANGIBLE, *adj.* : vebeyînbar.

REFRANGIBLENESS, *n.* : vebeyînbarîtî.

REFRESH, *vt.i.* : vejandin, nû kirin, hîn kirin, bîr kirin, vegeş kirin.

REFRESHEN, *vt.* = **REFRESH.**

REFRESHER, *n.* : vejînker, vexwarina vejînker, bîranîn, vegeş.

REFRESHING, *adj.* : hîn, xweş, nuwê, nû, çak, vegeşkirin.

REFRESHINGLY, *adv.* : bi hînî yan vegeşî, hînkî.

REFRESHMENT, *n.* : xweşî, xweşkirin, vegeş, sardemenî.

REFRIGERANT, *n., adj.* : sarker, dermanê germiyê nizm kirin.

REFRIGERATE, *vt.i.* : sar kirin, befr kirin (bo parastinê), qerisandin.

REFRIGERATED, *adj.* : sarkirî, befrkirî, berfkirî.

REFRIGERATION, *n.* : sarkirin, befrkirin, berfkirin.

REFRIGERATOR, *n.* : avsark, berfdan, befrîk, sarik, qerisînk.

REFRIGATORY, *n., adj.* : sarkarî, befrdanî, sarker.

REFRINGEMENT, *n.* : ladan.

REFRINGENT, *adj.* : şikên, şikestinî.

REFUEL, *vt.i.* : êzing kirinve.

REFUGE, *n.* : pena, penageh, qef, nivan, sitar.

REFUGE, *vt.i.* : pend kirin, hewandin.

REFUGED, *adj.* : penakirî, hewandî.

REFUGEE, *n.* : penaber, aware, mişext.

REFUGING, *n.* : penakirin.

REFULGENCE, *n.* : şewqdan, birûske.

REFULGENT, *adj.* : birûskedar.

REFULGENTLY, *adv.* : bi birûskdarî, birûsikdarkî.

REFUND, *n.* : diravzivirandinve (vegerandinve).

REFUND, *vt.* : dirav zivirandinve, deyn guhorîn şiklek yan şêweyek dî.

REFUNDMENT, *n.* : diravzivirandinve.

REFURBISH, *vt.* : vemiştin, nûkirin.

REFURBISHER, *n.* : nûker, vemiştker.

REFURBISHMENT, *n.* : nûkirin, vemiştin.

REFURNISH, *vt.* : raxistinve.

REFUSAL, *n.* : berperç, newîstin, neviyan, milnedan.

REFUSE, *n.* : zibil, kestek, tert, paşmawe, gilêş.

REFUSE, *vt.i.* : qebûl nekirin, qedexe kirin, şemûz bûn, berperç kirin.

RE-FUSE, *vt.* : fiyoz kirinve.

REFUSED, *adj.* : berperçkirî, qebûlnekirî.

REFUSING, *n.* : berperçkirin, qebûlnekirin.

REFUTABLE, *adj.* : berperçbar, mandelbar.

REFUTAL, *n.* : berperç, mandel.

REFUTE, *vt.* : berperç kirin, mandel kirin.

REFUTED, *adj.* : berperçkirî, mandelkirî.

REFUTING, *n.* : berperç kirin, mandel kirin.

REGAIN, *n. vt.* : vegerandin, qazanc kirinve, (bi) dest keftinve.

REGAL, *adj.* : şahî, nayab, şahane, şahanî.

REGALE, *n.* : xweş xwarin û vexwarin.

REGALE, *vt.i.* : şad kirin, xweş kirin, xweşî pê bûn.

REGALED, *adj.* : şadkirî.

REGALIA, *n.* : cîlên taybet, maf û nazyarên xunkarî, dirûşm û hêmayên xunkarî.

REGALING, *n.* : şadkirin.

REGALISM, *n.* : şahîtî, şanişîn, maf yan nazyarên şahî.

REGALITY, *n.* : şahîtî.

REGARD, *n.* : silav, xwezî, guhdarî, rêz, rêzgirtin, qedirgirtin, ditin.

- **IN ~ TO** : ya bo.

REGARD, *vt.i.* : rêz girtin, rûmet girtin.

- **AS ~S** : ya bo, sebaret.

REGARDANT, *adj.* : paşvedîtînî, zêrevanê çavzil.

REGARDFUL, *adj.* : guhdar, rûmetdar.

REGARDFULLY, *adv.* : bi rûmetdarî, rûmetdarkî.

REGARDFULNESS, *n.* : rûmetdarîtî.

REGARDING, *prep.* : sebaret, derbare, derhev, li ser, ji bo.

REGARDLESS, *adj.* : çi bitin, bê pûte.

- **OF** : bê ko, herçend ko.

REGARDLESSLY, *adv.* : çi biqewmit, bi bêpûteyî, bê pûtekî.

REGARDLESSNESS, *n.* : bê pûteyîtî.

REGARDS, *n.* : rêz, silav.

RE-GATHER, *vt.* : kom kirinve.

REGATTA, *n.* : pêşbirkeya beleman.

REGELATE, *vi.* : qerisînve, cemedbûnve, seholbûnve.

REGELATION, *n.* : qerisînve, cemedbûnve, seholbûnve.

REGENCY, *n.* : pêsipardî, sipardin.

- **COUNCIL** : civata sipardînê, encumenî sipardin.

REGENERATE, *adj.* : çêkirîve, nûkirî.

REGENERATE, *vt.i.* : nû kirin, nû bûn, nû endam kirin, nû giyan kirin, vejîyandinve, çak kirin, nû tevn kirin.

REGENERATION, *n.* : vejîyan, jiyanewe, nûkirin, nûbûn, leş yan endam nûbûn.

REGENERATIVE, *adj.* : nûkirînîve, nûyî.

REGENERATOR, *n.* : nûkar, vegêr, alava bayî yan gazê germ kirînve.

REGENESIS, *n.* : kombûnve, civînve.

REGENT, *n.* : pêsipêr.

REGENTAL, *adj.* : pêsiperî.

REGENTSHIP, *n.* : pêsiperîtî.

REGERMINATE, *vt.* : zêr kirinve.

REGERMINATION, *n.* : zêrkirinve.

REGICIDAL, *adj.* : şahkuj.

REGICIDE, *n.* : şahkujî, şahkuştin.

REGIE, *n.* : pawaniya tûtinê yan xwê.

REGILD, *vt.* : zêrkirinve.

REGIME, *n.* : rêzik, parêz, rejîm, rêbaza hukmî yan kardarî, rêzika hukmî yan civakî.

REGIMEN, *n.* : parêz, pehrêz.

REGIMENT, *n.* : tîp, fewc.

- **OF ARTILLERY** : fewca topan (topxaneya fewcekê).

REGIMENT, *vt.* : fewc çêkirin, qayim rêk xistin.

REGIMENTAL, *adj.* : fewcî.

REGIMENTATION, *n.* : fewcdiristkirin, rêkxistina req.

REGINA, *n.* : şahbanû.

REGINAL, *adj.* : şahbanûyî.

REGION, *n.* : dever, herêm, nawçe, navçe, olke.

REGIONAL, *adj.* : herêmî, deverî.

REGIONALISM, *n.* : herêmîtî, deverîtî.

REGIONALIST, *n.* : deverzan.

REGIONALIZATION, *n.* : deverîkirin.

REGIONALIZE, *vt.* : deverî kirin.

REGIONALIZED, *adj.* : deverîkirî.

REGIONALIZING, *n.* : deverîkirin.

REGISTER, *n.* : tomarker, jimêrk, jimara tomarkirî siyayî, xiste, rêzik, xane, şiyana dengî, tomarkirin.

- **ANNUAL ~** : salname.

REGISTER, *vt.i.* : tomar kirin, nivîsîn, rêzikî bûn, nameyên tomarkirî hinartin.

REGISTERED, *adj.* : tomarkirî, nivîsî.

- **LETTER** : nameya tomarkirî.
- **NURSE** : peristara jêhatî (tomarkirî).
- **POST** : posteyê tomarkirî.

REGISTRABLE, *adj.* : tomarbar.

REGISTRAR, *n.* : tomarvan, nûser, nivîser, tomarker.

REGISTRARY, *n.* : tomargeh.

REGISTRATION, *n.* : tomarkirin, nivîsîn, nûsîn.

- **CENSUS ~** : navnivîsîn, sernivîsîn.
- **MARK** : renûsa tomarkirina otomobîlê.

REGISTRY, *n.* : tomargeh, nivîsgeh.

- **OFFICE** : tomargeh.

REGLET, *n.* : titika dar yan mêtal bo cudakirina tîpan yan qalîban.

REGNAL, *adj.* : şahî.

- **YEAR** : sala şahî (destpêkirina fermanrewayiya şahî yan bîrhatinê).

REGNANT, *adj.* : zal, baw yan gelemper, xunkar.

REGORGE, *vt.i.* = **DISGORGE.**

REGRANT, *adj., vt.* : bexş nûkirinve, xurek pawankarî kirîn.

REGRATER OR REGRATOR, *n.* : kiriyarê pawankar.

REGRESS, *n., vt.i.* : paşveçûn, vegerîn, paşketin, paşveçûn, vegerîn, paş keftin.

REGRESSION, *n.* : paşveçûn, paşketin.

REGRESSIVE, *adj.* : paşketindar, paşve-(çûn)dar.

- **TAXATION** : baca kêmdar (ko hindî dahatî) pitir bibit bac kêmtir dibit (rêje).

REGRESSIVELY, *adv.* : bi paşketindarî, bi paşvedarî, paşketindarkî.

REGRESSIVENESS, *n.* : paşketindarîtî, paşvedarîtî.

REGRET, *n.* : pêşemanî, poşmanî, jûvanî, keser, mixabin.

REGRET, *vt.* : pêşeman bûn, vehatin.

REGRETFUL, *adj.* : polpoşman, jûvan, pêşeman, keserkêş, karpoşman, poşman.

REGRETFULLY, *adv.* : bi jûvanî, jûvankî.

REGRETLESS, *adj.* : bêjûvanî, bê poşmanî.

REGRETTABLE, *adj.* : jûvanbar, poşmanbar.

REGRETTABLY, *adv.* : bi jûvanî, bi poşmanî, poşmankî, jûvankî.

REGRETTED, *adj.* : vehatî, pêşeman, jûvankirî.

REGRETTING, *n.* : karpoşman, keserkêşî.

RE-GRIND, *vt.* : hêranve.

REGROUP, *vt.i.* : civandinve, civînve.

REGULABLE, *adj.* : rêkxistbar, rêzikbar.

REGULAR, *n., adj.* : rêkûpêk, rêzikî, rêk, asayî, serhev.

- **ARMY** : leşkerê rêzikî.
- **HOURS** : demjimêrên asayiyên karî.
- **LIFE** : jiyana asayî.
- **VERB** : lêkera rêzikî.

REGULARITY, *n.* : rêzikîtî, rêkxistinîtî, asayîti.

REGULARIZATION, *n.* : rêzikîkirin, rêkxistin.

REGULARIZE, *vt.* : rêk xistin, rêzikî kirin.

REGULARLY, *adv.* : bi rêzikî, rêzikkî.

REGULATE, *vt.* : rêzikî kirin, rast kirin, rêk xistin.

REGULATION, *n.* : rêzikîkirin, asayî, rêzikî, qanûn.

- **SPEED** : leza asayî.

REGULATIVE, *adj.* : rêzikdar.

REGULATOR, *n.* : lezkar, demjimêra hûr, rêzikar.

REGULUS, *n.* : şêrdil, xunkark, şahik, stêra geşa birca şêrî, baristeyê kan yan mêtalê nebijîn.

REGURGITATE, *vt.* : hilavêtin, vereşîn, havêtin yan riştin paş.

REGURGITATION, *n.* : hilavêtin, vereşîn, vereşandin, paş havêtin yan riştin.

REHABILITATE, *vt.* : şayan kirin.

REHABILITETED, *adj.* : şayandî.

REHABILITATING, *n.* : şayandin.

REHABILITATION, *n.* : şayandin.

REHANDLE, *vt.* : kardarî kirinve, çare kirinve.

REHANG, *vt.i.* : hilawîstinve.

REHASH, *n., vt.i.* : qîmekirinve, qîme kirinve.

REHEAR, *vt.* : bihîstinve.

REHEARED, *adj.* : bihîstîve.

REHEARING, *n.* : bihîstinve.

REHEARSAL, *n.* : meşq, rahênan.

REHEARSE, *vt.i.* : meşq kirin, rehênan.

REHEARSED, *adj.* : meşqkirî, rahênayî.

REHEARSER, *n.* : meşqkar, rahêner.

REHEARSING, *n.* : meşqkirin, rahênan.

REHEAT, *n., vt.* : germkirinve, germ kirinve.

REHINGE, *vt.* : reze kirinve.

RE-HIRE, *vt.* : (bi) kirê girtinve, kirê kirinve.

REHOBOAM, *n.* : butlê mezin yê şerabê.

REHOUSE, *vt.* : nişînkirinve, akincîkirinve, bi xanî kirinve (yan bi mal kirinve).

REHUMANIZE, *vt.* : mirovî kirinve.

REHYDRATABLE, *adj.* : avdarkirinbar.

REHYDRATE, *vt.* : avdarkirinve.

REHYDRATATION, *n.* : avdarkirinve.

REICH, *n.* : dewleta elmanî ya pêş Komarê, Rayş.

REICHSTAG : parlemanê elmanî (Hitlerî), Rayştag.

REIFICATION, *n.* : madeyîkirin, madeyî yan mayeyîbûn.

REIFICATORY, *adj.* : pêwendîdarê madeyîkirinê.

REIFIED, *adj.* : madeyî yan mayeyî kirî.

REIFY, *vt.* : madeyî yan mayeyî kirin.

REIFYING, *n.* : madeyî yan mayeyî kirin.

REIGN, *n.* : rajorî, serdestî, axayî, axatî, desthelatî, zal, rojgar : demê hukmê fermanrewayî (ya qiralî).

REIGN, *vi.* : hukim kirin, fermanrewayî kirin.

REIGNED, *adj.* : fermanrewayîkirî.

REIGNING, *n.* : hukimkirin (qiral), fermanrewayî.

- **BEAUTY** : ciwan yan ciwaniya balaya demî (şahbanûya ciwaniyê).

- **QUEEN** : şahbanûya hukimdar.

REIGNITE, *vt.i.* : dadanve, hilkirinve.

RE-IMAGINE, *vt.* : aşop kirinve.

REIMBURSABLE, *adj.* : (dirav) vegerandinbar.

RE-IMBURSE, *vt.* : dirav danve, dirav vegerandinve.

REIMBURSED, *adj.* : dirav vegerandîve.

RE-IMBURSEMENT, *n.* : diravvegerandinve.

RE-IMBURSING, *n.* : diravdanve.

RE-IMPLANTATION, *n.* : çandinve.

RE-IMPORT, *vt.* : hînanve nav.

REIMPOSE, *vt.* : dananve (barek, biryarek).

RE-IMPOSITION, *n.* : dananve.

REIN, *n.* : cilav, cilaw, lixav, rişme, hefsar, desgîn, cilew.

- **TO GIVE ~ TO** : serî berdan, veresandin.
- **TO HOLD THE ~S OF GOVERNMENT** : hukm kirin (hukim di destî de bûn).

REIN, *vt.i.* : hesp girtin, araste kirin.

- **TO ~ IN** : hesp hedar kirin.

REINCARNATE, *vt.* : vegerandinve (giyan).

REINCARNATION, *n.* : vegerandinve (giyan).

REINCORPORATE, *vt.* : yek kirinve.

REINDEER, *n.* : texlîtek pezkûvî ye.

RE-INDUSTRIALIZE, *vt.* : pîşesazî kirinve.

RE-INFECTED, *adj.* : vegirtîve.

REINFORCE, *vt.* : qayim kirin.

REINFORCEABLE, *adj.* : peresekirinbar.

REINFORCED, *adj.* : qayimkirî.

- **CONCRETE** : konkirît (çimento) yê asinrêj.
- **FORTRESS** : kelheya asêkirî.

REINFORCEMENT, *n.* : qayimkirin, teyet, peresekirin.

REINGRATIATE, *vt.* : xwe şirîn kirinve.

RE-INHABIT, *vt.i.* : nişîn bûnve, akincî kirinve.

REINING, *n.* : lixav kirin, hefsar kirin.

REINLESS, *adj.* : bêcilav, bêhefsar (ser berdayî).

RE-INOCULATE, *vt.* : qutînve.

REINSERT, *vt.* : kirin nav de ve.

RE-INSERTION, *n.* : kirinnavdeve.

RE-INSPECT, *vt.* : seh kirinve.

REINSTATE, *vt.* : damezrandinve (erkdar, karker).

REINSTATED, *adj.* : damezrandîve, zivirandîve.

REINSTATEMENT, *n.* : damezrandinve, zivirandinve.

REINSTATING, *n.* : damezrandinve.

REINSURANCE, *n.* : dabînkirinve.

REINSURE, *vt.* : dabîn kirinve.

REINTER, *vt.* : veşartinve.

REINTEGRATE, *vt.* : yek kirinve, tekûz kirinve.

REINTEGRATED, *adj.* : yekkirîve, tekûzkirîve.

REINTEGRATING, *n.* : yekkirinve, tekûzkirinve.

REINTERPRET, *vt.* : rave kirinve.

RE-INVADE, *vt.* : êrîş kirinve, dagîr kirinve.

RE-INVASION, *n.* : êrîşkirinve, dagîrkirinve.

REINVEST, *vt.* : anîn ber kirinve.

RE-INVESTIGATE, *vt.* : lê geranve, pirsiyar kirinve.

REINVESTMENT, *n.* : anînberkirinve.

REINVIGORATE, *vt.* : çalak kirinve.

REINVIGORATION, *n.* : çalakkirinve.

REISSUE, *n., vi.t.* : anînderve, weşîn yan belavkirinve, hinanderve, weşandin yan belav kirinve.

REITERATE, *vt.* : dubare kirin.

REITERATED, *adj.* : dubarekirî.

REITERATION, *n.* : dubarekirin.

REITERATIVE, *adj.* : dubaredar, dubareyî.

REIVE, *vi.* : talan kirin.

REIVED, *adj.* : talankirî.

REIVER, *n.* : talanker.

REIVING, *n.* : talankirin.

REJECT, *n.* : berperç.

REJECT, *vt.* : berperç kirin, qebûl nekirin.

REJECTABLE, *adj.* : berperçbar, neqebûlbar.

REJECTAMENTA, *n. pl.* : gilêş, tiştê deryayî havêtî beravê.

REJECTER, *n.* : berperçker, neqebûlker, milnedayî.

REJECTING, *n.* : berperç(kirin), qebûlnekirin.

REJECTINGLY, *adv.* : bi berberçî, berperçkî.

REJECTION, *n.* : neviyan, newîstin, berperç, milnedan.

REJECTOR, *n.* = **REJECTER.**

REJIG, *vt.* : alav kirinve, kereste kirinve.

REJOICE, *vt.i.* : şad bûn yan kirin.

REJOICED, *adj.* : şadkirî.

REJOICING, *n.* : şabûn, hilşabûn, dilgeş, rûgeş, geşbûn, rûgeşî, geşûgewzbûn.

REJOIN, *vt.i.* : endam bûnve, girêdanve.

REJOINDER, *n.* : bersiv.

REJUDGE, *vt.* : dadger kirinve.

REJUVENATE, *vt.i.* : genc kirinve, nû kirin, law bûnve, nî bûn.

REJUVENATED, *adj.* : nûkirîve.

REJUVENATING, *n.* : nûkirinve, genckirin.

REJUVENATION, *n.* : lawbûnve, gencbûnve.

REJUVENATOR, *n.* : lawker, gencker.

REJUVENIZE, *vt.i.* : law kirin, genc kirin.

REJUVENESCE, *vi.t.* : law kirin, genc kirin, xurt kirin.

REJUVENESCENCE, *n.* : lawkirin, lawbûn, gencbûn.

REJUVENESCENT, *adj.* : lawker, gencker.

REKINDLE, *vt.i.* : hilkirinve, hilbûnve.

RE-KNIT, *vt.* : vehûnanve.

RELABLE, *vt.* : navnîşan kirinve, nîşan kirinve.

RELAPSE, *n.* : ketin, ketinve, vegerîn, paşveketin (nesax), nişîvbûn.

RELAPSE, *vi.* : keftin, keftinve, nişîv bûn, paşve keftin (nesax), xirabtir bûn.

RELAPSED, *adj.* : ketîve.

RELAPSING, *n.* : nişîvbûn (nesax), xirabtirbûn.

- **FEVER** : taya veger.

RELATE, *vt.i.* : vegêran (çîrok), gotin, gehiştin, gehîn.

RELATED, *adj.* : vegêrayî, xizm, mirov, pêwend.

RELATEDNESS, *n.* : xizmîtî, mirovîtî.

RELATING, *n.* : vegêrîn, vegêran.

RELATION(S), *n.* : mirovatî, xizmatî, ristek, pêwendî, kesûkar, pêwendiya zayendeyî (regezî).

- **IN OR WITH ~ TO** : sebaret bi.

RELATIONAL, *adj.* : xizmî, vegêrî.

RELATIONALLY, *adv.* : bi xizmî, bi pêwendî, pêwendkî.

RELATIONSHIP, *n.* : mirovatî, mirovanî, xizm, xizmîtî, ristek, pêwendî, îşk.

- **BETWEEN LOVERS** : yarî.

RELATIVAL, *adj.* : rêjeyî.

RELATIVE(S), *n., adj.* : xizm, mirov, pêwend, kesûkar.

- **HUMIDITY** : nem yan nemiya rêjeyî.

RELATIVELY, *adv.* : bi rêjeyî, rêjekî, izafî.

RELATIVISM, *n.* : rêjeyîtî, ola rêjeyî : dîtaneya ko rastî rêjeyî ye, ko rastiyên sincî dihên guhartin pêrga mirov û dir (şûn) û mercan.

RELATIVITY, *n.* : rêjeyîtî : ko tişt rêjeyî ye : dîtaneya Einstein li babetê gerdûnî, ko pîvanên dir (şûn) û demî rêjeyî ne, izafiyet.

RELATIVIZE, *vt.* : xizm kirin.

RELATIVIZED, *adj.* : xizmkirî.

RELATIVIZING, *n.* : xizmkirin.

RELATOR, *n.* : vegêr, çîrokbêj.

RELAX, *vt.i.* : vesihîn.

RELAXATION, *n.* : vesihîn, vehêsan, vesihandin, vehesan.

RELAXED, *adj.* : vesihî, vesihandî, vehêsandî.

RELAXEDLY, *adv.* : bi vesihînî, vesihînkî.

RELAXING, *n.* : vesihîn.

RELAY, *n.* : guhaztin (koçeyî), guhorîn (zelam, hesp), pêşbirkeya guhorkî yan nobetdarî, koçeya vê pêşbirkeyê, koçe.

- **STATION** : êstgeha hinartinê yan nardinê (koçe).

RELAY, *vt.i.* : guhaztin (koçe), tîp guhorîn.

RE-LAY, *vt.i.* : dananve.

RELEARN, *vt.* : hîn bûnve, fêr bûnve.

RELEASABLE, *adj.* : berdanbar.

RELEASE, *n.* : berdan, reha, verestin, veresîn, vemistin, vizikandin, azakirin.

RELEASE, *vt.* : berdan, verestin, veresîn, aza kirin ; past : verest, berda, vemist, veresî.

RE-LEASE, *vt.* : kirê kirinve, kirê girtinve.

RELEASED, *adj.* : berdayî, verestî, azakirî.

RELEASER, *n.* : berdankar, azaker.

RELEASING, *n.* : berdan, azakirin.

RELEGATE, *vt.* : nizm kirin (paye), kêm kirin, sirgum kirin.

RELEGATED, *adj.* : nizmkirî (paye), kêmkirî (paye).

RELEGATING, *n.* : nizmkirin, kêmkirin.

RELEGATION, *n.* : nizmkirin, kêmkirin (paye).

RELENT, *vi.* : nerm bûn, dilovan bûn.

RELENTINGLY, *adv.* : bi nermî, nermkî.

RELENTLESS, *adj.* : bê dilovanî, req.

RELEVANCE, *n.* : bestina pêwendiyê, pêwendîdarî.

RELEVANCY, *n.* = **RELEVANCE.**

RELEVANT, *adj.* : pêwendîdar.

RELEVANTLY, *adv.* : bi pêwendîdarî, pêwendîdarkî.

RELIABILITY, *n.* : bawerbarîtî, hemet.

RELIABLE, *adj.* : bawerbar, hemetbar, merd.

RELIABLENESS, *n.* : bawerbarîtî, hemet.

RELIABLY, *adv.* : bi hemetî, hemetkî.

RELIANCE, *n.* : ewl, ewlehî, berbaweri, dilniyayî, mitmane, rapermon, bawermendîtî, hemet.

RELIANT, *adj.* : piştrast, hemetkar.

RELIANTLY, *adv.* : bi piştrastî, bi hemetkarî.

RELIC, *n.* : yadgar, paşmayî, şop.

RELICT, *n.* : bîjin.

RELICTION, *n.* : avkêmbûn, kêmradan.

RELIED, *adj.* : hemetkirî.

RELIEF, *n.* : helet, harîkarî, firyager, hedirîn, pîtak, vesihîn, vesihandin, firyaguzarî.

- **MAP** : nexşeya leşdar.

RELIER, *n.* : hemetkar.

RELIEVABLE, *adj.* : vesihînbar.

RELIEVE, *vt.* : rizgar kirin, harî kirin, vesihandin, şûn girtin (erk).

RELIEVED, *adj.* : vesihandî, şûngirtî.

RELIEVING, *n.* : vesihandin, hedirandin, şûngiritn.

RE-LIGHT, *vt.* : (ronahî) hilkirinve.

RELIGION, *n.* : ayîn, ol, dîn.

- **ESTABLISHED ~** : ayîn yan dînê damezrandî.
- **FREEDOM OF ~** : serbestiya dînî.
- **PRESERVER** : olperist.

RELIGIONER, *n.* : ayîndar, dîndar.

RELIGIONISM, *n.* : ayînîtî.

RELIGIONIST, *n.* : dîndar, ayîndar.

RELIGIONIZE, *vt.* : ayîn kirin.

RELIGIONLESS, *adj.* : bêdîn, bêayîn.

RELIGIOSE, *adj.* : olkî.

- **COURT** : dadgeha olkî.

RELIGIOSITY, *n.* : dîndarîtî, ayînîtî.

RELIGIOUS, *adj.* : olwer, olperist, dîndar, ayîndar.

- **ADVISOR** : olzan.
- **HOUSE** : dêr, mizgeft.
- **LAW** : qanûna ayînî.
- **MAN** : dîndar.
- **PSALMS AND HYMNS** : qewl, beyt (êzidî).
- **RULE** : rêzika dînî.

RELIGIOUSLY, *adv.* : bi dîndarî, dîndarkî.

RELIGIOUSNESS, *n.* : dîndarîtî, ayîndarî(tî), olwerî.

RELINE, *vt.* : rêz kirinve, ber kirinve.

RELINQUISH, *vt.* : dest jê berdan.

RELINQUISHMENT, *n.* : destjêberdan.

RELIQUARY, *n.* : şopdank.

RELISH, *n.* : tam, çej, meze, berqut, çeştin, tibabek biçûk, çeştinxwazî.

RELISH, *vt.i.* : xweşî pêbûn, çeştin.

RELISHABLE, *adj.* : xweşbar.

RELISHING, *n.* : çeştin.

RE-LIVE, *vt.i.* : jiyanve.

RE-LOAD, *vt.* : bar kirinve.

RELOCATE, *vt.i.* : war guhorînve, şûn guhaztin.

RELOCATION, *n.* : war yan şûn guhartin.

RELUCENT, *adj.* : teyisî.

RELUCT, *vi.* : bergirî kirin, berhelistî kirin.

RELUCTANCE, *n.* : berhelistî, neviyanî, pênexweşî.

RELUCTANT, *adj.* : bergir, berhelist, pênexweş.

RELUCTANTLY, *adv.* : bi pênexweşî, pênexweşkî.

RELUCTATE, *vi.* : bergirî kirin, berhelistî kirin.

RELUCTIVITY, *n.* : bergirîtî, berhelistîtî, pênexweşîtî, bergiriya magnetîzî.

RELUME, *vt.* : sotinve, hilbûnve.

RELUMED, *adj.* : hilkirîve.

RELUMING, *n.* : hilkirinve.

RELY, *vi.* : hemet kirin.

RELYING, *n.* : hemet (kirin).

REM, *n.* : yekeya mijîna qurta tîrêja iyonkirî ji layê tevnê leşî.

REMAIN, *n.* : şûnwar, paşdaketin, şûndaketin.

REMAIN, *vi.* : man, paşde keftin.

REMAINDER, *n.* : paşmayî, paşmawe, pelot, bermayî, bermawe, mawe, mayende.

REMAINING, *n.* : man, mayîn, qer, qar, mayî, pêna.

- **BEHIND** : paşde mayîn.

REMAINS, *n.* : term, laş.

REMAKE, *vt.* : çêkirinve.

REMAN, *vt.* : (bi) zelam kirinve, mêrxas kirinve.

REMAND, *n.* : vegerandina doznameyê (bo dadgehek nizmtir), vegerandin

bo zîndanê (ta ko roja dadgerînê, girtina demekî, gunehbarê bo girtîxaneyê hatiye vegerandin).

- **HOME** : girtîxane.

REMAND, *vt.* : ferman kirin (dadwer) ko dozname biçit dadgehek nizmtir, ferman kirin (dadwer) ko girtî hêş bimîne di nav girtîxaneyê de.

REMANENCE, *n.* : vizîka magnetîzî ya mayî.

REMANENT, *adj.* : paşketî, paşmayî.

REMANUFACTURE, *vt.* : sazkirinve.

REMARGIN, *vt.* : perawêz kirinve.

REMARK, *n.* : serinc, têbînî, lêdiwan.

REMARK, *vt.i.* : serinc kirin, têbînî kirin.

REMARKABLE, *adj.* : payedar, nîşandar, dêrîne, nayab.

- **DEED** ; qencîk.

REMARKEBLENESS, *n.* : payedarîtî, nayabîtî.

REMARKABLY, *adv.* : bi nayabî, nayabkî.

REMARRIAGE, *n.* : şûkirinve.

REMARRY, *vi.t.* : şû kirinve.

REMATCH, *n.* : pêşbirkeve, pêşbezînve.

REMAST, *vt.* : babirek kirinve, dar ala kirinve.

RE-MEASURE, *vt.* : pîvanve.

REMEASUREMENT, *n.* : pîvanve.

REMEDIABLE, *adj.* : çarebar.

REMEDIAL, *adj.* : çareserî.

REMEDIALLY, *adv.* : bi çareserî, çareserkî.

REMEDIATION, *n.* : çare.

REMEDILESS, *adj.* : bêçare.

REMEDY, *n., vt.* : çare, derman, çareserî, çare kirin.

REMEDYING, *n.* : çarekirin.

REMEET, *vt.* : civînve.

REMEMBER, *vi.* : bîr kirin.

REMEMBERABLE, *adj.* : bîrbar.

REMEMBERANCE, *n.* : bîrkirin, yadgar.

- **DAY** : roja bîrkirinê (roja şehîdan).

REMEMBERANCER, *n.* : deynkomker, bîrker, yad.

REMEMBERED, *adj.* : bîrkirî, li bîr, hate bîr.

REMEMBERING, *n.* : bîrkirin.

REMERGE, *vt.* : yek bûnve.

REMEX, *n.* : perê balindeyî.

REMIGRATE, *vt.* : koçer bûnve.

REMIGRATION, *n.* : koçerbûnve.

REMILITARIZATION, *n.* : leşkerîkirinve.

REMIMLITARIZE, *vt.* : leşkerî kirinve.

REMIND, *vt.* : hînan bîrê.

REMINDER, *n.* : anînbîr nemaze nameya bîrxistinê.

REMINDFUL, *adj.* : bîrdar

REMINDING, *n.* : bîrkirin, bîrxistin.

REMINISCE, *vt.* : bîr kirin.

REMINISCENCE, *n.* : yadgar.

REMINISCENT, *adj.* : yadewer.

REMINISCENTIAL, *adj.* : bîrdar.

REMINT, *vt.* (dirav) lê danve.

REMISE, *vt.* : dest jê kêşan yan berdan, raspartin.

REMISED, *adj.* : berdayî.

REMISING, *n.* : berdan.

REMISS, *adj.* : hêvişandî, xawîlke, kemterxem.

REMISSIBLE, *adj.* : lêborînbar.

REMISSION, *n.* : lêborîn.

REMISSLY, *adv.* : bi lêborîn(bar)î, lêborîn(bar)kî.

REMISSNESS, *n.* : feramoş, hêvişandin, havêtin piştguh.

REMIT, *n.* : hinartina doznameyê bo dadgehek dî.

REMIT, *vt.i.* : lê borîn, rakirin (siza), hinartin (dozname) dadgehek dî, vegerandin (nemaze bo zîndanê), paşxistin, dirav guhaztin yan hinartin, sivik bûn (nesaxî).

REMITMENT, *n.* : lêborîn, guhaztin.

REMITTAL, *n.* = **REMISSION.**

REMITTANCE, *n.* : guhaztina diravî, diravguhêz.

- **MAN** : guhêzkar.

REMITTENT, *adj.* : mewdayî.

- **FEVER** : taya mewdayî.

REMITTER, *n.* : diravhinêr.

RE-MIX, *vt.* : têkil kirinve.

REMNANT, *n.* : paşmayî, paşmawe, şûndar.

REMOBILIZATION, *n.* : lêkdanve (hêz).

REMOBILIZE, *vt.* : lêkdanve.

REMODEL, *vt.* : darêştinve, avakirinve, pêk hînanve, binyat kirinve.

REMOISTEN, *vt.* : şil kirinve, nem kirinve.

REMOLD, *vt.* (dirav) darêştinve.

REMONETIZATION, *n.* : bikarînanve, qanûnî kirinve (dirav).

REMONETIZE, *vt.* : bi kar hînane (dirav), qanûnî kirinve (dirav).

REMONSTRANCE, *n.* : bêzarî, berhelistî, sosre, mostre.

REMONSTRANT, *adj.* : bêzar, gazindeker.

REMONSTRANTLY, *adv.* : bi bêzarî, bi gazindeyî, gazindekî.

REMONSTRATE, *vt.i.* : bêzarî kirin, berhelistî kirin, mostre kirin, sosre kirin.

REMONSTRATED, *adj.* : bêzarîkirî.

REMONSTRATING, *n.* : bêzarîkirin.

REMONSTRATION, *n.* : bêzarî(kirin), sosre, mostre.

REMONSTRATINGLY, *adv.* : bi bêzarî, bêzarkî.

REMONSTRATIVE, *adj.* : bêzar(dar).

REMONSTRATOR, *n.* : bêzarker.

REMONSTRANT, *adj.* : gula salê ko ji carekê pitir vedibit.

REMORA, *n.* : texlîtek masiyê ko dişêt xwe bi meyka avî, gemiyan û kîselan ve bigrit, gîro.

REMORSE, *n.* : pêşemanî, poşmanî, jûvanî.

REMORSEFUL, *adj.* : pêşeman, poşman, jûvan, polpoşman.

REMORSEFULLY, *adv.* : bi jûvanî, jûvankî.

REMORSEFULNESS, *n.* : jûvanîtî, poşmanîtî.

REMORSELESS, *adj.* : bêjûvanî, bêpoşmanî, req.

REMORSELESSLY, *adv.* : bi reqî, bê jûvankî.

REMORSELESSNESS, *n.* : reqîtî, bêjûvanîtî, bêpoşmanîtî.

REMOTE, *adj.* : dûr, dîr.

- **CONTROL** : dabînkirina dûr.

REMOTELY, *adv.* : bi dûrî, dîrkî.

REMOTENESS, *n.* : dûrîtî, dîrîtî.

REMOTION, *n.* = **REMOVAL.**

REMOULD, *vt.i.* : darêştinve.

REMOUNT, *n.* : hespê berdêl.

REMOUNT, *vt.i.* : siwar bûnve.

REMOVABILITY, *n.* : guhêzbarîtî.

REMOVABLE, *n., adj.* : guhêzbar.

REMOVAL, *n.* : rakirin, labirdin, helpesardin, nehêlan, hilanîn, lebtek, qirqirin.

- **OF THE VEIL** : servekirin.

REMOVE, *n.* : hilînan, rakirin, rahiştin.

REMOVE, *vt.i.* : rakirin, rahiştin.

REMOVED, *adj.* : rakirî.

REMOVING, *n.* : derxistin, derêxistin, rakirin.

REMUNERATE, *vt.* : bexş kirin, berdêl kirin.

REMUNERATED, *adj.* : bexşkirî.

REMUNERATING, *n.* : bexşkirin.

REMUNERATION, *n.* : xelatkirin, kirê, bexşîn.

REMUNERATIVE, *n.* : bexşîndar, bexşînî.

REMUNERATIVELY, *adv.* : bi bexşîndarî, bexşîndarkî.

REMUNERATIVENESS, *n.* : bexşîndarîtî.

REMUNERATORY, *adj.* : bexşînî.

RENAISANCE, *n.* : vejiyan, jiyanewe, raperîn.

- **PAINTERS** : kevalvanên vejiyanî.

RENAL, *adj.* : gulçîskî.

- **ARTERY BRANCHES** : tayên sordemarê gulçîskê.
- **VEIN BRANCHES** : tayên şîndemarê gulçîskê.

RENAME, *vt.* : nav kirinve.

RENAMED, *adj.* : navkirîve.

RENAMING, *n.* : navkirinve.

RENASCENCE, *n.* : vejiyan, jiyanewe, vegeşî.

RENASCENT, *adj.* : vejiyanî, vegeş.

RENATURE, *vt.*: sirûştî kirinve, nijadî kirinve.

RENATURED, *adj.* : sirûştîkirîve.

RENATURING, *n.* : sirûştîkirinve.

RECOUNTER, *vt.i., n.* : vêketin (helketinî), vêketin (helketinî), bezm, lêketin (cerenîx).

REND, *vt.i.* : guhorîn, buhujandin, vedêran.

RENDER, *n.* : hinîn, berdêl.

RENDER, *vt.* : strandin, rave kirin, wêne kirin, vegêran, hinîn, rawestandin, guhorîn, guhastin, jenîn, dest jê berdan.

- **DULL (PAIN)** : hedar kirin.

RENDERED, *adj.* : vedêrayî.

RENDERING, *n.* : pêrabûn, jenîn, stranbêjî yan wergêran.

RENDEZVOUS, *n.* : civîn, civîngeh.

RENDEZVOUS, *vi.* : civîn, vêketin.

RENDEZVOUSED, *adj.* : civandî, vêketî.

RENDEZVOUSING, *n.* : civandin, vêketin.

RENDING, *n.* : vedêran, dirrandin.

RENDITION, *n.* : wergêran, jenîn, kirdarî.

RENEGADE, *adj.* : xiniz, neasayî.

RENEGADE, *vi.* : xinizî kirin.

RENEGADED, *adj.* : xinizîkirî.

RENEGADING, *n.* : xinizîkirin.

RENEGE, *vt.* : mandel kirin (gotina xwe), peyiva xwe şkandin.

RENEGED, *adj.* : peyivşikandî.

RENEGER, *n.* : peyivşikên.

RENEGING, *n.* : peyivşikandin.

RENEGOTIABLE, *adj.* : çixirandinbar.

RENEGOTIATE, *vt.* : çixrandinve.

RENEGOTIATION, *n.* : çixirandinve.

RE-NEST, *vt.* : hêlîn kirinve.

RENEW, *vt.i.* : nû kirin.

RENEWABLE, *adj.* : nûkirinbar.

RENEWAL, *n.* : nûkirin, nûjen.

RENEWED, *adj.* : nûkirî, nîkirî, tazekirî.

RENEWER, *n.* : nûker.

RENEWING, *n.* : nûkirin, nîkirin, nûhîtî, tazekirin.

RENIFORM, *adj.* : şikil yan şêwe gulçîsk.

RENIN, *n.* : pirotîna di nav xwînê de ko xwînpestênê zêde dikit : (rênin).

RENITENCY, *n.* : bergirî, berhelistî.

RENITENT, *adj.* : bergir.

RENNET, *n.* : şîrê meyî, şêlav(k).

RENNIN, *n.* : haveynê penîrçêkerê şîrî.

RENOMINATE, *vt.* : navkirinve (bo helbijartinê), berbijar kirinve.

RENOMINATION, *n.* : navkirinve, berbijarkirinve.

RENOUNCE, *n.* : qayilbûna destjêberdanê, mandelkirin(ol).

RENOUNCE, *vt.i.* : mandel kirin (bawerî), dest ji dînê xwe berdan, reben bûn, cuda bûn, xwe ji kurê xwe dûr kirin, dest ji mafê textî berdan, dev ji berdan.

RENOUNCED, *adj.* : mandelkirî(ol).

RENOUNCEMENT, *n.* : destjêberdan (text...).

RENOUNCING, *n.* : destjêberdan (maf), mandelkirin(ol).

RENOVATE, *vt.* : nû kirin, nûjen kirin, çak kirin, vejandin.

RENOVATED, *adj.* : nûkirîve.

RENOVATING, *n.* : nûkirinve, nûkirin.

RENOVATION, *n.* : nûkirin, nûjenkirin, vejînkirin.

RENOVATOR, *n.* : nûkar.

RENOWN, *n.* : rûmet, pêgotin, navdarî, nawbangî, navûdeng.

RENOWNED, *adj.* : pêgotî, navdar, nawbang.

RENT, *n.* : kirê.

- **PAYER** : mizder.

RENT, *vt.i.* : kirê kirin, kirê girtin.

RENTABILITY, *n.* : kirêbarîtî.

RENTABLE, *adj.* : kirêbar.

RENTAL, *n.* : kirê.

- **LIBRARY** : kitêbxaneya kirêkirinê.

RENTED, *adj.* : kirêdayî, kirêgirtî.

RENTER, *n.* : kirêdar, kirêyar.

RENTIER, *n.* : xudan dahatin (ji erd û qoçanan).

RENTING, *n.* : kirêdan, kirêgirtin, kirêkirin.

RENUMBER, *vt.* : hejmar kirinve.

RENUNCIANT, *n., adj.* : destjêberdayî (maf).

RENUNCIATION, *n.* : destjêberdan(maf).

RENUNCIATIVE, *adj.* : destjêberdayî.

RENUNCIATORY, *adj.* : destjêberdayî.

RE-OBSERVE, *vt.* : zêrevanî kirinve.

REOCUUPY, *vt.* : dagîr kirinve.

REOCCUPATION, *n.* : dagîrkirinve.

RE-OCCUR, *vt.* : qewmînve.

REOPEN, *vt.i.* : vekirinve, vebûnve.

REORDER, *n., vt.* : xwastinve.

REORGANIZATION, *n.* : rêkxistinve.

REORGANIZE, *vt.* : rêk xistinve.

REORGANIZER, *n.* : rêkxistinveker.

REORIENT, *vt.* : araste kirinve.

REORIENTATE, *vt.* : berkirinve, araste kirinve.

REORIENTATION, *n.* : arastekirinve, berkirinve.

REP(P), *n.* : tevnê perûkî (bo perdeyan).

REPACK, *vt.* : dagirtinve.

REPAID, *adj.* : dayîve.

REPAINT, *n., vt.* : boyekirinve, boye kirinve.

REPAIR, *n.* : çakkirin, ezgerî, hendu, dizgûnkirin.

- **IN ~** : baş e, bikarbar e, çak e.
- **IN BAD ~** : ne baş e, ne bikarbar e.
- **IN GOOD ~** : baş e, çak e.
- **OUT OF ~** : ne baş e, ne çakbar e.

REPAIR, *vt.* : çak kirin, çêkirin, dizgûn kirin, hendu kirin.

REPAIRABILITY, *n.* : çakbarîtî, dizgûnbarîtî.

REPAIRABLE, *adj.* : çakbar.

REPAIRER, *n.* : çakker, henduker.

REPAIRING, *n.* : çakkirin, hendukirin.

- **TOOLS** : amîretsazî.

REPAIRMAN, *n.* : çakker, henduker.

REPAND, *adj.* : pêlî.

REPAPER, *vt.* : kaxez kirinve.

REPARABLE, *adj.* = **REPAIRABLE.**

REPARATION, *n.* : çakkirin, hendukirin, berdêlkirin, şûndan.

REPARATIVE, *adj.* : berdêldar, çakkirindar.

REPARTEE, *n.* : bersiva zû yan şehreza, jîr, şehrezayiya bersivê.

REPARTITION, *n., vt.* : dabeşkirinve, belav kirin, dabeş kirinve.

REPASS, *vi.t.* : derbaz bûnve, zivirînve, derbaz kirinve.

REPAST, *n.* : xwarin, dan.

REPATRIATE, *vt.i.* : (mirovî) zivirandinve (welatê wî yan wê anko derve...).

REPATRIATED, *adj.* : zivirandîve (derve bo welatê nijadî).

REPATRIATING, *n.* : zivirandinve (welatê mirovî).

REPATTERN, *vt.* : nimûne kirinve.

RE-PAVE : reqfkirinve, rastkirinve(rê).

REPAY, *vt.i.* : deyn dan, bexş kirin.

REPAYABLE, *adj.* : (dirav) danvebar.

REPAYING, *n.* : danve.

REPAYMENT, *n.* : deyndan, seza, siza.

REPEAL, *n., vt.* : helweşan, rakirin, rakirin, helweşandin (biryar).

REPEALABLE, *adj.* : rakirinbar, helweşîn-bar.

REPEALING, *n.* : rakirin, helweşîn.

REPEAT, *n., vt.i.* : dubare, dubare kirin, ducare kirin.

REPEATABILITY, *n.* : dubarebarî(tî).

REPEATABLE, *adj.* : dubarebar.

REPEATED, *adj.* : dubarekirî, dubare, ducarekirî, dupat.

REPEATEDLY, *adv.* : bi dubareyî, dubarekî.

REPEATER, *n.* : dubareker.

REPEATING, *n.* : dubarekirin, patkirdin.

RE-PEG, *vt.* : sing kirinve.

REPEL, *vt.i.* : paşve bûn, bergirî kirin, bêz kirin, derxistin.

REPELLED, *adj.* : paşvebirî.

REPELLENCY OR REPELLENCE, *n.* : bêzkirin, paşvebirin.

REPELLENT, *adj.* : bêzkar, kîndar, paşvebir, pêtikdûrker, dermanê lêr û pejbûna çermî.

REPELLENTLY, *adv.* : bi bêzkarî, bêzkarkî.

REPELLING, *n.* : paşvebirin.

REPENT, *adj.* : xişok.

REPENT, *vt.i.* : fehêt, pêşeman bûn.

REPENTANCE, *n.* : jûvanî, poşmanî, pêşemanî.

- **DEEP ~** : polpoşman.

REPENTANT, *adj.* : jûvan, poşman, tobedar.

REPENTANTLY, *adv.* : bi jûvanî, jûvankî.

REPENTING, *n.* : jûvan, poşman.

REPEOPLE, *vt.* : ava kirinve, nişîn kirinve.

REPERCUSSION, *n.* : dirjang.

REPERCUSSIVE, *adj.* : dirjangdar.

REPERTOIRE, *n.* : karên şanogerî yan mûzîqeyî û awazî ko tîpek dişêt pêşkêş bikit.

REPERTORY, *n.* = **REPERTOIRE** : embar, cebe.

- **THEATRE** : şanoya karên tîpek şanogerî ko hemî kesî pêşkêş dikitve.

REPETEND, *n.* : şikesteyê dubare (jimarkarî).

REPETITION, *n.* : dubarekirin, ducarî, helbesta jiberkirinê, dubarebûn, rûnivîs.

REPETITIONAL, *adj.* : dubareyî.

REPETITIONARY, *adj.* = **REPETITIONAL.**

REPETITIOUS, *adj.* : dubare (bêqam).

REPETITIOUSLY, *adv.* : bi dubareyî, dubarekî.

REPETITIOUSNESS, *n.* : dubareyîtî.

REPETITIVE, *adj.* : dubare(dar).

REPETITIVELY, *adv.* : bi dubareyî, dubarekî.

REPETITIVENESS, *n.* : dubareyîtî.

REPHOTOGRAPH, *vt.* : wêne kirinve.

REPHRASE, *vt.* : hevok kirinve.

REPIECE, *vt.* : pêkve girtinve.

REPINE, *vi.* : gazinde kirin.

REPININGLY, *adv.* : bi gazindeyî, gazindekî.

REPIQUE, *n.* : leyiztinek kaxezan : feydekirina sihxalkan berî carek dî ko (pîk) bileyizit.

REPIQUE, *vt.i.* : vegerandin, guhorîn.

REPLACE, *vt.* : cihê kesek girtin.

REPLACEABLE, *adj.* : guhorînbar, berdêlbar.

REPLACEMENT, *n.* : cihgirtin (guhartin).

REPLACER, *n.* : cihgir, cêgir.

REPLAN, *vt.* : melheze kirinve.

REPLANT, *vt.* : çandinve, çikilandinve.

REPLANTATION, *n.* : çandinve.

REPLAY, *n., vt.* : leyiztinve, leyizandinve.

REPLEDGE, *vt.* : belên kirinve.

REPLENISH, *vt.* : tejî kirinve, êzîng kirinve, temam kirin, tekûz kirin.

REPLENISHABLE, *adj.* : tejîkirinvebar.

REPLENISHER, *n.* : tejîkirinve, temamkirinve.

REPLENISHMENT, *n.* : tejîkirinve, temamkirinve.

REPLETE, *adj.* : hilçûyî, lêvrêj.

REPLETENESS, *n.* : têrkirinîtî, temam kirinîtî.

REPLETION, *n.* : têrkirin, têrbûn, temam kirin, lêvrêjî, hilçûn.

REPLEVIED, *adj.* : vegerandîve (tiştên dest bi ser de girtî).

REPLEVIED, *adj.* : vegerandîve.

REPLEVIN, *n.* : vegerandinveya destebériya mitayên dest bi ser de girtî.

REPLEVY, *vt.* : vegerandinve (bi destebérî).

REPLEVYING, *n.* : vegerandinve.

REPLICA, *n.* : wêneyê guhaztî (guhazto), rûnivîs.

REPLICATE, *adj.* : dubare, ducare, rûnivîs.

REPLICATE, *vt.* : dubare kirin, pêçan yan paşve badan.

REPLICATED, *adj.* : rûnivîskirî, dubarekirî.

REPLICATING, *n.* : rûnivîskirin, dubarekirin.

REPLICATION, *n.* : bersiv, dengvedan, rûnivîsek rast, rûnivîskirin, dubarekirina serhatiyê li heman dir û demê rojê.

REPLICATIVE, *adj.* : berhemkirinveyî.

REPLIED, *adj.* : bersivdayî.

REPLOT, *vt.* : pîlan kirinve.

REPLY, *n., vi.t.* : bersiv, welam, bersiv dan.

REPLYING, *n.* : bersivdan.

REPOINT, *vt.*: (movikê avahî) tejî kirin (bi ceblê yan çimentoyê), kun kirinve.

REPOLARIZATION, *n.* : tewerekirinve, cemserkirinve.

REPOLARIZE, *vt.* : tewere kirinve, cemser kirinve.

REPOLISH, *vt.* : vemiştînve.

REPOPULATE, *vt.* : nişîn kirinve, ava kirinve.

REPORT, *n.* : biryarname, gotar, şiqîn, şilqîn.

REPORT, *vt.i.* : (peyam) hinartin.

REPORTABLE, *adj.* : hinêrbar, nardinbar.

REPORTAGE, *n.* : rîportac, biryarname, peygerîna rojnamegerî, roportaj.

REPORTER, *n.* : peyamnêr, nûçebêj, xeberdok.

REPORTORIAL, *adj.* : nûçebêjî, demrast.

REPOSAL, *n.* : rasipêrkirin.

REPOSE, *n.* : vesihîn, bêhnvekirin, vezelandin, hedan, dilniyabûn, mitbûn, hêmin, xwe dirêjkirin, sirewt.

REPOSE, *vt.i.* : vesihîn, rasipêr kirin, veketin.

REPOSED, *adj.* : veketî, vesihî, vezelandî.

REPOSEFUL, *adj.* : mit, hedar.

REPOSEFULLY, *adv.* : bi hedarî, hedarkî.

REPOSING, *n.* : vesihîn, veketin.

REPOSITORY, *n.* : kogeh.

REPOSSESS, *vt.* : vegerandinve, ziviran-dinve (saman).

REPOSSESSION, *n.* : vegerandinve (saman).

REPOSSESSOR, *n.* : vegerandinveker.

REPOST, *vt.* : hinartinve.

REPOT, *vt.* : bi qehfik kirinve.

REPOWER, *vt.* : hêzdar kirinve, bi makîne kirinve.

REPPED, *adj.* : rûzivr.

REPREHEND, *vt.* : têxurîn, lê heytandin, gunehbar kirin.

REPREHENSIBILITY, *n.* : gunehbarîtî.

REPREHENSIBLE, *adj.* : gunehbar.

REPREHENSIBLENESS, *n.* : gunehbarîtî.

REPREHENSIBLY, *adv.* : bi gunehbarî, gunehbarkî.

REPREHENSION, *n.* : serkune, serzenişt, gazinde, têxurîn, gileyî, lêheytandin.

REPREHENSIVE, *adj.* : serkunedar, serzenîştî.

REPRESENT, *vt.* : nimînende kirin.

REPRESENTATION, *n.* : nimînendekirin, niwandin, nuwênerî, nimînandin, nimînendingeh.

REPRESENTATIONAL, *adj.* : nimînendeyî.

REPRESENTATIONISM, *n.* : nimînendeyîtî.

REPRESENTATIVE, *n., adj.* : nimînender, niminende, nuwêner, şandiyar.

REPRESENTATIVELY, *adv.* : bi nimînedeyî, nimînendekî.

REPRESENTATIVENESS, *n.* : nimînendeyîtî, niwandin.

REPRESENTED, *adj.* : nimînendekirî.

REPRESENTING, *n.* : nimînendin, nitirandin.

REPRESS, *vt.* : tepeser kirin.

REPRESSED, *adj.* : tepeserkirî.

REPRESSIBILITY, *n.* : weraftinbarîtî : pestanbarîtî.

REPRESSIBLE, *adj.* : weraftinbar, pestanbar.

REPRESSION, *n.* : tepeserkirin, serçemandin, kujandin.

REPRESSIVE, *adj.* : zordar, zordarane, tepeserdar.

REPRESSIVELY, *adv.* : bi tepeserdarî, tepeserdarkî.

REPRESSIVENESS, *n.* : tepeserdarîtî.

REPRIEVAL, *n.* = **REPRIEVE.**

REPRIEVE, *n.* : paşxistina sêdarekirinê, rizgarbûna demekî.

REPRIEVE, *vt.* : paşxistin (sêdarekirin).

REPRIEVED, *adj.* : paşxistî, rizgarbûyî (demekî).

REPRIEVING, *n.* : rizgarkirina demekî (ji qenarê).

REPRIMAND, *n.* : riswabûn, lêhilatin, serkune, kopere, serzenişt.

REPRIMAND, *vt.* : têxurîn, xurîn, serkune kirin.

REPRIMANDING, *n.* : riswakirin, têxurin, serzenişt.

REPRINT, *n., vt.* : çapkirinve, çap kirinve.

REPRISAL, *n.* : tol, dagîrkirinve.

REPRISE, *n.* : kirêdana salaneya aqarî, destpêkirinveya karî.

REPRISE, *vt.* : dubare kirin (destpêkirinve).

REPRISED, *adj.* : dubarekirî (destpêkirîve).

REPRISING, *n.* : dubarekirin (destpêkirinve).

REPRISTINATE, *vt.* : vegerandinve (wek berê).

REPRISTINATING, *n.* : vegerandinve.

REPRO, *n.* : rûnivîsa diyar.

REPROACH, *n.* : gazin, gazinde, gileyî, serzenişt, serkune, lêgirtin.

REPROACH, *vt.* : têxurîn, gazinde kirin, lê girtin.

REPROACHED, *adj.* : lêgirtî.

REPROACHER, *n.* : lêgir.

REPROACHFUL, *adj.* : lêgirî, lêgirdar.

REPROACHFULLY, *adv.* : bi lêgirî, gazindekî.

REPROACHFULNESS, *n.* : lêgirîtî.

REPROACHING, *n.* : lêgirtin.

REPROACHINGLY, *adv.* : bi lêgirî, gazindekî.

REPROACHLESS, *adj.* : bêlêgirî, bêlome.

REPROBATE, *n., adj.* : bed, çikos, bedkar, garîs.

REPROBATE, *vt.* : kembax kirin, nifrîn lê kirin, gunehbar kirin.

REPROBATED, *adj.* : tawanbarkirî, gunehbarkirî.

REPROBATION, *n.* : gunehbarkirin, neviyan, derxistin (ji desteyek qencan).

REPROBATIVE, *adj.* : gunehbardar.

REPRODUCE, *vt.i.* : zayînve, berdanve, zayîn(zan), pitir bûn, zaûzê kirin, zehf bûn.

REPRODUCER, *n.* : berdar, berhemdar.

REPRODUCIBILITY, *n.* : berkirinvebar, berhemkirinvebar.

REPRODUCIBLY, *adv.* : bi berkirinvebarî, bi berhemkirinvebarî.

REPRODUCTION, *n.* : zorbûn, zaûzê.

REPRODUCTIVE, *adj.* : berhemdar.

REPROGRAPHIC, *adj.* : pêwendîdarê rûnivîskarî.

REPROGRAPHY, *n.* : rûnivîszanî, rûnivîskarî.

REPROOF, *n.* : têxurîn, gileyî, serzenişt, gazin.

REPROOF, *vi.* : av bergir kirinve.

REPROVABLE, *adj.* : serzenîştbar, gazinbar.

REPROVAL, *n.* = **REPROOF.**

REPROVE, *vt.* : têxurîn, xurîn, gazin kirin, serzenîştkirin.

REPROVED, *adj.* : têxurî.

REPROVER, *n.* : gazindeker.

REPROVING, *n.* : têxurin, serzenişt.

RIP-ROARING, *n.* : şadiya qerqeşe.

RIPSAW, *n.* : here, xîzar.

RIPSNORTING, *n.* : nayab.

RIP VAN WRINKLE, *n.* : mirovê xudan hizir yan ragehîna bêqam kevn û gêre.

RISE, *n.* : rabûn, evraz, helsan, vepengizîn, hilhatin.

- **TO GIVE ~ TO** : bûn egerê qewmînê.

RISE, *vi.t.* : rabûn, hilhatin, bilind bûn, raperîn ; past (rose) : rabû.

RISEN, *adj.* : *pp.* : rabûyî, vepengizî.

RISER, *n.* : hişyar (ji nivistinê), parçeya rasteka pêstirkê.

RISIBILITY, *n.* : şadî, tiraneyîtî, kenîn, kenî, kenînbarîtî.

RISIBLE, *adj.* : kenînbar, kenik, kenînî.

RISIBLES, *n.* : tiraneyîtî.

RISING, *n.* : rabûn.

- **TIDE** : avrabûn, radan.

RISK, *n.* : metirsî, sehmî, karê ziyandar, tewekelî.

- **AT ONE'S OWN ~** : li ser berpirsiya xwe(mirovî).

- **AT OWNER'S ~** : li ser berpirsiya xudanî.

- **TO RUN OR TAKE A ~** : xwe dan ber ziyanê.

RISK, *vt.* : karê ziyandar kirin.

RISKER, *n.* : hol.

RISKLESS, *adj.* : bê metirsî, bê ziyanbar.

RISK MONEY, *n.* : diravê metirsiyê.

RISKY, *adj.* : tewekel, tewakel.

RISORIUS, *n.* : masûlkeya pêkenînê.

RISQUE, *adj.* : (çîrok) berdayî yan bêşermî.

RISOTTO, *n.* : birinc (li gel goşt û penîrî).

RISSOLE, *n.* : kifte, kutilk yan kiloca goştî yan masiya qelandî.

RITARDANDO, *n., adj.* : derhînana mûzîqeyî, hêdîtir, nizmbûna hêdiya dengî.

RITE, *n.* : ol, karek ayînî.

RITELESS, *adj.* : bê ol.

RITENUTO, *n.* : parçemûzîqe (ya ko di cih de deng nizm dibit).

RITUAL, *n., adj.* : kitêba olî, nerît, olî, nivêjî.

RITUALISM, *n.* : olîtî.

RITUALIST, *n.* : olkar.

RITUALISTIC, *adj.* : olkarî.

RITUALISTICALLY, *adv.* : bi olkarî, olkarkî.

RITUALIZATION, *n.* : olîkirin.

RITUALIZE, *vi.* : olî kirin.

RITUALIZED, *adj.* : olîkirî.

RITUALIZING, *n.* : olîkirin.

RITUALLY, *adv.* : bi olkarî, olkarkî.

RITZY, *adj.* (**COLLOQ**) : payeberz.

RIVAGE, *n.* : berav.

RIVAL, *n., adj.* : hevrik, mêmil.

RIVAL, *vt.i.* : hevrikî kirin, hevrik bûn.

RIVAL(L)ED, *adj.* : hevrikîkirî.

RIVAL(L)ING, *n.* : hevrikîkirin.

RIVALROUS, *adj.* : hevrik.

RIVALRY, *n.* : hevrikî, berberekanî.

RIVE, *vt.i.* : kelişîn, dirrandin.

RIVED OR RIVEN, *adj.* **AND** *pp.* : dirrandî.

RIVEL, *vi. t.* : qurmiçîn, qurmiçandin.

RIVER, *n.* : kelişkar.

RIVER, *n.* : rûbar, çem.

- **BANK** : ceber, berav.

- **BANK (ROCKEY)** : zinar.

- **BED** : nihal.

- **MOUTH** : berdev, navgeh.

- **OF BLOOD** : kuştara bêqam.

- **WAVE** : şilqav, şeqil.

RIVERAIN, *n., adj.* : rûbarî.

RIVER FISH, *n.* : keşîne.

RIVER HEAD, *n.* : serrûbar, zê, kanî yan jêderê rûbarî.

RIVER HORSE, *n.* = **HIPPOPOTAMUS.**

RIVERINE, *adj.* : rûbarî.

RIVERLESS, *adj.* : bê rûbar.

RIVER SIDE, *n.* : berav, rexrûbar, kenarê rûbar.

RIVET, *n.* : bizmar, sing, berçim.

RIVET, *vt.* : bizmar kirin, berçim kirin.

RIVETER, *n.* : bizmarkar, makîneya bizmarkirinê.

RIVIERE, *n.* : stûvank, stivank.

RIVING, *n.* : zirandin.

RIVULET, *n.* : rûbark, celal, cok, coge, çem, delav, solîn.

ROACH, *n.* : texlîtek masî ye, sisirk (bi kurtkirin).

ROACH, *vt.* : (wek biji) birrîn.

ROAD, *n.* : rê, rêga.

- **COUNTRY ~** : şive.
- **GUIDE** : rêname (rêberê rê).
- **MAP** : rêname (nexşeyê rê).
- **RURAL ~** : şiverê.
- **STRAIGHT ~** : rasterê.
- **TO TAKE THE ~** : dest bi rêbariyê kirin.

ROADABILITY, *n.* : rêbarî(ti).

ROADAGENT, *n.* : rêgir.

ROADBED, *n.* : rêbinyat (bo otomobîlan yan rêasinî).

ROAD BLOCK, *n.* : rêgîro, çeperê rê.

ROAD HOG, *n.* : rêberaz : hajoyê rêgîroyê.

ROAD HOUSE, *n.* : rêmêvangeh.

ROADLESS, *adj.* : bê rê.

ROAD METAL, *n.* : cercîr.

ROAD ROLLER, *n.* : rêbagurdan.

ROAD RUNNER, *n.* : rêgerok : balindeyek emerîkanî ye.

ROADSIDE, *n., adj.* : rexê rê.

ROADSTEAD, *n.* : texlîtek balinde ye (li ser rêyan).

ROADSTER, *n.* : hespê rê.

ROAD TEST, *n.* : rêazmûn.

ROADWAY, *n.* : rê.

ROAM, *vi.t.* : geran (gerîn).

- **TO ~ ABOUT** : teriqîn.

ROAMED, *adj.* : teriqî.

ROAMING, *n.* : gerîn, geran, koçerî, geryan, bêrê.

ROAN, *n.* : çermê nerm, şê (bo hespî).

ROAR, *n.* : gurjîn, gurmîn, nere, nirrên, tîq, reqreq, rimîn, ringering, terq, ving, giregir, hirmijîn, hirmijandin.

ROAR, *vi.t.* : merijîn, hirmijîn, nirrên kirin, gurîn kirin.

ROARED, *p.* **OF ROAR** : meriji, hirmijandî, hirmijî.

ROARING, *n.* : hirmijîn, hirmijandin, merijîn.

ROARINGLY, *adv.* : bi hirmijînî, hirmijînkî.

ROAST, *n., adj.* : goştê birajtî, birajtin, birijandin.

ROAST, *vt.i.* : birajtin.

ROASTED, *adj.* : birajtî.

ROASTER, *n.* : birajker, alavkê birajtinê.

ROASTING, *n.* : birajtin, bahîn.

ROAVING, *n.* : geryan.

ROB, *vt.i.* : şelandin, dizîn, talan kirin.

ROBALO, *n.* : texlîtek masî ye (zehfe li Emerîka).

ROBAND, *n.* : werîsê girêdana babirekî.

ROBBED, *adj.* : şelandî, dizî, talankirî.

ROBBER, *n.* : diz, talanker, keleş, qeçax, nijdevan.

- **FLY** : mêşek rawrî ye.

ROBBERY, *n.* : dizî, talanî, talan, cerd, nijde.

ROBBING, *n.* : dizî, talankirin.

ROBE, *n.* : kûrtek, benîş, pûşenî, kiras.

- **DE CHAMBRE** : pûşenê bermalê.
- **OF HONOURS** : perwe, pero.

ROBE, *vt., i.* : (bi) kiras kirin, kinc kirin.

ROBED, *adj.* : kiraskirî, kinckirî.

ROBIN, *n.* : robin : balindeyek sîngsor e.

ROBING, *n.* : kiraskirin.

ROBLE, *n.* : darberû (li Kalîforniya û Meksîkê).

ROBORANT, *n., adj.* : dermanê qayimker.

ROBOT, *n.* : robot : mirovê alavkî.

- **BOMB** : bombaya arastekirî.

ROBOTIZATION, *n.* : alavkirin, xwekarîkirin.

ROBOTIZE, *vt.* : xwekar kirin, alavî kirin.

ROBOTIZED, *adj.* : alavîkirî, xwekarîkirî.

ROBOTIZING, *n.* : alavîkirin, xwekarîkirin.

ROBUST, *adj.* : qayim, çalak, stûr, dijwar, nevemiştî.

ROBUSTIOUS, *adj.* : zivr, stûr, qayim.

ROBUSTIOUSLY, *adv.* : bi qayimî, qayimkî.

ROBUSTIOUSNESS, *n.* : qayimîtî.

ROC, *n.* : balindeyek efsaneyî (wek sîmerxê) ye.

ROCAMBOL, *n.* : sîrê îspanî.

ROCHELLE SALT, *n.* : xwêya Roşêl (bo zikçûna sivik).

ROCHET, *n.* : komlekê oldarî.

ROCK, *n.* : kevir, helan, şax, hîm, koç, kevr.

- **BASS** : texlîtek masî ye.
- **BIG ~** : qiş.
- **FISH** : kevirmasî.
- **FLOWER** : gulkevrok.
- **JAGGED ~** : şaxor.
- **LITTLE ~** : şaxorkevirok.
- **MASSIVE ~** : zinar (ji çiyayî derketî).
- **ON THE ~** : bê pare.
- **PARTRIDGE** : sûsk.

ROCK, *vt., i.* : hejîn, hejandin, lorandin.

ROCK AND ROLL, *n.* : texlîtek sema ye.

ROCK AND RYE, *n.* : texlîtek wiskî ye.

ROCK AWAY, *n.* : erebaneya çarçerxî.

ROCK BOTTOM, *n., adj.* : bin.

ROCKBOUND, *adj.* : kevrî.

ROCKBRAKE, *n.* : kevrebelûr.

ROCK DOVE, *n.* : kewê şîn (kotir yan kevoka keviran).

ROCKER, *n.* : hejînk, pêpikên kevaniyên landikê, landika zêrkangerî.

ROCKER ARM, *n.* : destikê hejîn.

ROCKERY, *n.* : koma keviran.

ROCKET, *n.* : moşek, cercîr, tîra agirî, xompar.

- **BOMB** : bombaya moşekî.
- **LAUNCHER**, *n.* : moşekhavêj.
- **PLANE** : balafira moşekî.
- **PROPULSION** : paldana moşekî.
- **SHIP** : gemiya moşekî.

ROCKET, *vt., i.* : (wek) moşekî çûn, bi moşekî guhaztin.

ROCKETEER, *n.* : moşekzan.

ROCKETRY, *n.* : moşekzanî.

ROCK GARDEN, *n.* : çîmena kevirî.

ROCKING CHAIR, *n.* : kursiya hejîn.

ROCKING HORSE, *n.* : hespê darê hejîn.

ROCK OIL, *n.* : neft (rûnê keviran).

ROCK PIGEON, *n.* : (kotir yan kevoka keviran) kewê şîn.

ROCK RIBBED, *adj.* : kevrî.

ROCKSHAFT, *n.* : şîş.

ROCK WEED, *n.* : kevirgiya.

ROCK WOOL, *n.* : kevirhirî : madeyek cudaker e wek rîşalên hiriyê ji kevirê buhujî çêkiriye.

ROCKY, *adj.* : kevirî.

- **A ~ STORY** : (çiroka)tirek.

ROCOCO, *n., adj.* : xemilkariya avahî.

ROD, *n.* : şîş, dar, hêz, seza, çogan, gopal, bist.

- **TO HAVE A ~ IN PICKLE FOR** : sezayek dijwar li ber mirovekê ye.

- **TO SPARE THE ~** : seza nekirin.

RODE, *vi.* : êvarî difirit hindur (mirîşka kûvî).

RODLESS, *adj.* : bêdar.

RODLET, *n.* : darik.

RODLIKE, *adj.* : wek darî, darikî.

RODENTIA, *n.* : kirînk.

RODENTS, *n., adj.* : (canewerên) kirînk (wek mişkî).

RODENTICIDE, *n.* : mişkkuj.

RODEO, *n.* : bazarê terşî.

RODMAN, *n.* : harîkerê beyavpîverî.

RODOMONTADE, *n.* : fêz, fort, bûngî.

ROE, *n.* : asik, pezkûvî (biçûk).

ROEBUCK, *n.* : nêreasik.

ROEDEER, *n.* : asik.

ROENTGEN, *n., adj.* : rontgen : yekeya navdewletiya tîrêja îks(x), rontgenî.

ROENTGENIZE, *vt.* : dan ber tîrêja êks(x).

ROENTGENOGRAPH, *n.* : wêneyê tîrêja êks(x).

ROENTGENOGRAPHY, *n.* : wênegiriya tîrêja êks(x).

ROENTEGENOLOGY, *n.* : tîrêjêkszanî.

ROENTGEN RAYS, *n.* : tîrêj yan tîşka êks(x).

ROGATION, *n.* : sirûda pîrozan.

ROGER, *int.* : baş e (ko peyam gehişt).

ROGUE, *n.* : al, sorê vekirî, garîs, bed, muqurbaz, tiro, dirrinde, cerbeze, semend.

ROGUE, *vi., t.* : xapandin, fêlbazî kirin.

ROGUED, *adj.* : helkêşayî.

ROGUE ELEPHANT, *n.* : filê derbeder (teriqî).

ROGUERY, *n.* : garîsî, dilxapî, labandin, cerbezî.

ROGUES' GALLERY, *n.* : tomara tawanbaran.

ROGUISH, *adj.* : bed, xapînok, fêlbaz.

ROGU(E)ING, *n.* : helkêşan.

ROIL, *vt.* : şêlî kirin, şepirze kirin, perîşan kirin, enirandin.

ROILING, *n.* : şêlîkirin.

ROILY, *adj.* : şêlî, teqnî, enirî.

ROISTER, *vi.* : keyfa qîr û qîj kirin.

ROISTERED, *adj.* : şehlewendkirî.

ROISTERING, *n.* : şehlewendî.

ROLE, *n.* : rol, kar.

- **PLAYING** : karkirina wek erkî.

ROLL, *n.* : babole, gindirîn, gêr, gerandin, gergerok, reqreq, xil.

- **AROUND** : gevizîn.

- **OF HONOUR** : tomara serfiraziyê.

- **UP** : alandin.

- **TO STRIKE OFF THE ~** : rakirin (derxistin).

ROLL, *vt., i.* : girêl kirin, gêrîn, gevizandin, gevizîn.

- **TO ~ BACK** : paşve bûn, erzan kirin.
- **TO ~ OUT** : ji xew rabûn.
- **TO ~ UP** : kom kirin, gidîş bûn.

ROLLBACK, *n.* : paşve çûn, erzankirin.

ROLL CALL, *n.* : gazîkirin (bo hejmartinê ~).

ROLLER, *n.* : qenek, selîlalk, şilkak, gilolk.

ROLLER, *n.* : bagurdan, bagirdîn, bangurdan, banger(e).

- **BEARING** : helgira gindirkî.
- **COASTER** : rêasina bilinda çepûçîrî.
- **FILM** : filmê pêçayî.
- **SKATE** : hiliskera çerxkirî.
- **TOWEL** : xawliya zivirok.

ROLLICK, *n., vi.* : werbûn, keyf kirin.

ROLLING, *n.* : gindirandin, tilandin, balorkî, virvirî, pêçandin, pêçan, badekî, xil, gindirîn, gêr, girgir, bangerîn, bagerîn.

- **ABOUT** : gevizandin.
- **IN** : gevaztin.
- **PIN** : tîra hevîrî.
- **STOCK** : hevkêş.
- **UP** : hilmiştin, dapêçan.

ROLI-POLI, *adj.* : qut û qelew.

ROLLTOP DESK, *n.* : mêza serdana pêçîn.

ROLYPOLY, *n.* : kiloca pêçekî, mirovê qut û qelew.

ROMAIC, *n., adj.* : zimanê nûjenê grekî.

ROMAINE, *n.* : texlîtek kaho ye.

ROMAN, *n., adj.* : welatî û zimanê Roma, katolîkî, Latînî, piçekê xwehr (difn).

ROMAN-A-LIEF : çîroka rûpoşkirî : çiroka mirov û bûyerên rast bi rêbazek Romayî.

ROMAN CANDLE, *n.* : mûma Romayî : leyiztina agir baziyê.

ROMAN CATHOLIC : katolîkî.

ROMAN CATHOLICISM : katolikîtî.

ROMANCE, *n.* : romansî : helbest, roman yan çîroka evînîya dijwar, giyansoza yan sirûştê romansî, çîrokên efsaneyî aşopî yan qehremanî, zimanên romansî wek frensî, Îtalî.

ROMANCE, *vt.* : xwe bi evîndarê dijwar diyar kirin, çîrok û nûçe çêkirin, derew kirin, mezin kirin.

ROMANCED, *adj.* : mezinkirî, evînîkirî.

ROMANCER, *n.* : romannivîs, çêkerê çîrok û nûçeyan.

ROMANCING, *n.* : mezinkirin, evînîkirin.

ROMANESQUE, *n.* : hunera avahî.

ROMANIAN, *n., adj.* : welatî yan zimanê Romanya.

ROMANIC, *n., adj.* : romansî, Romayî, zimanê romansî.

ROMANISM, *n.* : katolîkîtî.

ROMANIST, *n.* : katolîk, romazan.

ROMANIZE, *vt.* : romanî yan latînî kirin, tîp latînî kirin (tîpên latînî bi kar hînan).

ROMAN NUMERALS, *n.* : renûsên latînî (I, II, III).

ROMANO, *n.* : texlîtek penîrê tûj û req e.

ROMANTIC, *adj.* : romansî, dildaryane.

ROMANTICISM, *n.* : romansîtî.

ROMANTICIZE, *vt., i.* : romansî kirin.

ROMANY, *n., adj.* : Qereç, Qereçî.

ROMISH, *adj.* : katolîk, romayî.

ROMNEY, *n.* : texlîtek teraş e.

ROMP, *n.* : keçika felîte, bezm, bezîna serketî (li pêşbezînê yan pêşbirkeyê), leyiztina zarokan, jin yan zaroyê ko hez ji vê leyiztinê dikit.

ROMP, *vi.* : bezm kirin, bezîn (bi lez û serkeftin li pêşbeziyê).

ROMPER, *n.* : kirasê fireh yê zarokan.

ROMPING, *n.* : bezmeyarî.

- **GROUND** : gevizk.

RONDEAU, *n.* : helbestek deh yan sêzdeh malik yan rêze.

RONDEL, *n.* : heyberê xelekî.

RONDO : parçeyek nûzîqeyiya awaza serekî dubare dibit.

RONDUE : çemere, çepdan.

ROOD, *n.* : xaç.

- **ARCH** : taqê di navbera sirûdgeh û avahiyê dêrê de.

- **CLOTH** : perûkê nixaftina xaçê.

- **SCREEN** : berbestê dar yan ber di navbera sirûdgeh û avahiyê dêrê de.

ROOF, *n.* : kaşxank, ban, banik, sapîte, bineban, binmîç, serban.

- **BEAM** : mertak, nîrgeh, karîte.

- **GUTTER** : pilosk.

ROOF, *vt.* : sîber kirin, kaşxank kirin, ban kirin.

ROOFER, *n.* : spasnameya serdankerî piştî çûnê.

ROOFING, *n.* : kaşxank, bankirin, ban.

ROOFLESS, *adj.* : bêpena, bêban.

ROOFTOP, *n.* : sapîte.

ROOFTREE, *n.* : ban, xanî, stûna kaşxankî.

ROOINEK, *n.* : koçerê brîtanî li başûra Efrîqa.

ROOK, *n.* : qijk, çivo, dilxap, kelheya şetrencê, lêbok, qel.

ROOK, *vt.* : fêlbazî kirin, xapandin.

ROOKERY, *n.* : darên têrqir, hêlînên qiran.

ROOKIE, *n.* (sl.) serbazê nû.

ROOKY, *adj.* : xanî û zincên hejaran.

ROOM, *n.* : jor, mezelk, ode, dir, şûn, firehî.

ROOM, *vi., t.* : hewandin, pena kirin, nişte kirin.

ROOMER, *n.* : kirêdar.

ROOMETTE, *n.* : jora nivistinê ya hevkêşê.

ROOMFUL, *adj.* : teşiya mezelekî, teşiya jorekê.

ROOMINESS, *n.* : firehîtî.

ROOMING HOUSE, *n.* : xaniyê kirêkirina joran.

ROOMMATE, *n.* : hevnişîn : hevalê jorê (ko du mirov pêkve nişte ne).

ROOMY, *adj.* : fireh, firawan, delp.

ROORBACK, *n.* : derew (bo kirêtkirina ramyarî).

ROOSE, *vt.* : pesn kirin.

ROOST, *n.* : dahiştin, lîsbûn, lîs, lûs.

ROOST, *vi., t.* : lîs kirin, dahiştin.

ROOSTER, *n.* : keleşêr, fêlbaz.

ROOSTING, *n.* : dahiştin, lûsîn.

ROOT, *n.* : rih, reg, regez, binyat, bineret, nijad.

- **AND BRANCH** : hemû : rih û çiq.

- **HAIR** : rîşal.

- **STOCK** : riha petrûmekirî.

- **TO TAKE OR STRIKE ~** : rih girtin, qayim bûn.

ROOT, *vt., i.* : rih girtin, kolîn, kolan (bo xwarinê).

- **TO ~ OUT** : helkêşîn.

ROOTAGE, *n.* : rihgirtin, rêzika rihan.

ROOT BEER, *n.* : bîreya rihan : vexwarinek gazî yan firhayiya rih û giyayan.

ROOTING, *n.* : ripindan.

ROOTLESS, *adj.* : bê rih.

ROOTLESSNESS, *n.* : bêrihîtî.

ROOTLET, *n.* : rihçik.

ROOTY, *adj.* : têrrih, rihdar.

ROPABLE, *adj.* : (bi werîsî) serketinbar.

ROPE, *n.* : ben, werîs, gorîs, benik, kap, pet, werîsê sêdareyê (qenareyê), mirin bi sêdarekirinê, tenafe.

- **DANCER** : delo, delîdoman, pehlewan, palewan, werîsliz, canbaz.
- **TO GIVE SOMEBODY PLENTY OF ~** : serbest kirin (serî berdan).
- **TO KNOW (LEARN) THE ~ S** : kar zanîn yan hîn bûn.

ROPE, *vt., i.* : girê dan (bi werîsî), fêtkarî kirin.

ROPED, *adj.* : girêdayî (bi werîsî).

ROPEWALK, *n.* : werîsgeh.

ROPEWALKER, *n.* = **ROPEDANCER.**

ROPINESS, *n.* : werîsîtî.

ROPING, *n.* : werîskirin (girêdan).

ROPY, *adj.* : werîsî, debîşî, şirêzî, stirkî, lincî.

ROQUE, *n.* : yariyek tepka daran e.

ROQUEFORT, *n.* : texlîtek penîr e.

ROQUELAURE, *n.* : kevne´ebayê zelamî ko digehişt çokê.

RORQUAL, *n.* : texlîtek neheng e.

ROSACE, *n.* : pencerka gulan, xemla wek gulê.

ROSACEAE, *n. pl.* : gul.

ROSACEOUS, *adj.* : gulî.

ROSANILINE, *n.* : boyeya sore.

ROSARIAN, *n.* : gulçîn.

ROSARIUM, *n.* : baxçeyê gulan.

ROSARY, *n.* : baxçeyê gulan, tizbî.

- **BEAD** : liba tizbiyê.

ROSCOE, *n.(sl.)* : tifeng.

ROSE, *n., adj.* : gul, gulebax, pembe, sordale, lorik, qirjale, rolik, ronik, jale.

- **BAY = OLEANDER.**
- **COLOURED** : soravî, gulgulî, gulfam.
- **GARDEN** : gulîzar.
- **QUARTZ** : gulber.
- **QUARTZ FLASK** : gulavdan.
- **STAR** : gulstêr.
- **WILD** : şîlan.

ROSE, *vt.* : gul dan.

ROSE, *p.* **OF RISE** : rabo, helsa, serhilda.

ROSEATE, *adj.* : gulgulî, pembe, sorik, soravî.

ROSE FEVER, *n.* : gulta : texlîtek taya pîşî ye (li biharê yan destpêka havînê belav dibit).

ROSEMARY, *n.* : helezek bêhn xweş e.

ROSE OF JERICHO, *n.* : gula Erîha.

ROSEOLA, *n.* : lîra gulê : nemaze sorikên elmanî.

ROSEOLAR, *adj.* : liriya gulê.

ROSERY, *n.* : gulzar, baxçeyê gulan.

ROSETTA STONE, *n.* : berê Reşîdî yê Misrê.

ROSETTE, *adj.* : pembeyî.

ROSEWATER, *n.* : gulav.

ROSE WINDOW, *n.* : pencerka gulî.

ROSE WOOD, *n.* : guldar : darek taze ye bo kelûpelî bi kar dihêt.

ROSH HASHANAH, *n.* : sala nû ya Cihiyan.

ROSILY, *adv.* : bi gulrengî, bi şadî, bi geşbînî, geşbînkî.

ROSIN, *n., vt.* : şirêz, şirêz kirin.

ROSINED, *adj.* : şirêzkirî.

ROSINING, *n.* : şirêzkirin.

ROSINESS, *n.* : gulîtî, gulbûn.

ROSINY, *adj.* : şirêzî.

ROSTER, *n.* : karname.

ROSTRAL, *adj.* : berzekî, nikildar.

ROSTRATE, *adj.* : berzekî, nikildar, duwangehî.

ROSTRATED, *adj.* : nikilkirî, duwangehî.

ROSIFEROUS, *adj.* : niklî.

ROSIFORM, *adj.* : wek niklî.

ROSTRUM, *n.* : duwangeh, berzek, nikil.

ROSY, *adj.* : gulî, sor, pîvazî, piyazî, pembe, pembeyî, gulfam, algon.

ROT, *n.* : komik, rizîn, genîn, rizî, kevziç, pûsan.

ROT, *vi., t.* : rizîn, rizandin, genî bûn, peritîn.

ROTA, *n.* : ger, siyayiya rêzika zivrînê.

- **METER** : avekîpîv.

ROTARIAN, *n.* : endamê yaneya Rotarî.

ROTARY, *n., adj.* : zivirok, gerînek, xulawe, badek, zivirek.

- **CULTIVATOR** : gêsinê zivirok.
- **ENGINE** : bizwêna (makîne) zivirok.
- **PRESS** : çapa zivirok.
- **WING AIRCRAFT** : helîkopter.

ROTARY CLUB, *n.* : yaneya Rotary (kardar û bazirgan).

ROTATABLE, *adj.* : zivirok, zivirînbar.

ROTATE, *vi., t.* : zivirîn, zivirandin, gerandin.

ROTATED, *adj.* : zivirî, zivirandî, gerandî.

ROTATING, *n.* : zivirîn.

ROTATION, *n.* : gerîn, zivirîn, ger, vizbûn, xulanewe gerger.

- **IN ~** : peyhatî.
- **OF CROPS** : peyhatina derametî.

ROTATIONAL, *adj.* : peyhatî.

ROTATIVE, *adj.* : zivirok, peyhatî(dar).

ROTATOR, *n.* : zivirok, gerîn.

ROTATORY, *adj.* : gerînek.

ROTE, *n.* : her nerît dubare kirin (bê têgehiştin), kevnealavka mûzîqeyî (wek gîtarê), rotîn, dengê şilqavê.

ROTIFER, *n.* : zivirok (canewer).

ROTIFERAL, *adj.* : (rotiferan), zivirokî.

ROTISSERIE, *n.* : birajgeh.

ROTOGRAPH, *n.* : çapkerê girûvir yê hestiyar (rotograf).

ROTOGRAVURE, *n.* : wênegiriya rotografî, çapkirina rotografî.

ROTOR, *n.* : zivirek, sorek.

ROTOTILL, *vt.* : kêlan (kêlîn) (bi gêsinê zivirok).

ROTOTILLER, *n.* : gêsinê zivirok.

ROTTED, *adj.* : rizî.

ROTTEN, *adj.* : genî, rizî, bonkirdû, çirûk, merqandî, pelot, rizok, pûsanî.

ROTTENLY, *adv.* : bi rizokî, rizokkî.

ROTTENNESS : genîtî, kofik, kevziç.

ROTTENSTONE, *n.* : berê rizî : berek qîrî û helweşayî (bo vemiştinê).

ROTTER, *n.* : genî : mirovê êkcar pûç.

ROTTING, *n.* : rizîn.

ROTTWEILER, *n.* : seyek reş û bilind e.

ROTUND, *n., adj.* : kaye, girûvir, xir.

- **ABOUT** : çoleçiv.

ROTUNDA, *n.* : avahiyê girûvir, girûvir.

ROTUNDATE, *adj.* : girûvir.

ROTUNDITY, *n.* : girûvirîtî.

ROTUNDLY, *adv.* : bi girûvirî, girûvirkî.

ROUBLE, ruble, *n.* : yekeya diravê rûsî.

ROUGE, *vt., i.* : sorav kirin.

ROUGED, *adj.* : soravkirî.

ROUGH, *n., adj., adv.* : dirişt, girs, sext, zivr, dijwar, req, qube, hişk, wuşk, qert.

- IN ~ : nêzîk.
- CAST : hinîna seretayî.
- CLOTH : qestûr, palas.
- COUNTRY : gundewariya sext.
- COPY : rûnivîsa zivir.
- DRAFT : rûnivîsa zivir.
- HANDS : destên zivir (karker, pale...).
- LEAF : belgê seretayî.
- LUCK : bextreş.
- MANNERS : bêrewişt, rewişta req.
- RIDER : siwarê yek hespî (hespşikên).
- RICE : şiltîk.
- ROAD : rêya sext.
- SKIN : çermê zivir.
- SEA : deryayê sext (têrpêl).
- TONGUE : zimangez.
- TRANSLATION : wergêrana nêzîk.
- WATER : ava dijwar (rûbar yan derya).
- WEATHER : seqayê dijwar.
- WORDS : peyivên kirêt.
- WORK : karê sext yan dijwar.

ROUGH, *vt.* : zivir kirin, zivir bûn, sereta neqş kirin.

ROUGHAGE, *n.* : xwarina zivir (wek pîne yê).

ROUGHCAST, *n., vt.* : hinîna seretayî, hinîna seretayî kirin.

ROUGHDRY, *vt.* : zuha kirin.

ROUGHEN, *vt., i.* : zivir kirin, girs kirin.

ROUGHENED, *adj.* : zivirkirî.

ROUGHENING, *n.* : zivirkirin.

ROUGH HEW, *vt.* : dar birrîn.

ROUGHISH, *adj.* : zivir yan piçekê har.

ROUGHLY, *adv.* : bi zivirî, nêzîk.

ROUGHNECK, *n.* : mirovê req.

ROUGHNESS, *n.* : xavî, girsîtî.

ROUGHSHOD, *adj.* : solzivirkirî : sola bizmarderketî da ko nehilisit.

- TO RIDE ~ OVER : dijwar bûn.

ROULADE, *n.* : awazên lezînên peyhatî di strana yek birgehî de.

ROULEAU, *n.* (*pl.* ROULEAUX) : gilolk yan pêçeya diravî.

ROULETTE, *n.* : rolêt : yariya qumarê, çerxik.

R(O)UMANIAN, *adj.* : welatî yan zimanê Romaniya.

ROUNCIVAL, *n.* : texlîtek kelîk e.

ROUND, *n., adj. prep., adv.* : girûvir, xir, mat, biger, des.

- IN THE ~ : şanoya hemû nîşan diyar, şanoya ko temaşeker ji hemû rexan dibînin.
- ABOUT : nêzîk.
- SOMEWHERE ~ : dor û berî.
- TO GET ~ A PERSON : xapandin.
- TO GO THE ~ OF : nûçe belav bûn.
- TO GO THE ~ S : nobetdarî kirin.
- TO MAKE ONE'S ~ : nobetdariya xwe kirin.
- TO SLEEP THE ~ : ji diwazdeh saetan pitir nivistin.
- TO TAKE IT ALL ~ : pirs ji hemû layan dîtin.

ROUND, *vt., i.* : zivirîn, çep dan, girûvir bûn, teji bûn (leş), vemiştîn, temam bûn, tekûz bûn.

- TO ~ OFF : temam kirin (şakarî).
- TO ~ ON OR UPON : êrîş kirin.
- TO ~ UP : terş kom kirin, derbeder civandin.

ROUNDABOUT, *n., adj.* : rêya çepûçîrî yan neêkser û xwehr, kevnesaqoyê kurt û teng yê zelam û kurikan, meydana girûvira daborînê.

ROUND ANGLE, *n.* : goşeya temam (360°).

ROUND BREAD, *n.* : sewik, kiloc, gilor, gildî, dorik.

ROUND DANCE, govend.

ROUNDED, *adj.* : lêwerkirî, lêwerhatî.

ROUNDEL, *n.* : girûvir.

ROUNDLAY, *n.* : kurtestran, meqam.

ROUNDER, *n.* : alava girûvir kirinê, destberdayî, bengê mey, tawankar, kulmbazî.

ROUNDHEADED, *adj.* : sergirûvir.

ROUNDHOUSE *n.* : xaniyê girûvir.

ROUNDING, *n.* : lêwerkirin.

ROUNDISH, *adj.* : piçekê girûvir.

ROUNDLET, *n.* : girûvirk, xirik.

ROUNDLY, *adv.* : vebirr, bi eşkerayî.

ROUNDNESS, *n.* : girûvirîtî.

ROUND ROBIN, *n.* : zincîre, skalanameya girûvir îmzakirî, beyaname.

ROUNDSMAN, *n.* : belavker (şîr, nan li ser malan ~) pişkîner, zêrevan.

ROUND SURFACE, *n.* : rûyê girûvir.

ROUND TABLE, *n.* : mêza girûvir.

ROUND TRIP, *n.* : rêwîtî yan geşta çûnûhatina yekrê.

ROUNDUP, *n.* : komkirin (terş), girtin (xelk), kurtî, civandina derbederan yan mişextan.

ROUNDWORM, *n.* : kirmê girûvir (di nav rîvîka mirovî de).

ROUP, *n., vt.* : herac, herac kirin yan firotin.

ROUPY, *adj.* : nesax (mirîşk).

ROUSE, *n.* : rakirin, hişyarkirin, arandin.

ROUSE, *vt.* : rakirin, hişyar kirin, arandin, har kirin, xwê kirin (masî).

ROUSED, *adj.* : harkirî, arandî.

ROUSEMENT, *n.* : harkirin, arandin, şarandin, sergermkirin.

ROUSER, *n.* : harker, hişyarker, aranker.

ROUSING, *n.* : harkirin, arandin, fêt, fêtdan, belqitîn.

ROUST ABOUT, *n.* : pale, karkerê benderan.

ROUTE, *n., vi., t.* : şikestin (şikandina leşkerî), şikandin (neyarî yan dijminî).

ROUTE, *n.* : sêpil, çûndin, rê, rêga, rêge, kêş.

- **EN ~** : li ser rê ye.
- **MARCH** : rêya rêveçûnê.

ROUTE, *vt.* : hinartin jî yan ser rêyekê.

ROUTED, *adj.* : bi rêvekirî, hinartî.

ROUTER, *n.* : hespê peşedirêj.

ROUTINE, *n.* : rotîn, asayî, karê rotînî.

ROUTING, *n.* : birêkirin, hinartî.

ROUTINISM, *n.* : rotîniti.

ROUTINIST, *n.* : rotînkar.

ROUTINIZATION, *n.* : rotînîkirin (kar).

ROUTINIZE, *vt.* : rotînî kirin (karî).

ROUTINIZED, *adj.* : rotînîkirî.

ROUTINIZING, *n.* : rotînîkirin.

ROUX, *n.* (*pl.* **ROUX**) : têkiliya bezî nemaze nîvişkî û arî bo çêkirina êxiniyan.

ROVE, *n., vt.* : koçerî, geran, teriqîn.

ROVED, *adj.* : teriqî.

ROVER, *n.* : gerok, deryagir, gerîde, geral.

ROVING, *n.* : geran, derodero, koçerî.

ROW, *n.* : qerqeşe, sîle, rêz, şelpî.

- **A HARD ~ TO HOE** : erkê zehmet yan sext.
- **TO GET INTO A ~** : lê ketin, cerenîx kirin.
- **TO MAKE (PICK UP) A ~** : şer kirin.

ROW, *vi., t.* : şelpî kirin, sewl lê dan.

ROWAN, *n.* : texlîtek tûşembî.

ROWAN TREE, *n.* : darê tûşembiyê.

ROWBOAT, *n.* : belema şelpîkirinê.

ROWDILY, *adv.* : bi reqî, reqkî.

ROWDINESS, *n.* : çelonîtî.

ROWDISH, *adj.* : piçekê çelon.

ROWDISM, *n.* : çelonîtî.

ROWEL, *n., vt.* : zixtika rikêbê, zixt lê dan.

ROWEL(L)ED, *adj.* : zixt lêdayî.

ROWEN, *n.* : encam.

ROWING, *n.* : şelpîkirin, xerandin, sewllêdan.

ROW LOCK, *n.* : alava girtina şelpiya belemê.

ROYAL, *n., adj.* : şah, şahî, qiral, qiralî, şahane, şahanî.

- **COURT** : şanîşîn.
- **RESIDENCE** : şanîşîn.
- **ROAD** : şahrê.

ROYAL BLUE, *n.* : şînşahî : rengê şînê erxiwanî.

ROYALIST, *n.* : şahî : piştgîrê hukmê şahîtiyê.

ROYAL JELLY, *n.* : hingvînê şahî.

ROYALLY, *adv.* : bi nayabî, bi şikûdarî, şikûdarkî.

ROYAL PALM, *n.* : darqespa şahî (darek dirêj e her bo xemlê ye).

ROYAL PURPLE, *n.* : erxiwaniyê şahî.

ROYALTY, *n.* : şahîtî, qiralîtî.

ROYSTON, *n.* ~ **CROW** : qira gewr yan kulavkirî.

RUB, *n.* : gemirandin, vemiştin, zehmetî, giriftarî, tirane, kosp, têxurîn, rexneya gezdar, xurîn.

RUB, *vt., i.* : gemirandin, hesîn, enirîn, rakirin, rabûn, xurandin, enirandin, têxurîn, arandin, vemiştin.

- **TO ~ DOWN** : gemirandin (leş).
- **TO ~ IN** : gotina nexoş dubare kirin.
- **TO ~ OFF** : rakirin yan rabûn bi xurînê yan gemirandinê.
- **TO ~ THE RIGHT WAY** : dilniya kirin, hedar kirin.
- **TO ~ THE WRONG WAY** : enirandin, şepirze kirin.

RUB-A-DUB, *n., vi.* : dengê deholê, dengê deholê çêkirin (wek dehol lê dan).

RUBATO, *n.* : mûzîqeya lezguhor.

RUBBED, *adj.* : gemirandî, pişaftî, hilpişaftî, sotkirî.

RUBBER, *n.* : gemirvan, lastîk.

- **CEMENT** : likana lastîkî.
- **CHECK** : çekê vegerandî (bê dirav).
- **STAMP** : mohra lastîk.

RUBBER, *vt.* : serê xwe zivirandin.

RUBBERIZE, *vt.* : lastîk kirin.

RUBBERLIKE, *adj.* : lastîkî, wek lastîkê.

RUBBERNECK, *n.* : gerok, zanxwaz.

RUBBER-STAMP, *vt.* : mohr kirin, zû pêk hatin.

RUBBERY, *adj.* : lastîkî.

RUBBING, *n.* : hesîn, sotkirin, gemirandin, têdan.

RUBBISH, *n.* : zibil, gilêş, paşmawe, xol, pîsîtî.

RUBBISHLY, *adv.* : bi gilêşî, gilêşkî.

RUBBLE, *n., vt.* : kavil, koma şikeste ber yan mêtalan, kavil kirin.

RUBBLED, *adj.* : kavilkirî.

RUBBLEWORK, *n.* : avahiyê kavil.

RUBBLING, *n.* : kavilkirin.

RUB DOWN, *n.* : gemirandin.

RUBE, *n.* : gewc, gundiyê xirpo.

RUBEFACIENT, *n., adj.* : sorker (bo çermî).

RUBEFACTION, *n.* : sorbûn.

RUBEFY OR RUBIFY, *vt.* : sor kirin.

RUBELLA, *n.* : sorikên elmanî.

RUBELLITE, *n.* : roblît : tormalînê sor (berê nîv hêja).

RUBEOLA, *n.* : sorik, sorikên elmanî.

RUBICON, *n.* : sinorê ko mirov derbaz dibit berî ko derbest bibit karî, serketin li yariyê berî neyar sed xalikan bibit (pikit : leyiztina kaxezan).

RUBICON, *vt.* : neyar şkandin berî ko sed xalikan bibit (leyiztina pikit).

RUBICUND, *adj.* : sor yan ber sorî ve.

RUBICUNDITY, *n.* : sorîtî.

RUBIDIUM, *n.* : robidyom : hêmanek mêtalî, reng zîv wek potasyomî ye.

RUBIGINOUS, *adj.* : rengjingar.

RUBIOUS, *adj.* : sor, sorê tarî.

RUBLE, *n.* : rûbil : yekeya diraviya Rûsî.

RUBRIC, *n.* : navnîşana jêbirrî (beş), navnîşan, nav, fermana rêvebirina nivêjan, pîroz, bi sorî çapkirî.

RUBRICAL, *adj.* : sor, sornîşankirî, taybet nivîsî yan çapkirî.

RUBRICALLY, *adv.* : bi sorî, sorkî.

RUBRICATE, *vt.* : sor nîşan kirin, sor kirin.

RUBRICATED, *adj.* : sorkirî, sornivîsî.

RUBRICATING, *n.* : sorkirin.

RUBRICATION, *n.* : (sor) nîşankirin.

RUBRICATOR, *n.* : sorker, (sor)nîşanker.

RUBRICIAN, *adj.* : sorî.

RUBRICANISM, *n.* : sorîtî.

RUBRICANIST, *n.* : sorker.

RUBRICISM, *n.* : sorîtî.

RUBRICIST, *n.* : sorker.

RUBUS, *n.* : texlîtek tû ye.

RUBY, *n., adj.* : yaqût, berê giran (bihadar).

RUBY, *vt.* : sor heş kirin.

RUCHE, *n.* : guliya qeytanan, kiloşê cilan.

RUCHED, *adj.* : gulîkirî, kiloşkirî (cil).

RUCHING, *n.* : gulîkirin, kiloşkirin.

RUCK, *n.* : koma yarîkerên (bezok) ji pêşbeziyê derketîn.

RUCK, *n.* : tegere, qurmiçîn.

RUCKLE, *vt., i.* : qurmiçîn.

RUCKLE, *n., vi.* : xirxira berî mirinê, xirxir kirin.

RUCKSACK, *n.* : parzîn.

RUCTION, *n.* : lêketin, tatêl, harî.

RUDD, *n.* : texlîtek masî ye.

RUDDER, *n.* : dezgîn, rêber, arasteker (gemî).

RUDDER POST OR RUDDER STOCK, *n.* : stûnka dezgînî.

RUDDINESS, *n.* : soratî, geşîtî, gulîtî.

RUDDLE, *n.* : sorboye (oksîdê asinîk).

- **MAN** : sorboyefiroş.

RUDDLE, *vt.* : sor kirin.

RUDDLED, *adj.* : sorkirî.

RUDDLING, *n.* : sorkirin.

RUDDOCK, *n.* : sîngsor (balinde ye).

RUDDILY, *adv.* : bi geşî, geşkî.

RUDDY, *adj.* : gulfam, algon, dêhmsor, guli, sor, ber sorî ve.

- **DUCK** : qazek emerîkanî ye.

RUDDY, *vt.* : geş bûn.

RUDE, *adj.* : req, rûqayim, hov, zimandirêj, bê avrû, rûhişk, nîvekîr.

RUDELY, *adv.* : bi rûqayimî, rûqayimkî.

RUDENESS, *n.* : rûqayimîtî, bê arîtî, zimandirêjî, rûhişkîtî, reqîtî, xavî, bê avrûyîtî.

RUDERAL, *n., adj.* : firîzî.

RUDERY, *n.* : rûqayimî.

RUDIMENT, *n.* : sereta, destpêk, şûn yan şopa endamekê.

RUDIMENTAL, *adj.* : seretayî, şopî.

RUDIMENTARILY, *adv.* : bi seretayî, seretakî.

RUDIMENTARINESS, *n.* : seretayîtî, şopîtî.

RUDIMENTARY, *adj.* : seretayî, şopî, paşketî.

RUDISH, *adj.* : piçekê rûqayim.

RUE, *n.* : jûvanî, poşmanî, espend, spend : helezek (teraş) pijişkî belg tale bêhndare berê bo dermanî bi kar dihat.

RUED, *adj.* : jûvan, poşman, jûvanbûyî, poşmanbûyî.

RUEFUL, *adj.* : mirîto, perûş, poşman.

RUEFULLY, *adv.* : bi mirîtoyî, mirîtokî.

RUEFULNESS, *n.* : mirîtoyîtî.

RUEING, *n.* : jûvanbûn, poşmanbûn.

RUFESCENT, *adj.* : ber sorî ve.

RUFF, *n.* : masiyek rûbarî ye, stûyî, dûvekê perî li dor stûyê balindeyî, balindeyek avî ye, havêtina kaxeza feydekirinê.

RUFF, *vt., i.* : kaxeza feydekirinê havêtin.

RUFFED GROUSE, *n.* : balindeya dûvekî ya emerîkanî.

RUFFIAN, *n., adj.* : hov, dirremirov.

RUFFIANISM, *n.* : dirrîtî, hovîtî.

RUFFIANLY, *adj.* : dirr, hov.

RUFFLE, *n.* : şaşî, perîşanî, şepirzeyî.

RUFFLE, *vt., i.* : şaş bûn, şepirze bûn, perîşan bûn, enirîn, enirandin, şepirze kirin.

RUFFLED, *adj.* : gij.

RUFFLING, *n.* : perîşankirin.

RUFOUS, *adj.* : ber sorî ve.

RUG, *n.* : berrik, merş, şemilk, şevilk, cacim, tej.

- **MAKER** : berrikçêker, berrikvan.
- **SELLING** : berrikfiroş.

RUGA, *n.* : qurmiçîn yan pêça rûvîstûrî.

RUGATE, *adj.* : qurmiçî.

RUGBY, *n.* : regbî : texlîtek tepka pêyan e (bi dest û pêyan dileyizin).

RUGGED, *adj.* : sext, zazor, gever.

RUGGEDIZE, *vt.* : qayim kirin.

RUGGEDIZED, *adj.* : qayimkirî.

RUGGEDIZING, *n.* : qayimkirin.

RUGGEDNESS, *n.* : sextîtî.

RUGGER, *n.* (*sl.*) : tepka pêyan (regbî).

RUGOSE, *adj.* : qurmiçî.

RUGOSELY, *adv.* : bi qurmiçînî, qurmiçînkî.

RUGOSITY, *n.* : qurmiçîtî.

RUGOUS, *adj.* : qurmiçî.

RUGULOSE, *adj.* : hûr (qurmiçî).

RUIN, *n.* : kavil, herifîn, ruxan, wêran, malxirabî, şûnwar.

RUIN, *vt.* : kavil kirin, têk dan, wêran kirin, têk çûn.

RUINATE, *adj.* : herifî, kavil.

RUINATE, *vt.* : wêran kirin, kavil kirin, herifandin.

RUINATION, *n.* : felişandin, ruxandin, kavilkirin, kembax(kirin).

RUINED, *adj.* : kavilkirî, wêrankirî, zehîkirî, zehî, wêran, berbad, herifî.

RUINER, *n.* : wêranker.

RUING, *n.* : jûvanbûn, poşmanbûn.

RUINING, *n.* : wêrankirin, zehîkirin.

RUINOUS, *adj.* : herifî, kavil, wêrankirî.

RUINOUSLY, *adj.* : bi wêrankerî.

RUINOUSNESS, *n.* : kavilîtî, wêranîtî.

RULE, *n.* : hukimdarî, rajorî, axayî, axatî, rêsa, serdestî, rêzan, destûr, binke.

- **AS A ~** : wek rêzikê yan destûrî.

- **TO WORK TO ~** : êkcar destûrî yan rêzikî kar kirin (ko bêzarî ye : destê xwe nahavêt tiştek dî ji (karê xwe yê) erkî pê ve.

RULE, *vt., i.* : hukim kirin, biryar dan.

- **TO ~ SOMETHING OFF** : cuda kirin (bi hêlekê).

- **TO ~ SOMETHING OUT** : agehdar kirin yan biryar dan ko çênabit.

RULED, *adj.* : hukimkirî, biryardayî.

RULE OF THREE, *n.* : destûra sêyan, rêzika sêyan.

RULE OF THUMB, *n.* : rêzika beranî : pîvan yan hejmartina nêzîk, biryardan ji serhatiyê.

RULER, *n.* : fermanrewa, raste, rastek, kardar, fermandar, xunkar, karbidest, homan.

RULING, *n.* : fermandan, biryardan, hukimkirin.

- **CLASS** : çîna rajor.

RUM, *n.* : rem : şerabek meyî, zehmet, gêre.

- **RUNNER** : qaçaxê vexwarinê nemaze remê, gemiya vê qeçaxiyê.

RUMANIAN, *n., adj.* = **ROMANIAN.**

RUMBA, *n.* : texlîtek govenda reşên Kûba ye.

RUMBLE, *n.* : bêzariya gîştî yan gelemperî, gurijîn, reqreq, lêketina kolanê nemaze di navbera cerde-herzekaran yan cimêran de.

- **OF WATER** : xolexol.

RUMBLE, *vi., t.* : reqreq kirin.

RUMBLED, *adj.* : reqreqkirî.

RUMBLING, *n.* : reqreq, reqreqkirin.

- **SOUND** : gimîn.

RUMBUSTIOUS, *adj.* : dengedengî, qîrûqîjî, galegotî.

RUMBUSTIOUSLY, *adv.* : bi galegotî yan reqreqî.

RUMBUSTIOUSNESS, *n.* : galegotîtî, reqreqîtî.

RUMBLY, *adj.* : reqreqî.

RUMEN, *n.* : ûrk, çilpirt.

RUMINAL, *adj.* : ûrkî.

RUMINANT, *adj.* : kayî.

RUMINANTLY, *adv.* : bi kayî.

RUMINATE, *vt., i.* : kayîn, vekayîn, raman kirin.

RUMINATED, *adj.* : vekayî.

RUMINATING, *n.* : vekayîn.

RUMINATION, *n.* : kayîn, ramankirin, karêj.

RUMINATIVE, *adj.* : kayîndar.

RUMINATIVELY, *adv.* : bi kayîndarî, kayîndarkî.

RUMINATOR, *n.* : kayî, conker, xunendek.

RUMMAGE, *n.* : lêgeran, sehkirin, pişkinîn, tiştên têvelên têkil, xurde bo firotinê.

- **SALE** : xurdefiroşî.

RUMMAGE, *vt., i.* : vekolîn, lê geran (gerîn), hûr seh kirin, peyda kirin (bi vekolînê).

RUMMAGED, *adj.* : lêgeranî, lêgerayî, pişkinînî.

RUMMAGER, *n.* : sehker.

RUMMAGING, *n.* : lêgeran (di nav tiştan de).

RUMMER, *n.* : tirarê mezin.

RUMMY, *adj.* : gêre, seyr.

RUMOUR, *n.* : çirçir, gotegot.

- **MONGER** : çirçirgêr, gotegotkar.

RUMOUR, *vt.* : çirçir kirin.

RUMOURED, *adj.* : gotegotkirî, çirçirkirî.

RUMOURING, *n.* : gotegotkirin, çirçirkirin.

RUMP, *n.* : kemax, terkî, qarçik, ran.

- **STEAK** : parçegoştê ranê çêlê.

RUMPLE, *n.* : qurmiçîn, pêjî.

RUMPLE, *vt., i.* : qurmiçîn, qurmiçandin.

RUMPLED, *adj.* : qurmiçî.

RUMPUS, *n.* : tevdan, qîrûqîj.

RUMPY, *n.* : kitika bêdûvik ya Manks (girava Man).

RUN, *n.* : bez, bezîn, rakirdin, xar.

- **ON THE ~** : revî.

- **AWAY** : revî.

- **OFF** : gera biryar (helbijartin), ava baranê.

RUN, *vi., t.* : revîn, bezîn, kirin xar, geran (gerîn), pena kirin, kêm derkirin, (pêşbirkeya) helbijartinê kirin (navkirin bo helbijartinê).

- **TO ~ ABOUT** : geran (gerîn) (ji derekê çûn derek dî).

- **TO ~ ALONG** : koçer bûn, çûn, derkeftin.

- **TO ~ ACROSS** : vêkeftin (helketinî).

- **TO ~ AFTER** : şeqandin, bi dûv keftin.

- **TO ~ AGAINST** : nakok bûn, berhelist yan dijî kesekê bûn (helbijartin).

- **TO ~ A TEMPERATURE** : ta girtin, ta hatin.

- **TO ~ AWAY** : direvit, baz dan.

- **TO ~ AWAY WITH** : dizîn, têçûn, enirîn, bi ser keftin (şanogerî).

- **TO ~ BACK** : hizra berê kirin.

- **TO ~ DOWN** : rawestîn, westîn, sivik kar kirin.

- **TO ~ DRY** : zuha bûn, hişk bûn.

- **TO ~ FOR IT** : revîn.

- **TO ~ IN** : girtin û bend kirin, hêdî hajotîn.

- **TO ~ INTO** : vêkeftin, deyndar bûn.

- **TO ~ ITS COURSE** : pêve çûn.

- **TO ~ OFF** : revîn, dizîn, vala kirin.

- **TO ~ ON** : berdewam kirin, li dor geran (gerîn), pêve çûn, xiftin.

- **TO ~ OUT** : kêm bûn, gehîştin dûmahiyê, qerimîn.

- **TO ~ OVER** : bi ser de çûn, bi ser ve çûn.

- **TO ~ ROUND** : seredanek lezîn kirin.

- **TO ~ SHORT** : kêm bûn.

- **TO ~ SHORT OF** : dirav neman yan kêm bûn.

- **TO ~ THROUGH** : zehê kirin (saman), lê dan (şûrî).

- **TO ~ TO** : gehîştin.

- **TO ~ TO FAT** : qelew diyar bûn.

- **TO ~ TO RUIN** : kavil bûn, herifîn.

- **TO ~ UP** : zû werar bûn, bilind bûn, dadan.

- **TO ~ UP AGAINST** : vêkeftin.

- **TO ~ UPON** : li dor mijadî geran (gerîn).

- **TO ~ WILD** : wek bivêtin kirin.

RUN, *adj. (pp.)* : bazda.

RUNABOUT, *n.* : gerok.

RUNAROUND, *n.* : xapîn, nivîsîna tîprêzkirî.

RUNAWAY, *n., adj.* : revîn, revî, bezîn.

RUNCIBLE, *n.* (~ spoon) : çetelê wek kefçikê kevanekirî.

RUNCINATE, *adj.* : didan xîzarî.

RUNDALE, *n.* : hevdagîriya zeviyê.

RUNDLE, *n.* : pêpikê pêstirkê.

RUNDLET, *n.* : birmîlk (birmîlê biçûk).

RUN-DOWN, *n.* : kurtî, kurte.

RUNE, *n.* : kevnetîpa elfabeya skandînavî, dabeşkirina helbesta finlendî, torkê mexolî.

RUNG, *n.* : pêpik (pêstirka guhêzbar).

RUNIC, *adj.* : bi kevnetîpên skandînavî neqşkirî.

RUN-IN, *n.* : lêketin, nivisîna serbar bo çapê.

RUNLET OR RUNNEL, *n.* : celal.

RUNNER, *n.* : bezok, beza, rake, hevber.

RUNNER-UP, *n.* : pêşbezê duwemderketî.

RUNNING, *n.* : bez, rewan, bazdan, revende, herane, bezîn.

- **TO BE IN THE ~** : hîvî kirin ko bi ser bikevit (pêşbirke, helbijartin).
- **TO BE OUT OF THE ~** : bêhîvî.

RUNNING AGROUND, *n.* : kêlekdan.

RUNNING BOARD, *n.* : çamlix (otomobil).

RUNNING GEAR, *n.* : gêr (otomobil).

RUNNING HEAD (LINE), *n.* : navnîşana dubare.

RUNNING KNOT, *n.* : girêka hilisînî (bo firehkirina kunika werîsî).

RUNNING MATE, *n.* : hevalê rêvingî.

RUNNING TITLE, *n.* : navnîşana kitêbê (li ser rûpelan).

RUNNY, *adj.* : delînî, dilopdar.

RUN-OF-THE-MILL, *n.* : asayî, navincî.

RUN-OF-THE-MINE, *n.* : asayî, navincî.

RUN-OVER, *n.* : serbar.

RUNOVER, *n.* : mayeyê serbar.

RUNT, *n.* : ga, çêl (biçûk).

RUN-THROUGH, *n.* : xwendina bilez.

RUN WAY, *n.* : dahatingeh, bezgeh, rêfirîn, rawerî, firgeh.

RUPEE, *n.* : rupî (dirav).

RUPTURE, *n.* : pêbirrîn, çirrîn, şelqî, birrîn, dirran.

RUPTURE, *vt., i.* : şikestin, peqîn, çirrandin.

RUPTURED, *adj.* : çirrandî.

RUPTURING, *n.* : çirrandin.

RURAL, *adj.* : gundî, ladêyî, gundewarî.

- **AREA** : kewşen.

RURALITY, *n.* : gundewarî(tî).

RURALIZE, *vt.*, i. : gundewarî kirin.

RURBAN, *adj.* : gundî, bajêrî.

RURIDECANAL, *adj.* : pêwendîdarê dêr yan oldarê gundî.

RURITANIA, *n.* : şahîtiyek aşopî li Ewropaya navîn.

RUSA, *n.* : asikek mezin e.

RUSE, *n.* : dek, laban, leban, xap, finaz, hiner.

RUSH, *n., adj.* : rakeş, êrîş, birh, berbûn, lez, zûkanî, tekan, zûyetî, zûyîtî.

- **HOUR** : demê apor (ji ber pêkve derketinê).
- **WITH A ~** : zû, ji nişkî.

RUSH, *vt.*, i. : lezandin, lez kirin, bezîn.

- **TO ~ AT** : êrîş kirin.
- **TO ~ DOWN** : bi lez hatin xarê.

RUSH CANDLE OR RUSH LIGHT, *n.* : mûmika gezî (ron dikin).

RUSHER, *n.* : lezker.

RUSHING, *n.* : lezkirin, berbûn, birh, rakeş, lezgîn.

RUSHY, *adj.* : lezîn.

RUSK, *n.* : parçeyek nan (texlîtek biskît e).

RUSSET, *n.* : sorbelek, mor, al, soravî, şerabî.

RUSSET(T)ING, *n.* : parçeya zivra meyweyî.

RUSSIA, *n.* : Rûsya.

RUSSIAN, *n., adj.* : Rûs, welatî yan zimanê rûsî.

RUSSOPHILE, *adj.* : hez rûs, rûshiz.

RUSSOPHOBE, *adj.* : dij (nehez) rûs.

RUSSOPHOBIA, *n.* : dij rûsî.

RUST, *n.* : jeng, jingar, zeng.

RUST, *vi., t.* : jingar girtin.

RUSTED, *adj.* : jingarî, jingargirtî.

RUSTIC, *adj.* : zivir, gundî, cotyar, sade, gewc, sakar.

RUSTICAL, *adj.* : sadeyî, gewcî.

RUSTICALLY, *adv.* : bi sadeyî, sadekî.

RUSTICITY, *n.* : sadeyîtî, gundiyatî.

RUSTICATE, *vi., t.* : (gundî) dijît.

RUSTICATED, *adj.* : (gund) jiyanî.

RUSTICATING, *n.* : (gund) jiyan.

RUSTICATION, *n.* : gundîbûn.

RUSTICATOR, *n.* : gundî.

RUSTILY, *adv.* : bi jengî.

RUSTINESS, *n.* : jengîtî.

RUSTLE, *n.* : reqreq, reqreqîn, sirwe, şingîn, xuşîn, lirfe.

RUSTLE, *vi., t.* : şingîn kirin, xuşîn kirin, lirfe kirin.

RUSTLED, *adj.* : şingînkirî, lirfekirî.

RUSTLER, *n.* : xuşînkar, lirfekar.

RUSTLINGLY, *adv.* : bi şingînî, bi lirfeyî, şingînkî.

RUSTY, *adj.* : jengî, jengarî, jingarî, jengdar.

RUT, *n.* : lûç, kendek, kend, kûr, çal, best, rê, cok, kelş, rotîn, gera perînê (li nik canewerî, belqitîn, fêtkarî).

RUT, *vt., i.* : kolîn, kelişîn, perîn.

RUTABAGA, *n.* : şêlima zer.

RUTH, *n.* : dilovanî.

RUTHENI OR RUTHENIOUS, *adj.* : ratinyomî : pêwendîdarê rotinyom (hêman).

RUTHENIUM, *n.* : rotinyom : hêmanek mêtalî qetlaz e.

RUTHERFORD ATOM, *n.* : gerdileya Rezerfordî : gerdîleyek kakil biçûk û erênî ye ko elektironên wek stêrên gerok li dor dizivirin.

RUTHERFORDIUM, *n.* : hêmanek kîmyayî tîrêjdar e.

RUTHFUL, *adj.* : dilovan.

RUTHFULLY, *adv.* : bi dilovanî, dilovankî.

RUTHFULNESS, *n.* : dilovanîtî.

RUTHLESS, *adj.* : dilreq, bêbezeyî, bêdilovanî.

RUTHLESSLY, *adv.* : bi dijwarî, bêbezeyî yan bêdilovanî.

RUTHLESSNESS, *n.* : dilreqîtî, dijwarîtî, bêdilovanîtî.

RUTILANT, *adj.* : geş, teyisî.

RUTILE, *n.* : rotîl : oksîdê Titanyom.

RUTTED, *adj.* : çalkirî, kûrkirî.

RUTTING, *n.* : çalbûn, kûrbûn, çalkirin.

RUTTISH, *adj.* : fêtkar, belqitînî.

RUTTY, *adj.* : kûrikî, çalikî, kelişkî.

R-VALUE, *n.* : pîvana gîrokirina têraçûna germiyê.

RYE, *n.* : cehder, cehdarî (helez), axayê qereç.

- **BREAD** : nanê cehderî.
- **GRASS** : giyacehder.
- **WHISKY** : wiskiya cehderî.

RYAKAN, *n.* : meyxaneya japonî.

RYOT, *n.* : cotyar, çandiyar.



S, s : ês : tîpa bîstem ya elfabeya Înglîzî.

SABA, *n.* " tune " : awaza seba.

SABADILLA, *n.* : helezek meksîkî belgdirêj û tovtal e.

SAB(A)EAN, *n., adj.* : welatiyê kevne Yemenê.

SABAISM, *n.* : stêrperistin.

SABBATARIAN, *n., adj.* : Cihiyê ko roja şembiyê vesihîn bo peristinê.

SABBATH, *n.* : roja şembiyê : roja vesihînê li nik Cihiyan û hindek feleyan, roja yekşembê : roja vesihîn û peristinê li nik feleyan, demê vesihînê.

SABBATIC(AL), *adj.* : şembiyî yan yekşembiyî, pişoyî, vesihînî.

SABBATICAL YEAR, *n.* : sala vesihînê li nik Cihiyan (her sala heftem), destûr yan rêdana mamostayî (bi asayî her sala heftem bo vesihîn, rêbarî yan vekolînê).

SABBATIZE, *vt., i.* : şembiyî kirin, roja şembiyê girtin.

SABEAN, *n., adj.* : sabiî, mendaî.

SABICU, *n.* : darê hêja yê Kûbayî.

SABIN, *n.* : yekeya mêjtina dengî.

SABLE, *n., adj.* : reş, cilên behiyê, reş girêdan.

- **ANTELOPE** : pezkûviyek mezin û şax qayim, nêr û reş e.

SABLED, *adj.* : reşkirî, behîkirî.

SABLY, *adv.* : bi reşî, behî yan şînî, şînkî.

SABOT, *n.* : pêlava darî.

SABOTAGE, *n.* : helweşandin, têkdan.

SABOTAGE, *vt. i.* : helweşandin, têk dan.

SABOTAGED, *adj.* : helweşandî.

SABOTAGING, *n.* : têkdan, helweşandin.

SABOTEUR, *n.* : têkder, kavilker.

SABRE, *n.* : şûrê siwarî, kahor.

- **TOOTHED** : didanşûr (çiq).

SABRE, *vt.* : lê dan, kuştin (bi şûrê siwarî).

SABRED, *adj.* : kuştî (bi şûrî).

SABRING, *n.* : kuştin (bi şûrî).

SABULOUS, *adj.* : xîzî (xîzê di nav endamên mîzê de).

SABURRA, *n.* : madeyê genî yê di nav ûrkî de, rix.

SAC, *n.* : telîs, çilek, çilkek.

SACATON, *n.* : giyayek Emerîkanî ye.

SACCADE, *n.* : kurtelivîna lerîna çavî.

SACCADIC, *adj.* : pêwendîdarê kurtelivîna lerîna çavî.

SACCATE, *adj.* : kîskî, berîkî.

SACCHAR-, SACCARI OR SACCARO-, *pref.* : pêşgir e ko şekir e.

SACCHARATE, *n.* : xwêya tirşiya şekirî.

SACCHARIC, *adj.* : tirşiya şekirê.

SACCHARIDE, *n.* : şekira sade.

SACCHARIFICATION, *n.* : şekirkirin.

SACCHARIFORM, *adj.* : şekirî (wek şekirî).

SACCHARIFY, *vt.* : şekir kirin (guhorînt şekirê).

SACCHARIMETER, *n.* : şekirpîv.

SACCHARIN, *n.* : pêkhatiyek belûrî ji şekira şirîntir e.

SACCHARINE, *adj.* : şekirî.

SACCHAROID, *adj.* : dêndikî wek şekirê.

SACCHAROMRTER, *n.* = **SACCARIMETER.**

SACCHAROSE, *n.* : şekira asayî.

SACCIFORM, *adj.* : wek kîskê.

SACCULAR, *adj.* : kîskî.

SACCULATE(D), *adj.* : kîsdar.

SACCULATION, *n.* : kîsbûn.

SACCULE, *n.* : kîsk, himbank.

SACERDOCY, *n.* : oldarîtî.

SACERDOTAGE, *n.* : oldarîtî : dewleta li bin destê oldaran.

SACERTOTAL, *adj.* : oldarî.

SACERDOTALISM, *n.* : oldarîtî.

SACHEM, *n.* : serokê bala yê hindek hozên Hindokên sor.

SACHET, *n.* : kîskê biçûk yê bêhnxweş (besteyek ji) bêhnxweşiya hişk (ko dikin nav cilan de).

SACK, *n.* : telîs, torbe, tor, mêşok, cemtêr, têrr, cem, bendik, cewal, şelandin, talankirin.

- **CLOTH** : parçeperûkê zivir yê ji mûyê hêştirê çêkirî.
- **COAT** : saqoyê telîsî (kurt û fireh).
- **LARGE ~** : têrr.
- **RACE** : pêşbirkeya telîsan, pêşbezîna telîsan.
- **(SMALL)** : tûrik.
- **TO GET THE ~** : hatin derxistin.
- **TO GIVE THE ~** : derxistin (ji karî).

SACK, *vt.* : talan kirin, derxistin (ji karî), kirin nav telîsî de.

SACKBUT, *n.* : lerek.

SACKFUL, *adj.* : teji telîsekê.

SACKING, *n.* : guş.

SAQUE, *n.* : saqoyê zarokî.

SACR-, *pref.* : pêşgir e ko pîroz e yan paşî ye.

SACRAL, *adj.* : pîroz, kemaxî, kortîxî.

SACRAMENT, *n.* : raza pîroz, qurbana pîroz.

SACRAMENT, *vt.* : sond xwarin.

SACRAMENTAL, *n., adj.* : razî, nihîniya pîroz, nepeniya pîroz.

SACRAMENTALISM, *n.* : razîtî, baweriya nihîniya pîroz.

SACRAMENTALIST, *n.* : bawermendê nihîniya pîroz.

SACRAMENTALLY, *adv.* : bi nepeniya pîrozî.

SACRAMENTARIAN, *adj.* : mandelker (yê hazirbûna rasta leş û xwîna Îsa pexemberî).

SACRARIUM, *n.* : penageha dêrê.

SACRED, *adj.* : pîroz.

- **BOOK** : kitêba pîroz.
- **COLLEGE** : civata pîroz.
- **COW** : çêla pîroz : mirovê di ser rexnê re.
- **DUTY** : erkê pîroz.
- **HEART** : dilê pîroz (Îsa pêxember).
- **NUMBER** : (jimara pîroz (wek 7).
- **RIGHT** : mafê pîroz.
- **WRITINGS** : nivîsînên pîroz.

SACREDLY, *adv.* : bi pîrozî, pîrozkî.

SACRAMENTARISM, *n.* : mandelkerîtiya hazirbûna rast ya leş û xwîna Îsa pêxemberî.

SACREMENTARIST, *n.* : mandelker : yê hazirbûna rast.

SACREDNESS, *n.* : pîrozîtî.

SACRIFICE, *n.* : xwebexşkirin, xwebexşîn, qurban.

SACRIFICED, *adj.* : gorîkirî.

- **SELF ~** : cangorî, xwebexşîn, xwequrbanî.

SACRIFICE, *vt., i.* : gorî kirin, qurban kirin.

SACRIFICIAL, *adj.* : gorîgirinî, qurbanîkirinî.

SACRIFICIALLY, *adv.* : bi gorîkirinî.

SACRIFICING, *n.* : gorîkirin.

SACRILEGE, *n.* : pîskirina pîroziyan.

SACRILEGIOUS, *adj.* : pîskiriniya, pîroziyan.

SACRILEGIOUSLY, *adv.* : bi pîskirinî.

SACRILEGIOUSNESS, *n.* : pîskirinîtî.

SACRILEGIST, *n.* : pîskerê pîroziyan.

SACRIST, *n.* : erkdarê parastina amanên pîroz.

SACRISTAN, *n.* : parêzerê jora pîroziyan (li dêrê).

SACRISTY, *n.* : jora pîroziyan û cilên oldaran.

SACROSANCT, *adj.* : bêqam pîroz.

SACROSANCTITY, *n.* : pîrozîtî.

SACRUM, *n.* : kortîx, hestiyê kemaxî.

SAD, *adj.* : kovan, dilgîr, melûl, serkiz, xemgîn, mirîto, dilkovan, mirûç, mirûs, neşa, xemdar, xembar, xemkêş, xemxwer, mat, pest.

- **SONG** : pehîzok, payizok.

SADDEN, *vt.* : gerandin, mirîto kirin.

SADDENED, *adj.* : qehro, xemgirtî, xemgînkirî, nuhurandî.

SADDENING, *n.* : qehirandin, nuhurandin.

SADDISH, *adj.* : piçekê xembar.

SADDLE, *n.* : xurc, zîn, kurtan, palan, menegî, qerpûz.

- **BACK** : pişîzîn, qaşazîn.
- **BAG** : benok, xurcezîn, xurc, têrr, kurtan, xurcik.
- **CLOTH** : perûkê ser (yan) palan.
- **COVER** : serpalan.
- **GIRTH** : kejî, teng, qoş.
- **HORSE** : hespê siwarbûnê.
- **IN THE ~** : serdest, desthelatdar.
- **MAKER** : zînker (zînçêker).
- **TIE ~** : teng, qoş.
- **TRAINED** : nîvzînî.

SADDLE, *vt. i.* : zîn kirin, bar giran kirin.

SADDLEBOW, *n.* : berahiya kevaniya zînî.

SADDLED, *adj.* : zînkirî.

SADDLELESS, *adj.* : bê zîn.

SADDLER, *n.* : zînker.

SADDLERY, *n.* : zînkarî.

SADDLETREE, *n.* : peykerê zînî.

SADDLING, *n.* : zînkirin.

SADIRON, *n.* : ûtiya giran.

SADISM, *n.* : sadîtî : ladanek regezî ko keyfa mirovî dihêt bi azardana dilberî, şadî bi êşandinê, êşandina bêqam.

SADIST, *n.* : sadî : hezkerê azardanê.

SADISTIC, *adj.* : sadiyî.

SADLY, *adj.* : bi mirûzî, bi mirîtoyî, mirîtokî.

SADNESS, *n.* : mirûz, daman, damayîn, qehr, qehirîn, xudîkî, melûlî, kizî, keser, axîn, ahîn, kovan, xem, şîn, serkizê neşayî.

- **AND GRIEF** : şîn û girî.

SADO MASOCHISM, *n.* : masoşîstiya sadî : nesaxiyek regezî ye ko mirov xweşiyê bi azardana xwe yan jî kesek dî dibînit.

SADRI, *n.*(rice) : sedrî (birinc).

SAD SACK, *n.* : mirovê kêm şehreza.

SAFARI, *n.* : rawegeşt.

- **PARK** : meydana şeran(bo temaşe).

SAFE, *n., adj.* : xezîne, xezne, gencîne, piştrast, silamet, êrya.

- **BLOWER** : gencîneşikên.
- **BREAKER = SAFE CRACKER.**
- **CONDUCT**, *n.* : derbazname, berbijariya borînê.
- **CRACKER**, *n.* : diz, gencîneşikên.
- **GUARD**, *n.* : parêz, parêzer, alavka parastinê, derbazname, parastin.

- **GUARD**, *vt.* : parastin.

- **LIGHT**, *n.* : ronahiya êryayê (silametiyê).

- **KEEPING** : parastin.

- **METHOD** : rêbaza êryayî.

SAFELY, *adv.* : bi êryayî, bi silametî, êryakî.

SAFENESS, *n.* : êryayîtî, silametîtî.

SAFETY, *n.* : êrya, êryayî, silametî, asayiş, saxî.

- **BELT**, *n.* : kemerbend yan qayişa êryayê yan silametiyê.

- **CURTAIN**, *n.* : perdeya êryayê yan silametiyê.

- **ISLAND**, *n.* : girava êryayê (beyava di nav rêya apore de).

- **LAMP** : çirayê êryayê (di kangehê de wek yê komirvanî).

- **MATCH**, *n.* : şixateya êrya.

- **PIN**, *n.* : maşek.

- **RAZOR**, *n.* : gîzana êrya.

- **VALVE**, *n.* : derçeya êrya yan silametiyê.

- **ZONE**, *n.* : devera êrya yan silametiyê.

SAFETYING, *n.* : asayişkirin.

SAFFIAN, *n.* : çerm yan kevlê bizinê yan pezî bi simaqê debaxkirî û reng vekirî û heşkirî.

SAFFLOWER, *n.* : helezek dirrî ye, heşa sor didit perên (belg) vî helezî, heşa ji van belgan (yan peran) çêkirî.

SAFFRON, *n., adj.* : zehferan.

- **CAKE**, *n.* : kiloca zehferanî.

- **COLOURED** : rengzehferanî.

SAFFRON, *vt.* : bi zehferanê reng kirin, wek zehferanî reng kirin.

SAFFRONY, *adj.* : zehferanî.

SAFRANIN(E), *n.* : madeyê rengkerê zehferanê, sorê zerê qetranî yê zehferanê.

SAFROLE, *n.* : avekiyek bêreng e (bo kulavan bi kar dihêt) : safrol.

SAG, *n.* : şorbûn, dahêlana rexekî, kêmbûna bihayî.

SAG, *v.i.t.* : şor bûn, sist bûn.

SAGA, *n.* : çîroka têrkarê qehremanî.

SAGACIOUS, *adj.* : hişyar, wurya, degel, çavbêl, bîrewer, bîrbir, zîrek, jîr, zên.

SAGACIOUSLY, *adv.* : bi jîrî, jîrkî.

SAGACITY, *n.* : hişyarîtî, jîrîtî.

SAGAMORE, *n.* = **SACHEM.**

SAGE, *n.* : giyakê bêhnxweş yê belg gewrkeskê lênan yan pêjandindar.

- **BRUSH** : şînkatiya tiftî li hindek deverên beyarên Wîlayetên yekgirtî yên Emerîka.

- **CHEESE** : penîrê vî giyayê tiffî têkilkirî.

- **COCK** : keleşêrê van deveran.

- **GREEN** : rengê belgên vî giyakî tiftî.

- **GROUSE** : balindemirîşkiya van deverên : beyarên Emerîka.

- **HARE** : rûviyê van deverên beyar.

- **LEAVES** : belgên giyakî.

- **TEA** : dermanê li gel giyakî têkilkirî.

SAGE, *n., adj.* : pendiyar, jîr, zana, hişdar, hozak.

SAGENESS, *n.* : pendiyarîtî.

SAGESHIP, *n.* : pendiyarî.

SAGGAN, *n.* : qalibê gilî bo patina kaloti.

SAGGED, *adj.* : şor, dahêlayî, mirtandî.

SAGGING, *n.* : mirtîn, mirtandin, dahêlan, şorbûn.

SAGITTA, *n.* : tîr (stêrên bakur).

SAGITTAL, *adj.* : tîrî, wek tîrî.

SAGITTARIUS, *n.* : birc (nîşana nehem ya çerxa bircan), tîr û kevan, tîrbaz, kevanevan.

SAGITTATE (ATED), *adj.* : tîrî, wek sertîrî.

SAGO, *n.* : arê nîşayî yê nafka darqespê sagoyî.

- **PALM** : darqespê sago (li Hindistanê û Malîzya).

SAGUARO, *n.* : heleza kaktosa mezin.

SAGY, *adj.* : giyakî.

SAHARA, *n.* : sehraya mezin ya Lîbya.

SAHARAN, *adj.* : sehrayî.

SAHARIAN, *adj.* : sehrayî.

SAHARIC, *adj.* : sehrayî.

SAID, *p.* **OF SAY** : got.

SAID, *adj.* : gotî.

SAIGA, *n.* : pezkûvî.

SAIL, *n.* : babirek, perdedar, hêlekan.

- **IN ~** : di gemiya bebirekî de.
- **BOAT** : gemiya hêlekanî yan babirekî, bagemî, keştîba.
- **CLOTH** : perûkê babirekî.
- **VESSEL** : gemiya hêlekanî.
- **TO MAKE ~** : dest bi rêwîtî kirin, babirek vekirin.
- **TO SET ~** : dest bi rêwîtiyê kirin.
- **TO TAKE IN ~** : beyava babirekan kêm kirin.
- **UNDER ~** : babirekvekirî.

SAIL, *v.i.t.* : çûn, dest bi rêwîtiya deryayî kirin.

- **TO ~ IN** : çalak dest bi karî kirin.
- **TO ~ INTO** : êriş kirin.

SAILABLE, *adj.* : deryabar.

SAILER, *n.* : bagemî.

SAILFISH, *n.* : masiyek mezin e nemaze şapera piştê.

SAILING, *n.* : keştîkirin, gemîvanî, babirekvanî.

- **BOAT** : belema perdedar yan çarokedar.
- **SHIP** : bagemî, bakeştî.
- **VESSEL** : bakeştî.

SAILOR, *n.* : gemîvan, keştîvan, deryavan, deryager.

- **A BAD ~** : deryavan yan deryagerê gêjekî.
- **A GOOD ~** : deryagerê negêjekî.
- **'S CHOICE** : bijarê deryayan.

SAILPLANE, *n.* : balafira babirekî (bê makîne).

SAIN, *vt.* : pîroz kirin, xaç kirin (li ser singî xaç nîşan kirin).

SAINFOIN, *n.* : helezek gul qerenfil e.

SAINT, *adj.* : pîroz, pîr.

SAINT, *vt.* : pîroz kirin.

SAINTDOM, *n.* : pîrozîtî.

SAINTED, *adj.* : pîrozkirî.

SAINTHOOD, *n.* = **SAINTSHIP.**

SAINTLINESS, *n.* : pîrozîtî.

SAINTLY, *adj.* : pîroz, pak.

SAINTSHIP, *n.* : pîrozîtî.

SAITHE, *n.* : texlîtek masî ye.

SAKE, *n.* : xatir, armanc, mebest, berjewendî.

SAKER, *n.* : laçîn, baz (seqrê Erebî).

SAKI, *n.* : texlîtek meymûn e.

SAL, *n.* : xwê.

- **FOR YOUR ~** : bo xatra te.

SALABILITY, *n.* : firoşbarîtî.

SAL(E)ABLE, *adj.* : firoşbar.

SALACIOUS, *adj.* : har, belqitî.

SALACIOUSLY, *adv.* : bi harî, harkî.

SALACIOUSNESS, *n.* : harîtî, belqitin.

SALAD, *n.* : zelete.

- **DAYS** : rojên holiyê.
- **DRESSING** : sos yan êxiniya zeletê.

SALADE, *n.* = **SALLET.**

SALAMANDER, *n.* : texlîtek kimkime ye (ji xwe ve di nav agirî de dijît), asinê germ yê sor (bo tophavêtin û barûtê).

SALAMI, *n.* : texlîtek sosîs : rîvîka bi qîmeyî dagirtî.

SAL-AMMONIAC, *n.* : nûşadir, nişadir.

SALANGUANE, *n.* : çiçika hêlîna xwarinbar çêdikit.

SALARIAT, *n.* : mûçexwer.

SALARIED, *adj.* : mûçekirî.

SALARY, *n.* : mûçe, mangane, heyvane.

- **CUT** : mûçebirrî.

SALAMENDRIAN, *adj.* : pêwendîdarê asinê, germê sor.

SALAMENDRINE, *adj.* = **SALAMENDRIAN.**

SALAMENDROID, *adj.* : kimkimeyî.

SALE, *n.* : firotin.

- **FOR ~** : bo firotinê.
- **ON ~** : bo firotinê.

SALE OF WORK, *n.* : bazarê xêrxwazî.

SALEP, *n.* : danê xurekî yan nîşayî (yê baskê heleza orkidê).

SALERATUS, *n.* : bîkarboneta sodyom yan potasyom.

SALERING, *n.* : xeleka kiriyaran (li heracê).

SALESMAN, *n.* : firoşyar.

SALESMANSHIP, *n.* : firoşyarîtî.

SALESWOMAN, *n.* : firoşyar (jin).

SALES RESISTANCE, *n.* : bergiriya firotinê, mejîreqî.

SALI-, *pref.* : pêşgir e ko xwê ye.

SALICET, *n.* : texlîtek orgen e.

SALICIN, *n.* : pêkhatiyek spî, tal û blûrî ye, derman e bo tayê.

SALICIONAL, *n.* : orgena dengnerm.

SALICYL, *n.* : salisîl.

SALICYLATE, *n., vt.* : salisîlêt, salisîlêt kirin.

SALICYLIC, *adj.* : salisilîkî.

- **ACID** : tirşiya salisilîkî.

SALICYLISM, *n.* : salisilîkîtî.

SALICYLIZE, *vt.* : salisilîkî kirin.

SALIENCE, *n.* : xalik yan nîşana berz, tişt yan parçeya derhatî, berzayî, vizik, lîtik.

SALIENCELY, *adv.* : berzkî.

SALIENCY, *n.* : berzayî, vizik, lîtik, derhatî, nîşanaberz.

SALIENT, *n., adj.* : diyar, berz, hendef.

SALIENTATION, *n.* : berzbûn, qol.

SALIENTIAN, *n., adj.* : bazder : canewerê bazderê bejavî wek beqê.

SALIENTLY, *adv.* : bi berzî, berzkî.

SALIFEROUS, *adj.* : têrxwê (erdek yan çînek erdî).

SALIFY, *vt.* : xwê kirin, kirin xwê, şor kirin.

SALIMETER, *n.* : şorpîv.

SALINA, *n.* : sûr, şor, şorezar.

SALINE, *adj.* : şor, şorav, sûr, siwêr.

SALINE METER, *n.* = **SALIMETER.**

SALINITY, *n.* : şorîtî, sûrîtî, şore, şorî (av û xwê).

SALINIZATION, *n.* : şorîkirin.

SALIN(IZE), *vt.* : şorî kirin.

SALINIZED, *adj.* : şorîkirî.

SALINIZING, *n.* : şorîkirin.

SALINOMETER, *n.* = **SALIMETER.**

SALIVA, *n.* : lîk, tuk, tif, girêz, gilîz, gilîzî, avadevî, xuzav.

SALIVARY, *adj.* : gilîzî, lîkî.

- **GLAND** : livîk yan toşpiya gilîzî.

SALIVATE, *vt. i.* : (gelek) gilîz kirin, gilêz hatin xarê, gilîz derkirin.

SALIVATED, *adj.* : gilîzkirî.

SALIVATING, *n.* : gilîzkirin.

SALK, *n.* (~ **VACCIN**) : yekem qutan dijî şehtiya zarokan.

SALLET, *n.* : xodeyê sivik.

SALLOW, *n., adj.* : pêtî.

SALLOW, *vt. i.* : pêtî bûn yan kirin.

SALLOW, *n.* : selp.

SALLOWISH, *adj.* : piçekê pêtî.

SALLOWNESS, *n.* : pêtîtî.

SALLOWY, *adj.* : selpî.

SALLY, *n.* : êrîş (hêzên abloqekirî), çalakiya nişkî, peqîn, tirane, rêwîtî.

SALLY, *v.i.* : êrîş kirin, seyran kirin.

SALLY, *n.* : livîna yekem ya zengilê (bo lêdanê).

SALMAGUNDI, *n.* : têkiliya gelemper, amanê goştî, masî, hêk û pîvazê.

SALMI, *n.* : êxinî.

SALMON, *n.* : masiya samon (masîxatûnk).

- **BERRY** : texlîtek firîz e.

- **LADDER, LEAP, PASS, STAIR** : pêngav yên borîna masiyê ji sikrî.

- **PINK** : rengê qerenfilê ber zerî ve.

SALOMONIC, *adj.* : silêmanî.

SAMANOID, *adj.* : samonî, masî, xatûnkî.

SALOON, *n.* : sif, sevik, bermal.

- **BAR** : meyxane.

- **KEEPER** : meyxanevan.

- **PISTOL** : debanceya mewdakurt.

- **RIFLE** : tifenga mewdakurt.

SALPIGLOSSIS, *n.* : zimanzirna : helezek gul kovikî û mezin e.

SALPINGIAN, *adj.* : pêwendîdarê boriya ostakî.

SALPINGITIS, *n.* : kulbûna boriya ostakî (boriya guhlêbûnê, bihîstinê).

SALPINX, *n.* : boriya ostakî.

SALSE, *n.* : birkan yan agirpijîna teqnê.

SALSIFY, *n.* : şing, gêzbelok.

SAL SODA, *n.* : karbonatên soda.

SALT, *n.* : xwê.

- **NOT WORTH ONE'S ~** : pûç, bernaketî bo helgirtinê yan parastinê.

- **OF THE EARTH** : xwêya erdê : qencemirov.

- **TO EAT A PERSON'S ~** : mêhvan bûn.

- **WITH A GRAIN OF ~** : piçek gumandarî (bi kêm bawerî yan hişyarî).

SALT, *vt.* : xwê kirin.

SALTANT, *adj.* : semadar, bazdar.

SALTATION, *n.* : bazdan, lîtik, sema.

SALTATORIAL, *adj.* : bazdar, semadar.

SALTATORY, *adj.* : bazdar, semadar.

SALTCELLAR, *n.* : xwêdan.

SALTED, *adj.* : xwêkirî.

SALTER, *n.* : xwêfiroş, xwêçêker.

SALTERN, *n.* : kargeha xwê.

SALTIGRADE, *adj.* : pîrhevoka bazder.

SALTILY, *adv.* : xwêkî, bi xwê.

SALTINESS, *n.* : xwêyîtî.

SALTING, *n.* : xwêkirin.

SALTISH, *adj.* : piçekê şor.

SALTLESS, *adj.* : ne şor, bê xwê.

SALT MARSH, *n.* : zonga şorav.

SALTPETER, *n.* : kevirxwê.

SALTUS, *n.* : guhartina nişkî.

SALTWATER, *n.* : şorav, şoraw.

SALTWORKS, *n.* : xwêgeh.

SALTWORT, *n.* : heleza karbonatên soda jê dihînin der (xwêhelez).

SALTY, *adj.* : sûr, şor.

- **LAND** : şorek, şorax.

SALUBRIOUS, *adj.* : saxdar, saxlem.

SALUBRIOUSLY, *adv.* : saxdarkî, bi saxdarî.

SALUBRIOUSNESS, *n.* : saxdarîtî.

SALUBRITY, *n.* : saxdarî, saxlemîtî.

SALUKI, *n.* : tajî (siloqiyê Erebî).

SALUTARIAN, *adj.* : saxlem.

SALUTARY, *adj.* : havildar, saxdar.

SALUTATION, *n.* : silav, dirûd.

SALUTATIONAL, *adj.* : silavî.

SALUTARY, *adj.* : saxlem, havildar.

SALUTATORIAN, *n.* : xwendekarê ko gotara xêrhatinê dibêjit (demê derçûna polekê).

SALUTE, *n.* : silav.

- **TAKE THE ~** : silav wergirtin.

SALUTE, *vt. i.* : silav kirin.

SALUTING, *n.* : silavkirin.

SALVABLE, *adj.* : rizgarbar.

SALVAGE, *n.* : rizgar, rizgarkirin, hawar, samanê rizgarkirî, rizgarkirina gemiyê û barî ji noqîbûnê, berdêla rizgarkirinê.

SALVAGE, *vt.* : rizgar kirin.

SALVAGER, *n.* : rizgar.

SALVARSAN, *n.* : dermanê firengî.

SALVATION, *n.* : rizgarkirin, azadkirin, azakirin, hawar.

- **ARMY** : leşkerê rizgarkirinê (olek feleyî û nîvleşkerî ye li Brîtanya).

SALVATIONISM, *n.* : rizgarîtî.

SALVATIONIST, *n.* : rizgar(ker).

SALVE, *n.* : melhem.

SALVE, *vt.* : melhem kirin, hedar kirin, rizgar kirin (gemî, bar jî noqîbûnê).

SALVED, *adj.* : melhemkirî.

SALVER, *n.* : sênî (bo pêşkêşkirina xwarinê yan vexwarinê).

SALVIA, *n.* : helezek gul şîn yan sor e.

SALVING, *n.* : melhemkirin.

SALVO, *n.* : havêtin (top yan bomba bi derbekê), silav, peqîna nişkî, bahoz.

SAL VOLATILE, *n.* : karbonatên nişadirî (avekiyek bêhndar e bo dillborînê bi kar dihêt).

SALVOR, *n.* : rizgar (mirov yan keştî).

SAMARA, *n.* : meyweya çengdar ya yek berik ya ko venabit, tîvil wek çengî ye (wek dirdar yan reşdarî).

SAMARITAN, *n.* : xêrker.

SAMARIUM, *n.* : hêmanek metalî û qetlaz e (samaryom).

SAMARSKITE, *n.* : metalê asin, kalisyom, uranyom, zirêç û toryom.

SAMBA, *n.* : samba : texlîtek sema ye.

SAMBAR, *n.* : pezkûviyek mezin e.

SAMBO, *n.* : zaroyê dutuxim.

SAMBUR, *n.* : pezkûviyê mezin yê hindî.

SAME, *adj., pron., adv.* : heman, jî xwe, bi xwe.

- **ALL THE ~** : li gel hindê.

- **IT IS ALL THE ~ TO ME** : heman (yan her) yek e bo min.

- **JUST THE ~** : bi heman awayî, li gel hindê.
- **ONE AND THE ~** : heman tişt e.
- **THE VERY ~** : heman tişt.

SAMEL, *adj.* : têrnepêjtî (kelpûç).

SAMENESS, *n.* : hevyekîtî.

SAMITE, *n.* : tevnê avirmîşî li gel tayê zêr û zîvî.

SAMLET, *n.* : masiya samon ya biçûk.

SAMOAN, *n., adj.* : ziman yan welatiyê Samwa.

SAMOVAR, *n.* : semawer.

SAMOYED, *n., adj.* : welatiyê milletê sîbêrî moxolî.

SAMP, *n.* : savarê genimê şamê.

- **POST** : posteyek erzan.

SAMPAN, *n.* : belemek biçûk e (çînî).

SAMPHIRE, *n.* : heleza kendalan (belg stûr û şor bo tirşiyê ~).

SAMPLE, *n.* : nimûne, soste, rastek.

- **ROOM** : nîşangeha nimûneyan.

SAMPLE, *vt.* : nimûne bûn, bijare kirin, azmûn kirin.

SAMPLED, *adj.* : nimûnekirî.

SAMPLER, *n.* : azmûnker yan kokerê nimûneyan, bijare, parçeyek ji karê derziyê, alava derhînana nimûneyan.

SAMPLING, *n.* : nimûnekirin.

SAMSON, *n.* : şemşûnê ejdeha.

SAMSONIAN, *adj.* : şemşûnî (pêwendîdarê şemşûnê ejdeha).

SANATIVE, *adj.* : saxkerdar.

SANATORIUM, *n.* : bojangeh, saxgeh.

SANBENITO, *n.* : kirasê zerê jûvanê.

SANCTIFICATION, *n.* : pakbûn, pirozbûn.

SANCTIFIED, *adj.* : pak, bêguneh, pîrozkirî, rûbaz (zir dîndar).

SANCTIFIER, *n.* : pîrozker.

SANCTIFY, *vt.* : pîroz kirin, pak dan, rewa kirin.

SANCTIMONIOUS, *adj.* : rûbaz.

SANCTIMONIOUSLY, *adv.* : rûbazkî, bi rûbazî.

SANCTIMONIOUSNESS, *n.* : rûbazîtî.

SANCTIMONY, *n.* : rubazî.

SANCTION, *n.* : piştgîrî, siza ferman, qanûn, rastandin, nehêl.

SANCTION, *vt.* : rastandin, rê dan, rewa kirin.

SANCTIONLESS, *adj.* : bê rastandin, bê rewakirin.

SANCTITY, *n.* : pîrozîtî, rêz.

SANCTUARY, *n.* : penageh, nîştgeh, qef, mezar.

- **TO TAKE ~** : çûn penagehê.

SANCTUM, *n.* : dir yan şûna pîroz.

- **SANCTORUM** : pîrozê pîrozan.

SANCTUS, *n.* : sirûda ayînî (pîroz, pîrozmûzîqeya vê sirûdê).

SAND, *n.* : xîz, zîx, ritam, şîlik.

- **BAG** : telîsê xîzî.
- **BANK** : girê xîzî.
- **BATH** : germika xîzî.
- **BLAST** : rewteka xîzî (bo paqijkirinê).
- **BOX** : xîzdan.
- **GROUSE** : qitk, kurkure.
- **HILL** : zîr yan girkê xîzî.
- **PAPER** : kaxeza cimbad, kaxeza xîzî, simarte.
- **PIPER** : çûçika tîtelanî.
- **STONE** : kevir yan ber xîz (zirdîndar).
- **THE ~ ARE RUNNING OUT** : dem li ber e ko temam bibit, bêqam dereng e.

SAND, *vt.* : xîz kirin, bi xîzî nixavtin yan teji kirin, bi xîzî yan kaxeza xîzî paqijkirin.

SANDAL, *n.* : şimik, pêlav, sol, şekal, texlîtek dar e.

- **TREE** : darsendel.
- **WOOD** : darê sendel.
- **WOOD OIL** : rûnê darê sendelî.

SANDARAC, *n.* : şirêzek e (sanderak).

- **TREE** : darê şirêza sanderakî.

SAND BAR, *n.* : xîzê ko radan yan rewteka avê çêdikit.

SAND BLIND, *n.* : nîvkore.

SANDBOY, *n.* : kurkê xîzî : pêtika wek kêçê ye.

SAND-CAST, *vt.* : dariştin nav xîzî de.

SAND CASTING, *n.* : dariştina nav xîzî de.

SANDER, *n.* : xîzker.

SANDERLING, *n.* : balindeyek wek çûçika tîtelanî.

SANDERS, *n.* : darê sendel.

SANDGLASS, *n.* = **HOUR GLASS.**

SANDINESS, *n.* : xîzîtî.

SANDING MACHINE, *n.* : makînaya xîzkirinê.

SANDIVER, *n.* : gilêşa avekiya şûşeyî.

SAND LAUNCE OR EEL, *n.* : marmasiya xîzî.

SAND-LOT, *n.* : yarîgeha xîzî bo zarokan.

SANDMAN, *n.* : xîzvan : ko efsane dibêjit ko zarokan dipîvit û bi pizirûkên xîzan dihavêtin ser çavan.

SAND TABLE, *n.* : mêza xîzî (bo meşqê yan zarokan).

SANDWITCH, *n.* : nanê duta, kadik, hoç, tûtik, kade, sandwîç.

SANDWICH MAN, *n.* : mêrkê sandiwîç : yê ko du agehdariyan heldigirit yek li ser sîngî û yek li ser piştî.

SANDWORT, *n.* : gulxîz.

SANDY, *adj.* : xîzî.

SANE, *adj.* : jîr, hişyar.

SANG FROID, *n.* : netre, xweragirî, hedarî.

SANGUIFICATION, *n.* : xwînçêkirin (ji xurekî).

SANGUINARILY, *adv.* : bi xwînrêji, xwînrêjkî.

SANGUINARINESS, *n.* : xwînrêjîtî.

SANGUINARY, *adj.* : xwînrêj, devxwîn, xwînî, xwînxwaz.

SANGUINE, *vt.* : (bi) xwîn kirin.

SANGUINEOUS, *adj.* : devxwîn, geşbîn, piştrast, sortarî, xwînrêj, xwînî, têrxwîn.

SANGUINITY, *n.* : xwînîtî.

SANGUINILENT, *adj.* : xwînî : ko xwîn tê de ye yan xwînkirî ye.

SANICLE, *n.* : helezek ûşîdar ko berê dermanî bû.

SANIES, *n.* : avekiya rohn ya xwînî ya ko qunêr derdikit.

SANIFY, *vt.* : saxlem kirin.

SANITARIAN, *n., adj.* : saxdarî, saxlemî, dirustaneyî, dirustane.

SANITARILY, *adv.* : bi dirustaneyî yan saxdarî, dirustanekî.

SANITARINESS, *n.* : dirustaneyîtî, saxdarîtî, saxlemîtî.

SANITARIUM, *n.* = **SANATORIUM.**

SANITARY, *adj.* : dirustane, saxdar.

- **NAPKIN** : dersoka dirustane.

SANITATE, *vt.* : dirustane kirin, bi awayên dirustane kirin.

SANITATED, *adj.* : dirustanekirî.

SANITATING, *n.* : dirustanekirin.

SANITATION, *n.* : dirustanekirin.

SANITIZATION, *n.* : paqijkirin, dirustanekirin.

SANITIZE, *vt.* : dirustane kirin (bi paqijkirinê).

SANITIZED, *adj.* : paqijkirî, dirustanekirî.

SANITIZING, *n.* : dirustanekirin.

SANITY, *n.* : hiş, hest.

SANK, *p.* **OF SINK** : noqî kir, noqî bû.

SAN(N)YASI, *n.* : parsêkê olî yê Hindî.

SANS, *prep.* : bê.

SANSKRIT, *n., adj.* : sansikrîtî, kevnezimanê pîroz yê Hindistanê.

SANSKRITIC, *adj.* : sanskrîtî.

SANSKRITISM, *n.* : sanskrîtîtî.

SANTA CLAUS, *n.* : Santa Kloz (Baba Noël).

SANTIR, *n.* : sentor.

SANTOLINA, *n.* : teraşek bêhnxweş e.

SANTONICA, *n.* : kirmek darî ye.

SANTONIN, *n.* : pêkhatiyek jehrî û belûrî ye.

SANTOUR, *n.* : sentor.

SAP, *n.* : av yan şîrê darî, çeper, awig, lawaz kirin (bawerî, zebrî, azayî).

SAP, *vt.* : (dar) hişk kirin, çeper çêkirin, lawaz kirin.

SAPAJOU, *n.* : meymûnka biçûk ya başûra Emerîka.

SAPANWOOD, *n.* : darê heşa sor.

SAPELE, *n.* : darek qayim e.

SAPHEAD, *n.* : gewc, serê, berahiya çeperî.

SAPHEADED, *adj.* : xirpo, gewc.

SAPID, *adj.* : tamxweş, bêhnxweş.

SAPIDITY, *n.* : tam yan bêhnxweşîtî.

SAPIENCE, *n.* : pend, pendiyarî.

SAPIENCY, *n.* = **SAPIENCE.**

SAPIENT, *adj.* : pendiyar.

SAPIENTIAL, *adj.* : pendiyar.

SAPLESS, *adj.* : lawaz, hişk, dilsist.

SAPLING, *n.* : sava, şitil, derik, derxik, devî, nemam, teraş, lawik, bispor.

SAPODILLA, *n.* : guhiya emerîkanî.

SAPONACEOUS, *adj.* : sabûnî.

SAPONATED, *adj.* : sabûnkirî.

SAPONIFIABLE, *n., adj.* : sabûnbar.

SABONIFICATON, *n.* : sabûnkirin.

SAPONIFIER, *n.* : sabûnker.

SAPONIFY, *vt., i.* : sabûn kirin.

SAPONIN, *n.* : sabûnîn.

SAPONITE, *n.* : sabûnît : silîkatên magnesyom û aluminyom yên sabûnî.

SAPOR, *n.* : tam, behn.

SAPPER, *n.* : endaziyarê leşkerî.

SAPPHIC, *adj.* : helbestiya çarrêz.

SAPPHIRE, *n., adj.* : safîr (berê hêja, yaqotê şîn).

- **WEDDING** : borîna 45 salan (6 şûkirin).

SAPPHIRINE, *n., adj.* : safîrî.

SAPPHISM, *n.* : jinbaziya jinan.

SAPPINESS, *n.* : terîtî, têravî (helezek e).

SAPPY, *adj.* : avis, awis, çalakî, çalak, ter, gewc.

SAPR(O)-, *pref.* : pêşgir e ko rizî ye.

SAPREMIA, *n.* : taya genî : texlîtek jehrbûna xwînê ye.

SAPROGENIC, *adj.* : genî.

SAPROLITE, *n.* : saprolît : kevnekevirê nerm yan rizî.

SAPROPHAGOUS, *adj.* : genî yan rizîxwer.

SAPROPHYTE, *n.* : rizîxwer.

SAPROPHYTIC, *adj.* : pêwendîdarê rizîxwerî.

SAPROZOIC, *adj.* = **SAPROPHYTIC.**

SAPSAGO, *n.* : penîrek req û kesk yê swisî.

SAPSUCKER, *n.* : av mêj : wek darkutukî.

SAPWOOD, *n.* : avdar : navbera tivil û nafka hişk.

SARABAND, *n.* : kevnegovenda îspanî.

SARACEN, *n.* : koçerê sehrayê, Ereb, musilmanê demê şerê xaçperêsan.

SARACENIC, *adj.* : erebî, musilmanî.

SARC(O)-, *pref.* : pêşgir e ko goşt e.

SARCASM, *n.* : pertav, tirane, henek, qeşmerî, tîz, galte, tinaz, tevz.

SARCASTIC, *adj.* : tevzker, tîzî.

SARCELLE, *n.* : qazek biçûk e.

SARCENET, *n.* : tevnê tenik yê avirmîş.

SARCOCARP, *n.* : nafik yan kakila meyweyî.

SARCODE, *n.* : protoplazm (avxwîn)a canewerî.

SARCOLOGY, *n.* : neşterbariya parçeyên goştdar yên leşî.

SARCOPLASM, *n.* : madeyê nav rîşaliyê masûlkeyî de.

SARCOMA, *n.* : perçiftina tevnê pêgir yê seretayî.

SARCOPHAGIC, *adj.* = **CARNIVOROUS.**

SARCOPHAGUS, *n.* : darbestberî.

SARCOUS, *adj.* : zeblekî, masûlkeyî, goştî.

SARD, *n.* : sard : berê hêja yê sorê ber zerî ve.

SARDELLE, *adj.* : masiyî (wek masî).

SARDINE, *n.* : texlîtek masiya hûrhûr e.

- **FISH** : masîhûrk.

SARDINIA, *n.* : welatî yan zimanê girava Sardînya.

SARDUS, *n.* : berek hêja ye.

SARDONIC, *adj.* : tevzker, teraneker, devtal.

SARDONYX, *n.* : onîks (berek hêja ye).

SARGESSO, *n.* : kevza deryayî.

SARGEANT, *n.* : serdehan, nasker çawîş.

SARI, *n.* : kirasê jinên Hindistanê, kewa.

SARK, *n.* : kumlek.

SARKING, *n.* : depê di navbera stûnê û kaşxankan de.

SARMENTOSE, *adj.* : çiqzirav.

SARONG, *n.* : cilên malezî yên millî, perûkê van cilan.

SAROS, *n.* : hejdeh sal di navbera dubarebûna rojgirtinê de.

SARSEN, *n.* : helanên berxîz.

SARSENET, *n.* : avirmîşê nerm û tenik.

SARTORIAL, *adj.* : diryarî.

SARTORIUS, *n.* : beqa ranî.

SASH, *n.* : kemerbend, dersok, kenarên pencerkê.

- **CORD** : benê kenarî.
- **LINE** : benê qayim yê kenarî.
- **POCKET** : valatiya li her du rexên kenarên pencerkê.
- **PULLEY** : dartûna benê kenarî.
- **TOOL** : texlîtek firçeya şûşevanî yan kevalvanî ye.
- **WEIGHT** : senga kenarî (pencerk).
- **WINDOW** : pencerka kenarkirî.

SASHAY, *n.* : rêwîtî, rêbarî.

SASHAY, *v.i.* : tehisîn, çûn, pêngavên bûngî havêtin.

SASHED, *adj.* : kenarkirî.

SASHLESS, *adj.* : bêkenar.

SASIN, *n.* : pezkûvî (Nepalî-Hindî).

SASINE, *n.* : xudanê samanê derebegî.

SASS, *n.* : bersiva req.

SASS, *v.t.* : req axiftin.

SASSABY, *n.* : pezkûviyek mezin (yê başûra Efrîqa).

SASSAFRAS, *n.* : darek biçûk e.

SASSANIAN, *adj.* : malbatiya şahên farisî, sasanî.

SASSANID, *adj.* = **SASSANIAN.**

SASSENACH, *n.* : mirov yan tiştên Înglîzî yên nimûneyî.

SASSWOOD, *n.* : darê tîviljehr yê efrîqayî (sasdar).

SASSY, *adj.* = **SAUCY.**

SASSY BARK, *n.* : têvilê darê sas.

SAT, *p.* **OF SITE** : danîşt, rûnişt.

SATAN, *n.* : şeytan, Ehrîmen.

SATANIC, *adj.* : şeytanî.

SATANICALLY, *adv.* : şeytankî, bi şeytanî.

SATANISM, *n.* : şeytanîtî, şeytanperistin, bedxwazî.

SATANIST, *n.* : bedxwaz.

SATANOLOGY, *n.* : şeytanzanî.

SATCHEL, *n.* : parzîn, torbe, çenteyê dibistanê.

SATCHELLED, *adj.* : çentedar.

SATE, *vt.* : têr kirin.

SATED, *adj.* : têr, têrî, têrayî, têrûpir, têrkirî.

SATEEN, *n.* : perûkê pembû yan hiriya teyisî.

SATELLITE, *n.* : stêrkok, dîvelank.

SATELLITIC, *adj.* : dîvelankî.

SATIABLE, *adj.* : têrbar.

SATIATE, *n.* : têrkirî.

SATIATE, *vt.* : têr kirin.

SATIATED, *adj.* : têrkirî.

SATIATING, *n.* : têrkirin.

SATIATION, *n.* : têrbûn.

SATIETY, *n.* : têrbûn, zorxwerî.

SATIN, *n.* : perûkê avirmîş, satan.

- **BEAUTY** : mehfûr.
- **CLOTH** : perûkê hirî yê wek satanî vehînayî.
- **FINISH** : hilîkirina zîvî bi firçeya metalî.
- **GYPSUM** : gêça rîşalî ya wek mirarî.
- **PAPER** : kaxeza teyisî ya nivîsînê.
- **STONE** = **SATIN GYPSUM.**
- **WOOD** : darê depê nayab.

SATINET, *n.* : satanê nehêja yê pambûkirî.

SATING, *n.* : têrkirin.

SATINY, *adj.* : satanî.

SATIRE, *n.* : lêbok, virrhawîştin, daşorî.

SATIRIC(AL), *adj.* : nitrek, tevzker.

- **POEM OR POETRY** : virrhawîştin.

SATIRICALLY, *adv.* : bi tevzkerî, tevzkerkî.

SATIRIST, *n.* : tiranekar, pesqel, pesxel.

SATIRIZE, *vt.* : tiraneyî êrîş kirin.

SATISFACTION, *n.* : dilniyayî, dilniyakirin, dilxweşî, têrbûn, hedar, dabîn, qayilî, razîbûn, hedan, qinyat, qîm, qîmbûn, asûdeyî.

SATISFACTORILY, *adv.* : bi dilniyayî, dilniyakî.

SATISFACTORY, *adj.* : dilniya, asûde.

SATISFIABLE, *adj.* : qayilbar, dilniyarbar.

SATISFIED, *adj.* : têr, rûnandî, qayildar, têrkirî, piştrast, dilxweş, çavtêr, dilhêsa, qayilkirin, hedirîn, hedirandin.

SATISFYING, *adj.* : dilniyadar, qayildar, qayil, rûnandin, asûdedar.

SATRAP, *n.* : serkarê deverê, derebeg, fermanrewayê deverê.

SATRAPY, *n.* : fermanrewayiya deverê, derebegî.

SATURABLE, *adj.* : têrbar.

SATURANT, *n.* : têrker.

SATURATE, *vt., adj.* : têr, têrkirin.

SATURATED, *adj.* : têr, têrkirî.

- **COMPOUND** : awîtey têr.
- **SOLUTION** : gîrawey têr.

SATURATION, *n.* : têrkirin, nemandin, têrbûn.

- **CURRENT** : lozew yan rewteka têrbûnê.
- **POINT** : xalka têrbûnê.

SATURDAY, *n.* : şembî, şembe.

SATURN, *n.* : keywan, Astan, Xudayê çandinê li nik Romanan.

SATURNALIA, *n.* : şayiya keywanî.

SATURNIAN, *n., adj.* : keywanî.

- **AGE** : rojgarê zêrîn.
- **METER** : pîvana helbesta romayî.
- **VERSE** : helbesta romayî.

SATURNIC, *adj.* : keywanî.

SATURNINE, *adj.* : tiraneyî, mirûs, mirîto, madmirûs, girêçî.

SATURNINELY, *adv.* : mirûskî, bi mirûsî.

SATURNISM, *n.* : jehrbûna girêçî.

SATYAGRAHA, *n.* : bergiriya nerêyî yan nedijwar.

SATYR, *n.* : mirovê belqitî, Xudayê daristanê (guh û dûv hesp).

SATYRIASIS, *n.* : belqitîn (viyana regeziya bêqam ya mêrî(nêrî).

SATYRIC, *adj.* : tiraneyî.

SATYRID, *n.* : pelpelîtk.

SAUCE, *n.* : medfînî, êxinî, zerzewatên li gel goştî, meyweyê lênanê, rûqayimî, sos.

- **BOX** : mirovê rûqayim.
- **PAN** : axlewîk.
- **TOMATO ~** êxinî yan sosa bacansorkan.
- **WHITE ~** : sosa nîvişk û arî.

SAUCE, *vt.* : tomdar kirin, rûqayîmî axiftin.

SAUCELESS, *adj.* : bê sos yan êxinî.

SAUCER, *n.* : sênîk yan kaska fincanê.

- **EYE** : çavê mezin yê girûvir.

SAUCERFUL, *n.* : teşî kasikê.

SAUCERLESS, *adj.* : bê kasik.

SAUCILY, *adv.* : bi rûqayimî.

SAUCINESS, *n.* : rûqayimîtî, bêarî.

SAUCY, *adj.* : zimantal, rûqayim, law.

SAUDI : welatiyê Erebistana Siûdî.

SAUGER, *n.* : masiyek rûbarî ya emerîkanî ye.

SAUNA, *n.* : germav yan serşoka hilmî.

SAUNTER, *n.* : geran.

SAUNTER, *v.i.* : geran.

SAUNTERER, *n.* : baguhêr.

SAUNTERING, *n.* : geran, seyran, baguhorîn.

SAUREL, *n.* : texlîtek masî ye.

SAURIAN, *n., adj.* : tuxmê kimkimeyî timsah jî li gel!.

SAUROPOD, *n.* : **SOROPOD** : texlîtek dînozor e.

SAURY, *n.* : texlîtek masî ye.

SAUSAGE, *n.* : sosec : rîvîka dagirtî (bi goştê qîmekirî û beharatan).

- **FILLER (OR GRINDER OR MACHINE)** : keresteyên çêkirina sosecî (bo qîmekirin û dagirtinê).
- **MEAT** : goştê sosecê, qîme.
- **ROLL** : goştê sosecê di nav hevîrî de bo pêjtinê.

SAUTE, *n., v.i.* : xwarina zû diqelit, zû qelandin.

SAUTERNE, *n.* : şerabek spî ye.

SAVABLE, *adj.* : rizgarbar.

SAVAGE, *n., adj.* : hov, dirr, dirrinde, gurêx, hoveber.

SAVAGE, *vt.* : dijwar êrîş kirin.

SAVAGENESS, *n.* : dirrîtî, hovîtî, dirrindeyîtî.

SAVAGELY, *adv.* : bi hovî, bi gurêxî, gurêxkî.

SAVAGERY, *n.* : hovîtî, gurêxî, gurêx, hoveberî.

SAVANNA(H), *n.* : deşta bêdar.

SAVANT, *n.* : zana, zanyar.

SAVATE, *n.* : kulmbaziya dest û pê têde bi kar dihên.

SAVE, *n.* : rizgarî, qurtal, werdan, hilînan (dirav).

SAVE, *vt. i.* : hilandin, werdan, rizgar kirin, qurtal kirin.

SAVE, *prep., conj.* : netê, têne.

SAVED, *adj.* : rizgarkirî, werdayî, hilxistî.

SAVELOY, *n.* : texlîtek sosec e.

SAVEN, *n.* : rizgar.

SAVIN(E), *n.* : texlîtek teraş e (ji serik rûnek firinde jê derdikevit wek dermanî bi kar dihêt).

SAVING, *n.* : rizgarkirin, danalî, hawar, hilxistin, paşdaxistin, werdan, rizgarî, hilînan.

SAVINGLY, *adv.* : bi rizgarî.

SAVINGS, *n.* : werdan, paşekewt, paşrojî, paşroj, nûtekirdin.

- **BANK** : benk yan diravgeha werdanê.

SAVIOUR, *n.* : rizgarker, rizgarkar, rizgar.

SAVORY, *n.* : giyayek wek pûngî ye bo pêjtinê bi kar dihêt.

SAVOUR, *n.* : tamdar, bêhnxweş, çej, tam, guman.

SAVOUR, *v.i. t.* : tamdar kirin, pêşniyaz kirin.

SAVOURILY, *adv.* : bi tamdarî, dilçûnî, damdarkî.

SAVOURINESS, *n.* : tamdarîtî.

SAVO(U)RY, *n., adj.* : tamdar, tamdarî.

SAVOY, *n.* : texlîtek kelem e, lehen.

SAVVY, *adj.* : rizî.

SAW, *n.* : xîzar, şeqe, here, birrek, mişar.

- **DUST** : pîne, kepek, teliş, telaş.

SAW, *vt. i.* : birrîn (bi xîzarî).

SAW, *p.* OF **SEE** : dît, bînî, nihêrî.

SAWBILL, *n.* : meravî.

SAW BUCK, *n.* = **SAWHORSE.**

SAWDER, *n.* : pesneaxiftin.

SAWDOCTOR, *n.* : makîneya çêkirina didanên xîzarî.

SAWED, *adj.* : xîzarkirî.

SAWFISH, *n.* : masîxîzark.

SAWFRAME, *n.* : destikê kêra xîzarî.

SAWGATE, *n.* = **SAWFRAME.**

SAWFLY, *n.* : mêşa xîzarî.

SAWGRASS, *n.* : giyayê xîzarî, belg didankirî (wek xîzarî).

SAWHORSE, *n.* : hespê xîzarî ko darî li ser dadinin bo xîzarî.

SAWING, *n.* : vedêran.

SAWLOG, *n.* : qurmê darê kêr dihêt bo xîzarkirinê (bo depan).

SAWMILL, *n.* : aşê xîzarkirinê.

SAWNEY, *n., adj.* : gewc.

SAWTOOTH, *adj.* : didanxîzar.

SAWYER, *n.* : xîzarker, kêza darkunker.

SAX, *n.* = **SAXOPHONE.**

SAX, *n.* : bivr.

SAXATILE, *adj.* : zindewerî (jiyan û werar) di nav keviran de.

SAXE, *n.* : kaxezek wênegirtinê ye.

SAXHORN, *n.* : borîzan.

SAXICOLOUS OR SAXICOLINE, *adj.* = **SAXATILE** : kevirnişîn.

SAXIFRAGE, *n.* : berşikîn (gulek e).

SAXON, *n., adj.*, **SAKSON** : mirovê yan zimanê gelek elmanî yê ko parçeyek Înglîzistanê dagîrkirî di seda 5-6 b.z de.

SAXONY, *n.* : hiriya hûr û nerm.

SAXOPHONE, *n.* : saksofon : alavek mûzîqeyî.

SAXTUBA, *n.* : borîzanek mezin e.

SAY, *n., adv.* : gotin.

SAY, *vt. i.* : gotin, deykirin.

- **THAT IS TO ~** : anko.
- **TO ~ OF** : Eve, jî bilî.

SAYING, *n.* : gotin, deykirin, gotar.

SAY-SO, *n.* : gotin.

SCAB, *n.* : girr, kelpik, şeliqî, gurrî, qalikê şûrî, dijyekîtî.

SCAB, *v.i.* : gurrî bûn, gurrî girtin.

SCABBARD FISH, *n.* : masiyek deryayî ye spî û zîvî wek kalanê şûrî ye.

SCABBLE, *vt.* : (kevrî) zivir tiraşîn.

SCABBY, *adj.* : girr, gurrî.

- **HEADED** : keçel.

SCABIES, *n.* : gurrî.

SCABIETIC, *adj.* : gurriyî.

SCABIOSA, *n.* : gulgurrî.

SCABIOUS, *n., adj.* : gurrî, girr.

SCABROUS, *adj.* : aloz, zehmet, sext, zivir, piçekê şerm, ber deryayî.

SCAD, *n.* : texlîtek masî ye, tibabek mezin.

SCAFFOLD, *n.* : sêdare, qemare, şano, skelle, peyker, herzal.

SCAFFOLD, *vt.* : skelle kirin, peyker kirin.

SCAFFOLDING, *n.* : peyker, skelle, keresteyên skelleyê.

SCAGILOLA, *n.* : zirmermer.

SCALABLE, *adj.* : serketinbar, hilpirjbar.

SCALAGE, *n.* : pîvan, nizmkirina kêmiyê (bi rêjeyek sedî).

SCALAR, *adj.* : pêpikî, jimarî.

- **PRODUCT** : lêkdayê jimarî.
- **QUANTITY** : tibaba nearastekirî.

SCALA, *n.* : texlîtek masî ye.

SCALARIFORM, *adj.* : pêpikî.

SCALAWAG, *n.* : bîjî, kêrnehatî.

SCALD, *n.* : sotina leşî (bi ava germ), sotin û reşbûna tevnê helezî jî ber germê û tavê.

- **HEAD** : nesaxiya pîstê serî.

SCALD, *vt.* : germkirin, sotin, paqijkirin (bi ava germ û hilmê).

SCALDING, *adj.* : sotindar.

SCALE, *n.* : terazû, pêwer, pîver, kelpik, terazî, şehîn.

- **FOR CHECKING LEVEL** : şaqol.
- **TO HOLD THE ~ EVEN** : bi dadwerî hukim kirin, bi terazûyê rast kêşan.
- **TO REMOVE THE ~ S FROM HER EYES** : perde jî ser çavên wê rakirin da ko rastiyê bibînit.
- **TO THROW INTO ~** : kirin nav kêşeyê de.
- **TO TURN THE ~ (S)** : pirs vebirr kirin (rexek bi ser xistin anko zal kirin).

SCALE, *vt. i.* : kêşan, perikîn.

- **TO ~ DOWN** : kêm kirin (bihayî).
- **TO ~ UP** : berz (pitir) kirin.

SCALE ARMOUR, *n.* : metalê zirêkirî.

SCALE BOARD, *n.* : depê tenik yê piştxudîkê.

SCALE-DOWN, *n.* : nizmkirin, kêmkirin.

SCALE INSECT, *n.* : speha helezî.

SCALENE, *n., adj.* : la(yan al) neyeksan yan neterîb.

- **TRIANGLE** : sêgoşeya ciyala : sêgoşeya altêvel.

SCALE MOSS, *n.* : heleza belgkelpikî.

SCALEMAN, *n.* : sênîya terazûyê, tayê terazûyê.

SCALER, *n.* : hilpirj, bijmêr, jimêrk.

SCALES, *n.* : qertîş.

SCALETAIL, *n.* : dûveqertîş.

SCALE-UP, *n.* : zêdekirina kirê yan mûçeyî (bi rêjeyekê).

SCALING, *n.* : hilpirj, perikên, lêlkirin.

- **LADDER**, *n.* : pêstirka zêdekirina kirê yan mûçeyî bi rêjeyekê.

- **TEARS** : rondikên kovanên behiyan.

SCALL, *n.* : kelpike serî.

SCALLION, *n.* : qurad, pîvazterk.

SCALLOP, *n.* : şeytanokê baweşîn, parçeyek goştê tenik.

SCALLOP, *vt.* : şeytanokê wek baweşînî kom dikit, kartol yan masiyê bi êxinî dipêjin.

SCALLYWAG, *n.* : canewerê hûr yan qels, mirovê pûç.

SCALP, *n.* : pîstê serî.

- **OUT FOR ~** : ewlehî ye ko dijminî bişkînit.

SCALP, *vt.* : (pîstê) serî kevil kirin.

SCALPEL, *n.* : neşter.

SCALP LOCK, *n.* : guliya qebkirinê yan berhengariyê.

SCALPER, *n.* : kevilkerê pîstê serî.

SCALPIFORM, *adj.* : (didan tîj) çîq.

SCALY, *adj.* : qertîşî.

- **FINNED** : şaper qertîşî.

SCAMMONY, *n.* : skamonî : leblaba ji rehan şirêza zikçûnê dihînin der, reha skamonî, şirêza skamonî.

SCAMP, *vt.* : bi lez û bez kar kirin.

SCAMPER, *n.* : revîn, bezîn.

SCAMPER, *v.i.* : revîn, bezîn.

SCAMPERED, *adj.* : bezî, revî.

SCAMPERING, *n.* : bezîn.

SCAMPI, *n.* : amanê mezîn yê robyanî.

SCAN, *n.* : sehkirina hûr, birrîna helbestê.

SCAN, *vt. i.* : qenc seh kirin, pîvan, li armancê geran (bi radarê).

SCANDAL, *n.* : qehbet, abrûbere, abrûçûn, riswa(bûn).

- **MONGER** : qumsî.

SHEET : rojnameya qehbetan.

SCANDALIZE, *vt.* : bêabrû kirin.

SCANDALIZED, *adj.* : bêabrûkirî, riswakirî.

SCANDALIZING, *n.* : bêabrûkirin, riswakirin.

SCANDALOUS, *adj.* : rûreşî, abrûber.

SCANDALOUSLY, *adv.* : riswakî, bi riswayî.

SCANDALOUSNESS, *n.* : riswayîtî.

SCANDENT, *adj.* : badak.

- **VINE** : sexme, suxme, sixme.

SCANDIUM, *n.* : skandiyom : hêmanek metalî û spî ye.

SCANDINAVIAN, *n., adj.* : welatî û zimanê Skandînavya : (Danimark, Norvêj, Swêd û Ayslende).

SCANNABLE, *adj.* : sehkirinbar.

SCANNED, *adj.* : sehkirî.

SCANNER, *n.* : sehker(alav).

- **HEART ~** : dilbîn.

SCANNING, *n.* : sehkirin.

SCANSION, *n.* : birrîn : parçekirina pîvanî ya helbestê.

SCANSORIAL, *adj.* : serketinî, hilpirjînî.

SCANT, *adj., adv.* : çikos, destmiç, rezîl, degmen, kêm, lawaz, bi zehmet, bi kotekî.

SCANT, *vt.* : kêm kirin, nizm kirin, dest girtin.

SCANTILY, *adv.* : bi hindikî, bi kêmî, hema, hindikkî, kêmkî.

SCANTINESS, *n.* : hindikîtî, kêmîtî.

SCANTLING, *n.* : tibabek kêm, parçeyek biçûk, parçeyek dar, dûratiyên darî yan berî (bo avakirinê).

SCANTY, *adj.* : kêm, kem, kêmek, lawaz, nebes.

SCAPE, *n.* : baskokê rehî : baskê biçûk yê bê belg yê ko jî rehê derdikevit, stûna karîteyî : parçeyê serekê di navbera ser û binî de.

- **SCAPE**, *suff.* : paşgir e ko dîmen e.

SCAPEGOAT, *n.* : bizin yan beranê qurbaniyê, qurban.

SCAPEGOATING, *n.* : berpirskirin(sûçkirin)a kesek dî.

SCAPEGRACE, *n.* : bîjî, garîsê çak nabit.

SCAPEMENT, *n.* : revîn.

SCAPHOID, *adj.* : hestiyê wek belemê.

SCAPEPOSE, *adj.* : baskdarê rehî.

SCAPULA, *n.* : kelekoç, kelkelok, şepîlk.

SCAPULAR, *n., adj.* : kirasê fireh yê bê hiçik, nîşana milî, hestiyê milî, perê milî (balinde ye).

- **FEATHERS** : perên binçengî.

- **REGION** : paşmil.

SCAPULARY, *n., adj.* = **SCAPULAR.**

SCAR, *n.* : birîn, şûnbirîn, bizmate, şeqitîn, cêbirîn, şopa mayî li ser baskî pişti werhana belgî, şopa ziyana sozyarî.

SCAR, *vt. i.* : birrîndar kirin yan bûn, wesa azar dan ko şûn bimînit.

SCARAB, *n.* : kêza pîroz ya rîxê li Misra kevn.

SCARABAEID, *n., adj.* : kêz (bi gişti), kêzî.

SCARABAEOID, *adj.* : kêzî (wek kêzê).

SCARABAEUS, *n.* = **SCARAB.**

SCARAMOUCH(E), *n.* : fortek.

SCARCE, *adj., adv.* : kêm, bi zehmet, bi kotek.

SCARCELY, *adv.* : hew, encex.

SCARCEMENT, *n.* : paşveçûna dîwarî, derza vê paşveçûnê.

SCARCENESS, *n.* : hindikîtî, kêmîtî.

SCARCITY, *n.* : hindikîtî, kêmîtî, degmenîtî, kêmayî, hindikayî.

SCARE, *n.* : tirs, hejîvîn.

- **CROW** : kalo.

- **HEAD** : navnîşana hestiyara rojnameyê.

- **MONGER** : tirskar.

SCARE, *vt.* : tirsandin, bizdihandin.

SCARED, *adj.* : tirsayî, tirsandî, bizdihî, hilçandî, toqandî, hejîvî, hejivandî.

- **AWAY** : terpilî, terpilandî, revandî (ji tirsa).

SCARER : tirsînok.

SCARF, *n.* : milpêç, stûpêç.

- **PIN** : sinceqa stûpêçê.

- **SKIN** : kelpikê çermî.

SCARF, *vt.* : dûmahî pêkve girtin (dep, metal yan çerm).

SCARIFICATION, *n.* : şeqitandin, rûşandin.

SCARIFY, *vt.* : şeqitandin, birîndar kirin, (xirmişandin).

SCARING, *n.* : hilçandin, toqandin, bizdandin, tirsandin.

- **AWAY** : terpilandin.

SCARIOUS, *adj.* : hişkperdeyî.

SCARLATINA, *n.* : soreta, taya sor.

SCARLESS, *adj.* : bê birîn, (bê xirmişîn) bê şeqitîn.

SCARLET, *n., adj.* : sor, al, qirmiz(î).

- **FEVER** : soreta, taya sor.
- **LETTER** : tîpa qirmizî : tîpa (A) ko gunehkarên tîrekî pê dax dikirin.
- **RUNNER** : heleza lobiyan.
- **WOMAN** : dêhl.

SCARP, *n.* : berê çeperî : nişîvî yan dîwarî çeperî, nişîviya tîj.

SCARP, *vt.* : nişîv bûn, (şaqolî) birrîn.

SCARRED, *adj.* : şeqitî.

SCARRY, *adj.* : şeqitî.

SCARUS, *n.* : masiyek rengîn e û lam wek niklî ye.

SCARY, *adj.* : bizdihîn, tirsînok.

SCAT, *n.* : strana bê wate yan şopewerî.

SCAT, *vt.* : derxistin, zû çûn, strana bêwate gotin.

SCAT(O)-, *pref.* : pêşgir e ko pîs e, gû ye.

SCATHE, *n.* : ziyan, azar.

SCATHE, *vt.* : êşandin, azar dan, dijwar rexne kirin.

SCATHED, *adj.* : êşandî.

SCATHING, *adj.* : bêqam req (rewişt), gezîn, tîj.

SCATOLOGY, *n.* : gûzanî.

SCATOPHAGOUS, *adj.* : rîxxwer, gûxwer.

SCATTER, *n.* : weşandin, belavekirin, weşek.

- **GOOD** : zehîker, destberdayî.

SCATTER, *vt. i.* : belave kirin, werandin, pijikandin ; past : belavebû, vepijikandin.

SCATTER BRAINED, *adj.* : gewc.

SCATTERED, *adj.* : belave, werandî, çirv, çirvandî, tarûmar, pest, hawîr, pijikandî, pêwerkirî, pijilandî, vepijikandî, vereviyayî.

SCATTERING, *n.* : perşbûn, çirvandin, çirv, belavekirin, werandin, werham, pijikandin, vedan, pertbûn.

SCATTERINGLY, *adv.* : belavbûnkî.

SCATTERING OF LIGHT, *n.* : belavbûna ronahiyê.

SCATTER RUG, *n.* : berrika biçûk (bo raxistinê li şûnek vala li jor).

SCATTILY, *adv.* : hişlawazkî, bi hişlawazî.

SCATTINESS, *n.* : hişlawazîtî.

SCATTY, *adj.* : hişlawaz, xirpo, gewc.

SCAUP, *n.* : texlîtek werdek e.

SCAUPER, *n.* = **SCALPER.**

SCAVENGE, *vt. i.* : maliştin, malîn, paqij kirin, li xwarinê geran, gaza sotî derxistin, metalê buhujî buhujandin.

SCAVENGER, *n.* : pakevan, zibilkêş, pakewan.

SCAVENGER, *v.i.* : li xwarinê geran (di nav gûfikan de : wek simsiyarkî) gaza sotî derxistin.

SCAVENGING, *n.* : paqijkirin.

SCAZON : pîvanek helbesta grekî yan Romayî.

SCENARIO, *n.* : deqa sînemayî, senaryo, melheza şanogerî yan sînemayî.

SCENARIST, *n.* : senaryonivîs.

SCENE, *n.* : dîdar, dîmen, çavbînek.

- **BEHIND THE ~** : nihînî, lipişt perdeya şanoyê, nepenî.
- **PAINTER** : kevalvanê dîmenan.
- **SHIFTER** : nirovê dîdarî yan dîmenî ko li şanoyê diguhorit.

SCENERY, *n.* : dîdar, dîmen, keresteya şanoyê.

SCENESHIFTER, *n.* : guhêrê dîmenan (li şanoyê).

SCENIC, *adj.* : şanoyî, kirdarî, dîmenî.

SCENICALLY, *adv.* : bi dîmenî, dîmenkî.

SCENOGRAPHER, *n.* : neqşkarê dîmenî.

SCENOGRAPHIC, *adj.* : pêwendîdarê neqşkariya dîmenî.

SCENOGRAPHY, *n.* : neqşkariya dîmenî.

SCENT, *n.* : bêhn, bêhnxweş(î), berame, şiyana sehkirinê, sehkirina bêhnê.

- **BOTTLE** : şûşeyê gulavê.
- **GLAND** : livika bêhnê.
- **TO THROW OFF THE ~** : xapandin, şûn berze kirin (winda kirin).

SCENT, *vt. i.* : bêhn kirin, seh kirin, bêhn jê hatin.

SCENTED, *adj.* : bêhnxweş, bêhnkirî.

SCENTLESS, *adj.* : bêbêhn.

SCEPSIS, *n.* : gumana jîrzanî.

SCEPTIC, *n.* = **SKEPTIC.**

SCEPTICAL, *adj.* = **SKEPTIC.**

SCEPTICISM, *n.* : gumankarîtî.

SCEPTRE, *n.* : çogan.

SCHAPPE, *n.* : perûk yan benê avirmîşê paşmayî.

SCHEDULE, *n.* : melheze.

- **ACCORDING TO ~** : wek melhezekirî.

SCHEDULE, *vt.* : melheze kirin.

SCHEDULED, *adj.* : melhezekirî.

- **FLIGHT** : firîna melhezekirî (balafir).

SCHEDULING, *n.* : melhezekirin.

SCHEELITE, *n.* : tengistêta kalsiyoma belûrî.

SCHEMA, *n.* : melheze, hêlkarî.

SCHEMATIC, *adj.* : melhezeyî, pîlanî.

SCHEMATIZE, *vt.* : melheze kirin.

SCHEMATIZED, *adj.* : melhezekirî.

SCHEMATIZING, *n.* : melhezekirin.

SCHEME, *n.* : pîşk, pîlan, melheze, bername.

SCHEME, *v.i.* : pîlan kirin, melheze kirin.

SCHEMER, *n.* : pîlangêr, pîşkar.

SCHEMING, *n.* : ewan, duberî, binvekolan.

SCHERZANDO, *adv., adj.* : mûzîqeyiya şad .

SCHERZO, *n.* : mûzîqeya çalak, sivik û şad.

SCHISM, *n.* : duberekîtî, rêbazgeh, duberî.

SCHISMATIC, *n., adj.* : dubereki, duberîker.

SCHISMATIST, *n.* = **SCHISMATIC.**

SCHISMATIZE, *v.i.* : dubereki kirin.

SCHIST, *n.* : kevrê çînên têvel yên kanî.

SCHISTOSE, *adj.* : pêwendîdarê kevirê çînên têvel yên kanî.

SCHISTOSOME, *n.* : kirmê xwînmizkî.

SCHISTOSOMIASIS, *n.* : xwînmîzîtî (bilharizya).

SCHIZANTHUS, *n.* : texlîtek gul e, spî binefşî û qirmizî ye.

SCHIZ(O)-, *pref.* : pêşgir e ko kelş e.

SCHIZO, *n.* : tirazank.

SCHIZOCARP, *n.* : meyweyek e (li gehiştinê yek berik e).

SCHIZOGENESIS, *n.* : zaûzêya kelşînî.

SCHIZOGONY, *n.* = **SCHIZOGENESIS.**

SCHIZOID, *adj.* : tirazanî.

SCHIZOPHRENE, *n.* : tirazandar (nesaxê tirazanê).

SCHIZOPHRENIA, *n.* : tirazan.

SCHIZOPHRENIC, *adj.* : tirazanî.

SCHIZOPOD, *n., adj.* : pêkelşî.

SCHIZOPODOUS, *adj.* : pêkelş.

SCHIZOTHYMIC, *adj.* : tirazanbarîtiyî.

SCHIZOTHYMIA, *n.* : tirazanbarîtî.

SCHMALTZ, *n.* : hişa serkirî.

SCHNORKEL, *n., v.i.* : alava bakêşana noqarî, ba kêşan .

SCHOLAR, *n.* : zana, hozan, pirzana, pişkniyar, nas.

SCHOLARLY, *adj.* : pispor, zana, rewşenbîr.

SCHOLARSHIP, *n.* : rewşenbîrî, zanyarî, nas, bexşa xwendinê.

SCHOLASTIC, *n., adj.* : dibistanî, zankoyî, jîrbêjiyî.

- **AGENT** : pêşkarê karî bo dîtina seydayan.
- **THEOLOGY** : olzaniya hûr.

SCHOLASTICALLY, *adv.* : bi ravekirinî.

SCHOLASTICISM, *n.* : ravekirinîtî.

SCHOLIAST, *n.* : raveker, perawezker, rêzimanzan, lêdiwankar.

SCHOLIASTIC, *adj.* : rêzimanî.

SCHOLIUM, *n.* : rave, têbînî, perawêz.

SCHOOL, *n.* : dibistan, hîngeh, xwendegeh, fêrgeh, qotabxane, celebê masiyan.

- **PRIMARY ~** : dibistana seretayî.
- **SECONDARY ~** : dibistana amadeyî.
- **BAG** : çenteyê dibistanê.
- **BOY** : şagird, qotabî.
- **CERTIFICATE** : fêrname.

SCHOOL, *v.i.* : hîn kirin, fêr kirin.

SCHOOLABLE, *adj.* : dibistanbar (hînbar).

SCHOOL BOARD, *n.* : civata dibistanê.

SCHOOL BOOK, *n.* : kitêba dibistanê.

SCHOOL EDITION, *n.* : çapa dibistanê (kitêb).

SCHOOL FELLOW, *n.* : hogirê dibistanê.

SCHOOL GIRL, *n.* : keçika li dibistanê, qotabî(keç).

SCHOOLHOUSE, *n.* : avahiyê dibistanê.

SCHOOLING, *n.* : têçûna fêrkirinê, rahînan, perwerde kirin, hînkirina dibistanê.

SCHOOL INSPECTOR, *n.* : pişkinêrê dibistanê.

SCHOOLMAN, *n.* : kardarê dibistanê, seyda, mamosta.

SCHOOLMASTER, *n.* : seyda yan kardarê dibistanê.

SCHOOLMATE, *n.* : hevalê dibistanê.

SCHOOLMISTRESS, *n.* : kardara dibistanê.

SCHOOL TEACHER, *n.* : hînker yan fêrkerê dibistanê.

SCHOOL TIME, *n.* : demê xwendinê.

SCHOONER, *n.* : keştî, gemiya babirekî, tirarê mezin yê bîreyê.

SHORL, *n.* : berek reş û nivhêja ye.

SCHUSS, *n., vt. i.* : hilisîna rasta gelek lezîn, nişîviya hilîsînê, hilisîn kirin (nişîvî).

SCHWA, *n.* : dengê bizwênê nediyar.

SCIAGRAPHY, *n.* : hunera tarîkirinê (li neqşkirinê).

SCIAGRAM, *n.* : wêneyê tîrêja îks, wênegirî bi tîreja îks.

SCIAMACHY, *n.* : şerê aşopî.

SCIATIC, *adj.* : kemaxî, janerehî.

- **ARTERY** : sordemarê kemaxî.
- **NERVE** : şîndemarê kemaxî.

SCIATICA, *n.* : janereh, rehêşan, reha *bayî, rehêş.*

SCIENCE, *n.* : zanîn, zanyarî, zanistî, zanatî, zanist, hîn.

- **APPLIED ~** : zanîstiya rahînî.
- **PURE ~** : zanistiya bijîn.
- **FICTION** : aşopiya zanistî.
- **OF LAW** : qanûnzanî.

SCIENTER, *adv.* : jîrekî.

SCIENTIAL, *adj.* : zanînî.

SCIENTIFIC, *adj.* : zanistî, zanyarî.

- **BOOKS** : kitêbên zanistî.

- **INSTITUTE** : zanîngeh.
- **METHOD** : rêbaza zanistî.
- **TERMINOLOGY** : zaravzaniya zanistî.

SCIENTIFICATION, *n.* : aşopkirina zanistî.

SCIENTIFICALLY, *adv.* : bi zanistî.

SCIENTISM, *n.* : zanistîtî, zanyarîtî.

SCIENTIST, *n.* : zana, zanistdar, hîna zanyar.

SCIENTIZE, *v.i.* : zanistî kirin.

SCIENTIZED, *adj.* : zanistîkirî.

SCIENTIZING, *n.* : zanistîkirin.

SCIENTOLOGY, *n.* : ola ayînî ya zanistî û karê giyanî li ser bûna madî.

SCILICET, *adv.* : anko.

SCILLA, *n.* : helezek wek zebatî ye.

SCIMITAR, *n.* : şûrê çemayî.

SCINTIGRAPHY, *n.* : wênegiriya endam yên leşî.

SCINTILLA, *n.* : gerdîle, tîbabek.

SCINTILLANT, *adj.* : çirîskî, teyisî.

SCINTILLATE, *v.i.t.* : teyisîn, çirîsîn.

SCINTILLATED, *adj.* : çirîsî.

SCINTILLATING, *n.* : tirûske, teyisîn.

SCINTILLATION, *n.* : kilpe, tirûske.

SCINTOLLO COUNTER : tirûskejimêr.

SCINTOLLOMETER, *n.* = **SCINTOLLOCOUNTER.**

SCIOLISM, *n.* : zirzanayî.

SCIOLIST, *n.* : zirzana.

SCIOLOSTIC, *adj.* : pêwendîdarê zirzanayî.

SCIOMANCY, *n.* : berbîniya sawîrî, (berbînî bi sawîriya mirî).

SCION, *n.* : nevî, timlok.

SCIRRHOID, *adj.* : peji : wek pêjbûna tîraveya req.

SCIRRHOSITY, *adj.* : pejîtî.

SCIRRHOUS, *adj.* : pejî.

SCIRRHUS, *n.* = **SIRRHOSITY.**

SCISSILE, *adj.* : birrdar, kelşdar.

SCISSION, *n.* : birrîn, dabeşbûn.

SCISSOR, *vt.* : birrîn.

SCISSORS, *n.* (**PAIR OF ~**) : cawbirr.

- **AND PASTE** : danana kitêban ji birrîna kitêbbendî.

SCIUROID, *adj.* : sivoreyî, wek dûvê sivoreyî.

SCIURINE, *adj.* : ji tuxmê sivoreyî.

SCLER(O)-, *pref.* : pêşgir e ko req e, hişk e.

SCLERA, *n.* : spîlka çavî.

SCLERENCHYMA, *n.* : tevnê req yê xaneyê.

SCLERIASIS, *n.* : hişkbûna tevnî.

SCLERODERMA, *n.* : çermhişkî, qeşamî.

SCLEROID, *adj.* : tevnhişkî, hişk.

SCLEROMA, *n.* : reqbûna tevnê mirî.

SCLEROMETER, *n.* : hişkîpîv.

SCLEROPHYLL, SCLEROPHATE, *n.* : heleza têrtevnreq ko nahêlit av ziwa bibit.

SCLEROSE, *vt. i.* : req bûn, req kirin.

SCLEROSED, *adj.* : reqbûyî.

SCLEROSIS, *n.* : reqbûn.

- **DISSEMINATED ~** : reqbûnbelave.
- **MULTIPLE ~** : reqbûna kevn ya tevnê mejî û karîteyê piştê.

SCLEROTIC, *adj.* : pêwendîdarê reqbûna perdeyan.

SCLEROTITIS, *n.* : reqbûna perdeya spîlka çavî.

SCLEROUS, *adj.* : req, reqbûyî.

SCOBS, *n.* : pîne.

SCOFF, *n.* : pêkenîn, tirane, tevz.

SCOFF, *v.i.* : pêkenîn, tirane kirin.

SCOFFER, *n.* : tiraneker.

SCOFFING, *n.* : tirane(kirin), henek, tewz.

SCOLD, *n.* : têxurîn.

SCOLD, *v.i.t.* : rezîl kirin, xurîn, têxurîn.

SCOLDING, *n.* : tehandin, lêhilatin, rezîlkirin.

SCOLEX, *n.* : serê kirmê şerîtî.

SCOLIOSIS, *n.* : ladana rexekî ya karîteyê piştê.

SCOLLOP, *n., vt. i.* = **SCALLOP.**

SCOLOPACEOUS, *adj.* : wek tivîrkî (balinde ye).

SCOLOPENDRA, *n.* : zov.

SCOLOPENDRINE, *n.* : sedpê.

SCOLOPENDRIUM, *n.* : heleza sevxes, (gez).

SCOMBLER, *n.* : texlîtek masî ye.

SCONCE, *n.* : çeper, ser, kilox, hiş, mûm, kêlka nerm, sikrê axê.

SCONCE, *vt.* : çeper kirin, asê kirin.

SCONE, *n.* : kiloca pan ya girûvir.

SCOOP, *n.* : heske, hesko, çemçik, hesk, çemçe, kefgîr, kefçî, simkut.

- **NET** : tora heskî (bo maliştina binê rûbarî).

SCOOP, *vt.* : bi heskî bûn, bi heskî vala kirin, zûtir nûçe belav kirin.

SCOOPER, *n.* : belavkerê zûtir yê nûçeyê.

SCOOT, *n.* : derketina bilez.

SCOOT, *v.i.* : bi lez çûn.

SCOOTER, *n.* : yekçerx (bo zarokan).

SCOOTERIST, *n.* : hajoyê duçerxa bizwênerî.

SCOPA OR SCOPULA, *n.* : guliya mûyê biçûk yê wek firçeyê nemaze li ser lingên mêşan.

SCOPATE, SCOPIFEROUS, SCOPIFORM, SCOPULATE OR SCOPULIFORM, *adj.* : pêwendîdarê guliya mûyê biçûk yê wek firçeyê.

SCOPE, *n.* : dûrbîn, perdeya radarê, merem, armanc, delîve, mewda, mawe.

- **NET** : tora heskî (bo maliştina binê rûbarî).

- **SCOPE**, *suff.* : paşgir e ko bîn e, dîtin e.

SCORBUTIC, *adj.* : eskerpotî (nesaxiyek ye), skorbûtî.

SCORCH, *n.* : şewat, sotina rûyekî, reşbûna tevnê helezî ji ber nesaxiyê yan germiyê.

SCORCH, *vt. i.* : erd û saman sotin, gezîn (bi tiraneyê), bi lez hajotin.

SCORCHER, *n.* : şewat, kel, nemaze roja bêqam germ.

SCHORCHING, *n.* : agirnak, sotan, kel, gezîn.

SCORCHINGLY, *adv.* : bi sotinî, bi şewatî, sotinkî.

SCORE, *n.* : sercem, encam, pêkan, birîn, xirmişîn, nîşana destpêkê yan dumahiyê, jimar, deyn, nîşana jîmartinê.

- **ON MORE ~ S THAN ONE** : ji hoyekê pitir.

- **ON THAT ~** : ji wî layî yan rexî ve.

- **TO PAY (SETTLE) OLD ~** : tole vekirin yan standin.

SCORE, *vt. i.* : tomar kirin, jîmartin, xirmişandin, li armancê dan.

SCOREBOARD, *n.* : depê pêkanan.

SCOREKEEPER, *n.* : tomarkerê pêkanan.

SCORER, *n.* : nîşandar, yarîkerê pêkanan bûn.

SCORIA, *n.* : paşmayiya metalê buhujî.

SCORING, *n.* : vêketin, lêketin, nîşandarî.

SCORIACEOUS, *adj.* : pêwendîdarê paşmayiya metalê buhujî.

SCORIFICATION, *n.* : rakirina paşmayiya metalî.

SCORIFY, *vt. i.* : paşmayiya metalî rakirin (bi buhujînê).

SCORING, *n.* : pêketin, vêketin.

SCORN, *n.* : tevz, avir.

- **TO LAUGH (SOMEBODY) TO ~** : tirane pê kirin.

- **TO TAKE (OR THINK) ~** : kot kirin.

SCORN, *vt.* : kot kirin, nizm kirin, (rûmetî).

SCORNFUL, *adj.* : riswa, tiro, tevzdar.

SCORNFULLY, *adv.* : bi tevzdarî, bi riswayî, tevzdarkî.

SCORNFULNESS, *n.* : riswayîtî, nizoyîtî.

SCORPAENID, *n., adj.* : dûpişkî.

SCORPIO, *n.* : dûpişk (bircek e).

SCORPIOID, *n., adj.* : dûpişkî.

SCORPION, *n.* : dûpişk.

- **FISH** : masîdûpişk.

- **FLY** : mêşdûpişk.

- **GRASS** : giyadûpişk.

SCOT, *n.* : Skotlendî, skoç.

SCOT, *n.* : paredan (wek baca niho).

- **AND LOT** : barê hemî bajêrî helgirtin.

SCOTCH, *n., adj.* : Skotlendî, şeqîtek Skotî, Skoç.

- **MAN** : skotlendî.

- **TAPE** : şerîta şeqitînê.

- **TERRIER** : seyek nêçîrê ling kurt e.

- **VERDICT** : biryara nevebirr.

- **WOMAN** : jina skotlendî.

- **WOODCOCK** : hêkên li ser masiya enkovî ya birajtî.

SCOTCH, *vt.* : xirmişandin, herişandin, tepeser kirin, gîro kirin.

SCOTER, *n.* : werdedek daryayî û mezin e.

SCOT-FREE, *adj.* : bê ziyan, bê bac, bêsiza, saxlem.

SCOTIA, *n.* : qalibê rûçal nemaze li binê kanîteyî.

SCOTLAND YARD, *n.* : Skotlendyard, polîsê Londonê.

SCOTO-, *pref.* : pêşgir e ko tarî ye.

SCOTODINA, *n.* : gêjîtî.

SCOTOMA, *n.* : tarîtî : piniya tarî ya dîtinê.

SCOTS, *n., adj.* : skotlendî.

SCOT(T)ICE, *adj.* : bi skotî.

SCOTTICISM, *n.* : hevoka skotî.

SCOTTICIZE, *v.i.t.* : skotî kirin (edet zarav).

SCOTTISH, *adj.* : skotlendî.

- **RITE** : ola skotlendî (avakerên serbest : fermeson).

SCOUNDREL, *adj.* : garîş, rûreş, çepel.

SCOUNDRELDOM, *n.* : çepelîtî, garîsîtî.

SCOUNDRELISM, *n.* = **SCOUNDERLDOM.**

SCOUNDRELLY, *adv.* : bi garîsî.

SCOUR, *n.* : paqijkirin, vemiştin, zikçûn.

SCOUR, *vt.* : paqij kirin, zik çûn, vemiştin.

SCOURED, *adj.* : pişaftî, hesikandî.

SCOURER, *n.* : paqijker.

SCOURGE, *n.* : tajang, karesat, bobelat.

SCOURGE, *vt.* : siza kirin, celde dan, eşkence dan, dijwar rexne kirin.

SCOURGED, *adj.* : (dijwar) sizakirî.

SCOURGING, *n.* : celdekirin.

SCOURING, *n.* : pişaftin, hilpişaftin.

SCOUT, *n.* : dîdevan, gerîde, dîtevan, mirov, çapok, çost, pêşrew, pêşeng, lawik.

- **CAR** : otomobîla gerîde.

- **MASTER** : rêberê pêşengan.

- **'S CAMP** : hobey çapokan.

SCOUT, *v.i. t.* : zêrevanî kirin, seh kirin, tirane yan tevz pê kirin.

SCOUTER, *n.* : pêşeng, sehker, nêrevan.

SCOUTING, *n.* : nêrevanî.

SCOUTS, *n.* : çapok, pêşrew(an).

SCOW, *n.* : sendel, aman, texlîtek belem e.

SCOWL, *n.* : mirûs, rûtalî.

SCOWL, *v.i. t.* : mirûs yan mirîto bûn.

SCOWLING, *n.* : rûtal, rûtehl, miçû mor, mirûsî.

SCOWLINGLY, *adv.* : bi rûtalî, bi mirûşî, bi miçûmorî.

SCRABBLE, *vi.* : (bê ser û ber) nivîsîn.

SCRABBLED, *adj.* : (bê serûber) nivîsî.

SCARBBLING : nivîsîna bêserûber.

SCRAG, *n.* : mirov yan canewerê (leş) lawaz.

SCRAG, *vt.* : sêdare kirin, xeniqandin, stû şikandin.

SCRAGGED, *adj.* : sêdarekirî, stûşkandî.

SCRAGGING, *n.* : sêdarekirin, stûşikandin.

SCRAGGY, *adj.* : barik, lawaz, zirav.

SCRAM! INTERJ. : wêde! wêde here! wêve here!.

SCRAMBLE, *n.* : xuşîn, hilpirjîn, paldan(bi milan).

SCRAMBLE, *v.i. t.* : xuşîn, hilpirjîn, kom kirin yan bi dest ketin (nerewayî), pal dan, lez kirin (bizdihayî), têkil kirin.

SCRAMBLED, *adj.* : paldayî (bi milan).

SCRAMBLING, *n.* : paldan (bi milan).

SCRAMMED, *adj.* : (cihde) wêve çûyî.

SCRAMMING, *n.* : (cihde) wêve çûn.

SCRANNEL, *adj.* : lawaz (deng), req, nemûzîqeyî (guh êşandin).

SCRANNY, *adv.* : zirav, barîk.

SCRAP, *n.* : sirîn, paşmawe, paşmayî, sikrap, şer, cerenîx.

- **BOOK** : tomara birriyan.
- **HEAP** : koma metalê havêtî (sikrap).
- **IRON** : asinê havêtî.

SCRAP, *vt.* : havêtin, şer kirin, cerenîx kirin.

SCRAPE, *n.* : verenîn, tengavî, cerenîx, şûna verenî.

SCRAPE, *vt.* : verenîn, rêya xwe bi zehmet birrîn, kolîn, hilandin (werdan).

SCRAPER, *n.* : renek.

SCRAPIE, *n.* : nesaxiya xurîniya pezi.

SCRAPING, *n.* : verenîn, çeltandin, lêlkirîn, verotîn.

- **OFF** : verenîn, dataşîn.

SCRAPPER, *n.* : şerker, şerok.

SCRAPPLE, *n.* : rehkên berazî : qîmeyê goştê berazî li gel arî wek rehkan diqelînin.

SCRAPPY, *adj.* : şerok, şikesteki, destdirêj.

SCRATCH, *n., adj.* : şeqîtek, şeqitî, şeqitîn, xurîn, roşan.

SCRATCH, *vt. i.* : xurandin, xurmişandin.

SCRATCHED, *adj.* (**OFF**) : şeqîtî, roşandî.

SCRATCHINESS, *n.* : xurînîtî.

SCRATCHING, *n.* (~ **OFF**) : verenîn, verandin, roşandin, xurandin, verotîn, şeqitandin.

- **GROUND** : gevzek.
- **UP TO ~** : wek meremê.

SCRATCH LINE, *n.* : xalka derketinê (pêşbirke yan pêşbezîn).

SCRATCH PAPER, *n.* : kaxeza reşnivîsê.

SCRATCH SHEET, *n.* : weşîna hespên ji pêşbirkeyê derxistîn yan kişayîn.

SCRATCH TEST, *n.* : azmûna hestiyarî (bo dermanî).

SCRATCHY, *adj.* : dirr, têrstirî, xurînî, feramoşî yan bi lez berpekirî, ne lêkdayî, tîreçîrî.

SCRAWL, *v.i. t.* : bê ser û ber nivîsîn yan neqş kirin.

SCRAWNY, *adj.* : lawaz, barîk.

SCRAY, *n.* : balindeyek deryayî ye.

SCREAK, *n., vi.* : qîj, qîj kirin.

SCREAKY, *adj.* : qîjî.

SCREAM, *n.* : hawar, qîr, qîj, qarqar, qêrqêr, qûrîn.

SCREAM, *v.i. t.* : qîj kirin, qîr kirin, qûrîn.

SCREAMER, *n.* : qîjker.

SCREAMING, *n.* : qîjkirin, qîrkirin, qijandin, qîjîn, qûrîn, zarezar.

SCREAMINGLY, *adv.* : bi qîjî, qîjkî.

- **TO ~ UP** : mit kirin, mit bûn, êdî nenivîsîn û neaxiftin, derî û pencerk girtin, firoşgeh girtin, parastin.

SHUT, *adj.* : girtî, daxistî.

SHUT DOWN, *n.* : daxistin.

SHUT-IN, *n.* : danîştek, mit, cudawaz, nefta girtî (di nav çalê de).

SHUTOFF, *n.* : birrek, rawestek, birrîn, rawestandin.

SHUTOUT, *n.* : pêşbirkeya bêpêkan.

SHUTTER, *n.* : derwaze, kilom.

SHUTTER, *vt.* : daxistin yan girtin (bi derwazeyî).

SHUTTING, *n.* : pêvedan, zetim, miçandin, daxistin, girtin.

- **ONE'S EYES** : çav neqandin.

SHUTTLE, *n.* : mekok, pizik.

- **COCK** : yariya lêdana tepedora perkirî ko dihêt û diçit.

- **DIPLOMACY** : diplomasiya mekokî (hatûçûyî) yan pizikî.

SHY, *n., adj.* : rûgirtî, rûsar, şermîn, şermende, rûzer, fedok, şermok, fehêtok.

- **TO FIGHT ~ OF** : xwe dûr kirin, xwe vedan.

SHY, *vi.* : şerm kirin.

SHYING, *n.* : potketin.

SHYNESS, *n.* : şermîtî, şermîn, şerm, terîqî, fedî, fihêt, fehêtî, şermokî, fehêt.

SHYLOCK, *n.* : şaylok : sûd yan havil xwerê dilreq.

SHYSTER, *n.* : parêzerê çivo.

SIALOAGOGIC, *adj.* : gilîzî.

SIALAGOGUE, *n.* : gilîzker : dermanê gilîzkirinê.

SIAMANG, *n.* : texlîtek meymûn e.

SIAMESE, *n., adj.* : welatî yan zimanê Siyamê (Taylend).

- **CAT** : kitika Siyamê : kitikek (pisîsek) kehî û zirav û çavşîn e.

- **TWINS** : cêmikê pêkve.

SIB, *n., adj.* : mirov, xizm.

SIBILANCE, *n.* : dengê fitikê.

SIBILANCY, *n.* = **SIBILANCE.**

SIBILANT, *n., adj.* : fitkî, fikekar, tîpa fitikî.

SIBILANTLY, *adv.* : bi fikeyî.

SIBILATE, *vt. i.* : fişîn kirin.

SIBILATED, *adj.* : fikekirî.

SIBILATING, *n.* : fikekirin.

SIBILATION, *n.* : fişîn, fişkîn, wizwiza maran, kofîn.

SIBLING, *n.* : xizm, mirov, bira yan xuşk.

SIBYL, *n.* : pîrhevî, berbîn, oldar, xefzan (jin).

SIBYLINE, *adj.* : pêwendîdarê pîrejîna berbîn.

SIC, *adv., vt.* : êrîş kirin, arandin bo êrîşê wesa.

SICCATIVE, *n., adj.* : zuhaker (ya merekebê).

SICK, *adj.* : nesax, nexweş, bîmar, kovandar, qels, bedhal, tûsm, zilik.

- **BAY** : nexweşxaneya keştî, nexweşane.

- **BED** : nivînên nesaxî.

- **ROOM** : jora çarekirinê.

SICKEN, *v.i. t.* : nesax bûn, nexweş bûn, bêzar bûn, bêzar kirin.

SICKENED, *adj.* : bêzar.

SICKENER, *n.* : bêzarker.

SICKENING, *adj.* : bêzardar, nesaxdar.

SICKISH, *adj.* : leşêş, bêzar.

SICKLE, *n.* : das, merendî.

- **BILL** : nikildas : her balindeyê ko nikilxwehr e.
- **FEATHER** : perê dasî (perê dirêj yê dûvê keleşêrî).
- **SMALL ~** : dasik.

SUCKLINESS, *n.* : sivikta, monî.

SICKLY, *adj.* : lawaz, mon, qels, bê av û reng, pepûk.

SICKNESS, *n.* : êş, nexweşî, nesaxî, dilxirabûn, levdan, xelan, levbûn.

- **CASE** : awayê nexweşî.

SIDE, *n.* : rex, tenişt, al, newq, olax, oltax, kêlek, la.

- **ARM** : çekê kêlekê (wek debanceyê).
- **BURNS** : cênik.
- **DISH** : amanê rexekî : xwarina neserekî.
- **EFFECT** : karîgera rexekî.
- **GLANCE** : dîtin yan têriwana rexekî.
- **HAIR** : bisk.
- **ISSUE** : pirsa rexekî (ne serekî).
- **KICK** : dostê dilsoz.
- **LIGHT** : ronahiya rexekî.
- **LINE** : rêz, dêra hêla rexekî.
- **LOCK** : bisk.
- **LONG** : rexekî, ne êkser, ladayî.
- **OF THE CHEST** : tenişt.
- **OF THE HUMAN BEING** : kêlek.
- **ON THE RIGHT ~ OF FORTY** : ji çilê (sal) kêmtir e.
- **ON THE ~** : li ser vêra yan hindêra.
- **ON THE WRONG ~ OF FORTY** : ji çilê pitir e(jî).
- **TO PUT ON ~** : difna xwe bê behane bilind kirin.
- **TO SPLIT OR BURST ONE'S ~** : têr kenîn.
- **TO TAKE ~ S WITH** : lagîrî kirin, tagîrî kirin, layek girtin.

SIDE, *vi.* : pişt girtin, layek girtin, piştgîrî kirin.

SIDED, *adj.* : piştgîrkirî.

SIDER(O), *pref.* : pêşgir e ko asin e.

SIDEREAL, *adj.* : stêrî.

- **DAY** : roja stêrî (23 demjimêr, 56 hûrek û 4,09 çirke).
- **HOUR** : demjimêra stêrê : _ ji roja stêrê.
- **MINUTE** : 1/60 ji demjimêra stêrê.
- **MONTH** : heyva stêrî : (27 roj, 7 demjimêr, 43 hûrek û 11,5 çirke).
- **TIME** : demê stêrî.
- **YEAR** : sala stêrî : demê gerana erdê li dor rojê pêrgstêrên rawestayî : 365 roj, 6 demjimêr, 9 hûrek û 9,54 çirke).

SIDERITE, *n.* : karbonata asinî.

SIDE ROAD, *n.* : riçe.

SIDEROSIS, *n.* : nesaxiya karê asinî.

SIDES, *n.* : hawîr.

SIDESADDLE, *n.* : xurcezîna rexekî.

SIDESHOW, *n.* : nîşangeh yan dîmenê rexekî.

SIDESLIP, *n., vi.* : tehisîna rexekî, rexekî tehisîn.

SIDESPIN, *n.* : zivirîna rexekî.

SIDESPLITTING, *adj.* : kêlekêş : (ji keninê yan pêkenîne).

SIDESTEP, *v.i. t.* : pêngava rexekî.

SIDESTEP, *v.i. t.* : pêngava rexekî havêtin, xwe vedan.

SIDESWIPE, *n., vt.* : lêdanek rexekî, rexekî lê dan.

SIDETRACK, *n., vt.* : hêl yan şûna rexekî, duhem paye, paye kêm kirin.

SIDEWALK, *n.* : peyare.

SIDEROGRAPHY, *n.* : neqşkirina li ser polayî.

SIDEWARD(S), *adj., adv.* : rexekî.

SIDEWAY, *n., adj., adv.* : rêya rexekî, rexekî.

SIDEWAYS, *adj., adv.* : rexekî, ji rexî.

SIDE-WHEEL, *adj.* : rexekî çerxkirî.

SIDE-WHEELER, *n.* : belema rexekî çerxkirî.

SIDE-WHISKERS, *n. pl.* : simbêlên rexekî.

SIDEWINDER, *n.* : kulma rexekî ya dijwar, marek biçûk û zengildar e.

SIDING OR SIDETRACK, *n.* : depên diwarên derveyî avahiyên darî.

SIDLE, *n.* : çûna rexekî.

SIDLE, *vi.* : rexekî çûn.

SIEGE, *n.* : alboqe(dan), dorgirtin, werhatin, gemaro.

- **GUN** : topa dorgirtinê.
- **WORKS** : çeper, pena (bo dorgirtinê).

SIEGE, *vt.* : dorgirtin, abloqe kirin.

SIEGING, *n.* : rexûdorgirtin, çarhêlgirtin.

SIENNA, *n.* : ax.

SIERRA, *n.* : sirta çiyayên zinarkirî.

SIERRAN, *adj.* : pêwendîdarê çiyayên gopîtk zinarkirî.

SIESTA, *n.* : nivistina nîvro.

SIEVE, *n.* : bêjing, hêleg, êleg, dobjen, serend, karmax.

- **COARSE ~** : seren.
- **MAKER** : bêjingçêker.
- **SELLER** : bêjingfiroş.
- **TUBE** : boriya bêjingî, parçeyek ji tîvilî wek boriyê biriti ye ji xaneyên wek bêjingê kunkirî.

SIEVE, *n.* : bêjînkirin.

SIEVING, *n.* : bêjingkirin.

SIFAKA, *n.* : canewerek memikdar wek meymûnê dûv dirêj û reş û spî.

SIFT, *vt. i.* : bêjing kirin, dan ber bêjingê.

SIFTER, *n.* : bêjingvan.

SIFTING, *n.* : bêjingkirin.

SIGH, *n.* : bawiş, axîn, pirze, ah, ahîn.

SIGH, *v.i. t.* : bawişîn ; past : bawişî.

SIGHING, *n.* : bawişîn.

SIGHT, *n.* : dîdar, awirek, dîmen, dîtin, bîn, bînayî.

- **AT OR ON ~** : gava dîtinê.
- **IN ~ OF** : li ber çavan.
- **OUT OF ~** : veşartî.

SIGHT, *vt.* : dîtin.

SIGHTBILL OR SIGHT DRAFT, *n.* : diravguhêz (dan gava dîtinê).

SIGHTED, *adj.* : dîtî.

SIGHTING, *n.* : dîtin.

SIGHTLESS, *n.* : kore, bêdîtin.

SIGHTLESSLY, *adv.* : korekî, bi koreyî.

SIGHTLESSNESS, *n.* : koreyîtî.

SIGHTLINESS, *n.* : ciwanî.

SIGHTLY, *adj.* : ciwan, taze.

SIGHTMETER, *n.* : dîtinpîv, bînahîpîv.

SIGHT-SEER, *n.* : gerîde.

SIGHT-SEEING, *n.* : dîmendîtin.

SIGIL, *n.* : bêje yan alava girîmane ko hêza cadûyî(xirsî) heye.

SIGILLATE, *adj.* : wek mohra nîşankirî nimûne çespandî (gilkarî).

SIGMA, *n.* : tîpa (hejdem ya) grekî.

SIGMOND COLON, *n.* : zeblota badayî.

SIGN, *n.* : nîşane, rêzanî, nîşan, nîşanek, hêma, şeql.

- **CONVENTION** : nîşaneya amaje.
- **POST** : kêla nîşanê.

SIGN, *v.i. t.* : îmza kirin.

- **OFF** (weşînê) rawestandin, dûmahiya bernameyê agehdar kirin.

SIGNABLE, *adj.* : îmzabar.

SIGNAL, *n., adj.* : nîşan, nîşane, hêma, berz, nayab.

- **MAN** : nîşanger.
- **OF DISTRESS** : hawar.
- **STRENGH** : nîşana xurtiyê.

SIGNAL, *vt. i.* : nîşan kirin.

SIGNALIZATION, *n.* : nîşankirin.

SIGNALIZE, *vt.* : nîşan kirin.

SIGNALIZED, *adj.* : nîşankirî.

SIGNALIZING, *n.* : nîşankirin.

SIGNALLED, *adj.* : nîşankirî.

SIGNALLER, *n.* : nîşanker.

SIGNALLING, *n.* : nîşankirin.

SIGNALLY, *adv.* : bi nayabî, bi berzî.

SIGNALMENT, *n.* : raveya hûr ya mirovekê.

SIGNARY, *n.* : siyayiya nîşanên ko dibin elfabeya zimanekê.

SIGNATORY, *n., adj.* : îmzaker (li ser belgenameyê).

SIGNATURE, *n.* : îmza.

- **TUNE** : awaza nimûneyî ya êzgehekê (êstegehekê) yan bernameyekê.

SIGNBOARD, *n.* : depê agehdariyan.

SIGNER, *n.* : îmzaker.

SIGNET, *n.* : mohr.

SIGNIFICANCE, *n.* : şopewerî, kirok, çemik, bayex, giringî.

SIGNIFICANCY, *n.* : derbirrînîtî.

SIGNIFICANT, *adj.* : şopewer.

SIGNIFICANT FIGURES, *n.* : jimareyên şopewerî, renûsên jimareyî ko bihayî diyar dikin.

SIGNIFICANTLY, *adv.* : bi şopewerî, şopewerkî.

SIGNIFICATION, *n.* : wate.

SIGNIFICATIVE, *adj.* : nîşandar, dirûva girîmane.

SIGNIFY, *vt. i.* : nîşan kirin.

SIGNING, *n.* : îmzakirin, navdanîn.

SIGN LANGUAGE, *n.* : zimanê nîşankirinê, zimanê kerran yan yê nezanên zimanekê.

SIGN MANUAL, *n.* : navdanîn nemaze navdanîna qiralî li serê belgenameyê.

SIGNORY, *n.* : derebegî.

SIKE, *n.* : celal.

SIKH, *n.* : sîk.

SILAGE, *n.* : saylo, sîlo.

SILAGE, *vt.* : kirin nav sîloyê.

SILENCE, *n.* : huşbûn, mitî, bêdengî.

SILENCE, *vt.* : bêdeng kirin, mit kirin.

SILENCER, *n.* : mitker, kipker.

SILENCING, *n.* : mitkirin, huşkirin.

SILENT, *adj.* : mit, mat, bêdeng, mat.

- **FILM** : filmê bêdeng.
- **PARTNER** : hevkarê mit : hevkarê bêdeng (li kardariya karî).

SILENTLY, *adv.* : teletel, bi mitî, mitkî.

SILENTS, *n.* : filmên bêdeng yên sînemayî.

SILENUS, *n.* : pîremêrê wek Xudayê daristanê.

SILESIA, *n.* : perûkê kitan yan pembûyê tenik.

SILEX, *n.* : oksîdê duhem yê silîkonê, cama bergirê germiyê.

SILHOUETTE, *n.* : reşî : wêneyê sîberî.

SILHOUETTE, *v.* : wêneyê sîberî neqş kirin.

SILIC(O)-, *pref.* : pêşgir e ko silîkon e.

SILICA, *n.* : silîka : oksîdê duhem yê silîkonî.

- **GEL** : texlîtek silîkaya celatînî ye.

SILICATE, *n.* : xwêya tirşiya silîka.

SILICEOUS OR SILICIOUS, *adj.* : silikonî.

SILICO-, *pref.* : pêşgir e ko silîka ye.

SILICIC, *adj.* : silikî, silîkayî.

- **ACID** : tirşiya silîkî, tirşiya silîkayî.

SILICOCOLOUS, *adj.* : silîkonî.

SILICIDE, *n.* : silîsîd.

SILICIFEROUS, *adj.* : silîkayî.

SILIFICATION, *n.* : silîkakirin.

SILICIFIED WOOD, *n.* : darê silîkakirî.

SILICIFY, *vt. i.* : silîka kirin.

SILCILE, *n.* : ber (meywe) ya xerdelkî.

SILICON, *n.* : silîkon : hêmanek ne metalî ye.

SILICONE, *adj.* : xerdelkî.

SILICOSIS, *n.* : jehrbûna silîkonî : bêhntengiya toza silîkonî.

SILIQUA, *n.* : texlîtek xerdel e.

SILK, *n., adj.* : avirmîş, awrîşim.

- **GLAND** : avirmîş derker yan derper.
- **HAT** : kulavê avirmîş.
- **OAK** : darberûyê avirmîşî.
- **PURE ~** : çilîk.
- **VELVET** : mexmûrê avirmîşî.
- **WORM** : kirmê avirmîşî.

SILK, *vi.* : reh hînan der (ya genimî).

SILKALINE, *n.* : perûkê pembûyê tenik bo perdeyan.

SILKEN, *adj.* : avirmîşî.

- **MATERIAL** : qutînî.

SILKILY, *adv.* : nermkî, bi nermî.

SILKINESS, *n.* : avirmîşîtî.

SILK-STOCKING, *adj.* : goreyên avirmîş.

SILKWEED, *n.* : giyaavirmîş.

SILKY, *adj.* : nerm, avirmîşî.

SILL, *n.* : derîzan.

SILLABUB, *n.* : texlîtek xwarin e (şîr û şerab li gel keşkî).

SILLER, *n.* : dirav, pare, zîv.

SILLERY, *n.* : texlîtek şampên e (vexwarin).

SILLILY, *adv.* : bi gewcî, gewckî.

SILLIMANITE, *n.* : silîmenît.

SILLINESS, *n.* : bodilî, xirpoyî, kerîtî, herzeyî, kenokî.

SILLY, *n., adj.* : debeng, gelho, tiro, bodil, legam, sersam, tirok herze, zirrek, gewc, xirpo, cilfir.

SEASON : demê tirane (havîn bo rojnameyan).

SILMANAL, *n.* : dariştinek metalî.

SILO, *n.* : sîlo, kendo, seylo.

SILT, *n.* : mîl, lîm, sêlak, sêlax, sonk, lîte, tilol.

SILT, *vt. i.* : lîm bûn, teji lîm bûn.

SILURID, *n.* : masiyek rûbarî ye.

SILVA, *n.* : dar, teraş (li deverekê yan welatekî).

SILVAN, *adj.* : xudabanûya teraşan, teraşî : teraşnişîn.

SILVER, *n.* : zîv, zîw.

SILVER, *v.i. t.* : zîv kirin.

SILVER AGE, *n.* : rojgarê zîvî.

SILVER ARTICLES, *n.* : keresteyên zîvî.

SILVER BELL, *n.* : teraşek gulspî û zengilî ye.

SILVERBERRY, *n.* : tûzîv : teraşek belg û ber zîvîn e (reng).

SILVER BROMIDE, *n.* : biromîdê zîvî : pêkhatiyê hestiyarê ronahiyê bo wênegiriyê.

SILVER CHLORIDE, *n.* : klorîdê zîvî : herdem magnetkirî ye.

SILVER CORD, *n.* : werîsê zîvî : pêgirika sozyarî ya daykê bo zarokî.

SILVERED, *adj.* : zîvkirî.

SILVER FISH, *n.* : zîvmasî, şekiralîs, pêtika kirînde.

SILVERING, *n.* : zîvkirîn.

SILVER LINING, *n.* : berzîv.

SILVER NITRATE, *n.* : zîvav, kevreagir.

SILVER PAPER, *n.* : kaxeza zîvî.

SILVER-PLATED, *adj.* : zîvkirî.

SILVER SCREEN, *n.* : zîvperde : perdeya sînemayê.

SILVER SIDES, *n.* : masiya teniştzîvî.

SILVERSMITH, *n.* : zîvger, zîvker.

SILVERSMITHY, *adj.* : zîvgerî.

SILVER-TONGUED, *adj.* : zimanhilî.

SILVERWARE, *n.* : amanên zîv.

SILVER WEDDING, *n.* : bireweriya bîstû-pêncsaliya şûkirinê.

SILVERY, *adj.* : zîvî.

SILVICULTURE, *n.* : daristanzanî.

SIMAR, *n.* : kirasê fireh yê jinan.

SIMIAN, *n., adj.* : meymûn, meymûnî.

SIMILAR, *adj.* : wek hev, wek yek, hevcor, hevta, wekê, weko, wek, şiptî, manend, mîna, nol, nolanî, hevreng.

SIMILARITY, *n.* : çonyekî, wekyekî, hevyekî, mînahî, hevtayî.

SIMILE, *n.* : mînandin, lêkçûn.

SIMILITUDE, *n.* : wekîtî, rûwekî, wekîkirin, wêneyê wek resenî.

SIMILIZE, *v.i. t.* : wek hev kirin.

SIMMER, *n.* : kelîn.

SIMMER, *v.i. t.* : kelîn.

SIMNEL-CAKE, *n.* : kiloc bo cejna pişt yan paş ramanê.

SIMONIAC, *n.* : kiriyar yan firoşiyarê şûnkarê oldarî.

SIMONIACAL, *adj.* : bazarê payedariya ayînî.

SIMONIZE, *vt.* : vemiştin (bi mûmî).

SIMON PURE, *n.* : rastemirov, heyberê bijîn.

SIMONY, *n.* : kirîn û firotina payedariya ayînî.

SIMOOM, *n.* : sebûn, gireba.

SIMPER, *n.* : bişkurîn (ne jî dil).

SIMPER, *v.i. t.* : bişkurîn (ne jî dil).

SIMPERED, *adj.* : bişkurî.

SIMPERING, *n.* : bişkurîn.

SIMPLE, *n., adj.* : sade, sakar, asan, sawîlk, sana, sanahî, kawik, hêsan, asayî, sadeyî, sefîl.

- **BEAUTY** : ciwaniya nexemilkirî.
- **DIET** : xwarina sade.
- **EQUATION** : hevkêşeya sade.
- **FRACTION** : şikesteya sade.
- **FRACTURE** : şikestina sivik.
- **HEARTED** : dilsade.
- **IDEA** : hizra sade.
- **INTEREST** : sûd yan havila sade.
- **MINDED** : hişsade, xirpo.
- **TENSE** : boriya têdeyî.

- **VERB** : lêkera sade.
- **VOW** : sonda sade : ko dihêlit oldar jinê bihînit.
- **WORD** : peyva sade.

SIMPLETON, *n.* : mirovok, gemje, gemjel, lajik.

SIMPLEX, *adj.* : sade, tek.

SIMPLICISM, *n.* : sadeyîtî.

SIMPLICITY, *n.* : asanîtî, hêsanîtî, sadeyîtî.

SIMPLIFICATION, *n.* : sadekirin, asankirin.

SIMPLIFIED, *adj.* : sadekirî, asankirî.

SIMPLIFY, *vt.* : sade kirin, asan kirin, hêsan kirin.

SIMPLISM, *n.* : (bêqam) sadeyî.

SIMPLY, *adv.* : bi sadeyî, sadekî.

SIMULACRUM, *n.* : wêneyê tiştekê.

SIMULANT, *adj.* : handan.

SIMULATE, *vt.* : han dan.

SIMULATED, *adj.* : handayî.

SIMULATING, *n.* : handankirin.

SIMULATION, *n.* : handan(bûn).

SIMULCAST, *n., vt.* : weşîna êzgeh û televizyon di yek demî de, hosa weşandin.

SIMULTANEITY, *n.* : hevdemîtî.

SIMULTANEOUS, *adj.* : hevdem, yekdem, hawkat.

- **EQUATIONS** : hevkêşeyên hevdemî.

SIMULTANEOUSLY, *adv.* : bi hevdemî.

SIMULTANEOUSNESS, *n.* : hevdemîtî.

SIMURGH, *n.* : sîmerx.

SIN, *n.* : guneh, gunehî, gunah, ayilî, sûç, beze.

SIN, *v.i. t.* : guneh kirin.

SINAITIE, *adj.* : Sînayî (çiya).

SINANTHROPUS, *n.* : mirovê wek meymûnî.

SINAPISM, *n.* : venûsînka xerdelê.

SINCE, *adv.*, prep., conj. : jî, hînga, lewra, ji ber ko.

SINCERE, *adj.* : dilrast, canecan, dilsoz, dirustkar, dilqenc, rastbêj, rastgo, heyran.

SINCERELY, *adv.* : dilsozkî, bi dilsozî.

SINCERENESS, *n.* : dilsozîtî.

SINCERITY, *n.* : dilsozî, heyranî, canbicanî, dirustkarî, dilqencî.

SINCIPUT, *n.* : ser (ji eniyê ta serî).

SINE, *n.* : berîk (sêgoşezanî).

- **CURVE OR WAVE** : kirv yan pêla berîkî.
- **OF ANGLE** : berîka goşeyî.
- **VERSED ~** : yeke kêm hawberîk.

SINECURE, *n.* : erkê nekarîger.

SINECURVE, *n.* : kirv yan kevana berîkî.

SINE DIE, *adv.* : tako demek ne diyarkirî.

SINE QUA NON, (*l.*) : mercê pêviyayî.

SINEW, *n.* : hêz, jêder, jê, reh.

SINEW, *vi.* : qayim kirin.

SINE WAVE, *n.* : pêla berîkî.

SINEWY, *adj.* : qayim, jêdar, jêyî, jehî demarî.

SINFONIA, *n.* : serawaz, sîmfonî.

SINFONEITTA, *n.* : simfonîk.

SINFUL, *adj.* : gunehbar, gunehkirî, hamoş.

SINFULLY, *adv.* : bi gunehdarî.

sinfulness : gunekarîtî.

SINLESS, *adj.* : bêguneh.

SINLESSNESS, *n.* : bêgunehîtî.

SING, *vi.* : strandin, stran gotin.

SINGE, *n., v.i.t.* : sotina serveyî, sotin.

SINGEING, *n.* : sotandin, sotin.

SINGER, *n.* : dengbêj, stranbêj, goranîbêj,

meqambêj, dîlokvan, dîlokbêj, lavijbêj, hozan.

SINGH, *n.* : şerker (Hindî).

SINGING, *n.* : strîn, strandin, laje.

- **BIRD** : balindeya strankar.

- **VOICE** : dengstranî.

SINGLE, *n., adj.* : tekane, tek, tak, yek, kit, tenya, raçandî, raçandin.

SINGLE, *vt.* (out) : nimûne kirin, helbijartin.

- **TO ~ OUT** : helbijartin.

SINGLE-BREASTED, *adj.* : yekrêz (qopçe).

SINGLE COMBAT, *n.* : şerê tekî (di navbera du mirovan de).

SINGLE ENTRY, *n.* : tektomar (defterdarî).

SINGLE-HANDED, *adj., adv.* : tekdestî, bi tenê.

SINGLE-HEARTED, *adj.* : rastok, dilsoz, emekdar.

SINGLE-MINDED, *adj.* : dilsoz, yekarmanc.

SINGLE-NAME PAPER, *n.* : yekîmza (qoçan).

SINGLENESS, *n.* : tekîtî.

SINGLE-PHASE, *adj.* : yek qonax yan koçe.

SINGLES, *n., adj.* : pêşbirkeya tekî, pêşbezîna tekî.

SINGLE-SPACE, *vt.* : tîpkirin yan çapkirina bê rêz hêlan.

SINGLET, *n.* : tak, bin kumlekê mêran.

SINGLE TAX, *n.* : yekbac : baca li ser yek tiştî.

SINGLE TICKET, *n.* : pisoleya yekrê (carekê).

SINGLETON, *n.* : tekkaxez, tekzayî (ne cêmik).

SINGLE-TRACK, *adj.* = **ONE TRACK.**

SINGLY, *adv.* : bi tekî, tekkî.

SINGSONG, *n., adj.* : helbest yan strana yekawaz.

SINGULAR, *n., adj.* : tak, kit, yekînî.

- **NUMBER** : peyva jimartak.

SINGULARITY, *n.* : tekîtî, takîtî, gêreyîtî, kesîtî.

SINGULARIZATION, *n.* : takirin.

SINGULARIZE, *vt.* : tek kirin, gêre kirin.

SINGULARLY, *adv.* : bi gêreyî, awarteyî yan êkaneyî.

SINHALES, *n., adj.* : welatî yan zimanê gelê Sirîlanka (berê Seylan).

SINISTER, *adj.* : garîs, anîbeş, anîreş.

SINISTERLY, *adj.* : destçepekî, bidestçepî.

SINISTERNESS, *n.* : bedîtî, garîsîtî.

SINISTRAL, *adj.* : destçep.

SINISTRALITY, *n.* : bi destçepîtî.

SINISTRALLY, *adj.* : destçepekî, bi destçepî.

SINISTRO-, *pref.* : pêşgir e ko çep e.

SINISTRORSE OR SINISTRORSAL, *adj.* : çepan.

SINK, *n.* : pêşok.

- **DOWN** : herbilîn.

- **HOLE** : avrêj, destşok, kuna kevrî ko av tê re diçit.

SINK, *v.i. t.* : noqî bûn, noqî kirin.

SINKABLE, *adj.* : noqîbar.

SINKAGE, *n.* : qilot, nizman, çalayî, kolîn, dakolin.

SINKER, *n.* : noqîker.

SINKING, *n.* : noqîkirin, binavbûn, nuqumbûn, noqîbûn, qilotî.

- **FUND** : diravê deyndanê yan têçûnê.

SINLESS, *adj.* : bêguneh.

SINLESSLY, *adv.* : bi bêgunehî.

SINLESSNESS, *n.* : bêgunehîtî.

SINNER, *n.* : gunehkar, gunehbar, şuçdar, bezekar.

SINNET, *n.* = **SENNIT.**

SINO-, *pref.* : pêşgir e ko Çîn e.

SINOLOGIST, *n.* : çînîzan.

SINOLOGUE, *n.* : çînîzan.

SINOLOGY, *n.* : çînîzanî.

SINTER, *n.* : kevir.

SINUATE, *adj.* : girnijî, kenar yan rex pêlî.

SINUATE, *vi.* : girnijîn, kenar pêlî kirin.

SINUATELY, *adv.* : bi kenarpêlî, kenarpêlkî.

SINUATION, *n.* : kenarpêl.

SINUOSITY, *n.* : alandin, şewildan.

SINUOUS, *adj.* : alandî, çepan, aloz, kenarpêl.

SINUOUSLY, *adv.* : bi alozî, alozkî.

SINUS, *n.* : kuna hestî yan tevnî.

SINUSITIS, *n.* : kulbûna berîkên difnê.

SINUSOID : kevana berîkî.

SINUSOIDAL, *adj.* : pêwendîdarê kevana berîkê.

- **SION**, *suff.* : paşgir e bo çêkirina navî.

SIOUX, *n.* (*pl.* **SIOUX**) : mirov yan zimanê girûhek ji hozên Hindokên sor yên bakura Emerîka.

SIP, *n.* : fir.

SIP, *vt. i.* : fir kirin, helçinîn.

SIPE, *n.* : çalika tayerê (bo girtina baştir).

SIPHON, *n.* : kêşer, hilmêjk.

- **BAROMETER** : pestanpîva hilmêjkî.
- **BOTTLE** : şûşeyê hilmêjkî.
- **CUP** : alava ronkirinê.
- **GAUGE** : hilmêjkpîv.

SIPHON, *v.i. t.* : hilmijîn.

SIPHONAL, *adj.* : hilmêjkî.

SIPHONED, *adj.* : hilmêjkirî.

SIPHONIC, *adj.* : hilmêjkî.

SIPHONET, *n.* : lûleya hingvînî ya kêça helezî.

SIPHONING, *n.* : hilmêjkirin.

SIPHONIPHONE, *n.* : canewerek zeryayî awête ye.

SIPHUNCLE, *n.* = **SIPHON.**

SIPPET, *n.* : keriyê (ker) nanî.

SIPPING, *n.* : hilçinîn, firkirin, helmijandin.

SIR, *n.* : axa, cenab.

SIRDAR, *n.* : serdar.

SIRE, *n.* : bab, bav, bawk, ezbenî.

SIRE, *vt.* : zayîn (canîk, dewar).

SIRED, *adj.* : zayî (dewar).

SIREN, *n.* : şawirê agadarî, jin, nîv jin û nîv balind e (efsane), fitik.

- **WARNING ~** : zengî agadarî.

SIRENIAN, *n.* : canewerek memikdar û giyaxwer, avî û mezin e.

SIRGANG, *n.* : balindeyek asyayî kesk û çengsor e.

SIRIASIS, *n.* : tavlêdan.

SIRING, *n.* : zayîn (dewar).

SIRKAR, *n.* : hikûmet, serokê hikûmetê yan malbatê (li Hindistanê).

SIRLOIN, *n.* : goştê kêleka çêlê (mange).

SIROCCO, *n.* : bayê jehrî yê digehit Îtaliya.

SISAL, *n.* : rîşalek helezî yê werîsan.

SISKIN, *n.* : texlîtek çûçik e.

SISSY, *adj.* : qûnde.

SISTER, *n.* : xweh, xwîşk, xuşk.

- **IN LAW** : tî, jinti, diş, jinbira.
- **OF GROOM** : berbûk.
- **UTERINE** : xuşka jî dayikê bi tenê.

SISTERHOOD, *n.* : xuşkîtî.

SISTERLESS, *adj.* : bê xuşk, bê xweh, bê xwîşk.

SISTERLINESS, *n.* : xuşkîtî.

SISTERLY, *adv.* : xuşkane, bi xuşkayî.

SISTINE, *adj.* : pêwendîdarê Papa sîkstosî.

- **CHAPEL** : dêrika Sikstîn li Vatîkanê.

SIT, *n.* : rûniştin, daniştin.

SIT, *v.i.t.* : rûniştin, daniştin.

- **TO ~ BACK** : vesihîn, çi kar nekirin.
- **TO ~ DOWN** : rûniştin.
- **TO ~ ON** : xwandin, lê geran.
- **TO ~ ON A COMMITTEE** : beşdarî karê licneyê bûn.
- **TO ~ OUT** : beşdar nebûn.
- **TO ~ TIGHT** : nit bûn, li ser ya xwe (êka xwe) man.
- **TO ~ UNDER** : beşdarî nivêj, wane yan qotara oldarî yan seydayî bûn.
- **TO MAKE SOMEBODY ~ UP** : mirovek bizdihandin.
- **TO ~ UP** : rep rûniştin, hişyar man.
- **TO ~ UPON** : têxurîn, beşdarî dadgehê kirin.

SITAR, *n.* : alavek mûzîqeyî yê hindî ye (wek tembûrê ye).

SIT-DOWN, *n.* : rûniştin.

SITE, *n.* : şûn, şiwên, şiwênewar, dir (der), ping.

SITE, *vt.* : dir helbijartin yan diyar kirin.

SITED, *adj.* : şûnkirî.

SIT-IN, *n.* : asêbûna rûniştinê (wekî nîşandanê).

SITKA, *n.* (**~ CYPRESS**) : darek wek kajî ye.

SITOLOGY, *n.* : xurekzanî.

SITOMANIA, *n.* : zikûniya nesaxî.

SITOPHOBIA, *n.* : xureknexwaz.

SITTER, *n.* : kurk (balinde ye), guhdarê zarokan.

- **IN** : dayîn.

SITTING, *n., adj.* : rûniştî, rûniştin, danîştin, veniştin, danîştek.

- **CROSS-LEGGED** : rûniştina çarmêrkî.
- **DUCK** : armanca hêsanî bo êrîşê yan rexneyê.

SITUATE, *vt.* : direk (şûnek) diyar kirin bo, danan direkê yan li nav mercekê de.

SITUATED, *adj.* : di nav barekê de (baş yan xirab), dir yan şûn girtî.

SITUATING, *n.* : danan.

SITUATION, *n.* : rewş, bar, dox, rewşî, awa, pergal, ton, tonî, kawdan.

SITUS, *n.* : dir, şûn.

SIVA, *n.* : Xudayê hindî.

SIX, *n.* : şeş.

- **AT ~ ES AND SEVEN** : bê ser û ber, bê rêzik tev li hev.
- **CARDINAL DIRECTIONS** : şeşder.
- **FINGERED PERSON** : şeşe.
- **FOLD** : şeş carî.
- **FOOTER** : şeşpê.
- **HUNDRED** : şeş sed.
- **LEAVED** : şeşperî, şeşbelgî.
- **PENNY** : şeş penî (nîv derhem).
- **SHOOTER** : debanceya şeşderb.

SIXTEEN, *n.* : şazdeh, şanzdeh.

SIXTEENTH, *n.* : şazdehemîn.

SIXTH, *n., adj.* : şeşem, şeşemîn.

- **SENSE** : hişa şeşem.
- **TOOL** : şûnpîvk.

SIXTHLY, *adv.* : şeşemîn.

SIXTIETH, *n.* : şêstem.

SIXTUPLE, *adj.* : şeşîne.

SIXTY, *n.* : şêst.

SIZABLE, *adj.* : girş, mezin, gewre, qebe.

SIZAR, *n.* : xwedekarê yarmetîdayî (harîkirî).

SIZE, *n.* : qebare, qeware, meznayî, boşerok.

- **OF A ~** : yek qebare, yek pîv.

SIZE, *vt. i.* : qebare kirin.

- **TO ~ UP** : hizir kirin, qebare kirin, diyar bûn.

SIZEABLE, *adj.* : mezin.

SIZED, *adj.* : qebarekirî, qebaredarê diyar.

SIZER, *n.* : qebareker.

SIZING, *n.* : şirêzkirin, madeyê şirêzî.

SIZZLE, *n., v.i. t.* : gizîn, gizîn kirin.

SIZZLING, *n., adj.* : gizîn, bêqam germ.

SKAT, *n.* : leyiztinek kaxezanê ye.

SKATE, *n.* : hilisîn, tehisîn, texlîtek masî ye.

SKATE, *vi.* : hilisîn, tehisîn.

- **TO ~ OVER A DELICATE PROBLEM** : hişyar nîşan kirin.

- **TO ~ OVER THIN ICE** : li ser babetek hestiyar axiftin.

SKATED, *adj.* : hilisî, tehisî.

SKATER, *n.* : çerixandin, şemitandin.

SKATING, *n.* : hilisîn, şemitandin, çerixandin, xişîn, xilîskan, tehisîn.

SKEAN, SKENE OR SKAIN, *n.* : xencer (Skotlendî, Îrlendî).

SKEE SICKS, *n.* : pûçe mirov.

SKEET, *n.* : werzişa armancê yan nîşan girtinê (sekvaniyê).

SKEETER, *n.* : mêşî, gemiya seholiya yek babirekî.

SKEIN, *n.* : şerîtk.

SKELETAL, *adj.* : qerdodeyî.

SKELETOGRAPHY, *n.* : qerqodezanî.

SKELETON, *n.* : qerqode, qeltax, kelex, wersel.

- **IN THE CUPBOARD OR CLOSET** : şermizariya veşartî.

- **KEY** : kilîla serekî.

- **STAFF** : kêmtirîn kes bo karî.

SKELETONIZE, *vt.* : qerqode kirin, kurt kirin, kêm kirin.

SKELP, *vt. i.* : zilehê, lê dan, çalak pêngavê havêtin.

SKELP, *n.* : zileh, çilaq, çimaq.

SKELPED, *adj.* : lêdayî.

SKELPING, *n.* : lêdan.

SKEP, *n.* : selka girûvir, şaneya mêş hingvînî.

SKEPTIC, *adj.* : gumanxwaz, gumandar, bawermendê gumandarîtiyê.

SKEPTICAL, *adj.* : gumandar.

SKEPTICISM, *n.* : gumandarîtî.

SKERRY, *n.* : girava kevirî.

SKETCH, *n.* : neqş, hêlkarî, dîmena şanoya tiranekerî.

- **BOOK** : namîlkeya hêlkarî, kitêba kurte gotarên torî.

- **MAP** : nexşeya hêlkarî.

- **ROUGH ~** : reşek.

SKETCH, *vt. i.* : reşnivîs kirin, hêlkarî neqş kirin.

SKETCHER, *n.* : neqşker.

SKETCHILY, *adv.* : bi hêlkarî, hêlkarkî.

SKETCHINESS, *n.* : hêlkarîtî.

SKETCHING, *n.* : hêlkar kirin, neqşkirin.

SKETCHY, *adj.* : hêlkar, destpêk, kêm, aloz, lawaz, serveyî.

SKEW, *adj.* : nakok, lader, ladayî, ladan.

SKEW, *v.i. t.* : taqê xwehr.

SKEWBACK, *n.* : banê nişîv.

SKEWBALD, *adj.* : qole.

SKEWER, *n.* : sîx, bist, derabe, şiş, bistik, şîşik.

- **BALD ~** : hespê pinîkirî.

SKEWER, *vt.* : bist kirin.

SKEW LINES, *n.* : hêlên nakok.

SKEWNESS, *n.* : xwehrî, ladan, nakokî.

SKEW RAYS, *n.* : tîşk yan tîrêjên lar.

SKI, *n.* : xişke, şemtok, sorîn, şema.

- **BOOTS** : cezmeyên şemtokî.
- **JUMP** : nişîva şemtokî.

SKI, *vi.* : hilisîn, tehisîn.

SKIAGRAM, SKIAGRAPH, *n.* = **RADIOGRAPH.**

SKIASCOPE, *n.* : ladanpîv : bo pîvana şikestina ronahiyê di nav çavî de.

SKIASCOPY, *n.* : ladanpîvî.

SKID, *n.* : xişke, xişîn, şemtok, sorîn.

- **FIN** : şaperê hevsengî ya rexekî.
- **ROW** : kolana ketinê (kolana xirabkariyê).

SKID, *vt. i.* : hilisîn (bi şemtokê), parastin, girtin (bi şemtokî).

SKIDDED, *adj.* : hilisî.

SKIDDING, *n.* : şemitîn, hilisîn, çerixîn, xişînok, xişîn, xişok.

- **GROUND** : şematok.
- **PLACE** : şematok, xişingeh.

SKIDDOO, *vi.* : çûn.

SKIER, *n.* : hilisînker.

SKIFF, *n.* : belem (sivîk).

SKIFFLE, *n.* : mûzîqeyek folklorî ye ko girûhek lê didit.

SKIING, *n.* : hilisîn, şemitandin, xilîskan, çerixandin.

- **GROUND** : şematok, tehîsok, xişingeh.
- **PLACE** : şematok, tehîsok, xişingeh.
- **RINK** : hilîsgeh.

SKIJORING, *n.* : tehisîna kişanî.

SKI JUMP, *n.* : tehisîna bazdanî.

SKI LIFT, *n.* : bilindkera tehisînê (bilindkera kehrebî bo guhaztina werzişvanan).

SKILL, *n.* : şehrezayî, pisporî, wuryayî, hunêr, hostayî, şarezayî, huner, karameyî.

SKILLED, *adj.* : şehreza, fêris, xasok, karame.

SKILLET, *n.* : axlewîk.

SKILLFUL, *adj.* : şehreza, zîrek, xasok, şehbaz, karame.

SKILLFULLY, *adj.* : bi şehrezayî, şehrezakî.

SKILL-LESS, *adj.* : bêşehrezayî.

SKILLY, *n.* : virrk, giraza rohn.

SKIM, *n., adj.* : tûk, tûkbirin, sertûkê (bêqam) tenik.

- **MILK** : şîrê sertûkbirî.

SKIM, *vt. i.* : sertûk rakirin, kef rakirin, bi lez yan sivik di ser re çûn.

SKIMBLE-SKAMBLE, *adj.* : şaş, pûç.

SKIMMER, *n.* : sertûkgir.

SKIMMIA, *n.* : teraşek her kesk û ber sor e.

SKIMMING, *n.* : sertûk.

SKIMP, *n.* : lawaz.

SKIMP, *vt. i.* : çikosî kirin, bi lez û feramoşî kar kirin.

SKIMPY, *adj.* : çikos, lawaz.

SKIN, *n.* : çerm, pist, pûst, qalik, kevil, tiwêj, dodik, dodank.

- **INFLATED ~** : derf.
- **IN OR WITH A WHOLE ~** : saxlem, bê ziyan.
- **TO ESCAPE BY THE ~ OF ONE'S TEETH** : bi ecêbî rizgar bûn.

- **TO KEEP ONE'S EYES ~ NED** : wurya bûn, hay ji xwe.

- **TO SAVE ONE'S ~** : xwe rizgar kirin.

SKIN, *vt.* : kevil kirin, girtin.

- **TO ~ ONE ALIVE** : revandin, eşkence dan.

SKIN AND BONE, *adj.* : lawaz.

SKIN (BAG), *n.* : meşk, hîz.

SKIN-DEEP, *adj.* : sivik (bawerî), bi kûriya çermî.

SKIN DIVE, *n.* : melevaniya binavê.

SKIN EFFECT, *n.* : lîr, xilt.

SKIN FLINT, *n.* : rijd, çikos.

SKIN FOR FAT, *n.* : hîzê rûn, rûndan.

SKIN GRAFT, *n.* : pîneya çermî.

SKIN GRAFTING, *n.* : pînekirina çermî.

SKINK, *n.* : texlîtek kimkime ye.

SKINK, *vt.* : şerab têkirin.

SKINLESS, *adj.* : bê pûst, hestiyar.

SKINNED, *adj.* : pûstkirî, kevilkirî.

SKINNER, *n.* : kevilfiroş.

SKINNINESS, *n.* : qelsbûn, lêlkirî, qerf.

SKINNING, *n.* : kevilkirin, lêlkirin, pûstkirin, gurîn, gurandin.

SKINNY, *adj.* : weza, lawaz, qels, çermîn, çermok.

SKIN TIGHT, *adj.* : gelek teng, kirasê teng.

SKIP, *n.* : bazdan, rakirin, rêberê tîpa werzişî.

SKIP, *v.i. t.* : bazdan, di ser re çûn, wêve çûn, rakirin, rêberiya tîpa werzişî kirin.

SKI PANTS, *n.* : şelwarê tehisînê.

SKIPJACK, *n.* : masiyek bazder e, kêza çeqçeqok.

SKIPPER, *n.* : serekê balafirê yan gemiyê, kirmê penîrî, kêza çeqçeqok, pelpelîtkek biçûk û lezîn e, kurkê sakar.

SKIPPET, *n.* : sindoqek darî û biçûk e bo parastina mohrê.

SKIPPING, *n.* : bazdan, hêlan.

SKIRL, *n.* : dengê hebanzirnayê.

SKIRL, *v.i. t.* : awaz dan (hebanzirna), hebanzirna lê dan.

SKIRMISH, *n.* : rahiştin.

SKIRMISH, *vi.* : rahiştin.

SKIRMISHER, *n.* : rahiştinker.

SKIRR, *n.* : rimîn, gurjîn.

SKIRR, *v.i. t.* : firîn, bezîn.

SKIRRET, *n.* : helezek reh xwarinbar e.

SKIRT, *n.* : kiras, fîstan, daw, keç, jin, dawên, tiştê dahêlayî.

SKIRT, *vt. i.* : (bi) dehmen kirin, dor girtin, alîn, dor ketin, ji tirsa yan ji rîswabûnê xwe vedan, ecêb rizgar bûn, li dor kenarî geran.

SKIRTED, *adj.* : kiraskirî.

SKIRTING, *n.* : kenar, dehmen, tevn (perûk) yê kirasan.

SKIRTLESS, *adj.* : bêkiras.

SKI RUN, *n.* : nişîva hilisînê.

SKI SUIT, *n.* : saqoyê hilisînê.

SKIT, *n.* : serinc yan têbîniya tirane, kurteşanogeriya tiraneyî.

SKI TOW, *n.* : bilindkera hilisînkeran.

SKITTER, *vi.* : hilisîn yan law bezîn, lerizî şok kêşan , bi lez hilisîn.

SKITTISH, *adj.* : şermîn, ciniqî, bizdihî, demdemî, felîte, yarîker.

SKITTLE, *n.* : yariya stûnkên darî (li ser mêza bilyardê), stûnka darî (ko neh stûnk in û bi tepkên bawlingê dixînin).

SKITTLE, *vt.* : yariya skîtil leyîstin.

SKIVE, *vt.* : tenik birrîn, verenîn (kevlê canewerî), parçetenik kirin (kevl yan lastîk).

SKIVED, *adj.* : (tenik) birrî.

SKIVER, *n.* : kevlê tenik (bo bergkirina kitêbê).

SKIVING, *n.* : (tenik) birrîn.

SKIVVY, *n.* : xidam, bincil (şelwar û kumlekê hiçikkurt).

SKOAL, *intej.* : noş !, nûşî can bit !.

SKUA, *n.* : hefçî.

SKULDUGGERY, *n.* : fêlbaziya xapîn, çiv, fêlbazî, xapîn.

SKULK, *n.* : revî, veşartî, sorikî, xeware-bûyî, revdeyek rûviyan.

SKULK, *vi.* : bi dizîkî ve çûn, revîn, xeware bûn (ji tirsa).

SKULL, *n.* : kilox, kapol, kelle, qepol.

SKULL AND CROSS BONES, *n.* : kilox û du hestiyên xaçkirî : dirûşmê deryagirî.

SKULL CAP, *n.* : kulavê teng : texlîtek helez e.

SKUNK, *n.* : mirovê kotî, canewerek emerîkanî memikdar û biçûk, bêhngenî ye, pûrtê vî canewerî.

- **CABBAGE** : lehena genî.

SKUNK, *vt.* : revandin, pare yan dirav nedan, xapandin.

SKY, *n.* : asman, esman.

- **OUT OF CLEAR ~** : ji nişkekê ve, ne li ber çêbûnê.

- **BLUE** : şînê esmanî, rengê şînê esmanî.

- **BORNE** : bi balafirê guhaztî.

- **CAP** : kolhelgirê balafirê.

- **CLAD (JOC.)** : tazî, rîs, rût.

- **COACH** : balafira bazirganî : ya kêm xizmet.

- **HIGH** : bêqam bilind, bala, parçe parçe dirrandî.

- **LIGHT** : rojîn, rodank, rojne, rojin.

- **LARK** : kilawkore, şivankuj, şivanmijûlk.

- **LINE** : asû yan aso.

- **MAN** : balafirvan.

- **PILOT** : oldar, qeşe, balafirvan.

- **ROCKET**, *n., v.i.t.* : moşek, tîra agirî, bilind kirin, ji nişkekê ve bilind bûn.

- **SCRAPER** : ewravahî (avahiyê bilind).

- **WARD(S)** : ber esmanî ve, bala.

- **WAVE** : pêla esmanî.

- **WRITE** : bi nivîsîna esmanî neqş kirin.

- **WRITTING**, *n.* : neqşkirina bi nivîsîna esmanî (balafir bi dûkêlê).

SKYER, *n.* : lêdanek bilind li yariya kirîkitê.

SLAB, *n., adj.* : parçe goşt yan penîr, dep, xişt, xeşt, debîş, tîr.

- **FLAT ~** : ferş.

- **SIDED** : rexraste (banî), dirêj û lawaz.

SLAB, *vt.* : dabeş kirin (dep yan parçe), têr ron kirin, nixaftin (kaşxank bi dep, xişt yan kerpîçan).

SLABBED, *adj.* : reqfkirî.

SLABBING, *n.* : reqf, hêvişandin.

SLACK, *n., adj., adv.* : sist, dilsar, lawaz, şil, neçalak, xav, qels.

- **SUIT** : kirasê fireh.

- **WATER** : ava peng, demê pengiya avê di navbera radan û nizmbûnê de.

SLACK, *vt. i.* : sist bûn, sist kirin, lawaz bûn.

- **TO ~ AWAY** : (werîsî) sist kirin, xwe vedan(ji erkî û karî), temirîn, lawaz bûn.

- **TO ~ OFF** : sist kirin, zexelî kirin.

- **TO ~ UP** : lez kêm kirin.

SLACKEN, *vt. i.* : sist kirin, sist bûn.

SLACKENED, *adj.* : sistkirî.

SLACKENING, *n.* : sistkirin, dilsarî, sistbûn, dahêzran, zexelî, mirtîn.

SLACKER, *n.* : revî (ji karî û erkî nemaze ji serbaziyê di demê şerî de).

SLACKLY, *adv.* : bi sistî, sistkî.

SLACKNESS, *n.* : sistîtî, rexe, dahêzran, hêvişandin, dilsarî, bêbazarî, mendî, mirtîn.

SLAG, *n.* : kozer (bo tovî û metalên buhujî).

SLAG, *vi.* : kozer bûn.

SLAGGY, *adj.* : kozerî.

SLAIN, *pp.* **OF SLAY** : serjêkirî.

SLAKE, *v.i. t.* : sivik kirin, têr kirin, şil kirin, av dan, lawaz kirin, temirandin, dilniya kirin.

SLAKED, *adj.* : dilniyakirî.

SLAKED LIME, *n.* : qislaw.

SLAKING, *n.* : dilniyakirin.

SLALOM, *n.* : hilisîna çep û çir, pêşbirkeya hilisîna çep û çir.

SLAM, *n.* : serketina nayab, lêdanek dijwar.

SLAM, *vt. i.* : dijwar lê dan, qayim daxistin, şingîn kirin, qayim û bi lez û şingînî pal dan, livandin yan danan.

SLAM-BANG, *adv.* : bi dijwarî, şingînî û holî (daxistin yan girtin).

SLAMMED, *adj.* : dijwar daxistî.

SLAMMING, *n.* : dijwar daxistin yan pêvedan (wek derî).

SLANDER, *n.* : şiltax, polik, bobelat, şiltaq, nebûyî, neweyî, dexesî, ewanî, geveztî.

SLANDER, *vt.* : rûmet kirêt kirin, bêbextî li kesekê kirin, (polik kirin).

SLANDERED, *adj.* : nengîkirî.

SLANDERER, *n.* : paşbêj, paşgo, zimanreş, kinos, duziman.

SLANDERING, *n.* : şiltaxkirin, paşbêjî, polikî, qumsîtî.

SLANDEROUS, *adj.* : bêbext, neng.

SLANDEROUSLY, *adv.* : bi bêbextî, bi nengî, nengkî.

SLANDEROUSNESS, *n.* : nengîtî, bêbextîtî.

SLANG, *n., adj.* : gelêr, zimanê gelêrî.

SLANG, *vt.* : xapandin, req û kirêt êrîş kirin.

SLANGY, *adj.* : pêwendîdarê zimanê gelêrî.

SLANT, *n.* : lader, larî, nişîv.

- **HEIGHT** : bilindiya nişîv.

SLANT, *v.i. t.* : nişîv bûn, xwehr kirin.

SLANTED, *adj.* : çemandî, lader, xol.

SLANTENDICULAR, *adj.* : xwehr, xahr, nişîv.

SLANTING, *n.* : lar, lader, çemandin, nişîv, xolbûn.

SLANTWAYS, *adv.* : bi nişîvî, nişîvkî, bi laderî, bi xwehrî.

SLANTWISE, *adv., adj.* : bi nişîvî, bi xwehrî, xwehrkî.

SLAP, *n., adv.* : çilaq, çimaq, şeqam, lêdan, zileh, weş, sîl, sîlak, çepîn, çelpandin, tep, şap.

- **BANG** : bi dijwarî, bi lez yan qayim.

- **DASH** : bi lez, bi holî, hol, lez dikit, çewa bit.

SLAP, *vt.* : tepeser kirin.

- **TO ~ DOWN** : pabend kirin, qedexe kirin.

SLAPPED, *adj.* : lêdayî (zille).

SLAPPING, *n.* : şaplêdan.

SLAPJACK, *n.* : kiloca şîr û hêk, yariyek kaxezanê ye.

SLAPSTICK, *n., adj.* : komediya erzan û bêqam req, têr dijwarî û reqî.

- **COMEDY** : komediya erzan.

SLAP-UP, *adj.* : nayab.

SLASH, *n.* : kelş, birrîn, erdê vala (li daristanan), çiqmirî, werhana çiqên mirî, kelşa dirêj ya kirasî.

SLASH, *v.i. t.* : kelişandin (bi derbên şûrî yan kêrê), req û gezîn rexne kirin, mûçe kêm kirin, birîndar kirin (bi dirrindeyî, bi şûrî, kêrê yan gîzanê).

SLASHED, *adj.* : kelişandî.

SLASHING, *n., adj.* : keişa dirêj ya kirasî, gezîn, req, çalak, ejdeha, zehf, teyisî.

SLASHINGLY, *adv.* : bi gezînî, gezînkî.

SLAT, *n., adj.* : kemax, kulm, zileh, alê pişta kursîkê, parçetenika dirêj û teng ya dar.

SLAT, *vi.* t. : havêtin yan dijwar lê dan.

SLATE, *n.* : ferş, kevirê ferşan bo nixaftina kaşxankan û nivîsînê, rengê gewr yê tariyê ber erxiwanî ve.

SLATE, *vt.* : dijwar rexne kirin, ferş kirin, nav tomar kirin yan nivîsîn, dem diyar kirin bo, dijwar kulm lê dan.

SLATED, *adj.* : ferşkirî.

SLATER, *n.* : kirmek pirpê (yê ko xwe dipêçit yan girûvir (gogî) dikit eger kesek dest biditê).

SLATHER, *n.* : tibabek mezin, jimarek zehf.

SLATHER, *vt.* : destberdayî xerc kirin, hinîn (bi boyeyê yan nivişkî).

SLATHERED, *adj.* : zehîkirî.

SLATHERING, *n.* : zehîkirin.

SLATING, *n.* : ferşkirin.

SLATTED, *adj.* : lakirî, alkirî.

SLATTER, *n., adj.* : felîte, dêhl, pîs.

SLATTER, *n., vt.* : zehî kirin.

SLATY, *adj.* : gewr.

SLAUGHTER, *n.* : serjêkirin, kuştin, nemaze serjêkirina terşî, kuştar.

- **HOUSE** : gurînxane.

SLAUGHTER, *vt.* : ser jê kirin, kuştin.

SLAUGHTERED, *adj.* : serjêkirî, gorandî.

SLAUGHTERER, *n.* : serjêker.

SLAUGHTERING, *n.* : serjêkirin, gurîn, gurandin.

SLAUGHTERINGLY, *adj.* : bi serjêkirinî, kuştarkî.

SLAUGHTEROUS, *adj.* = **MURDEROUS.**

SLAV, *n., adj.* : Slav, yek ji neteweyên rojhelata ewropî (wek Rûs, Sirb, Bulxar, Polonî...) .

SLAVISM, *n.* : slavîtî.

SLAVE, *n.* : kolî, kol, kole, dîl, carî, bende, zêrkirî, benî, lêz.

- **ANT** : bendemêrî, benîmêrî.
- **DRIVER** : hajo yan zêrevanê bendeyan.
- **GIRL** : navmalî.
- **HOLDER** : xudanê bendeyan.
- **HOLDING** : xudaniya bendeyan.
- **MAKING ANT** : mêriya bendegir.
- **TRADER** : bendefiroş.
- **WORKER** : kolî, benî.

SLAVE, *vi.* : kolîtî kirin, benîtî kirin.

SLAVER, *n.* : bende yan benîfiroş, gemiya benîfirotinê, koledar, bazirganê bendejinan.

SLAVER, *n.* : gilîz.

SLAVER, *vi.* : gilîz hatin xarê.

SLAVERY, *n.* : koleyî, benîtî, bendeyî, koledarî.

SLAVE STATE, *n.* : wîlayeta bendekirina rewa (qanûnî).

SLAVIC, *n., adj.* : zimanê regezê slavî.

SLAVISH, *adj.* : tepeser, kolî, bendeyî.

SLAVOCRACY, *n.* : bendexwazî.

SLAVONIC, *adj.* : slavonî (slavî).

SLAW, *n.* : seleteya kelemî.

SLAY, *v.i. t.* : ser jê kirin, kuştin, gurîn, gurandin.

SLAYED, *adj.* : serjêkirî, gurandî.

SLAYER, *n.* : kuj, serjêker.

SLAYING, *n.* : kuştin, serjêkirin, gurîn, gurandin.

SLEAVE, *n.* : ben, benik.

SLEAVE, *vt.* : (cuda) vebûn (da biibit benên ziravtir).

SLEAZY, *n.* : peritî, tevnê peritî, erzan, nesincî.

SLED, *n.* : xişke, şemtok, sorîn, taxork, cencer, xilîske.

SLED, *vt. i.* : li şemtokî siwar bûn, bi şemtokî guhaztin.

SLEDDING, *n.* : şemtok, xişke.

SLEDGE, *v.i. t.* = **SLED.**

SLEDGE, *n.* : taxork, karan, çekûç, gerran.

SLEDGED, *adj.* : şemitandî.

SLEDGE HAMMER, *n.* = **SLEDGE.**

SLEDGE HAMMER, *adj.* : dijwar, qayim.

SLEDGING, *n.* : şemitandin, çerixandin.

SLEEK, *adj.* : şayik, hilis, hilî, ciwanpûş, tîş, zebloq, los.

SLEEK, *vt.* : vemiştin, hilî kirin.

SLEEKEN, *vt.* : vemiştin.

SLEEKENED, *adj.* : vemiştî.

SLEEKENING, *n.* : vemiştin.

SLEEKER, *n.* = **SLICKER.**

SLEEKY, *adv.* : bi ciwanpûşî.

SLEEKNESS, *n.* : ciwanpûşîtî.

SLEEP, *n.* : razan, nivistin, xew, nûstin, raketin, xewa temar.

- **INDUCING** : xewînk.
- **MAKING ~** : lorandin.
- **WALKER** : şevger, xewger.

SLEEP, *v.i. t.* : nivistin, razan, raketin, veketin.

- **TO ~ ON** : nivistin berdewam kirin.
- **TO ~ ON OR OVER A PROBLEM** : pirs paş xistin (hêş hizir kirin).
- **TO ~ THE CLOCK ROUND** : duwazdeh demjimêran nivistin.
- **TO ~ WITH** : daketin (li gel).

SLEEPER, *n.* : nivistî, razayî.

- **HEAVY ~** : xewgiran.

SLEEPILY, *adv.* : xewekî, bi xewî.

SLEEPINESS, *n.* : xewverevîn, xewdarî, wenewz.

SLEEPING, *n., adj.* : raketin, nivistin, razan, raketî, veketî.

- **BAG** : tûrkê nivistinê.
- **DIFFICULTY** : xewgiranî.
- **MAT** : doşek.
- **PARTNER** : hevkarê nivistî (nenas).
- **PILL** : xewînk.
- **PLACE** : xewgeh.
- **SICKNESS : XEWOKÎ**, nesaxiya nivistinê.
- **SUIT** : pêcame, pîjama.

SLEEPLESS, *adj.* : xewrevîn, bêxew.

SLEEPLESSNESS, *n.* : bêxewîtî, xewverevîn, xewzirran.

SLEEPWALK, *vi.* : xewînk geran.

SLEEPWALKING, *n.* : xewgeran.

SLEEPY, *adj.* : xewînk, xewok.

SLEET, *n.* : lox, pûk, gijik, terze.

SLEET, *vi.* : terze barîn, gijik barîn.

SLEETINESS, *n.* : loxîtî, pûkîtî.

SLEETY, *adj.* : loxî, pûkî.

SLEEVE, *n.* : huçik, hiçik, çîlan, qol, pî, levandan, qilçik.

- **TO HAVE SOMETHING UP ONE'S ~** : hêşta tiştek di paxlê de heye (tiştekê veşartî, hêşta negotiye).
- **TO WEAR ONE'S HEART ON ONE'S ~** : evînî diyar kirin.

SLEEVE, *vt.* : hînan, (bi) hiçik kirin.

SLEEVED, *adj.* : hiçikkirî.

SLEEVELESS, *adj.* : bê hiçik.

SLEEVELET, *n.* : hiçikok.

SLEIGH, *n.* : xişke, taxork.

SLEIGHT, *n.* : lêb, gizî, fêlbazî, canbazî, laban.

- **OF HAND** : destsivik, cerbez.

SLENDER, *adj.* : weza, ferz, lawaz, zirav, barîk, rift, narîn, nazik, jar, qels, tîtelaskî.

- **GIRL** : keçika zirav û hûr.
- **HOPES** : bêhîvî.
- **INCOME** : kêmdahatî.
- **MEANS** : destteng.
- **WAIST** : kemerzirav.

SLENDERIZE, *vt., i.* : zirav kirin, zirav bûn.

SLENDERIZED, *adj.* : ziravkirî.

SLENDERIZING, *n.* : zirav kirin.

SLENDERLY, *adv.* : ziravkî, biziravî.

SLENDERNESS, *n.* : narînî.

SLEPT, *p.* **OF SLEEP** : nivist.

- **WITH** : daket.

SLEUTH, *n.* : polîsê nihênî yan nepenî.

- **HOUND**, *n.* = **BLOOD HOUND.**

SLEUTH, *vi.* : wek polîsê nihênî yan nepenî kar kirin.

SLEW = SLEU, *n.*

SLEW, *p.* **OF SLAY** : kuşt, ser jê kir.

SLEY, *n.* : levenê comkerî.

SLICE, *n.* : teliş, kûz, qaş, zivar, zol, çênî, kîzî.

- **A SMALL ~** : gepek.
- **BY SLICE** : pelpel.
- **OF BREAD** : parî, loq.

SLICE, *vt. i.* : kîzî kirin, kelişandin.

SLICED, *adj.* : pelpelkirî, kîzîkirî.

SLICER, *n.* : zivarker, pelpelker.

SLICING, *n.* : zivar kirin, pelpelkirin.

SLICK, *adj., adv.* : şehreza, nayab, vemiştî, hilî, los, tîş, şayik.

SLICK, *vt.* : hilî kirin.

SLICKENSIDE, *n.* : kevre rûyê hilî.

SLICKER, *n.* : fêlbaz, xapîn, bajêrî.

SLID, *adj.* : hilisî.

SLIDABLE, *adj.* : hilisînbar.

SLIDE, *v.i. t.* : hilisîn.

- **TO ~ OVER** : sivik nîşan kirin (mijadê nazik).

SLIDE, *n.* : şemitîn, hilisîn, xişîn, tehisîn, xişok, xilîskan.

- **FASTENER** : zincîrgir.
- **RULE** : jimarerastek, rasteya bijmêr.
- **VALVE** : derçeya hilisînê.
- **WAY** : rêhilisîn.

SLIDING, *n.* : şemitîn, xilîskan, hilisîn, çerxîn, xişok, xişînok, xuşîn, şiqitîn.

- **DOOR** : deriyê hilîsok.
- **SCALE** : pîveka hilisînê (bo kirê).

SLIGHT, *n., adj.* : piçek, kêm, kem, peritî, pûç, kotî, feramoşî.

- **ATTENTION** : kêm guhdarî yan sexbîrî.
- **OBSERVATION** : kêmzêrevanî.

SLIGHT, *vt.* : feramoş kirin, guh nedan, sivik berê xwe dan.

SLIGHTING, *adj.* : sivikî.

SLIGHTINGLY, *adv.* : bi sivikî, sivikkî.

SLIGHTLY, *adv.* : bi kêmî, piçekê, kêmkî, hindikkî.

SLIGHTNESS, *n.* : hindikayî.

SLIM, *adj.* : rift, jar, zirav, lawaz, barîk, qels, hoqil, weza.

SLIM, *vi.* : zirav bûn.

SLIME, *n.* : pîsatî, lîm, qur, herî, teqn.

- **MOLD** : kivarê lîmî.
- **JIM** : barîk, lawaz.

SLIME, *vt.* : bi teqnê pîs kirin, bi teqnê hinîn.

SLIMLY, *adv.* : qelsekî, bi qelsî.

SLIMMED, *adj.* : ziravbûyî.

SLIMMER, *n.* : ziravker : leşziravkirin.

SLIMMING, *n., adj.* : ziravker : leşziravkirin (wek parêzê).

SLIM(P)SY, *adj.* : lawaz, peritî.

SLIMY, *adj.* : teqnî, lîmî, lîk, debîş, pîs.

SLING, *n.* : berdeqanî, kevirkanî, darlastîk, havêtin, werîsê bilindkirinê, tora werîsan, (bo bilindkirina barî).

- **SHOT** : kevirkanî, berdeqanî.
- **SHOT WAR** : şerê berdeqanî.
- **WAR** : şerê berdeqanî.

SLING, *vt. i.* : qayim havêtin, bi berdeqaniyê havêtin, bilind kirin yan nizm kirin, dahêlan, hilawîstin.

SLINGER, *n.* : berdeqanîvan, kevirkanîvan.

SLINK, *n., adj.* : vedizîn, barîk, lawaz, leş yan hiş yan kesîtiya lawaz.

SLINK, *vt. i.* : vedizîn.

- **AWAY** : şelyan.

SLINKED OR SLUNK, *adj.* : vedizî.

SLINKING, *n.* : vedizîn, sorkandin.

- **AWAY** : şelyan.

SLINKY, *adj.* : vedizînî.

SLIP, *n.* : hilisîn, xiliskan, xişîn, sorikandin, xişok.

- **TO GIVE THE ~ TO** : jê veresîn.
- **TO LET ~THE DOGS OF WAR** şer dest pê kirin.

SLIP, *v.i. t.* : terişîn, şelyan, hilisîn, tehisîn, nizm bûn, veresandin, vekirin, cil zû kirin ber xwe yan xistin.

- **INTO** : vedizîn nav de (cil, nivîn).
- **TO ~ UP** : çewtî kirin.

SLIPCOVER, *n.* : nixava hilisînê.

SLIPE, *vt.* : parçetenik kirin, spî kirin.

SLIP-ON, *n.* : hilîsok : tiştê mirov hêsan dikit ber xwe yan pê xwe.

SLIPPAGE, *n.* : zehîbûn.

SLIPPED, *adj.* : hilisî.

SLIPPER, *n.* : pêlav, sol, şimik.

SLIPPERILY, *adv.* : bi hilîskî, hiliskkî.

SLIPPERINESS, *n.* : hilîskîtî.

SLIPPERY, *adj.* : xiz, xilisk, hilîsk.

SLIPPING, *n.* : sorikandin, hilisîn, çerxîn, xirikîn, şemitîn, xuşîn, xişok, şemitandin.

- **AWAY** : verestin.

SLIP PLANE, *n.* : rastebanîhilisk.

SLIPPY, *adj.* = **SLIPPERY.**

SLIP RING, *n.* : bazina hilisînê (ya bizwênê yan makîneyê).

SLIP SHEET, *n.* : laperê cudaker (di navbera du laperan de).

SLIP SHOD, *adj.* : kevn, peritî, şekalkirî, feramoş.

SLIPSLOP, *n.* : pirbêjî, pûçbêjî, gevezeyî.

SLIPSTREAM, *n.* : bayê vedayî (bi perwaneya balafirê).

SLIPUP, *n.* : çewtî, hele.

SLIP, *n.* : qelş, simt, qol, celx, kelş, derz, kelîştok, pişkivîn.

SLIT, *n., adj.* : dere, derçe, kelş.

SLIT, *vt. i.* : kelîştin (dirêjekî), birrîn.

SLITHER, *n.* : tehisîn.

SLITHER, *vi.* : tehisîn, wek marî xuşîn, tehisandin.

SLITHERING, *n.* : xişok, xişîn, şemitîn, xiliskan.

SLITHERY, *adj.* : şemitînî.

SLIVER, *n.* : şelêlka hirî yan pembûyî, telezm.

SLIVER, *vt. i.* : telezm kirin, telezm bûn.

SLIVERED, *adj.* : telezmkirî.

SLIVERING, *n.* : telezmkirin.

SLOB, *n.* : teqn, sehola deryayî, sade, gewc, pîs, kinco.

SLOBBER, *n.* : gilîz, axiftin yan karê sozyarî (sade).

SLOBBER, *v.i. t.* : gilîz kirin, bi gilîzî pîs kirin, sozyarî axiftin.

- **TO ~ OVER SOMEBODY** : hezkirin yan hijmekarî diyar kirin.

SLOBBERED, *adj.* : gilîzkirî.

SLOBBERING, *n.* : gilîzkirin.

SLOE, *n.* : texlîtek hilîk e.

- **EYED** : çavtarî (reng).
- **GIN** : cin(mey) bi hilîkê tamkirî.

SLOG, *n.* : rêncberî, derbê qayim, dana nav teqnê de, pêşketina zehmet.

SLOG, *v.i. t.* : xurt lê dan, zehmet rêka xwe birrîn, dan nav teqnê de, rêncberî kirin.

SLOGAN, *n.* : dirf, dirûşm.

SLOGANEER, *n., vi.* : dirûşmvan, dirûşm kirin.

SLOGANIZE, *vt.* : dirûşm kirin, kurt û qayim derbirrîn.

SLOID, *n.* : rahînana destkarî.

SLOOP, *n.* : gemiya babirekî (tekdarbabirek).

- **RIGGED** : wek gemiya tekbabirek.

SLOP, *n.* : cil û pertal bo deryavanan, teqnrohn, ava pîs, kirasê fireh, cilên erzan, gilêş.

- **CHUTE** : boriya gilêşî.

SLOP, *v.i. t.* : pîs kirin (bi pizrûka teqnê), (şepirzeyî) xwarin têkirin, zikûnî yan deng bilind xwarin yan vexwarin.

SLOPE, *n., adj.* : xwarayî, xêm, evraz, larî, lêj, nişîvî, berwar.

- **OF HILL** : kaş.
- **UP** : evraz.

SLOPE, *vt.* : nişîv bûn.

SLOPED, *adj.* : nişîv.

SLOPING, *n.* : nişîv, nişivbûn, çemandin.

SLOPPY, *adj.* : neşehreza, (bêqam) zarokî, pîskirî (avekî), teqnî, pîs, rohn, tenik, şil.

SLOPWORK, *n.* : karê neşehreza.

SLOSH, *n.* = **SLUSH** : dengê avê, vexwarina rohn.

SLOSH, *vt.* : bê armanc geran, têk vedan (avekî).

SLOT, *n.* : qol, kun, dere, derçe.

- **MACHINE** : kunkemakîne.

SLOT, *vt.* : kun kirin.

SLOTH, *n.* : tembelî, zexelî, canawerek bê mû li daristanên başûra Emerîka.

- **BEAR** : hirça zexel (tembel) ya reş, hingvînxwera Sirîlanka.
- **MONKEY** : meymûnek Sirîlankî.

SLOTHFUL, *adj.* : zexel, sist, tembel.

SLOTTED, *adj.* : kunkirî.

SLOTTING, *n.* : kunkirin.

SLOUCH, *n.* : mirovê gewc, tembel û jênehatî, çûn, rûniştin.

- **HAT** : şefqeyê dahêlayî : (rex pan û dahêlayî).

SLOUCH, *v.i. t.* : tembel çûn, rûniştin yan rawestîn.

SLOUCHILY, *adv.* : bi sistî, şorîtî.

SLOUCHINESS, *n.* : sistîtî, şorîtî.

SLOUCHING, *n.* : dahêlan.

SLOUCHY, *adj.* : tembel (çûn, rûniştin yan rawestan).

SLOUGH, *n.* : lok yan barişta tevnê miriyê qunêrê, qemitîn.

- **OF DESPOND** : bê hîvîtî.

SLOUGH, *v.i. t.* : qemitîn, qimitîn ; **PAST** : qemiti, qimiti.

- **TO ~ OVER** : pûte pê nekirin.

SLOUGHY, *adj.* : teqnî, kevlî.

SLOVAK, *n., adj.* : slovaki (slavî).

SLOVAKIAN, *n., adj.* = **SLOVAK.**

SLOVEN, *n., adj.* : pîsemirov, leş yan cil pîs, paşketî.

SLOVENE, SLOVENIAN, *n.* : welatî yan zimanê Slovenya.

SLOVENLINESS, *n.* : qirêjîtî, qirêjayî, gemarîtî.

SLOVENLY, *adj., adv.* : xerbende, çepel, cil yan leş rêvîn, feramoş, pîs, bi rêvînî, bi xerbendeyî, rêvinkî.

SLOVENRY, *n.* : bêserûberî.

SLOW, *adj., adv.* : hêdî, hemîn, tewat, mend, xurcilîn, sist.

- **AND SURE** : bê holî.
- **COACH** : mirovê hêdî diçit, hizir kevn û gelho.
- **DOWN** : lez yan kar kêm kirin.
- **DIGESTION** : derenggivêr.
- **FOOTED** : gelho.
- **NEUTRON** : notronên sist.
- **WITTED** : pergele.
- **WORM** : kimkimeyek bêpê ye.

SLOW, *v.i. t.* : hêdî çûn, xurcilîn.

SLOWISH, *adj.* : piçekê hêdî.

SLOWLY, *adv.* : hêdîka, aheste, hêdî.

SLOWNESS, *n.* : hêdîtî.

SLOWPOKE, *n.* : kîselî : mirovê bêqam hêdî (giran) diçit.

SLOYD, *n.* = **SLOID.**

SLUB, *n.* : hiriya piçekê badayî berî ristinê.

SLUB, *vt.* : ristin.

SLUBBED, *adj.* : ristî.

SLUBBING, *n.* : ristin.

SLUBBER, *vt. i.* : pîs kirin, tembelî kar kirin.

SLUBBERED, *adj.* : (neşehreza) karkirî.

SLUBBERING, *n.* : (neşehreza) karkirin.

SLUBBING, *n.* : ristin.

SLUDGE, *n.* : teqn, herî, qur.

SLUDGY, *adj.* : teqnî.

SLUG, *n.* : zexel, tembelxwaz, şeytanokê bê qalik ko helezî dikujît, fîşeka ne rêzikî, gumçika metalî, rêza tîpî.

SLUG, *v.i. t., n.* = **SLOG.**

SLUGFEST, *n.* : pêşbirkeya dijwar (kulmbazî, beysbol).

SLUGGARD, *adj.* : tembel.

SLUGGARDLY, *adv.* : bi tembelî, tembelkî.

SLUGGED, *adj.* : lêdayî, qurquşm yê çapkerî berdayî ser.

SLUGGER, *n.* : kulmbaz yan yarîker yê beysbolê dijwar.

SLUGGISH, *adj.* : gelho, temel, tembel, leşgiran.

SLUGGISHLY, *adv.* : bi tembelî.

SLUGGISHNESS, *n.* : bê bazarîtî, mendîtî.

SLUICE, *n.* : co, derçe, beravek.

- **GATE** : dergehê hilîsok.
- **WAY** : coka beravekî.

SLUICE, *vt. i.* : barîn (baran), şuştin (ax û xîzê zêrhelgir), milîn (milyan).

SLUICY, *adj.* : tavî barîn.

SLUIT, SLOOT, *n.* : geliyê kûr yê baranê çêkirî.

SLUM, *n.* : zinc, taxa hejaran.

SLUM, *vi.* : serdana taxa hejaran kirin.

SLUMBER, *n.* : xew, nivistin, razan, raketin, xewa, temar, xilmaş, hênijîn.

- **WEAR** : cilên nivistinê.

SLUMBER, *v.i. t.* : nivistin, razan, raketin, hênijîn ; past : raket, raza, nivist.

- **TO ~ AWAY** : dem bi nivistinê borandin.

SOVEREIGN, *n., adj.* : serbixwe, serxwebûn, şikûdar, rajorek, serwer.

SOVEREIGNLY, *adv.* : bi serxwebûnî.

SOVEREIGNTY, *n.* : rajorî, serdarî, serdestî, zal, serwerî, payebilindî, şikûdarî, axatî, axayî.

SOVIET, *n.* : Sovyet : şûra.

SOVIETISM, *n.* : Sovyetîtî, şûrayî.

SOVIETIZE, *vt.* : Sovyetî kirin, civatî kirin, şûrayî kirin.

SOVKHOZ, *n.* : çandingeha hikûmetê, sovxoz.

SOW, *n.* : mêberaz.

- **BELLY** : goştê xwêkiriyê barazî.

SOW, *vt.* : çandin, tov kirin.

SOWER, *n.* : tovçîn.

SOWING, *n.* : tovkirin, çandin, tovçînî.

SOWN, *adj.* : çandî, tovkirî.

- **FIELD** : zevî, kewşen.

SOYA(BEAN), *n.* : baqila soya.

SOZZLED, *adj.* (*sl.*) : bêqam mest.

SPA, *n.* : germav, gerav, geraw.

SPACE, *n.* : valatî, valayî, valayetî, vala, bor, esman, asman, kûlên.

SPACE, *vt. i.* : (peyv) ji yek dûr kirin.

SPACE CHARGE, *n.* : bargehê valatiyê.

SPACECRAFT, *n.* : keştîvalayî.

SPACED, *adj.* : cudakirî.

SPACE FLIGHT, *n.* : firîna valatiyê.

SPACE LATTICE, *n.* : tora beyavî : rêzkirina gerdîleyan di nav belûrî de.

SPACELESS, *adj.* : bêvalatî, bêsinot.

SPACEMAN, *n.* : asmanger.

SPACEMARK, *n.* : nîşana cudakirin yan firehkirinê.

SPACE MEDICINE, *n.* : pijîşkiya valatiyê.

SPACE PORT, *n.* : valageh.

SPACE STATION, *n.* : êzgeha valatiyê.

SPACE SUIT, *n.* : cilên valatiyê.

SPACE TIME, *n., adj.* : demê valatiyê.

SPACEWARD, *adv.* : ber valatî ve.

SPACE WRITER, *n.* : nivîserê valatiyê.

SPACIAL, *adj.* : valayî, beyavî, dirî yan şûnî.

SPACING, *n.* : dûrkirin (navbera peyvan), fireyî.

SPACIOUS, *adj.* : fireh, berfireh, firewan, firawan.

SPACIOUSLY, *adv.* : bi firewanî, bi berfirehî.

SPACIOUSNESS, *n.* : firehîtî, firewanî.

SPACKLE, *n.* : hevîr (bo tejîkirina derzan berî boyekirinê).

SPACKLE, *vt.* : hevîr kirin.

SPACKLED, *adj.* : hevîrkirî.

SPACKLING, *n.* : hevîrkirin.

SPADE, *n.* : merbêl, mer, bêl, dolemer.

- **WORK** : bêlkarî.
- **SMALL ~** : hestîv **(FOR FIRE PLACE)**.

SPADE, *vt.* : kolîn.

SPADED, *adj.* : kolayî (bi merbêlê).

SPADEFUL, *n.* : teji merê.

SPADER, *n.* : merbêlvan.

SPADGER, *n.* : çûçik, çiçik.

SPADILLE, *n.* : asê sînek (bêliyanê yan kaxezanê).

SPADING, *n.* : dakolîn, kolîn.

SPADIX, *n.* : stiriya gulê.

SPADO, *n.* : guno, nemêr.

SPAE, *v.i.t.* : berbîn kirin, pêşbîn kirin.

SPAGHETTI, *n.* : rijde, herişte, spageti, rişte.

- **FLAT ~** : rişte.

SPAHI, *n.* : siwarê nerêzikî yê sipayê.

SPAKE, *p.* **OF SPEAK** : axift.

SPALL, *vt. i.* : telezm kirin, telezm bûn.

SPALLATION, *n.* : telezmbûn.

SPALPEE, *n.* : mirovê çikos.

SPAM, *n.* : xureka qotikirî.

SPAN, *n.* : dirêjî, bost, mawe, bist.

- **OF BRIDGE** : dirêjiya pirê.

SPAN, *vt. i.* : pîvan, derbaz bûn, dirêj kirin, bost kirin, pîvan (bi bostê).

SPANDREL, *n.* : valatiya navbera milê taqî û çarkinarê dorgirtî.

- **WALL** : dîwarê li ser kirva taqî avakirî.

SPANG, *adv.* : bi tekûzî.

- **IN THE MIDDLE** : tekûz.

SPANGLE, *n.* : teyisok (bo xemla kirasî).

SPANGLE, *vt.* : xemilandin (bi teyisokên hûr).

SPANGLY, *adj.* : teyisokî.

SPANIARD, *n.* : îspanî, spanî.

SPANIEL, *n.* : tîle.

SPANISH, *n., adj.* : welatî yan zimanê îspanî.

- **AMERICAN** : Emerîkanî-îspanî.
- **BAYONET** : singoyê îspanî : helezek zebatî ye.
- **FLY** : mêşa îspanî : pêtikek kesk û teyisokî ye.
- **MACKEREL** : masiyek deryayî mezin e.
- **OMELET** : hêkên qelandî li gel bîber, pîvaz û bacansorkan (temate).
- **PAPRIKA** : bîbera îspanî.

- **RICE** : birincê îspanî (li gel pîvaz, bîber û bacansorkan).

SPANK, *n.* : lêdan, derbên dengdanî.

SPANK, *vt. i.* : lê dan (nemaze li kemaxê), têxurîn ketin (dengdanî).

SPANKER, *n.* : babireka paşî, hespê lezîn, tiştê nayab, awarte yan mezin.

SPANKING, *n.* : nayab, mezin, law, çalak.

SPANLESS, *adj.* : bê pîvan.

SPANNED, *adj.* : pîvayî.

SPANNER, *n.* : vekok, kilîl, spane.

SPAN-NEW, *adj.* = **BRAND-NEW.**

SPANNING, *n.* : pîvan.

SPAN ROOF, *n.* : banê du rex nişîv.

SPAR, *n.* : tewereyê qayim, darala yan babirek, çengil : çengê balafirê, livîna êrîş yan berevanî (kulmbazî), spar : metalek teyisî û belûrî ye.

SPAR, *vt.* : gemş kirin (wek keleşêran), şer kirin, berhevdan kirin, zirkulmbazî kirin.

SPARABLE, *n.* : bizmarê biçûk yê bêser.

SPARAXIS, *n.* : helezek sosinî ye.

SPARE, *n., adj.* : yedek, barîk, çikos, zirav, lawaz, kêm, destgirtî, çerxa serbar, endamê serbar (tîpa werzişî).

- **HORSE** : êdek, êrdek.
- **PARTS** : parçeyên yedek, spêr.
- **RIB** : parçeya goştê perasûyê nemaze ya berazî.

SPARE, *vt. i.* : hilandin, lêborîn, hêlan, awarte kirin, xwe vedan, çikosî kirin, dilovanî kirin, nerm bûn.

- **MY LIFE** : min nekuje.

SPARED, *adj.* : hêlayî.

SPARELY, *adv.* : bi çikosî, bi destmiçî.

SPARENESS, *n.* : çikosîtî, destmiçîtî.

SPARE RIBS, *n. pl.* : goştê perasûyê berazî.

SPARGE, *vt. i.* : şil kirin, pirijandin, delîn kirin, dilop kirin.

SPARGED, *adj.* : pirijandî.

SPARGER, *n.* : pirijînker, şilker, delênker.

SPARGING, *n.* : pirijîn, weşîn, weşandin.

SPARING, *adj.* : hêlan, lawaz, çikos, destmiç.

SPARINGLY, *adv.* : bi çikosî.

SPARINGNESS, *n.* : çikosîtî.

SPARK(S), *n.* : pilîse, çîk, çirûsk, pirşing, çirîsî, pilîk, bilêç, pîzik, peşk, pît, kilpe, pirîşk, mozrîk.

- **ARRESTOR** : çirîsîgir.
- **COIL** : pêça çirîskê.
- **GAP** : valatiya çirîskê.
- **OF GENEROSITY** : çirîska cîwamêrî yan dilverayiyê.
- **OF LIFE** : çirîska jiyanê.
- **PLUG** : serbenda çirîskê.
- **TRANSMITTER** : gûhêzê çirîskê.

SPARK, *vi.* : pirisîn.

SPARKING PLUG, *n.* = **SPARK PLUG.**

SPARKING WINE, *n.* : şeraba peqîşkî.

SPARKLE, *n.* : çirîsk, çirs, çirûskek, çirîskok, teyisandin.

SPARKLE, *vi.* : çirîsîn, teyisîn.

SPARKLED, *adj.* : teyisî, çirisî.

SPARKLER, *n.* : elmas.

SPARKLESS, *adj.* : bê çirîsk.

SPARKLET, *n.* : çirîskok.

SPARKLING, *n.* : teyisandin, birûsîn.

SPARKLOUS, *adj.* : zelal.

SPARRING, *n.* : şerkirin.

- **PARTNER** : hevalê şerkirinê (kulmbaz bo meşqkirinê).

SPARROW, *n.* : çûçik, çîçik, çûçelek, qijû-

le, çivîk, çivîk, waşe, guncêşk, guncîşk, beytik.

- **SMALL MULTI COLOURED ~** : sivsivîlk.

- **HAWK** : dobrakê çîçikan.

SPARRY, *adj.* : wek yan têr (spar) : kanê belûrî, sparî.

SPARSE, *adj.* : kêm, belave, bilaw, tenik.

SPARSENESS, *n.* : hindikayîtî.

SPARSITY, *n.* : kêmî, kemî.

SPATACIST, *n.* : spartakî.

SPARTAN, *n.* : welatiyê kevne Sparta.

SPAR VANISH, *n.* : boyeya darbabirekan ko bergirî avê ye.

SPASM, *n.* : tevz, rênc, reqbûn, kirjbûn, moçirk.

SPASMODIC(AL), *adj.* : birrî, (ne berdewam), harî, kirjî.

SPASMODICALLY : bi kirjî.

SPASMOLOGY, *n.* : kirjîzanî.

SPASTIC, *adj.* : kirjî, nîvşeht.

SPASTICALLY, *adv.* : şehtkî, bi şehtî.

SPASTICITY, *n.* : kirjîtî.

SPAT, *n.* : gelc, şeytanoka biçûk, hêka şeytanokî, lêketin, çilaq, çimaq, dengê qutanê, serpêlav.

SPAT, *v.i. t.* : şer kirin, çilaq lê dan.

SPAT, *p.* **OF SPIT** : tif kir.

SPATCHCOCK, *n.* : mirîşka serjêkirî paşî vepirtikandî (verûçikandî), vekirî û di cih de pêjtî.

SPATE, *n.* : tibabek zehf, avrabûn, boşbûn, peqîna nişkî.

SPATHACEOUS, *adj.* : nîvkovikî.

SPATHE, *n.* : nivkovikê gulan.

SPATHIC, *adj.* : wek şerê keleşêrî yan kulmbazî yan livîna xelekî.

- **IRON ORE = SIDE RITE.**

SPATIAL, *adj.* : beyavî, valayî.

SPATIALITY, *n.* : beyavîtî, valayîtî, şûnîtî, dirîtî.

SPATIALIZE, *vt.* : valayî kirin.

SPATIALLY, *adv.* : beyavkî.

SPATIOTEMPORAL, *adj.* : di demî û dirî de.

SPATTED, *adj.* : lêdayî.

SPATTEE, *n.* : goreya lingî ya hirî ko jin û zaro bi kar dihînin li ser pêlav û goreyan.

SPATTER, *n.* : pirijîn, pizrûk, leke, pinî, weşîn.

SPATTER, *vt. i.* : kirêt kirin (rûmet pirijandin, pinî kirin, belave kirin, pîs kirin (bi teqnê).

SPATTERDOCK, *n.* : zebata avî ya zer ya bakura Emerîka.

SPATTERING, *n.* : weşandin, weşîn.

SPATTING, *n.* : lêdan.

SPATULA, kefçik yan hestîvka dermansazî.

SPATULATE, *adj.* : (wek) hestîvkî.

SPATULE, *n.* : parçeya pan ya şînkî yan şepîlkî nemaze dûmahîya dûvperê balindeyî.

SPATULAR, *adj.* : pêwendîdarê parçeya pan ya şînkî.

SPATULATE, *adj.* = **SPATULAR.**

SPATULIFORM, *adj.* = **SPATULAR.**

SPAVIN, *n.* : nesaxiya pejbûna navçoka hespî.

- **BLOOD BOG** : pejbûna movikî.

SPAVINED, *adj.* : pêwendîdarê pêjbûna movikî.

SPAWN, *n.* : xerz : hêkên masiyên tov.

SPAWN, *vt. i.* : xerz kirin, hêk kirin (masî), berhem kirin.

SPAY, *vt.* : guno kirin, hêkdank helkêşan.

SPEAK, *v.i. t.* : axiftin.

- **FOR** : bo kesekê axiftin.
- **FOR ONESELF** : bo xwe axiftin, hizra xwe bi xwe derbirrîn.
- **OF** : li ser babetî axiftin.
- **OUT** : eşkera û serbest axiftin.
- **UP** : eşkera û serbest axiftin.
- **WELL OF** : qenc li ser axiftin.
- **SO TO ~** : heker mirov bişêt bêjit.

SPEAKEASY, *n.* : meyxane.

SPEAKER, *n.* : axiftinker, peyvyar, qiseker, gotarbêj, bêje, diwanbêj, dengbilindker, peyvdar.

SPEAKING, *n.* : lêdiwan, axiftin, peyivîn, peyivandin, qisekirin, rewanbêjî.

- **ACQUAINTANCE** : nas.
- **TUBE** : boriya axiftinê li nav avahî de.

SPEAR, *n., adj.* : rim, zergeh, tîr, tirok, nêze, nize, cerîd.

- **FISH** : rimmasî : masiyek deryayî û mezin e.
- **HEAD** : serê rimê, zergehxişt.
- **MAN** : rimbaz.
- **MINT** : tehtavîk, pîng, pûng.
- **SIDE** : çiqê nêr yê malbatê.
- **WORT** : helezek giyayî ye.

SPEAR, *vt.* : kun kirin (bi rimî).

- **FISH** : masî girtin (bi rimî).

SPEARER, *n.* : rimbaz.

SPECIAL, *n., adj.* : taybet, taybetî, serxwe, xweser, xwemalî.

- **ACT** : qanûna taybet.
- **DELIVERY** : pêdana taybet.
- **EDITION** : çapa taybet (kitêb, rojname...).
- **LICENCE** : rêdana taybet.
- **LOGIC** : jîrbêjiya taybet.
- **PLEADER** : rawêjkar.
- **PLEADING** : gotina layekê li dadgehê dijî gotina layê dî.
- **PURPOSE** : merema taybet.
- **TRAIN** : hevkêşa taybet.

SPECIALISM, *n.* : taybetîtî, taybetbûn.

SPECIALIST, *n.* : pispor, karedar.

SPECIALISTIC, *adj.* : pisporî, karedarî.

SPECIALITY, *n.* : pisporîtî, taybetîtî, karê taybet, taybetbûn, xwemal.

SPECIALIZATION, *n.* : pisporîtî, pisporî, taybetbûn.

SPECIALIZE, *vt. i.* : pispor bûn.

SPACIALIZED, *adj.* : pispor.

SPECIALIZING, *n.* : pisporîkirin.

SPECIALLY, *adv.* : nemaze, nexasme.

SPECIALTY, *n.* : taybetbûn.

SPECIATION, *n.* : eger yan hoyê çêbûna texlîtekên nû (bi kirdara guhorînê).

SPECIE, *n.* : dirav, pare, pol.

- **IN ~** : heman, bi diravî, bê guhartin.
- **TO RETURN INSULT IN ~** : kirêtî bi heman çavî vegerandinve.

SPECIES, *n.* : cor, texlîtek, pol, self.

SPECIFIC, *n., adj.* : taybet, corekî, taybetî, corî.

- **CHARACTER** : kesîtî yan kesayetiya taybet.
- **DUTY** : erkê taybet.
- **GRAVITY** : kêşeya taybet.
- **HEAT** : germiya taybet, germexwe, germiya conî.
- **HEAT CAPACITY** : firehiya germiya taybet.
- **INDUCTIVE CAPACITY** : firehî handaniya taybet.

- **IONIZATION** : iyonbûna taybet.
- **POWER** : hêza taybetî.
- **RESISTANCE** : bergiriya taybetî.
- **ROTATION** : zivirîna taybetî.
- **SURFACE** : rûyê taybetî.
- **VISCOSITY** : çiriya taybetî, linciya taybetî.
- **VOLUME** : qebareya taybetî.
- **WEIGHT** : kêşexwe, kêşana taybetî.

SPECIFICALLY, *adv.* : bi taybetî, taybetkî.

SPECIFICATION, *n.* : taybet.

SPECIFICITY, *n.* : taybetîti.

SPECIFICNESS, *n.* : taybetîtî.

SPECIFIABLE, *adj.* : taybetkirinbar.

SPECIFIED, *adj.* : taybetkirî.

SPECIFY, *vt.* : taybet kirin.

SPECIFYING, *n.* : taybetkirin.

SPECIMEN, *n.* : nimûne, rastek.

SPECIOLOGICAL, *adj.* : corîzanî pêwendîdarê zanîna nijadê coran.

SPECIOLOGY, *n.* : corzanî, zanîna nijadê coran.

SPECIOSITY, *n.* : firehîtî.

SPACIOUS, *adj.* : çaka serveyî (xapînî).

SPECIOUSITY, *n.* : çakîtiya serveyî (xapînî).

SPECIOUSLY, *adv.* : bi çakiya serveyî.

SPECIOUSNESS, *n.* : çakîtiya serveyî.

SPECK, *n.* : pinî, leke, pirtik, tibabek bêqam biçûk, goştê qelew, goştê berazî, gamasî yan nehengî, piniya rizî ya meyweyî.

SPECK, *vt.* : pinî kirin.

SPECKLE, *n.* : pinî yan lekeya biçûk.

SPECKLE, *vt.* : pinî yan pîne kirin.

SPECKLED, *adj.* : pinîpinî, pinîkirî, çîl, pitpitk.

SPECKLESS, *adj.* : bê pinî, bê leke.

SPECS, *n. pl.* : berçavik.

SPECTACLE, *n.* : temaşe, dîmen, dîdar.

SPECTACLED, *adj.* : berçavikirî, çawîlkekirî.

- **BEAR** : hirça başûra Emerîka.
- **COBRA** : marê kobrayê Hindî.

SPECTACLES, *n.* : çavik, çavînk, çawîlke, berçavik.

- **CASE** : çavikdank.

SPECTACULAR, *adj.* : temaşe, dîdarî, dîmenî, hestiyar.

SPECTACULARLY, *adv.* : bi hestiyarî, bi dîmenî, hestiyarkî.

SPECTATE, *vi.* : temaşe kirin.

SPECTATED, *adj.* : temaşekirî.

SPECTATING, *n.* : temaşekirin.

SPECTATOR, *n.* : temaşeker, bîner, seyrker, nêrevan.

- **SPORT** : werzişa temaşekeran.

SPECTATRESS, *n.* : temaşeker (keç yan jin).

SPECTRAL, *adj.* : reşekî, sawîrî.

- **LINE** : hêla sawîrî.

SPECTRE, *n.* : sawîr, şebeng, peş, termayî, cendexewn, helamet, reşek, sihme.

- **OF DEATH** : xêz.

SPECTRO-, *pref.* : pêşgir e ko şebengeh e.

- **GRAM** : wêneyê reşekî yan şebengî.
- **GRAPH** : neqşkera şebengeh (alav).
- **GRAPHY** : neqşkeriya şebengî.
- **HELIOGRAPH** : neqşkera şebengê rojê(alav).
- **HELIOSCOPE** : rojşebengbîn.
- **METER** : şebengpîv.
- **METRIC** : şebengpîvî.
- **METRY** : şebengpîvîtî.

- **PHTOMETER** : şebengpîva ronahîkî.

SPECTROSCOPE, *n.* : şebengbîn.

SPECTROSCOPIC(AL), *adj.* : şebengbînî.

SPECTROSCOPICALLY, *adv.* : bi şebengbînî, şebengbînkî.

SPECTROSCOPIST, *n.* : şebengbînzan.

SPECTROSCOPY, *n.* : şebengbînî, şebeng şîtelkarî.

SPECTRUM, *n.* : şebeng, reşek.

- **A WIDE ~ OF INTERESTS** : hewesdarê gelek pirsan.
- **ANALYSIS** : şîtelkirina şebengî.
- **ATOMIC ~** : şebenga gerdîleyî.
- **BAND** : bendîşebeng.
- **EMISSION** : derperîna şebengî.
- **LINE** : hêlîşebeng.

SPECULAR, *adj.* : rûhilî, xudîkî, berçavkî, vebeyînî.

- **IRON** : oksîdê asinî.
- **SURFACE** : rûhiliyê vebeyînî.

SPECULATE, *vi.* : hizir kirin, raman kirin, bazirganiya qoçanên derayî kirin.

SPECULATED, *adj.* : hizirkirî.

SPECULATION, *n.* : hizirkirin, ramankirin, bazarkariya qoçanên diravî.

SPECULATIVE, *adj.* : hizirdar, ramandar, bazarkariya qoçanên diravî.

SPECULATIVELY, *adv.* : metirskî, bi metirsî (bazar).

SPECULATIVENESS, *n.* : metirsîtî (bazar).

SPECULATOR, *n.* : bazarkerê qoçanên darayî.

SPECULUM, *n.* : berçavikên pijîşkî, kevnexudîk, vebeyînker, wêne yan neqşa ko şûnên rêjê yên stêrên gerok diyar dikit.

- **METAL** : darêja mis û temekeyî (bodûrbînan).

SPED, *p.* **OF SPEED** : lez kir.

SPEECH, *n.* : axiftin, gotar, qise, zarav, gilî, bêje, lêdiwan.

- **FREEDOM OF ~** : serbestiya derbirrîna hizrê.
- **THERAPY** : çarekirina çewtaxiftin.

SPEECHFUL, *adj.* : pirpêj.

SPEECHIFICATION, *n.* : axiftinkirin, gotin.

SPEECHIFIER, *n.* : gotarbêj, axiftinker.

SPEECHIFY, *vi.* : gotar gotin, axiftin kirin.

SPEECHLESS, *adj.* : bêaxiftin, lal.

SPEECHLESSLY, *adj.* : mitkî, bi mitî, bi bê axiftinî, bê axiftinkî.

SPEECHLESSNESS, *n.* : bê axiftinîtî, lalîtî, matbûn, matman.

SPEED, *n.* : zûyî, pele, lez, xêrayî, lezitî, lezanî.

- **AT ~** : bi lez.
- **BOAT** : belema lez.
- **LIMIT** : sinorê lezê, leza ewperî.
- **UP** : lezkirina karî.
- **VIBRATION** : lerza lezê.
- **WAY** : rêya lezê, lez rê.

SPEED, *vt. i.* : lez kirin.

- **TO ~ UP** : bi leztir çûn, bi leztir kirin.

SPEEDER, *n.* : lezker.

SPEEDILY, *adv.* : lezkî, bi lez.

SPEEDINESS, *n.* : lezîtî.

SPEEDING, *n.* : lezkirin, xêrakirin, lezgîn, lezîn.

SPEEDOMETER, *n.* : lezpîv.

SPEEDILY, *adv.* : bi lez, reverev.

SPEEDINESS, *n.* : lezîtî.

SPEEDSTER, *n.* : lezker.

SPEEDWELL, *n.* : giyayek biçûk, bask xişok yan hilçûyî û gul şînê vekirî ye.

SPEEDY, *adj.* : lezgîn, sivik pê, lezîn.

SPEISS : pêkhatî yan awêteya zirnîx û asinî ko çêdibit di demê buhujîna kanê xav ê qurquşmî de.

SPELAEAN, *n., adj.* : şikeftnişînî.

SPELEOLOGICAL, *adj.* : pêwendîdarê şikeftzanî.

SPELEOLOGIST, *n.* : şikeftzan.

SPELEOLOGY, *n.* : şikeftnişînzanî.

SPELL, *n.* : niviştî, cadû, xirs, rîq, serdestî yan kêrtêkirina zal, ger, dem.

SPELL, *vt.* : hincandin, dilgir kirin, cadû yan xirs kirin, hêdî û zehmet xwarin.

- **WORD** : peyv hincandin.
- **TO ~** : revandin (bi hincandinê).
- **TO ~ OUT** : diyar kirin.

SPELLBLIND, *vt.* : cadû kirin, xirs kirin, dilgir kirin.

SPELLBINDER, *n.* : çakaxiftinker, bêja.

SPELLBOUND, *adj.* : dêwane, şeyda.

SPELLER, *n.* : hincanker, kitêba hînkirina hincandinê.

SPELLING, *n.* : hincandin, diyarkirin, vehincandin.

SPELT, *p.* **OF SPELL** : vehicandî.

SPELT, *n.* : genimê resen.

SPELTER, *n.* : zink, tûtya.

SPELUNKER, *n.* : heweskarê dîtin û xwendina şikeftan.

SPELUNKING, *n.* : heweskariya dîtin û xwendina şikeftan.

SPENCER, *n.* : kurtesaqo, babir(r).

SPENCER, *n.* = **TRYSAIL.**

SPENCERIAN, *adj.* : bawermendiya guhorîna xwegerî (mekanîkî)ya gerdûnî.

SPENCERIST, *n.* : bawermendê ola guhorîna xwe gerî.

SPEND, *vt. i.* : xerc kirin, mezaxtin, mezixandin.

- **THRIFT** : destberdayî.

SPENDABLE, *adj.* : xercbar.

SPENDING, *n.* : xerckirin, xerc, lêçûn, bizaftin, mezixandin.

SPENT, *p.* **OF SPEND** : xerc kir.

SPENT, *adj.* : lêçûyî, xerckirî.

SPERM, *n.* : tov, nêmik, tuxmav, tuxmaw, avik, tom.

- **WHALE** : nehengek mezin û didandar e yê ko madeyek mûmî berhem dikit jî serî.

SPERM(O)-, *pref.* : pêşgir e ko tov e, tuxmav e.

SPERMACETI, *n.* : madeyê mûmê rûnê serê nehengî.

SPERMADUCT, *n.* : borî yan kerxa tuxmavî.

SPERMARY, *n.* : livika tuxmavê nêr, gun.

SPERMAT-, *pref.* : pêşgir e ko tov e, avik e, mîkrob e.

SPERMATIC, *adj.* : tuxmavî.

- **CORD** : rîviya tuxmavî.
- **FLUID** : nêmik, ava xweş.

SPERMATID, *n.* : xaneya bûn zayendê nêrîk.

SPERMATISM, *n.* : perîna tuxmavî.

SPERMATIUM, *n.* : tuxmavgeh.

SPERMATOCIDAL, *adj.* : tuxmavkuj.

SPERMATOCYTE, *n.* : xaneya tuxmavî.

SPERMATO-GENESIS, *n.* : çêbûna tuxmavî.

SPERMATOGENIUM, *n.* : xaneya nêrî ya tuxmavî.

SPERMATOGENIST, *n.* : tuxmavzan.

SPERMATOGENOUS, *adj.* : (nêr) tuxmavî.

SPERMATOGENY, *n.* : tuxmavzanî.

SPERMATOLOGIST, *n.* : tuxmavzan.

SPERMATOLOGY, *n.* : tuxmavzanî.

SPERMATOPHORE, *n.* : tuxmavdank.

SPERMATOPHYTE, *n.* : helezê tovî.

SPERMATOZOID, *n.* : nêr.

SPERMATOZOON, *n.* (ZOO) : zayendê tyxmavkî.

SPERMINE, *n.* : spêrmîn : madeyek tiftî, rûnî û belûrî ye di nav tuxmavî de.

SPERM OIL, *n.* : zeyta nehengî.

SPERMOPHILE, *n.* : canewerek kirinde ye.

SPERM WHALE, *n.* : nehengek mezin didandar e.

SPEW, *n., v.i. t.* : vereşîn, vereşan, serda çûn.

SPHAGNUM, *n.* : texlîtek kevz e.

SPHALERITE, *n.* : kibrîtîda zinkê.

SPHENE : silikêta kalsiyom û titanyom.

SPHEN(O)-, *pref.* : pêşgir e ko sing e, spîn e.

SPHENOID, *n., adj.* : singî, spînî, hestiyê spînî.

SPHENOIDAL, *adj.* : singî, spînî.

SPHERAL, *adj.* : gogî, saz, hevta.

SPHERE, *n.* : hol, govek, gok, go, biwar, tepik, deretan.

SPHERE, *vt.* : gog kirin.

SPHERED, *adj.* : gogkirî.

SPHERIC, *n., adj.* : gogî.

SPHERICAL, *adj.* : gogî, girûvir.

- **ABERRATION** : ladana gogkî.
- **ANGLE** : goşeya gogkî.
- **COORDINATE** : tewera gogkî.
- **EXCESS** : pêtîriya gogkî.
- **GEOMETRY** : endazyarîzaniya gogkî.
- **TRIGONOMETRY** : sêgoşezaniya gogkî.

SPHERICALLY, *adv.* : gogkî, bi gogî.

SPHERING, *n.* : gogkirin.

SPHEROID, *n.* : gogek, tengogîn, leşgogîn.

SPHEROIDAL, *adj.* = **SPHEROID.**

SPHEROIDALLY, *adv.* : bi gogkî.

SPHEROMETER, *n.* : gogpîv.

SPHERULAR, *adj.* : gogkî.

SPHERULATE, *adj.* = **SPHERULAR.**

SPHERULE, *n.* : kevnegogik.

SPHERULITE, *n.* : gogika şûşeyî.

SPHERULITIC, *adj.* : pêwendîdarê kevre gogik şûşeyî.

SPHERUTIZE, *vt.* : gogikşûşeyî kirin.

SPHERY, *adj.* : gogik.

SPHINCTER, *n.* : givêşk : zebleka givêşk.

SPHINCTERAL, *adj.* : pêwendîdarê zebleka givêşkî.

SPHINCTERIAL, *adj.* : givêşkî.

SPHINCTERIC, *adj.* : hestigivêşkî.

SPHINX, *n.* : sifinks (ebulhol) : bûnewerek efsaneyî ya Girekî ko leş şêr û çeng e, ser û sîng yê jinê ne.

SPHRAGISTIC, *adj.* : gustîrkî, kevrî.

SPHRAGISTICS, *n.* : gustîrk û mohrzanî.

SPHYGMOGRAPH, *n.* : neqşqerê firtê yan pirteyê.

SPHYGMOMANOMETER, *n.* : xwînpestanpîv.

SPHYGMOMETER, *n.* = **SPHYGMOGRAPH.**

SPHYGMUS, *n.* : qutan.

SPICA, *n.* : gulegenim : pêçeya gulegenimî.

SPICATE, *adj.* : gulegenimî, gulegenimdar.

SPICATED, *adj.* : gulegenimî.

SPICE, *n.* : beharat, alat, biharat.

- **DEALER** : beharatfiroş.

SPICE, *vt.* : beharat kirin, alat kirin.

SPICEBERRY, *n.* : çaya Kanada.

SPICED, *adj.* : beharatkirî, alatkirî.

SPICERY, *n.* : alat, beharat.

SPICING, *n.* : alatkirin, beharatkirin.

SPICK, *adj.* : law, nû.

SPICK-AND-SPAN, *adj.* : law, nû.

SPICILY, *adv.* : bi alatî yan beharatî.

SPICINESS, *n.* : alatîtî, tûjîtî.

SPICULAR, *adj.* : stirîkirî.

SPICULATE, *adj.* : stirîkirî.

SPICULE, *n.* : kelem, stirî.

SPICY, *adj.* : alatî, beharatî, tûj, gezîn.

SPIDER, *n.* : pîrik, pîrhevok, dapîroşk, pêtavent, tevnpind.

- **CRAB** : kêvjaleyê pîrhevokî.
- **MONKEY** : meymûnka pîrhevokî.
- **'S WEB** : tevnepîrk.
- **WASP** : stênga kunka xwe li bin pîrhevokê çêdikit (bo zilkêtkan).
- **WORT ~** : gulşîn.

SPIDERY, *adj.* : pîrhevokî.

SPIED, *adj.* : sixorîkirî.

SPIEL, *n., vi.* : axiftin, suhbet, suhbet kirin.

SPIF(F)LICATE, *vt.* : herifandin.

SPIFY, *adj.* : nayab.

SPIGNEL, *n.* : helezek giyayî, gul spî û bêhnxweş e.

SPIGOT, *n.* : serbend, serdevk, berdevk.

SPIK, *n.* (*dereg.*) : Îspaniyê emerîkanî.

SPIKE, *n.* : sing, gulegenim, texlîtek masî ye, şav, gulîşî, rezînek, reze, zerzipnek, .

- **HEEL** : paşpaniya bizmarî : bilind û sertûj bo pêlava jinan.
- **OF CORN OR WHEAT** : serî.

SPIKE, *vt.* : gîro kirin, kun kirin (bi bizmarî), têk dan, reze kirin, alkuhol berdan ser şerabê.

SPIKED, *adj.* : gulgenimkirî, dirrik, gulgenimdar.

SPIKELET, *n.* : gulgenimk, îşîkê gulan.

SPIKENARD, *n.* : melhemê nardî, gulgenima bêhnxweş.

SPIKY, *adj.* : dirrik, têrstirî.

SPILE, *n., vt.* : serdevk, ding, borî, boriyek biçûk dikin nav ava derê de bo derhînana avikî, girtin (daxistin), avika darê bi borî hînan der, qayim kirin, bi ding kirin.

SPILING, *n.* : ding.

SPILL, *vt.* : rištin.

- **TO ~ BLOOD** : xwîn rištin.
- **TO ~ THE BEANS** : raz eşkera kirin.

SPILL, *n.* : hilçûn, serdaçûn.

- **OVER** : serdaçûn.
- **WAY** : cok bo ava serdaçûnê.

SPILL, *n.* : dep.

SPILLAGE, *n.* : ava serdaçûyî.

SPILLED, *adj.* : serdaçûyî.

SPILLING, *n.* : rištin.

- **OVER** : hilçûn.

SPILLIKIN, *n.* : telezma darî yan hestî.

SPILT, *p.* **OF SPILL** : rişt.

SPILTH, *n.* : tiştê rištî.

SPIN, *vt. i.* : ristin, zivirîn, zivirandin.

- **TO ~ A YARN** : çîrokek derew çêkirin.

SPIN, *n.* : reş, gerr, rêsandin, ristin, zivirîn, badan.

- **HEAD** : nîk, nûk.
- **ORBIT COUPLING** : cotbûnî badan û surgeh.
- **QUANTUM NUMBER** : jimareka çendikî û badan.

SPINA BIFIDA : çewtiya derhatî ya karîteyê mejî.

SPINACH, *n.* : spînax.

SPINAL, *adj.* : movikî, girêkî.

- **CANAL** : parçeya rêzika demarî ya nîvekî.
- **COLUMN** : stûnka piştê, moregeha pişt.
- **CORD** : mejiyê piştê.
- **NERVE** : reha qolincê.

SPINDLE, *n., adj.* : teşî, wek teşiyê, tewere yan stûna gerînê.

- **HEAD** : serteşî.
- **LEGGED** : ling zirav û dirêj.
- **LEGS** : lingên zirav û dirêj.
- **SHANKED** : ling zirav û dirêj.
- **SHAPED** : wek teşiyê (teşiyî).

SPINDLE, *vi.* : zirav û dirêj bûn.

SPINDLED, *adj.* : baskbûyî.

SPINDLING, *adj.* : zirav, barîk, dirêj, lawaz.

SPINDLY, *adj.* : zirav û dirêj.

SPINDRIFT, *n.* : kefa pêlê, pizrûka pêlê.

- **CLOUDS** : ewrên sivik yên wek peran.

SPINE, pirûsk, mazmazk, karîteyê piştê, stirî, dirrik, birrebirre.

- **CHILLER** : kitêba çiroka bizdihîn.
- **CHILLING** = **SPINE CHILLING.**

SPINED, *adj.* : dirrikdar.

SPINEL, *n.* : texlîtek kan yan metal (reng têvel û belûrî).

- **RUBY** : yaqûta sorê tarî.

SPINELESS, *adj.* : nemovik, lawaz, sist.

SPINES, *n.* : porjan.

SPINESCENT, *adj.* : dirrik.

SPINET, *n.* : piyanoya biçûk.

SPINIFEX, *n.* : giyayek zivr û belgteşiyî ye.

SPININESS, *n.* : dirrikîtî.

SPINNAKER, *n.* : babireka sêkoçikî û mezin.

SPINNED, *adj.* : rêsandî, rêstî, ristî, rîstî, rîsandî.

SPINNER, *n.* : rês, rîsyar.

- **WALL'S ~** : hirîrês.

SPINNERET, *n.* : rêsker : endamê tevnçêkirinê yê pîrhevok û kirmê avirmişî.

SPINNEY, *n.* : dehlê teraşî.

SPINNING, *n.* : rêstin, rêsandin, ristin, rîsandin, rîstin, badek, rês.

- **COTTON** : pembûrês.
- **JENNY** : kevneteşiya xwekarî.
- **HOUSE** : xaniyê çakirina dêhlan (teşirêsan).
- **MACHINE** : makîneya ristinê.
- **OF THREADS** : dezîrêsî.
- **WHEEL** : çerx ristin, çerxa ristinê, xerek.

SPINOSE, *adj.* : têrstirî, dirrik.

SPINOSITY, *n.* : dirrikîtî.

SPINOUS, *adj.* : dirrik, tûj.

- **PROCESS** : werara dirrikî.

SPINOZISM, *n.* : jîrzaniya spinoza ko her madeyek neradedar bi tenê dirêjbûna hiş û rûçik in û mirov şiklên gewher in.

SPINOZIST, *n.* : bawermendê jîrzaniya spinoza.

SPINSTER, *n.* : teşirêş, bijin, jinebî, qeyre.

SPINSTERHOOD, *n.* : bijinîtî.

SPINTHARISCOPE, *n.* : tîrêjbîna elfa.

SPINULE, *n.* : stûnka piştê, dirrik, stîrk.

SPINULIFEROUS, *adj.* : stirîkî, dirrikî.

SPINULOUSE, spinulous, *adj.* : pêwendîdarê stûnka piştê (mejîkî), dirrikî.

SPINY, *adj.* : dirrikî, têrstirî.

- **FINNED** : dirrşaper.
- **LOBSTER** : kêvjaleyê dirrîkî yê deryayî.

- **RAT** : mişkek mûzivr e.

SPIRACLE, *n.* : devê pişînê (yê pêtik û nehengan).

SPIRACULAR, *adj.* : devpişînî.

SPIRACULATE, *adj.* = **SPIRACULAR.**

SPIRACULUM, *n.* = **SPIRACLE.**

SPIRAL, *n., adj.* : badoke, lûlekî, lol, pêç, alandin, alandî, çeqçeqokî, çeqçeqok.

- **GALAXY** : hesareya lûlekî.
- **LINE** : xêza badayî.
- **SPRING** : zenbelek.
- **WHEEL** : çerxa lûlekî.

SPIRAL, *vt.* : lûlekî alîn, lûlekî çûn.

SPIRALITY, *n.* : lûlekîtî.

SPIRALLED, *adj.* : lûleyîkirî.

SPIRALLING, *n.* : lûleyîkirin.

SPIRALLY, *adv.* : bi lûlekî, lûlekî.

SPIRANT, *n., adj.* = **FRICATIVE.**

SPIRE, *n.* : gopîtk, lûtke, birc, gopîtka sertîj, belgê giyayî.

SPIRE, *v.i. t.* : weran yan şîn bûn, (ser tîj) bilind bûn, lûlekî bilind yan nizm bûn.

SPIREA, *n.* : gulbend : texlîtek helez e.

SPIRED, *adj.* : lûlekî, sertîj, bircî.

SPIRIFEROUS, *adj.* : lûlekî (bûyî).

SPIRILLUM, *n.* : lûlek : bakteriyek lûlekî ye.

SIRING, *n.* : basîkirin.

SPIRIT, *n., vt.* : can, giyan, giyanê pîroz, keş, çelengî, çalakî, sawîr, bedgiyan, çalak kirin, xurt kirin, giyandar kirin, revandin.

- **LEVEL** : şaqûla asoyî.
- **RAPPING** : giyan gazîkirin (bi qutanê yan kutanê...).
- **IN HIGH ~ S** : şad, keyfxweş.
- **IN POOR OR LOW ~** : mirîto, mirûs, bêhnteng.
- **OUT OF ~** : mirîto, mirûs, bêhnteng.

SPIRITED, *adj.* : çalak, çeleng, aza.

SPIRITEDLY, *adv.* : bi azayî, azakî.

SPIRITEDNESS, *n.* : giyanîtî.

SPIRITISM, *n.* : giyankîtî, înanveya giyanî, baweriya ko giyanê mirî digehit zindî dirêka navbêjî de.

SPIRITIST, *n.* : bawermendê giyankîtiyê.

SPIRITLESS, *adj.* : sist, tirsonek, mirî, mirûs.

SPIRITS, *n.* : vexwarinên sermestî.

- **OF HARTSHORN** : ava nişadirê.
- **OF TURPENTINE** : rûnê kezwanî.
- **OF WINE** : alkuhol, giyanê şerabê.

SPIRITUAL, *n., adj.* : giyanî, can, ayînî, oldar.

- **COURT** : dadgeha olkî.
- **(RELIGIOUS) SCIENTIST** : ayînzan.

SPIRITUALISM, *n.* : giyankîtî : bawermendiya giyanî ko rastî hemû giyanî ye, înanveya giyanan.

SPIRITUALIST, *n.* : bawermendê giyankîtiyê.

SPIRITUALISTIC, *adj.* : pêwendîdarê bawermendiya giyankîtiyê.

SPIRITUALITY, *n.* : giyankirî(tî), giyandarîtî.

SPIRITUALIZATION, *n.* : giyanîkirin.

SPIRITUALIZE, *vt.* : giyanî kirin.

SPIRITUALIZED, *adj.* : giyanîkirin.

SPIRITUALIZING, *n.* : giyanîkirin.

SPIRITUALLY, *adv.* : giyankî, bi giyanî.

SPIRITUALNESS, *n.* : giyanîtî.

SPIRITUOSITY, *n.* : alkuholîtî, giyanîtî.

SPIRITUOUS, *adj.* : alkuholî.

SPIRIT WRITING, *n.* : nivîsîna giyanî, nivîsîna xwekarî ko girîmane ji ber kartêkirina giyanî dibit.

SPIRO-, *pref.* : pêşgir e ko pişîn e, bêhnkişan e.

SPIROCHETAL, *adj.* : badekî.

SPIROCHETE, *n.* : bakteriya yan dirma badekî.

SPIROCHETOSIS, *n.* : nesaxiya badekiyan.

SPIROGRAPH, *n.* : neqşkera pişînê.

SPIROGYRA, *n.* : kevza kesk ya rûbarî.

SPIROMETER, *n.* : pişînpîv.

SPIROMETRY, *n.* : pişînpîvî.

SPIRY, *adj.* : lûlekî, sertûj, bircî badayî.

SPIT, *n.* : tif, bist, şîş, şîşk, ava devî, sîx, tûk.

SPIT, *n.* : kûratiya merbêlêya erdê.

SPIT, *vi.* t. : tif kirin.

- **TO ~ COTTON : ENIRÎN**, kef dan.

- **TO ~ IT OUT** : derbirrîn.

SPIT AND POLISH, *n.* : vemiştin, paqijî, hinîn û hisîn.

SPITBALL, *n.* : tepka tifkiriya beysbolê, tepka kaxeza cûtî yan cîtî berî havêtinê.

SPITCH-COCK, *n.* : marmasiya birajtî yan qelandî.

SPITCHCOCK, *vt.* : marmasî birrîn bo birajtinê.

SPIT CURL, *n.* : guliya pirça alayî.

SPITE, *n.* : kîn, rik, qîn, zikreşî, enirîn, enirandin, kîne.

SPITE, *vt.* : enirandin, kîn kirin.

SPITED, *adj.* : kîmekirî.

SPITEFUL, *adj.* : kîndar, kînawî, kîno, dilreş, diltarî, doşvan.

SPITEFULLY, *adv.* : kîndarkî, bi kîndarî.

SPITEFULNESS, *n.* : kîndarîtî.

SPITFIRE, *n.* : agirhavêj (wek agirpijî, topê yan balafirê), balafira cengî, enirok.

SPITING, *n.* : kînekirin.

SPITTER, *n.* : tifker.

SPITTING, *n.* : tif, tifkirin.

SPITTLE, *n.* : lîk, tif, gilîz, tûk.

- **BUG** : pêtika tifker : pêtikek bazder e (kirmokeyên wê kefek wek tifê derdikit).

SPITTOON, *n.* : tifdank.

SPITZ, *n.* : texlîtek tîle ye.

SPIV, *n.* : bapîv.

SPLANCHNIC, *adj.* : hinavî.

SPLANCHNOLOGY, *n.* : hinavzanî.

SPLANCHNOTOMY, *n.* : helkêşana parçehinavî.

SPLASH, *n.* : pizrûk, weşîn, pinî, leke, şilq, şileq, kurtenoqîbûn, fortekî, berzkirina nûçeyê.

- **TO MAKE A ~** : serinc kirin.

SPLASH, *vt. i.* : weşandin, pinî kirin, şil kirin (rû û çavan), berz kirin (nûçe).

- **TO ~ ONE'S MONEY ABOUT** : dirav zehî kirin.

SPLASHBOARD : depikê bergirê avê yan teqnê.

SPLASH DOWN, *n.* : dahatina ser avê.

SPLASHER, *n.* : parêzera pizrûkê.

SPLASH GUARD, *n.* : parêzeriya pizrûkî ya çerxên paşî yên otomobîlê.

SPLASHING, *n.* : weşîn, weşandin.

SPLASHY, *adj.* : pizrûkî, pinîkirî, teqnî, hestiyar.

SPLAT, *n.* : balagiya dirêj, darê pişta kursîkê.

SPLATTER, *vi.* : weşandin.

SPLATTERING, *n.* : weşîn, weşandin.

SPLAY, *n., adj.* : nişîv, nişîvî, lar, larî, xwehrî, dirêjbûn, neşehreza.

- **FOOT(ED)** : pê pan û rast.
- **MOUTH** : devmezin.

SPLAY, *vt. i.* : nişîv yan xwehr bûn, dirêj kirin, raxistin, nişîv yan xwehr kirin.

SPLEEN, *n.* : sipil, dêdik, peşa reş, patereş, fatereş.

- **WORT** : giyaspil.

SPLEENFUL, *adj.* : kîndar, enirî, çirt, mirûs, şerker.

SPLEENISH, *adj.* : enirî, kîndar, çirt.

SPLEENLESS, *adj.* : bê sipil.

SPLEENY, *adj.* : sipilî.

SPLEENOLOGY, *n.* : sipilîzanî.

SPLEENOTOMY, *n.* : sipilhelkêşan.

SPLENDENT, *adj.* : navdar, teyisî, ronahî.

SPLENDID, *adj.* : nayab, baş, rind, cindî, çeleng, ferwar, pêgotî, mezin, teyisî.

SPLENDIDLY, *adv.* : bi nayabî, nayabkî.

SPLENDIDNESS, *n.* : nayabîti.

SPLENDIFEROUS, *adj.* = **SPLENDID.**

SPLENDOUR, *n.* : rengûrû, rewş, pergal, rewneq, çelengî, ferwar, şewqdan, qeşeng.

SPLENECTOMIZED, *adj.* : sipilhelkêşayî.

SPLENECTOMY, *n.* : sipilhelkêşan.

SPLENETIC, *n., adj.* : sipilî, çirt, şerker.

SPLENIAL, *adj.* : pêwendîdarê pejbûn yan mezinbûna sipilî.

SPLENIC, *adj.* : sipilî.

- **CIRCULATION** : gêra demarên sipilî.
- **FEVER** : nesaxiya pezî.

SPLENITIS, *n.* : kulbûna peşa reş.

SPLENIUS : masûlkeya rex û paşiya stûyî bo paşve birin yan kişana serî.

SPLENOID, *adj.* : pêwendîdarê nesaxiya pezî.

SPLENOLOGY, *n.* : peşareşzanî.

SPLENOMEGAL, *adj.* : sipilstûr.

SPLENOMEGALY, *n.* : sipilstûrî.

SPLENIZATION, *n.* : guhartina peşeyî bo sipilî.

SPLICE, *n.* : şûkirin, kezîkirin, pêkvegirêdan (bi kezîkirinê pêkvenan, girêdana kezîkirî).

SPLICE, *vt.* : dan şû, pêkve girêdan (bi kezîkirinê).

SPLINE, *n.* : depik (dar yan metal e ko dirêj û zirav e), zimanok, kelş.

SPLINE, *vt.* : (bi zimanokî) qayim kirin.

SPLINT, *n.* : şepk, depikê metalî, depikê tenik yê dar, telezm, mezinbûna hestiyê serê lingê hespî.

- **BONE** : hestiyê telezmî : yek ji her du hestiyên wek telezmî li rexê lingê hespî.
- **COAL** : rejiya req ya têrgermî.

SPLINT, *vt.* : girtin (hestî bi telezmî).

SPLINTER, *n.* : telezm, parçe, qirş, kerî(ker), desteyek duberekî.

- **GROUP** : girûhek biçûk ya duberekî.
- **PARTY** : partiyek biçûk ya duberekî.

SPLINTER, *vt. i.* : parçe parçe kirin yan bûn, telezm bûn, dirandin, derketin (ji partî).

SPLINTER, *adj.* : telezmkirî.

SPLINTERING, *n.* : telezmkirin.

SPLINTERY, *adj.* : telezmî.

SPLIT, *n., adj.* : kelş, derz, celx, derzek, kelşî, parçekirî, dabeşkirî, kelişîn, duberekî, girûha duberek, derizandî, pelpelkirî, pijilandî, şeqitîn, şeqitî, şikafti.

- **PERSONALITY** : kesîtiya kelişî.

- **SECOND** : gav, bêhnek.

- **TICKET** : kaxeza helbijartina parçekirî.

SPLIT, *vt. i.* : pilijîn, kelişandin.

- **TO ~ HAIRS** : berhevdana tiştê pûç dikit.

- **TO ~ ONE'S SIDE** : bêqam kenîn (peqîn ji keniyê).

- **TO ~ STRAWS** : şer li ser tiştek pûç kirin.

- **TO ~ THE DIFFERENCE** : pêkhatin li ser binyata nîvkirina têveliyê.

SPLITTING, *n.* : kelişandin, derizîn, derizandin, çirîn, bizdîn, pijilîn, kelaştin, şeqitandin, şikaftin, tirazan.

SPLOTCH, *n., vt.* : leke, leke kirin.

SPLOTCHED, *adj.* : lekekirî, lekedar.

SPLOTCHING, *n.* : lekekirîn.

SPLOTCHY, *adj.* : lekeyî.

SOLURGE, *n.* : fortekî.

SPLURGE, *vi.* : fortekî kirin, fortekî yan destberdayî xerc kirin.

SPLURGED, *adj.* : destberdayî.

SPLURGING, *n.* : destberdan.

SPLUTTER, *n., v.i. t.* : têkşêlan, têk şêlan.

SPODE, *n.* : kalotê nayab.

SPODUMENE, *n.* : spodomîn : texlîtek metal e.

SPOIL, *n.* : talan, şelîn, yexterme zehîbûn, pertalê seqet.

SPOIL, *vt. i.* : têkdan, têkçûn.

SPOILAGE, *n.* : kaxeza têkçûya çapkirinê, zehî.

SPOILED, *adj.* : zehîkirî, şewliqî, zehî.

SPOILER, *n.* : doxman.

SPOILING, *n.* : doxman, talan, zehîkirin.

SPOILS, *n.* : talan, têkdan, gilahe.

- **MAN** : endamê helperistê partî.

- **SYSTEM** : rêzika talanan.

SPOILT, *adj.* : têkdayî, berbad.

SPOKE, *n.* : tirêjka çerxî, pêpikê pêstirkê, girteka erebaneyê.

- **BONE** : nîvtîreya zendî.

- **SHAVE** : gîzana di navbera du destikan de.

SPOKE, *vt.* : bisttîrêjî kirin.

SPOKE, *p.* OF **SPEAK** : axift.

SPOKED, *adj.* : bisttîrêjîkirî.

SPOKESHAVE, *n.* : parçereneya di navbera du destikan de.

SPOKESMAN, *n.* : qiseker, axiftinker, gotebêj, peyvdar, berdevk, bêjinde, şandiyar.

SPOKESWOMAN, *n.* : peyvdar (jin).

SPOLIATE, *vt.* : talan kirin, şelandin.

SPOLIATION, *n.* : talan.

SPOLIATOR, *n.* : talanker.

SPOLIATORY, *adj.* : talanî.

SPONDAIC, *adj.* : spondî : pêwendîdarê şeş pîveyî (helbest) ko (spondî) pîveya pêncem e.

SPONDEE, *n.* : pîveka helbestî ya du birgeh dirêj.

SPONDULICKS, *n. pl. (sl.)* : dirav, pare.

SPONDYLITIS : kulbûna movikan.

SPONGE, *n.* : hewrek, ewrik.

- **TO THROW UP THE ~** : çîz kirin.

SPONGE, *vt. i.* : bi hewrekî paqij kirin, rakirin.

- **TO ~ OUT** : paqij kirin, hemî şop rakirin.

SPONGE BAG, *n.* : çenteyê avbergir.

SPONGE CAKE, *n.* : kiloca hewrek (kiloca şirîn, tenik û kunîlkeyî).

SPONGE CLOTH, *n.* : perûkê hewrekî.

SPONGED, *adj.* : paqijkirî (bi hewrekî).

SPONGER, *n.* : dûvdehol, mişexwer.

SPONGE RUBBER, *n.* : lastîka hewrekî, lastîka kunîleyî.

SPONGING, *n.* : paqijkirin (bi hewrekî).

SPONGING HOUSE, *n.* : zîndana deyndaran.

SPONGINESS, *n.* : hewrekîtî.

SPONGOLOGIST, *n.* : hewrekzan.

SPONGOLOGY, *n.* : hewrekzanî.

SPONGY, *adj.* : hewrekî.

SPONSION, *n.* : desteberî.

SPONSON, *n.* : herzala rexekî, şaper (bo hevsengiya balafira avî).

SPONSOR, *n.* : desteber.

SPONSOR, *vt.* : desteber kirin.

SPONSORED, *adj.* : desteberkirî, sexbîrkirî.

SPONSORIAL, *adj.* : desteberkirî, sexbîrkirî.

SPONSORING, *n.* : sexbîrkirin, desteberkirin.

SPONSORSHIP, *n.* : algirtin, desteberkirin.

SPONTANEITY, *n.* : serpilkîtî.

SPONTANEOUS, *adj.* : xweyî, xweres.

- **COMBUSTION** : sotina xweresî.
- **GENERATION** : helhênana xweresî.

SPONTANEOUSLY, *adv.* : bi xweresî.

SPONTANEOUSNESS, *n.* : xweresîtî.

SPOOF, *n.* : xapîn, fêlbazî, pûçbêjî, çavlêkirina tiraneyî.

SPOOF, *vt.* : xapandin.

SPOOK, *n., vt. i.* : sawîr, ciniqîn, bizdihandin.

SPOOKY, *adj.* : ciniqînî, sawîrî, demarî.

SPOOL, *n.* : qenek, çirrik, dartûn, alandin, xuloke.

SPOOL, *vt.* : alandin (ser qenekî), alîn.

SPOOLING, *n.* : dapêçan.

SPOON, *n.* : kefçik, kewçik, kefçî.

- **PERFORATED** ~ : kefçî.
- **STRAINING** ~ : kefçî.
- **WOODEN** ~ : kefçikê darî.

SPOON, *vt. i.* : têkirin (bi kefçikî), çal (wek kefçikî) vedan, evînî kirin.

SPOONBILL, *n.* : balindeyek nikil kefçikî ye.

SPOONDRIFT, *n.* : kef yan pizrûka kefçikî ye.

SPOON BEAK, *n.* : werdeka nikilmer.

SPOON BREAD, *n.* : nanê kefçikî şilkî ye ji arê genimê şamê, hêk şîr û nivişkî çêkiriyê.

SPOONEY, *n., adj.* = **SPOONY.**

SPOON-FED, *adj.* : nazdar, bi kefçik xwarindayî.

SPOON-FEED, *vt.* : bi kefçikî xwarin danê.

SPOON FOOD, *n.* : xwarina bikefçikî.

SPOONFUL, *adj.* : kefçikek, piçek.

SPOONILY, *adv.* : xirpokî, bi xirpoyî.

SPOONINESS, *n.* : xirpotî.

SPOON MEAT, *n.* : xureka bikefçikî.

SPOONY, *n., adj.* : gewc, xirpo, sade.

SPOOR, *vt.* : li dûv şopê çûn.

SPOORER, *n.* : şopzan.

SPORADIC, *adj.* : birrî (ne berdewam), belave, qewmîna li vêrê û wêrê.

SPORANGIUM, *n.* : tovdank, zayendedank.

SPORE, *n.* : zayende.

- **CASE** = **SPORANGIUM.**

SPORE, *vi.* : (zayende) berhem kirin.

SPORED, *adj.* : zayende berhemkirî.

SPORI-, *pref.* : pêşgir e ko tov e, zayend e.

SPORICIDAL, *adj.* : tov yan zayende kuj.

SPORICIDE, *n.* : zayendekujî.

SPORIC PERIOD, *n.* : qonax yan koçeya zayendeyî.

SPORIFEROUS, *adj.* : zayendeyî, tovî.

SPORING, *n.* : zayendeberhemkirin.

SPORO-, *pref.* : pêşgir e ko tov e, zayend e.

SPOROBLAST, *n.* : dirma zayendeyî.

SPOROCYST, *n.* : kîskê zayendeyî.

SPOROGENESIS, *n.* : zayîna zayendeyî.

SPOROGONY, *n.* : zaûzêya zayendeyî.

SPOROPHORE, *n.* : zayendehelgir.

SPOROPHYLL, *n.* : belgê zayendeyî.

SPOROPHYTE, *n.* : neveya zayendeyî, werara zayendeyî.

SPOROZOAN, *n.* : zayendeyî (canewerê mişexwer yê ko zaûzêyê bi zayendeyê dikit).

SPOROZOITE, *n.* : zindikê zayendeyî.

SPORRAN, *n.* : kîskê pare yan diravî (Skotlandî).

SPORT(S), *n.* : werzişyarî, keyf, tirane, pêkenîn, werz.

- **'S FIELD** : zevî yan meydana werzişî.
- **'S MAN-SHIP** : werzişvan(keç, jin).
- **FOR ~, IN ~** : bo yarî yan tirane.
- **TO MAKE ~ OF** : pêkenîn.

SPORT, *vt.* : keyf kirin, ladan, pê kenîn.

SPORT(S), *adj.* : werzişvanî.

SPORTFISH, *n.* : masiya keyfê (tazeyiyê ne ya xwarinê).

SPORTFUL, *adj.* : yarîkar, tiranekar, keyfxweş.

SPORTING, *adj.* : werzişî, qumarî, felîteyî.

SPORTIVE, *adj.* : rageş, leyizok.

SPORTCAST, *n.* : bernameya werzişî.

SPORTMAN, *n.* : werzyar.

SPORTSMANSHIP, *n.* : werzyarî.

SPORTSWEAR, *n.* : cilên werzişî.

SPORTSWRITER, *n.* : nivîserê werzişî.

SPORTY, *adj.* : werzişyarîkar, law, xemildar.

SPORULAR, *adj.* : zayendî.

SPORULATE, *vi.* : zayende bûn.

SPORULATION, *n.* : zayendebûn.

SPORULE, *n.* : zayendek, zayendik.

SPOT, *n., adj.* : rohnkirin, dem yan agedariya navbera du bernameyan, pinî, cî, axpîne, ping, rastik, şanik, şehnik, qan, yane, dir, şûn, dever, deq, kekmek, leke.

- **ON THE ~** : dem û dest, di cih de.
- **UPON THE ~** : tengav, li dira berpirs.
- **BEAUTY ~** : şame, xalik, xalîçe.
- **BLACK ~** : şame, xalik.
- **CHECK** : sehkirina bilez.
- **LIGHT** : ronahiya şanoyê, ronahiya direkî, rohnkirin.

SPOT, *vt. i.* : rohn kirin, pinî kirin, seh kirin, leke kirin, şûn kirin.

SPOTLESS, *adj.* : pak, bê pinî, pinîkirî, pitpitk, çil, lekedar.

SPOTTED FEVER, *n.* : taya pinîker nemaze reşegiraneta.

SPOTTER, *n.* : zêrevan, sehker, balafira sehkirinê, firokeya nêrevaniyê.

SPOT TEST, *n.* : azmûna nimûneyî.

SPOTTILY, *adv.* : bi pinîkirinî.

SPOTINESS, *n.* : pinîkirinîtî.

SPOTTY, *adj.* : reşbaz, pinîkirî, xaldar.

SPOUSAL, *n., adj.* : şûkirin, şûkirinî.

SPOUSE, *n.* : mêr yan jin.

SPOUT, *n.* : pilosk, şirrik, derçe.

- **UP THE ~** : girewkirî, desttengî, tengavî.
- **WATER ~** : pilosk.

SPOUT, *vt. i.* : vizikîn.

SPOUTED, *adj.* : vizkirî.

SPRAG, *n.* : girtekê çerxî : parçeyek dar yan asin ko nahêlit çerxa erebaneyê paşve biçit.

SPRAIN, *n.* : xelandin yan badana nişkî û dijwariya movikî.

SPRAIN, *vt.* : xelîn (movik).

SPRAINTS, *n.* : koşpilên seavî.

SPRANG, *p.* **OF SPRING** : baz da.

SPRAT, *n.* : siprat, masiyek biçûk e, pûçemirovê biçûk.

SPRAT, *vi.* : masiya siprat girtin.

SPRATTER, *n.* : masîgirê sipratê.

SPRATTING, *n.* : masîgiriya siprati.

SPRAWL, *n.* : dirêjkirin, vezelîn, belavebûna nesaziya pirçê yan porê.

SPRAWL, *v.i. t.* : vezelîn, nesaz belave yan dirêj bûn, dirêj kirin.

SPRAWLING, *n.* : vezelîn.

SPRAY, *n.* : pirjîn, pirj, çiqik, çiqilk, reqişandin, pizrûk.

- **GUM** : alava reqişandinê.

SPRAY, *vt.* : pirjandin.

SPRAYED, *adj.* : reqişandî.

SPRAYER, *n.* : alava reqişandinê, reqişandinker.

SPRAYING, *n.* : reqişandin.

SPREAD, *n., adj.* : belav, belave, belavkirin, pejilîn, pertbûn, pervedan, pijikandin, pijikandî, raxer, raxistî, raçandin, teşene.

SPREAD, *vt. i.* : pejilandin, pejilîn, belav kirin.

SPREAD, *adj.* : raçandî, belavkirî.

SPREADABILITY, *n.* : belavbarî(tî).

SPREADABLE, *adj.* : belavbar.

SPREAD EAGLE, *n.* : helûyê çengvekirî : (hêmaya wîlayetên yekgirtî yên Emerîkanî), fortek.

SPREAD-EAGLE, *v.i. t.* : (wek helûyî) dest û pê vekirin, belave bûn, palewanî tehisîn (dest û pê vekirî).

SPREADER, *n.* : belavker : alava belavkirin yan dirêjkirina tiştekê, kêrika belavekirina nîvişkî li ser nanî.

SPREADING, *n.* : belavkirin, belavbûn, pijikandin, raçandin, pertbûn, teşene, bilawbûn, peresandin.

- **OUT** : raxer.

SPREE, *n.* : vexwarina bêqam, şadiya şingîn, çalakî û mijûliya bêqam.

SPREE, *vi.* : bêqam mijûl bûn (bi kirinê, vexwarînê...).

SPREWED, *adj.* : werhayî.

SPRIG, *n.* : çilpî, çirpî, çirp, qatork, çiqilk, nevî, lawik, çekê wek çiqilkî yan belgê helezî, bizmarê biçûk yê bêser.

SPRIG, *vt.* : xeml kirin (bi çiqilandin), qayim kirin (bi bizmarên bêser).

SPRIGGED, *adj.* : çiqilkirî.

SPRIGGING, *n.* : çiqilkirin.

SPRIGGY, *adj.* : çiqilkî.

SPRIGHTLY, *adj.* : çalak, çeleng.

SPRING, *vt. i.* : vizikîn.

- **FROM** : vemiztin.

SPRING, *n., adj.* : kanî, çavkanî, serkanî, kehnî, çindik, selef bazdan, zenbelekî, çalakî, çelengî, bihar, biharî, behar, firqaş.

SPRING, *v.i. t.* : bazdan, berdan, westandin, xurt badan, teqandin (mîn), bilind bûn, vegeranve (wek zenbelekê) werar bûn, peyda bûn.

SPRINGAL(D), *n.* : lawik.

SPRING BACK, *n.* : vegerîna paşve.

SPRING BALANCE, *n.* : terazûya zenbelekî.

SPRING BEATY, *n.* : ciwana biharê.

SPRING BED, *n.* : doşeka zenbelekî.

SPRING BEGINNING, *n.* : nûbihar.

SPRINGBOARD, *n.* : herzala bazdanê, xalika derketinê (destpêkirinê).

SPRINBOK, *n.* : aska başûra Efrîqa.

SPRING CHICKEN, *n.* : mirîşka biçûk (mirîşka biharê : bo xwarinê).

SPRING-CLEANING, *n.* : paqijkirina temam.

SPRINGE, *n., vt., i.* : dav, dav vedan.

SPRING FLOWER, *n.* : pîvok.

SPRINGER, *n.* : bazder, parçeya kevaniya taqî, jêriya taqî, çêla li ber zanê.

- **SPANIEL** : seyê bazder : texlîtek seyê nêçîrê.

SPRINGFIELD, *n.* : tifenga sprîngfîld.

SPRINGHALT, *n.* : lingirîn yan kirjiya paşpêyên hespî.

SPRINGHOUSE, *n.* : xanîkê li ser kanî yan celalî.

SPRINGING, *n.* : zan, bazdan, vemiztin.

SPRINGINESS, *n.* : zenbelekîtî.

SPRINGLET, *n.* : kanîk.

SPRINGLOCK, *n.* : kodê zenbelekê.

SPRING ONION, *n.* : pîvazterk.

SPRING RAIN, *n.* : tavan.

SPRING SONG, *n.* : serêlî, serêlok.

SPRING TIDE, *n.* : firhan, radana biharê (destpêk yan nîva mehê (mangê, heyvê).

SPRING TIME, *n.* : demê biharê, axlêv, bihar, behar.

SPRING WAGON, *n.* : erebaneya zenbelekî.

SPRING WORM, *n.* : kirmê biharê.

SPRINGY, *adj.* : biharî, cîr.

SPRINKLE, *n.* : pirz, pizrûk.

SPRINKLE, *vt.* : bêjing kirin, werhan, vepijikandin.

SPRINKLED, *adj.* : werhayî, pêwerkirî, reqişandî.

SPRINKLER, *n.* : pirjên.

- **MUSK'S ~** : miskrêj.

SPRINKLING, *n.* : pirjandin, pêwerkirin, lêrîk, reqişandin.

SPRINT, *n.* : bez.

SPRINT, *vi.* : bezîn.

SPRINTER, *n.* : bezok.

SPRINTING, *n.* : bezîn.

SPRIT, *n.* : darê babirekî.

SPRITE, *n.* : perî.

SPRITSAIL, *n.* : babirekê vekirî.

SPROCKET, *n.* : didanê çerxa didankirî.

- **WHEEL**, *n.* : çerxa didankirî.

SPROUT, *n.* : firajî, bişkoj, bişkov, rewz, riwan, pindik, gopke, kurik.

SPROUT, *v.i. t.* : çizirîn, bişkoj dan, pişkivîn, zû şîn bûn.

SPROUTED, *adj.* : çizirî, bişkojî.

SPROUTING, *n.* : çizirîn, bişkojîn, bişkovîn.

SPRUCE, *n., adj.* : ciwanpûs, şêl, darek sinewberî : merx.

- **BEER** : bîreya merxî.

- **TREE** : kaj, merx, darok.

SPRUCE, *vt.* : ciwanpûş kirin, law kirin, law bûn (cilên law kirin ber xwe).

SPRUCED, *adj.* : ciwanpûşkirî.

SPRUCING, *n.* : ciwanpûşkirin.

SPRUCY, *adj.* : law, ciwanpûş.

SPRUE, *n.* : zikçûna deverên germ, darişte : kuna dariştina qalibî.

SPRUIT, *n.* : celalek (başûra Efrîqa).

SPRY, *adj.* : sivik, çalak.

SPRYLY, *adv.* : bi çalakî, çalakkî.

SPRYNESS, *n.* : sivikîtî, çalakîtî.

SPUD, *n.* : merbêl, kartol.

- **BASHING** (*sl.*) : erkê spîkirina kartolan.

SPUD, *vt.* : kolîn, birrîn (firîzî).

SPUDDED, *adj.* : kolayî (bi merê).

SPUDDING, *n.* : kolan.

SPUDDLE, *vi.* : sivik kolîn.

SPUME, *n., vi.* : kef, kef dan.

SPUMED, *adj.* : kefdayî.

SPUMINESCENCE, *n.* : kefbûn.

SPUMINESCENT, *adj.* : kefdar.

SPUMINESCOUS, *adj.* : kefî.

SPUMINESS, *n.* : kefîtî.

SPUMING, *n.* : kefdan.

SPUMOUS, *adj.* : kefî.

SPUMY, *adj.* : kefî.

SPUN GLASS, *n.* : şûşeyê ristî, şûşeyê rengrîşalî.

SPUNK, *n.* : dilêrî, çalakî, çelengî, mêrxasî, boketî, azayî, wêran.

SPUNK, *vi.* : çalak bûn, bêqam enirîn.

SPUNKY, *adj.* : mêrxas, dilêr, aza.

SPUN RAYON, *n.* : reyonê ristî.

SPUN SUGAR, *n.* : ristina şekirî, ristina keçan, şiriniya şekira wek rîsî.

SPUN THREAD, *n.* : ben, benik, rîs, rês.

SPUN YARN, *n.* : werîsk (ne qenc badayî).

SPUR, *n.* : hajok, zixt, zixtik, xurîn, ajok, hender.

- **ON THE ~ OF THE MOMENT** : serpilkî, di gavê de.

- **TO WIN ONE'S ~ S** : serketin, meznatî ava kirin.

SPUR, *vt.* : hajotin, xurîn.

- **TO ~ ON** : hajotin.

SPUR GEAR, *n.* : gêr (didan terîbî-tewereyî).

SPURGE, *n.* : helezek şirêz û şîr tal e.

- **LAUREL** : teraşê dargulbendî : teraşek guldar belg her kesk e.

SPURIUOS, *adj.* : derew, zir, nerewa, qelp, nejîrbêj, sexte, bîjî.

SPURN, *n., vt. i.* : pehîn, tîzik, kotîkirin, kotî kirin, kirêt kirin, nizm kirin, qebûl nekirin.

SPURNING, *n.* : qebûlnekirin.

SPUR-OF THE MOMENT, *adj.* : serpilkî.

SPURRED, *adj.* : dirrik, hajotî, zixtkirî.

SPURRIER, *n.* : zixtçêker.

SPURRING, *n.* : hajotin, zixtkirin.

SPURR(E)Y, *n.* : giyayek ewropî û gul spî ye.

SPURT, *n.* : vemiztin, belqîn, vizikandin.

SPURT, *vi.* : vizikîn.

SPUR TRACK, *n.* : hêla liqî ya rêasinî.

SPUR WHEEL, *n.* : çerxa didankirî.

SPUR WORT, *n.* : heleza belgdidankirî.

SPUTNIK, *n.* : spotnîk : yekem (stêr) dîvelanka destkar.

SPUTTER, *n.* : peqîn, axiftina têkil yan har, pirjîn.

SPUTTER, *vt. i.* : peqîn, pirjîn, (bi lez peyv) gotin, têkil û har, havêtin (pizrûk, tif û xwarinê ji devî).

SPUTTERER, *n.* : pirjînker, havêj (peyv, xwarin) ji devî.

SPUTTERING, *n.* : kirin, pirjandin.

SPUTUM, *n.* : tif.

SPY, *n.* : sîxor, desgîz, guhbel.

- **HOLE** : kuna derî.

SPY, *vt. i.* : sîxorî kirin.

SPYGLASS, *n.* : dûrbînk.

SPYING, *n.* : guhbelî, sîxorî, sose.

SQUAD, *n., adj.* : mirovê qut û qelew, qut û qelew.

- **CHICK** : çiçelok (balindeyê bêper).

SQUABLBE, *n.* : circir, gelc, lêketin, cirenîx (yan cerenîx) şerê qîr û qîjî.

SQUABBLE, *v.i. t.* : şer kirin, cirenîx kirin, circir kirin, rêzkirina tîpan têk dan.

SQUABB, *adj.* : qut û qelew.

SQUABBLING, *n.* : cerenîxkirî.

SQUABBY, *adj.* : qut û qelew.

SQUAB PIE, *n.* : kadeya goştê koterê, kateya goştê pezî, pîvaz û sêvê.

SQUACCO, *n.* (*pl.* **SQUACCOS**) : sikwako : balindeyek biçûk, ling û stû dirêj e.

SQUAD, *n.* : taxim, girûh, pehlanî, komele, deste, bolik, pel.

- **AWKWARD ~** : serbazên nû yên hêşta ne meşqkirî.

- **CAR** : otomobîla polîsî.

SQUAD, *vt.* : rêk xistin (desteyek).

SQUADDED, *adj.* : polênkirî, rivdekirî.

SQUADDING, *n.* : polênkirin, rivdekirin.

SQUADRON, *n.* : rivdek, tebûr, pol, girûhek, keştîgel.

- **LEADER** : sertabûr, serrivdek.

SQUADRON, *vt.* : rivdek yan tabûr kirin (zelam).

SQUAIL, *n.* : yariya havêtina depikên biçûk û girûvir ser depek mezin.

- **BOARD** : depê mezin yê vê yariyê.

SQUAILER, *n.* : texlîtek gopal e (serik zirêçkirî) bo lêdan yan havêtina ser sivoreyan.

SQUALID, *adj.* : koti, pîs, dawpîs.

SQUALIDITY, *n.* : kodîtî, pisîtî, gemarîtî.

SQUALIDLY, *adv.* : bi pîsî yan gemarî.

SQUALIDNESS, *n.* : pîsîtî, gemarîtî.

SQUALL, *n.* : qîj, qîjkirin, lêketin, bayê dijwar (li gel baran û befrê), cirenîx.

SQUALL, *vi.* : qîj kirin, qor kirin.

SQUALLER, *n.* : qîjker.

SQUALLY, *adj.* : bi qîjî, qîjkî.

SQUALOID, *n.* : masiya wek meyika avê.

SQUALOR, *n.* : qirêj, gemar, xewş, kesas, qilêr, pirrîk.

SQUAM(O)-, *pref.* : pêşgir e ko kelpik e.

SQUAMAE, *n.* : qertîş.

SQUAMATE, *adj.* : qertîşî.

SQUAMATION, *n.* : qertîşbûn.

SQUAMOUS, *adj.* : qertîşkirî, têrqertîş.

SQUAMULOSE, *adj.* : qertîşbiçûk.

SQUANDER, *n.* : zehîkirin, destberdan.

SQUANDER, *vt.* : belave kirin (leşkerî), zehî kirin.

SQUANDERED, *adj.* : zehîkirî.

SUANDERER, *n.* : destberdayî.

SQUANDERING, *n.* : zehîkirin.

SQUANDERINGLY, *adv.* : bi zehîkirinî, zehîkirinkî.

SQUARE, *n., adj., adv.* : çarling, çarpê, duca, çarçing, çarçik, zirtxane, çarînkirî, çare, meydan, fêz, ducarî, çargoşe, ducayî, gerdek, çargoşeyî.

- **ALL ~** : hevkêş.

- **ON THE ~** : rast, pak, li ser goşeya rast.

- **OUT OF ~** : ladayî, ne li ser goşeya rast, nerêzkirî, nerêzikî, çewt.

- **DEAL** : pakî, rastî, dadî.

- **ROOT** : reha ducar, regî ducarî.

SQUARE, *vt. i.* : çarçik kirin, azmûn kirin.

- **TO ~ UP TO DIFFICULTIES** : rûberî zehmetiya bûn.

- **TO ~ UP THE PROBLEMS** : rûberî giriftariyan bûn.

- **TO ~ AWAY** : lêk dan nemaze bo şerî.

- **TO ~ OFF** : xû lêk dan (bo şerî).

- **TO ~ THE CIRCLE** : cixiz yan çemere çarçik kirin.

SQUARE DANCE, *n.* : semaya çarçik, (semaker çarçikî govendê dirust dikin).

SQUARED, *adj.* : çargoşekirî, ducarkirî.

SQUARE MEASURE, *n.* : pêvana çargoşe.

SQUARER, *n.* : çarçikker, karkerê darî yan berî çarçik dibirrit.

SQUARE SAIL, *n.* : babirekê çar al yan la.

SQUARE SHOOTER, *n.* : rastok, pak nexasme li yariyan.

SQUARE-TOED, *adj.* : parêzer, kevnxwaz.

SQUARE-TOES, *n.* : parêzer, kevnxwaz.

SUBSTATION, *n.* : êzgeha liqî, postexaneya liqî.

SUBSTITUENT, *n., adj.* : berdêl : nemaze gerdîle (yan girûhek gerdîleyan) ko şûna gerdîle (yan girûhek gerdîleyan) digirit.

SUBSTITUTABLE, *adj.* : berdêlbar.

SUBSTITUTE, *n., adj.* : berdêl, şûn, dêl, dupişkî, hevgel, tole.

SUBSTITUTE, *vt. i.* : şûngirtin, guhorandin, berdêl kirin.

SUBSTANTIAL, *n.* : bawermendî, gewherî, binyatî.

SUBSTANTIATED, *adj.* : aşkartkir.

SUBSTANTIATING, *n.* : aşkartkirin.

SUBSTITUTION, *n.* : şûngirtin, berdêl kirin, bobijardin, guhartin.

SUBSTITUTIONAL, *adj.* : berdêlî.

SUBSTITUTIONARY = SUBSTITUTIONAL.

SUBSTITUTIVE, *adj.* : şûngirtinî, berdelî, şûndar.

SUBSTRATE, *n.* = **SUBSTRATUM.**

SUBSTRATOSPHERE, *n.* : stratosfer : bergê esmanî yê jêrçîna zimherî.

SUBSTRATUM, *n.* : madeyê li ber kartêkirina haveynî.

SUBSTRUCTION = SUBSTRUCTURE, *n.* : binyat.

SUBSTRUCTURAL, *adj.* : berpalkiya binyatî.

SUBSUME, *vt.* : polên kirin (di nav komelek mezintir yan jêrseretayek gelemperî de).

SUBSUMED, *adj.* : polênkirî.

SUBSUMING, *n.* : polêkirin.

SUBSUMPTION, *n.* : kurtepêşekî, tiştek polênkirî di nav komelek mezintir yan jêrseretayek giştî de.

SUBSURFACE, *n., adj.* : jêrava yekser li bin rûyê bejî, çîna jêrserveyî : axa yekser li ser axa serveyî.

SUBTANGENT, *n.* : jêrlêkete.

SUBTEEN, *n.* : bispor nemaze keçika jêr sêzdehsalî.

SUBTEMPERATE, *adj.* : pêwendîdarê devera navî ya sartir, jêrnavî.

SUBTENANCY, *n.* : jêrkirêdarî.

SUBTENANT, *n.* : kiredarê hindurî, jêrkirêdar.

SUBTEND, *vt.* : jêr tiştekê (yan tê re) dirêj bûn, rûberî kirin, beramber kirin.

SUBTENDED ANGLE, *n.* : goşeya beramber.

SUBTENSE, *n.* : rastê beramber.

SUBTER-, *pref.* : pêşgir e ko jêr e.

SUBTERFUGE, *n.* : fêl, gizî, hiner, behane, lêb, laban.

SUBTERMINAL, *adj.* : nêzîk dûmahiyê.

SUBTERRANEAN, *adj.* : jêrbej, nepenî.

SUBTILIZATION, *n.* : nepenîkirin.

SUBTILIZE, *vt.* : bijîn kirin, parzîn (sepî) kirin, bilind kirin, bala kirin, tij kirin (hiş yan sehkirin) tenik kirin, pisporî yan şehreza kirin, nepenî kirin.

SUBTITLE, *n., vt.* : navnîşana liqî ya kitêbê, perawêza sînemayî, navnîşana liqî kirin.

SUBTILIZED, *adj.* : nepenîkirî.

SUBTILIZING, *n.* : nepenîkirin.

SUBTLE, *adj.* : bed, çivo, hûr, wird, bîrtîj, fêris, nazik, vemiştî.

- **AIR** : bayê sivik.
- **ART** : hunera nazik.
- **CHARM** : dilberiya nazik.
- **MAGIC** : xirs yan cadûya nihênî yan nepenî.
- **PHILOSOPHER** : jîrzanê nihênî yan nepenî.

SUBTLETY, *n.* : jêhatin, lêhatin, nazikîtî, bîrtîjî, tiştê tenik yan hûr.

SUBTLY, *adv.* : bi nihênî, nepenîkî.

SUBTONIC, *adj.* : jêrawazî (deng).

SUBTOPIA, *n.* : avahiyên kirêt.

SUBTOTAL, *adj.* : jêrsercem.

SUBTRACT, *vt. i.* : kêm kirin, der kirin.

SUBTRACTION, *n.* : kêm kirin, derkirdin.

SUBTRACTIVE, *adj.* : derkirî, kêmkirî, derdar, kêmdar.

SUBTRAHEND, *n.* : kêmker, derker.

SUBTRIBE, *n.* : hozik, jêrhoz.

SUBTROPICAL, *adj.* : rûçikiya deverên serhedên yeksanekerî.

SUBTROPICS, *n. pl.* : deverên nîvyeksanekerî.

SUBULATE, *adj.* : sûjinî, kunkerî.

SUBURB(S), *n.* : qerax, dorûberên bajêrî.

SUBURBAN, *n., adj.* : pêwendîdarê dorûberên bajêrî, rexbajêrî.

SUBURBANIZATION, *n.* : bajêrîkirin.

SUBURBANIZE, *vt.* : bajêrî kirin.

SUBURBANIZED, *adj.* : bajêrîkirî.

SUBURBANIZING, *n.* : bajêrîkirin.

SUBURBIA, *n.* : dorûberên bajerî.

SUBVARIETY, *n.* : corik, jêrcor yan texlît.

SUBVENTION, *n.* : harîkariya darayî, pêşkêşkirina harîkariya darayî.

SUBVERSIVE, *adj.* : têkder, herifînkar, kavilker.

SUBVERSIVELY, *adv.* : têkderkî, bi têkderî.

SUBVERSIVENESS, *n.* : têkderîtî.

SUBVERT, *vt.* : têk dan, herifandin, xirab kirin, kavil kirin, gelacî kirin, tevlokî kirin.

SUBVOCAL, *adj.* : jêrdengî(hiş).

SUBVOCALIZATION, *n.* : jêrdengîbûn.

SUBVOCALIZE, *vi.* : jêrdengî bûn.

SUBVOCALLY, *adv.* : bi jêrdengî, jêrdengkî.

SUBWAY, *n.* : jêrrê, hevkêşa kehrebî ya jêrrê, jêrrêya peyayan.

SUBZERO, *n.* : jêrsifir (pileya germiyê).

SUCCEDANEOUS, *n.* : berdêlî.

SUCCEDANEUM, *n.* : berdêl.

SUCCEDENT, *adj.* : paşekî, dahatî, peyhatî.

SUCCEED, *v.i. t.* : pey hatin, ci girtin nemaze textî, bi ser ketin.

SUCCENTOR, *n.* : cîgirê serekdengbêjê dêrê.

SUCCENTORSHIP, *n.* : cîgiriya serekdengbêjê dêrê.

SUCCESS, *n.* : biserketin, serkewtin, helkewtin, kamuranî, serçûn, serfirazî, levanîn.

SUCCESSFUL, *adj.* : biserketî, resîw.

SUCCESSFULLY, *adv.* : biserketinkî, bi serketinî.

SUCCESSION, *n.* : şûngirtin, cihgirî.

- **DUTY** : baca mîratî.

SUCCESSIONAL, *adj.* : cihgirî.

SUCCESSIONALLY, *adv.* : cihgirkî, bi cihgirî.

SUCCESSIVE, *adj.* : peyhatî.

- **DIFFERENTIATION** : hevyazkarî yan cudakariya peyhatî.

SUCCESSIVELY, *adv.* : serhev, seryek.

SUCCESSOR, *n.* : cîgir, mîratber yan mîratagîr.

SUCCINATE, *n.* : kehreman.

SUCCINCT, *adj.* : kurtiya nayab, rewanbêj, qayim, teng.

SUCCINCTLY, *adv.* : bi rewanbêjî, rewanbêjkî.

SUCCINCTNESS, *n.* : rewanbêjîtî.

SUCCINIC ACID, *n.* : tirşiya saksinîk : tirşiyek belûrî û dugerdîle ya hîdrojena guhorbar e ko ji kehremanî derdikevit.

SUCCORY, *n.* = **CHICORY.**

SUCCOTASH, *n.* : xureka genimeşamî û lobiyan.

SUCCOUR, *n.* : penageh, hevarî, pîtak, harîkarî, hawar, yarmetî, harîkirin.

SUCCOUR, *vt.* : harî kirin, yarmetî dan, hewandin, pena kirin, hedar kirin, sivik kirin.

SUCCOTH, *n.* : şayiya payizî ya spasiya Cihiyan bo penageha hovîstanê.

SUCCUBA, (bus) : dêwbanû, mêdêw.

SUCCULENCE, *n.* : terî, têravî.

SUCCULENT, *adj.* : ter, têrav, avdar.

SUCCULENTLY, *adv.* : têravekî, bi têravî, bi terî.

SUCCUMB, *vi.* : çîz kirin, mirin, ketin bin destî, jêr yan bin dest bûn.

SUCCURSAL, *adj.* : harîkerî (oldarî).

SUCCUSION, *n.* : hejek, hejîn.

SUCH, *adv., n.* : wesa, we, ev, hosa, wilo.

- **AND ~** : û her wesa.
- **AS ~** : vêca wesa.

SUCK, *vt. i.* : hilmijîn, mêjtin, mijîn, fir kirin.

- **TO ~ UP TO** : rûbazî kirin.

SUCK, *n.* : mijîn, mêtin, mêjtin, fir.

- **TO GIVE ~ TO** : şîr dan.

SUCKER, *n.* : memikmij, mijek, şîrmij, vemêjok, mijok, mije, xirp.

SUCKER, *vt. i.* : (helez) rehên mijok şîn kirin, rût kirin (dar û teraşî jî rehên mijok).

SUCKERED, *adj.* : (darik) paqijkirî.

SUCKING, *n.* : hilmijandin, memik mijîn, firkirin, hilçinîn.

- **FISH** : masîhilmij : texlîtek masî ye.

SUCKLE, *vt.* : mêjtin, mijîn, mêjandin, şîr dan.

SUCKLED, *adj.* : şîrdayî.

SUCKLING, *n.* : mêjandin, şîrmij, berşîr, bersîngî, bermakî.

SUCROSE, *n.* : sekiroz : şekira leven û şilindirê.

SUCTION, *n.* : hilmijîn, mêjtin, mijîn.

- **CHAMBER** : jorika hilmijîne.
- **PIPE** : boriya hilmijînê.
- **PUMP** : tirompey mijok, pestêwka mijok.
- **STROKE** : lêdana hilmijînê.

SUCTIONAL, *adj.* : hilmijînî, hilmij, mijok.

SUDANESE, *adj.* : Sûdanî (welatiyê Sûdanî).

SUDATORIUM, *n.* : xuhgeh : jora xuhdanê (li germavê).

SUDATORY, *n., adj.* : xuhgehî, xuhgeh, xuhdanî.

SUDD, *n.* : heleza serav.

SUDDEN, *n., adj.* : nişkî, nişk, niş, kirp.

- **ALL OF A ~** : jî nişkekê ve, jî nişkî ve.
- **ON A ~** : jî nişkekê ve, jî nişkî ve.
- **STRIKE** : terpetozek.

SUDDENLY, *adv.* : nakaw, le pir, niş, jî nişka ve, jî nişkekê ve, jî nişkekê, nişkî ve.

SUDDENNESS, *n.* : nişkîtî, lepirîtî.

SUDORIFEROUS, *adj.* : xuhî.

SUDORIFIC, *n., adj.* : xuhdar, dermanê xuhkirinê.

SUDRA, *n.* : çîna nizimtirîn ya her çar çînên hindurî.

SUDS, *n. pl.* : kefa av û sabûnê.

SUDS, *n., vt. i.* : kefa sabûnê, bîre, şoya sabûnê, kef kirin, bi şoya sabûnê şûştin.

SUDSY, *adj.* : têrkef, kefî.

SUE, *vt. i.* : gilî kirin, hîvî kirin, evînî kirin.

SUEDE, *n.* : çermê lepik û cezmeyan.

SUET, *n.* : bez.

SUETY, *adj.* : bezî.

SUFFER, *vt. i.* : derd kêşan, siza helgirtin, êşan(êşîn), azar bûn, biha dan.

SUFFERABLE, *adj.* : rakêşbar.

SUFFERANCE, *n.* : rakêşan.

SUFFERED, *p.* **OF SUFFER** : kêşa.

SUFFERER, *n.* : herasan, zorkêş.

SUFFERING, *n.* : jan, arhan, êşan, azar, derd, derdmendî, êş, jangirtin,

êşandin, liyan, jarîtî, rakêşan, rojreşî, şikenc, eşkence.

SUFFICE, *vt. i.* : bes kirin, têra kirin, dilniya kirin.

- **IT TO SAY** : her bes e mirov bêjit.

SUFFICED, *adj.* : beskirî.

SUFFICIENCY, *n.* : besbûn, qîm.

SUFFICIENT, *adj.* : bes, hew, têrakirî.

SUFFICIENTLY, *adv.* : bi têrayî.

SUFFICING, *n.* : beskirin, hewkirin.

SUFFIX, *n.* : paşko, paşgir, paşpirt.

SUFFIX, *vt.* : paş girtin.

SUFFIXING, *n.* : paşgirî.

SUFFOCATE, *vt. i.* : xeniqandin, xeniqîn.

SUFFOCATED, *adj.* : xeniqî.

SUFFOCATING, *n.* : xeniqandin.

SUFFOCATINGLY, *adv.* : bi xeniqînî.

SUFFOCATION, *n.* : xeniqîn.

SUFFRAGAN, *n., adj.* : harîker, metranê harîker.

SUFFRAGE, *n.* : deng (li helbijartinê), dengdan, mafê dengdanê, pêkhatin, rastandin, hîvî yan kurte nivêj.

SUFFRAGETTE, *n.* : xebatker (jin) bo mafê dengdana jinan.

SUFFRAGIST, *n.* : piştgirê mafê dengdana jinan.

SUFFRAGON, *n.* ~ bishop : metranê harîker.

SUFFUSE, *vt.* : noqî kirin, belave kirin, reng kirin.

SUFFUSED, *adj.* : belavkirî.

SUFFUSING, *n.* : belavkirin, belavbûn.

SUFFUSION, *n.* : belavebûn.

SUFI, *n.* : sofî, derwêş.

SUFIC, *adj.* : sofiyî.

SUFISM, *n.* : sofîtî.

SUGAR, *n.* : şekir, qend.

- **CANDY** : nuqul.

SUGAR, *vt. i.* : şekir kirin.

SUGAR APPLE, *n.* : biha hindî.

SUGAR BASIN, *n.* = **SUGAR BOWL** (şekirdan).

SUGAR BEET, *n.* : şilindira şekirî.

SUGAR BOWL, *n.* : şekirdan.

SUGAR BUSH, *n.* : dehlê şekirê : (têrîsfendan).

SUGAR CANE, *n.* : qenda şekirê.

SUGARCOAT, *vt.* : şekirberg kirin : şirîn kirin li ber çavan.

SUGARCOATING, *n.* : bergê şekirê : herçî tiştî şirîn bikit (li ber çavî).

SUGAR CORN, *n.* : genimê şamê yê şekirê.

SUGAR DROPS, *n.* : qendav.

SUGARED, *adj.* : hingvîndar, şekirkirî, bi şekirê bergkirî, têkilkirî yan şirînkirî bi şekirê.

SUGAR HOUSE, *n.* : şekirgeh.

SUGARINESS, *n.* : şekirîtî.

SUGARLESS, *adj.* : bê şekir.

SUGAR LOAF, *n.* : çiyayê şikil qoçekî, kovikê şekirê : baristeyek şekira şikil qoçekî.

SUGAR MAPLE, *n.* : îsfendana şekirê (helez e).

SUGAR MILL, *n.* : aşê şekirê : bo herisandina qendê û derhînana şekirê.

SUGAR REFINER(Y), *n.* : sepî yan bijînkarê şekirê.

SUGAR SHAKER, *n.* : alava reqişandina şekirê, şekirhejînk.

SUGAR SOLUTION, *n.* : qendav, şekirav, (girava şekirê).

SUGAR TONGS, *n.* : gasikek biçûk e bo rakirina şekirê (ji ser mêzê).

SUGARY, *adj.* : şekirî, qendî.

SUGGEST, *vt.* : pêşniyaz yan pêşniyar kirin, nîşan kirin.

SUGGESTED, *adj.* : pêşniyazkirî.

SUGGESTIBILITY, *n.* : pêşniyazbarî(tî).

SUGGESTIBLE, *adj.* : pêşniyazbar, pêşniyazbarê nivandina magnetîzî.

SUGGESTING, *n.* : pêşniyazkirin.

SUGGESTION, *n.* : pêşniyaz, pêşniyar.

SUGGESTIVE, *adj.* : pêşniyazdar, berdayî, bêrûmet.

SUGGESTIVELY, *adv.* : bi pêşniyazî, pêşniyazkî.

SUGGESTIVENESS, *n.* : pêşniyazîtî.

SUICIDAL, *adj.* : xwekuştinî.

SUICIDALLY, *adj.* : xwekujkî, bi xwekujî.

SUICIDE, *n.* : xwekuştin.

SUI GENERIS, *l.* : awarte, yekane.

SUI JURIS, *l.* : jêhatiyê qanûnê.

SUILLINE, *adj.* : berazî.

SUING, *n.* : gilîkirin, dozkirin.

SUIT, *n.* : çox, çoxe, kêr, qat, deste, doz-name, şal û şepk.

SUIT, *vt. i.* : bi kêr hatin, bi cil kirin, bi kêr hînan.

- **TO ~ ONESELF** : wek bivêt bikit.

SUITABILITY, *n.* : bikêrhatin, kêrhatinbarîtî.

SUITABLE, *adj.* : bikêrhatî, berketî, saz, nermenîşk, lebar, goncaw, hinkov, bicih, lêhatî, kêr.

- **PLACE** : ciraz.

SUITABLENESS, *n.* : bikêrhatin.

SUITABLY, *adv.* : bi kêrhatinî, kêrhatinkî.

SUITCASE, *n.* : çenteyê rêwîtiyê.

SUITE, *n.* : darûdest, piştmêr, mifridî.

SUITER, *n.* : çenteyê çend deste.

SUITING, *n.* : çox yên cilan.

SUITOR, *n.* : awaz, gilîkar, gilîdar.

SULCATE(D), *adj.* : kîzîkirî.

SULCUS : kelş, nemaze li navbera du pêçên mejî de.

SULF-, *pref.* : pêşgir e ko gogird e, kibrît e.

SULFA, *adj.* : sulfonamîdî, selfayî : dermanê sulfa.

SULFADRUGS OR SULFAS, *n. pl.* : dermanên sulfa.

SULFANILAMIDE, *n.* : sulfanîlamîd.

SULFATE, *n.* : selfêt, kibrîtat, sulfat.

SULFATE, *vt. i.* : gogird kirin, kibrît kirin.

SULFATED, *adj.* : çarekirî bi kibrîtat yan tirşiya kibrîtî.

SULFATING, *n.* : çarekirin bi kibrîtat yan tirşiya kibrîtî.

SULFIDE, *n.* : xwêya sulfîd, kibrîtîd.

SULFONAMIDE, *n.* : sulfonamîd.

SULFONATE, *n.* : xwêya tirşiya sulfonî.

SULFONATE, *vt.* : çare kirin bi xwêya tirşiya sulfonî.

SULFONATING, *n.* : çarekirina bi xwêya tirşiya sulfonî.

SULFONE, *n.* : sulfon.

SULFONIC ACID, *n.* : tirşiya sulfonî.

SULFONIUM, *n.* : sulfonyom.

SULFONYL, *n.* : sulfonîl.

SULFUR, *n.* : kibrît, gogird.

SULFUR, *vt.* : kibrit kirin, gogird kirin.

SULFURATE, *vt.* : gogird kirin, têkil yan têrkibrît kirin.

SULFUR DIOXIDE, *n.* : oksîdê duhem yê kibrîtî.

SULFUR(E)OUS, *adj.* = **SULFUROUS.**

SULFURET, *n.* : kibrît.

SULFURET, *vt.* : kibrît kirin.

SULFURIC, *adj.* : kibrîtî.

SULFURIC ACID, *n.* : tirşiya kibrîtî.

SULFURIZE, *vt.* : kibrît kirin.

SULFURIZED, *adj.* : kibrîtkirî.

SULFURIZING, *n.* : kibrîtkirin.

SULFUROUS, *adj.* : kibrîtî, dojeyî, tal, bêqam, bêqam dijwar yan req, çêr, dijûn, cinêw.

- **ACID** : tirşiya kibrîtî.

SULFURYL, *n.* : sulforîl.

SULK, *n.* : silbûn, zîzbûn.

SULK, *vi.* : enirîn, zîz bûn, sil bûn.

SULKINESS, *n.* : rûtalî, rûbadan.

SULKILY, *adv.* : zîzkî, bi zîzî.

SULKY, *n., adj.* : sil, enirî, zîz, miçûmir, rûtal, miçûmor.

SULLAGE, *n.* : avrêjî, pîsatî, sêlax, lîm, sonk, lîte, tilol.

SULLEN, *adj.* : miçûmir, rûtal, zîz, sil, enirî.

SULLENLY, *adv.* : bi zîzî, zîzkî.

SULLENNESS, *n.* : rûtalîtî, rûbadanîtî, girjîtî, mon, matman, miçûmorîtî.

SULLIED, *adj.* : lekekirî, senimandî.

SULLY, *vt. i., n.* : pîs bûn yan kirin, leke, pîsî.

SULLYING, *n.* : senimîn, senimandin, pîskirin.

SULPHA, *adj.* = **SULFA.**

SULPHAMIC, *adj.* (**~ACID**) : tirşiyek xurt û firîzîkuj e, amîda tirşiya kibrîtî.

SULPHATE OR SULFATE, *n., v.i. t.* : xwêya tirşiya kibrîtîk.

SULPHIDE OR SULFIDE, *n.* : awêteya kibrîta duhêman.

SULPHITE OR SULFITE, *n.* : xwêya tirşiya kibrîtoz.

SULPHONAMIDE, *n.* = **SULFONAMIDE**, *n.* : (derman e) madeyek ji amîda tirşiya sulfonîk derdikevit.

SULPHONATION, *n.* : sulfonkirin.

SULPHONIC, *adj.* : sulfonî.

SULPHONE, SULFONE, *n.* : sulfon : pêkhatî yan awêteyek endamî birîtî ye ji duhem oksidê kibrîtî (SO2) li gel du gerdîleyên karbonî.

SULPHONIUM OR SULFONIUM, *n.* : sulfonyom.

SULPHUR, *n., vt.* = **SULFUR** : gogird, kibrît, liftek, kibrît kirin.

SULPHURATE OR SULFURATE, *vt.* : kibrît kirin.

SULPHURATION, *n.* : kibrîtkirin.

SULPHURATOR, *n.* : kibrîtker.

SULPHURDIOXIDE, *n.* = **SULFUR DIOXIDE.**

- **MATCH**, *n.* : şixate.
- **ORE**, *n.* : xameyê kibrît.

SULPHUREOUS, *adj.* = **SULFUREOUS.**

SULPHURET, *n., vt.* = **SULFURET** : kibrît, kibrît kirin.

SULPHURETTED, *adj.* : kibrîtkirî.

- **HYDROGEN** : hîdrojena kibrîtkirî, kibrîtîda hîdrojenê.

SULPHURIC, *adj.* = **SULFURIC.**

- **ACID** : zaxav.

SULPHURIZE OR SULFURIZE, *vt.* : kibrîtî kirin.

SULPHUROUS, sulfurous or sulphureous, *adj.* : kibrîtiyê hezhêznizm.

SULPHUROUS ACID, *n.* = **SULFUROUS ACID.**

SULPHUR YELLOW, *n.* : zerê kibrîtî : zerê ber keskî ve.

SULTAN, *n.* : xunkar, sultan, padîşa, qiral, xaqan.

SULTANA, *n.* : kişmiş, yara şahî, keç, jin, bermalî yan dayka sultanî.

SULTANATE, *n.* : xunkarî, padîşahî, mîrayetî.

SULTRY, *adj.* : bêqam germ û nem.

SUM, *n.* : sercem, ko, kijî, maye.

- **TOTAL** : sercem, temamî.

SUM, *vt. i.* : sercem kirin, ko kirin.

- **TO ~ UP** : sercem kirin.

SUMAC(H), *n.* : simaq, sîvok.

SUMERIAN, *n.* : Sumerî.

SUMA CUM LAUDE : bûnseriya nayab.

SUMMARILY, *adv.* : bi kurtî, bi lez, bê gîro, bê duwaketin, bê gîrokî.

SUMMARIZATION, *n.* : kurtkirin, puxtekirin (nivîsîn, axiftin).

SUMMARIZE, *vt. i.* : kurt kirin.

SUMMARIZED, *adj.* : kurtkirî (nivîsîn).

SUMMARIZING, *n.* : kurtkirin.

SUMMARY, *n., adj.* : kurte, kurtî, puxte, vebirrîn.

SUMMATE, *vt.* : ko kirin.

SUMMAT, *n.* : kokirî.

SUMMATING, *n.* : kokirîn.

SUMMATION, *n.* : kokirin.

SUMMATIONAL, *adj.* : kokirinî.

SUMMATIVE : kokirinî, kokirindar.

SUMMER, *n., vt. i.* : havîn, hawîn, zozanî kirin.

- **CAMP** : zom, havîn war.
- **CROP** : terekal.
- **CYPRESS** : gez.
- **HOUSE** : sîbergeh (kepir) ya havînî li baxçeyî, xaniyê havînî.

SUMMERING, *n.* : geşt, zozanî, hawîne.

SUMMER KITCHEN, *n.* : lênangeh yan têştxaneya havînî.

SUMMERLESS, *adj.* : bê havîn.

SUMMERLY, *adj.* : havînî.

SUMMER PASTURE, *n.* : zom, zozan.

SUMMER QUARTERS, *n.* : zozan.

SUMMER RESORT, *n.* : peraşîn, feraşîn, hawînehawar, kiwêstan, zozan, havîngeh, sermîyan, zom.

SUMMER RESIDENCE, *n.* : zom, zozan, kiwêstan, hawînehawar.

SUMMER RETREAT, *n.* : havîngeh.

SUMMER SAUSAGE, *n.* : sosec (rîvîka dagirtî) ya havînê : dûkêlkirî yan li ber bayî zuhakirî.

SUMMER SOLSTICE, *n.* : guhorîna havînî.

SUMMERTIME, *n.* : demê havînê.

SUMMER TIME, *n.* : havîn.

SUMMER VACATION, *n.* : zozankarî, pişûya havînê.

SUMMER VACATIONING, *n.* : zozankarî, pişûkirina havînê, zozanî, zozanvanî.

SUMMER VACATIONIST, *n.* : zozanî, zozanvan, havînwer.

SUMMER VISITOR, *n.* : zozanî, havînwer.

SUMMERY, *adj.* : havînî.

SUMMING-UP, *n.* : sercemkirin.

SUMMIT, *n.* : dûçik, lûtke, gopîtk, kimt, kop, kumbet, navser, raser, tepel, ewc, kumik, sin, kêre.

SUMMITLESS, *adj.* : bê lûtke, bê gopîtk.

SUMMITRY, *n.* : civîna serek dewletan, gopîtkî, lûtkeyî.

SUMMITS, *n.* : gazûbêlan.

SUMMON, *vt.* : vexwastin, civandin.

SUMMONED, *adj.* : gazîkirî.

SUMMONER, *n.* : gazîker.

SUMMONING, *n.* : gazîkirin.

SUMMONS, *n.* : vexwestin.

SUMMONS, *vt.* : vexwastin.

SUMMONED, *adj.* : vexwestî.

SUMMONING, *n.* : vexwestin, bangkirin.

SUMMUM BONUM : qenciya bala.

SUMO, *n.* : texlîtek gemşa japonî ye.

SUMP, *n.* : pork.

SUMPTER, *n.* : hêstir, olax, wulax, qoş, dewarê barî yan hajotinê.

- **HORSE** : hespê barî.
- **MULE** : hêstira barî.
- **PONY** : hespê biçûk yê barî.

SUMPTUARY, *adj.* : têçûnî, xercî nemaze bo xurek û cilan.

SUMPTUOSITY, *n.* : nayabîtî, dilverayîtî.

SUMPTUOUS, *adj.* : nayab, dilvera, dewlemend.

SUMPTUOUSLY, *adv.* : bi dilverayî.

SUMPTUOUSNESS, *n.* : nayabîtî.

SUN, *n.* : roj, tav, ro, xor.

- **A TOUCH OF THE ~** : şopa tavê : esmeriya çermî ji ber tîrêja rojê(tavê).

SUN, *vt. i.* : tav kirin, li ber tavê yan tîrêja rojê danan.

SUNBATH, *n.* : germava tavê.

SUNBATHE, *vi.* : xwe dan ber tavê (germava tavê), çûn ber tavê.

SUNBATHING PLACE, *n.* : berberojk.

SUNBEAM, *n.* : tîrêja rojê, tav.

SUNBIRD, *n.* : rojbalinde : balindeyek taze û strankar e.

SUN BONNET, *n.* : kulavek jinanî bo parastinê ji tavê.

SUNBOW, *n.* : kevana rojê : kevanek wek kesk û sorî ye gava roj di nav mijê de derdikevit.

SUNBURN, *n.* : sotin ji ber tîrêja rojê.

SUNBURN, *vt. i.* sotin (bi tîrêja rojê).

SUNBURST, *n.* : rojderketina nişkî (ji navewran de), sinceqa wek rojê ya xemlê.

SUNDAE, *n.* : texlîtekek dondirme ye.

SUN DANCE, *n.* : semaya rojê : semayek ayînî ya Hindokên sor demê guhorîna havînê.

SUNDAY, *n., adj.* : êkşemb, yekşemb.

SUNDAY, *vi.* : roja yekşembê borandin.

SUNDAY BEST, *n.* : baştirîn cilên mirovî.

SUNDAY-GO-TO-MEETING, *adj.* : baştirîn cilên liberkirinê bo çûna dêrê roja yekşembê.

SUNDAY PUNCH, *n.* : lêdana kulmbaziya vebirr, livîn bo vê lêdanê.

SUNDAY SCHOOL, *n.* : dibistana yekşembê.

SUNDER, *vt. i.* : cuda kirin, jêve kirin.

SUNDERANCE, *n.* : dabirrîn, jêbirrîn, cudakirin, jêvekirin, pêbirrîn, şelqî.

SUNDEW, *n.* : rojxûnav : helezek giyayî ye ya ko belgguvaşek debişî dihînit der da ko pêtik pêve bimînin û bi mêjit.

SUNDIAL, *n.* : demjimêra rojê.

SUNDISK, *n.* : sewka rojê : sewka çengkirî, hêmaya Xudarojê Misra kevn.

SUNDOG, *n.* : seroj : rojik, zirroj, kesk û sor ya biçûk yan ne tekûz.

SUN DOWN, *n.* : avabûn, êvar.

SUN-DRIED, *adj.* : (bi tavê) zuhakirî.

SUNDRIES, *n. pl.* : pirtok, hemecor.

SUNDRY, *n., adj.* : têvel, çend.

- **ALL AND ~** : hemû, bê awarte.

SUNFAST, *adj.* : rojbergir ko pêtî yan reş nabit bi tîrêja rojê.

SUNFISH, *n.* : rojmasî : masiyek deryayî û mezin e, masiyek rûbarî û biçûk e.

SUNFLOWER, *n.* : berberoj.

SUN GLASSES, *n.* : rojşikên.

SUNKEN, *adj.* : çal, noqî : nemaze li binê deryayî yan rûbarî.

SUNK FENCE, *n.* : tanê noqî : dîwar yan berbestê di nav çalê de bo dabeşkirina erdî bê kiretkirina dîmenî.

SUNLAMP, *n.* : rojçira : çirayê kehrebî û serbinefşî bo çarekirina hindek nesaxiyan.

SUNLESS, *adj.* : bê roj.

SUNLESSNESS, *n.* : bêrojîtî.

SUNLIGHT, *n.* : tav, ronahiya rojê.

SUNLIT, *adj.* : hetavkirî, tavkirî, ronahîkirî bi tava rojê.

SUNN, *n.* (~ **HEMPS**) : rîşalê werîsan (yê rojhelata Hindistanê).

SUNNA(H), *n.* : sunî, sine.

SUNNED, *adj.* : bertavkirî.

SUNNILY, *adv.* : tavkî, bi tavî.

SUNNINESS, *n.* : tavîtî.

SUNNING, *n.* : bertav kirin.

SUNNITE, *adj.* : sunî, sinî (tîreya musilmanî).

SUNNY, *adj.* : tavdar, bertav.

- **SIDE** : beroj.

SUN PARLOUR, SUN PORCH OR SUN-ROOM, *n.* : jora rojê : jora camkirî li ber tîrêja rojê.

SUN PROTECTOR, *n.* : rojşikên.

SUN RAYS, *n.* : tîrêjên rojê, pejn.

SUNRISE, *n.* : rojderketin, rojhilatin, tavatî.

SUNRISING, *n.* : tavdan.

SUNSET, *n.* : rojava, rojavabûn, zerketav.

- **TIME** : hingûr, hengûr.

SUNSHADE, *n.* : sîtav, sih, sîvan, sîwan.

SUNSHINE, *n.* : tav, hetav, hetaw.

- **ROOF** : kaşxank yan banê livînî (li ser otomobîla biçûk ya rêbaran yan siwaran).

SUNSHINY, *adj.* : şad, tavî, hetavî.

SUN SPECTRE, *n.* : şebeng.

SUNSPOT, *n.* : piniya rojê : piniyek tarî ye ko caran li ser rûyê rojê diyar dibit.

SUNSTROKE, *n.* : rojgezî, tavgez.

SUNSTRUCK, *adj.* : rojgezkirî.

SUNSUIT, *n.* : destecilên rojê : cilên kurt bo yariyan û tavê.

SUNTAN, *n.* : esmerê tîrêja rojê.

SUNWARD(S), *adv.* : ber rojê ve.

SUNWARD, *adj.* : ber yan hevberî rojê.

SUNWORSHIPPING, *n.* : rojperestin.

SUP, *vt. i.* : fir kirin, heliçînîn.

SUP, *n.* : fir.

SUPER, *n., adj., adv.* : nayab, ejdeha, perûkê pembûyê mûmkirî bo bergê kitêbê, bêqam.

SUPER, *vt.* : paşiya kitêbê qayim kirin (bi perûkê mûmkirî).

SUPER-, *pref.* : pêşgir e ko ser e, jor e, mezintir e, serbar e, bêqam e.

SUPERABLE, *adj.* : zalbar.

SUPERABOUND, *vi.* : bêqam zehf kirin.

SUPERABUNDANCE, *n.* : zehfiya bêqam.

SUPERABUNDANT, *adj.* : peleseng.

SUOERABUNDANTLY, *adv.* : bi pelesengî, pelesengkî.

SUPERADD, *vt.* : berdan yan havêtin ser, ko kirin.

SUPERADDITION, *n.* : havêtinser.

SUPERALTAR, *n.* : kêla ferşê pîrozkirî şûna qurbangeha nepîroz.

SUPERANNUABLE, *adj.* : xanenîşbar.

SUPERANNUATE, *vt. i.* : xanenîşîn bûn,

kevn bûn, xanenişîn kirin (ji ber nesaxiyê yan pîriyê).

SUPERANNUATED, *adj.* : xanenişîn, bêkar (ji ber nesaxiyê yan pîriyê).

SUPERANNUATING, *n.* : xanenişîn kirin.

SUPERANNUATION, *n.* : xanenişînî yan mûçeya xanenişînî.

SUPERAQUEOUS, *adj.* : ser av.

SUPERB, *adj.* : nayab, berbijartî, şikûdar, dilber.

SUPERBLY, *adv.* : bi nayabî, nayabkî.

- **BEAUTIFUL FLOWER** : şaha gul.

SUPERBNESS, *n.* : nayabîtî.

SUPERCARGO, *n.* : berpirsê bar yan barkirina gemiyê.

SUPERCELESTIAL, *adj.* : ser esmanî.

SUPER CHARGER, *n.* : bargehker : alava makîneya sotin-hindurî da ko tibabek serbar jî oksîjenê bidit stûnkan.

SUPERCILLIARY, *adj.* : biroyî : nik biroyan li ser çavî.

SUPERCILIOUS, *adj.* : çavsor, fêzbûyî, difnbilind, lûtberz.

SUPERCILIOUSLY, *adv.* : fêzkî, bi fêzî, difnbilindî, fêz, fêzbûn.

SUPERCLASS, *n.* : nayab.

SUPER COLUMNAR, *adj.* : karîte seryekve.

SUPER COLUMNATION, *n.* : karîte seryekvebûn.

SUPERCONDUCTING, *n.* : sergehîn, bêqamgehîn.

SUPERCONDUCTIVE, *adj.* : ser yan bêqam gehîn.

SUPERCONDUCTIVITY, *n.* : sergehînîtî, gehînîtiya bêqam.

SUPERCONDUCTOR, *n.* : sergehîn, bêqamgehîn.

SUPERCONSCIOUS, *adj.* : bêqam hişdar.

SUPERCONSCIOUSLY, *adv.* : bi hişdariya bêqam.

SUPERCOOL, *vt.* : ser yan bêqam sar kirin.

SUPERCRITICAL, *adj.* : serbarê tengavî.

SUPERDREADNOUGHT : zirêpûşa ejdeha.

SUPEREGO, *n.* : ezê bala, serezî.

SUPERELEVATION, *n.* : pitiriya rexê derve yê çimê rê ji rexê hindurî.

SUPEREMINENCE, *n.* : berzî.

SUPEREMINENT, *adj.* : bêqam berz yan serketî.

SUPEREMINENTLY, *adv.* : bi berziya bêqam.

SUPEREROGATION, *n.* : serkarkirin.

SUPEREROGATORY, *adj.* : serkarkirinî.

SUPEREXCELLENCE, *n.* : nayabiya bêqam.

SUPER EXCELLENT, *adj.* : bêqam nayab.

SUPER EXCELLENTLY, *adv.* : bi nayabiya bêqam.

SUPER FAMILY, *n.* : sermalbat, malbata bala.

SUPERFATTED, *adj.* : têrbezkirî (sabûn).

SUPERFETATION, *n.* : avisbûna duhem (di nav malbiçûkî de).

SUPERFICIAL, *adj.* : serveyî, rûyî.

- **KNOWLEDGE** : zanîna serveyî, zanîna serpilkî.

- **PLOUGHING** : yekgêsinî, reşkirin.

SUPERFICIALLY, *adv.* : bi serveyî, serveyîkî.

SUPERFICIES, *n.* : rû, nijyarê devreyî.

SUPERFICIES VEINS, *n.* : şîndemarên serve yên dest û pêyan.

SUPERFINE, *adj.* : bêqam bijîn yan nayab.

SUPERFLUITY, *n.* : zehfîtî, tiştê serbar yan pêneviyayî.

SUPERFLUOUS, *adj.* : serpilkî, serrêj.

SUPERFLUOUSLY, *adv.* : bi serpilkî.

SUPERFLUOUSNESS, *n.* : serpilkîtî.

SUPER GALAXY, *n.* : hesareya mezin, koma mezin ya stêran.

SUPER GIANT, *n.* : stêra ejdeha (bêqam geş û mezin).

SUPERHEAT, *vt.* : qemandin, bêqam germ kirin.

SUPERHEAT, *n.* : germiya bêqam.

SUPERHEATED, *adj.* : bêqam germkirî.

- **STEAM** : hilma bêqam germkirî.

SUPERHEATER, *n.* : bêqam germker.

SUPERHETERODYNE, *n., adj.* : wergir bi karê bêqam guhorînê, alava wergira bi karê bêqam guhorîn.

SUPER HIGH FREQUENCY, *n.* : lereya serbala.

SUPERHIGHWAY, *n.* : rêya bêqam fireh û dirêj.

SUPERHUMAN, *adj.* : ser mirov, zebelah.

SUPERHUMANITY, *n.* : sermirovîtî.

SUPERHUMANLY, *adv.* : bi zebelahî.

SUPERHUMANNESS, *n.* : zebelahîtî.

SUPERHUMERAL, *n.* : cilê ser milê oldarî.

SUPERIMPOSE, *vt.* : li ser hev danan, têk helkêşan.

SUPERIMPOSED, *adj.* : têk helkêşan, ser hev danan.

SUPERIMPOSITION, *n.* : têkhelkêşan, serhevdanan.

SUPERINCUMBENT, *adj.* : giran, qurs, pestên, serî : li ser tiştek dî danayî.

SUPERINDUCE, *vt.* : bûn ho yan eger, çêkirin, qewmandin, berdan ser, serbar kirin.

SUPERINTEND, *vt.* : zêrevanî kirin, kargerî kirin, serperiştî kirin.

SUPERINTENDENCE, *n.* : serkarî, serperiştî, zêrevanî, kargerî.

SUPERINTENDENT, *n.* : serkar, zêrevan, serperişt, karger.

SUPERIOR, *n., adj.* : berz, bilind, baştir, berbijartî, serdest, serketî, torîn, serok, fermande.

- **GENERAL** : serokê gelemperî (li rebengehê).

- **NUMBERS** : têr zelam yan mirov.

- **PERSONS** : mirovên zana.

SUPERIORITY, *n.* : berzîtî, torîn, baştiritî, balayîtî, çêtiritî, başbûn, bûnserî, raserbûn, serdestî, serketin.

- **COMPLEX** : girêka berzîtiyê, girêka çêtiriyê, baweriya mirovî bi çêtiriya xwe.

SUPERIORLY, *adv.* : bi çêtirî, ber balatir ve.

SUPERJACENT, *adj.* : seryekî : li ser tiştek dî danayî.

SUPERLATIVE, *n., adj.* : baştir, serketîtir.

- **TO TALK IN ~** : mezin kirin, mezin axiftin.

SUPERLATIVELY, *adv.* : balakî, bi balayî.

SUPERLATIVENESS, *n.* : nayabîtî.

SUPERLINER, *n.* : keştiya mezin ya hêla lezîn.

SUPERLUNARY, *adj.* : esmanî, ser yan pişt heyvî.

SUPERMAN, *n.* : sûperman : mirovê nimûneyî, kesê hêzdar û berpekerê ser mirovî.

SUPERMARKET, *n.* : ser bazar : firoşgeha mezin ko firotin xwexizmetiyê.

SUPERMUNDANE, *adj.* : ser gerdûnî : balayî, nedinyayî.

SUPERNACULUM, *adv., n.* : ta dilopa dawî.

SUPERNAL, *adj.* : balayî, esmanî.

SUPERNALLY, *adv.* : bi balayî, balakî.

SUPERNATANT, *n., adj.* : madeya serav, seravî.

SUPERNATURAL, *n., adj.* : hêz, kartêkirin yan diyardeya ser sirûştî, sersirûşt.

SUPERNATURALISM, *n.* : sersirûştîtî, baweriya bi hêzeka sersirûştî.

SUPERNATURALIST, *n.* : sersirûştiyî.

SUPERNATURALLY, *adv.* : bi sersirûştî.

SUPERNATURALNESS, *n.* : sersirûştîtî.

SUPERNORMAL, *adj.* : asayî, sersirûştî.

SUPERNOVA, *n.* : stêra nûgeş (ji ber peqînê).

SUPERNUMERARY, *n., adj.* : mirov yan tiştê serbar, kirdarê karkurt, serbarê jimara jimarek pitir.

SUPER ORDER, *n.* : texlîtekê polênê ya navbera rêzikê û çînê.

SUPERORDINAL, *adj.* : pêwendîdarê polênê yê vî texlîtî.

SUPERORDINATE, *adj.* : giringtir û payeberztir.

SUPERORGANIC, *adj.* : ser endamî yan balatir, derûnî.

SUPERPHOSPHATE, *n.* : ser yan superfosfat.

SUPERPHYSICAL, *adj.* : paş yan serfîzyayî : ko nahêt ravekirin bi seretayên fizyayî.

SUPERPOSE, *vt.* : siwar kirin, danan ser tiştek dî, hevyek kirin.

SUPERPOSED, *adj.* : siwarkirî (li ser yek).

SUPERPOSING, *n.* : siwarkirin (li ser yek).

SUPERPOSITION, *n.* : siwarîtî, hevyekîtî.

SUPERPOWER, *n.* : hêz yan dewleta mezin, desthelatiya dewletî ya mezin, wizeya mezin.

SUPER SATURATE, *vt.* : ser têr kirin.

SUPERSATURATION, *n.* : sertêrbûn.

SUPERSCRIBE, *vt.* : li ser rû (yê derve) yan li ser tiştekê nivîsîn.

SUPERSCRIPT, *n., adj.* : tîpa serî, li serî nivîsî.

SUPERSCRIPTION, *n.* : tiştê nivîsî yan neqşkirî li ser rû yan derveyî tiştek dî.

SUPERSEDE, *vt.* : cî girtin, helweşandin, şûn girtin.

SUPERSEDURE, *n.* : cîgirtin, şûngirtin.

SUPERSESSION, *n.* : cîgirtin, şûngirtin.

SUPERSENSIBLE, *adj.* : giyanî, derûnî, paş yan ser sehkirinê.

SUPERSENSITIVE, *adj.* : ser hestiyar yan bêqam hestiyar.

SUPERSONIC, *n., adj.* : serdeng.

SUPERSONICALLY, *adv.* : bi serdengî, serdengkî.

SUPERSONICS, *n. pl.* : serdengzanî, serdengnasî.

SUPERSTITION, *n.* : rîf, efsane.

SUPERSTORE, *n.* : bazar yan serfiroşgeh (firoşgeha mezin).

SUPERSTRATUM, *n.* : serçîn.

SUPERSTRUCTURAL, *adj.* : seravahiyî.

SUPERSTRUCTURE, *n.* : seravahî.

SUPER SUBSTANTIAL, *adj.* : ser made, ser gewherî, ser dehker.

SUPER SUBTLE, *adj.* : bêqam bîrtîj.

SUPERSUBTILITY, *n.* : bîrtîjîya bêqam.

SUPERTANKER, *n.* : sarincîka, baca serbar.

SUPERTEMPORAL, *adj.* : jor eniyê.

SUPERTERRANEAN, *adj.* : ser beji.

SUPERTERRENE, *adj.* : ser bejî : ji devera jor bejî, esmanî.

SUPERTONIC, *n.* : serawazî.

SUPERVENE, *vi.* : qewmîn, helketin, pey hatin, li dûv hatin.

SUPERVENIENT, *adj.* : qewmînî, helketinî.

SUPERVENTION, *n.* : guhorîn.

SUPERVISE, *vt.* : zêrevanî kirin, serperiştî kirin.

SUPERVISED, *adj.* : serperiştîkirî.

SUPERVISING, *n.* : serperiştîkirin.

SUPERVISION, *n.* : çavnêrî, çavdarî, serperiştî, serkarî, dîdevanî, çavdêrî.

SUPERVISOR, *n.* : çavdêr, çavdar, çavik, serkar, serperişt, nêrevan.

- **OF COWHERD** : gavan, gole.

SUPERVISORY, *adj.* : zêrevanî, serperiştî.

SUPINATE, *vt.* : dirêj bûn yan ketin ser piştê.

SUPINATED, *adj.* : ketî ser piştê.

SUPINATING, *n.* : ketina kevandina ser piştê.

SUPINATION, *n.* : dirêjkirin li ser piştê, ketina ser piştê, vezelandin (li ser piştê).

SUPINATOR, *n.* : zeblek yan masûlkeya dirêjeker.

SUPINE, *n., adj.* : serpiştî, serpişt, sist, dilsar, zexel, navê lêkerî.

SUPINELY, *adv.* : bi serpiştî, serpiştkî.

SUPINESS, *n.* : serpiştîtî.

SUPPER, *n.* : paşîv, şîv, şêw.

SUPPERLESS, *adj.* : bê şîv.

SUP, *n.* : fir.

SUP, *vt. i.* : şîv xwarin, fir kirin.

SUPPING, *n.* : firkirin, hilçinîn.

SUPPLANT, *vt.* : helkêşan, şûngirtin nemaze bi kotekî û bêbextî.

SUPPLANTER, *n.* : şûngir.

SUPPLE, *adj.* : nerm, tûrt.

SUPPLE, *vt. i.* : nerm kirin, hedar kirin.

SUPPLED, *adj.* : nermkirî.

SUPPLELY, *adv.* : bi nermî.

SUPPLEMENT, *n.* : serbar, paşko, paşik, paşmayî.

SUPPLEMENT, *vt.* : temam kirin, berdan ser.

SUPPLEMENTAL, *adj.* : serbar, temamî.

SUPPLEMENTARY, *adj.* : hevpişt.

- **ANGLES** : goşeyên tekûz yan temamker (bo 180°).

SUPPLEMENTATION, *n.* : tekûzkirin, temamkirin.

SUPPLENESS, *n.* : nermîtî.

SUPPLIANT, *n., adj.* : lavekar, mehdervan.

SUPPLIANTLY, *adv.* : bilavekarî, hîvîkarî yan mehdervanî.

SUPPLICANT, *n.* : lavekar, mehdervan, laveker.

SUPPLICATE, *vt. i.* : hîvî kirin.

SUPPLICATINGLY, *adv.* : bi hîvîkarî, hîvîkarkî, lavekarkî.

SUPPLICATION, *n.* : daxwaz, lave, dilnewayî, lavekî.

SUPPLICATORY, *adj.* : lavekî, hîvîkarî, mehderkarî.

SUPPLIER, *n.* : jîyandinker.

SUPPLING, *n.* : nermkirin, hedarkirin.

SUPPLY, *vt.* : jîyandin kirin, bi azoqe kirin, bi kereste kirin.

SUPPLY, *n.* : jîyandin, pert, azoqe, azoxe, pîtak.

- **AND DEMAND** : jîyandin û xwastin.

- **DEPARTMENT** : beşê jîyandinê.

- **OF COAL** : azoqe yan jîyandina reşî yan komirî.

- **OF FISH** : jîyandina yan azoqeya masî.

- **OF WATER** : jîyandina avê.

SUPPORT, *vt.* : piştgirtin, harî kirin.

SUPPORT, *n.* : hevdestî, helgir, piştvan, piştgirî, palpişt, darî, berpalk palpişt, harîkirin, piştemêr, piştevanî, mildanber, berpal, alîkirin, lagirî, ragirtin, dakokî, harîkarî, yarîdedan.

- **RESOLUTION** : biryara harîkirinê.

- **VINE'S ~** : çirpî.

SUPPORTABILITY, *n.* : piştgirtinbarî(tî).

SUPPORTABLE, *adj.* : pişţgirtinbar.

SUPPORTABLY, *adv.* : bi pişţgirtinî, pişţgirtinkî.

SUPPORTED, *adj.* : berpale, paldayî, harîkirî, alîkar.

SUPPORTER, *n.* : pişţgîr, hevdest, pişţemêr, hewadar, pişţevan.

SUPPORTING, *n.* : pişţgirtin, alî, algirtin, lagîrî.

SUPPORTIVE, *adj.* : pişţgirdar.

SUPPORTIVENESS, *n.* : pişţgirdarîtî.

SUPPORTLESS, *adj.* : pişţbirrî, bê pişţ, bê pişţevanî.

SUPPOSABLE, *adj.* : girîmanbar, girîmane, girîmanî.

SUPPOSAL, *n.* : girîmankirin.

SUPPOSE, *vt. i.* : girîman kirin.

SUPPOSED, *adj.* : girîmankirî.

SUPPOSEDLY, *adv.* : bi girîmanî, girîmankî.

SUPPOSING, *n.* : girîmankirin.

SUPPOSITILY, *adv.* : bi berdêlî, berdêlkî.

SUPPOSITION, *n.* : girîman.

SUPPOSITIONAL, *adj.* : girîmanî.

SUPPOSITIONALLY, *adv.* : bi girîmanî, girîmankî.

SUPPOSITIOUS, *adj.* : derewîn, berdêlkirî, zir, nerewa, aşopî, efsaneyî, girîmanekî.

SUPPOSITINESS, *n.* : berdêlîtî.

SUPPOSITIVE, *adj.* : zir, derewîn, girîmanî.

SUPPOSITORY, *n.* : şaf, matif.

SUPPRESS, *vt.* : tepeser kirin, qedexe kirin, nihênî kirin, gîro kirin (werara sirûştî).

SUPPRESSED, *adv.* : tepisî, tepeserkirî, serçemandî.

SUPPRESSIBLE, *adj.* : tepeserbar, nihênbar, nepenîbar.

SUPPRESSION, *n.* : tepeserkirin, serçemandin, herişandin.

SUPPRESSIVE, *adj.* : tepeserdar.

SUPPRESSOR, *n.* : tepeserker, mitker, kipker.

- **GRID** : torê mitker, torê kipker.

SUPPURATE, *vi.* : pirzik bûn, kêm (nêm) yan edabî bûn, edab der kirin.

SUPPURATING, *n.* : nêmkirin, edabkirin.

- **PISTULE**, *n.* : pirzika edabî yan nêmî.

SUPPURATION, *n.* : nêmbûn.

SUPRA-, *pref.* : pêşgir e ko li pişţ e, paş e li ser e.

SUPRALIMINAL, *adj.* : ser derazînkî.

SUPRAMOLECULAR, *adj.* : ser gerdî.

SUPRA NATIONAL, *adj.* : ser neteweyî.

SUPRA ORBITAL, *adj.* : ser kunka çavî.

SUPRA PROTEST, *n.* : dana diravê jî alê yan layê kesê sêyem.

SUPRARENAL, *n., adj.* : ser gulçîskî.

SUPRARENAL GLAND, *n.* : livik yan toşpiya erdînal.

SUPREMACY, *n.* : bûnserî, berzî, zalbûn, rajorî, raserbûn, pergal.

SUPREME, *n., adj.* : bala, berz, zal, serdar.

- **COMMANDER** : serfermandar, serleşker.

- **COURT** : dadgeha bala.

- **TO MAKE THE ~ SACRIFICE** : bo welatî mirin, xwe gorî welatî kirin.

SUPREMA BEING, *n.* : Xuda, Xudê, Xuwa, Bûnewerê Bala.

SUR OR SUPER-, *pref.* : pêşgir e ko li ser e, serre ye.

SURAH, *n.* : tevnê avirmîş yê hindî.

SURAL, *adj.* : belekî (ling).

- **ARTERY** : demarê belekî.

SURBASE, *n.* : xemlek avahî li ser binê dîwarî.

SURCEASE, *vt. i.* : rawestîn, dawî kirin.

SURCEASE, *n.* : rawestan, dawîkirin.

SURCHARGE, *n.* : serbac, serbiha, serkirê, barê giran, pûlê diravî yê mohrkirî, mohra li ser pûlê diravî yan posteyî yan kaxeza diravî.

SURCHARGE, *vt.* : bar giran kirin, bêqam bar kirin, pûl yan kaxeza mirovî mohr kirin.

SURCINGLE, *n.* : kemera zînî, kemera kirasê oldarî.

SURCOAT, *n.* : palto.

SURCULOSE, *adj.* : berhemdarê rehên biçûk.

SURD, *n., adj.* : mit, ker, tîpa mit ya ne dengdar ko bi pişînê anko bi nedengî mirov dibêjit (wek : p, s, b, v, z...).

SURE, *adj., adv.* : piştrast, dilniya, binecih, piştrastkî.

- **FOR ~** : piştrast, bê guman.
- **ENOUGH** : rastî.
- **FOOTED** : pêçespan.
- **TO BE ~** : rastî, bê guman.

SURE-ENOUGH, *adj.* : rast, resen.

SUREFIRE, *adj.* : bawerdar.

SURELY, *adv.* : bi piştrastî, piştrastkî.

SURENESS, *n.* : piştrastîti, qinyat.

SURETY, *n.* : bawerîti, destberî, kirîv, desteber.

SURF, *n.* : pêlên şikest.

SURFACE, *n., vt. i.* : serrû, rû, bi ser avê ketin.

- **CHARGE DENSITY** : bargehçiriyê rû.
- **CURVED ~** : rûçemandî.
- **DENSITY ~** : rûçirî.
- **ENERGY** : rûwize.
- **LOWER ~** : rûjêrîn.
- **ROUND ~** : rûyê girûvir.
- **MAIL** : posteyê asayî (bejî).
- **OF REVOLUTION** : rûyê zivirînê.
- **PLANE** : rûrast.
- **PLATE** : rûdepik.
- **SPHERICAL ~** : rû gilokî yan gogî.
- **TENSION** : rûtingijîn.
- **UPPER ~** : rûjorîn.

SURF BOARD, *n.* : depê yariya pêlên şikestî.

SURF BOAT, *n.* : belema yariya pêlên şikestî.

SURFEIT, *n.* : bêqamî, zorxwerî, tibabek mezin.

SURFEIT, *vt. i.* : bêqam yan zor xwarin.

SURF FISH : texlîtek masî ye.

SURF RIDING : siwarbûna pêlên avê.

SURFY, *adj.* : şikestepêlî.

SURGE, *vi.* : şilqan.

SURGE, *n.* : şilqan, çilqan, pêl.

SURGED, *adj.* : şilqayî.

SURGENT, *pres. part.* : rabûyî (pêl).

SURGEON, *n.* : birînsaz, neşterdar, neşterkar, birînkar, birînbaz, nijdar.

- **KNIFE** : neşter.

SURGEONCY, *n.* : birînkarî, şûnkariya birînkarî.

SURGEONFISH, *n.* : masiyek devera yeksanekerî ye.

SURGEON GENERAL, *n.* : serekbirînkar.

SURGEON KNOT, *n.* : girêka birînkarê : girêka girêdana demarên xwînê.

SURGERY, *n.* : birînkarî, nijdarî, neşterkarî, birînsazî.

SURGICAL, *adj.* : nişterî, nojdarî.

- **FEVER** : taya nojdarî (vegirtin ji pirzika rizî).
- **OPERATION** : nişterî, birînkarî.

SURGICALLY, *adv.* : bi nişterî, nişterkî.

SURGING, *n.* : rakeş, şilqandin, çilqandin, pêlpêlok.

SURICATE, *n.* : canewerek memikdar e wek koremişkî ye.

SURINAM, *n.* (**~TOAD**) : beqa Surînamê ko mê hêk û şînikan li ser pişta xwe heldigirit.

SURINJECTION, *n.* : raberê bîrkarî.

SURLILY, *adv.* : bi piştrastî.

SURLINESS, *n.* : girjî, miçûmor.

SURLY, *adj.* : mon, girj.

SURMISE, *n.* : pîjin, sosekirin, hizirkirin, têhînander.

SURMISE, *vt. i.* : hizir kirin, guman kirin, têhînan der.

SURMISED, *adj.* : hizirkirî, têhînayî der.

SURMISING, *n.* : hizir kirin, têhînander.

SURMOUNT, *vt.* : zal bûn, bi ser ketin (hilçûn), bala bûn.

SURMOUNTABLE, *adj.* : serketinbar.

SURMULLET, *n.* : erzînkar : texlîtek masî ye.

SURNAME, *n.* : sernav, bernav, naznaw, navê malbatê.

SURNAME, *vt.* : sernav kirin.

SURPASS, *vt.* : jê borandin, bi ser ketin, jê borîn, (jê) çêtir bûn.

SURPASSABLE, *adj.* : jêborînbar.

SURPASSING, *adj.* : nayab.

SURPASSINGLY, *adv.* : bi nayabî, nayabkî.

SURPLICE, *n.* : kirasek oldarî û spî ye.

SURPLICED, *adj.* : (oldar) spîkiraskirî.

SURPLUS, *n., adj.* : serrêj.

- **POPULATION** : xelkê serrêj.

SURPLUSAGE, *n.* : serbar, serrêj.

SURPRISAL, *n.* : nişkî, guhoştî.

SURPRISE, *vt.* : guhoşandin, rahêjandin.

SURPRISED, *adj.* : rahêjandî, guhoşandî.

SURPRISEDLY, *adv.* : bi rahêjanî, rahêjandkî.

SURPRISING, *adj.* : rahêjanî, guhoşînî.

SURPRISINGLY, *adv.* : bi guhoşînî, guhoşînkî.

SURRA, *n.* : texlîtek kêmxwîniya kujî ya hesp û terşî li deverên yeksanekerî.

SURREALISM, *n.* : serrealîtî : serrastî : olek fransayî û nûjen di huner û torê de ko çalakiyên hişa hindurî bê ser û ber derdibirrît.

SURREBUTTER, *n.* : bersiva gilîkarî dijê gilîlêkerî.

SURREJOINDER, *n.* : bersiva gilîkarî dijî berevanî.

SURRENDER, *vt. i.* : çîz kirin, dest jê berdan.

SURRENDER, *n.* : çîz, mildan, dandest.

SURRENDERING, *n.* : çîzkirin, rasipartin.

SURREPTITIOUS, *adj.* : veşartî, telînî, nihênî, zir, dizî.

SURREPTITIOUSLY, *adv.* : teletel.

SURREY, *n.* : erebaneyek çarçerxî û bi durûnîştek.

SURROGATE, *n.* : cîgir, niwêner, fermanberê dadwerî yê ko rastiya rasipêriyan çespan dikit kardariya samanê miriyan dikit.

SURROGATE, *vt.* : cîgirî kirin, şûnkarî kirin, niwênerî kirin, şûn girtin.

SURROGATED, *adj.* : cîgirkirî, pêşkarkirî.

SURROGATESHIP, *n.* : nimênenderîtî, niwênerîtî, berdêlî, şûnîtî, şûnkarîtî.

SURROGATING, *n.* : cîgirkirin, pêşkarkirin.

SURROUND, *n.* : dorgirtin.

SURROUND, *vt.* : dor girtin.

- **COUNTRY** : gundewarî.

SURROUNDED, *adj.* : pêwerhatî, dorgirtî, dapêçkirî.

SURROUNDING(S), *n.* : dormedar, çarmedar, werhatin, çarhêlgirtin, çarpar, dorgirtin, dorahî, dorûber, dorber, têwerhatin, têwerandin, dorhêl.

SURTAX, *n., vt.* : serbac, baca serbar, baca serbar standin.

SURTOUT, *n.* : paltoyê teng.

SURVEIL, *vt.* : desteser kirin.

SURVEILLANCE, *n.* : dîdevanî, çavdêrî.

SURVEILLANT, *n.* : dîdevan, zêrevan.

SURVEILLED, *adj.* : desteserkirî.

SURVEILLING, *n.* : desteserkirin.

SURVEY, *n.* : pîvan, pêwan, rûpîvî.

SURVEY, *vt.* : pîvan.

SURVEYED, *adj.* : pîvayî, sehkirî.

SURVEYING, *n.* : zevîpîvî, erdpîvî.

SURVEYOR, *n.* : pîver, erdpîv, pîvyar, zevîpîv.

- **'S CHAIN** : zincîra zevîpîvî.

SURVEYOR'S LEVEL, *n.* : terazûya rûpîverî.

SURVEYOR'S MEASURE, *n.* : pîvana rûpîverî.

SURVIVABILITY, *n.* : manbarî(tî), mandarî(tî).

SURVIVABLE, *adj.* : manbar, mandar.

SURVIVAL, *n.* : man, veman, mayîn, debar.

- **OF THE FITTEST** : mana jêhatîtirî.

SURVIVE, *vt. i.* : (zindî) man.

SURVIVED, *adj.* : vemayî.

SURVIVOR, *n.* : vemayî.

SUSCEPTANCE, *n.* : kartêkirin.

SUSCEPTIBILITY, *n.* : hestiyarbarî(tî), kartêkirin.

SUSCEPTIBLE, *adj.* : hestiyarbar, kartêkirinbar.

SUSCEPTIBLENESS, *n.* : hestiyarîtî.

SUSCEPTIBLY, *adv.* : bi hestiyarî, bi kartêkirinî, hestiyarkî.

SUSCEPTIVE, *adj.* = **RESCEPTIVE** (hestiyardar).

SUSLIK, *n.* : canewerek kirinde ye wek sivoreyî, pûrte vî canewerî.

SUSPECT, *vt.* : guman kirin.

SUSPECT, *n., adj.* : guman, gumanî.

SUSPECTABLE, *adj.* : gumanbar.

SUSPECTED, *adj.* : gumankirî.

SUSPEND, *vt. i.* : dahêlan, derxistin (demdarî), rawestandin yan gîro kirin (demdarî), hilawîstin.

SUSPENDED, *adj.* : daliqandî, hilawîstî, helwesrawe, dahêlayî.

SUSPENDER, *n.* : hilawîstok, helgira şelwarî yan goreyî.

SUSPENSE, *n.* : hilawîstin, dahêlan, çavnihêrîn, paşxistin, perîşanî, şaşî, bêrîkirin.

- **IN ~** : hilawîstî, perîşan.

SUSPENSEFUL, *adj.* : hilawîstindar.

SUSPENSIBLE, *adj.* : hilawistinbar, gîrobar.

SUSPENSION, *n.* : dahêlan, helwasîn, hilawîstin, daliqandin, daliqîn.

- **BRIDGE** : pira hilawîstî.

- **POINTS** (...) : nîşana rakirinê (...).

SUSPENSIVE, *adj.* : hilawîstî, paşxistî-(demdarî), bêhnçiker, dudil, (biryar) paşxistinxwaz.

SUSPENSIVELY, *adj.* : bi hilawîstinî, hilawîstinkî.

SUSPENSORY, *adj.* : hilawîstî.

SUSPENSORY LIGAMENT, *n.* : pêgirka hilawîstî (çav û cerg).

SUSPICION, *n.* : şop dîltepî, guman.

- **ABOVE ~** : li ser gumanê re (ji gumanê dûr e).
- **UNDER ~** : gumanbar.

SUSPICION, *vt.* : guman kirin.

SUSPICIONED, *adj.* : gumankirî.

SUSPICIONING, *n.* : gumankirin.

SUSPICIONLESS, *adj.* : bê guman.

SUSPICIOUS, *adj.* : gumangir, gumanî, gumandar, gumanbar, gumanxwaz, berguman.

SUSPICIOUSLY, *adv.* : bi gumanî, gumankî.

SUSPICIOUSNESS, *n.* : gumanîtî.

SUSPIRATION, *n.* : bawişîn.

SUSPIRE, *v.i. t.* : bawişîn, bêrî kirin.

SUSPIRED, *adj.* : bawişkirî.

SUSPIRING, *n.* : bawişkirin.

SUSTAIN, *vt.* : harî kirin, piştgirtin, çespan kirin, qayim kirin, jiyandin kirin, hêlan, man dirêj kirin.

SUSTAINABLE, *adj.* : jiyandinbar, piştgirtinbar.

SUSTAINED, *adj.* : berpale.

SUSTAINER, *n.* : nandar.

SUSTAINING, *n.* : harîkirin.

- **PROGRAMME** : bernameya serbixwe.

SUSTAINMENT, *n.* : alîkirin, piştgirî.

SUSTENANCE, *n.* : xwarin, xwardin, nandan, nandarî, xurek, debar, bijîw, pişgîrî.

SUSTENATION, *n.* : piştgîrî.

SUSURRANT, *adj.* : pistpistker.

SUSSURATION, *n.* : pistpistkirin, pispis(kirin).

SUSURRUS, *n.* : pistpist.

SUTLER, *n.* : dikandarê serbazgehî.

SUTRA, *n.* : pendên torî yên sansikrîtî, çend pend.

SUTTEE, *n.* : sotina bîjina hindî li gel mêrê wê yê mirî.

SUTURAL, *adj.* : dirînî.

SUTURATING, *n.* : dirîna birînan.

SUTURE, *n.* : ta (bo dirîna birînan), dirîna birînan, rêza pêgirtina hestiyên kiloxî, rêza girtina parçeyên nêzîkî helezî yan canewerî.

SUTURE, *vt.* : dirîn.

SUTURED, *adj.* : dirî.

SUTURING, *n.* : dirîn, yekgirtin.

SUZERAIN, *n.* : derebeg, dewlet yan fermanrewa ko serdestiya navkî heye yan raserbûna giştî li ser dewleta nîv-serxwebûnî yan otonomî.

SUZERANITY, *n.* : serdestî, fermanrewayî.

SVELTE, *adj.* : bejnzirav, rift, lewend, ferz, kinf, barik, nazik, vemiştî.

SVELTENESS, *n.* : zirav̂tî, şengîtî, lewendîtî.

SWAB, *vt.* : bi malîkê paqij kirin.

SWAB, *n.* : malîka lûleya çekê agirî, deryavan, baristeyek ji madeyek mijok bi serê darî ve bo paqijkirina şûnek, banê gemiyê, mirovê pûç yan kotî.

SWABBED, *adj.* : malîştî.

SWABBER, *n.* : mirovê pûç yan kotî.

SWADDLE, *n.* : destraz, pêça zarokî.

SWADDLE, *n., vt.* : alandin, pêçan (zarokî).

SWADDLING CLOTHES, *n. pl.* : pêçan.

SWAG, *v.i. t.* : veweşîn, şor bûn, veweşandin, dahêlan.

SWAG, *n.* : dahêlan, veweşîn, şorbûn.

SWAGE, *n.* : qalibê qutanê : alava qutana metalan.

- **BLOCK** : qurmê qalibî.

SWAGE, *vt.* : qutan (metalî).

SWAGGED, *adj.* : veweşî.

SWAGGER, *v.i. t.* : fortekî çûn, fêz kirin, (bi gef) standin.

SWAGGER, *n., adj.* : fortekî, fêzî, fort, fêz, ciwanpûş.

- **STICK** : darê kurt yê efseran.

SWAGGERER, *n.* : fêzkar.

SWAGGERING, *n.* : fort, fortek, zir.

SWAGGERINGLY, *adv.* : bi fortî, fortekkî.

SWAGGING, *n.* : veweşîn.

SWAHILI, *n.* : ziman yan gelê swahilî (li Zencebar û rojhelata Efrîqa).

SWAIN, *n.* : şivan, gundî, cotyar, dildar, evîndar.

SWALE, *vt. i.* : sotin.

SWALLET, *n.* : karêz.

SWALLOW, *vt. i.* : daûran, qurt kirin, hişavtin.

SWALLOW, *n.* : qurt, gulpe, hacîreşk, dumeqesk, meqasok, firek, pereslêr, pereslêra singsor, peresêlke.

SWALLABLE, *adj.* : daûranbar.

SWALLOWED, *adj.* : daûrayî, daqutandî.

SWALLOWING, *n.* : daûran, lerqandin, daxwarin, dalelandin, hişavtin, qurtandin, loşdan.

SWALLOWTAIL, *n.* : dûvpereslêrî.

SWAM, *p.* **OF SWIM** : ket avê (ajnê kir).

SWAMI : potê hindî, seydayê ayînî yê hindî.

SWAMP, *n.* : meraze, çirav, avgir, zong, zelkaw, pingav, genav, avgîr, comaq.

SWAMP, *vt.i.* : noqî bûn, rê birrîn (bi rakirina daran), noqî kirin.

SWAMPER, *n.* : çiravnişîn, yawer, harîker.

SWAMPINESS, *n.* : çirrvîtî.

SWAMPY, *adj.* : çiravî.

SWAN, *n.* : qurmî, werdek, qaz.

- **DIVE** : noqiya werdekî.

- **HERD** : xudankerê werdekan.

SWAN, *n., vi.* : agehdar kirin, cinêw dan, xeber gotin.

SWAN, *vi.* : geran (bê armanc).

SWANK, *n., adj.* : fortekî, fort, law, ciwanpûş.

SWANK, *vi.* : fort kirin.

SWANKY, *adj.* : fortek.

SWANNED, *adj.* : gerayî.

SWANNERY, *n.* : qazgeh.

SWANNING, *n.* : geran.

SWANSDOWN, *n.* : pûrtê qazê yan werdekê, perûkê pembû yê pûrtî.

SWANSKIN, *n.* : çermê qazê.

SWANSONG, *n.* : strana werdekê (strana li ber mirinê), karê dûmahî (berî mirinê).

SWAP, *n., vt. i.* : pêk guhorîn, pêk guhorandin.

SWARAJ, *n.* : serxwebûna hindî.

SWARD, *n.* : mêrg, erdê giyakirî.

SWARF, *n.* : pirtik (telezm) yên darî, kanî yan mûmî yên birrîna qawinan.

SWARM, *n.* : şilx, şilh, koma kuliyan, koma xelkê pêşve diçin.

SWARM, *vt. i.* : kom bûn, firîn (mêş hingvîn).

SWARMING OF BEES, *n.* : baris.

SWART, *adj.* = **SWARTHY.**

SWARTH, *n., adj.* : sward, reng tarî yan çerm esmer.

SWARTHINESS, *n.* : rengtarîtî.

SWARTHY, *adj.* : reng tarî yan çerm esmer.

SWASH, *n.* : fortekî, fêzî, çûna avê (jî pêlên şikestî) bo ber avê ve, dengê vê avê, coka avê (ji ber avê bo çalek xîzî).

SWASH, *vt. i.* : fort kirin, fêz kirin.

SWASHBUCKLER, *n.* : zirt.

SWASHBUCKLING, *adj.* : zirtî.

SWASH LETTERS, *n. pl.* : tîpên dûvkirî (bo xemilandinê).

SWASTIKA, *n.* : xaça xwehr, bextewer, hêmaya naziyan.

SWAT, *n.* : lêdana dijwar.

SWAT, *vt. i.* : dijwar lê dan.

SWATCH, *n.* : tîtikek yan nimûneyek perûkî, parçeyek biçûk, girûhek biçûk.

SWATH, *n.* : piniya birrîna dasê ya carekê, rêzek ji giyanî yan gulegenimî bi dasê yan cawbirrê hatî birrîn.

SWATHE, *vt.* : girê dan, pêçan.

SWATHE, *n.* : swath, pêç.

SWATHING, *n.* : pêçan, panisman.

SWATHY, *adj.* : reşboz.

SWAY, *v.i. t.* : xingilîn, veweşîn.

SWAY, *n.* : veweşîn, ferkosî, desthelatî, xingilîn.

SWAYED, *adj.* : vehejandî.

SWAYING, *n.* : şeke, veweşîn, licimandin, ferkosî, vehejîn, vehejandin, xelîn, leqîn, xingilîn.

- **MOTION** : livîna veweşînî.

SWEAR, *n., vt. i.* : çêr, sond xwarin, dupat kirin.

- **TO ~ AT** : xeber gotin, cinêw kirin, ciwên dan.

- **TO ~ BY** : sond xwarin bi.

- **TO ~ FOR** : desteber kirin.

- **TO ~ IN** : şûnkar kirin.

- **TO ~ OFF** : dest jê berdan.

SWEARER, *n.* : devçêr.

SWEARING, *n.* : çêr, navdan, sond.

- **BY " OATH "** : sond xwarin.

SWEARWORD, *n.* : virtoqî, dijûn, ciwên, cinêw, xeber, çêr.

SWEAT, *n.* : xuh.

- **GLAND** : livîka xuhdanê.

- **GLAND DUCT** : kerxexuh.

- **SHIRT** : kumlekê werzişvanan.

- **SHOP** : kargeha xuhdanê (kêmkirê û nexweş).

SWEAT, *v.i. t.* : xuh dan.

- **TO ~ BLOOD** : rêncberî kirin, bêqam perîşan bûn.

SWEATBAND, *n.* : şerîta xwe mijîna şefqeyî.

SWEATBOX, *n.* : sindoqa xuhdanê : xuhdangeh, dira mirov lê xuh didit, tengesindoqa girtiyan.

SWEATED, *adj.* : xuhdayî.

- **GOODS** : pertalê xuhdayî (bi kêmkirê û mercên nexweş berhemkirî).

- **LABOUR** : karê xuhdayî : rêncberiya sext ya kêmkirê û cih û merc nexweş).

- **WORKERS** : karkerên xuhdayî, ko karê sext dikin, (kêmkirê û merc nexweş).

SWEATER, *n.* : saqo yan bilozê hirî, rêncber, xuhker.

- **GIRL** : memikbel.

SWEATING, *n.* : xuhdan.

- **ROOM** : jora xuhdanê.

SWEATY, *adj.* : xuhdanî.

SWEDE, *n.* : welatiyê Swêdê.

SWEDISH, *n., adj.* : welatî yan zimanê Swêdî.

- **MASSAGE** : gemirandina swêdî : gemirandin bi livînên werzişî yên swêdî.

- **MOVEMENTS** : livînên swêdî : rêzika livînên werzişî bo rahênana zeblekan.

SWEENY, *n.* : lawazbûna zeblekî nemaze ya milê hespî.

SWEEP, *vi.* : ramalîn, maliştin, malîn.

- **TO ~ THE CARPET** : mehfûr maliştin (malîn).

- **TO ~ THE FLOOR** : bermalê maliştin (malîn).

SWEEP, *n.* : berbirîn, ramalîn, maliştin, malîn, berbirin.

- **BACK** : dirêjbûn, paşveçûna çengî.

- **STAKE(S)** : pêşbirke, texlîtek girewa li ser hespî ko altdar hemû yan behra pitir jî girewan dibit, peşk, pêşbezîn.

SWEEPER, *n.* : gêsik, bermalk, gêzîvan, malîk, şivînk, rêş, cerîfk.

SWEEPING, *n., adj.* : gêzîkirin, malîn, maliştin, rêşkirin, radan, gewre.

- **AWAY** : ramalîn.

- **CURRENT** : rewtek yan şîpa avê.

- **FLOW** : şîpa avê.

- **STREAM** : şîpa avê.

SWEEP-SECOND, *n.* : destikê çirkeya ramalîn (lêkdayî li ser destikên dî yên demjimêrê).

SWEEPY, *adj.* : maliştinî.

SWEET, *n., adj.* : şirîn, herîr, neşmîle, şekirî, şîranî, dobe, şîranî(tî).

- **AT ONE'S OWN ~ : WILL** : wek bivêt (bikit).

- **TO BE ~ ON OR UPON** : şeyda.

SWEET ALYSSUM, *n.* : elîsoma şirîn : helezê elîsoma deryayî.

SWEET APPLES, *n.* : sêvên şirîn.

SWEET BABY, *n.* : zarokê şirîn, hestîsivik.

UNLEARNT, *adj.* : nezan.

UNLEASH, *vt.* : veresandin.

UNLEAVENED, *adj.* : nehavekirî.

- **CAKE** : kiloc.

UNLESS, *prep., conj.* : ger, heke, meger.

UNLETTERED, *adj.* : nexwenda, nexwendewar.

UNLIBERATED, *adj.* : neserbestkirî.

UNLICENSED, *adj.* : nerewakirî, nedestûrkirî, rênedayî.

UNLICKED, *adj.* : nevemiştî, req, neşikilkirî.

UNLIGHTED, *adj.* : neronahîkirî.

UNLIKE, *adj.* : ne wek.

UNLIKELY, *adj.* : neşîmankî.

UNLIMBER, *vt.* : rakirin (berahiya topê).

UNLIMITED, *adj.* : bêsinor, bêrade (neradekirî), bêleka.

UNLINED, *adj.* : nerêzkirî, nexêzkirî.

UNLINK, *vt.* : vekirin (zincîr).

UNLIQUIDATED, *adj.* : neavekîkirî, neqirandî.

UNLISTED, *adj.* : nesiyayîkirî.

UNLIT, *adj.* : nehilkirî.

UNLOAD, *vt., i.* : vala kirin, bar hînan xarê.

UNLOADER, *n.* : valaker.

UNLOCK, *vt., i.* : vekirin (kod yan çilmîre), vebûn, şifre vekirin.

UNLOCKED, *adj.* : vekirî (çilmîre...).

UNLOOKED (FOR), *adj.* : nehîvîkirî.

UNLOOSE, *vt.* = **LOOSE.**

UNLOOSEN, *vt.* = **LOOSE.**

UNLOVABLE, *adj.* : neviyanbar.

UNLOVED, *adj.* : neviyayî.

UNLOVELY, *adj.* : netaze, kirêt, kîndar.

UNLOVING, *adj.* : neviyankar.

UNLUCKILY, *adv.* : bi bedbextî, bi bextreşî.

UNLUCKINESS, *n.* : bextreşîtî, bêoxirîtî.

UNLUCKY, *adj.* : porkur, malxirab, bêw, bedbext, bextreş, xopan, bêoxir.

UNMAIDENLY, *adj.* : nenazik.

UNMAKE, *vt.* : şikandin, lawaz kirin, cuda kirin, guhorîn.

UNMAN, *vt.* : nemêr kirin, guno kirin.

UN MANAGEABLE, *adj.* : nekardarbar.

UNMANLY, *adj.* : qûnde.

UNMANNED, *adj.* : bê zalam, bê karker.

UNMANNERLY, *adj.* : dilreq, bêrûmet, nîvekir.

UNMARKED, *adj.* : nenîşankirî.

UNMARKETABILITY, *n.* : nebazarbarîtî.

UNMARRIED, *adj.* : şûnekirî.

UNMASK, *vt.* : riswa kirin, bê rûpûş kirin, diyar yan eşkera kirin.

UNMASKING, *n.* : riswakirin, diyarkirin.

UNMATCHABLE, *adj.* : bêhemta.

UNMEANING, *adj.* : bêşopewer.

UNMEASURABLE, *adj.* : nepîvanbar.

UNMELODIOUS, *adj.* : neawazdar.

UNMELTED, *adj.* : nebuhujî.

UNMEMORABLE, *adj.* : nebîrewer(bar).

UNMENTIONABLE, *n., adj.* : nenîşankirinbar.

UNMERCHANTABLE, *adj.* : nebazarbar.

UNMERCIFUL, *adj.* : nedilovan, nemihrivan.

UNMERITED, *adj.* : nehêja, nestêle.

UNMINDFUL, *adj.* : feramoş.

UNMISTAKABLE, *adj.* : rohn, diyar, eşkera, (neçewtbar).

UNMITIGATED, *adj.* : temam, tekûz, bêhedarî.

UNMIXED, *adj.* : netêkil, petî, bijîn.

UNMODIFIED, *adj.* : neguhartî, nerastkirî.

UNMODULATED, *adj.* : dengneguhartî.

UNMOLESTED, *adj.* : necariskirî.

UNMOOR, *vt.* : lenger vekirin yan rakirin.

UNMORAL, *adj.* : nesincî.

UNMORALITY, *n.* : bêsincîtî.

UNMOTHERLY, *adj.* : nedayikanî.

UNMORTISE, *adj.* : pêkve negirtî.

UNMOURNED, *adj.* : nebehîkirî.

UNMOUNTED, *adj.* : nesiwar (bûyî).

UNMOVED, *adj.* : mit, hedar, xweragir, guhnedayî, pûtepênekirî.

UNMOWN, *adj.* : (giya) nebirrî.

UNMUFFLE, *vt.* : rûpûş yan stûpêç rakirin.

UNMURMURING, *adj.* : negazindî.

UNMUSICAL, *adj.* : ne mûzîqeyî, ne xweş (bo bihîstinê).

UNMUZZLE, *vt.* : devgirî rakirin (ji devê seyî).

UNNAIL, *vt.* : bizmar hînan der.

UNNAMEABLE, *adj.* : nenavkirinbar.

UNNAMED, *adj.* : nenavkirî.

UNNATIONAL, *adj.* : ne neteweyî.

UNNATURAL, *adj.* : nesirûştî, biyanî, rûbaz, nerast, nexweristî.

UNNECESSARILY, *adj.* : bi pêneviyayî.

UNNECESSARY, *adj.* : pêneviyayî.

UNNEIGHBOURLY, *adj.* : nedostane, ne xoş cîran, ne çitov cîran.

UNNERVE, *vt.* : tirsandin, bizdihandin, har kirin.

UNNOTICED, *adj.* : nesehkirî, nedîtî.

UNNUMBERED, *adj.* : bêjimar, jimarnekirî, bêqam.

U.N.O., *abbr.* : **UNITED NATIONS ORGANIZATION** : Rêkxirawa Neteweyên Yekgirtî.

UNOBJECTIONAL, *adj.* : ne berhelistinbar.

UNOBSCURED, *adj.* : neveşartî.

UNOBSERVANT, *adj.* : nezêrevan.

UNOBSERVED, *adj.* : nezêrevankirî.

UNOBSTRUCTED, *adj.* : negîrokirî.

UNOBTAINABLE, *adj.* : nestandinbar.

UNOBTRUSIVE, *adj.* : nezanxwaz.

UNOCCUPIED, *adj.* : vala, nemijûl.

UNOFFENDING : bêziyan.

UNOFFICIAL, *adj.* : nemirî.

UNOILED, *adj.* : neronkirî.

UNOPENED, *adj.* : nevekirî.

UNOPPOSED, *adj.* : neasayî.

UNORGANIZED, *adj.* : nerêkxistî.

UNORIGINAL, *adj.* : neresen.

UNORNAMENTED, *adj.* : nexemilandî.

UNORTHODOX, *adj.* : nerast hizir yan ol.

UNOSTENTATIOUS, *adj.* : nefortek.

UNOWNED, *adj.* : bêxudan.

UNPACK, *vt., i.* : valakirin (çente), vekirin.

UNPAGED, *adj.* : nehejmarkirî (rûpel).

UNPAID, *adj.* : bê pare, bê dirav, bê kirê, bêmûçe, herwe.

- **LABOUR** : suxre, bîgar(î).

- **WORK** : zibare, olam.

UNPAIRED, *adj.* : necotkirî.

UNPALATABLE, *adj.* : nexweş, kîndar.

UNPARALLELED, *adj.* : bêwêne, bêhvta, bêhemta.

UNPARDONABLE, *adj.* : nebexşînbar.

UNPARLIAMENTARY, *adj.* : neparlemanî (dij rêbaza rast ya perlamanî).

UNPATENTED, *adj.* : nebelûkirî.

UNPATRIOTIC, *adj.* : ne nîştimanperwer.

UNPAVED, *adj.* : nerastkirî(rê).

UNPEELED, *adj.* : nespîkirî (mîwe).

UNPEG, *vt.* : singî rakirin, vekirin (bi rakirina singî).

UNPEOPLE, *vt.* : bêxelk kirin.

UNPERCEIVED, *adj.* : netêgehiştî, tenehînayîder.

UNPERFORMED, *adj.* : neberpekirî.

UNPERSON, *n.* : mirovê nenas(kirî).

UNPERSUADED, *adj.* : qayilnekirî, neqayilkirî.

UNPERSUASIVE, *adj.* : neqayildar.

UNPERTURBED, *adj.* : neşepirze.

UNPHILOSOPHICAL, *adj.* : nejîrzanî.

UNPICK, *vt.* : vekirin (dirîn).

UNPICKED, *adj.* : nebijartî.

UNPICTURESQUE, *adj.* : netaze, newênedar.

UNPILE, *vt.* : belav kirin, cuda kirin (ji komê), cuda bûn (ji komê).

UNPIN, *vt.* : vekirin yan cuda kirin.

UNPITIED, *adj.* : nekolayî, nekûrikkîrî.

UNPLACED, *adj.* : nedanayî (di nav pêşbezînê de).

UNPLANNED, *adj.* : nemelhezekirî, bê melheze.

UNPLANTED, *adj.* : beyar, neçandî.

UNPLASTERED, *adj.* : neseyandî.

UNPLAUSIBLE, *adj.* : nebawerbar.

UNPLAYABLE, *adj.* : neleyizbûn (tepk).

UNPLEASANT, *adj.* : hestîgiran, gulor.

UNPLEASING, *adj.* : neşadkar.

UNPLEASURE, *n.* : nexweşî.

UNPLEDGED, *adj.* : nebelênkirî, nesozkirî.

UNPLOUGHED, *adj.* : nekêlayî.

UNPLUCKED, *adj.* : nehelkêşayî.

UNPLUG, *vt.* : (serdevkî) rakirin.

UNPLUMBED, *adj.* : bê serhatî, azmûnnekirî.

UNPOETICAL, *adj.* : nehelbestî.

UNPOINTED, *adj.* : nexalikkirî, bêxalik.

UNPOLISHED, *adj.* : nevemiştî.

UNPOLITICAL, *adj.* : nerêzikî, neramyarî.

UNPOLLED, *adj.* : dengnedayî.

UNPOLLUTED, *adj.* : nepîskirî.

UNPOPULAR, *adj.* : negelêrî, nehez, nexûntal.

UNPOPULATED, *adj.* : neava, bêxelk.

- **AREA** : pasar.

UNPOSSESSED, *adj.* : bêxudan.

UNPOSTED, *adj.* : nehinartî.

UNPRACTICAL, *adj.* : nekirdarî.

UNPRACTISED, *adj.* : serhatî yan kirdar nekirî.

UNPRECEDENTED, *adj.* : nûjen.

UNPREDICTABLE, *adj.* : neberbînbar.

UNPREDICTED, *adj.* : neberbînkirî.

UNPREJUDICED, *adj.* : nepêşbiryar.

UNPREMEDITATED, *adj.* : nebiryardarî.

UNPREPARED, *adj.* : nepêkhatî, nelêkdayî, neamade.

UNPREPOSSESSING, *adj.* : nedilgir.

UNPRESENTABLE, *adj.* : nelêkdayî (karnekirî).

UNPRESUMING, *adj.* : nerûqayim.

UNPRETENDING, *adj.* : nefortek.

UNPRETENTIOUS, *adj.* : sade, sakar, dilovan.

UNPRICED, *adj.* : nebihakirî, nenirxkirî.

UNPRIEST, *vt.* : (qeşe) derxistin.

UNPRIMED, *adj.* : nelêkdayî (makîne).

UNPRINCIPLED, *adj.* : bêabrû, bêsincî.

UNPRINTABLE, *adj.* : neçapbar.

UNPRINTED, *adj.* : neçapkirî.

UNPROCURABLE, *adj.* : neberdest(kirin)bar.

UNPRODUCTIVE, *adj.* : neberdar, neberhemdar.

UNPROFESSED, *adj.* : nenaskirî.

UNPROFESSIONAL, *adj.* : nepîşekar, dij sinciya karî xulya.

UNPROFITABLE, *adj.* : nehavilbar, bêtewş.

UNPROGRESSIVE, *adj.* : nepêşketinxwaz.

UNPROHIBITED, *adj.* : rewa, neqedexekirî.

UNPROMISING, *adj.* : bêhavil, neserketî.

UNPROMPTED, *adj.* : serpêlkî, xweyî, xweristî.

UNPRONOUNCABLE, *adj.* : nebêjebar.

UNPROPHETIC, *adj.* : neberbîn.

UNPROPITIOUS, *adj.* : nemijdewer.

UNPROSPEROUS, *adj.* : nedewlemend.

UNPROSCRIBED, *adj.* : rewa.

UNPROTECTED, *adj.* : neparastî.

UNPROVABLE, *adj.* : nedirûvbar.

UNPROVED, *adj.* : nedirûvkirî.

UNPROVEN, *adj.* : nedirûvkirî.

UNPROVIDED, *adj.* : nedayî.

UNPROVOKED, *adj.* : nearandî.

UNPUBLISHED, *adj.* : nebelavkirî, neweşandî.

UNPUNCTUAL, *adj.* : nezû.

UNPUNCTUATED, *adj.* : nexalikkirî.

UNPUNISHED, *adj.* : nesizakirî.

UNPURIFIED, *adj.* : nebîjnkirî.

UNQUALIFIED, *adj.* : nejêhatî, piştrast, bê guman.

UNQUEEN, *vt.* : şah banû derkirin.

UNQUENCHABLE, *adj.* : têhnbar.

UNQUENCHED, *adj.* : têhnneşikandî.

UNQUESTIONABLE, *adj.* : negumanbar, bê guman.

UNQUESTIONED, *adj.* : nepirsyarkirî, negumankirî.

UNQUESTIONING, *adj.* : bêgumankirin, tekûz.

UNQUIET, *adj.* : şepirze, şilejan, perîşan.

UNQUOTABLE, *adj.* : nelêwergirtinbar.

UNQUOTE, *vt.* : lêwergirtin temam kirin (kevan girtin).

UNQUOTED, *adj.* : nelêwergirtî.

UNRANSOMED, *adj.* : xwîn(biha)nedayî.

UNRAVEL, *vt., i.* : vekirin, vebûn (ben yan aloz).

UNRAVELLING, *n.* : vekirin (aloz).

UNRAVISH, *adj.* : netalankirî.

UNRAZORED, *adj.* : netiraşî.

UNREACHABLE, *adj.* : negehînbar.

UNREAD, *adj.* : nexwendî, nezan.

UNREADABLE, *adj.* : nexwendinbar.

UNREADY, *adj.* : nelêkdayî, neamade.

UNREAL, *adj.* : nerast, aşop.

UNREALISTIC, *adj.* : nekirdarî.

UNREALIZABLE, *adj.* : neberperbar.

UNREALIZED, *adj.* : neberpekirî.

UNREAPED, *adj.* : necinî, nedirî, (genim...).

UNREASON, *n.* : dînatî.

UNREASONABLE, *adj.* : bêcî, nehişdar, nejîrbêjî, bêqam.

UNREASONED, *adj.* : egernekirî, honekirî.

UNRECEPTIVE, *adj.* : newergir.

UNRECIPROCATED, *adj.* : neberdêlkirî.

UNRECKONED, *adj.* : nehejmartî, hizirnekirî.

UNRECLAIMED, *adj.* : nedaxwazkirîve.

UNRECOGNIZABLE, *adj.* : nenaskirinbar.

UNRECOGNIZED, *adj.* : nenaskirî.

UNRECOMPENSED, *adj.* : nexelatkirî.

UNRECONCILED, *adj.* : neaştkirî, nepêkhatî.

UNRECORDED, *adj.* : netomarkirî.

UNRECTIFIED, *adj.* : nerastkirî.

UNREDEEMED, *adj.* : nerizgarkirî.

UNREDRESSED, *adj.* : neçarekirî.

UNREEL, *vt., i.* : vekirin, vebûn (ben ji dartûnî...).

UNREEVE, *vt.* : kêşan (werîsî ji kunekê yan bazinekê).

UNREFLECTING, *adj.* : neramankar.

UNREFLECTIVE, *adj.* : hol, neramandar.

UNREFORMED, *adj.* : neçakkirî.

UNREGAL, *adj.* : neqiralî, neşahî.

UNREGARDED, *adj.* : hizirjênekirî.

UNREGENERATE, *adj.* : rikdar, bizir.

UNREGISTERED, *adj.* : tomarnekirî.

UNREGRETTED, *adj.* : jûvannekirî : poşmannebûyî.

UNREGULATED, *adj.* : rêziknekirî.

UNREHEARSED, *adj.* : nerahînayî.

UNREIN, *vt.* : bêhefsar kirin, veresandin.

UNRELATED, *adj.* : nepêwendîdar.

UNRELAXED, *adj.* : nevesihî.

UNRELENTING, *adj.* : nesist yan lawaz, çalak, req.

UNRELIABLE, *adj.* : ne cihê baweriyê, teres.

UNRELIEVED, *adj.* : rizgarnekirî.

UNRELIGIOUS, *adj.* : nedîndar.

UNREMARKABLE, *adj.* : nepayedar, nehêja.

UNREMEMBERED, *adj.* : bîrnekirî.

UNREMITTING, *adj.* : berdewam.

UNREMUNERATIVE, *adj.* : nediravbar, nehavilbar.

UNRENOUNCED, *adj.* : nehêlayî (bawerî, ol...).

UNREPEALED, *adj.* : nehelweşandî.

UNREPEATABLE, *adj.* : nedubarebar.

UNREPENTANT, *adj.* : nepoşman, nejûvan.

UNREPORTED, *adj.* : nehinartî (peyam).

UNREPRESENTATIVE, *adj.* : nenimînenderî.

UNREPRESENTED, *adj.* : nenimînendekirî.

UNREPROVED, *adj.* : gilîjênekirî.

UNREQUITED, *adj.* : berdêlnekirî (viyan).

UNRESERVE, *n.* : eşkerayî, neparêzkerî.

UNRESERVED, *adj.* : tekûz, negirtî (cih), neparêzkar.

UNRESISTED, *adj.* : bergirînekirî.

UNRESISTING, *n.* : nebergirkar.

UNRESOLVED, *adj.* : neçarekirî.

UNRESPONSIVE, *adj.* : nebersivbar.

UNREST, *n.* : şilejan, bêvesihînî.

UNRESTFUL, *adj.* : nevesîhî.

UNRESTING, *adj.* : bêvesihîn, nevesihîn.

UNRESTORED, *adj.* : nevegerandîve.

UNRESTRAINED, *adj.* : negirtî, bêqam, neşaş, berdayî, xweyî.

UNRESTRICTED, *adj.* : nebendkirî, neradekirî.

UNRETURNED, *adj.* : nevegerandî.

UNREVEALED, *adj.* : nediyarkirî.

UNREVISED, *adj.* : nebijarkirî.

UNREVOKED, *adj.* : nehelweşandî.

UNREVENGED, *adj.* : tolnevekirî, tolnestandî.

UNREVERSED, *adj.* : neberevajîkirî.

UNREWARDED, *adj.* : nebexşkirî.

UNREWARDING, *n.* : bêhavîl.

UNRHETORICAL, *adj.* : nerewanbêjî.

UNRHYMED, *adj.* : neçamekirî, nepîvankirî.

UNRHYTHMICAL, *adj.* : neawazî.

UNRIDABLE, *adj.* : nesiwarbar.

UNRIDDLE, *vt.* : vekirin (aloz yan metelok).

UNRIG, *vt.* : cil êxistin.

UNRIGHTEOUS, *adj.* : zordar, sitemkar, nerast, bed, dijdar.

UNRIP, *vt.* : diyar kirin, dirandin, peritandin.

UNRIPE, *adj.* : negehiştî (mêwe...), tift, kerik, xav, mate.

- **FRUIT** : kerik.

- **GRAPES** : bêsîre.

UNRIVAL(L)ED, *adj.* : awarte, bêhevta, bêhevrik.

UNROBE, *vt., i.* : cil êxistin.

UNROLL, *v.* : (gilol) vekirin, belav bûn, belav kirin.

UNROMANTIC, *adj.* : neromantîkî.

UNROOF, *vt.* : (kaşxank) rakirin, (serdank) rakirin.

UNROOFED, *adj.* : nebankirî.

UNROOT, *vt., i.* : helkêşan.

UNROPE, *vt., i.* : vekirin(werîsî).

UNROYAL, *adj.* : neşahane.

UNRUFFLED, *adj.* : neşaşkirî, nehejandî, hedar, hilî.

UNRULED, *adj.* : nehukimkirî.

UNRULY, *adj.* : şemûz, şehmûz, şebûz.

UNRWA, *abbr.* : **United Nations Relief and Works Agency** : Şûnkariya yarmetî û karên Neteweyên Yekgirtî.

UNSADDLE, *vt., i.* : kevandin (ji ser hespî), xurc rakirin.

UNSAFE, *adj.* : nehêmin, bêbawer.

UNSAID, *adj.* : negotî.

UNSALABILITY, *n.* : bêbazarî, nefirotinbarî.

UNSALARIED, *adj.* : nemûçekirî.

UNSALEABLE, *adj.* : nefiroşbar.

UNSALTED, *adj.* : nexwêkirî.

UNSANCTIFIED, *adj.* : nepîrozkirî.

UNSANCTIONED, *adj.* : nepiştgîrkirî.

UNSANITARY, *adj.* : pîs.

UNSATISFACTORY, *adj.* : nedilniyayî.

UNSATISFIED, *adj.* : nedilniya(kirî).

UNSATISFYING, *n.* : nedilniya (kirin).

UNSATURATE(D), *adj.* : netêrkirî, (pêkhatiya kîmyayî).

UNSAVED, *adj.* : nerizgarkirî.

UNSAVOURY, *adj.* : bêtam, kîndar.

UNSAY, *vt.* : (axiftina xwe) paşve kêşan, (ji axiftin yan gotina xwe) paşve çûn.

UNSCALABLE, *adj.* : neserketinbar.

UNSCALE, *vt.* : hatin xarê.

UNSCARRED, *adj.* : nebirînkirî.

UNSCATHED, *adj.* : bêziyan, saxlem.

UNSCENTED, *adj.* : nebêhnxweş.

UNSCHEDULED, *adj.* : nemelhezekirî.

UNSCHOLARLY, *adj.* : nezana.

UNSCHOOLED, *adj.* : nexwendî, nerahênayî.

UNSCIENTIFIC, *adj.* : nezanistî.

UNSCRAMBLE, *vt.* : nameya bêtêlî vegerandin şiklê resen, rave kirin, şîtel kirin, tiştê têkil vegerandin hêmanên resen.

UNSCREENED, *adj.* : bêperde(kirî), bêberbest(kirî), vata.

UNSCREW, *vt., i.* : vekirin (burxî, pêçek...), vebûn.

UNSCRIPTED, *adj.* : nenivîsî, bênivîsîn.

UNSCRIPTUAL, *adj.* : netewratî.

UNSCRUPULOUS, *adj.* : bêakar, nesincî.

UNSEAL, *vt.* : mohr rakirin, vekirin.

UNSEALED, *adj.* : negirtî (zerf...).

UNSEAM, *vt.* : (dirîn) vekirin, dirrandin.

UNSEARCHABLE, *adj.* : nepenî, nihênî, aloz, nepişkinînbar.

UNSEASONABLE, *adj.* : nekeşbar.

UNSEASONED, *adj.* : nealatkirî, nebeharatkirî.

UNSEAT, *vt.* : kevandin (ji rûniştekê yan desthelatiyê).

UNSEAWORTHY, *adj.* : (derya) kêrnehatî.

UNSECONDED, *adj.* : nepesindkirî.

UNSECURED, *adj.* : neqayimkirî.

UNSEEDED, *adj.* : nebijartî (werzişvan yan yarîker).

UNSEEING, *adj.* : nebîn, kore.

UNSEEN, *adj.* : nebîn, neditî.

UNSEGREGATED, *adj.* : têkil (bêcudakirina regezî yan rengî).

UNSELFCONSCIOUS, *adj.* : hay ji xwe ne.

UNSELFISH, *adj.* : neezperist.

UNSENSATIONAL, *adj.* : nehestiyar.

UNSENTIMENTAL, *adj.* : nesozyar.

UNSEPARETED, *adj.* : necuda.

UNSERVICEABLE, *adj.* : nebikarbar.

UNSET, *adj.* : nedanayî nav (gewher).

UNSETTLE, *vt.* : rakirin, şaş kirin, şepirze kirin, şaş bûn, xilole bûn.

UNSEW, *vt.* : vekirin yan dirrandin (dirîn).

UNSEX, *vt.* : regezî, zayendeyî yan hêza zayendeyî jê birin, bê mêyatî kirin.

UNSHACKELED, *adj.* : aza yan rizgar kirin (ji bendan).

UNSHADED, *adj.* : nesîberkirî.

UNSHAKABLE, *adj.* : xwegir (nehejînbar), neşekbar.

UNSHAKEN, *adj.* : nehejandî, şeknekirî.

UNSHAPED, *adj.* : (kirêt) şikil yan şêwe nekirî.

UNSHAPELY, *adj.* : netaze.

UNSHARED, *adj.* : dabeşnekirî.

UNSHAVEN, *adj.* : netiraşî.

UNSHEATHE, *vt.* : kêşan (ji kalanî).

UNSHED, *adj.* : sîber yan sih nekirî.

UNSHELL, *vt.* : hînan der (ji qalikî).

UNSHELTERED, *adj.* : nepenakirî.

UNSHIP, *vt.* : hînan xarê (rêbar û barî) ji gemiyê.

UNSHOD, *adj.* : pêxas.

UNSHOE, *vt.* : pêlav êxistin.

UNSHORN, *adj.* : rûtnekirî.

UNSHRINKABLE, *adj.* : negirmijînbar.

UNSHRINKING, *adj.* : negirmijî.

UNSIGHTED, *adj.* : neditî.

UNSIGHTLY, *adj.* : kirêt, netaze.

UNSIGNED, *adj.* : îmzanekirî.

UNSIZED, *adj.* : qebarenekirî.

UNSIZED, *adj.* : qebarenekirî.

UNSKILFUL, *adj.* : neşehreza.

UNSKILLED, *adj.* : xavdest, neşehreza.

- **WORKER** : sepan, pale, kolî, karkerê neşehreza.

UNSKIMMED, *adj.* : tûknerakirî.

UNSLAKED LIME, *n.* : kilsa nevekujandî.

UNSLEEPING, *n.* : şevnişîn, nexewîn.

UNSLING, *vt.* : rakirin, êxistin.

UNSMILING, *adj.* : nebişkurî.

UNSMOKED, *adj.* : nedûkêlkirî.

UNSNARL, *vt.* : vekirin (alîn yan alozî).

UNSOCIABILITY, *n.* : goşegîrî(tî).

UNSOCIABLE, *adj.* : har, dirr, necivakîbar.

UNSOCIABLENESS, *n.* : goşegîrî(tî).

UNSOCIAL, *adj.* : necivakî.

UNSOILED, *adj.* : nelekekirî.

UNSOLD, *adj.* : nifirotî.

UNSOLDER, *vt.* : buhujandin.

UNSOLICITED, *adj.* : nexwestî.

UNSOLVABLE, *adj.* : neçarebar.

UNSOLVED, *adj.* : neçarekirî.

UNSOPHISTICATED, *adj.* : sade.

UNSORDID, *adj.* : nepîs, nekirêt.

UNSORTED, *adj.* : necudakirî.

UNSOUGHT, *adj.* : lidûvneçûyî, nelêgerayî.

UNSOUND, *adj.* : neqayim, nebaş, nerast, nedirist, nesax (leş û hiş).

UNSOUNDED, *adj.* : nepirsyarkirî.

UNSOURED, *adj.* : netirş, neenirî.

UNSOWN, *adj.* : beyar, tovnekirî.

UNSPARING, *n.* : dilvera, zehf, req, bêdilovanî.

UNSPEAKABLE, *adj.* : neravebar, negotinbar (nahêt gotin), bêqam bed.

UNSPECIFIED, *adj.* : netaybetkirî.

UNSPECTACULAR, *adj.* : nenayab.

UNSPENT, *adj.* : mayî, xercnekirî.

UNSPILLED, *adj.* : nerîştî.

UNSPILT, *adj.* : nerîştî.

UNSPIRITUAL, *adj.* : negiyanî.

UNSPLICED, *adj.* : (pêkve) negirêdayî.

UNSPLINTERABLE, *adj.* : netelezimbar.

UNSPOILED, *adj.* : netêkdayî.

UNSPOILT, *adj.* : nexirabkirî.

UNSPOKEN, *adj.* : neaxiftî.

UN SPORTING, *adj.* : newerzişî.

UNSPORTSMANLIKE, *adj.* : ne (wek) werzişvanî.

UNSPOTTED, *adj.* : nepînîkirî, nelekekirî, nepîskirî, bêkêmatî.

UNSPRUNG, *adj.* : nezenbelekî.

UNSTABLE, *adj.* : xwenegir, neseqamgîr, xilole, dilkoçer.

UNSTAINED, *adj.* : nepînîkirî, nepîskirî, nelekekirî.

UNSTAMPED, *adj.* : nepolkirî.

UNSTARCHED, *adj.* : nenişakirî.

UNSTATED, *adj.* : negotî.

UNSTATESMANLIKE, *adj.* : ne (wek) dewletvanî.

UNSTATUTABLE, *adj.* : neqanûnbar.

UNSTEADFAST, *adj.* : xweneragir.

UNSTEADILY, *adv.* : ne bi qayimî, neqayimkî.

UNSTEADINESS, *n.* : neqayîmîtî.

UNSTEADY, *adj.* : neqayim, xilole, demdemî.

UNSTICK, *vt.* : cudakirin (tiştek venûskî).

UNSTITCHING, *n.* : bişkavtin.

UNSTINTED, *adj.* : neradekirî.

UNSTINTING, *n.* : neradekirin.

UNSTIRRED, *adj.* : nearandî, netêkvedayî.

UNSTOP, *vt.* : (berbestî) rakirin, gîro nekirin.

UNSTOPPABLE, *adj.* : nerawestinbar, nerawestandinbar.

UNSTOPPER, *vt.* : serdevkî rakirin, vekirin.

UNSTRAINED, *adj.* : netingijandî.

UNSTREAMED, *adj.* : nerewankirî.

UNSTRESSED, *adj.* : nepestandî, nedupatkirî.

UNSTRAP, *vt.* : kemerbend sist kirin yan vekirin.

UNSTRATIFIED, *adj.* : neçînkirî, nerewzkirî.

UNSTRING, *vt.* : jenan sist kirin yan vekirin.

UNSTRUNG, *adj.* : (jen) sistkirî, demar tingijî.

UNSTRUCTURED, *adj.* : neavahîkirî.

UNSTUCK, *adj.* : serneketî, nevenûsî.

UNSTUDIED, *adj.* : nexwendî, serpêlkî, xweristî, sirûştî.

UNSTUFFED, *adj.* : nedagirtî, netejîkirî.

UNSUBDUED, *adj.* : neşelqandî, nerevandî.

UNSUBJUGATED, *adj.* : netepeserkirî, nestûxarkirî.

UNSUBSTANTIAL, *adj.* : lawaz, aşop, bêbinyat, negelek, negewherî.

UNSUCCESS, *n.* : serneketin, neserketin.

UNSUCCESSFUL, *adj.* : sar û pûç.

UNSUGARED, *adj.* : neşekirkirî, şekirnekirî.

UN SUGGESTIVE, *adj.* : nenîşandar.

UNSUITABLE, *adj.* : nekêrhatî, nesaz, nelê, nehêjayî, nejêhatî, nahemwar.

UNSUITED, *adj.* : kêrnehatî.

UNSULLIED, *adj.* : nepîskirî.

UNSUMMONED, *adj.* : negazîkirî.

UNSUNG, *adj.* : nestrandî.

UNSUNNED, *adj.* : netavkirî.

UNSUPPLIED, *adj.* : neazoqkirî.

UNSUPPORTABLE, *adj.* : neberpalkbar.

UNSUPPORTED, *adj.* : piştnegirtî, berpalknekirî.

UNSURPASSABLE, *adv.* : nehevtabar.

UNSURPASSED, *adj.* : nehevtakirî.

UNSURVEYED, *adj.* : nerûpîvkirî.

UNSUSCEPTIBLE, *adj.* : kartênekirinbar.

UNSUSPECTED, *adj.* : negumankirî.

UNSUSPECTING, *adj.* : negumandar.

UNSUSPICIOUS, *adj.* = **UNSUSPECTING.**

UNSUSTAINED, *adj.* : neberevankirî, piştnegirtî.

UNSWATHE, *vt.* : pêç rakirin.

UNSWAGED, *adj.* : neveweşandî.

UNSWEAR, *vi.* : sond şikandin.

UNSWEETENED, *adj.* : neşirînkirî.

UNSWEPT, *adj.* : nemalîştî.

UNSWERVING, *adj.* : newergerayî.

UNSWORN, *adj.* : sondnexwarî.

UNSYMMETRICAL, *adj.* : nehevta.

UNSYMPATHIC, *adj.* : nehevsoz.

UNTACK, *vt.* : (nerêzikî) jêve kirin, cuda kirin.

UNTANGLE, *vt.* : vekirin (alîn yan girê).

UNTANNED, *adj.* : nedebaxkirî.

UNTAPPED, *adj.* : nepiloskirî.

UNTARNISHED, *adj.* : pîsnekirî, lekenekirî.

UNTASTED, *adj.* : tamnekirî.

UNTAUGHT, *adj.* : xweyî, nefêrkirî, nehînkirî, nezan.

UNTENABLE, *adj.* : nebergirbar, neberpebar.

UNTETHER, *vt.* : veresandin, berdan.

UNTHANKFUL, *adj.* : nankor.

UNTHANKFULNESS, *n.* : nankorî(tî).

UNTHINKABLE, *adj.* : nebawerbar, neaşopbar, ne li hizr e.

UNTHINKING, *adj.* : feramoş, nejîr, nehizirkirî.

UNTHREAD, *vt.* : (ben) vekirin.

UNTHRESHED, *adj.* : holînekirî.

UNTIDY, *adj.* : nelêkdayî, neterpûş.

UNTIE, *vt., i.* : vekirin (girê), vebûn, berdan.

UNTIL, *prep., conj.* : tako, heya, heya.

UNTILLED, *adj.* : nekêlayî.

- **LAND** : beyar.

UNTIMELY, *adv.* : ne di demî de, zû, berî demî, kêrnehatî.

UNTO, *prep.* : tako.

UNTOLD, *adj.* : bêjimar, bêqam, negotî, nevegêrayî, nihênî yan nepenî mayî.

UNTOUCHABILITY, *adj.* : mirdarîtî, nedesdanbarîtî.

UNTOUCHABLE, *adj.* : mirdar, wêve havêtî, nerexnebar, nedesdanbar.

UNTOUCHED, *adj.* : destnekirî.

UNTOWARD, *adj.* : şemûz, serkêş, şerker, serhişk, bedbext, çol.

UNTRACEABLE, *adj.* : bê ser û şûn.

UNTRACED, *adj.* : nexşenekirî, şûnnedîtî.

UNTRAINED, *adj.* : nemeşqkirî, nerahînayî.

UNTRAMMELED, *adj.* : davnekirî.

UNTRASLATABLE, *adj.* : newergerandinbar, newergerînbar.

UNTRANSPORTABLE, *adj.* : neguhêzbar.

UNTRAVEL(L)ED, *adj.* : rêbarî nekirî, rêwîtî nekirî, direk yan şûnek nedîtî.

UNTRAVERSED, *adj.* : direk nedîtî, rêbarî nekirî.

UNTREAD, *vt.* : vegerînve.

UNTRIED, *adj.* : bêserhatî, azmûn nekirî.

UNTRODDEN, *adj.* : têre neborî.

UNTROUBLED, *adj.* : şepirzenekirî, giriftarnekirî.

UNTRUE, *adj.* : nerast.

UNTRUSTED, *adj.* : nebawerkirî.

UNTRUSTWORTHY, *adj.* : teres.

UNTRUTH, *n.* : nerastî, direw, derew.

UNTRUTHFUL, *adj.* : nerast, derew.

UNTUNE, *vt.* : şaş kirin, nesaz kirin (awaz).

UNTUNED, *adj.* : nesazkirî, neawazkirî.

UNTURNED, *adj.* : newergerayî, newergerandî.

UNTUTORED, *adj.* : nereweşenbîr, sade, xweristî.

UNTWINE, *vt., i.* : vekirin, vebûn.

UNTYING, *n.* : vekirin, veresandin.

UNUSUAL, *adj.* : gêre, seyr, semere, neasayî.

UNUSUALLY, *adv.* : bi gêreyî, neasakî.

UNUSED, *adj.* : bikarnehatî, fêrnebûyî.

UNUTTERABLE, *adj.* : nederbirrinbar.

UNUTTERED, *adj.* : nederbirrî, negotî.

UNVALUED, *adj.* : nebihakirî, nebihadar.

UNVARIED, *adj.* : neguhartî.

UNVARNISHED, *adj.* : nevemiştî.

UNVARYING, *n.* : neguhor.

UNVEIL, *vt.* : serkol kirin, serkol bûn, perde ji ser rakirin (peyker).

UNVEILING, *n.* : servekirin, serkolkirin, perderakirin.

UNVENOMOUS, *adj.* : nejehrî (mar...).

UNVENTILATED, *adj.* : baneguhartî.

UNVERIFIABLE, *adj.* : nesehkirinvebar, neesehbar.

UNVERIFIED, *adj.* : nesehkirîve, neesehkirîve.

UNVERSED, *adj.* : neşehreza.

UNVIOLATED, *adj.* : neçirandî.

UNVISITED, *adj.* : serdannekirî.

UNVITIATED, *adj.* : nehelweşandî.

UNVOICED, *adj.* : dengnekirî, mit.

UNWANTED, *adj.* : neviyayî.

UNWARLIKE, *adj.* : neşerker.

UNWARMED, *adj.* : negermkirî, netêhnşîrkirî.

UNWARRANTABLE, *adj.* : nereweta, nebehanekirî, kêrnehatî.

UNWARRANTED, *adj.* : nerêdayî, bê behane.

UNWARY, *adj.* : hol, nehaydar, feramoş.

UNWASHED, *adj.* : neşûştî, nezan.

UNWATCHED, *adj.* : zêrevannekirî.

UNWATCHFUL, *adj.* : nezêrevan.

UNWATERED, *adj.* : neavdayî.

- **FIELD** : dêm (zevî).

UNWAVERING, *adj.* : xweragirtî, nehejayî.

UNWEANED, *adj.* : jî şîrî nevekirî.

UNWEARABLE, *adj.* : nekevnbar.

UNWEARIED, *adj.* : newestayî, neqerimî, nemandî.

UNWEARY, *adj.* : newestayî.

UNWEAVE, *vt.* : (tevn yan vehînan) vekirin.

UNWEDDED, *adj.* : neşûkirî.

UNWEEDED, *adj.* : nefirîzkirî.

UNWEIGHED, *adj.* : nekêşayî.

UNWELL, *adj.* : tawî, leşêş, nexweş, mehikî.

UNWEPT, *adj.* : negirî.

UNWETTED, *adj.* : neşilkirî.

UNWHIPPED, *adj.* : netajangkirî, nearandî.

UNWHITENED, *adj.* : nespîkirî.

UNWHOLESOME, *adj.* : kuşinde, netaze.

UNWIELDY, *adj.* : nekirdarî.

UNWILLING, *adj.* : neviyayî.

UNWILLINGLY, *adv.* : neviyankî, serdest.

UNWIND, *vt., i.* : sist bûn, vebûn, belave kirin, vekirin (tiştê alandî).

UNWINKING, *adj.* : çavnegirtînk.

UNWISDOM, *n.* : nependiyarî.

UNWISE, *adj.* : xirpo, hol, nependiyar.

UNWISHED, *adj.* : neviyayî.

UNWITHERED, *adj.* : neçilmisî.

UNWITNESSED, *adj.* : negewahkirî, nedîtî.

UNWITTED, *adj.* : nevên.

UNWITTING, *adj.* : nezan, neqestî, pênehesiyayî.

UNWITTINGLY, *adv.* : ne bi qestî.

UNWOMANLY, *adj.* : nejinanî.

UNWONTED, *adj.* : qetlaz, neasayî.

UNWOODED, *adj.* : neqayilkirî.

UNWORKABLE, *adj.* : nekirdarbar.

UNWORKED, *adj.* : karnekirî.

UNWORKMANLIKE, *adj.* : ne (wek) karkerî.

UNWORDLY, *adj.* : nedinyayî, giyanî, sade.

UNWORN, *adj.* : nû, nekevn.

UNWORSHIPPED, *adj.* : neperistî.

UNWORTHILY, *adv.* : bi nesteleyî, bi nehêjayî.

UNWORTHINESS, *n.* : nehêjayîtî.

UNWORTHY, *adj.* : bê rûmet, nehêja, nelê, nestêl, nesaz.

UNWOUNDED, *adj.* : nebirîndar.

UNWOVEN, *adj.* : nevehînayî, netevnkirî.

UNWRAP, *vt.* : vekirin.

UNWRINKLED, *adj.* : negirmijî, nequrmiçî.

UNWRITABLE, *adj.* : nenivîsbar.

UNWRITTEN, *adj.* : nenivîsî, lêvikî.

UNWROUGHT, *adj.* : nenerm.

UNWRUNG, *adj.* : nebadayî.

UNYIELDING, *adj.* : neberdar yan berhemdar.

UNYOKE, *vt.* : vekirin (nîr).

UNZIP, *vi.t.* : zincîr vekirin.

UP, *adv., prep., n., adj.* : jor, banî, bala, selal, ser bi jor, ber bi jor, rawestayî, lêkdayî, siwar, pêşketî, serketîn, geşbûn.

UP AND DOWN, : hatin û çûn, rabûn û nizmbûn.

UPS AND DOWNS : xweşî û nexweşiya jiyanê.

UP TO : mijûl bi, jêhatî, tako, jê pêviyayî.

UP TO DATE : ta niho.

UP, *vi.t.* : rabûn, rakirin, payebilind kirin, pêtir kirin (kirê).

UP-AND-COMING, *adj.* : serketî, hîvîdar.

UPAS, *n.* : opas : darek şîr jehr e (bo tîran bi kar dihêt), şîrê jehrê vî darî.

UPBEAR, *vt.* : pişt girtin, helgirtin, rakirin.

UPBEAT, *adj.* : geşbîn, geş, şad.

UPBRAID, *vt.* : gileyî kirin, gazinde kirin.

UPBRAIDING, *n.* : gazindekirin, serzenişt, serkonekirin.

UPBRINGING, *n.* : xudankirin.

UPBUILD, *vt.* : damezrandin, ava kirin.

UPCAST, *n., adj.* : jor arastekirî, kulîn, derbaza bayî (li kangehê).

UP-COUNTRY, *adj., adv., n.* : hindura welatî.

UPDATE, *vt.* : nûjen kirin, nû dîrok kirin.

UPDRAFT, *n.* : bagera rabûyî.

UPEND, *vt.i.* : li ser dûmahîkê danan, rabûn, rûniştin yan rawestîn.

UPGRADE, *vt.* : paye bilind kirin, paye berz kirin.

UPGROWTH, *n.* : werar.

UPHEAVAL, *n.* : helçûn.

UPHEAVE, *vt.i.* : helçûn, bilind bûn, bilind kirin, pêl geran (gerîn).

UPHELD, *adj.* : pişgirtî.

UPHILL, *n., adj.* : evraz, serevraz, sext, zehmet.

UPHOLD, *vt.* : pişt girtin, destê xwe rakirin, alîkarî kirin.

UPHOLDER, *n.* : alîkar.

UPHOLDING, *n.* : alîkarî, pişgirî.

UPHOLSTER, *vt.* : rû kirin (rûnîştek).

UPHOLSTERER, *n.* : bazirganê rûyê kelûpelî.

UPHOLSTERY, *n.* : kelûpelê rûkirinê, rûkirin.

UPHROL, *n.* : qurmê dirêj yê darê kunkirî bo têreçûna werisên hilawîstinê (li ser gemiyê).

UPKEEP, *n.* : xudankirin, parastin.

UPLAND, *n., adj.* : helem, bam, banik, bane.

UPLIFT, *vt.i.* : rakirin, helgirtin, bilind kirin, bilind bûn.

UPLIFT, *n.* : bilindkirin : bilindbûn, berzkirin, belakirin, tevgera vejîyanî.

UPMOST = UPPERMOST.

UP-NIGHT, *adj.* : şevnişîn.

UPON, *prep.* : jor, li ser, nik, kin, hinga, gava, paşî, li ser daxwaza.

UPPED, *adj.* : rabûyî.

UPPER, *adj., n.* : jorîn, jor, jorî, bakurî.

- ON ONE'S ~ : hejar, pêlavdirrhayî.

UPPER ARM, *n.* : qol.

UPPER ATMOSPHERIC LAYER, *n.* : tarî gewr, tarîbar.

UPPER CASE, *n.* : sindoqa jorî, sindoqa tîpen destpêkirinê (mezin).

UPPERCASE, *n., vt.* : tîpên destpêkirinê, destpêkirê mezin, çap kirin (bi tîpên destpêkirinê).

UPPERCASED, *adj.* : çapkirî (bi tîpên mezin).

UPPER-CASING, *n.* : çapkirin (bi tîpên mezin).

UPPER-CLASS, *adj.* : arîstoqratî : çîna bala (civakî).

UPPERCLASSMAN, *n.* : xwendekarê sala sê yan çarê (li zanistgehê yan dibistanê).

UPPER CRUST, *n.* : çîna civakiya bala.

UPPER CUT, *n., vt.i.* : kulm lê dan (ji binî bo serî), kulma ji binî bo serî (erzînka neyarî).

UPPER-HAND, *n.* : zalbûn, çîzkirin, desthelatî, serdestî, raserbûn.

UPPER LIP, *n.* : lêva jorî.

UPPERMOST, *adj., adv.* : balatir, berztir, jortir, yekem.

UPPER PART, *n.* : jor.

UPPER STOREY, *n.* : nihûma jorî.

UPPING, *n.* : rabûn.

UPPISH, *adj.* : bong, qapan.

UPPISHLY, *adv.* : bi qapanî, qapankî.

UPPISHNESS, *n.* : qapanîtî.

UPPITY, *adj.* : (*colloq.*) qapan.

UPRAISE, *vt.* : bala kirin, bilind kirin.

UPREAR, *vt.i.* : ava kirin, bilind kirin, bilind bûn.

UPRIGHT, *adj., adv., n.* : rast, rep, dilpak, rabûyî şipiya, boq, westaw, destpak.

- **PIANO** : piyanoya jenserî.
- **POST** : kêla rast.
- **STONE** : kêl.

UPRIGHTLY, *adv.* : bi dîlpakî.

UPRIGHTNESS, *n.* : qencîtî, rastîtî.

UPRISE, *adj.* : raperî.

UPRISING, *n.* : serhildan, raperîn, rabûn, serxwerabûn, hilrabûn, bizav, serhildan.

UPROAR, *n.* : girr, dengedeng, qîrûqîj, galegot, qerqeşe.

UPROARIOUS, *adj.* : qîrûqijî, qerqeşeyî.

UPROARIOUSLY, *adj.* : bi qîrûqijî, qîrûqijkî.

UPROARIOUSNESS, *n.* : qîrûqijîtî.

UPROOT, *vt.* : helkêşan, rakirin (ji rihan).

UPROOTING, *n.* : helkêşan, rakirin (ji rihan), binebirr.

UPROUSE, *vt.* : rakirin, hişyar kirin.

UPRUSH, *n.* : bezîna jorî (serevrazî).

UPS-A-DAISY = UPSY DAISY.

UPSET, *n., adj.* : perîşan, şepirze, têkçûn, wergêran, şilejan, leşêşî.

- **PRICE** : bihayê binyatî yê pertalî.

UPSET, *vt.i.* : perîşan kirin, şepirze kirin, helweşandin (rasipêrî), revandin, leşêş bûn, wergêran.

UPSETTER, *n.* : perîşanker.

UPSETTING, *n.* : perîşankirin.

UPSHOT, *n.* : akam, dûmahî, dawî, serencam, soxî.

UPSIDE, *n.* : rexê jorî.

UPSIDE-DOWN, *adj.* : ser û bin, vajî, nixûn, serserkî, serûbino, serewjêr.

UPSIDES-WITH, *adv.* (*colloq.*) : pakbûn li gel (mirovekê).

UPSILON, *n.* : tîpa bistem ya grekî (U).

UPSPRING, *vi.* : şîn bûn, derketin, diyar bûn.

UPSTAGE, *adv., adj.* : qapan, li paşiya şanoyê.

UPSTAGE, *vt.* : difna xwe bilind kirin.

UPSTAIRS, *adv., adj., n.* : selal, sêlal, jor.

UPSTANDING, *adj.* : repitî.

UPSTART, *n., adj.* : qapan, nûkîse.

UPSTART, *vi.* : bazdan (ji nişkekê ve).

UPSTATE, *adj., n.* : bakura wîlayetî (stanî, deverî).

UPSTREAM, *adv.* : ber jorî rûbarî ve, dijî lozewî yan rewtekî.

UPSTROKE, *n.* : baskê jorî.

UPSURGE, *n.* : rabûna nişkî, pitirbûna zû (lezîn).

UPSWEEP, *n., vt.* : rakirin (paş), rakirin (paş).

UPSWEPT, *adj.* : rakirî (bo şilka serî).

UPSWING, *n.* : tevgera çalak, pitirbûna diyar (çalakî), çakbûna diyar.

UPSY-DAISY, *interj., expr.* : derbirrîn e bo xurtkirina zarokê ketî da ko rabit.

UPTAKE, *n.* : têgehiştin, mêjtin, mijîn, boriya serevrazî.

UPTHROW, *vt.* : havêtin jor.

UPTHROWING, *n.* : havêtin jor.

UPTHROWN, *adj., pp.* : havêtî jor.

UPTHRUST, *n.* : paldana jorî.

UPTIGHT, *adj.* : tingijî.

UPTIGHTNESS, *n.* : tingijîtî.

UPTOWN, *adj., n.* : pêwendîdarê parçeya bilind yan nişîniya şarî yan bajarî.

UPTURN, *n.* : pêlbûn, bilindbûn, şilejan, çakbûn, pêşketin, pêşkewtin.

UPTURN, *vt.i.* : wergêran, serûbin kirin, şilejan kirin, bilind kirin.

UPWARD(S), *adv.* : serketî, derketî, berbijor, bala, jor, ser bi jor, serevraz.

UPWARD, *adj.* : bala, serevraz.

UPWARD(S) OF, *adv.* : pitir ji, nêzîk, ber bi jor.

UPWARDLY, *adv.* : serevrazek.

UPWARP, *n.* : pêça koqiz, rûyê pan yê bilind(erd).

UPWIND, *adj., adv.* : dij arasteya bayî.

URACIL, *n.* : pêkhatî yan awêteya belûrî ya av şitelkirina tirşiya rîbonoklîk.

URAEMIA, *n.* : nesaxiya xwînê ji ber têkilbûna mîzê.

URAEMIC, *adj.* : pêwendîdarê nesaxiya xwînê.

URAEUS, *n.* : mar wek şaşika oldar û kevneqiralên misrê.

URAL-ALTAIC, *adj.* : pêwendîdarê sirtên çiyayên Ûral û Altayî.

URANIAN, *adj.* : evîniya regezî (yan zayendeyî) û hişî û giyanî.

URANIC, *adj.* : ûranyomî.

URANIFEROUS, *adj.* : ûranyomî, ko ûranyom têde ye.

URANISM, *adj.* : Evîniya hevregez nemaze nêrbazî.

URANIUM, *n.* : ûranyom, hêmanek metalî ko tîrêjdar (tîşkdar) e.

URAN(O)- *pref.* : pêşgir e ko esman e, yoran-yom e.

URANOGRAPHY, *n.* : esman û stêrzanî, danîna nexşeyên esmanî.

URANOLOGICAL, *adj.* : stêrî.

URANOLOGY, *n.* : stêrzanî, stêrnasî, esmanûstêrzanî.

URANOMETRY, *n.* : esmanpîvî.

URANOUS, *adj.* : ûranyomî.

URANUS, *n.* : yoranos : xudayek grekî, stêra gerok ya heftem.

URATE, *n.* : yorêt, mîzêt, xwêya tirşiya mîzî.

URATIC, *adj.* : pêwendîdarê yorêt yan mîzêtî.

URBAN, *adj.* : bajêrî, şaristanî, bajarî, jiyarî.

- **DISTRICTS** : deverên şaristanî.

URBANE, *adj.* : sernerm, terziman.

URBANELY, *adv.* : bi jîyarî, bi terzimanî, bi sernermî, jîyarkî.

URBANISM, *n.* : şaristanîtî, bajêrîtî.

URBANIST, *n.* : şarzan, bajêrzan.

URBANITE, *n.* : şaristanî, bajêrî.

URBANITY, *n.* : jîyarîtî, tazeyî, rêzikî.

URBANIZATION, *n.* : şaristan.

URBANIZE, *vt.* : bajêrî kirin.

URBANIZING, *n.* : bajêrkirin.

URBANOLOGIST, *n.* : bajarzan, şarzan.

URBANOLOGY, *n.* : bajarzanî, şarzanî.

URBICULTURE, *n.* : kiryar û gîrûgiriftên bajêran.

URCEOLATE, *adj.* : cerî.

URCHIN, *n.* : jîjî, jîjû.

URDU, *n.* : ûrdû, zimanê hindistanî.

UREA, *n.* : mîze, madeyek belûrî di nav mîzê de.

UREASE, *n.* : haveyna şîtelker ya mîzê.

UREMIA, *n.* : mîzjehrî.

URETER, *n.* : zam, mîzkêş, beravkuj.

URETHANE, *n.* : uretan, pêkhatiyek belûrî ye, emîd û karbometatît .

URETHRO-, *pref.* : pêşgir e ko borî yan coka mîzê ye.

URETHRA, *n.* : zam, beravkuj.

URETHRITIS, *n.* : kulbûna zamî, beravkujî.

URETHROSCOPE, *n.* : zambîn, beravkujbîn.

URETIC, *adj.* = **DIURETIC.**

URFA, *n.* : awazek kurdî ye, bajerê Ûrfe li Kurdistana bakur.

URGE, *n.* : hajok, ajok, reço, reko, rekokar, handan.

URGE, *vt.* : hajotin, han dan.

URGED, *adj.* : hajotî, handayî.

URGENCY, *n.* : pelpkirin, wica pelp, lezînîtî.

URGENT, *adj.* : lez, lezîn.

URGENTLY, *adv.* : reçokî, reçokarî, reko.

URGING, *n.* : hajotin, reço, reçokirin, handan.

- **ON** : wiş, xurîn.

URIAL, *n.* : pezek kûvî ko gewr û sor e, stû û rih spî ne.

URIC, *adj.* : mîzî.

- **ACID** : tirşiya mîzî.

URICOSURIC, *adj.* : pêwendîdarê derkirina tirşiya mîzî ji nav mîzê de.

URIDINE, *n.* : urîdîn, pêkhatî yan awêteyek belûrî ko giring e bo jîyan - herîfandina karbohîdratî.

URINAL, *n.* : mîzgeh, sincik.

URINALYSIS, *n.* : şêtelkirina mîzê.

URINARY, *adj.* : mîzî.

- **BLADDER** : mîzdank.

URINATE, *vi.* : mîztin.

URINATED, *adj.* : mîzkirî.

URINATING, *n.* : mîzkirin, mîztin, destav.

URINATION, *n.* : mîzkirin, destav.

URINE, *n.* : mîz.

- **SUGAR** : şekirmîz.

URINO-, *pref.* : pêşgir e ko mîz e.

URINOFEROUS, *adj.* : mîzguhêz.

URINOGENITAL, *adj.* = **UROGENITAL.**

URINOLOGY, *n.* : mîzzanî.

URINOMETER, *n.* : mîzpîv.

URINOMETRY, *n.* : mîzpîvî.

URINOSCOPIC, *adj.* : azmûniya mîzê.

URINOSCOPY, *n.* : azmûnkirin yan taqîkirina mîzê.

URINOUS OR URINOSE, *adj.* : mîzî.

URN, *n.* : amanê mezin yê metalî (bo çay

û qehwe çêkirînê nemaze li çayxaneyan), cer (bo parastina xuliya miriyan).

URNING, *n.* : nêrbaz.

URO-, *pref.* : pêşgir e ko mîz e, dûv e.

UROCHROME, *n.* : rengê zer yê mîzê.

UROGENITAL, *adj.* : pêwendîdarê mîz û zaûzêyê.

UROLITH, *n.* : berikê mîzê.

UROLITHIASIS, *n.* : nesaxiya hebûna berikî di nav rêzika mîzê de.

UROLOGIC, *adj.* : mîzî.

UROLOGICAL, *adj.* : mîziyî.

UROLOGIST, *n.* : mîzzan, pisporê rêzika mîzê.

UROLOGY, *n.* : mîzzanî.

URONIC ACID, *n.* : tirşiyek mîzê ye.

UROPOD, *n.* : serbarkê zikî yê qertîşan.

UROPYGIAL, *adj.* : jêderiyê dûvî.

UROPYGIUM, *n.* : jêderê dûvikê balindeyî.

UROSTYLE, *n.* : hestiyek paşiya beqê.

URSA MAJOR, *n.* : termê Adem, çarega.

URSA MINOR, *n.* : termê mihê, çarega.

URSIFORM, *adj.* : hirçî, wek hirçê.

URSINE, *adj.* : hirçî.

URTICARIA, *n.* : lîr, lor.

URTICATE, *vt.* : lîr derketin, lîrî bûn.

URTICATED, *adj.* : lîrkirî.

URTICATING, *n.* : lîrkirin.

URTICATION, *n.* : lîrbûn.

URUS, *n.* : oros, texlîtek gayê kûvî ye.

US, *pron.* : em, me, ême.

U.S.A., *abbr.*, **UNITED STATES OF AMERICA** : Wîlayetên yekgirtî yên Emerîka.

US(E)ABILITY, *n.* : bikarînanbarî(tî).

US(E)ABLE, *adj.* : bikarînanbar.

USABLENESS, *n.* : bikarînanbarîtî.

USABLY, *adv.* : bikarînanî.

USAGE, *n.* : bikarînan, qewat, nerît.

USANCE, *n.* : nerît, bikarînan, havil, sûd, demê neritî (bo dana qoçanên bazirganî).

USE, *n.* : havil, tewş, kelk, nerît, kêr, sûd, bikarînan.

- **IN ~** : bi kar e, bikarînayî.

- **OUT OF ~** : ne bikar e, bikarneînayî.

- **TO COME INTO ~** : bi kar hatin, dest pê kirin.

- **TO MAKE (GOOD) ~ OF** : qenc bi kar hînan, havîl yan feyde jê kirin.

USE, *vt., i.* : bi kar hînan.

- **TO ~ UP** : têçûn, têbûn, hemû bi kar hînan.

USEABLE, *adj.* = **USABLE.**

USED, *adj.* : bikarhatî, bikarînayî.

- **TO** : rahatî, fêrbûyî.

USEFUL, *adj.* : sûdemend, qenc, kêrhatî, kêra, nijdar, havildar.

USEFULLY, *adv.* : bi sûdî, bi havilî, bi kêrhatinî, havilkî.

USEFULNESS, *n.* : kêrhatîtî, sûdmendîtî, havilîtî.

USELESS, *adj.* : bêkêr, bêxêr, bêfeyde, bêsûd, bêhavil, bêtewş, bêhode, zehî, valaçû, berbad, parenekirin.

USELESSLY, *adv.* : bi bêsudî, bi bêhavilî, bi bêkîrî, bê havilkî.

USELESSNESS, *n.* : bêhavilîtî, bêtewşîtî.

USER, *n.* : bikarxistek, bikarînayî.

USHER, *n.* : çawîş, dergevan, rêber, raber, harîkerê seydayî, erkdarê biçûk.

USHER, *vt.* : gehandin dirê yan şûnê.

USHERED, *adj.* : gehandî dirê yan şûnê (li sînemayê, şanoyê yan civînekê...).

USHERETTE, *n.* : harîkera rûniştinê (li sînema û şanoyê).

USING, *n.* : bikaranîn, bikarînan, bikarhînan.

USTULATE, *adj.* : qemandî, nîvsotî.

USTULATION, *n.* : qemandin.

USUAL, *adj.* : asayî, sakar.

- **AS ~** : wek her car, wek asayî.

- **QUESTIONS** : pirs yan pirsyarên asayî.

USUALLY, *adv.* : bi asayî, bi her royî.

USUALNESS, *n.* : asayîtî.

USUCAPTION, *n.* : xudaniya samanî ji ber karînana berdewam ya demek radekirî.

USUFRUCT, *n.* : mafê bikarînanê (nexasme samanê mirovek dî bê ziyan û bê zehêkirin).

USUFRUCTUARY, *n., adj.* : bikarînayî, bikarînan.

USURER, *n.* : sû yan sûdxwer.

USURIOUS, *n.* : sû yan sûdxwerî.

USURIOUSLY, *adv.* : bi sûdxwerî.

USURIOUSNESS, *n.* : sûdxwerîtî.

USURP, *vt., i.* : dagîr kirin, bi zor standin.

USURPATION, *n.* : kotek, zor.

USURPER, *n.* : dagîrker.

USURY, *n.* : sû yan sûd, selef.

U.T. *abbr.*, **UNIVERSAL TIME** : demê cihanê.

UTENSIL(S), *n.* : aman, vêl, defr.

- **EATING ~** : çaşnî, aman.

UTERINE, *adj.* : makî, ji layê dayikê ve.

- **CAVITY** : maldank.

UTERITIS, *n.* : kulbûna malbiçûkî yan pisdankî.

UTIL, *adj.* : bikar, havil, kirdar.

UTILITARIAN, *n., adj.* : havilperist, sûdperist.

UTILITARIANISM, *n.* : ola havilîtiyê yan sûdmendîtiyê.

UTILITY, *n., adj.* : havil, havilî, havilguzarî, sûd, damezrîna havilî, kêr bikarînanê lê ne gelek baş, lêkdayî bo armancên têvelên kirdar.

UTILIZATION, *n.* : bikarînan, bikaranîn, bikarhînan.

UTILIZE, *vt.* : bi kar hînan, havil yan feyde jê kirin.

UTILIZED, *adj.* : bikarînayî, havilkirî.

UTILIZER, *n.* : havilker.

UTILIZING, *n.* : bikarînan, havilkirin.

UTMOST, *n., adj.* : zortirîn, ewper.

- **DO YOUR ~** : hindî ji te bihêt bike.

- **RELUCTANCE** : bergirî yan berhelistiya bêqam.

UTOPIA, *n.* : utopya, bajêrê pak, dir yan şûna dûr ya aşopî, melhezeya nekirdarî.

UTOPIAN, *n.* : aşopî, nimûneyî.

- **SOCIALISM** : civakîtiya aşopî.

UTOPIANISM, *n.* : aşopîtî, nimûneyîtî.

UTOPISM, *n.* = **UTOPIANISM.**

UTOPIST, *n.* : bawermendê aşopî.

UTRICLE, *n.* : porg yan valatiya biçûk di leşî de (nemaze di guhê hindurî de), xaneya canewerî yan helezî.

UTRICULAR, *adj.* : porgî.

UTRICULUS, *n.* : porg (nemaze di guhê hindurî de).

UTTER, *vt.* : dey kirin, gotin.

UTTER, *adj.* : petî, bijî.

- **ABSURDITY** : êkcar pûç.

- **DENIAL** : mandelkirina êkcarî.

- **MISERY** : hejariya bêqam.

UTTERABLE, *adj.* : derbirrînbar, deykirinbar.

UTTERANCE, *n.* : derbirrîn, denganî, axiftin, gotin, dengkirin, niqe.

UTTERED, *adj.* : deykirî, derbirrî.

UTTERING, *n.* : derbirrîn, gotin, deykirin.

UTTERLY, *adj.* : lap, lapide, êkcar.

UTTERMOST, *n., adj.* : mezintirîn.

UVAROVITE, *n.* : berek hêja û kesk e.

UVIA, *n.* : perdeya parastinî ya çavî.

UVEAL OR UVEOUS, *adj.* : pêwendîdarê perdeya çavî.

U.V. *abbr.*, **ULTRA VIOLET** : ser binefşî.

UVEITUS, *n.* : kulbûna perdeya parastinî ya çavî.

UVULA, *n.* : gelaloç.

UVULAR, *adj.* : gelaloçî.

UXORIAL, *adj.* : jinî.

UXORICIDE, *n.* : jinkujî, (kujê jina xwe).

UXORIOUS, *adj.* : şeydayê jina xwe yan li ber destê wê.

UXORIOUSLY, *adv.* : bi şeydayî (ya jina xwe).

UXORIOUSNESS, *n.* : şeydayîtî (ya jina xwe).

UZBEK, *n.* : Ozbekî (ziman yan welatiyê Ozbekistanê).



V, v : vî : tîpa bîst û duwem ya elfabiya înglîzî.

v, *abbr.* = **VOLT(S)** : volt, yekeya hêza livker ya kehrebî.

VACANCY, *n.* : valayî, valatî, valabûn, jora vala, erkê vala.

VACANT, *adj.* : vala çolkirî, xirpo.

- **SPACE** : beyava vala.

VACANTLY, *adv.* : bi valayî.

VACANTNESS, *n.* : valayîtî.

VACATE, *vt.* : vala kirin.

VACATED, *adj.* : valakirî, valabûyî.

VACATING, *n.* : valakirin.

VACATION, *n., vt.* : pişû, pişû kirin.

- **LAND** : erd yan devera pişûyan.

VACATIONED, *adj.* : pişûkirî.

VACATIONING, *n.* : pişûkirin.

VACATIONIST, *n.* : pişûker.

- **SUMMER ~** : zozanî.

VACCINATE, *vt.* : qutan, kutan (leşî dij nesaxiyekî).

VACCINATED, *adj.* : qutandî, deqandî.

VACCINATING, *n.* : qutan.

VACCINATION, *n.* : qutan, deqan, kutan.

VACCINATIONIST, *n.* : qutanker, qutankar.

VACCINATOR, *n.* : alava qutanê, qutanker.

VACCINE, *n., adj.* : çêlî, qutanî, dermanê qutanê (wek dij xurîkan).

- **FARM** : çandingeha qutanî (derman).

VACCINIA, *n.* : xurîka çêlê.

VACCINAL, *adj.* : xurîkiya çêlê.

VACCINIC, *adj.* = **VACCINAL.**

VACILLATE, *vi.* : hejîn, lerîn.

VACILLATED, *adj.* : hejandî.

VACILLATING, *adj.* : hejîn, dudilî, demdemî.

VACILLATINGLY, *adj.* : hejînkî, bi hejandinî.

VACILLATION, *n.* : hejandin, hejîn.

VACILLATORY, *adj.* = **VACILLATING.**

VACUITY, *n.* : gewcî, valatî.

VACUOLAR, *adj.* : tovdankî.

VACUOLATE(D), *adj.* : tovdankdar.

VACUOLATION, *n.* : tovdankbûn.

VACUOLE, *n.* : tovdank : valatî di nav xaneya zindî de.

VACUOUS, *adj.* : vala, bapîv, xirpo.

- **REMARK** : têbînî yan serinca vala.
- **STARE** : dîtina vala (bê wate).

VACUOUSLY, *adv.* : bi valayî, valakî.

VACUOUSNESS, *n.* : valayîtî.

VACUUM, *n., adj.* : valak, valakirî yan parçe valakirî.

- **BOTTLE** : şûşeyê valak.
- **BRAKE** : girtekê valak.
- **CLEANER** : paqijkerê valak.
- **FLASK** : şûşeyê valak.
- **GAUGE** : valapîv.
- **PUMP** : hilmija valak.
- **TUBE OF VALVE** : lûle yan derçeya valakirî.

VACUUM, *vt.* : vala kirin.

VACUUMIZE, *vt.* : vala kirin.

VACUUMIZED, *adj.* : valakirî.

VACUUMIZING, *n.* : valakirin.

VAGABOND, *n., adj.* : êperî, derbeder, tarekdar, ebeboz, pûç, derbederî.

VAGABONDAGE, *n.* : tarek.

VAGABONDISH, *adj.* : tarekî.

VAGABONDISM, *n.* : tarekîti.

VAGABONDIZE, *vi.* : tarek bûn, derbeder bûn.

VAGAL, *adj.* : pêwendîdarê demarê pişê.

VAGARY, *n.* : hewes, aşopî, guhartina bêmehane.

VAGILE, *adj.* : livîndar, serbest e ko bilivit.

VAGILITY, *n.* : livîndarîti.

VAGINA, *n.* : zîl(ik), kalan (helez e), quz (canewer).

VAGINAL, *adj.* : kalanî.

VAGINALLY, *adv.* : bi kalanî.

VAGINATE(D), *adj.* : kalandar, kalankirî.

VAGINITIS, *n.* : kulbûna virçikê yan gîlikê.

VAGINOTOMY, *n.* : helkêşana virçikê yan gîlikê.

VAGOTOMY, *n.* : helkêşana demarê şêlî.

VAGOTONIA, *n.* : tingijîna demarê şêlî.

VAGRANCY, *n.* : tarek.

VAGRANT, *n., adj.* : derodero, serserî, sergerdan, tarekdar, gerok (bapîv), êperî, gede.

- **MUSICIAN** : mûzîqevanê gerok.
- **SPECULATIONS** : hizrên tarekdar.

VAGRANTLY, *adv.* : bi tarekî.

VAGROM, *adj.* = **VAGRANT.**

VAGUE, *adj.* : şêlî, nediyar, bong.

- **ANSWER** : bersiva şêlî.
- **IDEA** : hizra şêlî.
- **TERRORS** : tirsên şêlî.

VAGUELY, *adv.* : bi şêlî.

VAGUENESS, *n.* : şîlîtî.

VAGUS NERVE : demarê pîşî-ûrî.

VAIL, *vt.i.* : nizm bûn, rakirin (kulav bo rêzgirtinê).

VAIN, *adj.* : bêtewş, valaçû, bong, pûç.

- **IN ~** : bêtewş.
- **BOASTS** : qapamiyên vala, bêtewş.
- **DISTINCTION** : cudayî yên bêtewş.

VAINGLORIOUS, *n.* : qapan, rûreq, fortek.

VAINGLORIOUSLY, *adv.* : bi qapanî, bi fortekî.

VAINGLORIOUSNESS, *n.* : qapanîtî, tertekîti.

VAINGLORY, *n.* : piz, fêz, pêro, hempazî, qapanî.

VAIN HOPE, *n.* : bêhîvî, hîviya bêtewş.

VAINLY, *adv.* : bi bêtewşî.

VAINNESS, *n.* : fêzîtî, haş, hilor.

VAIR, *n.* : qijk yan pûrtê sivoreyan.

VAI SHNAVA, *n.* : endamê olek hindû ya mezin.

VAISYA, *n.* : Hindûkê çîna bala (bazirgan yan zevîdar).

VALANCE, *n.* : perdeya kurt (li serê pencerkê yan li binê textî).

VALANCED, *adj.* : perdekirî.

VALE, *n.* : nihal, dol.

VALE, interj. : ûxir.

VALEDICTION, *n.* : ûxirkirin, verêxistin.

VALEDICTORIAN, *n.* : pêşkêşkirina gotara ûxirkirinê.

VALEDICTORY, *n., adj.* : ûxirî.

VALENCE, *n.* : hevhêzî, hawhêzî, hawlif, hawhêzayek.

- **ANGLES** : goşeyên hevhêz, goşeyên hawhêzî.
- **CRYSTAL** : belûra hevhêz, belûriya hawhêzayetî.

VALENCY, *n.* : yekeya lêkdana (pêkhînan) firehî ye = **VALENCE.**

VALENTINE, *n.* : dilber (dihêt helbijartin li cejna pîroz ya valantînî).

- **DAY** : roja Valantîn.

VALERATE, *n.* : xwêyeka tirşiyek bêhnnexweş e.

VALERIAN, *n.* : helezek gul biçûk û spî yan qerenfelî ye, dermanek bêhnxurt û demar hedarker e ji rehên vî helezî dihînin der, valêryan.

VALERIC, *adj.* : pêwendîdarê helezê valêr-yanî.

- **ACID** : tirşiya bêhnnexweş ya ji helezê valêryanî derdikevit.

VALET, *n.* : çawîş, pîşekar, xulam, lêz.

VALET, *vt.* : xulamî kirin.

VALETUDINARIAN, *n., adj.* : nesax, hizirkerî bo nesaxe.

VALETUDINARIANISM, *n.* : nesaxîtî.

VALETUDINARY, *n., adj.* : nesaxî.

VALGUS, *n.* : wergerana jorî ya pêyî.

VALHALA, *n.* : efsane ye koçka ko giyanên qehremanên kuştî keyfê têde dikin, avahî bo gorên gernasan.

VALIANCE, *n.* : azayî, gernasî.

VALIANCY, *n.* = **VALIANCE.**

VALIANT, *adj.* : mêrxas, camêr, gernas.

VALIANTLY, *adv.* : bi gernasî, bi mêrxasî.

VALIANTNESS, *n.* : gernasîtî, mêrxasîtî.

VALID, *adj.* : rewa.

- **CONTRACT** : peyiv yan belêniya rewa.

VALIDATE, *vt.* : rewa kirin, rastandî kirin.

VALIDATED, *adj.* : rewakirî, rastandî.

VALIDATING, *n.* : rewakirin.

VALIDATION, *n.* : rewakirin, rastandin.

VALIDLY, *adv.* : bi rewayî, rewakî.

VALINE, *n.* : valîn, tirşiya emîniya spî ya belûrî.

VALISE, *n.* : çenteyê alavan.

VALLATE, *adj.* : çeperkirî, sengerkirî.

VALLATION, *n.* : çeper, senger.

VALLECULA, *n.* : kîzî.

VALLECULAR, *adj.* : kîziyî.

VALLECULATE, *adj.* = **VALECULAR.**

VALLEY, *n.* : nihal, dol, duhêl, dewl.

VALONIA, *n.* : kûvik (serik) yê berrûyê ko bo debaxê bi kar dihînin.

- **OAK** : mazî.

VALO(U)R, *n.* : azayî, mêrxasî.

VALORAZIATION, *n.* : bihakirin.

VALORIZE, *vt.* : biha kirin, (hikûmet) pertal biha kirin.

VALORIZED, *adj.* : bihadarkirî.

VALORIZING, *n.* : bihadarkirin.

VALOROUS, *adj.* : camêr, aza.

VALOROUSLY, *adv.* : bi azayî, bi merxasî.

VALSE, *n.* = **WALTZ** (sema).

VALUABLE, *n., adj.* : bihagiran, bihadar, pirbiha, giran, hêja, nirxdar.

VALUABLE ASSISTANCE : yarmetî yan harîkirina hêja.

- **INFORMATION** : ragehîna hêja.

- **LAND** : erd yan zeviya giran.

- **PROPERTY** : samanê giran.

- **THINGS** : pertal yan tiştên bihadar.

VALUABLENESS, *n.* : bihadarîtî, bihagiranîtî.

VALUABLY, *adv.* : bi bihagiranî, bi bihagiranîtî.

VALUATE, *vt.* : biha kirin, xeml kirin.

VALUATED, *adj.* : bihakirî, xemlkirî, nirxkirî.

VALUATION, *n.* : xemilkirin, bihakirin, biha, nirxandin.

VALUATIONAL, *adj.* : bihakirinî, xemilkirinî, nirxandinî.

VALUATIONALLY, *adv.* : bi bihakirinî, bi xemilkirinî.

VALUATOR, *n.* : bihaker.

VALUE, *n.* : biha (beha, bayî), nirx, hêjayî.

- **OF FRESH WATER** : bihayê ava zelal.

VALUE, *vt.* : xeml kirin, biha kirin.

VALUED, *adj.* : bihakirî, hêja.

- **FRIEND** : dost yan hevalê hêja.

VALUELESS, *adj.* : bê biha.

VALUER, *n.* : bihaker.

VALUING, *n.* : bihakirin, nirxkirin.

VALUTA, *n.* : bihayê pêkguhartina diravî.

VALVAL, *adj.* : derçeyî, serdankî.

VALVAR, *adj.* : derçeyî, serdevkî, serdankî.

VALVATE, *adj.* : serdevkî, derçeyî.

VALVE, *n.* : derçe, serdevk, zimane, dergirtek.

- **CHEST OR ~ BOX** : sindoqa derçeyan.

- **SAFETY ~** : zimaneya êrya, zimaneya dilniya.

VALVED, *adj.* : derçekirî, serdankdar.

VALVELOT, *n.* : derçek.

VALVELESS, *adj.* : bê derçe.

VALVULA, *n.* : derçek (derçeyê biçûk).

VALVULAR, *adj.* : derçeyî.

VALVULITIS, *n.* : kulbûna derçeyê dilî.

VAMBRACE, *n.* : metalê zendî.

VAMOOSE, *vi.* : (bi lez) çûn yan derketin.

VAMOOSED, *adj.* : (bi lez) çûyî yan derketî.

VAMOOSING, *n.* : çûn yan derketina bilez.

VAMP, *n.* : parçeya bilind ya berahiya pêlavê pinî, serbarên çaktir, fêtkar (jin), pîne, tero.

VAMP, *vi.t.* : (parçeya bilind ya berahiya pêlavê) nû kirin, pinî yan pîne kirin, pate kirin, çak kirin, fêtkarî kirin (jin).

VAMPER, *n.* : pîneker, pînedoz.

VAMPIRE, *n.* : gornepişk, gornebaş, xwînmêj (çekçekîle), sawîrê ko bi şev ji gorê derdikevit û xwîna nivistiyan dimêjit.

VAMPIRIC, *adj.* : xwînmêj.

- **BAT** : çekçekîleyê xwînmêj.

VAMPIRISM, *n.* : xwînmêjîtî, bawerî bi sawîrê xwînmêj.

VAMPLATE, *n.* : zirêyê asinê destî.

VAN, *n.* : tîp yan berê leşkerî, guhêzok (van).

VANADATE, *adj.* : vanadyomî.

VANADIC, *adj.* = **VANADATE.**

- **ACID** : tirşiya vanadyomî.

VANADINITE, *n.* : vanadînît, xamek metalî ko vanadyom têde ye.

VANADIUM, *n.* : vanadyom : hêmanek metalî û qetlaz e.

VANADOUS, *adj.* = **VANADIC.**

VANDAL, *n., adj.* : cerde, nijde, endamê hozek Cermenî ko da ser Fransa, Îspanya, û bakura Efrîqa li seda pêncê b.z.

VANDALIC, *adj.* : cerdeyî.

VANDALISM, *n.* : cerdeyîtî, xirabkirin.

VISCOUSNESS, *n.* : lincîtî.

VISCUS, *n.* : hînav, pizûr.

VISE, *n.* : girtek, mengene.

VISE, *vt.* : bi mengene girtin.

VISHNU, *n.* : duwem (yek ji sêyan) pîrozê Hindûyî.

VISIBILITY, *n.* : dîtinbarî(tî), dîtiŋ, fitkirin.

VISIBLE, *adj.* : dîtinbar, berçav, diyar, xûya, penî, fitirandî, dîbar, kifş, şanî.

- **HORIZON** : asoya diyar.

- **IMPATIENCE** : bê aramiya eşkera.

VISIBLENESS, *n.* : dîtinbarîtî, diyarbarîtî.

VISIBLY, *adv.* : bi xûyayî, bi diyarî.

VISION, *n.* : dîtin, xewn, xulyan, bîn, dîtinek, mirov yan dîmenek law, şebeng, binayî, fitirandin, aşop.

VISION, *vt.* : aşop kirin.

VISIONAL, *adj.* : dîtinî, xûyayî.

VISIONALLY, *adv.* : dîtinkî, bi dîtinî.

VISIONARINESS, *n.* : dîtinîtî.

VISIONARY, *n., adj.* : xewnkar, aşopî, balxwaz, nimûneyî, nekirdarî, têrxewnî.

VISIONED, *adj.* : xewndîtî, têrxewn, sirûşkirî.

VISIONING, *n.* : dîtin.

VISIONLESS, *adj.* : bê dîtin, kore, bê sirûş.

VISIT, *n.* : seredan, seradan, serdan, serlêdan.

VISIT, *vt.* : ser lê dan, serdan kirin.

VISITABLE, *adj.* : serdanbar.

VISITANT, *n., adj.* : serdanker, serdanî.

VISITATION, *n.* : serdan, balindeyê serdanî yan koçer.

VISITED, *adj.* : serdankirî.

VISITING, *n.* : serdankirin.

- **CARD** : karta serlêdanê.

VISITOR, *n.* : serdanker, seredanî.

- **SUMMER ~** : zozanî.

VISITORIAL, *adj.* : serlêdanî.

VISOR, *n.* : rûpûş, rexê cama berahiya otomobîlê.

VISORLESS, *adj.* : bê rûpûş.

VISTA, *n.* : dîmen, derbazgehê teng yê

dîmen têre diyar dibit, berahiya xodeyî, rexê kulavî.

VISUAL, *adj.* : berçav, diyarî, dîtinî, vejiyanî.

- **ACUITY** : tijbînî.
- **AIDS** : harîkarên berçavî.
- **ANGLE** : goşeya dîtinê.
- **RAYS** : tîrêjên dîtinê.

VISUALITY, *n.* : dîtinîtî.

VISUALLY, *adv.* : bi dîtinî, dîtinkî.

VISUALIZATION, *n.* : aşopkirin, vejiyandin.

VISUALIZE, *vt.* : aşop kirin, diyar kirin (berçavî).

VISUALIZED, *adj.* : aşopkirî.

VISUALIZING, *n.* : aşopkirin.

VITA, *n.* : jînnameya nivîserî.

VITA GLASS, *n.* : texlîtek şûşe ye ko dihêlit tîrêjên vijiyanî yên ser benefşî têre biborin.

VITAL, *n., adj.* : jînî, jîwarî, binyatî, vejiyanî, zindekarî, tomarên binyatî yên mirovan.

- **ENERGIES** : ozeyên vejiyanî.
- **FORCE** : hêza vejiyanî.
- **IMPORTANCE** : giringiya vejiyanî.
- **QUESTION** : pirsa vejiyanî.
- **STATISTICS** : jimartinên vejiyanî (giring), zayîn, jinanîn, şûkirin, mirin.

VITALISM, *n.* : vejiyanîtî, ola vejiyanî.

VITALIST, *n.* : bawermendê ola vejiyanî.

VITALISTIC, *adj.* : pêwendidarê bawermendê ola vejiyanî.

VITALITY, *n.* : vejiyanîtî, jîndarî, zîndekî.

VITALIZATION, *n.* : vejiyankirin.

VITALIZE, *vt.* : vejiyandin.

VITALIZED, *adj.* : vejiyankirî.

VITALLY, *adv.* : bi jîndarî.

VITALS, *n. pl.* : endamên vejiyanî (dil, mejî).

VITAMIN, *n.* : vîtamîn, madeyek endamî û binyatî yê xurekî.

VITAMINIZE, *vt.* : vîtamîn kirin.

VITASCOPE, *n.* : ketingeha sînemayiya kevn.

VITELLARY, *adj.* : zerikî (pêwendîdarê zerikiya hêkê).

VITELLIN, *n.* : vîtelin, pirotînê zerika hêkê.

VITELLINE, *adj.* : zer, pêwendîdarê zerika hêkê, zerikî.

VITELLOGENESIS, *n.* : çêbûna zerkê.

VITELLUS, *n.* : zerikiya hêkê, zerik.

VITIATE, *vt.* : helweşandin, têk dan.

VITIATED, *adj.* : helweşandî, têkdayî.

VITIATING, *n.* : helweşandin, têkdan.

VITIATION, *n.* : helweşandin, helweşîn, têkdan.

VITIATOR, *n.* : helweşînkar.

VITICULTURAL, *adj.* : mêwçandinî.

VITICULTURE, *n.* : mêwçandin, rezvanî.

VITICULTURIST, *n.* : mêwçandiyar, rezvan.

VITILIGO : nesaxiya çermî ko piniyên spî li ser diyar dibin.

VITRECTOMY, *n.* : helkêşana avika binayî (deranîna avika bînayî).

VITREOSITY, *n.* : şûşeyîtî.

VITREOUS, *adj.* : şûşeyî, camî.

- **BODY** : leşê şûşeyî, avika bînayî.
- **ELECTRICITY** : kehreba şûşeyî.
- **ENAMEL** : mînaya şûşeyî.
- **HUMOUR** : tevnê rohn yê jelatînî yê topka çavî.

VITREOUSNESS, *n.* : şûşeyîtî.

VITRESCENCE, *n.* : şûşekirinbarî, şûşekirinxwazî.

VITRESCENT, *adj.* : şûşekrinbar, şûşekirinxwaz.

VITRIFACTION, *n.* : şûşekirin.

VITRIFIABILITY, *n.* : şûşekirinbarî(tî).

VITRIFIABLE, *adj.* : şûşekirinbar.

VITRIFIED, *adj.* : şûşekirî.

VITRIFY, *vt.i.* : şûşe kirin, şûşe bûn, guhorandin şûşeyî.

VITRIFYING, *n.* : şûşekirin.

VITRIOL, *n.* : şeb, zax, rexneya req yan gezîn, tirşiya kibrîtî yan xwêya wê.

- **BLUE ~** : zaxa şîn, şînzax.
- **GREEN ~** : zaxa kesk (sewz).
- **WHITE ~** : zaxa spî.

VITRIOLATE, *vt.* : zax kirin.

VITRIOLATION, *n.* : zaxkirin.

VITRIOLIC, *adj.* : zaxî.

VITRIOLINE, *adj.* = **VITRIOLIC.**

VITRIOLIZABLE, *adj.* : zaxbar.

VITRIOLIZATION, *n.* : zaxkirin.

VITRIOLIZE, *vt.* : zax kirin, kirin selfêt, jehr kirin, sotin (bi zaxî).

VITTA, *n.* : stûvank (bo xemilkirina qeşeyî), qurban, demarkê rûnî di hindek meyweyan de, rêz, hêl.

VITTATE, *adj.* : hêl yan rêzkirî, dirêjkî rêzkirî, rûndemarî.

VITUPERATE, *vt.* : têxurîn, paşbêjî kirin; cinêw dan, xeber gotin.

VITUPERATED, *adj.* : têxurî.

VITUPERATING, *n.* : têxurîn.

VITUPERATION, *n.* : çêr, dijûn, cinêw, nawziran, xeber, têxurîn.

VITUPERATIVE, *adj.* : nawziranî, devçêrî, çêrdar.

VITUPERATIVELY, *adv.* : bi nawziranî, devçêrkî.

VITUPERATOR, *n.* : devçêr.

VITUPERATORY, *adj.* : devçêrî.

VIVA, *interj., n.* : bijî ! her bijî !

VIVACE, *adv., adj.* : bi çalakî, çalak.

VIVACIOUS, *adj.* : şox.

VIVACIOUSLY, *adv.* : şoxkî, bi şoxî.

VIVACIOUSNESS, *n.* : şoxîtî.

VIVACITY, *n.* : şoxîtî.

VIVARIUM, *n.* : rîçala hişk.

VIVAT, *interj., n.* : bijî!.

VIVA VOCE, *adv.*, lêvikî, azmûna devikî.

VIVAX, *n.* : dirmê lerzetayê (melarya, taya sêyekî).

VIVE, interj. : bijî!.

VIVERRINE, *adj.* : pêwendîdarê tuxmê kitikê.

VIVID, *adj.* : geş, zindî, çalak, vejiyanî, qayim.

- **DESCRIPTION** : raveya geş yan qayim.
- **FLASH** : teyisîna xurt.
- **GREEN** : hişa çalak û geş yan rohn.
- **IMAGINATION** : aşopa xurt.

VIVIDLY, *adv.* : geşkî, bi geşî, bi çalakî, bi xurtî.

VIVIDNESS, *n.* : geşîtî, qayimîtî, çalakîtî.

VIVIFIED, *adj.* : vejiyandî.

VIVIFIER, *n.* : vejiyanker.

VIVIFY, *vt.* : vejiyandin.

VIVIFYING, *n.* : vejiyandin.

VIVIPARITY, *n.* : zayînîtî.

VIVIPAROUS, *adj.* : zayînî (biçûkbûnî, ne hêkkurkî).

VIVIPAROUSLY, *adv.* : bi zayînî.

VIVIPAROUSNESS, *n.* : zayînîtî.

VIVISECT, *vt.* : vekelişandin (zindî bo meremên zanistî).

VIVISECTION, *n.* : vekelişandin.

VIVISECTIONAL, *adj.* : vekelişînî.

VIVISECTIONIST, *n.* : neşterbaz.

VIXEN, *n.* : jina çirt, mêrûvî.

VIXENISH, *adj.* : çirtî, mêrûviyî.

VIXENLY, *adv.* : bi çirtî.

VIZ, *adv.* : **THAT IS TO SAY** : anko.

VIZ, *n.* = **VISOR.**

VIZARD, *n.* = **VISOR**, rûpûş.

VIZCACHA = **VISCACHA.**

VIZIER, *n.* : wezîr, şalyar.

VIZOR, *n.* = **VISOR.**

VOCABLE, *n., adj.* : peyiv, bêje.

VOCABULAR, *adj.* : pêwendîdarê peyivan.

VOCABULARY, *n.* : siyayiya elfabêyî, li gel diyarkirina hemû peyivên serekî yên di zimanekê, kitêbekê yan zanistiyekê de.

VOCAL, *n., adj.* : dengî.

- **CORD** : dengjê, jêyê deng, jehê dengî.

VOCALIC, *adj.* : pêwendîdarê tîpebizwên yan tîpên ne dengda.

VOCALISM, *n.* : tîpebizwên, tîpên nedengdar, stran.

VOCALIST, *n.* : stranbêj, ahengbêj, sirûdbêj.

VOCALITY, *n.* : dengdanîtî.

VOCALIZATION, *n.* : dengandin, bêje, gotin, stran derbirrîn.

VOCALIZE, *vt.* : gotin, bêje kirin, derbirrîn, strandin, tîpebizwên kirin, guhorandin, tîpên nedengdar.

VOCALIZED, *adj.* : bêjekirî.

VOCALIZING, *n.* : bêjekirin, dengdankirin.

VOCALLY, *adv.* : bi dengdanî, bi bêjeyî.

VOCATION, *n.* : pîşe, pîşegerî, sîlke.

VOCATIONAL, *adj.* : pîşeyî.

VOCATIONALISM, *n.* : pîşeyîtî.

VOCATIONALIST, *n.* : pîşekar.

VOCATIONALLY, *adj.* : pîşekî, bi pîşeyî.

VOCATIVE, *n., adj.* : gazî, dariştina bazîkerî.

VOCIFERANCE, *n.* : girêç, qîrûqîj.

VOCIFERANT, *adj.* : girêçî, qîrûqîjî, qîrûqîjkar.

VOCIFERATE, *vt.* : qîrûqîj kirin, qerqeşe kirin.

VOCIFERATED, *adj.* : girêçkirî, qîrûqîjkirî.

VOCIFERATING, *n.* : qîrûqîjkirin, girêçkirin.

VOCIFERATOR, *n.* : qîrûkîjker, qerqeşeker.

VOCIFEROUS, *adj.* : qîrûqîjî, girêçî.

VOCIFEROUSLY, *adv.* : bi qîrûqîjî, qîrûqîjkî, bi girêçî.

VOCIFEROUSNESS, *n.* : girêçîtî, qîrûqîjîtî.

VODKA, *n.* : vodka, meya rûsî.

VOGUE, *n.* : riqîn, gelêrî, mode, cil, baw.

- **IN** ~ : riqîn, firoşdar, baw, gelêrî.

VOGUE, *vi.* : gelêrî bûn.

VOGUISH, *adj.* : law, baw (ji nişkî yan demkî).

VOGUISHNESS, *n.* : bawîtî, gelêrîtî.

VOICE, *n.* : deng, awaz, stran, şiyana stranbêjî, derbirrîn, dariştina lêkerî.

- **IN** ~ : dengkêrhatî (bo axiftin yan stranan).

- **WITH ONE** ~ : hemûkî.

VOICE, *vt.* : (tîpek) dengdanî gotin, awaz kirin.

VOICE BOX, *n.* : sindoqa stranan, gerû, gewrî.

VOICED, *adj.* : dengdar, dengdarî, derbirrî, dengkirî.

VOICEDNESS, *n.* : dendarîtî.

VOICEFUL, *adj.* : têrdeng, dengbilind, dengdar.

VOICEFULNESS, *n.* : têrdengîtî.

VOICELESS, *adj.* : bê deng, lal.

VOICELESSNESS, *n.* : bêdengîtî.

VOICING, *n.* : dengkirin.

VOICE PART, *n.* : parçeya dengî, parçeyek awaza dengî yan alavî.

VOICE PLEASANTNESS, *n.* : dengxweşîtî, xweşdengîtî.

VOID, *n., adj.* : vala, bêtewş, helweşayî, kun, pûç.

- **SPACE** : beyava vala.

VOID, *vt.* : helweşandin, vala kirin, derkirin, derxistin.

VOIDABLE, *adj.* : helweşînbar.

VOIDABLENESS, *n.* : helweşînbarî(tî).

VOIDANCE, *n.* : valabûn, valakirin, helweşîn, derkirin, derxistin, helweşandin.

VOIDED, *adj.* : valakirî.

VOIDING, *n.* : valakirin.

VOIDLY, *adv.* : bi valayî.

VOIDNESS, *n.* : valayîtî, valayî, valatî.

VOILE, *n.* : vewal, tevnek yan perûkek pembû û tenik e.

VOIR DIRE : sond (gewahî).

VOL., *abbr.* **FOR VOLUME** : qebare.

VOLANT, *adj.* : lezok, firînbar, firende (yan firinde).

VOLAPUK, *n.* : zimanê cihanî, zimanek nav neteweyî, binyat înglîzî ye.

VOLAR, *adj.* : paniyî (pê), lêpî (dest).

VOLATILE, *adj.* : perende, firende, perş.

VOLATILENESS, *n.* = **VOLATILITY.**

VOLATILITY, *n.* : perendeyîtî, firendeyîtî.

VOLATILIZABLE, *adj.* : perendebar, firendebar.

VOLATILIZATION, *n.* : helmandin, perendekirin, firîn.

VOLATILIZE, *vt.i.* : perende kirin, firende kirin, firîn, firandin.

VOLATILIZED, *adj.* : perendekirî, firendekirî.

VOLATILIZING, *n.* : perendekirin.

VOL-AU-VENT, *n.* : kadeya sivik ya goştî.

VOLCAN, *n.* : birkan, agirpîjîn.

VOLCANIC, *adj.* : birkanî, agirpijînî.

- **GLASS** : şûşeyê birkanî yan agirpijînî.

- **LAVA** : arav, agirav.

VOLCANICITY, *n.* : birkanîtî, agirpijînîtî.

VOLCANISM, *n.* : birkanîtî.

VOLCANIST, *n.* : birkanzan.

VOLCANO, *n.* : çiyayê agirî, birkan.

VOLCANO-ACTIVE : birkanê çalak.

VOLCANODORMAN, *n.* : birkanê mit (temirî yan damirandî).

VOLCANO EXTINCT, *n.* : birkanê nemayî.

VOLCANOLOGIC(AL), *adj.* : pêwendîdarê birkanzanî.

VOLCANOLOGIST, *n.* : birkanzan.

VOLCANOLOGY, *n.* : birkanzanî, agirpijînzanî.

VOLE, *n.* : texlîtek kirindeyê wek mişkî, mişkê zeviyan.

- **WATER ~** : kirindeyê mezin yê wek mişkî.

VOLENT, *adj.* : kîno.

VOLET, *n.* : rexê depê sêyîne.

VOLITANT, *adj.* = **VOLANT.**

VOLITION, *n.* : vên (viyan).

- **OF MY OWN ~** : bi vêna xwe bi xwe.

VOLITIONAL, *adj.* : xwazeyî, vênî, viyanî.

VOLITIONLESS, *adj.* : bê vên.

VOLITIVE, *adj.* : vênî, vêndar, viyandar, xwazeyî, viyanî.

VOLITIVELY, *adj.* : xwazekî, bi xwazeyî.

VOLLEY, *n.* : barîn (tîr yan fişek havêj di yek demî de), şêlik.

VOLLEY, *vt.* : barandin, şêlik havêtin, lê dan (tepka tenisê berî ko bi erdê bikevit).

- **BALL**, *n.* : (yarî) tepka firende.

VOLLEYED, *adj.* : barandî, şêlikhavêtî.

VOLLEYING, *n.* : barandin, şêlikhavêtin.

VOL PLANE, *n.* : dahatin (balafir yan balafirvan), nişîvbûn (bê makîne, balafir).

VOL PLANE, *vi.* : (balafir) haatin xarê, nîşîv bûn.

VOL PLANED, *adj.* : hatî xarê.

VOL PLANING, *n.* : dahatin.

VOLS, *abbr.* **OF VOLUMES** : qebare.

VOLT, *n.* : volte.

VOLT, *n.* : volt, yekeya hêza livîna kehrebî.

VOLT, *vi.* : voltek çêkirin.

VOLTA, *n.* : (mûzîqe) awazlêdan (una volta: carekê).

VOLTAGE, *n.* : voltî, erk : hêza livîna kehrebî (bi voltan pîvayî).

VOLTAGE DIVIDER : dabeşkerê voltiyê.

VOLTAIC, *adj.* : voltane, galvamî.

- **BATTER** : kogeha galvanî.

VOLTAISM, *n.* = **GALVANISM.**

VOLTA METER, *n.* : volt û ampêr pîv.

VOLT-AMPERE, *n.* : volt-ampêr.

VOLTE, *n.* : (şûrbazî) livîna lezîn da xwe ji (derbê şûrî) vedit, livîna cixiziya hespî.

VOLTE-FACE, *n.* : guhorîna helwêstê.

VOLT METER, *n.* : voltpîv.

VOLUBILATE, *adj.* : badayî.

VOLUBILITY, *n.* : terzimanî(tî).

VOLUBLE, *adj.* : pirbêj, pûçbêj, dengbilind.

VOLUBLENESS, *n.* : pûçbêjîtî, terzimanîtî.

VOLUME, *n.* : qebare, qeware, bergîn, govek, tibab, lok.

VOLUMED, *adj.* : qebarekirî (bo hinartinê).

VOLUMING, *n.* : qebarekirin.

VOLUMENOMETER, *n.* : alava qebarepîva leşê req bi labirina avekî.

VOLUMETER, *n.* : qebarepîv.

VOLUMETRIC(AL), *adj.* : qebarepîvî.

- **ANALYSIS** : şîtel qebareyî.

VOLUMETRICALLY, *adv.* : bi qebarepîvî.

VOLUMINAL, *adj.* : qebareyî, mezinî.

VOLUMINOSITY, *n.* : qebareyîtî, mezinîtî.

VOLUMINOUS, *adj.* : mezin, gewre, alandî, têrpêç, fireh, pej, gelek, zehf, çendekî.

VOLUMINOUSLY, *adv.* : bi gewreyî yan mezinî.

VOLUMINOUSNESS, *n.* : gewreyîtî, mezinîtî (qebare).

VOLUNTARILY, *adv.* : bi xwazekî.

VOLUNTARINESS, *n.* : xwazekîtî.

VOLUNTARISM, *n.* : xwazekîtî.

VOLUNTARIST, *n.* : xwazek.

VOLUNTARY, *n., adj.* : hemt, qebalewî, xwazekî, viyanî.

- **CONFESSION** : naskirina xwazekî.

- **MOVEMENT** : liveka vênî.

- **MUSCLE** : masûlkeya vênî.

VOLUNTARYISM, *n.* = **VOLUNTARISM.**

VOLUNTARYIST, *n.* : xwazek.

VOLUNTEER, *n.* : dilxwaz.

VOLUNTEER, *vt.i.* : dilxwaz bûn, dilxwaz kirin.

VOLUNTEERISM, *n.* : dilxwazîtî.

VOLUPTUARY, *n., adj.* : fêtkar, belqitî, hestiyar.

VOLUPTOUS, *adj.* : belqitî, hestiyar.

VOLUPTOUSNESS, *n.* : belqitînîtî, hestiyarîtî.

VOLUTE, *n.* : şikil yan şêweyê çeqçeqokî, pêça qalikê şeytanokî, leyiztoka çeqçeqokî, şeytanokê deryayî.

VOLUTE(D), *adj.* : badoke, lûlekî, çeqçeqokî.

- **SPRING** : zenbelekê badoke.

VOLUTOID, *n., adj.* : badoke, badokeyî.

VOLUTION, *n.* : pêç yan badana lûlekî yan çeqçeqokî.

VOLVA, *n.* : perdeya qarçikî.

VOLVULUS, *n.* : alandina rîvîkê.

VOMER, *n.* : hestiyê biçûk yê tenik yê ko ximximkan parçe dikit.

VOMIT, *n.* : hîlavêtin, rişandin, dirş, vereşandin, vereşîn.

VOMIT, *vt.i.* : hilavêtin, vereşandin.

VOMITED, *adj.* : vereşandî.

VOMITER, *n.* : vereşînker.

VOMITING, *n.* : vereşîn, vereşandin, hilavêtin, dirş, vereşiyan.

- **GAS** : xaza vereşînê.

VOMITIVE, *adj.* : vereşînî, vereşîndar.

VOMITORY, *n., adj.* : dirîkê rûnîştekên şanoyê.

VOMITURITION, *n.* : bizava vereşînê, hilavêtin yan vereşandina dubare.

VOMITUS, *n.* : tiştê hilavêtî.

VOODOO, *n.* : niviştî, cadûbaz, cerbez, xirsker.

- **DOCTOR** : pijîşkê cadûbaz yan xirsker.

- **PRIEST** : oldarê cadûbaz yan xirsker.

VOODOO, *vt.* : cerbezî kirin, cadû kirin, xirs kirin.

VOODOOISM, *n.* : vodoyîtî : ayînek Reşên Efrîqayî, ko li nav Reşên Hayîtî belav e û binyat cadûgerî û remldarî ye, cadû, xirs, cerbezî.

VOODOOIST, *n.* : bawermendê vodo.

VOODOOISTIC, *adj.* : pêwendîdarê bawermendê vodo.

VORACIOUS, *adj.* : pirxwer, zikînî, zikkûr, xwara, xwarok, çavbirsî, çilek, kulb.

- **APPETITE** : xwara, pirxwer.

VORACIOUSLY, *adv.* : bi xwarayî.

VORACIOUSNESS, *n.* : çilekîtî, çilek, zikûrîtî.

VORACITY, *n.* : çilekîti, zikkûrîtî, zikkorîtî.

- **VOROUS**, *suff.* : paşgir e ko rengdêr e.

VORTEX, *n.* : virvirok, gerav, zivrek, gêjaw, viz, gêjeng.

- **MOTION** : livîna zivrekî, livîna gêjeng.

VORTICAL, *adj.* : zivrek, gêjkî.

VORTICALLY, *adv.* : bi zivrekî, bi gêjkî, zivrekî.

VORTICELLA, *n.* : canewerê zengilokî di nav çiravan de.

VORTICISM, *n.* : tevgera zivrekî, tevgera hunerî ya nûjenî û neheyberî, baweriya ko gerdûn valatiyek têrmade ye ko livîn zivrekê xwe berdewam dikit.

VORTICIST, *n.* : hunermendê tevgera zivrekî.

VORTICITY, *n.* : zivrekîtî.

VORTICOSE, *adj.* = **VORTICAL.**

VORTIGINOUS, *adj.* : zivrekî.

VOTARIST, *n.* = **VOTARY.**

VOTARY, *n.* : endamê sondxwer, bawermendê xurt, piştgirê xwîngerm.

VOTE, *n.* : deng (helbijartin), dengdan, mafê dengdanê, biryara dengdanê, peşk, dengder.

- **OF NO CONFIDENCE** : dengdana ewlekî rakirin.

VOTE, *vi.t.* : deng dan.

- **TO ~ DOWN** : pêşniyazek revandin bi dengdanê.

- **TO ~ IN** : helbijartin (bi dengdanê).

VOTED, *adj.* : dengdayî.

VOTELESS, *adj.* : bêdeng (maf).

VOTER, *n.* : dengder, pişkhavêj.

VOTING, *n.* : dengdan, dengrahêlan, pişkhavêtin.

- **MACHINE** : makîne yan rêxistina dengdanê.

VOTIVE, *adj.* : viyanî, niyazî, sondî.

- **OFFERING** : pêşkêşkirina sondî.

- **PICTURE** : wêneyê sondî.

- **MASS** : nivêja meremek taybet (fele).

- **TABLET** : depê sondî.

VOUCH, *vt.i.* : (bo gewahê) xwastin, gewahî dan, derbest kirin, dupat kirin, dirûv kirin.

VOUCHEE, *n.* : gewah.

VOUCHER, *n.* : pisole, pete, destavêj, qoçan.

VOUCHSAFE, *vt.* : derbest kirin, rê dan, bersiv dan, dilovanî kirin, bexş kirin (wek bersivê).

VOUCHSAFED, *adj.* : derbestkirî.

VOUCHSAFING, *n.* : derbestkirin.

VOUSSOIR, *n.* : sipîn, qaş yan zemûmeya (kevirî) berî yan taqî.

VOW, *n.* : belênî, sond, peyivdan.

VOW, *vt.* : sond xwarin.

VOWEL, *n.* : dengdêr, (tîpe)bizwên.

- **POINT** : livîn (di zimanekê de).

VOWELIZE OR VOWELISE, *vt.* : bizwên kirin.

VOWELIZED, *adj.* : bizwênkirî.

VOWELIZING, *n.* : bizwênkirin.

VOWELLESS, *adj.* : bê (tîpe)bizwên.

VOWELLY, *adv.* : bi tîpe bizwênî.

VOWER, *n.* : sondxwer.

VOYAGE, *n.* : rêbarî, rêwîtî, geşt.

VOYAGE, *vi.t.* : rêbarî kirin.

VOYAGED, *adj.* : rêbarîkirî, rêwîtîkirî.

VOYAGER, *n.* : rêbar, rêvingî.

VOYAGEUR, *adj.* : gerok.

VOYAGING, *n.* : rêbarîkirin, rêwîtîkirin.

VOYEUR, *n.* :, kesê xweşiya zayendî (regezî) dibinît bi dîtina karê zayendiyê kesek dî.

VOYEURISTIC, *adj.* : pêwendîdarê kesê xweşiyê dikit bi dîtîna karê zayendî.

VOYEURISTICALLY, *adv.* : bi xweşiya dîtina karê zayendî.

VRAIC, *n.* : kevza giravên Nokenda Birîtanî.

V-SIGN (VICTORY SIGN) : nîşana serketinê.

VULCAN, *n.* : volkan, Xudayê agirî û çêkirina keresteyên metalî (li nik Romayiyan).

VULCANIAN, *adj.* : volkanî, birkanî.

VULCANIC, *adj.* = **VOLCANIC.**

VULCANITE, *n.* : volkanît, lastîka req ya bi kibrîtê çarekirî bo çêkirina qopçe û şehan.

VULCANIZABLE, *adj.* : lastîka reqbar.

VULCANIZATION, *n.* : lastîkreqkirin (bi kibrîtê).

VULCANIZE, *vt.* : lastîk req kirin (bi kibrîtê).

VULCANIZED, *adj.* : reqkirî.

VULCANIZER, *n.* : lastîkreqker.

VULCANOLOGICAL, *adj.* : birkanî, agirpijnî.

VULCANOLOGIST, *n.* = **VOLCANOLOGIST.**

VULCANOLOGY, *n.* : birkanzanî, agirpijînzanî.

VULGAR, *adj.* : çepel, xirabkar, qube.

- **THE ~ HERD** : nizmexelk.

VULGARIAN, *n.* : qube, çepel, mirovê dewlemend lê tamsar, geveze.

VULGARISM, *n.* : qubeyîtî, çepelîtî, tamsarîtî, gevezeyîtî.

VULGARITY, *n.* : çepelîtî, qubeyîtî, gevezeyîtî.

VULGARIZATION, *n.* : çepelbûn, gevezebûn, qubebûn.

VULGARIZE, *vt.* : qube kirin, çepelî kirin.

VULGARIZED, *adj.* : çepelkirî, qubekirî.

VULGARIZING, *n.* : çepelkirin, qubekirin.

VULGARLY, *adv.* : çepelkî, bi çepelî, bi qubeyî.

VULGATE, *n.* : Încîla latînî.

VULGUS, *n.* : kurtehelbesta latînî.

VULNERABILITY, *n.* : şikestinbarî(tî), birînbarî(tî).

VULNERABLE, *adj.* : şikestinbar, birînbar.

VULNERABLENESS, *n.* : şikestinbarîtî.

VULNERABLY, *adv.* : bi şikestinbarî.

VULNERARY, *n., adj.* : dermanê birîngir.

VULPICIDE, *n.* : rûvîkujî.

VULPINE, *adj.* : çivo, canbaz, fêlbaz, wek rûvî.

VULTURE, *n.* : simsiyark, sîsark, kerges, başoke.

VULTURISNE, *adj.* : simsiyarkî, zikûnî, talanker.

VULTURISH, *adj.* = **VULTURINE.**

VULTUROUS, *adj.* : simsiyarkî, wek simsiyarkî (zikûnî û talanker).

VULVA, *n.* : navling, quz.

VULVAL, *adj.* : quzî.

VULVAR, *adj.* = **VULVAL.**

VULVATE, *adj.* = **VULVAL.**

VULVIFORM, *adj.* : şikil quzî.

VULVITIS, *n.* : kulbûna quzî.

VULVOVAGINITIS, *n.* : kulbûna quz û vinçikî.

VYING, *n.* : hevrikîkirin.



W, w : debilyo : tîpa bîst û sêyem ya elfabeya înglîzî.

W : SYMBOL OF TUNGSTEN : tungsten, texlîtek kan e.

W, *abbr.* : watt(s).

WABBLE = WOBBLE.

WACKE, *n.* : gilê gewra kesk yan genimî yê kevirê birkanî yan agirpijînî.

WACKILY, *adv.* : bi gewcî.

WACKINESS, *n.* : gewcîtî.

WACKY, *adj.* : gewc.

WAD, *n.* : deste, gurze, gelek dirav.

WAD, *vt.* : pêçan , teji kirin, dagirtin.

WADABLE OR WADEABLE, *adj., n.* : borbar.

WADDED, *adj.* : hepişandî.

WADDING, *n.* : hepişandin.

WADDLE, *n.* : xingilîn.

WADDLE, *vi.* : xingilîn.

WADDLED, *adj.* : xingilî.

WADDLINGLY, *adv.* : bi xingilînî.

WADDY, *n.* : gurzê şerî (awistralî).

WADE, *n.* : bor.

WADE, *vi.t.* : gurz lê dan, zehmet pêş ketin, dan borî (dan nav avê re), êrîş kirin, çalak kar kirin, derbaz bûn (ji borî).

- **TO ~ IN** : êrîş kirin.

- **TO ~ INTO** : çalak êrîş kirin.

- **TO ~ THROUGH BLOOD** : dan nav xwînê de.

- **TO ~ THROUGH SLAUGHTER** : dan nav kuştarê de.

WADED, *adj.* : dayî nav avê re.

WADER, *n.* : têperê borî.

WADING BIRD, *n.* : balindeyê avî yê lîngdirêj.

WADING POOL, *n.* : gera borî (bo zarokan).

WADMAL, WADMOL OR WADMEL, *n.* : tevnek yan perûkek hîrî stûr e.

WAFER, *n.* : dorik, sewka nanî, bazina tenik, venûsînk, sewka venûsînê.

WAFER, *vt.* : venûsîn, qayim kirin, girtin (bi sewk yan bazina tenik).

WAFERED, *adj.* : girtî, venûsî.

WAFERING, *n.* : girtin, venûsîn.

WAFERY, *adj.* : sewkî (tenik).

W.A.F., ABBR. WITH ALL FAULTS : li gel hemû çewtiyan.

WAFFLE, *n.* : kîloc (ji ar, şir û hêkê dihêt sorkirin bi alavek sorkirinê taybet).

- **IRON** : sorkera kilocê (pêjgeh).

WAFFLE, *vt.* : xirpoyî axiftin, têk şêlan.

WAFFLED, *adj.* : xirpoyî axifti, têkşêlayî.

WAFFLING, *n.* : axiftina xirpoyî, têk şêlan.

WAFT, *n.* : bahîn, sirwe, şine, bêhna sivik, deng, ala (bo nîşankirinê yan zanîna arasteya bayî).

WAFT, *vt.* : pal dan, hajotin (ser avê yan ser bayî), derketin (bêhn, deng, awaz).

WAFTAGE, *n.* : guhaztin (bi gemiyan).

WAFTURE, *n.* : tiştê ba yan pêl dibit yan guhaztin.

WAG, *n.* : hejîn (ser), yariker, kenînker.

WAG, *vt.i.* : livîn, hejîn, veweşîn, xingilîn.

- **TO ~ TAIL** : dûv hejandin.

WAGE, *n.* : kirê, mûçe.

- **ANNUAL ~** : salane.

- **DAILY ~** : rojane, rojanî.

- **MONTHLY ~** : mangane, heyvane.

- **EARNER** : kirêkar, mûçexwar, rêncber.

- **SCALE** : pêstirka kirê (nîşankerê rêkar yan guhorîna kirê).

- **WORKER** = **WAGE EARNER.**

- **WEEKLY** ~ : heftane.

WAGE, *vt.* : kirê kirin, êrîş kirin.

WAGED, *adj.* : êrîşkirî.

WAGER, *n.* : girewî, merc, daw.

- **OF BATTLE** : şerker.

WAGER, *vt.* : merc kirin, girew kirin.

WAGERED, *adj.* : merckirî.

WAGERING, *n.* : merckirin.

WAGGED, *adj.* : hatî û çûyî.

WAGGING, *n.* : axiftina berdewan (bê rawestan).

WAGGERY, *n.* : çole.

WAGGISH, *adj.* : tiraneyî, tiraneker, yarîker.

WAGGLE, *n.* : veweşîn, hejîn yan hejandin (til bi gîleyî).

WAGGLE, *vt.i.* : hejîn, hejandin, veweşîn, xingilîn.

WAGGLED, *adj.* : veweşî.

WAGGLING, *n.* : veweşîn.

WAGGLY, *adj.* : veweşînî, hejînî.

WAGING, *n.* : êrîşkirin.

WAG(G)ON, *n.* : erebaneya çarçerx ya barkêşana giran.

- **BOILER** : qazana erebaneyî.

- **CEILING** : kaşxanka nişîv.

- **ROOF** : banê nişîv.

- **TRAIN** : hevkêşa erebaneyî.

- **VAULT** : gomiza erebaneyî.

WAG(G)ONER, *n.* : erebanehajo.

WAG(G)ONETTE, *n.* : erebaneya çarçerx ya vekirî bo siwarbûna keyf xweşiyê ko bi asayî hespek kêşan.

WAGON-LIT, *n.* : erebaneya nivistinê ya hevkêşê.

WAHOO, *n.* : teraşek bakura Emerîka.

WAIF, *n.* : pertal yan canewerê bêxudan, tiştê deryayî havêtî yan înayî beravê, mirov yan canewerê bi zirbûyî nemaze zarok, mirovê derbeder.

WAIL, *n.* : zêmar, zarîn, nike, babo babo, bavo bavo.

WAIL, *vi.i.* : girîn, giryan, zêmar kirin.

WAILFUL, *adj.* : zêmarî, zarînî.

WAILING, *n.* : zarî, qîrqîr, zarezar, qareqar, zarîn, wiswisk, qorîn.

- **AND LAMENTING** : zarezar.

- **OVER** : zarîn, zêmar.

- **PLACE** : dir yan şûna zarînê.

- **WALL** : dîwarê zarînê.

WAILINGLY, *adv.* : zarînkî, zêmarkî, bi zarînî, bi zêmarî.

WAIN, *n.* : erebaneyek mezin, hirça mezin.

WAINSCOT, *n.* : darberrûya nayab, nixêva dîwarê hindurî.

WAINSCOT, *vt.* : nixaftin (bi depên darî).

WAINSCOT(T)ED, *adj.* : nixafti.

WAINSCOT(T)ING, *n.* : nixaftin.

WAINWRIGHT, *n.* : erebane çêker yan çaker.

WAIST, *n.* : navteng, kemer, navqed, qarîş, qayîş, newq, teflef.

- **BAND** : doxîn, hemyan, piştan, kemer, navkêl.

- **BELT** : kemerbend.

- **COAT** : çekbend, sûxme, êlek, qufk, kutk.

- **CLOTH** = **LOIN CLOTH.**

- **DEEP** : kûr tako kemerê.

- **HIGH** : bilind tako kemerê.

- **LINE** : navqed, kemer, êlek, sernêk, navtirêng.

WAIT, *vi.t.* : xwe girtin, xizmet kirin (çavnêrî), payîn (pan).

- **TO ~ ON OR UPON** : xizmeta kesekê kirin.

- **TO ~ UP** : dereng nivistin, rûniştin dirêj kirin.

- **A MINUTE! OR WAIT A BIT!** : raweste!.

WAIT, *n.* : bende, bose, hîvîdarî, endamê tîpa stranbêj û mûzîqevan yên ko li kolanan digerin li cejna kirismisê, mûzîqeya vê tîpê.

- **TO LIE IN ~ FOR** : bose bi kesekê danan yan vedan.

WAITER, *n.* : çavnêr.

WAITING, *n.* : ragirtin, xwegirtin, hîvîdar, li hîvî, benda, çavnêrî, bendewar, lêpan.

- **FOR** : bendemayî, bende.

- **GAME** : gemeya xwegirtinê (bo delîveyê).

- **LIST** : siyayiya xwegirtinê (bo karî yan rêbariyê).

- **MAID OR WOMAN** : bermal, yawer, xidam.

- **MAN** : xulam, yawer, berdest.

WAITRESS, *n.* : çavnêr (mê).

WAIVE, *vt.* : dest jê berdan, xwe vedan, (pertalê dizî) firotin, paş xistin, wêve bûn (bi hejandina destî).

WAIVED, *adj.* : destjêberdayî.

WAIVER, *n.* : destjêberdan, belgenameya destjêberdanê.

WAIVING, *n.* : destjêberdan.

WAKE, *n.* : hişyarî, pişûya salane, ahenga cejna mehdervanê dêrê, mana li ber termê mîrî berî veşartînê.

- **IN THE ~ OF** : piştî.

WAKE, *vi.t.* : rabûn, hişyar bûn, hişyar kirin, li ber nivînên nesaxî yan termê mirî man.

- **TO ~ HIM UP** : ew hişyar kirin, ew rakirin.

- **TO ~ UP** : rakirin, hişyar kirin.

- **UP THERE!** : hîlo rabe!.

WAKED OR WOKE, *adj.* : hişyar.

WAKEFUL, *adj.* : şevnişîn, hişyar, şiyar, bêxew, agehdar.

WAKEFULLY, *adv.* : bi bêxewî.

WAKEFULNESS, *n.* : bêxewîtî, agehîbûn, agehîtî.

WAKELESS, *adj.* : bê birrîn (xew), kûr.

WAKEN, *vt.i.* : hişyar kirin, hişyar bûn, ji xewê rabûn.

WAKENED, *adj.* : hişyarkirî.

WAKENING, *n.* : hişyarkirin.

WAKE-ROBIN, *n.* : gulsêyîne, orkida belek.

WAKE-UP, *n.* : darkutok, balindeyek emerîkanî ye.

WAKING-UP, *n.* : hişyarkirin, rakirin.

WALE, *n.* : şop yan şûna lêdana tajangî, bijare, helbijartin, al, la, perasûya rast ya tevnî, sirûştê tevnî yan texlîtekê vehînanê.

WALE, *vt.* : nîşan kirin, helbijartin, bijartin(şûna lêdana tajangî) diyar kirin.

WALED, *adj.* : nîşankirî.

WALER, *n.* : hespê behne (yê leşkerê hindî).

WALES, *n.* : dever yan mîrnişîna brîtanî.

WALING, *n.* : nîşankirin.

WALK, *n.* : royiştin, çûn, çûyîn (li ser pêyan), rewt, geran, pêvçûn, newişt, rêbaz.

- **ON** : karê mit yê şanoyê.

- **OUT** : ger, seyrangeh, lêdan (mangirtin).

- **OVER** : serketina asan.

WALK, *vi.t.* : çûn (ser pêyan), geran, çûn (wêve), pîvan, derbaz bûn, meşîn.

- **TO ~ AWAY FROM** : revandin (bi samahî), rizgar bûn.
- **TO ~ AWAY WITH** : rizgar bûn (tiştê ne yê wî yan wê).
- **TO ~ INTO** : êrîş kirin, çillekî xwarin û vexwarin.
- **TO ~ OFF WITH** : dizîn, feyde kirin.
- **TO ~ ONE'S CHALKS** : zû çûn.
- **TO ~ OUT** : karî lê dan, derketin (enirî).
- **TO ~ OUT ON** : dest jê berdan.
- **TO ~ OVER** : dan ser.
- **TO ~ THE CHALK LINE** : rast çûn, pak man.
- **TO ~ THE PLANK** : dest ji karî berdan (bivêt nevêt).
- **TO ~ THE STREETS** : tirekî kirin, dêhlatî kirin.
- **TO ~ THROUGH** : karê rotînî kirin.

WALKAWAY, *n.* : serketin, pêger.

WALKER, *n.* : peya, peyar.

- **LONG DISTANCE ~** : çolbirr.

WALKIE-LOOKIE, *n.* : kamereya gerok ya televizyonî.

WALKIE-TALKIE, *n.* : alavka radyoyî (hinêr û wergir).

WALK-IN, *n.* : serketina asan, êkser, mezin (navda).

WALK-UP, *n.* : avahî, xanîk yan nivîsgeha bêbilindker.

WALKING, *n.* : peyar, ger, çûn, pêçûn.

- **DELEGATE** : nuwêner yan nimînenderê gerok.
- **FAST** : zû her.
- **QUICKLY** : zeroq.
- **STICK** : qeysik.
- **TICKET OR PAPERS** : kaxezên berdanê (ji serbaziyê).

WALL, *n.* : dîwar.

- **TO RUN ONE'S HEAD AGAINST A ~** : karek dûre kirin.
- **TO SEE THROUGH A BRICK ~** : dûr dîtin (jîr).
- **BUILDING** : sewkirin (dîwar avakirin).
- **OF PARTITION** : dîwarê cudakirinê.
- **OPENING** : kunek.
- **PAINTING** : kevala dîwarî.
- **PAPER** : kaxeza dîwarî.
- **PELLITORY** : giyayê kevnedîwaran (bo mîzkirinê baş e).
- **PLATE** : depê dîwarî.
- **PLUG** : devikê dîwarî.
- **ROCKET** : heleza kevnedîwaran (gul zer û mezin e).
- **WITH ONE'S BACK TO THE ~** : berevanîkirin (barê berevaniyê).

WALLABY, *n.* : kangûrûyek biçûk e di nav daristanên Awistiralya.

WALLAROO, *n.* : kangûrûyek mezin e.

WALLBOARD, *n.* : depên dîwarî.

WALLET, *n.* : çizdan.

WALL-EYE, *n.* : çavbilogî, çavê spî (wek yê hespî, çavgilênespî, xestiya gilêneyî, çavxêla biloq, xêl, biloq.

WALL-EYED, *adj.* : xeyle, şaşî.

WALLFLOWER, *n.* : guldîwar, mirovê ko li ber dîwarî rûdinit demê semayê.

WALL HANGING, *n.* : perde yan berrika dîwarî.

WALLOON, *n.* : welatî yan zimanê Walonistanê (li Belçika ko zimanê wan fransî ye).

WALLOP, *n.* : kulma dijwar, şiyama dijwar ya kulmbazî, kartêkirina sozyarî, arandin.

WALLOP, *vi.t.* : dijwar lê dan (êkcarî), revandin.

WALLOPING, *n.* : revîna pîs, mezin, nayab, lêdana dijwar.

WALLOW, *n.* : gevizandin, rizîn, gevizîn, gevz.

WALLOW, *vi.* : (in) : gevizîn, pêş ketin.

WALLOWING, *n.* : gevz, gevizîn.

- **GROUND** : gevzik (erdê gevizînê).

WALNUT, *n.* : gûz, giwîz, giwêz, dargûz, dargiwêz, .

- **SWEET ~** : gûzê (giwêzê) bez.

WALRUS, *n.* : canewerek memikdar e û wek golikê avê ye.

WALL STREET, *n.* : kolana bazara darayî li Niw York.

WALTZ, *n.* : sema, govend yan mûzîqeya walzê.

WALTZ, *vi.t.* : semaya walzê kirin.

WALTZER, *n.* : semakerê walzê.

WAMBLE, *n.* : veweşîn, badan, dilrabûn, qirqira ûrkî, xingilîn, alan, zivirîn.

WAMBLE, *vi.* : veweşîn, dil rabûn, ûrk qirqir kirin.

WAMBLED, *adj.* : veweşî, dilrabûyî.

WAMBLING, *n.* : veweşîn, dilrabûn.

WAMPUM, *n.* : stûvankê mohrikan.

WAN, *adj., vi.t.* : nesax, sist, lawaz, pêtî, pêtî bûn, pêtî kirin.

WAND, *n.* : çogan, gopal.

WANDER, *n.* : geran, ger.

WANDER, *vi.t.* : geran.

WANDERED, *adj.* : gerayî.

WANDERER, *n.* : bapîv, gerok, geryayî, gerîde, geral.

WANDERING, *n.* : bêrê, bapîvanî, sergerdan, koçerî geran, derodero.

- **SELLER** : pîlewer, çemçî, çerçî.

WANDERINGLY, *adv.* : gerankî, bi geranî.

WANDER LUST, *n.* : viyana geranê.

WANDEROO, *n.* : meymûnek hindistanî yan sirîlankî ko kêm dibit.

WANDO, *n.* : darê okaliptûsê li rojavaya Awistraliya.

WANE, *n.* : qilotî.

WANE, *vi.* : kêm bûn, pêtî bûn, lawaz bûn, qilot bûn.

WANED, *adj.* : pêtî, lawaz (bûyî).

WAN(E)Y, *adj.* : kêmkirî, kêmdar.

WANGLE, *vt.* : fêlbazî kirin, xapandin, hejandin, qayîl kirin (xapînî), xwe rizgar kirin (ji giriftariyekê yan aporiyekî).

WANGLER, *n.* : fêlbaz, xapîn(ok).

WANGLED, *adj.* : xapandî.

WANGLING, *n.* : fêlkirin, xapandin.

WANING, *n.* : lawazbûn.

WANKLE, *n.* : **-ENGINE** : makîneya wankil ya sotina hindurî.

WANLY, *adv.* : lawazkî, bi lawazî.

WANNED, *adj.* : pêtîbûyî.

WANNESS, *n.* : pêtîbûn.

WANT, *n.* : desttengî, berteng, kêmahî, kêmayî, tengî, daxwaz, kêmatî.

- **AD** : agehiya daxwazê yan wicê.

- **OF CARE** : kêmsexbîrî.

- **OF JUDGEMENT** : kêmpendî.

- **OF SENSE** : kêmhiş.

- **OF THOUGHT** : kêmraman.

WANT, *vt.i.* : viyan (vêtin, divêtin), xwastin.

WANTED, *adj.* : viyayî, vexwestî, xwastî, berxwast.

WANTING, *prep.* : bê, kêm.

WANTON, *n., adj.* : qeşmer, felîte, dawênpîş, yarîker, belqitî, dirr, hov, sitemkar, bêqam, verestî, durê nazdar, tirek.

- **CHILD** : zarokê madguhêr yan nazdar.
- **DESTRUCTION** : wêrankirina bêmerem yan bêwate.
- **MISCHIEF** : şeytaniya bêmerem.
- **MOOD** : maddijwar.
- **WIND** : bayê dijwar.

WANTON, *vi.* : serserî bûn, dest berdayî bûn.

WANTONER, *n.* : tirek.

WANTONLY, *adj.* : qeşmerîtî, feliteyîtî.

WANTONNESS, *n.* : qeşmerîtî, felîteyîtî.

WAPIT, *n.* : pezkûviyek emerîkanî ye.

WAPPER-JAWED, *adj.* : erzînk badayî yan çîq.

WAR, *n.* : şer, ceng, kêş, dijminî.

- **CIVIL ~** : şerê birakujî yan jiyarî.
- **BATLLE** : bezma şerî yan cengî.
- **CHEST** : sindoqa şerî yan cengî (darayî).
- **CLUB** : yaneya şerî yan cengî, şerxwaz.
- **CRIMES** : tawanên şerî yan cengî.
- **CRY** : hela hela, narete, tililiyên şerî.
- **DANCE**, daweta şerî.
- **FOOTING** : lêkdan yan amadeyiya şerî.
- **GAME** : gemeya şerî yan cengî.
- **HORSE** : hespê şerî (êrîşker).
- **LORD** : serokê şerî (serokê ko karê wî şer e).
- **MATERIEL** : keresteya şerî yan cengî.
- **MONGER** : şerxwaz, şerfiroş.
- **MONGERING** : şerfiroşî.
- **OF NERVES** : şerê demaran (gef, hereşe û gurreşer anko şerê derûnî).
- **PAINT** : boyeya rûveşartinê.
- **PARTISAN** : şerê çetegerî yan pêşmergeyî.
- **PATH** : lêkdayî yan amadebûyî bo şerî.
- **PLANE** : balafira şerî yan cengî.
- **POWER** : hêza şerî yan cengî.
- **PROFITEER** : nûkîne.
- **RISK INSURANCE** : dabînkirina metirsiya şerî yan tewekeliya şerî.
- **SHIP** : şerkeştî.
- **SONG** : strana şerî.
- **TIME** : demê şerî.
- **VESSEL** : keştiya şerî.
- **WHOOP** : qîja şerî.
- **ZONE** : devera şerî.

WAR, *vi.* : şer kirin, kêşe kirin.

WARBLE, *n.* : çirîkandin, aheng, stran, şiqîn, çiçîkan.

- **FLY** : mêşa hesp û terşî.

WARBLE, *vi.t.* : strandin.

WARBLED, *adj.* : strankirî (stranî).

WARBLER, *n.* : ahengbêj, stranbêj, dengbêj.

WARBLING, *n.* : şiqîn, çirîkandin, çiçîkan.

WARD, *n.* : pasvanî, parastin, pasvan, sexbirî, girtin, zîndan, rasipêrî, rexek zîndanê yan nexweşxaneyê, tax, kelşa biçûk û teng ya kilîlê, bisporê rasipêrkirî.

WARD, *vt.* : parastin, xwe vedan, paşve bûn.

-WARD, *suff.* : paşgir e ko araste ye.

- **BACK~** : paşve.
- **FOR~** : pêşve.
- **HOME~** : bo yan ber mal ve.

- **IN~(S)** : ber hindurî ve.
- **NORTH~** : ber bakurî ve.
- **SOUTH~** : ber başûrî ve.

WARDED, *adj.* : kunkirî, didankirî.

WARDEN, *n.* : wirdiyan, zîndanvan.

WARDER, *n.* : pasvan, zîndanvan, çogan, dardest.

WARDERSHIP, *n.* : pasvanîtî.

WARD HEELER, *n.* : piştgirê ramyarî.

WARDRESS, *n.* : zîndanvan yan wirdiyan (jin).

WARDROBE, *n.* : dolab.

WARDROOM, *n.* : rexê efseran (şerkeştî).

WARDSHIP, *n.* : rasipêrî, pasvanî, şagirdî.

WARE, *n., adj.* : kotal, aman, pertal, kalot, wurya, têgehiştî, hişyar.

- **HOUNDS** : tajiyên pasvaniyê.
- **HOUSE** : kogeh, embar.
- **ROOM** : jora embarkirinê.
- **TRAPS** : telheya hişyariyê.
- **WIRE** : têla hişyariyê.

WARE, *vt.* : hişyar bûn, xwe vedan, xerc kirin, embar kirin (nemaze kel û pelî).

WARED, *adj.* : agehkirî.

WARES, *n.* : pertal, kutal, aman.

WARFARE, *n.* : şer, ceng.

WARFARIN, *n.* : warferîn, derman e, kirindekuj e.

WARILY, *adv.* : bi hişyarî.

WARINESS, *n.* : haş, hayjê.

WARING, *n.* : agehkirin.

WARISON, *n.* : borîzana (deng) êrîşê.

WARLIKE, *adj.* : cengî, şerxwaz.

WARLOCK, *n.* : cadûbaz, xirsker.

WARM, *n., adj.* : germ, têhnşîr, şiletên.

- **ARM BLOODED** : xwîngerm.
- **ARM COUNTRIES** : welatên germ.
- **FRONT** : ber yan bereyê germ.
- **HEART** : dilovanî.
- **HEARTED** : dilovan, dilnerm.
- **HEARTEDLY**, *adv.* : dilovankî, bi dilovanî, bi dilnermî.
- **HEARTEDNESS** : dilovanîtî, dilnermîtî.
- **SPOT** : xalka germ (sehker e), hezkirîn.
- **WATER** : ava têhnşîr.
- **WEATHER** : seqayê germ.

WARM, *vt.i.* : germ bûn.

- **TO ~ UP** : germ kirin (xwarin), germ bûn.

WARMED, *adj.* : germkirî.

WARMER, *n.* : germker, germtir.

WARMING, *n.* : germkirin.

- **PAN** : axlewîk.

WARMISH, *adj.* : piçekê germ.

WARMLY, *adv.* : germkî, bi germî.

WARMTH, *n.* : germî.

WARM-UP, *n.* : germbûn.

WARN, *vt.* : agehdar kirin.

WARNED, *adj.* : haydayî, qewîtîkirî.

WARNER, *n.* : agehker.

WARNING, *n.* : hişdarî, agehkirin, agehî, terîr, hay, haydan, pelikandin, qewîtî, şîret, agehdarî, pend, agehdarkirin, agadarkirin.

WARNINGLY, *adv.* : bi agehdarî.

WARP, *vt.i., n.* : badan, xwehr kirin, la dan, badan, xwehrî, bendek, binyat, benê dirêjê tevnî, werîsê gemiyê, lîm.

- **BEAM** : pêça benî.
- **AND WOOF** : binyat.

WARPED, *adj.* : xîs.

WARRANT, *n.* : rêdan, destûr, destebarî, bihane, dirûv, bîrname.

- **OFFICER** : cêgir yan cîdarê efserî, sedvanyar.

WARRANT, *vt.* : dupat kirin, desteber kirin, destûr dan, rewa kirin, behane kirin, dirûv kirin.

WARRANTABLE, *adj.* : behanebar, mehanebar.

WARRANTABLENESS, *n.* : behanebarîtî.

WARRANTABLY, *adv.* : bi behaneyî, behanekî.

WARRANTEE, *n.* : destberdar.

WARRANTER, *n.* = **WARRANTOR.**

WARRANTOR, *n.* : desteber.

WARRANTY, *n.* : desteberî.

WARRED, *adj.* : şerkirî, cengkirî, kêşekirî.

WARREN, *n.* : nêçîrgeh, mafê nêçîrê, kêvrûşgeh, kêvrûşkên vê dirê.

WARRENER, *n.* : nêçîrgehvan, xudanê kêvrûşkgehê.

WARRIGAL, *n., adj.* : kûvî, nekehîkirî, (hesp), seyê kûvî.

WARRING, *n.* : şerkirin.

WARRIOR, *n.* : şerker, şervan, cengawer, cengbaz, cengvan, şerkar, şêranî.

WARAW, *n.* : texlîtek masî ye.

WARSAW, *n.* : serekbajêrê Polonya.

WARS(T)LE, *vt.* : xebat kirin, bizav kirin, kêşe kirin, gemş kirin.

WART, *n.* : balûke, balîke, behlûke, behlûlk, belalûk.

- **GRASS** : giyabehlûlk (bo dermanî).

- **WEED** : firîzîbehlûlk (bo dermanî).

WARTED, *adj.* : behlûlkirî.

WARTHOG, *n.* : berazê kûvî yê Efrîqayî.

WARTLESS, *adj.* : bê behlûlk.

WARTY, *adj.* : behlûlkeyî, balîkeyî, behlûlkî.

WARY, *adj.* : çavvekirî, hişyar.

WAS, *p.* **OF IS** : bo.

WASH, *n., adj.* : şûştin, beravkirin (balavkirin), celal, hinîn, boye, lîm, gotin yan axiftina pûç, hinîna tenik.

- **BASIN** : text, şikev, avsong.

- **BOARD** : depê şûştinê.

- **BOILER** : qazana şûştinê (avkelandinê).

- **BOTTLE** : alavka bijînkirina xazan.

- **BOWL** : text, pêşok, beravxane (balavxane), avsong.

- **CLOTH** : perûkê şûştina amanan.

- **DAY** : roja şûştina cilan, roja balavê.

- **HAND-BASIN** : pêşok.

- **HOUSE** : beravxane (balavxane).

- **LEATHER** : nermeperûk, kuderî.

- **OUT** : ramalîn.

- **RAG** = **WASH CLOTH.**

- **ROOM** : şûştingeh, avdest (li aşxaneyê), avrêj.

- **STAND** : pêşok.

- **TUB** : teşt yan teşta şûştinê.

- **WOMAN** : jina cilşo.

WASH, *vt.i.* : şûştin.

- **TO ~ CLOTHES** : cil şûştin.

- **TO ~ DOWN** : xwarin birin xarê (daûran) bi vexwarinê.

- **TO ~ OUT** : wêran kirin (pirê), lawaz kirin, reng pêtî kirin, paqij kirin.

- **TO ~ UP** : dest û çav şûştin, aman şûştin.

WASHABILITY, *n.* : şûştinbarî(tî).

WASHABLE, *adj.* : şûştinbar.

WASH AND WEAR, *adj.* : şûştin û liber xwe kirin.

WASHED, *adj.* : şûştî.

- **OUT** : qerimî, mandî, pêtî.

- **UP** : mandî, westayî, bêzar, gelek qerimî.

WASHER, *n.* : şo, cilşoya xwekar.

- **WOMAN** : jina cilşo.

WASHER, *n.* : waşer, xelekek lastîk yan metalî bo mukimkirina girtinê yan nehêlana delandinê.

WASHERY, *n.* : şûştingeha komirî.

WASHING, *n.* : şûştin, berav (balav), beravkirin (balavkirin), şîştin, arav.

- **MACHINE** : cilşo, beravek (balavek).

- **RECEPTACLE** : legen.

- **STAND** : pêşok.

WASHINGTON, *n.* : serekbajêr yan serekpaytextê wîlayetên yekgirtî yên Emerîka.

WASHINGTONIA, *n.* : texlîtek darqespa Kalîforniya.

WASHILY, *adv.* : bi lawazî.

WASHINESS, *n.* : lawazîtî, rohnîtî.

WASHY, *adj.* : bêqam avî (rohn, ne tîr), pêtî, tenik.

WASP, *n.* : stêng, stang, mozqirtik, moz, zilkêtk.

- **BEE** : mêşa zilkêtkî.

- **BEETLE** : kêza wek zilkêtkê.

- **FLY** : mêşa zilkêtkî.

- **WAIST** : kemera stêngî, kemera gelek zirav.

WASP, *abbr.* **WHITE ANGLO-SAXON PROTESTANT** : pirotiyê spî yê anglo-saksonî.

WASPISH, *adj.* : stêngî, zilkêtkî.

WASPISHLY, *adv.* : stêngkî.

WASPISHNESS, *n.* : stêngî(tî), zilkêtkîtî.

WASSAIL, *n.* : nûşecan, nûşcan, nûşîcan! ahenga vexwarinê.

WASSAIL, *vi.t.* : nûşîcan kirin, bêqam vexwarin, stranên cejna zayînê gotin.

WASSERMAN REACTION OR TEST, *n.* : azmûna waserman, bo sehkirina nesaxiya firengî yan ateşekê (sûsenek).

WASTAGE, *n.* : zehî.

WASTE, *n., adj.* : zehî, xult, çol, paşmawe, beyar, firro.

- **TO GO OR RUN TO ~** : zehî bûn.

- **TO LAY ~** : kavil kirin, wêran kirin, herifandin.

- **BASKET** : selka gilêşî.

- **ENERGY** : wizeya zehî.

- **HEAP** : gûfik.

- **LAND** : çol, beyar.

- **PAPER** : kaxezên zehî.

- **PIPE** : boriya pîsavê.

- **PRODUCTS** : paşmayî, berhemên zehî.

- **WATER** : pîsav, ava bikarhatî.

WASTE, *vt.* : zehî kirin.

WASTED, *adj.* : zehîkirî.

- **FRUITS AND VEGETABLES** : simîte.

WASTEFUL, *adj.* : zehîdar.

WASTEFULLY, *adv.* : bi zehîkirinî.

WASTEFULNESS, *n.* : zehîtî.

WASTELESS, *adj.* : bê zehî.

WASTER, *n.* : zehîker, destberdayî.

WASTING, *adj.* : zehîkirinî, lawazker, kavilkerî.

WASTREL, *n.* : bapîv, destberdayî, kêrnehatî, tiştê zehîkirî, zehîker.

WATCH, *n.* : demjimêr, zêrevanî, nêrevanî, katjimêr.

- **BAND** : kostek.

- **BRACELET** : kostek.

- **CAP** : kulavê deryavanî.

- **CASE** : nixêva metalî ya demjimêrê.

- **CHAIN** : zincîra demjimêrê.

- **DOG** : seyê pasvaniyê, zêrevan.

- **FIRE** : agirê pasvanî yan pasvaniyê.

- **GLASS** : cama demjimêrê.

- **GUARD** : zencîr yan benê demjimêra berîkî.

- **HAND** : mil.

- **KEY** : kilîla demjimêrê (bo barkirinê).

- **MAKER** : demjimêrvan, demjimêrçêker.

- **MAKING** : demjimêrçêkirin.

- **MAN** : pasewan, dîdevan.

- **NIGHT** : nivêja dirêj nemaze ya şeva sala nû.

- **POCKET** : berîka demjimêrê.

- **TOWER** : birca zêrevaniyê.

- **WORD** : peyiva serekî ya seretayên partekê, perûl.

WATCH, *vi.t.* : dîtin, nêrîn, temaşe kirin, zêrevanî kirin.

- **TO ~ ONE'S TIME** : li hîviya delîveyê man.

- **TO ~ OUT** : hişyar bûn, wurya bûn, hay ji xwe hebûn.

WATCHED, *adj.* : zêrevanîkirî, temaşekirî.

WATCHER, *n.* : şehne, temaşeker, bînende, dîdevan, temaşevan, çavdêr, bîner.

WATCHFUL, *adj.* : wurya, hişyar.

WATCHFULLY, *adv.* : bi wuryayî, bi hişyarî.

WATCHFULNESS, *n.* : hişyarîtî.

WATCHING, *n.* : temaşekirîn, temaşe, dîdevanî, dîtin, nêrîn, çavdêrî, bînîn.

WATER, *n., adj.* : av, aw, derya, ger, radan, xêzaw, rondik, firmêsk, mîz, derhînana qoçanên darayî bê pitirkirina sermayeyî.

- **ABOVE ~** : dûr ji derdî.

- **IN DEEP ~** : giriftar, ketî bin derdekê yan tûşî girftariyekê bûyî.

- **IN LOW ~** : tengav, destteng.

- **IN SMOOTH ~** : pêşketî, bê giriftarî.

- **ON THE ~** : di nav keştî de ye, li ser gemiyê, bi rê ketiye.

- **TO DRINK THE ~** : çûn germava bo kanav û ten dirustiyê.

- **TO GET INTO (BE IN) ~** : tûşî giriftariyê bûn.

- **TO GO ON THE ~ WAGON** : êdî meyê venaxwit.

- **TO GO THROUGH FIRE AND ~** : ketiye ber derdek giran.

- **TO HOLD ~** : dîtane rast e û xwe li ber rexneyê digirit.

- **TO KEEP ONE'S HEAD OR ONESELF ABOVE ~** : xwe ji giriftariyan vedan.

WATER, *vt.i.* : av dan.

WATER BACK, *n.* : paşav, sarinc yan boriya li paş koçkî bo dabînkirina ava germ.

WATER BAG, *n.* : meşk.

WATER BALLET, *n.* : semaya avê ko melevan dikin.

WATER BEETLE, *n.* : kêza avî.

WATER BIRD, *n.* : balîndeyê avê.

WATER BISCUIT, *n.* : biskîta avî (ar û av).

WATER BLISTER, *n.* : zîpke yan pirzîka avî (bê kêm (nêm) û xwîn).

WATER BLOOM, *n.* : koma kevzê.

WATERBORNE, *n.* : serav.

WATER BOTTLE, *n.* : gogim, şûşe, botlê avê : avguhêz nemaze bi gemiyê.

WATER BOY, *n.* : avbir, kurkê ko avê didit girûhekê wek yarîkerên tepka pê.

WATER BRAIN, *n.* : nesaxiyek pezî (mejî, kirmoke dibit.

WATER BUCK, *n.* : pezkûvî yan asikê avê, yên ko hez jî av û çiravan dikin.

WATER BUFFALO, *n.* : gamêşê avê.

WATER BUG, *n.* : avpêşî.

WATER CANAL, *n.* : co, coya avê.

WATER CARRIER, *n.* : avbir.

WATER CHESTNUT OR WATER CALTROP : şahberrûya avê.

WATER CHIQUAPIN, *n.* : zebata avê.

WATER CLOCK : demjimêra avê.

WATER CLOSET, *n.* : destav, avrêj, avdest.

WATER COCK, *n.* : corne.

WATER COLOUR, *n.* : kevala avî, rengê avê, boyeya neqşî ya têkilî ava nerûnî kirî.

WATER COLOURIST, *n.* : hunermendê (kevalên) avî, yê ko bi rengê avî neqş dikit.

WATER COOL, *vt.* : (bi avê) sar kirin.

WATER COURSE, *n.* : celal, awero.

WATERCRAFT, *n.* : gemî, keştî, belem.

WATER CRAKE, *n.* : balindeyek avî ye.

WATERCRES, *n.* : pêrpîn.

WATER CURRENT, *n.* : tîra avê, rewteka avê, sîlav.

WATER CYCLE, *n.* : duçerxa avî.

WATER DOG, *n.* : seav.

WATERED, *adj.* : avdayî, beravî, avdar, avî.

WATERFALL, *n.* : rêjav, sûlav, tavgeh, şîp, firek, avşor.

WATER-FAST, *n.* : avgir.

WATER FORD, *n.* : **-GLASS** : şûşeyê rohn û bêreng yê beristeyî.

WATERFINDER, *n.* : avger.

WATER FLEA, *n.* : kêça avî.

WATER FLOW, *n.* : avrewanî.

WATER FOWL, *n.* : balindeyê avî nemaze yê melevan.

WATER FRONT, *n.* : berav.

WATER GAP, *n.* : kelşa avê, kelşa di nav sirta çiyayan de ko rûbar têre diçit.

WATER GAS, *n.* : xaza avî (jehr e) bo êzîng û ronahîkirinê.

WATER GATE, *n.* : dergehê avê.

WATER GAUGE, *n.* : avpîv (di sarinc yan qazanê de).

WATER GLASS, *n.* : şûşeyê avê (bo zêrevaniyê), demjimêra avê, tiranê avê, avpîv.

WATER GUARD AND DISTRIBUTOR : mîrav.

WATER GUM, *n.* : şirêza avê, darek şirêzî ye û li ber avê şîn dibit.

WATER GUN, *n.* = **WATER PISTON.**

WATER HAMMER, *n.* : kutana avî, dengê kutana avê gava li boriyan didit.

WATER HEMLOCK, *n.* : sokerana avî (jehrî ye).

WATER HEN, *n.* : mirîşka avî, mirêk, mirîşkbeşk.

WATER HOLE, *n.* : kuna avî, kunek xuristî ye av tê de heye, kuna ser seholê.

WATER HYACINTH, *n.* : gulek avî wek zebatî ye.

WATER ICE, *n.* : befroka avî, şirînayiya seholê (av û şekir û tamdarî).

WATER INADEQUACY, *n.* : kêmav.

WATER INCH, *n.* : înca avî.

WATERINESS, *n.* : avîtî.

WATERING, *n.* : avdan, lêrik, dilop, delên.

- **HERD** : veherandin, garan avdan.

- **PLACE** : kanî, jêderê avê.

- POT OR CAN : amanê pizirûkê.

WATER JACKET, *n.* : saqo yan nixêvka avê, ko av têre diçit bo sarkirina parçeyên germ yên hindurî yên makîneyê nemaze stûnkên otomobîlê.

WATER JUG, *n.* : cewdik.

WATER JUMP, *n.* : gîroya avê wek ger yan çala avê ko pêdivêt hesp li ser re bazbidit li pêşbezîna hespan.

WATER LEAF, *n.* : belgavî, helezek belg didankî û avî ye.

WATERLESS, *adj.* : bê av.

WATERLESSNESS, *n.* : bêavîtî.

WATER LEVEL, *n.* : rêkara avî.

WATER LILY, *n.* : zebat, nîlûfer.

WATERLINE, *n.* : hêla avê, li rexê gemiyê ko kûratiya avê diyar dikit.

WATER LOGGED, *adj.* : tejî av.

WATERLOO, *n.* : derb yan lêdanek dijwar, pêşbirkêya vebirr.

WATER MAIN, *n.* : boriya serekî ya avê.

WATERMAN, *n.* : gemîvan, şelpîkar.

WATERMANSHIP, *n.* : gemîvanî.

WATERMARK, *n.* : nîşana avê, nîşana di nav tevnê kaxezê de ya ko bi tenê diyar dibit hînga dikevit navbera ronahî û çavî de.

WATERMARK, *vt.* : kaxez "dax" kirin bi nîşana avê, neqş kirin wek nîşana avî.

WATERMELON, *n.* : zebeş, şeftî, şûtî.

WATER METER, *n.* : avpîv.

WATER MILFOIL, *n.* : hezarbelga avî.

WATER MILL, *n.* : aşav, aşê avê.

WATER MOCASIN, *n.* : mokasinê avê, marê avê.

WATER NYMPH, *n.* : periya avê.

WATER OAK, *n.* : berrûya avê.

WATER OF CRYSTALIZATION, *n.* : ava belûrbûnê.

WATER OF HYDRATATION, *n.* : ava pêkhatî yan awêteyî (madeyek li gel avê).

WATER OF LIFE, *n.* : ava jînê.

WATER PASSAGE, *n.* : borr.

WATER PEPPER, *n.* : bîbera avê, texlîtek giyagirêçk e li erdê avî şin dibit.

WATER PIMPERNEL, *n.* : rizyankrûvî.

WATER PIPE, *n.* : boriya avê.

WATER PIPE FLOW, *n.* : avkişîn.

WATER PISTOL, *n.* : debanceya avî (bo zarokan).

WATER PITCHER, *n.* : mesîn.

WATER PLANTSIN, *n.* : zirna yan zurna ya şivanî, giyayek avî yan çiravî ye.

WATER POLO, *n.* : yariya polo di nav avê de.

WATER POOL, *n.* : avzivêrk, avgerk.

WATER POL (WITH SPOUT), *n.* : mesîn.

WATER POWER, *n.* : hêza avê, bo karê alavan, sûlava bo vî karî, mafê avê.

WATER PROOF, *n., adj., vt.* : dij yan bergirê avê, perûkê dij avûbaranê, xwe li ber avê girtin.

WATER PROOFER, *n.* : bergirê avê.

WATER PROOFING, *n.* : bergirkirina avê.

WATER PUMP, *n.* : avhilmij.

WATER RAM, *n.* : kutekê avê (hîdrolîkî).

WATER RAT, *n.* : mişk yan cirdê avê, bapîv yan dizê beravê.

WATER REPELLENT, *n.* : avdûrker.

WATER RESISTANT, *adj.* : av bergir.

WATER RIGHT, *n.* : mafê avê.

WATER SAPPHIRE, *n.* : safîr (berê hêja) yê avê.

WATER SCORPION, *n.* : dûpişkê avê.

WATER SEAL, *n.* : avgirtek.

WATER SEWAGE, *n.* : coka sikavê.

WATERSHED, *n.* : gera ava baranê ko av jê diçit rûbarî.

WATER SHIELD, *n.* : metalê avê, helezek avî ye.

WATERSIDE, *n., adj.* : berav.

WATER SKI, *n.* : hilîsoka avê, alava hilisîna seravê.

WATER-SKI, *vi.* : hilisîna ser avê kirin (yarî).

WATER SKIN, *n.* : meşk, dîvavk.

- **SMALL ~** : şîp, şirav.

WATER SNAKE, *n.* : maravî, marê avî.

WATER-SOAK, *vt.* : (di avê da) şil kirin.

WATER SODA, *n.* : ava soda, ava qilê.

WATER SPAMIEL, *n.* : tîle, se yan tajiyê avî yê ko têr mûyê gij e û li nêçîrê balindeyên avî digirit.

WATER SPOT, *n.* : piniya avê, nesaxiyek meyweyî.

WATERSPOUT, *n.* : şurik.

WATER SPRAYING, *n.* : avweşîn.

WATER SPRINKLER, *n.* : avêj.

WATER SPRINKLING, *n.* : avweşandin, avweşîn.

WATER SPRITE, *n.* = **WATER NYMPH.**

WATER STRIDER, *n.* : pêşiya lingdirêj ya ko li ser ava peng diçit.

WATER SUPPLY, *n.* : jiyandin yan azoqeya avê.

WATER SYSTEM, *n.* : rêzika avê, rûbar û çem û zê, jêderê avê.

WATER TABLE, *n.* : rêkara ave, ko erd li bin de têrav e, dîwarkê parastina avahiyekê li dijê avê.

WATER THRUSH, *n.* : balindeyê strankar yê avî.

WATERTIGHT, *n.* : avgir, dijav, bêguman.

WATER TOWER, *n.* : birca avê, boriya avê, alavka agirkuj.

WATER VAPOUR, *n.* : hilm yan helma avê.

WATER-VASCULAR SYSTEM, *n.* : rêzika amanî ya avê.

WATER VESSEL, *n.* : gogim.

WATER WAVE, *n., vt.* : pêla avê, av pêl kirin, pirç yan por wek pêla avê çêkirin.

WRIGGLING, *n.* : alandin, badan.

WRIGGLY, *adj.* : alandî.

WRIGHT, *n.* : çêker, karker, pêşeker.

WRING, *n.* : givaştin.

WRING, *vt.* : givaştin, badan, xwehr kirin, eşkence dan, bi zorî standin, êşandin, (dest bi germî) hejandin (bo xêrhatinê).

- **TO ~ NECK (OF)** : stû badan, mirîşk kuştin, pêçan.

WRINGER, *n.* : givaştek, bezirxan(e).

WRINGING, *n.* : givaştin, çemandin.

WRINKLE, *vt.i.* : qurmiçîn, qurmiçandin.

WRINCKLED, *adj.* : qurmiçî, kirmişî, qurmiçandî, rûqurmiçî, çirç.

WRINCKLY, *adj.* : qurmiçî.

WRIST, *n.* : zend, bazinê destî, lep, meçek.

WRISTBAND, *n.* : bazinê zendî, bazinê kumlekî.

WRIST DROP, *n.* : şehitiya (falincî) masûlkeyên zendî (ji ber jehrbûna qurquşmî).

WRISTLET, *n.* : bazink.

WRISTLOCK, *n.* : girtina zendî (li gemşê).

WRIST WATCH, *n.* : demjimêra destî, katjimêra dest.

WRISTY, *adj.* : zendî.

WRIT, *n.* : fermana dadgehî, nivîsîna pîroz, belgenameya mîrî.

- **OF ASSISTANCE** : fermana harîkirinê.

- **OF ELECTION** : fermana helbijartinê.

- **OF PROHIBITION** : fermana qedexekirinê yan tembîkirinê.

- **OF PROTECTION** : fermana parastinê (hatin, çûn û man).

WRITABLE, *adj.* : nivîsbar.

WRITE, *vi.t.* : nivîsîn, danan tomar kirin.

- **TO ~ DOWN** : nivîsîn, tomar kirin, bihayê xwe kêm kirin, bihayê pertalî kêm kirin.

- **TO ~ IN** : (bê pîvan) kirin nav belgename yan devî de, navekê berdan ser kaxeza dengdanê.

- **TO ~ OFF** : rakirin, biha kêm kirin.

- **TO ~ OUT** : nivîsîn, tomar kirin, şiyana xwe ya torevanî kêm kirin (hindî gelek dinivîsit).

- **TO ~ UP** : gazî kirin ber dadgehê, bi dirêjî rave kirin, dûmahîk darîştin, pesin nivîsîn.

WRITE-DOWN, *n.* : kêmkirina bihayê pertalî.

WRITE-OFF, *n.* : hilqetandin, rakirin.

WRITER, *n.* : nivîser, nivîsevan, nivîskar, wêjevan, torevan, wêjer, nûser, hozan.

- **'S CRAMP** : êşa dest û tilan ji ber gelek nivîsînê, pirka nivîserî.

WRITE-UP, *n.* : gotar : nemaze rexne, zêdekirina bihayê pertalî.

WRITHE, *n.* : badan.

WRITHE, *vi.t.* : pêçan, alandin, badan, alîn, vehînan.

WRITHED, *adj.* : badayî.

WRITHING, *n.* : badan.

WRITING, *n.* : nivîsîn, reşbelek, nivîs, nivîsar, nivîsandin, nûsîn, nivîsok, nûsewerî.

WRITING BOOK, *n.* : defter.

WRITING DESK, *n.* : mêza nivîsînê.

WRITING-IN, *n.* : berdan ser.

WRITING PAPER, *n.* : kaxeza nivîsînê.

WRITING POETRY, *n.* : helbestnivîsîn.

WRITING TABLE, *n.* = **WRITING DESK.**

WRITTEN, *pp.* **OF WRITE** : nivîsî.

WRITTEN, *adj.* : nivîsî, nivîskî.

WRITTEN TEST : azmûna nivîskî.

WRONG, *adj.* : çewt, çemt, sitem, ayil, hele, azar, ne dirust, ne rast, têşikan.

- **IN THE ~** : çewt, berpirs, sûçdar.

- **IN ~ BOX** : ketiyê, tûşbûyî.

- **ON THE ~ SIDE OF FIFTY** : (jî yan temen) jî pêncî (sal) pêtir e yan borî ye.

- **TO DO ~ TO SOMEBODY** : zordarî lê kirin.

- **TO GO ~** : bi ser neketin, rê winda kirin.

- **TO PUT A PERSON IN THE ~** : mirovek çewt yan sûçdar hînan der.

- **TO TAKE THE ~ TURNING OR PATH** : rêya xirab yan çewt girtin.

WRONG ANSWER, *n.* : çewtebersiv, bersiva çewt.

WRONGDOER, *n.* : gunehkar, zordar, sitemkar.

WRONGDOING, *n.* : zordarî, gunehkarî, sitemkarî.

WRONGED, *adj.* : sitimandî.

WRONGFONT, *n.* : tîpa çapî ya neasayî.

WRONGFUL, *adj.* : nerewa, zordar, sitimdar.

WRONGFULLY, *adv.* : zordarkî, bi zordarî.

WRONGFULNESS, *n.* : zordarîtî.

WRONGHEADED, *adj.* : rikdar (hizra çewt bernadit).

WRONGING, *n.* : zordarîkirin.

WRONGLY, *adv.* : çewtkî, bi çewtî, bi zordarî, zordarkî, bi nehêjayî.

WRONGNESS, *n.* : çewtîtî, nerastîtî.

WRONG OPINION, *n.* : hizra çewt.

WRONGOUS, *adj.* = **WRONGFUL** (çewt, nerewa, neqanûnî).

WRONG SIDE, *n.* : rexê çewt.

WRONG WAY, *n.* : rêya çewt.

WROTE, *p.* OF **WRITE** : nivîsî.

WROTH, *adj.* : bêqam enirî, har.

WROUGHT, *adj.* : çêkirî, xemilandî, arandî, qutandî.

- **IRON** : asinê nerm, asinê guncayî.

- **UP** : girgîn.

WRUNG, *adj.* : bada(yî).

WRY, *vt.i.* : badan.

WRY, *adj.* : xîs, xwehr, xahr, tirane, badan (rû).

- **TO MAKE A ~ FACE** : rûyê xwe tal û tirş kirin.

WRYFACE, *n.* : rûbadan (nîşana bêzariyê).

WRYING, *n.* : badan (rû bi tirane).

WRY MOUTH, *n.* : dev badan yan miçandin (nîşana bêzariyê).

WRY-MOUTHED, *adj.* : (rûbaziya) tiraneyî.

WRYNECK, *n.* : balindeyek biçûk û stûdirêj ya ko serê xwe badidit li ser milî (wek darkutakî ye).

WRYNESS, *n.* : badanîtî.

WULFENITE, *n.* : wulfenît, molîbdatên qurquşmî.

WUNDERKIND, *n.* : xurtî bêqam serketî.

WURTZITE, *n.* : wurtzît, kibritîdê zinkî.

WYANDOTTE, *n.* : mirîşkek nijad emerikanî pêgotiye bo hêkan.

WYCH, WICH OR WITCH, *pref.* : pêşgirên navên daran in.

WYCLIFFITE, *n.* : wayklîf, bawermendê ola çakerê ayînî .

WYE, *n.* : tîpa (Y) yan şiklê hosa.

WYLIECOAT, *n.* : kiras nemaze bin kiras.

WYND, *n.* : kolanka teng (Skotlandî).

WYVERN, *n.* = **WIVERN.**



X, x : êks : tîpa bist û çarem ya eflabêya înglîzî.

XANADU, *n.* : direk yan şûnek (gund, bajêr) bêqam ciwan.

XANON, *adj.* : seretayî, hov.

XANTH-, *pref.* : pêşgir e kozer e, tirşî ye, zerîk e.

XANTHATE, *n.* : zantêt, xwêya tirşiya zerîk.

XANTHENE, *n.* : zantîn, pêkhatî yan awêteyek spî û belûrî ye.

XANTHENE DYE : heşa zantînî.

XANTHIC, *adj.* : zer, zerîn.

XANTHIC ACID, *n.* : tirşiya zerîn.

XANTHIN, *n.* : zerav.

XANTHINE, *n.* : ksantîn, pêkhatî yan awêteyek nîtrojenî ya belûrî ye, pewendîdarê tirşiya mîzê ye, di nav mîz û xwînê û hindek tevnên canewerî û helezî de heye.

XANTHIPPE, *n.* : zantip, jina zimandirêj ya siqratî, jina çirtok ya bedmad (şetah).

XANTHO- = XANTH.

XANTHOCROID, *n., adj.* : zerkok.

XANTHONE, *n.* : ksanton : çend texlîtek heşên zer.

XANTHOPHYLL, *n.* : ksantofîl, zere, boyeya zer ya helezî (di nav tov û belgan de).

XANTHOPHILLIC, *adj.* : ksantofilî, zereyî.

XANTHOUS, *adj.* : zer, mexolî.

X-AXIS, *n.* : tewereyê êîks (X).

X-CHROMOSOME : heşa êksê (X), heşek zayendî ye ya ko kartêkirinek serekî heye li ser zayendê pizî.

X-COORDINATE, *n.* : hevpayeyê îksê (X), tewereyê îks (X).

X-DISEASE, *n.* : nesaxiya îks (X) : nesaxiyek vîrûsî (ho û binyat nezan).

XEBEC, *n.* : keştiyek biçûk û sê babirekî (bo deryagiriyê bi kar dihat).

XEN(O)-, *pref.* : pêşgir e kogêre ye, biyanî ye.

XENIA, *n.* : qutank, kartêkirina yekserî ya qutana meyweyî yan tovî ji ber qutana durehî.

XENIAL, *adj.* : mêvandarî.

XENOBIOTIC, *n., adj.* : pêkhatiyek yan awêteyek kîmyayî ye (derman û pêtik kuje).

XENODIAGNOSIS, *n.* : sehkirina mişexwerî.

XENODIAGNOSTIC, *adj.* : pêwendîdarê sehkirina mişexwerî.

XENOGAMY, *n.* : peyînkirina du rehî yan melezî.

XENOGENIC, *adj.* : pêwendîdarê texlîtek dî.

XENOGRAFT, *n.* : yekgirtina nijdariya tevnî ya di navbera texlîtekên têvel de.

XENOLITH, *n.* : kevirê biyanî.

XENON, *n.* : (ek)zênon, hêmanek xazî û xav (neçalak) û giran.

XENOPHILE, *n.* : biyanîxwaz.

XENOPHOBE, *n.* : tirsayî ji biyanî.

XENOPHOBIA, *n.* : tirsîn ji biyanî.

XENOPHON, *n.* : Ksênofon, fermandarê grekê dehhezaran û nivîserê kitêba Anabasîs ko çiroka pêşveçûna leşkerî ya Korişê Ecem û paşî kuştina Korişî û vegerîn yan paşveçûna Grekan bo welatê xwe ko di Kurdistanê re borîn sala 401 b.z. (şeş rojan) şerê Kurdan kirin û bo yekem car di dîrokê de navê Kurdan hat wek milletekê (Grekan navê Kurdan Kardûxoy nîşan kirin).

XENOPLASTIC, *adj.* : dûrî (ne xizmî).

XENOTROPIC, *adj.* : berhemdarê di xaneya biyanî de.

XER(O)-, *pref.* : pêşgir e ko zuha ye, hişk e.

XERANSIS, *n.* : hişkbûn, zuhabûn.

XERANCH, *adj.* : şînbûyî li derek yan şûnek hişk.

XERANTHEMUM, *n.* : helezek salîne ye (yek sal dirêj dikit) gul pêkhatî ye û herdemî ye.

XERIC, *adj.* : pêwendîdarê kêmnemî.

XERODERMA, *n.* : çermhişkî, nesaxiyek çermî hişk, req û kelpikî dikit.

XERODES, *n.* : perçiftin yan pejbûna hişk.

XEROGRAPH, *n.* : wênezuha.

XEROGRAPHIC, *adj.* : wênezuhayî.

XEROGRAPHICALLY, *adv.* : bi wênezuhayî.

XEROGRAPHY, *n.* : wênegiriya zuha.

XEROPHILE, *adj.* = **XEROPHILOUS.**

XEROPHILOUS, *adj.* : hişkwerarî yan kêmnemwerarî.

XEROPHILY, *n.* : kêmnemwerarî yan hişkwerarîtî.

XEROPHTHALMIA, *n.* : hişkî (yan zuhayî)ya çavan.

XEROPHTHALMIC, *adj.* : pêwendîdarê zuhayiya çavan.

XEROPHYTE, *n.* : hişkxwaz, heleza sehrayî.

XEROPHYTIC, *adj.* : hişkxwazî.

XEROPHYTISM, *n.* : hişkxwazîtî.

XERORADIOGRAPHY, *n.* : wênegirtina tîrêjî nemaze bo sehkirina penceşêra memikî.

XEROTHERMIC, *adj.* : germehişk, werarê deverên germ û hişk.

XEROX, *n.* : nîşanek bazirganiya wênegirî ye.

XEZON, *n.* : bayê xav yê giran.

XHOSA, *adj., n.* : xosa, welatî yan zimanê gelê Bantu li devera Kêp (başûra Efrîqa).

XIPH-, XIPHI-, XIPHO-, *pref.* : pêşgir e ko şûr e.

XIPHISTERNUM, *n.* : sîng hestiyê wek şûrî.

XIPHOID, *n., adj.* : wek şûrî.

XIPHOID APPENDAGE : berdansera wek şûrî.

XIPHOID CARTILAGE : kirkiroka wek şûrî.

XIPHOSURAN, *n., adj.* : dûvşûr.

XMASS, *n.* : (**CHRISTMAS**), cejna zayîna Îsa pêxemberî.

XOANON, *n.* : seretayî.

X-RADIATION, *n.* : tîrêja X.

X-RAY, *n.* : tîrêja X, tîşkî X.

X-RAY ASTRONOMY, *n.* : stêrzaniya derkirina tîrêja X.

X-RAY EXAMINATION, *n.* : sehkirin yan azmûnkirina bi tîrêja X.

X-RAY PHOTOGRAPH : wêneyê tîrêja X.

X-RAY THERAPY : çarekirin bi tîrêja X.

X-RAY TUBE, *n.* : lûleya tîrêja X.

X-RAY SECTION, *n.* : tîşa (teş) tîrêja X.

X-RAY SECTIONAL, *adj.* : tîşiya tîrêja X.

XYL-, *pref.* : pêşgir e ko dar e.

XYLAN, *n.* : ksîlan, pêntozanê zer yê şirêzî di nav dîwarên helezî û tevnê darî de.

XYLEM, *n.* : ksîlem, parçeya darî ji helezî.

XYLENE, *n.* : ksîlîn, yek ji sê pêkhatî yan awêteyên hîdrokarbonê ayzomerî ko ji qetrana rejûyê dihînin der bo çêkirina boyeyan.

XYLIC ACID, *n.* : tirşiya ksîlînî.

XYLIDINE, *n.* : ksîlîdin, pêkhatî yan awêteyek îzomerî ji ksîlînê dihînin der.

XYLITOL, *n.* : alkuholek belûrî ye ji şekira darî derdikevit (bo şirînkirinê).

XYL(O)-, *pref.* : pêşgir e ko dar e.

XYLOCARP, *n.* : darê meywehişk (wek darî).

XYLOCARPOUS, *adj.* : pêwendîdarê darê meywehişkê wek darî.

XYLOGRAPH, *n.* : neqşedarî.

XYLOGRAPHER, *n.* : neqşkerê darî.

XYLOGRAPHIC, *adj.* : pêwendidarê neqşkirina darî.

XYLOID, *adj.* : wek darî.

XYLOL, *n.* = **XYLENE.**

XYLONITE, *n.* = **CELLULOID.**

XYLOPHAGOUS, *adj.* : kunker yan kilorkerê darî, pêtikiyê darxwer.

XYLOPHILOUS, *adj.* : werar yan şîn li ser darî.

XYLOPHONE, *n.* : darînk, alava mûzîqeyî ya darî.

XYLOPHONIST, *n.* : mûzîqevanê darînkî.

XYLOSE, *n.* : ksîloz, şekira darî.

XYLOTOMIC, *adj.* : darbirrî, darkunkerî.

XYLOTOMOUS, *adj.* : darbirr, darkunker.

XYLOTOMY, *n.* : darbirrîn (bo hûrsehkirinê), darkunkirin.

XYSTUS, *n.* : sivdeya nixafti.

Y

Y, y : way, tîpa bîst û pêncem ya elfabeya înglizî.

YABBER, *n.* : axiftin.

YABBY OR YABBIE, *n.* : texlîtek kuliya deryayî ye (timloke bo masîgiriyê).

YACHT, *n., vi.* : yext, bagemiya biçûk (bazirganî yan werzişî), bi yextî çûn.

YACHT CLUB, *n.* : yaneya yextan.

YACHT RACING, *n.* : pêşbirkeya yextan.

YACHT ROPE, *n.* : werîsê yextî.

YACHTSMAN, *n.* : yextvan.

YACK, *n., vt.* : pirbêjî, pirbêjî kirin.

YAFFLE, *n.* : darkutok yan çikçikanê kesk (sewz).

YAGER, *n.* : serbazek elmanî tifenghelgir yan havêj.

YA-GI, *n.* = **AERIAL** : hewayiyê pêlkurt (radyo, televizyon).

YAH, *interj.* : nîşana nizmkirinê.

YAHOO, *n.* : dehbemirov.

YAHU PIGEON, *n.* : kevok yan kotira yahu.

YAHVEH, *n.* : Yehwa, Xudayê Cihiyan.

YAHWISM, *n.* : yehwayîtî, peristîna Yehwa.

YAHWIST, *n.* : yehwayî, yehwaperês.

YAHWISTIC, *adj.* : yehwayiyî.

YAK, *n.* : yak, gayê mezînê mûdirêj yê Tîbetî, pirbêjî.

- **LACE** : qeytan yan şerîta qayim ya yakî.
- **HAIR** : mûyê yakî.

YAK, *vt.* : pirbêjî kirin.

YAKKED, *adj.* : pirbêjîkirî.

YAKKING, *n.* : pirbêjîkirin.

YALE LOCK, *n.* : kod yan çilmîreya yêl.

YAM, *n.* : yam : heleza hilpirjîna xwarinbar ya devera yeksanekerî.

YAMMER, *n., vi.* : hawar, zarîn, girîn, gazindekirin, gazinde kirin, zarzar kirin, girîn.

YAMMERED, *adj.* : hawarkirî, zarînkirî.

YAMMERING, *n.* : hawarkirin, zarînkirin.

YANG, *n.* : seretaya çalakiya nêrê gerdûnî (jîrzaniya çînî).

YANK, *n.* : kevandin, (ê)xistin, kişana dijwar.

YANKEE, *n.*, **COLLOQ IN** *abbr.* : Yankî, Emerîkanî.

YANKEE-DOODLE, *n.* = **YANKEE.**

YANKEEDOM, *n.* : emerikanîtî.

YANKEEISM, *n.* : emerikanîtî.

YANQUI, *n.* : welatiyê Wîlayetên yekgirtî yên Emerîka.

YAOURT, *n.* = **YOGHURT.**

YAP, *n.* : rew, rewîn.

YAP, *vi.* : rewîn, pirbêjî kirin, pûçbêjî kirin.

YAPO(C)K, *n.* : yapok : canewerek başûra emerikanî û biçûk e, darî (beji) yan avî yan jî hebanî ye, terşî bûn meydana pawankirinê.

YAPP, *n.* : texlîtek bergê kitêbê.

YAPPED, *adj.* : rewî.

YAPPING, *n.* : rewîn.

YARD, *n.* : gerdek, meydan, qad, zirtxane, yarde (3 pê yan 36 înc), hewş, bermal, hevşî.

YARD, *vt.i.* : kom bûn, pawan bûn.

YARDAGE, *n.* : tibabek yardeyan, dirêjî yan rûpîvî yan jî qebare bi yardeyan.

YARD ARM, *n.* : rexê darê babirekê.

YARD BIRD, *n.* : serbazê erknizm, serbazê sade.

YARD GOODS, *n.* : pertalê yardeyî (bi yardeyê firotin).

YARD GRASS, *n.* : dirrgiya (bi stirî yan kelemî).

YARDMAN, *n.* : paleyê meydanê yan pawanê : (giyayê mêrgê birrîn, befr malîn yan otomobîl şûştin).

YARD MASTER, *n.* : zêrevanê meydanê.

YARD STICK, *n.* : pîvek.

YARE, *adj.* : amade, lêkdayî.

YARMULKE, *n.* : kulavê mêrên Cihiyan.

YARN, *n.* : rîs, ben, benik.

YARN, *vi.* : suhbet kirin, axiftin, vegêrîn (çîrok).

YARN BEAM, *n.* : darikê rîsî (bo alandinê).

YARN-DYE, *vt.* : heş kirin (berî tevnkirinê yan vehînanê).

YARN ROLL, *n.* : dartûna rîsî.

YARROW, *n.* : hezarbelg, giyayek bêhn û tam tîj û xwîngir e (verestina xwînê radiwestînit).

YAULD, *adj.* : çeleng, çalak.

YAUPON, *n.* : helezê belgdirrikê vereşînê.

YAUTIA, *n.* : helezek devera yeksanekerî reh nişayî û xwarinbar e (wek kartolê ye).

YAW, *n., vi.* : çepdan, ladan, goşeya çepdanê, çep dan, la dan.

YAWL, *n., vi.* : rewîn.

YAWN, *n., vi.t.* : bawiş, bawişk, bawişîn.

YAWNER, *n.* : bawişker.

YAWNING, *n.* : bawişîn, bawiş.

YAWNINGLY, *adv.* : bawişkkî, bi bawişî.

YAWP, *n., vi.* : qîj, hawar, axiftin, suhbet, zimanê gewc û req û dijwar, gazinde kirin, qîj kirin, zil dîtin (bi devbeşekî).

YAWS, *n.* : nesaxiyek wek sûsenek e.

Y-AXIS, *n.* : tewereya Y (way) .

Y-CHROMOSOME, *n.* : boyeya Y (way) (boyeyek zayendî).

Y-COORDINATE, *n.* : tewereya Y (way).

YE, *pron.* : hon, te, hewe, we.

YEA, *adv., n.* : erê, ne her eve bi tenê lê, pêkhatin, dengê erêyî.

YEAH, *adv.* : erê.

YEAN, *vt.i.* : zayîn (zan) (bizin yan mih).

YEANLING, *n.* : kavir, sava, berx.

YEAR, *n.* : sal.

- **CALENDAR ~** : sala rojikî.
- **HEGIRA ~** : sala koçî.
- **LAST ~** : par.
- **LEAP ~** : sala pirr.
- **LUNAR ~** : sala heyvî.
- **SIMPLE ~** : sala sade.
- **OF GRACE** : sala zayînî.
- **BEFORE LAST** : pêrar.

YEARBOOK, *n.* : salname.

YEARLING, *n., adj.* : salekî.

YEARLY, *adj., adv.* : salane.

- **MEETING**, *n.* : civîna salane.

YEARN, *vi.* : bêrî kirin.

YEARNING, *n.* : bêrîkirin, bêrî, pirge, dilbijokî, arezû, awat.

YEARNINGLY, *adv.* : bi bêrîkirinî.

YEAR-ROUND, *adj.* : hemû salê.

YEA-SAYER, *n.* : mirovê erê yan erênî.

YEAST, *n.* : havên, haveyn, hevîrtirş, tirşêne, hêvên, hewên.

- **FERMENT** : tirşîne, haveyn, maye.
- **POWDER** : gejmîreka haveynî.

YEASTINESS, *n.* : haveynîtî.

YEASTY, *adj.* : haveynî, xav, negehiştî,

kefdar, vala, demdemî, çalak, xwîngerm, pûç.

YEGG(MEN), *n.* : diz.

YELK, *n.* = **YOLK.**

YELL, *n.* : qîj, qûrîn, gazî.

YELL, *vi.t.* : qîj kirin, gazî kirin, gazinde kirin, bêzarî kirin, bilind agehdar kirin.

- **TO ~ OUT AN OATH** : sondek qîj kirin.
- **TO ~ ORDERS** : ferman qîj kirin.
- **TO ~ WITH DELIGHT** : şad qîj kirin.
- **TO ~ WITH FURY** : har yan enirî qîj kirin.
- **TO ~ WITH LAUGHTER** : bi ken qîj kirin.
- **TO ~ WITH PAIN** : bi jandarî qîj kirin.

YELLER, *n.* : qîjker.

YELLING, *n.* : qîjkirin, qîjîn, qîjandin, qîrqîr.

YELLOW, *n., adj., vt.i.* : zer, zerd, zerik, qîçik, zer bûn, zer kirin.

YELLOW BACK, *n.* : bergzer, romana erzan.

YELLOW BILE, *n.* : zerdav.

YELLOW-BIRD, *n.* : zerole, zerêle (balinde ye).

YELLOW BOOK, *n.* : kitêba zer, biryarnameya mîrî ya hikûmetê ko berg zer e li babetê pirsek ramyarî.

YELLOW DAISY, *n.* : zerdawudî, dawudiya zer.

YELLOW-DOG, *adj.* : kotî, dij yekîtiya paleyan.

YELLOW-DOG CONTRACT, *n.* : belêna mandelkirinê ko paleyî yan karkerî çi pêwendê bi yekyetiya paleyan yan karkeran ve nîne.

YELLOWED, *adj.* : zerbûyî, tirsayî.

- **FACE** : rûzer, rûzerk, rûpêtî.

YELLOW ENZYME, *n.* : enzîmek pişeyî û zerik e.

YELLOW FEVER, *n.* : zereta, zerdeta, taya zer.

- **MOSQUITO** : pêşiya zer yan zeretayê.

YELLOW FLOWER, *n.* : gulzer, helezer.

YELLOW GREASE, *n.* : bezê zer, ronê berazî, kêrî xwarinê nahêt, bo bezkirinê bi kar dihêt.

YELLOW GREEN, *n.* : zerê kesk, rengek navî ye di navbera zerî û keskî de.

YELLOW-GREEN ALGA, *n.* : kevza zerkesk.

YELLOW GUM, *n.* : zerokiya reş ya savayan.

YELLOWHAMMER, *n.* : darkutok yan çikçikan, balindeyê sade yê zer.

YELLOW JACK, *n.* : taya zer, alaya zer ko gemî radikit li kerentîneyê, masiya zîvî zêrî.

YELLOW JACKET : saqoyê zer, bo mirovên payeberzn Çînê.

YELLOWISH, *adj.* : zero, piçekê zer, şê (bo hesp û hêstiran).

YELLOW LEAF, *n.* : belgê zer.

YELLOW LEGS, *n.* : ling zer : balindeyek beravî ya emerikanî û lingdirêj e.

YELLOW MEN, *n.* : mirov yan regezê zer, Çînî.

YELLOW METAL, *n.* : zermetal, têkiliya mis û tûtyayî, zêr.

YELLOWNESS, *n.* : zerîtî, zeratî, qîçkayî.

YELLOW OCHRE, *n.* : axzer.

YELLOW PAGES, *n.* : rûpelên zer yên raberê telefonê (bo karî).

YELLOW PAPERED, *adj.* : kevnekaxez (zerbûyî).

YELLOW PERIL, *n.* : metirsî yan tewekeliya zer, regezê zer.

YELLOW PINE, *n.* : sinewber yan kaja zer.

YELLOW RACE, *n.* : regezê zer (Çînî).

YELLOWS, *n.* : zerkî, zerek.

YELLOW-SHAFTED FLICKER, *n.* = **YELLOWHAMMER.**

YELLOW SPOT, *n.* : zerpinî, parçeya hestiyar ya tora çavî.

YELLOW TAIL, *n.* : dûvzer, texlitek masiyên dûvzer yan bi zerî ve ye.

YELLOW THROAT, *n.* : zergurden, balindeyek strankar e sîng yan gerden zer e.

YELLOW WASP, *n.* : zilkêtk, zerkitik.

YELLOW WEED, *n.* : zerfirîzî : helezek gulzer e li ser baskek dirêj û çiqdar e.

YELLOW WOOD, *n.* : zerdar yan darê zer, darek e ko ber zerî ve diçit, şîrê wî bo boyeya zer bi kar dihêt.

YELLOWY, *adj.* : zerkî, ber zerî ve.

YELP, *n.* : rewîn, kastin, veqîn.

YELP, *vi.t.* : rewîn.

YELPER, *n.* : rewî, seyê rewî.

YELPING, *n.* : çele, çîr, veqîn, kastin.

YEN, *n.* : Yên, yekeya diravê Japonî.

YEN, *vi., n.* : bêqam bêrî kirin, bêrî.

YENNED, *adj.* : bêqam bêrîkirî.

YENNING, *n.* : bêqam bêrîkirin.

YEOMAN, *n.* : yoman, cotyarê zevîdar yê biçûk yê îngilîz, hariker, endamek pasdarên şahaniyên brîtanî, efserk biçûk yê hêza deryayî ya brîtanî.

- **SERVICE** : xizmeta hêjayî.

YEOMANLY, *adj., adv.* : yomanî, azakî, bi azayî, bi mêranî, bi dilêrî.

YEOMANRY, *n.* : cotyarên zevîdar.

YEP, COLLOQ. = **YES.**

YERBA, *n.* **-MATE** : mate (hogir).

YERK, *n.* : tajankkirin, pehîn, lêdan, tîzik, livîna lêzîn, celdekirin.

YERK, *vt.* : zixt lê dan, dijwar êrîş kirin, celde kirin, dijwar celde kirin.

YERK, *vt.* : zixt lê dan, dijwar êrîş kirin, celde kirin, dijwar lê dan.

YES, *part., adv., n.* : erê, belê, pêkhatin.

YESHIVA, *n.* : dibistana xwendina Tewratê.

YESMAN, *n.* : bêbar.

YERSTER, *adj.* : duhî, pêwendî li gel duhî heye.

YESTERDAY, *adv., n., adj.* : duhî, duwênê.

YESTER-EVE, *adv.* : duhî êvarî.

YESTERMOR, *adv., n.* : duhî spêdê.

YESTER-MORNING, *n.* : duhî spêdê.

YESTER-NIGHT, *adv., n.* : şevê dî.

YERTERYEAR, *adv., n.* : par.

YESTREEN, *adv., n.* : şevê dî.

YET, *adv., conj.* : hêşta, nê, li ser re.

- **IS HE ~ ALIVE ?** ew hêş saxe ? ew hêşta nimiriye ?

- **IT IS NOT TIME ~** : hêşta ne dem e.

- **HIS ~ UNFINISHED TASK** : erkê wî yê hêşta netemam bûyî.

- **AGAIN** : hêşta carek dî.

YETI, *n.* = **ABOMINABLE SNOWMAN.**

YEUK, *vi.* : xurîn.

YEW, *n.* : darek sinewber e û her şîn e, kevana vî darî.

YEZÎDÎ, *adj.* : Ezîdî.

YID, *n.* : Cihî (bo kirêtiyê).

YIDDISH, *adj.* : Yidî, zimanê cihiyê silavî.

YIDDISHISM, *n., adj.* : yidiyî, pêwendîdarrê zimanê yidî.

YIELD, *n.* : berdarî, deramet, ber, dexl.

- **POINT** : xalka şikestinê, xalka dûmahîka nermiyê.

YIELD, *vt.i.* : ber (berhem) dan, çîz kirin, dest jê berdan, bûn ho yan eger, tepeser bûn, nerm bûn.

- **TO ~ FORTRESS** : kelhe bi dest ve dan.

- **TO ~ THE POINT** : (li ser xalkê) pêk hatin.

YIELDER, *n.* : berhemdar.

YIELDING, *n.* : bindestî, daxwarin, çivîn, mildan, nerm, turt, berder.

- **TO PERSUATION** : qayilbûn.

- **TO SUPERIOR FORCE** : çîzbûn, çîzkirin.

Y-INTERCEPT, *n.* : tewereya Y (way) ya xalkekê ko rêzek, rûyek yan kirvek dibirrit.

YIP, *n., vi.* : rewîn.

YIPPED, *adj.* : rewî.

YIPPEE, *interj.* : derbirrîna şadiyê.

YIPPIE OR YIPPY, *n.* : hipiyê çalak yê ramyarî (emerikanî).

YIPPING, *n.* : rewîn.

YLANG-YLANG, *n.* : darê gulavî yê Melayî.

YOBBO, *n.* : cerde, nijde.

Y.M.C.A., *abbr.* **YOUNG MEN'S CHRISTIAN ASSOCIATION** : Civata mêrên xort yên fele.

YOD, *n.* : tîpa dehem û biçûktirîna elfabeya îbrî.

YODEL, *n.* : qîj yan strana dengguhor.

YODEL, *vt.i.* : stirîn, stirandin, ji dengê asayî guhorîn bo dengê bilind.

YODEL(L)ED, *adj.* : strankirî, qîjkirî.

YODEL(L)ING, *n.* : stranbêjî.

- **CRY** : qîja nizm ya bilind dibit.

YOGA, *n.* : yoga, jîrzaniya ayînî ya Hindistanî, binyat naman e û xwe girtin e bo yekyetiya giyanî li gel xuyî-xudayî, rêzika rahînanî bo leş û giyanê saxlem.

YOGH, *n.* : tîpa înglîziya navîn (caran bo 19 "ci" û "way" bi kar dihat.

YOGI, *n.* : rahînkerê yoga, bawermendê jîrzaniya yoga.

YO-HEAVE-HO, *interj.* = **HEAVE HO.**

YO(HO)-HO, *interj.* : derbirrîna gazîkirinê.

YOGURT OR YOGHURT, *n.* : mast, lorik.

- **AND WATER** : dew, mastaw.

YOICK, *interj.* : qîja nêçîrvanê rûviyan.

YOKE, *n., vt.i.* : coq, nîr, rîş, bandor yan bandûr, bendeyî, benîtî, koledarî, girê dan, civandin, bende kirin, cot bûn, tepeser kirin, pêgirek bûn, pêwendî kirin.

- **BONE** : hestiyê lamê, hestiyên serî bi rûyî ve girê didin.

- **FELLOW** : heval, hogir, jin, mêr, hevser.

- **MATE** : heval, hogir.

YOKED, *adj.* : nîrkirî.

YOKEL, *n.* : gundî, ladêyî, cotyar.

YOKING, *n.* : nîrkirin.

YOLK, *n.* : zerik, zerka hêkê.

- **BAG** : kîskê zerikê.

- **GLAND** : hilhilank, toşpî yan livîka zerikî.

- **SAC** : kîskê zerikê.

YOLKED, *adj.* : zerikkirî.

YOLKY, *adj.* : zerikî.

YOM KIPPUR, *n.* : roja jûvanê (li nik Cihiyan).

YON = YOND = YONDAR.

YONDER, *adv., adj.* : dusibe, wêrahe, li wêrê, dûrtir.

YONI, *n.* : hêmaya endamên mê (şermecê) ko Hindok rûmet digirin.

YOO-HOO, *interj.* : gazî (bo guhdariyê).

YORE, *n.* (**OF YORE**) : berê, li rojên berê.

YORK, *n.* (**~AND LANCASTER**) : partên hevrik yên şerên gulan li Înglîzistanê.

YORK, *vt.* : tepka York havêtin (kirîket).

YORKER, *n.* : tepk (kirîket).

YORKSHIRE, *n.* : Yorkşayer, deverek înglîzî ye, berazek spî yê vê deverê ye.

- **PUDDING** : kiloc yan kadeya Yorkşayerê (ji goşt û arê pêjtî ye).

- **TERRIER** : seyek înglîzî dest û pê kurt, leş dirêj û mû avirmîşî ye.

YORUBA, *n.* : Yoroba, mirov yan zimanê gelê zenciyê Nijerya (Efrîqa).

YOU, *pron.* : tu, hingo, te, hon, êwe, we, hewe.

- **ALL** : hon hemû.

- **KNOW** : axir, tu dizanî, nê.

- **SEE** : axir.

YOUNG, *adj., n.* : genc, rewal, lawik, law, xort.

- **WITH ~** : avis, bi tişt, bi zik.

YOUNG ANIMAL, *n.* : canewerê biçûk.

YOUNG ASS, *n.* : caş, daşik.

YOUNG BERRY, *n.* : tûya emerîkî.

YOUNG BULL, *n.* : conega, ciwanga.

YOUNG CHILD, *n.* : zarokê biçûk.

YOUNG DAYS, *n.* : demên lawiyê.

YOUNG DEER, *n.* : xifş, xifşik.

YOUNG DONKEY, *n.* : caş, caşik, daşik.

YOUNGER, *n., adj.* : biçûktir (jî).

YOUNGEST, *n., adj.* : biçûktirîn.

YOUNG EWE, *n.* : kavir.

YOUNG FAMILY, *n.* : xêzana genc.

YOUNG FEMALE GOAT, *n.* : tiştîr.

YOUNG GOAT, *n.* : gîsk.

YOUNG INSTITUTION, *n.* : damezrîna nû.

YOUNGISH, *adj.* : xort, law, genc.

YOUNGLING, *n.* : xort, law.

YOUNGMAN, *n.* : rewal, şimal, bengîn, xurt.

YOUNG MASTER, *n.* : pisaxa.

YOUNG NATION, *n.* : neteweyê nû.

YOUNGNESS, *n.* : lawîtî.

YOUNG OF ANIMAL, *n.* : cewr.

YOUNG OF PIG, *n.* : pelx.

YOUNG OX, *n.* : conega, ciwanga.

YOUNG PIGEON, *n.* : çêlkevok yan çêlkotir (çêlik yan cûcika kevokê).

YOUNG PEOPLE, *n.* : xurt, şimal, rewal, tît.

YOUNG TURK, *n.* : gence Tirk, rihdar.

YOUNG WOMAN, *n.* : jina law, berbext.

YOUNKER, *n.* : lawik, xort, zarok.

YOUR, *adj., attrib.* : te, ya te, yê te, yê hewe, ya hewe.

YOUR DANGER : tewekeliya te, telezgeha te.

YOUR DISMISSAL : derxistina te.

YOUR EXPECTATIONS : rabinîn yan hîviyên te.

YOUR FATHER : bav, bab yan bavkê te.

YOUR HAT : şefqe yan kulavê te.

YOURS, *pron., pred., adj.* : yên te, ya te, yê te, ya hewe, yên hewe.

- **IS THE ONLY WAY** : ya te bi tenê rêya rast e (yan rêbaz e).

- **TRULY** : dilsozê te.

YOURSELF, *pron.* : xwe, xu, tu bi xwe.

- **ASK ~** : ji xwe bipirse.

- **PULL ~ TOGETHER** : xwe bigire yan ragire.

YOURSELVES, *pron.* : xwe, xu, tu yan hon bi xwe.

YOUTH, *n.* : lawik, law, bengîn, gudok, genc, gencî, lawî, lawan, newcewan, lawanî, rewal, şimal, xort, tolaz, xurtani, cuwanî.

- **NICE ~** : tarlaw.

- HOSTEL : lawxane, xaniyê xortan.

YOUTHFUL, *adj.* : bengîn, gudok.

YOUTHFULLY, *adv.* : bengînekî, bi lawî yan bengînî.

YOUTHFULNESS, *n.* : xortî, xortayî, lawînî, lawîtî, lawanî, xortanî.

YOWL, *n.* : kastin, veqîn.

YOWL, *vi.t.* = **YAWL** : rewîn, (bêzarî) qîj kirin.

YOWLING, *n.* : çir, kastin, rewîn, veqîn.

YO-YO, *n.* : yoyo, yarî, livîna hatîn û çûnê.

YO-YO, *vi.* : livîn (hatin û çûn), yoyo kirin.

YO-YOED, *adj.* : yoyokirî, livî (hatin û çûnî).

YO-YOING, *n.* : yoyokirin, livîn (hatin û çûnî).

YPERITE, *n.* : xaza xerdelkê.

Y-POTENTIAL, *n.* : erkê Y (way) kehrebî-bergîrî.

YTTERBIA, *n.* : oksîdê îtêrbiyom.

YTTERBIC, *adj.* : îtêrbiyomî.

YTTERBOUS, *adj.* : pêwendîdarê îtêrbiyomî.

YTTERBIUM, *n.* : îtêrbiyom, hêmanek metalî û qetlaz e.

YTTERIC, *adj.* : îtêryomî.

YTTERIUM, *n.* : îtêryom, hêmanek metalî û qetlaz e.

YUAN, *n.* : yekeya diravê Çînê.

YUCCA, *n.* : helezek wek zebatê yan şilêrê ye.

YUCKY, *adj.* (*sl.*) : kirêt, tamsar.

YUGA, *n.* : rojgar : yek ji çar rojgaran di gera hebûna gerdûnî de (jîrzaniya Hindistanê).

YULE, *n.* : cejna zayînê (ya Îsa pêxemberî).

- LOG, BLOCK OR CLOG : qurmê mezin yê darî bo agirê cejna zayînê.

YULETIDE, *n.* = **CHRISTMAS TIDE.**

YUMMY, *adj.* : xweş, tamdar.

YUM-YUM, *interj., expr.* : derbirrina xweşiya xwarînê.

YUP = **YEP.**

YOURT OR YOORT, *n.* : konê koçerî yê girûvir yê moxolî, yûrt.

Y.W.C.A., *abbr.* **YOUNG WOMEN CHRISTIAN ASSOCIATION** : Civata jinên xort yên fele.

Z

Z, z : zêd : tîpa bist û şeşem (û dûmahî) ya elfabeya înglîzî.

ZABAGLIONE, *n.* : êxiniyek zerika hêkan, şekir û şerabê ye.

ZACHUM, *n.* : zeqne (darê bertal).

ZACHUM OIL TREE, *n.* : zeqne, sekom.

ZADDIK(IM), *n.* : rastok (sadiq).

ZAFFRE OR ZAFFER, *n.* : zafer : têkiliya oksîdê kobaltî û silîka bo rengkirina şûşeyî û kaloti (bi rengê şîn).

ZAG, *n., vt.* : çepdana tîj, tîj çep dan.

ZAGGED, *adj.* : tîjçepdayî.

ZAGGING, *n.* : tîjçepdan.

ZAMIA, *n.* : helezek wek darqespê ye.

ZAMINDARÎ, *n.* : zavîdarî, derebegî.

ZANDER, *n.* : masiyek rûbarî ya ewropî ye.

ZANILY, *adv.* : rûbazkî, bi rûbazî.

ZANINESS, *n.* : rûbazîtî, durûyîtî.

ZANY, *n., adj.* : durû, rûbaz, zirtek, xirpo, sade, sakar, gewc, pêkenînî, tiraneyî, zirtekî.

ZANZIBARI, *n., adj.* : xelkê Zenzebar (yan Zencebar li rojhelata Efrîqa).

ZAP, *vt.* : kuştin, lêdan, êrîş kirin.

ZAPATEADO, *n.* : govendek başûra Emerîka.

ZAPPED, *adj.* : kuştî, wêrankirî.

ZAPPING, *n.* : kuştin, wêrankirin.

ZAPPY, *adj.* = **ZIPPY.**

ZARATHUSTER, *n.* : Zerdeşt.

ZARATHUSTRIAN, *adj.* : Zerdeştî.

ZARZUELA, *n.* : operêta tîraneyî ya îspanî.

ZAX, *n.* : birrokê ferşvanê banî.

Z-AXIS, *n.* : tewereyê Z (zêd), tewereyê çavî.

Z-COORDINATE, *n.* : tewereyê biha radekirî bi pîvana teribî li gel tewerê Z.

ZEAL, *n.* : jîrî, jîrayî, perûşî, halan, jîrahî, heyhêz.

ZEALOT, *n.* : halan, dilgerm, serçil.

ZEALOTRY, *n.* : heyhêz, halanî.

ZEALOUS, *adj.* : jîr, halan, perûş, dilgerm.

ZEALOUSLY, *adv.* : halanekî, bi halanî.

ZEALOUSNESS, *n.* : perûşîtî, halanîtî, heyhêzîtî.

ZEATIN, *n.* : giyayek genimî ye.

ZEBEC(K), *n.* = **XEBEC.**

ZEBRA, *n.* : kerê kûvî, kerê ravrav, xalxalok, zêbra.

- **CROSSING** : (rê) têper (wek zêbra yan xalxalokî).
- **FINCH** : çûçikek belek awistralî ye.
- **FISH** : masiya xalxalokî.
- **MARKINGS** : nîşanên xalxalokî.
- **WOOD** : darê xalxalokî.

ZEBRINE, *adj.* : xalxalokî.

ZEBROID, *adj.* = **ZEBRINE.**

ZEBU, *n.* : canewerek memikdar û wek çêlê ye lê koparedar e.

ZED, *n.* : tîp Z, zêd -z-.

ZEDOARY, *n.* : giyayek hindî bo çêkirina gulav û ciwankariyê ye.

ZEIN, *n.* : zayn : protînê genimê Şamê bo çêkirina nermoke, varnîş, benê tevnî û merekebê.

ZEITGEIST, *n.* : giyanê rojgarî : hişî, sincî û rewşenbîrî, bayê çandayî û sinciya rojgarekê.

ZELKOVA TREE, *n.* : darek dirêj wek dirdarî ye (Japonî ye).

ZEN, *n.* : şiklek.yan şêweyek Bûdî ye.

ZENANA, *n.* = **HAREM** : jînane.

ZEND, *n.* : kevnezimanê Zend-avêstaya Zerdeştî.

ZEND AVESTA : Avêsta.

ZENER, *n.* (**CARDS**) destek kaxezan, pênc hêma.

ZENER DIODE, *n.* : alavek silîkonî û nîvgehîn bo rêzikiya voltiyê ye.

ZENITH, *n.* : navser, raser, ewc, lûtke, dûçik, gopîtk.

- **DISTANCE** : kevaneya birrî di navbera leşekê û gopîtkê de.

ZENITHAL, *adj.* : toqeserî.

ZEOLITE, *n.* : zeolît : silîkatên avî.

ZEOTROPE, *n.* : çerxa jiyanê.

ZEPHIRAN, *n.* : zefiran : madeyek paqijker e.

ZEPHYR, *n.* : şal, şemal, perûkê ciwan, bayê hîn, bayê rojava.

ZEPHIUS, *n.* : Xudayê bayê rojavayî li nik Grêkan.

ZEPPELIN, *n.* : balona zeplin.

ZERO, *n.* : sifir, hîç, nadan, mêjter.

- **ABSOLUTE** : sifrî yan sifra reha yan bijîn.

- **GRAVITY** : nekêşî, bêzemkêşî (sifirkêşî).

- **ENERGY** : wizeya xalka sifrê.

- **HOUR** : demjimêr sifir : demê destpêkirina karî nemaze karê leşkerî.

- **POINT** : xalka sifrê.

ZEROTH, *adj.* : sifirkirî.

ZEST, *n.* : keyfxweşî, dilberî, çalakî, tamaxweş, tazeyî, xweşî, jînî.

ZESTFUL, *adj.* : perûşî, xweş.

ZESTFULLY, *adv.* : perûşkî, bi perûşî, bi xweşî.

ZESTFULNESS, *n.* : perûşîtî.

ZESTY, *adj.* : perûşî, xwîngermî.

ZETA, *n.* : tîpa şeşem ya girêkî.

ZETETIC, *adj.* : pêşveçûyî bi pirsyarkirinê.

ZEUGMA, *n.* : wêneyê axiftinê.

ZEUS, *n.* : serekxudayê Grêkan, Xudayê Xudawendên olempî.

ZIBELINE, *n.* : perûkek hirînerm e.

ZIBET(H), *n.* : canewerek hindî wek sivoreyî-rûvî ye.

ZIG, *n., vt.* = **ZIGZAG**, çepdana tîj, tîj çep dan.

ZIGGED, *adj.* : tîjçepdayî.

ZIGGING, *n.* : tîjçepdan.

ZIGGURAT, *n.* : peykerê qoçekî yê babilî yan aşûrî yê çend nihûm.

ZIGZAG, *adj., n.* : çep û çîr, dolkan.

- **COURSE** : rê yan rêbaza çepûçîr.

- **ROAD** : rêya çepûçîr.

ZIGZAG, *vi.* : çepûçîr çûn.

ZIGZAGGED, *adj.* : çepûçîrkirî.

ZIGZAGGING, *n.* : çepûçîr kirin.

ZILCH, *n.* : sifir.

ZILLAH, *n.* : devera kardarî li Hindistanê.

ZILLION, *n.* : zilyon : jimareyek bêqam (mezin).

ZINC, *n.* : zink, tûtya : hêmanek metalî, spî û ber şînî ve.

ZINC, *vt.* : tûtya kirin.

ZINCATE, *n.* : pêkhatiyek yan awêteyek ji karlêkirina zinkî yan oksîdê zinkî li gel gîravên madeyên qilêyî yan tiftî.

ZINC BLENDER, *n.* : kibrîtîdê zinkî.

ZINC CHLORIDE, *n.* : xwêyek tal û jehrî ye.

ZINCIC, *adj.* : zinkî, tûtyayî.

ZINCIFEROUS, *adj.* = **ZINCIC.**

ZINCIFICATION, *n.* : zinkirin, tûtyakirin.

ZINCIFY, *vt.* : zink kirin, tûtya kirin.

ZINC(K)ING, *n.* : tûtyakirin.

ZINCITE, *n.* : zinkît : oksîdê zinkê sor.

ZINCOGRAPH, *n., vi.t.* : depikê zinkê neqşkirî bo çapkirinê, neqş kirin ser zinkî.

ZINCOGRAPHER, *n.* : neqşkerê zinkî.

ZINCOGRAPHIC, *adj.* : neqşkeriya zinkî.

ZINCOGRAPHY, *n.* : kolana zinkî, neqşkirina zinkî.

ZINCOID, *adj.* : zinkî.

ZINC OINTMENT, *n.* : melhema zinkî bo çarekirina nesaxiyên çermî.

ZINCOUS, *adj.* : zinkî.

ZINCOTYPE, *n.* : depikê zinkê tîpkirî bo çapkirinê.

ZINC OXIDE, *n.* : oksîdê zinkî : toza heşa spî bo derman û ciwankariyê.

ZINC STONE, *n.* : kevirê tûtyayî.

ZINC SULPHATE, *n.* : zaxa spî.

ZINC WHITE, *n.* : spiyê zinkî : boyeya spî ya oksîdê zinkî bo çêkirina texlîtên boyeyê.

ZINFANDEL, *n.* : zinfandil : şeraba tiriyê reş yê hûr yê Kaliforniya (Emerîka).

ZING, *n., vi.* : gîze, oze, çalakî, çelengî, gîze kirin, çalak livîn.

ZINGARO, *n.* : qereç.

ZINGY, *adj.* : ciwan, dilber.

ZINJANTHROPUS, *n.* : berdîneyek mirovî (ji rojhelata Efrîqa).

ZINK, *n.* = **ZINC.**

ZINKENITE, *n.* : zinkenît : kibrîtîdê qurquşm û antîmonî.

ZINKY, *adj.* : zinkî, tûtyayî.

ZINNIA, *n.* : zinya : helezek pêkhatî ye, awête ye.

ZION, *n.* : zîrê kevne Qudsê, çiyayê Sion li Qudsê.

ZIONISM, *n.* : sionîzm : tevgera sîonî.

ZIONIST, *n.* : (bawermendê) siyonîst.

ZIONISTIC, *adj.* : pêwendîdarê sîonî.

ZIP, *n.* : civciv, gîze, çalakî, vejiyanî, çelengî.

- **CODE** : renûs, jimareya deverê.

- **FASTENER** : zincîr (ya penteronî, çenteyî...).

ZIP, *vi.t.* : çalakî kar kirin, gîze derketin, vebûn û girtin bi zincîrê, leztir kirin, xweştir kirin, zincîrk tehîsokî vekirin yan girtin.

ZIPPED, *adj.* : zincîrkirî (girtî).

ZIPPER, *n.* = **ZIP FASTENER** : (zincîr).

ZIPPERED, *adj.* : zincîrkirî (girtî).

ZIPPING, *n.* : zincîrkirin (girtin).

ZIPPY, *adj.* : law, çeleng.

ZIRAM, *n.* : xwêyek tûtyayî ya endamî ye.

ZIRCON, *n.* : zirkon : silîkêtên zirkonyom.

ZIRCONATE, *adj.* : zirkonat : xwêya tirşiya zirkonî.

ZIRCONIA, *n.* : oksîdê zirkonyom.

ZIRCONIC, *adj.* : zirkonî : pêwendîdarê zirkonî.

ZIRCONIC ACID, *n.* : tirşiya zirkonî.

ZIRCONIUM, *n.* : zirkonyom : hêmanek metalî û qetlaz e (tîrêjdar e, bo wizeya gerdileyî bi kar dihêt).

ZIRCONIUM OXIDE : oksîdê zirkonyom.

ZIT, *n.* (*sl.*) : pirzik, zîpik.

ZITHER, *n.* : qanûn : alavek mûzîqeyî.

ZILOTY, *n.* : zilotî : yekeya diravî ya polonî.

ZIZYPHUS, *n.* : sinco.

-ZOA, *suff.* : paşgir e ko giyanewer e.

ZOANTHARIA, *n. pl.* : mercana gulî.

ZOAR, *n.* : penageh.

ZOARIUM, *n.* : dagîrgeh ya canewerek deryayî hûr dagîrgehî.

Zn, *symb.* **OF ZINC**, *n.* : hêmaya kîmyayî ya zinkî.

ZODIAC, *n.* : çerxa bircan, çerxa felekê.

ZODIACAL, *adj.* : bircî.

- **LIGHT** : ronahiya bircî.

ZOEA, *n.* : şiklê seretayê kêvjaleyî.

ZOETROPE, *n.* : leyiztoka dîtinê ye.

-ZOIC, *suff.* : paşgir e ko texlîtek jî hebûna canewerî yan rojgarek erdnasî.

ZOIC, *adj.* : pêwendîdarê caneweran.

ZOISITE, *n.* : zoysît : silîkatên kalsiyom û aluminyom.

ZOLAISM, *n.* : bêşermîtî (rast gotin).

ZOLLNER, *n.* : **ZOLLNER'S LINES** : hêlên terîb ko neterîb dihên diyar kirin bi hêlên hevbirr.

ZOMBI(E), *n.* : zombî : marê xudakirî di ayîna (Vodo) de, hêza diçit nav leşê mirî de û vedijînit (baweriya Vodo), miriyê hosa vejiyayî bê ko bişêt biaxivit û bê serbestiya vênî, şeraba meyweyî.

ZOMBISM, *n.* : bawermendiya ola zombî.

ZONAL, *adj.* : deverî.

ZONALLY, *adv.* : deverkî, bi deverî.

ZONARY, *adj.* = **ZONAL.**

ZONATE(D), *adj.* : deverkirî.

ZONATION, *n.* : deverkirin.

ZONDA, *n.* : reşebayê germ yê Arjentîna (başûra Emerîka).

ZONE, *n.* : dever, herêm, navçe.

- **MELTING** : buhujîna deverî : rêbazek bijînkirina kanî yan metalî ye.

- **REFINING** : bijînkirina kanî bi vê rêbazê, ko kanê bijînê buhujî dibe-rdin ser kanê nebijîn, radikin û kanê bijîn dikin û kanê bijîn dihêlin.

- **TIME** : demê deverê.

ZONE, *vt.i.* : dever kirin.

ZONED, *adj.* : dever kirî.

ZONING, *n.* : dever kirin.

ZONK, *vi.* : gêj yan sir kirin.

ZONKED, *adj.* : gêjkirî yan sirkirî.

ZONULAR, *adj.* : deverî.

ZONULE, *n.* : deverk, kemerbendk.

ZOO, *n.* : baxçeyê giyaneweran.

ZOO-, *pref.* : pêşgir e ko canewer e.

ZOOCHEMISTRY, *n.* : kîmyaya canewerî.

ZOO-ECOLOGY, *n.* : canewerjîngezanî.

ZOOGAMETE, *n.* : leşê zayendî yê livînî.

ZOOGENIC, *adj.* : canewerî, giyanewerî.

ZOOGENOUS, *adj.* = **ZOOGENIC.**

ZOOGEOGRAPHER, *n.* : erdnasê canewerî.

ZOOGEOGRAPHIC(AL), *adj.* : (pêwendîdarê) erdnasiya canewerî.

ZOOGEOGRAPHICALLY, *adv.* : bi erdnasiya canewerî.

ZOOGEOGRAPHY, *n.* : erdnasiya dehbeyan, erdnasiya caneweran.

ZOOGLEA, *n.* : baristeya celatînî.

ZOOGLEAL, *adj.* : baristeyî ya celatînî.

ZOOGRAPHIC(AL), *adj.* : pêwendîdarê canewerşirovezanî.

ZOOGRAPHY, *n.* : canewerşirovezanî yan canewerravezanî.

ZOOID, *n., adj.* : wek canewerî, xane yan leşek endamî ko dişêt bi xwe bilivit.

ZOOIDAL, *adj.* : wek canewerî.

ZOOKEEPER, *n.* : baxçevanê caneweran.

ZOOLATRY, *n.* : giyanewer yan canewerperês, dehbeperês.

ZOOLOGIC, *adj.* : giyanewerî, canewerî.

ZOOLOGICAL, *adj.* = **ZOOLOGIC.**

ZOOLOGICAL GARDEN : baxçeyê caneweran.

ZOOLOGICALLY, *adv.* : canewerkî, bi canewerî.

ZOOLOGIST, *n.* : canewerzan, giyanewerzan.

ZOOLOGY, *n.* : canewerzanî, giyanewerzanî.

ZOOM, *n.* : civciv, gîze, rabûna nişkî (balafir).

- **LENS** : nîskeya nêzîk û dûrkirinê, nîskeya kamêrayê ko qebareya wêneyî guhorbar e.

ZOOM, *vt.i.* : biha ne asayî zêde bûn, gîze kirin, balafir ji nişkekê ve û bi lez rabûn, nêzîkî tiştekê bûn yan dûr ketin da ko ew tişt nêzîk yan dûr diyar bibit.

ZOOMETRY, *n.* : canewerpîvî, dehbepîvan.

ZOOMORPHIC, *adj.* : şikil canewer, pêwendîdarê kesîkirina canewerî.

ZOOMORPHISM, *n.* : wênekirina xudayan wek caneweran, kesîkirina canewerî, bi karînana şiklên canewerî di huner yan hêmayî de.

ZOON, *n.* : zindîk, canewerk (canewerê hûr).

-ZOON, *suff.* : paşgir e ko canewer e yan wek canewerî ye.

ZOONAL, *adj.* : zindîkî, canewerkî.

ZOONOSIS, *n.* : nesaxiya ko mirov ji canewerê nizm vedigirit.

ZOONOTIC, *n.* : pêwendîdarê nesaxiya mirov ji canewerê nizm vedigirit.

ZOOPARASITE, *n.* : canewerê mişexwer.

ZOOPHAGOUS, *adj.* : xwerê goştê canewerî.

ZOOPHILIC, *adj.* : canewerxwaz.

ZOOPHYTE, *n.* : canewerê helezî (wek mercan, hewrik...).

ZOOPLANKTER, *n.* : canewerê hilawîstokî.

ZOOPLANTON, *n.* : jiyana canewerê hilawîstok.

ZOOPLANTONIC, *adj.* : pêwendîdarê canewerê hilawîstok.

ZOOPLASTY, *n.* : nijdariya berdêliya canewerî, ko tevnê zindî ji canewerek nizm diguhêzin leşê mirovî.

ZOORY, *n.* : sendela qirşikî ya japonî.

ZOOSPERM, *n.* : nêrtuxmav, nêmik.

ZOOSPORANGIUM, *n.* : nêmikhelgir.

ZOOSPORE, *n.* : nêmikê canewerî.

ZOOSPORIC, *adj.* : nêmikiyê canewerî.

ZOOSTEROL, *n.* : stêrola canewerî, yek ji stêrolên wek kolestrolî.

ZOOTECHNICAL, *adj.* : kehîkeriya caneweran.

ZOOTECHNICIAN, *n.* : kehîkerê caneweran.

ZOOTECHNICS, *n.* : canewerxudankirin yan kehîkirinzanî.

ZOOTECHNY, *n.* : kehîkirin yan xudankirina caneweran.

ZOOTOMY, *n.* : canewerkelîşînzanî.

ZOOT SUIT, *n.* : destecilên teyisî (bi kêrhatî dirûtî).

ZORI, *n.* : sendela (pêlav) qirşikî ya japonî.

ZORIL, *n.* : texlîtek rûvî.

ZOROASTER, *n.* : zerdeşt.

ZOROASTRIAN, *adj.*, *n.* : zerdeştî.

ZOROASTRIANISM, *n.* : rêzika ayînî ya zerdeştî di nav Zendavêsta de li ser binyata kêşeya li navbera Ormuzdî ko Xudayê ronahî û qenciyê ye û Ehrîmenî ko Xudayê tarî û bediyê ye; zerdeşti.

ZOSTER, *n.* : nexweşiya deverî, nexweşiyek çermî ye.

ZOUAVE JACKET, *n.* : selte.

ZOUNDS, *n.* : sond.

ZOYSIA, *n.* : giyayek xişok e.

ZUCCHETTO, *n.* (*pl.* **ZUCHETTOS**) : kulavê oldarî.

ZUGZWANG, *n.* : pêviyana livandinê (şetrenc) herçend ko ne li berjewendiya yarîkerî de bit.

ZULU, *n.* : gelê Natalê (Efrîqaya başûr).

ZUNI, *n.* : yek ji gelên Hindokên sor yên emerikanî.

ZUNIAN, *n.* : zimanê gelê Zunî yê Hindokên sor yên emerikanî.

ZUPPAINGLESE, *n.* : texlîtek şirînayî (kiloc) ye.

ZWIEBACK, *n.* : baqemat.

ZWINGLIAN, *adj.*, *n.* : îtzwîngilî, pêwendîdarê çakkerê pirotî yê îtzwingil.

ZWINGLIANISM, *n.* : ola îtzwîngilî.

ZWITTERION, *n.* : îyona melezî ko du bargeh hene : erêyî û nerêyî.

ZYGAL, *n.* : şiklê H.

ZYG(O)-, *pref.* : pêşgir e ko nêr e, cot e, duwane ye, yekitî ye, şûkirin e.

ZYGODACTYL, *adj.*, *n.* : cot penc.

ZYGODACTYLOUS, *adj.* = **ZYGODACTYL.**

ZYGOMA, *n.* : hestiyê rûçikî, kevaneya rûçikî.

ZYGOMATIC, *adj.* : rûçikî.

- **ARCH** : kevaneya rûçikî.
- **BONE** : hestiyê rûçikî.
- **PROCESS** : werar yan derhatina rûçikî.
- **SUTURE** : dirîn yan şikestebendiya rûçikî.

ZYGOMORPHIC OR ZYGOMORPHOUS, *adj.* : şikil nîrî, duzayendî.

ZYGOMORPHY, *n.* : duzayendî.

ZYGOPHYLLACEOUS, *adj.* : pîrozî, helezek zaûzê kirin bi nêrikên peyînî wek darê pîrozan û darikên pêxemberan.

ZYGOPHYTE, *n.* : nêrikî, heleza zaûzê dikit bi nêrikên peyînî.

ZYGOSE, *adj.* : şûyî, pêwendîdarê şûkirinê.

ZYGOSIS, *n.* : şûkirin, çêbûna nêrikan piştî yekîtiya leşên zayendî (pirotoplazmî).

ZYGOSITY, *n.* : çêbûna rûçikên zayendî.

ZYGOSPORE, *n.* : nêrikê peyînî, nêrikê duxane yên zayendî û hevyek.

ZYGOSPORIC, *adj.* : nêrikiyê peyînî.

ZYGOTE, *n.* : peyînkerê xaneya ji yekbûna du leşên zayendî çêdibit.

ZYGOTENE, *n.* : qonax yan koçeya yekgirtina kromozoman.

ZYGOTIC, *adj.* : peyînî.

ZYLEM, *n.* : tevnê seretayî.

ZYM(O)-, *pref.* : pêşgir e ko tirşbûn e, haveyn e.

ZYMASE, *n.* : zîmas : haveyna şekirê diguhorit alkuhol û oksîdê duwemê karbonê.

-ZYME, *suff.* : paşgir e ko haveyn e, enzîm e.

ZYMOGEN, *n.* : zîmojen : haveynçêker.

ZYMOGENIC, *adj.* : zîmojenî, tirşanî, tirşkirî.

ZYMOGRAM, *n.* : beyava livîna pirtikên di nav avekê de hilawîstî ko rêzika protînan diyar dikit.

ZYMOLOGIC, *adj.* : pêwendîdarê haveynzanî.

ZYMOLOGIST, *n.* : haveynzan.

ZYMOLOGY, *n.* : zîmolojî : haveynzanî, hevîrtirşzanî.

ZYMOLYSIS, *n.* : enzîmîtî : karê givêrî yê haveynî û tirşkirinê, tirşbûn.

ZYMOLYTIC, *adj.* : pêwendîdarê enzîmîtiyê.

ZYMOMETER, *n.* : tirşpîv.

ZYMOPLASTIC, *n.* : haveynçêker, haveynker.

ZYMOSAN, *n.* : şikestika çend şekirî ya dîwarên xaneyên haveyniya nebuhujînbar.

ZYMOSCOPE, *n.* : tirşkirinpîv, alavka ko şiyana haveynê tirşkirinê dipîvit.

ZYMOSIS, *n.* : nesaxiyek vegir e, tirşan.

ZYMOSTHENIC, *adj.* : qayimker yan çalakkerê karê haveynan.

ZYMOTIC, *adj.* : vegir, tirşkirî, tirşbûnî.

- **DISEASES** : nesaxiyên vegir.

ZYMURGY, *n.* : kîmyaya tirşbûnê, kîmyaya kirdarên tirşbûnê nemaze bo çêkirina şerab û bîreyê.

BIBLIOGRAPHY

MAIN ENGLISH AND KURDISH SOURCES AND REFERENCES

1. **The Oxford Dictionary of Current English**, fourth edition, 1952, and sixth edition, 1976.
2. **Webster's Ninth New Collegiate Dictionary**, 1983.
3. **Ferhenga Kurdî**, Mîr Celadet Bedirxan (manuscript).
4. **Ferhenga Kurmanci-inglizi, Berkeley**, California, 1992.
5. **Ferhenga Kurdî-Erebî Nûjen**, Elî Seydo Elî Gewranî, Amman, 1985.
6. **Ferhenga Khurdî-Tirkî**, Musa Anter, Istanbul, 1967.
7. **A Kurdish-English Dictionary**, Taufiq Wehbî and C.J. Edmonds (Soranî Kurdish-English) Oxford, Clarendon Press, 1966 (179 p.).
8. **A Kurdish-English Dictionary of synonymous words and expressions** by Shawkat Ismail Hassan, volume one, Baghdad, 1978.
9. **The Human Body** (Giyanê Mirovî), Eziz Reşid Akreyî, Baghdad, 1978.
10. **Ferhengi Kurdî-Farisi**, Hejar (Soranî Kurdî-Farisî), Tehran, 1369 (kelk le Kurdî-Kurdî wergîrawe).
11. **Ferhengi Mehabad, Ferhengêki Qotabxaneyi Kurdî-Arewî ye**, Gîw **Mukiryani, çapi yekemîn**, Hewlêr, çapxaney Kurdistan, 2573 Kurdî.
12. **Estêregeşe, Ferhengêki Kurdî-Erebî ye**, Fazil Nîzam El-Dîn, Komarî Iraq, Wezaretî Perwerde, 1990.
13. **Ferhengi Xal** : Şêx Mehemedî Xal, cizmî yekem 1959, cizmî duwen 1964.
14. **Ferhengi Zanyarî, Erebî-Englizi-Kurdî**, Dananî Kemal Celal X'erîb, bergî sêyem, çapî yekem, 1983.
15. (a) **Zarawey Kurdiyi Zanistekan, lijney zarawe zanistiyekan**, Korî Zanyariy 'îraqî, destey Kurdî.

(b) **Poxtey zarawey hemeçeÔne, lijney zarawe miroviyekan**, Korî Zanyariy îraqî, destey Kurdî.

(c) **Komelek zarawey hemeçeÔne Kurdî**, Korî Zanyariy îraqî, destey kurdî.

(d) **Listey yekemi zarawi kargêri**, kovarî Korî Zanyariy Kurd, 1973.

(e) **Listey duwemi zarawi kargêri**, kovarî Korî Zanyariy Kurd, 1974.

(f) **Listey sêyemi zarawi kargêri**, kovarî Korî Zanyariy Kurd, 1975.

SALADIN'S

ENGLISH-KURDISH DICTIONARY

FERHENGA ÎNGLÎZÎ-KURDÎ

ya SELAHEDÎN

By Salah Saadallah

PARIS KURDISH INSTITUTE

ISBN 975-7112-85-2

9 789757 112853

avesta